

MIZGÎNÎ

PEYMANA NÛ

PEYMANA NÛ (MIZGÎNÎ)

ISBN 978-9939-53-177-9

Peymana Nû (Mizgînî) bi zimanê kurdî (kurmancî)
Новый Завет на курдском (курманджи) языке
Today's' Kurdish-kurmanji New Testament
Նոր Կտակարան, քրդերեն (կուրմանջի) լեզվով

© CBÎM- Bona çapkirinê 2008, 2017

© RMILAZIM- Bona veğerandinê

Çapkirina dudan 2017

SERECEMA PEYMANA NÛ

	KITÊB	SERÎ	RÛPEL
	BINGEHA VEGERANDINÊ		2
1	MIZGÎNÎ YA KU METTA NIVÎSÎ	28	3
2	MIZGÎNÎ YA KU MARQOS NIVÎSÎ	16	29
3	MIZGÎNÎ YA KU LÛQA NIVÎSÎ	24	45
4	MIZGÎNÎ YA KU YÛHENNA NIVÎSÎ	21	72
5	K'ARÊN ŞANDÎYAN	28	91
6	NAMA PAWLOS ROMÎYANR'A	16	114
7	NAMA PAWLOSE PÊŞIN KORINTÎYANR'A	16	125
8	NAMA PAWLOSE DUDAN KORINTÎYANR'A	13	136
9	NAMA PAWLOS GALATÎYANR'A	6	143
10	NAMA PAWLOS EFESÎYANR'A	6	147
11	NAMA PAWLOS FÎLÎPÎYANR'A	4	151
12	NAMA PAWLOS KOLOSÎYANR'A	4	154
13	NAMA PAWLOSE PÊŞIN TÊSALONÎKÎYANR'A	5	157
14	NAMA PAWLOSE DUDAN TÊSALONÎKÎYANR'A	3	160
15	NAMA PAWLOSE PÊŞIN TÎMOTÊYOR'A	6	162
16	NAMA PAWLOSE DUDAN TÎMOTÊYOR'A	4	165
17	NAMA PAWLOS TÎTOR'A	3	167
18	NAMA PAWLOS FILÎMONR'A	1	169
19	NAMA ÎBRANÎYANR'A	13	170
20	NAMA AQÛB	5	179
21	NAMA PETRÛSE PÊŞIN	5	182
22	NAMA PETRÛSE DUDAN	3	185
23	NAMA YÛHENNAYE PÊŞIN	5	187
24	NAMA YÛHENNAYE DUDAN	1	190
25	NAMA YÛHENNAYE SISYAN	1	190
26	NAMA CIHÛDA	1	191
27	AŞKERETÎYA KU ÎSA MESÎH DA YÛHENNA	22	192

BINGEHA VEGERANDINÊ

- 1-Ev k'itêb li gora zargotina kurmançîya welatên Kafkazê- ji Peymana Nûye Ermenîye rohilatêye kevn hatye vegerandinê, ya ku ji destnivîsarên yûnanîye bingeh hatye hildanê: «Eastern Armenian (Ararat) New Testament»- 1883.
- 2- Usa jî, ev kitêb li t'evî van kitêbên jêrnivîsar hatye berhevkerin ê:
- 2.1. Kitêba Peymana Nûye Ermenîye roavayêye kevn, ya ku ji destnivîsarên yûnanîye bingeh hatye vegerandinê.
 - 2.2. Kitêba Peymana Nûye Ermenîye «Today's Eastern Armenian New Testament».
 - 2.3. Kitêba Peymana Nûye Ermenîye «Armenian Eastern NTV 263».
 - 2.4. Kitêba Peymana Nûye kurmançî, s.2000 Stokholm-Moskva.
- 3- Kitêb xeber bi xeber nehatye vegerandinê, lê li gora bendfiraz û rêzimanîya kurmançî ye.

ÇEND PIRSÊN RASTNIVÎSARÊ

K'itêbêda çend k'arên biç'ûk hatine kirinê, ku alîk'arîya xwendevan bikin, ku nivîsar hê rihet bê xandinê. Mesele:

1-Ev «'»- t'ûncika (apostrofa) jorin li ser hinek sewtan hatye nivîsarê, ku hemû xwendevan bikaribin sewtan rast bêjin û fikira xeberê hê zû fem bikin. Soz mesele nivîsar e: «ker»- vir ne zelal e, bixûnî «ker» yan «ker'». Mesele:

-Wir çend ker hene? - Vir ne femdarî ye gotin bona çî ye. Mesele:

-Çend karên wî hene, ew dixaze wan nîşanî te bide. - Li vir jî gava «'» t'ûncika jorin t'une, hingê xwendevan nizane, gelo gotin bona k'arkirinê ye, yan bona karê bizinan.

-Usa jî mesele, nivîsar e -Ber-, nizanî bixûnî: Be'r, ber', yan ber. Ê pirsên aha gelek caran rast tên.

Yan jî gava xwendevan rast fem nake û dîsa vedigere, ku rast fem bike, hingê jî aciz dibe û diweste. Yan gava merivekî ne k'urd yan zar'okek dixaze bixûne, wanr'a gelekî zehmet dibe, lema zimanê gelek zar'okan li ser zargotinê şaş dişkê.

2-Hemû xeberên ku bi sewta «r» dest pê dibin, çawa qanûn ew tê xandinê «r'» û ne hewce ye ku ev «'» t'uncika jorin bê nivîsarê.

3-Heger li xeberêda du herfên danganî k'etine rex hev, nava wanda herfa bêdenge «y» hatye nivîsarê. Soz mesele: Hewcetîya, merivatîyê, sîya.

Lê çend xeber nek'etine ber vê qanûnê. Soz mesele: Dua, Îsraêl, tuê.

4-Çaxê piştnavên «da, r'a, va» xeberêva hatine bik'aranînê, pêşp'irtikên «li û ji» pêşîya xeberê nehatine nivîsarê. Lê çaxê piştnavên «da, r'a, va» xeberêva nehatine bik'aranînê, pêşp'irtikên «li, ji» pêşîya xeberê hatine bik'aranînê, lê cî jî hene, ku him piştnav, him jî pêşp'irtik hatine bik'aranînê, ku fikira gotî hê bê şidandinê. Soz mesele: Li malêda deng heye, ji minva ne girêdayî ye.

5-Usa jî ev «'» t'uncik ji ser wan herfan hatye hildanê, k'îjan ku ne zîs in ne jî ker', lê sonant in (nîvdeng in), çimkî ew nava cimetêda p'ayê-p'ir'ê nîvdeng tene bihîstinê û fikira xeberê naguhêzin. Mesele: Hej, herf, hemû.

MIZGÎNÎ YA KU METTA NIVÎSÎ

PÊŞGOTIN

Bona k'arê Îsa Mesîh, ji şagirtên wî, yekî navê wî Metta, ev Mizgînî nivîsî. Ew berî ku bibûya şagirtê Îsa, xercgir bû û wîr'a digotin Lêwî.

Ev kitêba ji sedsaliya pêşinda heta niha bûye mecaleke mezin, ku meriv bi wê bona rastîya Xwedê pê bihesin, awa gotî has ji Îsa Mesîh û k'arê wî hebin. Belê, bi vê Mizgînîyê k'ifş dibe, ku Îsa Mesîh e Rizgarkir û P'adşayê ji Xwedêda şandî, yê ku bona mêriv jîyîna xwe da~ bû qurban û bi xûn û canîya wî gunehafûbûn û rizgarî hazir bû. Û Îsa ne t'enê Rizgarkir û P'adşayê cimeta cihûyan e, lê ew yê her miletan e û usa jî ew P'adşayê hemû erşê ezmên e.

Ji her sê Mizgînîyên din, hê zêde Mizgînîya Mettada nivîsarên Peymana Kevin hatine wek'ilandinê, çawa îzbatîya wê yekê, ku Îsa Şandîyê Xwedêyî sozdayî ye, ku bi wî cûreyî sozên Xwedêye bona rizgarîyê anî sêrî, yên ku Peymana Kevnda hatibûne nivîsarê.

Ev Mizgînî ji her sê Mizgînîyên mayîn bi vî awayî jî firq dibe~ vêda dewsa navê «Xwedê» gelek caran xebera «Ezman» hatye bik'aranînê: manî ew bû, ku cihûyan nedixast navê Xwedê her car bê ser zaran, çimkî ew nav pîroz e, lema Metta mîna cûr'ê cihûyan nivîsî. Soz-mesele, dewsa «P'adşatîya Xwedê» gelek caran «P'adşatîya Ezmanan» nivîsar e.

Metta bona heyîntîya Îsa Mesîh du rastîyan tîne li ber ç'evan, ew dide k'ifşê, ku du binyatên Mesîh hebûne, ew alîyê Ruhê xweda lawê Xwedê bû, Ruhê wî ji Xwedê qetya û hat, lê alîyê xûn û goştê ew lawê meriv bû~ ji Meryema bik'ir bi k'iryamet dinê k'et. Gelek caran ew dinivîse, ku Îsa çawa «Lawê Dawid» tê hesabê, çimkî Mesîhê sozdayî wê ji malbeta Dawid p'adşa bibûya û Meryema dê jî ji bereka Dawid p'adşa bû.

Usa jî Mizgînîya Mettada Îsa çawa dersdarekî mezin k'ifş bûye, ew Qanûna Xwedê bi hikum şirovedike û bona P'adşatîya Xwedê dannasîn dike. Metta daye k'ifşê, ku Îsa wek'ilê Qanûna Xwedê û Peymaneke hê mezin e.

SERECEMA MIZGÎNÎYÊ

Şikilê malbeta Îsa û jidêbûyîna wî (1:1-2:23)

Xizmetîya Yûhennayê nixamdar (3:1-12)

Nixamtin, cêribandin, dannasîn û k'arên Îsaye li Celilê (3:13-18:35)

Meşa Îsa ji Celilê heta Orşelîmê (19:1-20:34)

Hefîya Îsaye paşin (21:1-27:66)

Girtin, dîwankirin, xaçkirin, mirin û zêndîbûna Îsa (26:47-28:20)

MALBETA ÎSA

(Lûqa 3:23-38)

1 ¹ Ev e şikilê malbeta Îsa Mesîh~ lawê Dawid, lawê Îbrahîm: ² Ji Îbrahîm Îshaq bû, ji Îshaq Aqûb bû, ji Aqûb Cihûda û birayên wîva bûn, ³ ji Cihûda Pêrês û Zerah bûn, (navê dîya wan T'amara bû), ji Pêrês Hesrûn bû, ji Hesrûn Ram bû, ⁴ ji Ram Amînadav bû, ji Amînadav Nehşon bû, ji Nehşon Selmon bû, ⁵ ji Selmon Bowaz bû, (navê dîya wî Rexab bû), ji Bowaz Ovêd bû, (navê dîya wî Rût' bû), ji Ovêd Yêşa bû ⁶ û ji Yêşa Dawid p'adşa bû. Ji Dawid p'adşa Silêman bû, (dîya wî *waxtekê* jina Ūrîya bû), ⁷ ji Silêman Rehobowam bû, ji Rehobowam Ebîya bû, ji Ebîya Asaf bû, ⁸ ji Asaf Yêhoşefat bû, ji Yêhoşefat Yoram bû, ji Yoram Ūzîya bû, ⁹ ji Ūzîya Yotam bû, ji Yotam Ahaz bû, ji Ahaz Hizqîya bû, ¹⁰ ji Hizqîya Minaşe bû, ji Minaşe Amos bû, ji Amos Yoşîya bû, ¹¹ ji Yoşîya Yexonîya û biranva bûn. Hingê *cimet* hêsîr çûne Babilonê. ¹² Lê pey hêsîrçûyîna Babilonêr'a, ji Yexonîya Şaltîyêl bû, ji Şaltîyêl Zerûbabel bû, ¹³ ji Zerûbabel Abîyûd bû, ji Abîyûd Êlyaqîm bû, ji Êlyaqîm Azûr bû, ¹⁴ ji Azûr Sadoq bû, ji Sadoq Axîn bû, ji Axîn Êlyûd bû, ¹⁵ ji Êlyûd Êlazar bû, ji Êlazar Metan bû, ji Metan Aqûb bû, ¹⁶ ji Aqûb Ūsiv bû, mêrê Meryema ku ji wê Îsa bû, ewî ku Mesîh tê navkirinê.

¹⁷ Awa hemû~ ji Îbrahîmda heta Dawid, çardeh nisil bûn, ji Dawidda heta hêsîrçûyîna Babilonê çardeh nisil bûn û ji hêsîrçûyîna Babilonêda heta Mesîh dîsa çardeh nisil bûn.

JIDÊBÛYÎNA ÎSA

(Lûqa 2:1-7)

¹⁸ Jidêbûyîna Îsa Mesîh aha bû.~ Dîya wî, Meryem Ūsivr'a nîşankirî bû, lê hê dergîstî bû, bi *hikumê* Ruhê Pîroz du halî k'ifş bû. ¹⁹ Lê Ūsivê dergîstîyê wê merivekî rast bû, nexast wê rûreş ke, fikirî dizîva wê berde. ²⁰ Gava Ūsiv hê ser vê difikirî, awa xewnêda milyak'etê Xudan wîva k'ifş bû, gotê: «Ūsivê kur'ê Dawid! Netirsî, ku Meryema dergîstîya xwe bistînî. Zar'oka ku wê jê bibe, ew bi *hikumê* Ruhê Pîroz e. ²¹ Ewê kur'ekî bîne û gerekê navê wî daynî Îsa, * çimkî ewê cimeta xwe ji gunehên wan rizgar bike».

²² Ev her tişt aha bû, ku gotina Xudane bi zarê p'êxember bê sêrî, ku dibêje: ²³ «Va ye, qîza bik'ir wê duhalî derê, kur'ek wê jê bibe û navê wî wê daynin Îmmanûyêl†, ku tê femkirinê: «Xwedê mer'a ye».

²⁴ Ūsiv jî, ku ji xewê rabû, li gora gotina milyak'etê Xudan kir~ dergîstîya xwe bire cem xwe. ²⁵ Lê dest nedayê, heta ku kur'ê wêyî nixurî‡ bû. Û navê wî danî Îsa.

* 1:21 Fikira navê «Îsa» bi îbranî ev e: «Rizgarkir» yan jî «Azabûn.»

† 1:23 Îşaya 7:14.

‡ 1:25 Destnivîsarên hinekanda xebera «nixurî» t' une.

2¹ Çaxê Beytlehima Cihûstanêda, rojên p'adşatîya Hêrodesda Îsa ji dîya xwe bû, hingê ji rohilatê steyrkzan* hatine Orşelîmê ² û pirsîn: «Ew P'adşayê cihûyan, ku gerekê bibûya, k'anê ye? Me steyrka wî li rohilatêda dît û em hatine ku wî bihebînin».

³ Hêrodes p'adşa hema *ev yek* bihîst, t'evîhev bû, t'emamîya Orşelîmê *jî pêr'a*. ⁴ Hingê wî hemû çanûnzânên cimê û serokên k'ahînan civandin û ji wan pirsî: «Mesîh, li k'u gerekê bibe?» ⁵ Wana wîr'a got: «Li Beytlehima Cihûstanê, çimkî bi destê p'êxember aha nivîsar e: ⁶ <Ay Beytlehim, erdê Cihûda, nava mîrên Cihûdayêda tu ne yekî biç'ûk î, çimkî ji te mîrek wê rabe, ku şivantîyê cimeta min Îsraêlê bike>[†]».

⁷ Hingê Hêrodes bi dizîva gazî steyrkzanan kir, ji wan pê hesya, ku steyrk çîçax k'ifş bûye. ⁸ *Peyr'a* ewana şandine Beytlehmê got: «Her'in derheqa zar'okêda rast bizanibin. Û çaxê wî bibînin, minr'a bêjin, ku ez jî bêm, wî bihebînim».

⁹ Gava wan ji p'adşê bihîst, çûn. Û ew steyrka ku rohilatêda dîtibûn pêşîya wanva çû û ser wê dera ku zar'ok lê bû sekinî. ¹⁰ Gava wan ew steyrk dît, gelekî şa bûn, ¹¹ çûne hindur, zar'ok Meryema dîya wîva t'evayî dîtîn, deverû xwe avîtine ber *zar'okê* û ew hebandin û xeznên xwe vekirin, p'êşkêşên zêr', bixûr û zimir danê. ¹² Paşê wan xewnêda ferman stand, ku venegerine cem Hêrodes û rêke dinva çûne erdê xwe.

¹³ Hema *steyrkzan* ji wir çûn, milyak'etekî Xudan xewnêda Ûsivva k'ifş bû got: «Rabe zar'okê û dîya wî hilde bireve Misirê. Li wir bimîne, heta ku ez ter'a bêjim, çimkî Hêrodesê zar'okê biger'e, ku wî bikuje». ¹⁴ Ûsiv jî rabû zar'ok û dîya wî hildan, şevda çûne Misirê ¹⁵ û heta mirina Hêrodes li wir man. Eva yeka aha bû, ku ew gotina Xudane ku bi zarê p'êxember gotî bê sêrî, ku dibêje: «Ji Misirê min gazî kur'ê xwe kir».[‡]

¹⁶ Çaxê Hêrodes dît, ku ew ji steyrkzananda xapya, gelekî hêrs k'et. Wî ferman da, ku hemû zar'okên kur'îne li Beytlehmê û der-dorên wê bêne kuştinê~ yên du salî û ji wan biç'ûktir, li gora wî waxtê ku ji steyrkzanan pê hesya bû. ¹⁷ Hingê ew gotina bi zarê Yêremîya p'êxember hate sêrî: ¹⁸ «Ji Ramayê dengê hêwerzê, şînê, girî û nelîna giran hat. Rahêl digirya, bona zar'okên xwe û nedixast sik'in berda bê, çimkî *ew îdî t'unekûn*».[§]

VEGERA JI MISIRÊ

¹⁹ Çaxê Hêrodes mir, milyak'etekî Xudan li Misirê xewnêda Ûsivva k'ifş bû ²⁰ û gote wî: «Rabe, zar'okê û dîya wî hilde û her'e erdê Îsraêlê, çimkî ewên pey zar'okê k'etibûn, ku ew bikuştana, mirine».

²¹ Ûsiv jî rabû, zar'ok û dîya wî hildan, vegerya erdê Îsraêlê. ²² Lê gava bihîst, ku Arxêlayo dewsa bavê xwe Hêrodes bûye p'adşayê Cihûstanê, tirsya her'e wir. Hingê wî xewnêda ferman stand, ku her'ine alîyê qeza Celîlê. ²³ Ew jî çûne bajarê ku Nisret digotinê û li wir hêwirîn. Eva yeka aha bû, ku ew gotina bi zarê p'êxemberan bê sêrî, ku: «Wîr'a wê bêjin <Yê nisretî>».

DANNASÎNA YÛHENNAÛ NIXAMDAR
(Marqos 1:1-8; Lûqa 3:1-18; Yûhenna 1:19-28)

3¹ Wan rojanda Yûhennayê nixamdar hat, ber'îya Cihûstanêda dannasîn dikir ² digot: «Ji gunehkirinê vegevin, çimkî P'adşatîya Ezmanan nêzîk bûye». ³ Ev ew bû, bona k'îjanî Îşaya p'êxember gotibû: «Dengê ber'iyêda dike gazî: <Rîya Xudan hazir bikin û şiverêyên wî rast bikin>».^{**}

⁴ K'inca Yûhenna ji pirça devê bû, qayîşeke ç'erm piştê bû, xwarina wî jî kulî û hingivê çolê bû. ⁵ Hingê ji Orşelîmê, ji t'emamîya Cihûstanê û ji her der-dorên ç'emê Ûrdunê dihatine cem wî, ⁶ gunehên xwe didane rûyê xwe û bi destê wî ç'emê Ûrdunêda dihatine nixamtinê. ⁷ Gava Yûhenna dît ku gelek fêrisî û sadûqî jî hatine, ku bêne nixamtinê, gote wan: «Ç'êjikên me'ran! K'ê wer'a got, ku hûn *dikarin* ji hêrsa tê birevin? ⁸ De bi kirinên qenc bidine k'ifşê, ku hûn ji gunehkirinê vegeryane. ⁹ Û dilê xweda nefikirin nebêjin: <Îbrahîm bavê me ye>. Ez dibêjime we, Xwedê dikare ji van kevîran jî Îbrahîmr'a lawan derxe. ¹⁰ Va ye balt'e ber rawê darê danî ye. Her dara ku berê qenc nade, wê bê bir'înê û avîtinê nava êgir. ¹¹ Ez we bi avê dinixênim, *çawa nîşana* bona t'obekirinê, lê yekî ji min zortir wê bê. Ez ne hêja me p'êlavên wî jî bigirime destê xwe. Ewê we bi Ruhê Pîroz û agir binixême. ¹² Bêra wîye bêderê dêstda ye. Ewê bêdera xwe paqij ke, genimê xwe jî wê bike embarê, lê ka wê bi agirê ku natemire bişewtîne».

NIXAMTINA ÎSA
(Marqos 1:9-11; Lûqa 3:21-22)

¹³ Wî çaxî Îsa ji Celîlê hate Ûrdunê, cem Yûhenna, ku bi destê wî bê nixamtinê. ¹⁴ Lê Yûhenna wîr'a nerazî bû, got: «Ez hewcê nixamtina destê te me û tu t'êyî cem min?» ¹⁵ Îsa lê vegevand got: «Niha bihêle, çimkî li me dik'êve, ku em hemû rastîyê bînine sêrî». Paşê Yûhenna wîr'a razî bû.

¹⁶ Hema çawa Îsa hate nixamtinê û ji avê derk'et, ezman vebû û wî dît, wê Ruhê Xwedê mîna kewekê hate xwarê û li ser wî danî. ¹⁷ Û dengekî ji ezmên got: «Ev e, Kur'ê minî delal, ez ji wî razî me».

*2:1 Destnivîsarên esasîda dewsa xebera «steyrkzan» nivîsar e~«alim»

† 2:6 Mîxa 5:2.

‡ 2:15 Hoseya 11:1.

§ 2:18 Yêremîya 31:15.

** 3:3 Îşaya 40:3.

Metta 4,5

CËRIBANDINA ÎSA
(Marqos 1:12,13; Lûqa 4:1-13)

4¹ Hingê Ruh Îsa bire ber'îyê, ku ji aliyê Şeytanda bê cêribandinê. ² Wî çil rojan û çil şevan rojî girt, peyr'a birçî bû. ³ Hingê Cêribandok nêzîkî wî bû û got: «Heger tu Kur'ê Xwedê yî, de van keviranr'a bêje, ku bibin nan». ⁴ Îsa lê vegerand got: «Nivîsar e: <Meriv t'enê bi nan najî, lê bi her xebereke ku ji zarê Xwedê tê xwarê>».*

⁵ Hingê Şeytan ew bire Bajarê Pîroz, li ser bilindcîya banê p'aristxanê da sekinandinê ⁶ û gote wî: «Heger tu Kur'ê Xwedê yî, de xwe bavêje xwarê, çimkî nivîsar e: <Xwedê t'emîya te wê bide milyak'etên xwe û ewê te ser destên xwe bigirin, ku nigê te kêvir nek'eve>».† ⁷ Îsa lê vegerand: «Aha jî nivîsar e: <Xudan Xwedêyê xwe necêribîne>».‡

⁸ Şeytan dîsa ew *cêriband*, bir û rakire ser ç'iyakî gelekî bilind û hemû p'adşatîyên dinyayê rewşa wanva nîşan kirinê ⁹ û gotê: «Ezê van her tiştan bidime te, heger tu deverû bêyî û min bihebînî». ¹⁰ Hingê Îsa gote wî: «Dûrî min her'e, Şeytan! Çimkî nivîsar e: <Xudan Xwedêyê xwe bihebîne û t'enê wîr'a xizmetîyê bike>!»§

¹¹ Hingê Şeytan ew hişt çû û milyak'et hatin Îsar'a xizmetî kirin.

DESTPÊBÛNA K'ARÊN ÎSA LI QEZA CELÎLÊDA
(Marqos 1:14-15; Lûqa 4:14-15)

¹² Gava Îsa bihîst, ku Yûhenna avîtine hebsê, rabû çû Celîlê. ¹³ Ew ji Nisretê çû û li Kefernahûma devê gola Celîlê~ li nava sînore Zebûlonê û Neftelîyêda cî-war bû. ¹⁴ Eva yeka aha bû, ku ew gotina bi zarê Îşaya p'êxember bê sêrî: ¹⁵ «Erdê Zebûlonê û Neftelîyê, li ser rîya berbi golê, wî aliyê Êrdunê, Celîla hêtanosan, ¹⁶ ew cimeta ku nav tarîstanîyêda rûniştîbû ronahîke mezin dît û ewên ku li erd û sîya mirinêda rûniştîbûn ronahî ji wanr'a derk'et».***

¹⁷ Ji hingêda Îsa dest bi dannasînê kir û got: «Ji gunehkirinê vejerin, çimkî P'adşatîya Ezmanan nêzîk bûye».

ÎSA GAZÎ ÇAR MESÎGIRAN DIKE
(Marqos 1:16-20; Lûqa 5:1-11)

¹⁸ Gava Îsa li devê gola Celîlê diger'ya, ewî du bira dîtin~ Şimhûnê ku nav dibû Petrûs û Endrawsê birayê wî. Wana t'or' davîte golê, çimkî mesîgir bûn. ¹⁹ Îsa wanr'a got: «Pey min werin, ezê we bikime nêç'îrvanên merivan». ²⁰ Wana jî hema ji wê demêda t'or'ên xwe hiştin û pey wî çûn.

²¹ Gava Îsa ji wir hinekî pêşda çû, du birayên din jî dîtin~ Aqûbê Zebedî û Yûhennayê birayê wî. Wana t'evî bavê xwe Zebedî qeyikêda t'or'ên xwe hîvês dikirin. Îsa gazî wan jî kir. ²² Wana jî hema ji wê demêda qeyik û bavê xwe hiştin û pey wî çûn.

ÎSA DANNASÎN DIKE Û QENC DIKE
(Lûqa 6:17-19)

²³ Îsa t'emamîya Celîlê diger'ya, k'inîştên wanda hîn dikir û Mizgînîya P'adşatîyê dannasîn dikir û li nava cimetêda her cûr'e êş û nexaşî qenc dikirin. ²⁴ Nav-dengê wî belayî t'emamîya Sûryayê bû, cimetê her cûr'e merivên nexaş anîne cem wî, yên ku cûr'e-cûr'e êş û nexaşîyanda dinelîyan~ yên cinak'etî, hîvk'etî, şilûşet û ewî ew hemû jî qenc kirin. ²⁵ Gelek k'omên merivan jî ji Celîlê, ji qeza Dêkapolisê, ji Orşelîmê, ji Cihûstanê û ji wî aliyê Êrdunêyî rohilatê li pey wî diçûn.

DANNASÎNA SER Ç'ÎYÊ
XWEZÎYA RAST
(Lûqa 6:20-23)

5¹ Gava Îsa k'omên merivan dît, rabû ç'iyê, rûnişt û şagirtên wî hatine cem. ² Ewî dest pê kir ew hîn kirin û got: ³ «Xwezî li ruhfeqîran, çimkî P'adşatîya Ezmanan ya wan e. ⁴ Xwezî li heznîyan, çimkî ewê bêne berdilîkirinê. ⁵ Xwezî li milûkan, çimkî dinya wê p'ara wan be. ⁶ Xwezî li wan, yên ku t'î û birçiyê rastîyê ne, çimkî ewê t'êr bin. ⁷ Xwezî li dilrehman, çimkî ewê rehmê bibînin. ⁸ Xwezî li dilpaqijan, çimkî ewê Xwedê bibînin. ⁹ Xwezî li wan, k'ê haştîyê dikin, çimkî ewana wê lawên Xwedê bêne gotinê. ¹⁰ Xwezî li wan, yên ku bona rastîyê têne zêrandinê, çimkî P'adşatîya Ezmanan ya wan e.

¹¹ Xwezî li we, çaxê bona navê min we bêhurmet kin, bizêrînin û her cûr'e buxdanan li we bikin. ¹² Şa bin û bireqisin, çimkî maşê we li ezmanan gelek e. Bi vî cûr'eyî p'êxemberên ku berî we hebûn zêrandin.

XWÊYA ERDÊ Û RONAYA DINYAYÊ
(Marqos 9:50; Lûqa 14:34-35)

¹³ Hûn xwêya erdê ne, lê heger xwê te'ma xwe unda ke, îdî bi çi ewê te'mê bistîne? Peyr'a kêrî t'u tiştî neyê. Wê bê avîtîne û p'êpeskirinê.

* 4:4 Qanûna Ducarî 8:3.

† 4:6 Zebûr 91:11,12.

‡ 4:7 Qanûna Ducarî 6:16.

§ 4:10 Qanûna Ducarî 6:13.

** 4:16 Îşaya 9:1,2.

Metta 5

¹⁴ Hûn ronaya dinyayê ne. Heger bajarek li ser ç'îyê ye, nayê veşartinê. ¹⁵ T'u kes ç'irê vênaxe û nake binê derdanê, lê datîne ser p'êç'irê, ku ronayê bide hemûyên malêda. ¹⁶ Usa jî bira ronaya we ber merivan şewq bide, ku ewana kirinên weye qenc bibînin û pesinê Bavê weyî ezmanan bidin.

HÎNKIRINA LI SER QANÛNÊ, HÊRSÊ Û KUŞTINÊ

¹⁷ Nefikirin, ku ez hatime nivîsarên p'êxemberan û Qanûnê xirab bikim. Ez nehatime xirab bikim, lê ku wan hemûyan bîname sêrî. ¹⁸ Ez rast dibêjime we, berî derbazbûna erd û ezmên, niqitkek yan herfeke biç'ûk ji Qanûnê wê unda nebe, heta ku her tişt bêne sêrî.

¹⁹ Awa k'î ji van t'emîyan yeke here biç'ûk bit'eribîne û merivan usa hîn ke, P'adşatîya Ezmananda wê ji hemûyan biç'ûk bê hesabê, lê k'î ku wan pêk bîne û hîn bike, P'adşatîya Ezmananda ewê mezin bê hesabê. ²⁰ Lema ez dibêjime we, heger rastîya we ser rastîya qanûnzana û fêrisîyan nek'êve, t'u car hûn nak'evine P'adşatîya Ezmanan.

²¹ We bihîstye, ku pêşyanr'a hatye gotinê: <Nekuje!* K'î ku bikuje, wê bik'êve ber dîwanê>. ²² Lê ez wer'a dibêjim, k'î ku badîhewa ser birê xweda hêrs k'êve, ewê bik'êve ber dîwanê û k'î bêje birê xwe: <Bêaqil>, ewê bik'êve ber dîwana civîna giregiran û k'î ku bêje: <Bêhiş>, wê bik'êve ber dîwana agirê dojê.

²³ Awa heger tu hedîya xwe bîni ser qurbangehê û wir bê bîra te, ku dilê birayê te ji te maye, ²⁴ hedîya xwe li wir ber qurbangehê bihêle û pêşyê her'e birayê xwer'a li hev were û paşê vegere hedîya xwe bide.

²⁵ Çaxê, yê k'îna te girtye, te k'aşî cem hakim dike, rêda zû wîr'a li hev were. Heger na, ewê te bide destê hakim, hakimê jî te bide destê celat û te bavêje hebsê. ²⁶ Ez rast dibêjime te, tu ji wir dernak'evî heta p'erê xweyî paşin nedî.

HÎNKIRINA LI SER ZINÊK'ARÎYÊ Û JINBER'DANÊ

(Metta 19:9; Marqos 10:11,12; Lûqa 16:18)

²⁷ We bihîstye, ku hatye gotinê: <Zinêk'arîyê neke>.[†] ²⁸ Lê ez wer'a dibêjim, k'î bi temê xirab k'ulfetekê binihêre, ewî dilê xweda îdî wêr'a zinêk'arî kir. ²⁹ Awa heger ç'evê teyî rastê te ji rê derdixe, wî derxe û ji xwe bavêje. Ter'a hê qenc e, ku endemeke te unda be, lê t'emamîya bedena te nek'êve cenimê. ³⁰ Û heger destê teyî rastê te ji rê derdixe, wî jêke û *wêda* bavêje. Ter'a hê qenc e, ku endemeke te unda be, lê t'emamîya bedena te nek'êve cenimê.

³¹ Ev jî hatye gotinê: <K'î jina xwe ber'de, bira nivîsara jinber'danê bide wê>.[‡] ³² Lê ez wer'a dibêjim, k'î ku jina xwe bêy manîya qavîyê ber'de, ew dibe manîya zinêkirina wê û k'î ku yeke mêrber'dayî bistîne, ew zinêk'arîyê dike.

HÎNKIRINA LI SER SONDE

³³ We ev jî bihîstye, ku pêşyanr'a hatye gotinê: <Derew sond nexwe, li ber Xudan *li gora* sondê xwe bike>. ³⁴ Lê ez wer'a dibêjim, qet sond nexwin~ ne bi ezmên, çimkî ew k'ursîya Xwedê ye, ³⁵ ne bi erdê, çimkî ew bingeha p'îyên wî ye, ne jî bi Orşelîmê, çimkî ew bajarê P'adşayê mezin e ³⁶ û ne jî bi serê xwe sond bixwe, çimkî tu nikarî mûkî sipî kî yan reş kî. ³⁷ Lê gotina we bira bibe <belê-belê> yan <na-na>. Ji vê zêdetir ji yê Xirab e.

HÎNKIRINA LI SER HEYFHILDANÊ

(Lûqa 6:29-30)

³⁸ We bihîstye, ku hatye gotinê: <Ç'ev dewsa ç'ev û diran dewsa diran>.[§] ³⁹ Lê ez wer'a dibêjim, miqabilî xiraban xiraban nesekinînin. Heger yek şemaqekê rûyê teyî rastê xe, yê din jî bide ber. ⁴⁰ Û heger yek te k'aşî ber dîwanê ke û bixaze kirasê te ji te bistîne, p'otê xwe jî wîr'a bihêle. ⁴¹ Û heger yek zorê li te bike, ku mîlek** *rê* te bibe, wîr'a dudan her'e. ⁴² Bide wî, yê ku ji te dixaze û berê xwe ji wî neguhêze, yê ku ji te dixaze deyn bike.

DIJMINÊN XWE HIZ BIKIN

(Lûqa 6:27-28, 32-36)

⁴³ We bihîstye, ku hatye gotinê: <Hevalê xwe hiz bike,^{††} dijminê xwer'a xirabîyê bixaze>. ⁴⁴ Lê ez wer'a dibêjim, dijminên xwe hiz bikin û dua-dirozge li wan bikin, yên ku nifiran li we dikin, xêrnexazên xwer'a qencîyê bikin û bona wan dua bikin, yên ku we dizêrînin, ⁴⁵ ku hûn bibine lawên Bavê xweyî ezmanan. Çimkî ew te'va xwe derdixe, ku him li ser qencan nedîr dide, him jî li ser xiraban û baranê him bona yên rast dibarîne, him jî bona nerastan. ⁴⁶ Heger hûn *t'enê* wan hiz bikin, yên ku we hiz dikin, hûnê çi maş bistînin? Ê ne xercgir jî usa dikin? ⁴⁷ Û heger hûn *t'enê* silavê bidine birayên xwe, îdî hûn çi tiştî ji ewên din zêdetir dikin? Ê ne xercgir jî usa dikin? ⁴⁸ Awa k'amil bin, çawa Bavê weyî li Ezmanan k'amil e.

* 5:21 Derk'etin 20:13.

† 5:27 Derk'etin 20:14.

‡ 5:31 Qanûna Ducarî 24:1.

§ 5:38 Derk'etin 21:24; Qanûna K'ahintîyê 24:20.

** 5:41 Mîlek bi çapa îroyîn 1500 mêtir e.

†† 5:43 Qanûna K'ahintîyê 19:18.

Metta 6

HÎNKIRINA LI SER QENCÏKIRINÊ

6¹ Miqatî xwe bin, qencîyên xwe li ber merivan nekin, ku wanva bêne dîtînê. Yanê na, hûnê ji Bavê xweyî ezmanan maş nestînin.

² Awa çaxê tu xêrê dikî, pêşîya xwe bor'îyê nexe, çawa durû k'inîşt û k'ûçanda dîkin, ku meriv pesinê wan bidin. Ez rast dibêjime we, ku wana îdî maşê xwe standye. ³ Lê çaxê tu xêrê dikî, bira destê ç'epê nizanibe, ku destê rastê çî *xêr* da, ⁴ ku xêrên te bi dizîva bin. Û Bavê te, ku tiştên tu dizîva dikî dibîne, wê maşê te bide te.

HÎNKIRINA LI SER DUAKIRINÊ

(Lûqa 11:2-4)

⁵ Çaxê hûn dua dîkin, mîna durûyan nebin. Ew hiz dîkin k'inîşt û meydananda bisekinin dua bikin, ku merivanva k'ifş bin. Ez rast dibêjime we, wan îdî maşê xwe standye. ⁶ Lê çaxê tu dua dikî, bik'eve oda xwe, pey xwe derî bigire û Bavê xwer'a, ku nayê dîtînê, duayê xwe bike. Û Bavê te, ku tiştên tu dizîva dikî dibîne, wê maşê te bide. ⁷ Çaxê hûn dua dîkin, mîna hêtanosan zefxeberdar nebin. Wan t'irê bona zef xeberdana wan duayên wanê bêne bihîstinê. ⁸ Hûn nebîne mîna wan, çimkî berî xastina we, Bavê we dizane çî wer'a lazim e. ⁹ Lê hûn aha dua bikin: <Bavê meyî ezmanan! Navê te pîroz be, ¹⁰ P'adşatîya te bê, daxaza te be, çawa li ezmên, usa jî ser dinyayê. ¹¹ Nanê meyî rojê roj bi roj bide me. ¹² Bibaxşîne me deynên me, çawa em dibaxşînine deyndarên xwe. ¹³ Û me nebe ser cêribandinê, lê ji yê xirab rizgar ke, çimkî p'adşatî, qewat û rûmet yên te ne, heta-ha-tê. Amîn>.

¹⁴ Heger hûn neheqîyên merivan bibaxşînine wan, Bavê weyî Ezmanan jî wê bibaxşîne we. ¹⁵ Lê heger hûn neheqîyên merivan nebaxşînine wan, Bavê we jî neheqîyên we nebaxşîne we.

HÎNKIRINA LI SER ROJÎGIRTINÊ

¹⁶ Çaxê hûn rojî digirin, mîna durûyan medekirî nebin. Ew medê xwe dîkin, ku meriv bizanibin ew rojî ne. Ez rast dibêjime we, ku wan maşê xwe standye. ¹⁷ Lê çaxê tu rojî yî, rûyê xwe bişo û gulrûnê serê xwe de, ¹⁸ ku meriv nizanibin tu rojî yî, lê t'enê Bavê teyî ku nayê dîtînê bizanibe. Û Bavê te, ku tiştên tu dizîva dikî dibîne, wê maşê te bide.

XEZNA EZMANAN Û Ç'IRA BEDENÊ

(Lûqa 11:33-36; 12:32-34)

¹⁹ Li ser dinyayê xwer'a xeznê t'op nekin. Li vê derê zeng û bizûz xirab dîkin û diz derevedîkin, didizin. ²⁰ Lê xwer'a xeznê li ezmên t'op kin. Li wir zeng û bizûz xirab nakin û diz jî derevenakin, nadizin. ²¹ Çimkî xezna te li k'u be, dilê te jî wê li wir be.

²² Ç'ira bedenê ç'ev e. Heger ç'evê te qenc e, t'emamîya bedena teyê ronahî be. ²³ Lê heger ç'evê te xirab e, t'emamîya bedena teyê tarî be. Awa heger ew ronaya ku nav teda ye tarî ye, *hingê* tarîya *nava teda* wê hê zêde be!

XWEDÊ Û HEBÛKA DINYAYÊ

(Lûqa 16:13)

²⁴ T'u kes nikare du axanr'a xulamîyê bike, çimkî yan wê hîlê wî ji yekî her'e û yê din hiz bike yan jî wê hurmeta yekî bigire û yê din bêhurmet ke. Hûn nikarin him Xwedêr'a xulamîyê bikin, him jî hebûka dinyayêr'a.

HÎNKIRINA LI SER XEMKIRINÊ

(Lûqa 12:22-31)

²⁵ Lema ez dibêjime we, bona jîyîna xwe xeman nekin, ku hûnê çî bixwin û çî vexwin, ne jî bona bedena xwe, ku hûnê çî li xwe kin. Ê ne jîyîna ji xwarinê zêdetir e û beden jî ji k'incan? ²⁶ Teyredên ezmên binihêrin. Ewana ne diçînin, ne didirûn û ne jî embaranda t'op dîkin, lê Bavê weyî Ezmanan risqê wan dide. Ê ne hûn ji wan zêdetir in? ²⁷ Îdî ji we k'î dikare bi xemkirinê gavekê li ser bejina xweda zêde ke? ²⁸ Û

bona k'incan çima hûn xem dîkin? Sosinên çolê binihêrin, çawa şîn dibin, ew ne dixebitin û ne jî dirêsin. ²⁹ Lê ez wer'a dibêjim, ku Silêman jî nava wê hemû xezna xweye mezinda mîna yeke ji wan xwe nekir. ³⁰ Heger gîhayê çolê, ku îro heye, sibê davêjine nava êgir, Xwedê usa wan dixemilîne, lê çiqas zêde wê bona we xemxur be, kêmbawerno? ³¹ Awa hûn xem nekin û nebêjin: <Emê çî bixwin>? yan: <Çî vexwin>? yan jî: <Çî li xwe kin>? ³² Hêtanos pey wan her tiştan dik'evin, lê Bavê weyî ezmanan dizane, ku hewcetîya we li wan her tiştan heye. ³³ Lê berê pêşda hûn li P'adşatîya Xwedê biger'in û pey rastîya wî her'in û ew her tişt wê wer'a bêne dayîne. ³⁴ Îdî bona roja sibê xem nekin, çimkî roja sibê wê bona xwe xem bike. Xemên rojê besî wê ne.

HÎNKIRINA LI SER LOMEKIRINÊ

(Lûqa 6:37-38, 41-42)

7¹ Lome nekin, ku lome we nebin. ² Hûn çî lome bikin, ew lome jî wê we bibin û hûn bi çî çapê bipîvin, bi wê jî bona we wê bê pîvanê. ³ Çima tu zilîkê ç'evê birê xweda dibînî, lê k'êranê ç'evê xweda nabînî? ⁴ Yan jî tu çawa dikarî bêjî birê xwe: <Bihele ji ç'evê te zilîk derxim>, lê va ye k'êranê ç'evê teda heye? ⁵ Durû! Berê pêşda ji ç'evê xwe k'êran derxe. Paşê tuê qenc bibînî, ku ji ç'evê birê xwe zilîk çawa derxî.

⁶ Tiştên buhurtî nedine sa û ne jî dur'ên xwe bavêjine ber berazan. Heger na, *beraz* wê wan p'êpes kin û *seyê jî* vegerin we gez-gezî kin.

Metta 7,8

BIXAZIN, BIGER'IN, DERÎ XIN
(Lûqa 11:9-13)

⁷ Bixazin û hûnê bistûnin, biger'in û hûnê bibînin, derî xin, ber we wê vebe. ⁸ Çimkî k'î dixaze, distîne, k'î diger'e, dibîne û k'î ku derî dixê, li ber wî vedibe. ⁹ Ji we k'î ye ew merivê ku kur'ê wî nan jê bixaze, ew kevir bidê? ¹⁰ Yan jî mesî bixaze, ew mer bidê. ¹¹ Hûn ku xirab in, lê dizanin tiştên qenc bidine lawên xwe, lê çiqas zêde Bavê weyî ezmanan wê tiştên qenc bide wan, yên ku jê dixazin.

QANÛNA ZÊR' Û DERÊ TENG
(Lûqa 13:24)

¹² Her çi ku hûn dixazin meriv bona we bikin, hûn jî usa bona wan bikin. Ev e *meremê* Qanûnê û p'êxemberan. ¹³ Derê tengr'a bik'evine hindur, çimkî fire ye ew derî û ber e ew rîya ku dibe berbi undabûnê û yên ku wêda diçin gelek in. ¹⁴ Lê gelekî teng e ew derî û zehmet e ew rîya ku dibe berbi jîyînê û yên ku wê rê dibînin hindik in.

DAR JI BERÊ XWE TÊ NASKIRINÊ
(Lûqa 6:43-45)

¹⁵ Hevza xwe ji p'êxemberên derew bikin. Ewê bi p'ostê pêz bêne cem we, lê hindurva gurên t'alank'ar in. ¹⁶ Hûnê wan ji berên wan nas bikin. Gelo k'î ji stirîyan tirî diçine yan ji gongilê, hêjîrê? ¹⁷ Dara qenc berê qenc dide, lê dara xirab, berê xirab. ¹⁸ Dara qenc nikare berê xirab bide, ne jî dara xirab dikare berê qenc bide. ¹⁹ Her dara ku berê qenc nade, tê bir'inê û avîtinê nava êgir. ²⁰ Awa hûnê wana ji kirinên wan nas bikin.

K'Ê DIKARE BIK'EVE P'ADŞATÎYA EZMÊN
(Lûqa 13:26-27)

²¹ Ne her kesê ku dibêje min: <Xudan! Xudan!> wê bik'eve P'adşatîya Ezmanan, lê ew, k'î daxaza Bavê minî ezmanan pêk tîne. ²² Wê Rojê gelek wê bêjine min: <Xudan! Xudan! Ê ne me bi navê te p'êxembertî kirin, bi navê te me cin derxistin û bi navê te gelek k'iryamet kirin?> ²³ Hingê ezê aşkere wanr'a bêjim: Min hûn qet nas nekirine <Ji min dûr k'evin, neheqno>!

MALA YÊ SERWAXT Û MALA YÊ BÊAQIL
(Lûqa 6:47-49)

²⁴ Awa k'î ku van gotinên min dibihê û li gora wan dike, ew mîna merivekî serwaxt e, ku mala xwe ser kêvir çê kir. ²⁵ Baran barî, ba û lêyî rabûn, wê malê xistin, lê ew mal hilneşîya, çimkî rikinê wê ser kêvir bû. ²⁶ Lê k'î ku van gotinên min dibihê û li gora wan nake, ew mîna merivekî bêaqil e, ku mala xwe ser qûmê çê kir. ²⁷ Baran barî, ba û lêyî rabûn, wê malê xistin û ew hilşîya, lap wêran bû çû».

²⁸ Gava Îsa gotinên xwe ser hevda anîn, k'omên merivan ser hînkirina wî zendegirtî man, ²⁹ çimkî wî mîna yekî xweyhikum ew hîn dikirin, lê ne mîna qanûnzanan wan.

ÎSA YEKÎ K'OTÎ PAQIJ DIKE
(Marqos 1:40-45; Lûqa 5:12-16)

8 ¹ Paşê Îsa ji ç'îyê dak'et, k'omên merivane giran dane pey wî çûn. ² Hingê yekî k'otî hat, deverû li ber wî xwe avêt û got: «Xudan! Heger bixazî, dikarî min paqij kî».

³ Îsa destê xwe dirêj kir lê k'et û got: «Ez dixazim. Paqij be!» Û *hema* cîda ew ji k'otîbûnê paqij bû. ⁴ Hingê Îsa wîr'a got: «Miqat be, t'u kesîr'a tişteki nebêjî, lê her'e xwe nîşanî k'ahîn ke û hedîya ku Mûsa t'emî daye bide, ku hemûyanr'a bibe şehdetî, ku tu paqij bûyî».

ÎSA XULAMÊ SERSEDEKÎ QENC DIKE
(Lûqa 7:1-10)

⁵ Gava Îsa k'ete Kefernahûmê, sersedek hate cem, hîvî ji wî kir û got: ⁶ «Xudan, xulamê min malda şilûşet p'aldayî k'ûr dinele». ⁷ Îsa gotê: «Ezê bê mî wî qenc bikim». ⁸ Sersed lê vegeand got: «Xudan, ez ne hêja me, ku tu bêyî mala min. Lê t'enê xeberekê bêje û xulamê min wê *bi wê xeberê* qenc be. ⁹ Ez xwexa jî merivekî bin hikumda me û bin destê minda jî esker hene. Ez yekîr'a dibêjim: <Her'e>, diçe, yê dinr'a dibêjim: <Were>, tê û xulamê xwer'a *dibêjim*: <Vî tiştî bike>, dike».

¹⁰ Gava Îsa ev yek bihîst, zendegirtî ma û ewên ku pey wî diçûn, wanr'a got: «Ez rast dibêjime we, Îsraêlêda jî bawerîke aha min nedîtye. ¹¹ Ez wer'a dibêjim, ku ji rohilatê û ji roavayê gelek wê bîn û şaya P'adşatîya Ezmananda t'evî Îbrahîm, Îshaq û Aqûb rûnên, ¹² lê lawên P'adşatîyê wê bêne avîtinê tarîya derva. Li wir wê bigirîn û diranan biç'irîkînin». ¹³ Paşê Îsa sersedr'a got: «Her'e! Bira li gora bawerîya te ter'a be». Û wê demê xulamê wî qenc bû.

ÎSA GELEK NEXAŞAN QENC DIKE
(Marqos 1:29-34; Lûqa 4:38-41)

¹⁴ Gava Îsa hate mala Petrûs, xwesîya wî germêda p'aldayî dît. ¹⁵ Îsa destê wê girt û germa wê danî, ew jî zû rabû wîr'a xizmetî kir. ¹⁶ Û gava bû berî êvar, gelek cinak'etî anîne cem wî. Ewî bi xeberê ruhên heram derxistin û

Metta 8,9

hemû nexaş qenc kirin, ¹⁷ ku ew gotina bi zarê Îşaya p'êxember bê sêrî: «Ewî nexaşîyên me hildan û êşên me birin».*

YÊN KU DIXAZIN PEY ÎSA HER'IN
(Lûqa 9:57-62)

¹⁸ Gava Îsa k'omên merivan dora xwe dîtin, ferman da şagirtan, ku her'ine wî berî golê. ¹⁹ Hingê qanûnzaneke nêzik bû û gote wî: «Dersdar! Tu k'uda jî her'î, ezê pey te bêm». ²⁰ Îsa gotê: «Bona rûvîyan k'or hene, teyredên ezmênr'a jî hêlîn, lê bona Kur'ê Meriv çik t'une, ku serê xwe lê dayne».

²¹ Yekî din, ku jî şagirtên wî bû gotê: «Xudan, destûrê bide min, ku ez her'im pêşda bavê xwe daynime gor'ê». ²² Lê Îsa gote wî: «Tu pey min were. Bira mirî mirîyê xwe bikine gor'ê».

BA Û GOL JÎ ÊLIMÎ ÎSA DIBIN
(Marqos 4:35-41; Lûqa 8:22-25)

²³ Gava Îsa k'ete qeyikê, şagirtên wî li wîr'a çûn. ²⁴ Nişkêva li golê bû firtone, usa ku qeyik pêlanda unda dibû. Lê ew razayî bû. ²⁵ Hingê şagirt nêzik bûnê, ew hişyar kirin û gotinê: «Xudan! Me rizgar bike! Em unda dibin!» ²⁶ Îsa gote wan: «Çima hûn usa tirsonek in, kêmbawerno»? Wê demê ew rabû li bayê û golê hilat û her tişt rihet bû. ²⁷ Merivên pêr'a ecêb man û gotin: «Ev çi meriv e, ku ba û gol jî elimî wî dibin?»

ÎSA DU CINAK'ETÎYAN AZAD DIKE
(Marqos 5:1-20; Lûqa 8:26-39)

²⁸ Gava Îsa derbazî wî alîyê cî-miskenê Gerdarînê bû, du cinak'etî rastî wî hatin, yê ku jî nav gor'istanê derk'etibûn. Ewana usa har bûn, ku t'u kes nikaribû wê rêr'a derbaz bûya. ²⁹ Wana kire qîr'în û got: «Tu çi jî me dixazî, Kur'ê Xwedê? Ji waxt zûtir hatî me bidî cizaretê»? ³⁰ Ji wan wêdatir kerîkî berazayî mezin diç'êrya. ³¹ Cinan reca jî wî dikir û digotinê: «Heger tu me derdixî, bihêle ku em her'in bik'evine nava kerê berazan». ³² Wî gote wan: «Her'in!» Ew jî derk'etin çûn k'etine nava berazan û t'emamiya wê kerîyê revî û jî jorda xwe jî kendêlda avîtine golê û xeniqîn. ³³ Berazvan revîn çûne bajêr, çi ku hatibû serê cinak'etîyan gotin. ³⁴ Hingê binelîyên bajêr hemû derk'etine pêşîya Îsa û gava ew dîtin, reca jê kirin, ku ew jî erdê wan her'e.

ÎSA GUNEHÊN YEKÎ ŞILÛŞET AFÛ DIKE Û WÎ QENC DIKE
(Marqos 2:1-12; Lûqa 5:17-26)

⁹ ¹ Îsa k'ete qeyikê paşda vegerya hate bajarê xwe. ² Li wir şilûşetek bi ber'ê wergirtî û p'aldayî anîne cem. Gava Îsa bawerîya wan dît, gote yê şilûşet: «Lawo, ser xwe be! Gunehên te hatine baxşandinê».

³ Lê jî qanûnzanan hinek nava xweda fikirîn: «Ev k'ifirî dike». ⁴ Îsa fikirên wan hesya got: «Çima hûn dilê xweda tiştên xirab difikirin? ⁵ K'îjan rihet tê gotinê: <Gunehên te hatine baxşandinê> yan <Rabe û biger'e>? ⁶ Lê ku hûn bizanibin, ku hikumê Kur'ê Meriv heye ku li ser dinyayê gunehan afû bike», hingê yê şilûşetr'a got: «Rabe ber'a xwe hilde, her'e mala xwe». ⁷ Ew jî rabû çû mala xwe. ⁸ Gava merivên hazir ev yek dîtin, tirs k'ete ser wan û şikirî dane Xwedê, ku ev hikum daye mêriv.

ÎSA GAZÎ METTA DIKE
(Marqos 2:13-17; Lûqa 5:27-32)

⁹ Îsa jî wir pêşda çû, yekî navê wî Metta li cîyê xerchildanêda rûniştî dît, gote wî: «Pey min were». Ew jî rabû pey Îsa çû. ¹⁰ Û gava Îsa mala Mettada ser sifrê rûniştîbû, gelek xercgir û gunehk'arên din hatin t'evî Îsa û şagirtên wî rûniştin. ¹¹ Fêrisîyan ku ev yek dît, gotine şagirtên wî: «Çima dersdarê we t'evî xercgir û gunehk'aran dixwe û vedixwe?»

¹² Lê gava Îsa ev yek bihîst, gote wan: «Yên silamet ne hewcê hekîm in, lê yê nexaş. ¹³ Her'in manîya van xeberan hîn bin: <Ez rehmê dixazim, ne ku qurbanê>.[†] Ez nehate, ku gazî yê rast kim, lê gazî gunehk'aran kim».

PIRSA ROJÎGIRTINÊ
(Marqos 2:18-22; Lûqa 5:33-39)

¹⁴ Hingê şagirtên Yûhenna hatine cem wî û gotin: «Çima em û fêrisî gelek caran rojî digirin, lê şagirtên te rojî nagirin»? ¹⁵ Îsa gote wan: «Qet dibe, ku xandîyên dewatê şînê bikin, heta ku zava wanr'a ye? Lê roj wê bîn, çaxê zava jî wan bê hildanê, hingê wê rojî bigirin.

¹⁶ T'u kes bi p'arçê nû k'inca kevn p'îne nake, çimkî p'arçê dirûtî wê zorê li k'inca kevn bike û cîyê qelişî wê hê xirab be. ¹⁷ Ne jî şeraba nû dikine meşkên kevn. Çaxê ku dagirin, hingê meşk wê bit'eqin, şerabê jî birije û meşk jî wê xirab bin. Lê şeraba nû dikine meşkên nû û her du jî têne xweykirinê».

* 8:17 Îşaya 53:4.

† 9:13 Hoseya 6:6.

Metta 9,10

QÎZIKA MIRÎ Û K'ULFETEKE NEXAŞ

(Marqos 5:21-43; Lûqa 8:40-56)

¹⁸ Gava Îsa hê eva yeka wanr'a digot, mîrek hat xwe avîte ber nigên wî û got: «Qîza min hema hêja mir, lê *tu* were destê xwe dayne ser wê û ewê bijî».

¹⁹ Îsa rabû şagirtên xweva t'evayî da pey wî çû. ²⁰ K'ulfeteke nexaş, ku donzdeh sal bûn ew ser xûnê vebibû, piştêva hat û serê p'êşa k'inca Îsa k'et. ²¹ Ewê dilê xweda digot: «Heger ez t'enê k'inca wî k'evim, ezê qenc bim».

²² Îsa ser milê xweva vegerya ew dît, gotê: «Evdê! Ser xwe be! Bawerîya te tu qenc kirî». Û wê demê ew k'ulfet qenc bû.

²³ Gava Îsa gihîşte mala mîr, nihêrî, wê xelq t'evîhev bûye û bilûrvan jî bi zelûlî bilûrê dixin, ²⁴ gote wan: «Derk'evin! Qîzik nemirye, lê hênijîye». Wana qerfê xwe wî dikirin. ²⁵ Lê gava cimet derxistine derva, Îsa çû hindur, destê wê girt û qîzik rabû ser p'îyan. ²⁶ Ev deng-bes belayî t'emamîya wî erdî bû.

QENCKIRINA DU KORAN Û YEKÎ LAL

²⁷ Gava Îsa ji wir derk'et çû, du merivên kor pey wî k'etin, kirine qîr'in û gotin: «Me were rehmê! Kur'ê Dawid!»

²⁸ Gava gihîştine malê, ew her du kor hatine cem. Îsa pirs da wan: «Hûn bawer dikin, ku ez dikarim alî we bikim»? Wan lê veqerand: «Belê Xudan». ²⁹ Hingê Îsa destê xwe da ç'evên wan û got: «Li gora bawerîya we wer'a be». ³⁰ Wê demê ç'evên wan vebûn. Îsa sert t'emî da wan û got: «Miqat bin, bira t'u kes vê yekê nizanibe».

³¹ Lê ewana derk'etin, li t'emamîya wî erdî nav û dengê wî bela kirin.

³² Gava yên qencbûyî derk'etin çûn, hinekan cinak'etîkî lal anî cem Îsa. ³³ Gava ewî cin derxist, yê lal xeber da. K'oma merivan zendegirtî man û gotin: «Li Îsraêlêda jî tişteki aha qet nebûye». ³⁴ Lê fêrisîyan digot: «Ew cinan bi hikumê mîrê cinan derdixe».

DILÊ ÎSA LI SER CIMETÊ DIŞEWITE

³⁵ Îsa her gund û bajarên digerr'ya, k'inîştên wanda hîn dikir, Mizgînîya P'adşatîyê dannasîn dikir û li nav cimetêda her cûr'e nexaşî qenc dikirin. ³⁶ Gava ewî k'oma merivan dît, dilê wî li ser wan şewtî, çimkî ew mîna pezên bêy şivan~ berdayî û belabûyî bûn. ³⁷ Hingê ewî şagirtên xwer'a got: «Nandirûn gelek e, lê k'arker hindik in. ³⁸ Awa hîvî ji xweyê dirûnê bikin, ku k'arkeran nandirûna xwer'a bişîne».

NAVÊN DONZDEH ŞANDÎYÊN ÎSA

(Marqos 3:13-19; Lûqa 6:12-16)

10 ¹ Îsa her donzdeh şagirt gazî cem xwe kirin û hikum da wan, ku ruhên heram derxin, hemû eş û nexaşîyan jî qenc bikin. ² Navê her donzdeh şandîyan ev in: Yê pêşin Şimhûn, ku jêr'a dibêjin Petrûs û birê wî Endraws, Aqûbê Zebedî û birê wî Yûhenna, ³ Filîpo û Bertolomeyo, Tûma û Mettayê xercgir, Aqûbê Halfawo û Tadayo*, ⁴ Şimhûnê Kenanî û Cihûdayê Îsxeryotî, yê ku nemamîya Îsa kir.

ŞANDINA HER DONZDEHAN

(Marqos 6:7-13; 13:9-13 Lûqa 9:1-6; 21:12-17)

⁵ Îsa ev her donzdeh şandin, t'emî da wan got: «Neçine nava hêtanosan û nek'evine bajarên Sameryayê. ⁶ Lê berê pêşda her'ine nava pezên mala Îsraêlêye undabûyî. ⁷ Çaxê hûn her'in, dannasîn kin bêjin: <P'adşatîya Ezmanan nêzîk bûye>. ⁸ Nexaşan qenc kin, mirîyan zêndî kin, k'otîyan paqij kin, cinan derxin. We bêy maş standye, bêy maş jî bidin. ⁹ Pişteka xweda t'u tiştî hilnedin~ ne zêr', ne zîv, ne sifir, ¹⁰ ne tûrik bona rê, ne du dest kiras, ne p'êlav, ne jî kewaz, çimkî k'arker hêjayî maşê xwe ye.

¹¹ Çi bajar yan gundê hûn her'inê, maleke hêja bibînin û li wir bimînin, heta ku hûn ji wir diçin. ¹² Çaxê hûn bik'evine malê, silavê bidin û bêjin: <Haştî vê malêr'a>. ¹³ Û heger ew mal hêja ye, bira silava we li ser wê be, lê heger ne hêja ye, bira silava we li we vegere. ¹⁴ Lê k'î we hilnede û guhdarîya xeberên we neke, çaxê hûn ji wê malê yan jî wî bajarî derdik'evin, t'oza nigên xwe dawşînin. ¹⁵ Ez rast dibêjime we, Roja axretê halê cimeta Sodom û Gomorayê wê ji ya wî bajarî çêtir be.

¹⁶ Awa ez we çawa pez dişînime nava guran. Îdî mîna me'ran serwaxt bin û mîna kewan dilsafî. ¹⁷ Hevza xwe ji merivan bikin, ewê we bibine ber dîwan û k'inîştên xwe, wê we bidine ber qamçîyan. ¹⁸ Bona min wê we bibine ber hizûra welî û p'adşan, ku hûn ber wan û hêtanosan şehdetîyê bidin. ¹⁹ Lê çaxê we bibine ber dîwanan, xem nekin, ku hûnê çawa yan çi xeber din. Tiştên ku hûnê xeber din, hingê wê wer'a bê dayîne. ²⁰ Çimkî ne ku hûnê xeber din, lê Ruhê Bavê weyî ku nava weda ye.

²¹ Bira wê birayê xwe bide kuştîne, bavê jî, kur'ê xwe û law jî wê rabine ber dê û bavên xwe û wan bidine kuştîne. ²² Bona navê min hûnê ber ç'evên hemûyan reş bin. Lê k'î ku heta xilazîyê sebir bike ewê rizgar be. ²³ Û çaxê nava vî bajarîda we bizêrînin, birevine bajarekî din. Ez rast dibêjime we, heta hatina Kur'ê Meriv, hûnê pêr'a negihînin hemû bajarên Îsraêlê biger'in.

²⁴ Şagirt ji dersdarê xwe ne mestir e û ne jî xulam ji axayê xwe. ²⁵ Besî şagirt e, ku mîna dersdarê xwe be û xulam jî mîna axayê xwe. Heger malxê malêr'a <Belzebûl> gotin, lê gelo neferên *mala* wîr'a wê hê zêde nebêjin?

* 10:3 Destnivîsarên hinekanda ev ji heye: «Lêwî, ku Tadayo hate bernavkirinê»

Metta 10,11

TIRS, ÎQRARKIRIN Û ÎNK'ARKIRIN

(Lûqa 12:2-9)

²⁶ Awa îdî ji merivan qet netirsîn. Ne tişteki dizîva heye, ku aşkere nebe û ne jî *tişteki* veşartî, ku derneyê. ²⁷ Çi ez wer'a tariyêda dibêjim, hûn wê nava ronayêda bêjin û çî ku hûn guhanda dibihên, ser banan bikine dengî. ²⁸ Û ji wan netirsîn yên ku bedenê dikujin, lê nikarin ruh bikujin. Lê hûn ji wî bitirsîn, yê dikare ruh û bedenê dojêda unda ke. ²⁹ Ê ne du ç'ivîk bi diraveki çarqurûşê tene firotanê? Lê ji wan yek jî bêy destûra Bavê we nak'eve erdê.

³⁰ Belê, her t'êlekî p'or'ê serê we jimartî ye. ³¹ Îdî netirsîn. Hûn ji gelek ç'ivîkan zêdetir in.

³² K'î ku min ber merivan îqrar bike, ezê jî wî ber Bavê xweyî ezmanan îqrar bikim. ³³ Lê k'î ku min ber merivan înk'ar bike, ezê jî wî ber Bavê xweyî ezmanan înk'ar bikim.

ŞÛR Û HAŞTÎ

(Lûqa 12:51-53; 14:26-27)

³⁴ Nefikirin, ku ez hatime haştîyê bînime dinyayê. Ez nehatim haştîyê bînim, lê şûr. ³⁵ Çimkî ez hatime ku kur' ji bavê, qîzê ji dê û bûkê ji xwesîyê cude bikim ³⁶ û dijminên mêriv wê ji mala wî bin.

³⁷ Yê ku bavê xwe yan dîya xwe ji min zeftir hiz bike, ew ne hêjayî min e. Yê ku kur'ê xwe yan qîza xwe ji min zeftir hiz bike, ew ne hêjayî min e. ³⁸ Yê ku xaçê xwe hîlnede pey min neyê, ew ne hêjayî min e. ³⁹ K'î kesa xwe *xwer'a* xweyî dike, ewê wê unda bike, lê k'î kesa xwe bona min unda bike, ewê wê bibîne.

MAŞSTANDIN

(Marqos 9:41)

⁴⁰ Yê we qebûl dike, ew min qebûl dike û ewê min qebûl dike, ew yê ez şandime qebûl dike. ⁴¹ Ewê ku p'êxember qebûl dike çawa p'êxember, wê maşê p'êxember bistîne û ewê ku meriveki rast qebûl dike çawa yekî rast, ewê maşê yê rast bistîne. ⁴² Û k'ê ku *hema* t'ase ava sar jî dide van biç'ûkan yekî, bona xatirê wê yekê ku ew şagirtê min e, ez rast dibêjime we, ewê maşê xwe t'u car unda neke».

PIRSA YÛHENNAÛ NIXAMDAR Û CABA ÎSA

(Lûqa 7:18-35)

11 ¹ Gava Îsa t'emîyên ku dane her donzdeh şagirtên xwe xilaz kirin, ji wir çû nava bajarên wan, ku hîn bike û dannasîn bike.

² Çaxê Yûhenna hebsêda bona k'arên Mesîh bihîst, çend şagirtên xwe şandine cem wî ³ û jê pirsîn: «Tu ew î, ku gerekê bihata yan em hîvîya yekî din bin?» ⁴ Îsa caba wan da û got: «Her'in, çî ku hûn dibînin û dibihên bêjine Yûhenna. ⁵ Kor dibînin, seqet diger'in, k'otî paqij dibin, ker' dibihên, mirî zêndî dibin û feqîran'a jî Mizgînî tê dayînê. ⁶ Û xwezî li wî, k'î ku mînda nak'eve şikê».

⁷ Gava ew çûn, Îsa bona Yûhenna destpê kir k'oma merivan'a got: «Hûn derk'etin ber'iyê çî binihêrin? Qamişekî ji bayê diheje? ⁸ Lê hûn derk'etin çî binihêrin? Meriveki k'incên nazik xwe kirî? Ê ne ewên ku k'incên nazik xwe dikin, rewşxanên p'adşanda ne? ⁹ Lê hûn derk'etin çî binihêrin? P'êxemberekî? Belê, ez dibêjime we, ji p'êxemberekî jî zêdetir. ¹⁰ Ev ew e, bona k'ê nivîsar e: <Va ye, ezê qasidê xwe pêşîya teva bişînim. Ewê pêşîya teva rîya te hazir bike>. ¹¹ Ez rast dibêjime we, ji nava ewên ji k'ulfetan bûne, t'u kes ji Yûhennayê nixamdar mestir

nebûye. Lê P'adşatîya Ezmananda yê herî biç'ûk ji wî mestir e. ¹² Ji rojên Yûhennayê nixamdarda heta niha P'adşatîya Ezmanan bi qewat tê zeftkirinê û yên *bawerîyêda* qewat dest davêjine wê. ¹³ Çimkî hemû p'êxemberan û Qanûnê heta Yûhenna bona P'adşatîya Ezmanan şehdetî dan. ¹⁴ Û heger hûn dixazin, vê gotinê hildin, ew Êlyas e, ku wê bihata.

¹⁵ Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê.

¹⁶ Niha ez vî nisilî bi çî bidime ber hev? Ew mîna wan zar'okan e, yên ku bazaranda rûniştî ne, gazî hevalên xwe dikin ¹⁷ dibêjin: <Me bona we zurnê xist, hûn nereqisîn û bona we beyt gotin, we şîn nekî>. ¹⁸ Yûhenna hat, ne dixwar, ne vedixwar, digotin: <Cin wîda heye>. ¹⁹ Kur'ê Meriv hat, dixwe û vedixwe, bona wî dibêjin: <Ew yekî pey xwarin û vexwarinê k'etî ye, hevalê xercgir û gunehk'aran e>. Lê serwaxtîyê bi lawên xwe da k'ifşê, ku ew rast e».

BAJARÊN NEBAWER

(Lûqa 10:13-15)

²⁰ Hingê Îsa destpê kir li wan bajarên hilat, k'îjananda gelek k'iryametên wî hatibûne kirinê, çimkî ew ji gunehkirinê venegeryan. ²¹ «Wey li te Xorazîn! Wey li te Beytsayda! Heger ew k'iryametên ku nava weda bûn, Sûr û Saydêda bibûna, ewana wê zûva bi k'urx û k'ozîyê *ji xirabîyê* vegeryana. ²² Lê ez wer'a dibêjim, Roja Axretê halê Sûrê û Saydê wê ji halê we hêsatir be. ²³ Û tu Kefernahûm, te t'irê tuê heta ezman bilind bî? Na! Tuê heta dojê† her'î xwarê! Ew k'iryametên ku nav teda bûn, heger Sodomêda bibûna, ewê heta roja îroyîn bima. ²⁴ Lê ez wer'a dibêjim, Roja Axretê halê *cimeta* erdê Sodomê wê ji halê te çêtir be».

* 11:10 Malaxî 3:1.

† 11:23 Ceninê.

Metta 11,12

BI DESTÊ K'Ê XWEDÊ NAS BIKIN
(Lûqa 10:21-22)

²⁵ Hingê Îsa got: «Şikir navê te be Bavo, Xudanê erd û ezman, ku ev tişt te ji serwaxt û zaneyan veşartin û li ber zar'okan vekirin. ²⁶ Belê Bavo, çimkî aha li te xaş hat.

²⁷ Her tişt ji Bavê min minr'a hatye dayînê. T'u kes Kur' nas nake pêştirî Bavê û t'u kes Bavê nas nake pêştirî Kur' û ewana wê nas bikin, k'îjananr'a Kur' bixaze Bavê bide naskirinê.

²⁸ Werine cem min, hemûyên westîyayî û bargiran û ezê rihetîyê bidime we. ²⁹ Bi t'evî min bik'evine bin nîrekî* û ji min hîn bin, ku milûk im û dilda nek'ubar û hûnê rihetîyê ruhê xwer'a bibînin. ³⁰ Çimkî nîrê min şîrin e, barê min sivik».

ROJA ŞEMÎYÊ Û MERIVÊ DESTK'IŞYAYÎ
(Marqos 2:23-3:6; Lûqa 6:1-11)

12 ¹ Hingê Îsa rojê şemîyê nava zevîyanr'a derbaz dibû, şagirtên wî birçî bûn û destpê kirin simbilên genim çinîn û xwarin. ² Gava fêrisîyan ev yek dît, gotine wî: «Hela binihêre, şagirtên te roja şemîyê tiştê necayîz dikin».

³ Îsa wanr'a got: «We nexandye, ku Dawid çi kir, gava ew û yên pêr'a birçî bûn? ⁴ Ew k'ete Xana Xwedê û nanê Xwedêr'a dayî xwar, lê ew nan ne wîr'a cayîz bû, ku bixwara, ne jî wanr'a, yên ku t'evî wî bûn, lê t'enê k'ahînanr'a. ⁵ Yan jî we Qanûnêda nexandye, ku roja şemîyê k'ahîn p'aristxanêda şemîyê diherimînîn û dîsa bêşûc in? ⁶ Lê ez wer'a dibêjim, ku li vir yekî ji p'aristxanê mestir heye. ⁷ Heger we fikira vê xeberê bizanibûya çi ye, ku tê gotinê: «Ez rehmê dixazim, ne ku qurbanê»,[†] hingê weyê yên bêşûc gunehk'ar nekirana. ⁸ Çimkî Kur'ê Meriv Xudanê roja şemîyê ye jî».

⁹ Îsa jî wir rabû çû û hate k'înîştan wan. ¹⁰ Merivek li wir hebû, ku destê wî k'îşyabû. Hinekên ku dixastin xeyba Îsa bikirana ji wî pirsîn: «Gelo cayîz e, ku roja şemîyê nexaşan qenc bikin?»

¹¹ Wî jî gote wan: «Ji we k'î ye, ku pezeke wî hebe û roja şemîyê bik'eve k'orê, wê negire û dernexe? ¹² Lê meriv çiqas jî pêz zêdetir e! Awa roja şemîyê qencîkirin cayîz e». ¹³ Hingê Îsa gote wî merivî: «Destê xwe dirêj ke». Ew jî dirêj kir û mîna destê din qenc bû. ¹⁴ Lê fêrisî derk'etine derva, bona Îsa li hev şêwîrîn, ku çawa wî bidine kuştinê.

XULAMÊ XWEDÊ Û GUMANA HER MILETAN

¹⁵ Çaxê Îsa wê yekê hesya, ji wir çû, gelek k'omên merivan pey wî çûn. Ewî hemû jî qenc kirin ¹⁶ û t'emî da wan, ku bona wî nekine dengî, ¹⁷ ku ew gotina bi zarê Îşaya p'êxember bê sêrî: ¹⁸ «Va ye xulamê min, yê ku min ew hilbijartye û hizkirîyê min, ku min ew begem kirye. Ezê Ruhê xwe daynime ser wî û ewê miletanr'a heqîyê bike dengî. ¹⁹ Ewê ne bik'eve hucetê, ne bike qar'eqar' û ne jî yekê dengê wî meydananda bibihê. ²⁰ Ew qamîşê hincirî hûr nake, p'ilta diç'irûse vênasîne, heta ku heqîyê bigihîne sêrî. ²¹ Û her milet wê gumana xwe bidine ser navê wî».[‡]

BÊT'İFAQÎ MAL Û P'ADŞATÎYAN WÊRAN DIKE
(Marqos 3:20-30; Lûqa 11:14-23; 12:10)

²² Hingê cinak'etîkî kor û lal anîne cem Îsa û ewî ew qenc kir, usa ku ewî him dît, him jî xeber da. ²³ Û k'oma merivan hemû zendegirtî man û gotin: «Gelo ev e kur'ê Dawid?»

²⁴ Lê gava fêrisîyan bihîst gotin: «Eva cinan bi hikumê Belzebûlê mîrê cinan derdixe». ²⁵ Lê Îsa fikirên wan hesya gote wan: «Her p'adşatîya ku nava wêda bêt'ifaqî hebe, wê wêran be û her bajar yan mala ku li nava wêda bêt'ifaqî hebe, ew namîne. ²⁶ Heger Şeytan xwexa xwe derdixe, usa dertê, ku nava p'adşatîya wêda bêt'ifaqî heye, îdî p'adşatîya wî wê çawa bimîne? ²⁷ Heger ez bi hikumê Belzebûl cinan derdixim, lê peyçuyên we bi çi derdixin? Lema ewê bibine hakimên we. ²⁸ Lê heger ez bi hikumê Ruhê Xwedê cinan derdixim, îdî P'adşatîya Xwedê gihîştîye heta cem we. ²⁹ Yan çawa yek dikare bik'eve mala yekî qewat û hebûka wî t'alan bike, heger berê pêşda ewî qewat girênde? Çaxê girêde, hingê wê bikaribe mala wî t'alan bike.

³⁰ K'î ku ne t'evî min e, miqabilî min e û k'î ku t'evî min t'op nake, ew bela dike. ³¹ Bona vê yekê ez wer'a dibêjim, her guneh û k'ifirî wê li merivan bêne baxşandinê, lê ewê ku k'ifirîyan Ruh bike, li wî nayê baxşandinê. ³² K'î tiştêkî miqabilî Kur'ê Meriv bêje, wê li wî bê baxşandinê, lê heger yek hindava Ruhê Pîrozda bêje, li wî nayê baxşandinê, ne li vê dinyayê, ne jî dinê axretê.

BERÊ HER DAREKÊ MÎNA WÊ YE
(Lûqa 6:43-45)

³³ Heger dar qenc e, berê wê jî qenc e, heger dar xirab e, berê wê jî xirab e, çimkî dar ji berê xwe tê naskirinê. ³⁴ Ç'êjikên meran! Çawa hûn dikarin qenc xeber din, heger hûn xirab in? çimkî çi ku dilda heye zar jî wê dibêje. ³⁵ Merivê qenc ji xezna xweye qenc qencîyê derdixe, lê merivê xirab ji xezna xweye xirab xirabîyê derdixe. ³⁶ Ez wer'a dibêjim, Roja Axretê meriv bona her xebereke p'ûç, ku xeber didin, wê cabdar bin. ³⁷ Çimkî hûnê bi xeberên xwe bêşûc derên û bi xeberên xwe gunehk'ar derên».

* 11:29,30 Bi yûnanî xeber bi xeber aha nivîsar e: «Nîrê min hildine ser xwe».

† 12:7 Hoseya 6:6.

‡ 12:21 Îşaya 42:1-4.

Metta 12,13

K'IRYAMETEK JI ÎSA TÊ XASTINÊ
(Lûqa 11:29-32)

³⁸ Hingê ji qanûnzana û fêrisîyan hinekan wîr'a got: «Dersdar! Em dixazin ji *destê* te nîşanekê bibînin». ³⁹ Ewî li wan vegeand got: «Nisilê xirab û xalifî nîşanekê dixaze, lê wîr'a nîşanekê din nayê dayînê, pêştirî nîşana Ênis p'êxember. ⁴⁰ Çawa ku Ênis sê roj û sê şevan zikê hûtda ma, Kur'ê Meriv jî wê usa sê roj û sê şevan li dilê erdêda bimîne. ⁴¹ Merivên Nînewê wê Roja Axretê rabin û dîwana vî nisilê bikin, çimkî ewana bi dannasîna Ênis ji gunehkirinê vegeryan û va ye yekî ji Ênis mestir li vir heye. ⁴² Xanimp'adşa Başûrê Roja Axretê wê rabe û vî nisilê neheq bike, çimkî ew jî serê dinyayê hat, ku serwaxtîya Silêman bibihê û va ye yekî ji Silêman mestir li vir heye.

PAŞDA HATINA RUHÊ HERAM
(Lûqa 11:24-26)

⁴³ Çaxê ruhê heram ji mêriv dertê, li cîyê bêy av digêr'e, ku rihetîyê bibîne. Lê gava nabîne, ⁴⁴ hingê dibêje: «Ez vegerime mala xwe, jî k'u derk'etime». Çaxê tê, dibîne mal vala, paqijkirî û hevdayî ye. ⁴⁵ Hingê diçe heft cinên mayîne ji xwe xirabtir jî tîne, dik'evine wir dimînin. Û axirîya wî merivî ji pêşîyê xirabtir dibe. Usa jî wê bê serê vî nisilê xirab».

DÊ Û BIRAYÊN ÎSA
(Marqos 3:31-35; Lûqa 8:19-21)

⁴⁶ Hê wî k'oma merivanr'a xeber dida, dê û birayên wî derva sekinîn, dixastin wîr'a xeber bidin. ⁴⁷ Yekî jêr'a got: «Dîya te û birayên te derva sekinî ne û dixazin ter'a xeber din». ⁴⁸ Ewî jî li wî vegeand got: «K'î ye dîya min û k'î ne birayên min»? ⁴⁹ Hingê bi destê *xwe* şagirtên xwe nîşan da û got: «Awa, dê û birayên min! ⁵⁰ Çimkî k'î ku daxaza Bavê minî ezmanan bîne sêrî, ew e birayê min, xûşka min û dîya min».

MESELA T'OXIMREŞ Û ŞIROVEKIRINA WÊ
(Marqos 4:1-20; Lûqa 8:4-15)

13 ¹ Wê rojê Îsa ji malê derk'et, li devê golê rûnişt. ² Û haqas k'oma merivan hate cem wî, ku ew k'erba k'ete qeyikê rûnişt û t'emamîya k'oma merivan devê golê sekinî. ³ Ewî gelek tişt bi meselan ew hîn kirin û got: «T'oximreş rabû çû, ku t'oxim biçîne. ⁴ Gava wî direşand, ji wan hinek k'etine devê rê, teyrede hatin û ew xwarin. ⁵ Hinekên din k'etine ser cîyê kevirî, li k'u xweli kêm bû. Ew zû şîn bûn, çimkî xweli ne k'ûr bû. ⁶ Lê gava te'v derk'et, ew qimilîn û çimkî rawên wan t'onebûn, hişk bûn. ⁷ Hinekên din k'etine nava stirîyan, stirî rabûn û ew xeniqandin. ⁸ Lê hinekên din jî k'etine nava erdê qenc û ber dan, yê sed *bare*, yê şêst û yê jî sî. ⁹ Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê!»

¹⁰ Hingê şagirtên wî nêzik bûnê û gotinê: «Çima bi meselan wanr'a xeber didî»? ¹¹ Wî li wan vegeand got: «Wer'a hatye dayînê, ku sur'ên P'adşatîya Ezmanan hûn bizanibin, lê wanr'a nehatye dayînê. ¹² Çimkî k'êr'a ku heye, wê jêr'a hê bê dayînê û zêde be û k'êr'a ku t'une, çi heye jî wê jê bê standinê. ¹³ Ez bona wê bi meselan wanr'a xeber didim, ku ewana dinihêrin û nabînin, dibihên, lê guhê xwe nadinê û fem nakin. ¹⁴ Ser wan p'êxembertîya Îşaya tê sêrî, ku dibêje: <Hûnê bi guhan bibihên, lê fem nekin, bi ç'evan binihêrin, lê nebînin. ¹⁵ Çimkî eva cimeta serhişk e, bi guhan giran dibihên û ç'evên xwe girtine, ku bi ç'evan nebînin, bi guhan nebihên û bi hiş fem nekin, venegerin, ku ez wan qenc bikim>.* ¹⁶ Lê xwezî ç'evên we, ku dibînin û guhên we, ku dibihên. ¹⁷ Ez rast dibêjime we, gelek p'êxember û merivên rast hizreta dîtina van tiştan bûn, çi ku hûn dibînin, lê nedîtin û ew *tişt* bibihîstana, çi ku hûn dibihên, lê nebihîstin. ¹⁸ Niha hûn şirovekirina mesela t'oximreş bibihên. ¹⁹ Her merivê ku xebera P'adşatîyê dibihê û fem nake, yê Xirab tê û ji dilê wî *xebera* çandî direvîne. Evana ew in, ku *dilê wan mîna xweliya* devê rê ye, ku lê hate çandinê. ²⁰ *Merivên mîna* cîyê kevirî, ku lê hate çandinê, ew in, ku çaxê xeberê dibihên, zû bi *dilê* şa hildidin. ²¹ Lê ku rawê *xeberê* nava wanda t'une, dirêj t'ab nakin. Çaxê bona xeberê rastî tengasîyan yan zêrandinê tèn, zû ji rê dik'evin. ²² *Yên mîna* erdê stirî jî, ku lê hate çandinê, ew in, yên ku xeberê dibihên, lê xemên vê dinyayê û xapandina dewlemendîyê xeberê dixeniqînin û ew bêy ber dimînin. ²³ Lê *merivên mîna* erdê qenc, ku lê hate çandinê ew in, ku xeberê dibihên, fem dikin û ber didin, yê sed *bare*, yê şêst û yê jî sî».

MESELA GENIM Û ZÎWANÊ

²⁴ Îsa meseleke din jî wanr'a got: «P'adşatîya Ezmanan mîna vê yekê ye: Merivekî nava erdê xweda t'oximê qenc çand. ²⁵ Çaxê meriv razayî bûn, dijminê wî hat û li nav genimda zîwan jî çand û çû. ²⁶ Çaxê genim gihîşt berê xwe da, hingê zîwan jî pêr'a k'ifş bûn. ²⁷ Xulamên xweyê erdê nêzikî wî bûn û gotinê: <Axayê *me!* Te nava erdê xweda t'oximê qenc neçand? Lê ev zîwan ji k'u hatin>? ²⁸ Ewî li wan vegeand got: <Dijminekî ev tişt kirye>. Xulamên jî gotinê: <Niha tu dixazî, ku em her'in wan derxin>? ²⁹ Ewî got: <Na, nebe gava hûn zîwanê derxin, genim jî pêr'a derê. ³⁰ Bihêlin bira her du jî hevr'a bigihîjin heta roja nandirûnê. Roja nandirûnê ezê k'arkeranr'a bêjim, berê pêşda zîwanê bidirûn, gurz-gurz girêdin bona şewatê, lê gênim bikine embara min>».

* 13:15 Îşaya 6:9,10.

Metta 13,14

MESELÊN T'OXIMÊ XERDALÊ Û HEVÎRTIRŞKÊ
(Marqos 4:30-34; Lûqa 13:18-21)

³¹ Meseleke din jî wanr'a got: «P'adşatîya Ezmanan mîna vê *yekê* ye: Merivekî libeke t'oximê xerdalê hilda, erdê xweda çand. ³² Ew ji hemû t'oximan hûrtir e, lê çaxê digihîje, ji hemû p'incar'an mestir dibe û dibe dar, usa ku teyredên ezmên tèn hêlînên xwe ser çiqilên wê çê dikin».

³³ Îsa meselek jî gote wan: «P'adşatîya Ezmanan mîna hevîrtirşk e, ku k'ulfetekê hilda nava sê kod arda stira, heta ku hemû hilat».

³⁴ Îsa ev her tişt bi meselan k'oma merivanr'a gotin û bêy mesele t'u tişt wanr'a nedigot, ³⁵ ku ew gotina bi zarê p'êxember bê sêrî: «Ezê bi meselan wanr'a xeber dim û tiştên ji dema efirandina dinyayêda veşartî bêjim».*

ŞIROVEKIRINA MESELA GENIM Û ZÎWANÊ

³⁶ Hingê Îsa k'oma merivan hişt, hate mal. Şagirtên wî hatine cem û gotinê: «Mesela gênim û zîwanê mer'a şiroveke». ³⁷ Ewî li wan vegerand got: «Ewê ku t'oximê qenc çand, Kur'ê Meriv e. ³⁸ Erd dinya ye, t'oximê qenc lawên P'adşatîyê ne, lê zîwan lawên yê Xirab in. ³⁹ Dijminê ku ew çandin, Şeytan e. Nandirûn axirîya dinyayê ye, k'arker jî milyak'et in. ⁴⁰ Û çawa ku zîwanê t'op dikin dişewtînin, axirîya vê dinyayê jî wê usa be. ⁴¹ Kur'ê Meriv wê milyak'etên xwe bişîne û ewê ji P'adşatîya wî hemûyên ku merivan ji rê derdixin û neheqîyê dikin t'op kin ⁴² û bavêjine k'ûra agir. Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka diranan. ⁴³ Hingê merivên rast wê P'adşatîya Bavê xweda mîna te'vê şewq bidin. Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê!

MESELÊN XEZNA VEŞARTÎ, DUR'Ê BAHA Û T'OR'A AVÎTÎ

⁴⁴ P'adşatîya Ezmanan mîna vê *yekê* ye: Erdekîda xezneke veşartî hebû. Merivek wê dibîne, *dîsa* vedişêre, ji şabûna diçe hemû hebûka xwe difiroşe û wî erdî dik'ir'e.

⁴⁵ Dîsa P'adşatîya Ezmanan mîna vê *yekê* ye: Merivekî bazirgan dur'ên rind diger'e. ⁴⁶ Çaxê dur'ekî qîmetgiran dibîne, diçe hemû hebûka xwe difiroşe û wî dur'î dik'ir'e.

⁴⁷ Dîsa P'adşatîya Ezmanan mîna vê *yekê* ye: T'or'ek tê avîtinê nava be'rê û her cûr'e mesî dik'evinê. ⁴⁸ Çaxê t'or' t'ije dibe, dik'işînine der û rûdinên mesîyên baş t'op dikin dikine derdanan, lê yên bêkêr wêda davêjin. ⁴⁹ Axirîya dinyayê jî wê usa be. Milyak'et wê derk'evin xiraban ji nava qencan cude kin ⁵⁰ û bavêjine k'ûra agir. Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka diranan».

RASTÎYÊN KEVN Û NÛ

⁵¹ Îsa pirs da wan: «We ev her tişt fem kirin»? Wana jî gote wî: «Belê Xudan». ⁵² Ewî jî gote wan: «Bona vê *yekê* her qanûnzaneke ku li ser P'adşatîya Ezmanan hîn bûye, mîna merivekî xweymilk' e, ku ji xezna xwe tiştên kevn û nû derdixe».

BAJARÊ KU ÎSA WIR MEZIN BIBÛ WÎ QEBÛL NAKE (Marqos 6:1-6; Lûqa 4:16-30)

⁵³ Gava Îsa ev mesele xilaz kirin, ji wir çû ⁵⁴ û hate cî-miskenê xwe û k'inîşt wanda ew hîn dikirin. Ewana jî zendegirtî diman û digotin: «Ev serwaxî û qewata k'iryametn ji k'u gihîştinê? ⁵⁵ Ê ne ev kur'ê necar e? Ê ne navê dîya wî Meryem e? Ê ne birayên wî Aqûb, Ûsiv, Şimhûn, Cihûda û ⁵⁶ her xûşkên wî cem me ne? Ev her tişt ji k'u gihîştine wî?»

⁵⁷ Û aha ewana ji wî k'ûvî bûn, lê Îsa gote wan: «P'êxember t'u deran ne bêhurmet e, lê t'enê mal û cî-miskenê xweda». ⁵⁸ Ewî li wê derê gelek k'iryamet nekirin, çimkî bawerîya wan t'unekû.

KUŞTINA YÛHENNAYÊ NIXAMDAR (Marqos 6:14-29; Lûqa 9:7-9)

14 ¹ Hingê Hêrodesê çaran, ku serokê Celîlê bû bona Îsa bihîst, ² xulamên xwer'a got: «Eva Yûhennayê nixamdar e, ji nava mirîyan zêndî bûye. Lema jî bi *destê* wî k'iryamet tene kirinê».

³ Hêrodes xwexa Yûhenna girtibû bend kiribû avîtibû hebsê, rûyê Hêrodîya jina Filîpoyê birê xweda. ⁴ Çimkî Yûhenna Hêrodesr'a gotibû: «Ne rast e, tu wê bistînî». ⁵ Lema Hêrodes dixast ew bikuşt, lê ji cimetê ditirsya, çimkî cimetê Yûhenna çawa p'êxember qebûl dikir.

⁶ Çaxê roja jidêbûyîna Hêrodes hat, şayîyêda qîza Hêrodîyayê li ber wan reqîsî û li dilê Hêrodes gelekî xaş hat. ⁷ Ewî sond xwar û gote qîzîkê, ku ew çî bixaze wê bide wê. ⁸ Qîzîkê jî, ku ji dê hatibû şîretkirinê, got: «K'a li vir, li ser sinîyê, serê Yûhennayê nixamdar bide min». ⁹ P'adşa ber xwe k'et, lê çimkî li ber t'eglîfkişîyan sond xwaribû, ferman da, ku xastina wê bê dayîne. ¹⁰ Ewî şand hebsêda serê Yûhenna da lêxistinê ¹¹ û serê wî li ser sinîyê anîn dane qîzîkê. Qîzîkê jî dîya xwer'a bir. ¹² Hingê şagirtên wî hatin cinyazê wî hildan û ew kirine gor'ê. Paşê çûn Îsar'a gotin.

* 13:35 Zebûr 78:2.

Metta 14,15

ÎSA PËNC HEZAR MERIVAN T'ËR DIKE
(Marqos 6:30-44; Lûqa 9:10-17; Yûhenna 6:1-14)

¹³ Gava Îsa eva yeka bihîst, ji wir bi qeyikê t'enê çû cîkî xewle. Lê gava k'oma merivan bihîst, ji bajaran pey wî peya çûn. ¹⁴ Gava Îsa ji qeyikê derk'et û k'omeke merivane giran dît, hingê dilê wî li ser wan şewtî û nexaşên wan qenc kirin.

¹⁵ Berî êvarê şagirtên wî hatine cem û gotinê: «Ev der cîkî xikî-xwelî ye û îdî dereng e. Îzina vê k'oma merivan bide, ku her'ine gundan xwer'a xurek bik'ir'in». ¹⁶ Lê Îsa wan'r'a got: «Ne hewce ye, ku ew her'in. Hûn xurekê bidine wan». ¹⁷ Wana lê vegerand got: «Li vir pêştirî pênc nan û du mesîyan tişteki meyî din t'une». ¹⁸ Ewî gote wan: «Wan bînine cem min». ¹⁹ Îsa ferman da, ku k'oma merivan li ser şinayîyê rûnên. Ewî her pênc nan û her du mesî hildan, berê xwe ezmênda kir, şikirî da û ew nan ker kirin. Paşê da şagirtan, wana jî da k'oma merivan. ²⁰ Hemûyan jî xwarin t'êr bûn û ji hûrikên bermayî jî donzdeh sele t'ijî nan dane hev. ²¹ Ewên ku xwarin, pêştirî jin û zar'okan, ku qasî pênc hezar mêran bûn.

ÎSA SER AVÊR'A PEYA DIÇE
(Marqos 6:45-52; Yûhenna 6:16-21)

²² Îsa zû p'êyî ser şagirtan kir, ku bik'evine qeyikê û berî wî derbazî wî alîyê golê bin, heta ku xwexa k'oma merivan verêke. ²³ Gava wî k'oma merivan verêkir, t'enê rabû ser ç'iyê, ku dua bike. Gava bû berî êvar, ew li wir t'enê bû, ²⁴ lê qeyik îdî ji devê golê dûr k'etibû û nava pêlanda bû, çimkî ba miqabilî wê bû.

²⁵ Qereberbangê Îsa li ser golê'r'a peya diçû nêzîkî wan dibû. ²⁶ Lê gava şagirtan dît, ku ew ser golê'r'a peya dihat, ziravqetî bûn û gotine hev: «Ev xeyal e!» Û wana ji tirsî kire qîr'in. ²⁷ Lê Îsa wê demê deng da wan û got: «Ser xwe bin! Ez im! Netirsin!» ²⁸ Petrûs lê vegerand got: «Xudan, heger tu yî, ferman bide, ku ez ser avê'r'a bême cem te».

²⁹ Îsa got: «Were!» Petrûs ji qeyikê peya bû, ser avê'r'a çû, ku her'e cem Îsa. ³⁰ Lê gava ewî bayê qayîm dît tirsya û îdî wê niqo bûya, qîr'ya got: «Xudan, min rizgar ke!» ³¹ Wê demê Îsa destê xwe dirêjî wî kir, ew girt û jê'r'a got: «Kêmbawero! Çima tu dudilî bûyî?» ³² Gava k'etine qeyikê, ba seqirî. ³³ Û ewên qeyikêda ew hebandin û gotinê: «Bi rastî jî tu Kur'ê Xwedê yî».

ÎSA CÊNÎSARTÊDA NEXAŞAN QENC DIKE
(Marqos 6:53-56)

³⁴ Gava ew derbazî wî berî golê bûn, li alîyê Cênîsartêva gihîştine bejê. ³⁵ Bineliyên wê derê ew nas kirin, şandin t'emamiya der-doran, hemû nexaş anîne cem wî. ³⁶ Wan hîvî jê dikir, ku hema serê p'êşa k'inca wî k'evin. Û hemûyên ku lê dik'etin ji nexaşiyên xwe qenc dibûn.

RÊ-RIZMÊ KALEBAVAN Û XEBERA XWEDÊ
(Marqos 7:1-13)

15 ¹ Hingê fêrisî û qanûnzânên Orşelîmê hatine cem Îsa û gotin: ² «Çima şagirtên te pey rê-rizmê kal-bavan naçin? Destneşûstî nan dixwin».

³ Wî li wan vegerand, got: «Lê hûn çima rûyê rê-rizmê xweda t'emiyên Xwedê didine alîkî? ⁴ Çimkî Xwedê got: <Dê û bavê xwer'a hurmetê bike>* û <Ewê ku nifir li dê û bavê xwe bike, gerekê bê kuştinê>.[†] ⁵⁻⁶ Lê hûn dibêjin: <Ew *meriv* ji wê hurmetdayîna dê û bavê xwe aza ye, yê ku dê yan bavê xwer'a bêje: „Ew alîk'arîya ku gerekê te ji min bîstana ew *Xwedê'r'a* p'êşkêş tê dayîne»>. Awa hûn bona xweykirina rê-rizmê xwe xebra Xwedê p'êpes dikin. ⁷ Durûno! Îşaya li ser we *hema* qenc p'êxembertî kirye û gotye: ⁸ <Eva cimeta bi zarê xwe hurmeta min digire, lê dilê wan ji min dûr e. ⁹ Badîhewa min'r'a xizmetiyê dikin, t'emiyên merivan çawa qanûnên min cimete hîn dikin>>.[‡]

TIŞTÊN KU MERIV PÊ DIHERIMIN
(Marqos 7:14-23)

¹⁰ Hingê Îsa gazî k'oma merivan li cem xwe kir û gote wan: «Bibihên û fem bikin! ¹¹ Ne ku tiştê diçe dêv merivan diherimîne, lê çi ku ji dêv dertê, ew merivan diherimîne».

¹² Hingê şagirtên wî hatin û gotinê: «Tu dizanî? Gava fêrisîyan eva xebra bihîst, dilê wan ji te ma» ¹³ Ewî li wan vegerand got: «Her dara ku Bavê minî ezmanan nedaçikand ye, wê ji k'okêva bê rakirinê. ¹⁴ Ji wana vegerin! Ewana kor in û rêberên koran in. Heger kor rêberiyê yê kor bike, her du jî wê bik'evine k'orê». ¹⁵ Petrûs lê vegerand got: «Vê meselê mer'a şiroveke».

¹⁶ Îsa got: «Çima hûn jî femkor in? ¹⁷ Hê fem nakin, ku çi diçe dêv, derbazî hinavê *meriv* dibe û diçe der? ¹⁸ Lê ew tiştên ku ji dêv dertên, ew ji dil dertên û hema ev in, ku mêriv diherimînin. ¹⁹ Çimkî ji dil fikirên xirab dertên~kuştin, zinêk'arî, qavî, dizî, derew, buxdan. ²⁰ Ev tişt merivan diherimînin, lê destneşûstî nanxwarin merivan naherimîne».

* 15:4 Derk'etin 20:12; Qanûna Ducarî 5:16.

† 15:4 Derk'etin 21:17.

‡ 15:9 Îşaya 29:13.

Metta 15,16

BAWERIYA K'ULFETA KENANI
(Marqos 7:24-30)

²¹ Îsa rabû ji wê derê çû alîyê Sûr û Saydê. ²² Û k'ulfeteke kenanî, ku ji wê derê bû hat, kire gazî û gotê: «Xudan, Kur'ê Dawid, min were rehmê. Qîza min cina dik'êve, gelekî diçerçire». ²³ Lê wî caba wê neda. Şagirtên wî nêzikî wî bûn hîvî jê kirin û gotin: «Tişteki bêje vê, ku dûrî me k'êve, çimkî pey me tê û dike qar'eqar'». ²⁴ Ewî cab da û got: «Ez hatime şandinê, ku t'enê nava pezên mala Îsraêlêye undabûyîda bim». ²⁵ Lê ewa k'ulfeta hat xwe avîte nigê wî û got: «Xudan, alî min bike»!

²⁶ Ewî li wê vegerand, got: «Ne baş e, ku nan ji ber zar'okan hildin û bavêjine ber san». ²⁷ Ewê jî got: «Belê Xudan, ne se jî ji wan hûrikên bermayî dixwin, çî ku ji sifra zar'okan dimîne». ²⁸ Hingê Îsa lê vegerand got: «Evdê, bawerîya te mezin e. Bira anegorî xastina dilê te ter'a be». Hema ji wê demêda qîza wê qenc bû.

QENCKIRINA GELEKAN

²⁹ Îsa ji wir çû ber gola Celîlê, rabû ser ç'îyê rûnişt. ³⁰ K'omeke merivane giran hate cem, ku xwer'a gelek seqet, kor, lal, şilûşet û nexaşên mayîn anîbûn û avîtine ber p'îyên Îsa. Ewî jî ew qenc kirin. ³¹ Gava k'oma merivan dît, ku yên lal xeber dan, şilûşet qenc bûn, seqet ger'yan û ç'evên koran vebûn, zendegirtî man û pesinê navê Xwedê Îsraêlê dan.

ÎSA ÇAR HEZARAN T'ÊR DIKE
(Marqos 8:1-10)

³² Îsa gazî şagirtên xwe kir û got: «Dilê min ser vê k'oma merivan dişewite. Sê rojê wan e, ku t'evî min in û tişteki wanî xwarinê t'une. Ez naxazim wana birçî verêkim, ku rêva dilê wan xweva neçe».

³³ Şagirtên wî wîr'a gotin: «Li vê ber'îyêda emê ji k'u haqas nan bînin, ku vê k'oma merivane giran t'êr kin»? ³⁴ Îsa gote wan: «Çend nanên we hene»? Wana got: «Heft nan û çend mesîyên hûr».

³⁵ Îsa ferman da, ku k'oma merivan ser erdê rûnê. ³⁶ Ewî her heft nan û ew mesî hildan şikirî da û ker kirin. Paşê dane şagirtan, şagirtan jî dane k'oma merivan. ³⁷ Hemûyan jî t'êr xwarin û ji hûrikên bermayî jî heft zembîl t'îjî nan dane hev. ³⁸ Ewên ku xwarin, pêştirî jin û zar'okan, qasî çar hezar mêran bûn. ³⁹ Paşê ewî k'oma merivan verêkir, k'ete qeyikekê û hate sînorê Megedanê.

HEVÎRTIRŞKÊ FÊRISÎ Û SADÛQÎYAN
(Marqos 8:11-21)

16 ¹ Fêrisî û sadûqî hatine cem Îsa, ku wî bicêribînin û jê xastin, ku ew nîşanekê ji ezmanan nîşanî wan bike. ² Ewî li wan vegerand got: «Çaxê dibe êvar hûn dibêjin: <Hewa wê xaş be, çimkî ezman sor bûye>. ³ Lê serê sibehê dibêjin: <Îro hewa wê ne xaş be, çimkî ezman sor û tarî ye>. Hûn rûyê ezmên vedinihêrin, ku hewayê çawa be, lê nîşanên zemanan venanihêrin? ⁴ Nisilê xirab û xalîfî nîşanê dixaze, lê wîr'a nîşaneke din nayê dayînê, pêştirî nîşana Ûnis p'êxember». Û ewî ew hiştin û çû.

⁵ Gava şagirtên wî derbazî wî alî bûn, bîr kirin nan xwer'a hilnedan. ⁶ Îsa gote wan: «Miqatî xwe bin, hevza xwe ji hevîrtirşkê fêrisîyan û sadûqîyan bikin». ⁷ Lê wan nav hevda xeber didan û digotin: «Nanê me t'une, lema aha dibêje». ⁸ Lê Îsa fikirên wan hesya gote wan: «Kêm-bawerno! Hûn çima nava hevda xeber didin, ku nanê we t'une? ⁹ Hûn hê fem nakin? Nayê bîra we, çawa pênc nanan t'êra pênc hezar merivan kir û we çend sele nanên bermayî hildan? ¹⁰ Û heft nanan jî t'êra çar hezar merivan kir û we çend zembîl nanên bermayî hildan? ¹¹ Hûn çawa fem nakin, ku min bona nan wer'a negot? Lê ku hûn hevza xwe ji hevîrtirşkê fêrisîyan û sadûqîyan bikin».

¹² Şagirtan hingê fem kir, ku wî bona hevîrtirşkê nan wan'r'a negot, ku hevza xwe bikin, lê ji hînkirina fêrisîyan û sadûqîyan.

ŞEHDETÎYA PETRÛS Û GOTINA ÎSA BONA MIRIN Û ZÊNDÎBÛNA WÎ
(Marqos 8:27-9:1; Lûqa 9:18-27)

¹³ Îsa çû alîyê Qeyserîya Fîlîpoyê û ji şagirtên xwe pirsî: «Bi t'exmîna merivan Kur'ê Meriv k'î ye»? ¹⁴ Wana got: «Hinek dibêjin Yûhennayê nixamdar e, hinekên din dibêjin Êlyas e, lê hinekên din jî dibêjin Yêremîya ye yan jî yek ji p'êxemberan e».

¹⁵ Ewî pirs da wan: «Lê hûn çî dibêjin? Bi t'exmîna we ez k'î me?»

¹⁶ Şimhûn-Petrûs lê vegerand got: «Tu Mesîh î, Kur'ê Xwedêyê zêndî». ¹⁷ Îsa lê vegerand got: «Xwezî li te, Şimhûnê kur'ê Yûhenna, çimkî xûn û goşt eva yeka tu pê nehelandin, lê Bavê minî ezmanan. ¹⁸ Ez ter'a dibêjim, ku tu Petrûs î û ser vî qeyayî ezê civîna xwe çê kim û dergehên dojê[†] wê pê nikaribin. ¹⁹ Û ezê k'îlîtên P'adşatîya Ezmanan bidime destê te û çî ku li ser erdê tu girêdî, ezmananda jî wê girêdayî be û çî ku li ser erdê tu vekî, ezmananda jî wê vekirî be».

²⁰ Hingê Îsa t'emî da şagirtên xwe, ku t'u kesîr'a nebêjin, ku ew Mesîh e. ²¹ Pey wê yekêr'a Îsa destpê kir li ber şagirtên xwe vekir, ku gerekê ew her'e Orşelîmê, jî alîyê rûspîyanda, serokên k'ahînananda û qanûnzanananda gelekî biçerçire û bê kuştinê, lê roja sisyan wê ji mirinê zêndî be. ²² Lê Petrûs ew k'aşî alîkî kir, lê hilat û got: «Dûrî te

* 16:18 «Petrûs» bi yûnanî tê femkirinê: «qeya» yan «kevir.»

† 16:18 «dergehên dojê, yanê cenimê» tê femkirinê, qewat û mecalên ku dibine dojê.

be, Xudan! Ew tiştê neyê serê te!»²³ Îsa ser Petrûsda vegerya û got: «Dûrî min her'e, Şeytan! Tu li ber min kevirê lik'umandinê yî, çimkî ew nêt-fikira te ne ji Xwedêda ye, lê ji merivayî ye».

²⁴ Hingê Îsa şagirtên xwer'a got: «Heger yek dixaze pey min bê, bira xwe înk'ar ke, xaçê xwe hilde û pey min bê. ²⁵ Çimkî k'î dixaze jîyîna xwe rizgar ke, ewê unda bike û k'î ku jîyîna xwe bona min unda bike, ewê bibîne. ²⁶ Çi qazinc, heger meriv t'emamîya dinyayê dest bîne, lê jîyîna xwe unda bike? yan jî meriv ji ber jîyîna xweva çî dikare bide? ²⁷ Çimkî Kur'ê Meriv wê bi rûmeta Bavê xwe, bi milyak'etên xweva bê. Hingê anegorî kirên her kesî wê bide wan. ²⁸ Ez rast dibêjime we, ku hinekên li vir hizûr, wê mirinê nebînin, heta ku Kur'ê Meriv bi P'adşatîya xweva tê nebînin».

ŞAGIRT NAVA NÛR Û RÛMETÊDA ÎSA DIBÎNIN
(Marqos 9:2-13; Lûqa 9:28-36)

17 ¹ Pey şeş rojan' a Îsa Petrûs, Aqûb û birê wî Yûhenna xwer'a hildan, ew rakirine ser ç'iyakî bilind, li k'u ew t'enê bûn. ² Hingê ew li ber ç'evên wan hate guhastinê. Sifetê wî mîna te'vê bîriqî û k'incên wî jî mîna ronayê çîl-querqaş bûn. ³ Mûsa û Êlyas wanva k'ifş bûn û wîr'a xeber dan. ⁴ Hingê Petrûs gote Îsa: «Xudan! Çiqas baş e, ku em li vir in! Heger bixazî, emê sê oban li vir çê kin, yekê ter'a, yekê Mûsar'a, yekê jî Êlyas'a».

⁵ Ewî hê xeber dida, e'wrekî ronahî hat û li ser wan kire sî, dengê jî e'wr hat û got: «Ev e, Kur'ê minî delal, ez jî wî razî me. Guhdarîya wî

bikin!»⁶ Gava şagirtan ew deng bihîst, deverû xwe avîtin û saw û tîrsê ew girtin. ⁷ Lê Îsa nêzîkî wan bû, dest da wan û got: «Rabin, netirsin». ⁸ Wan jî serê xwe bilind kir û pêştirî Îsa t'u kes nedîtin.

⁹ Gava ew jî ç'iyê dadik'etin, Îsa t'emî da wan got: «Wê dîtina ku we dît t'u kesîr'a nebêjin, heta ku Kur'ê Meriv ji nava mirîyan zêndî nebe». ¹⁰ Şagirtan jê pîrsîn: «Lê çima qanûnzan dibêjin pêşda gerekê Êlyas bê?» ¹¹ Îsa li wan veğerand got: «Hemî, pêşda Êlyasê bê û ewê her tiştî saz ke. ¹² Lê ez wer'a dibêjim, ku Êlyas hatye jî, lê ew nas nekirin û çawa ku xastin, usa jî anîne serê wî. Wê usa jî bînine serê Kur'ê Meriv».

¹³ Hingê şagirtan fem kir, ku bona Yûhennayê nixamdar gote wan.

ÎSA JI XORTEKÎ CIN DERRIXE
(Marqos 9:14-29; Lûqa 9:37-43)

¹⁴ Gava ew hatine cem k'oma merivan, merivek nêzîkî Îsa bû, li ber wî k'ete ser çokan û got: ¹⁵ «Xudan, kur'ê min were rehmê! Ew hîvê dik'eve û gelekî diçerçire. Caran dik'eve nava agir û caran jî nava avê. ¹⁶ Min ew anî cem şagirtên te, lê wan nikaribû ew qenc bikira». ¹⁷ Îsa got: «Nisilê nebawer û xalifî! heta çiçax ezê t'evî we bim? heta çiçax ezê we sebir kim? Wî bînine vir cem min». ¹⁸ Îsa lê hilat, cin jê derk'et, xort hema cîda qenc bû.

¹⁹ Hingê şagirt bi t'enê hatine cem Îsa û jê pîrsîn: «Me çima nikaribû ew cin derxista?» ²⁰ Îsa got: «Rûyê kêmbawerîya weda. Ez rast dibêjime we, heger bawerîya we *hema* weke hebeke t'oximê xerdalê be jî, hûnê vî ç'iyayîr'a bêjin: <Ji vir derbazî wî alî be>! wê derbaz be. Û bona we t'u tiştê zehmet wê t'unebe. ²¹ Lê ev cisnê aha bi tiştêkî din dernayê, pêştirî bi dua û bi rojîyê».

ÎSA DERHEQA MIRINA XWEDA DÎSA DIBÊJE
(Marqos 9:30-32; Lûqa 9:43-45)

²² Gava şagirt Celîlêda civyan, Îsa gote wan: «Kur'ê Meriv wê bik'eve destê merivan, ²³ ewê wî bikujin, lê roja sisyân wê zêndî be». Û ewana gelekî ber xwe k'etin.

XERC DAYÎNA P'ARISTXANÊ

²⁴ Gava ew hatine Kefernahûmê, xercgirên duzîvê* hatine cem Petrûs û gotinê: «Dersdarê we xercê duzîvê nade?» ²⁵ Wî got: «Belê» wê bide. Gava Petrûs hate mal, pêşda Îsa jê pîrsî: «Şimhûn! Bi t'exmîna te? P'adşayên dinyayê selefên yan xerc ji k'ê distînin, ji bajarvanên xwe yan ji xerîban?» ²⁶ Petrûs got: «Ji xerîban». Îsa gotê: «Ku usa ye bajarvan aza ne. ²⁷ Lê ku nebe em van p'işk bikin, her'e golê, xeleşa *mesîyan* bavêjê û mesîyê pêşin, ku bê girtinê devê wî veke û tuê nalekî çarzîvê bibîni. Wî hilde, dewsa min û xwe bide wan».

YÊ XWE BIÇ'ÛK KE, EW E MEZIN
(Marqos 9:33-37; Lûqa 9:46-48)

18 ¹ Hingê şagirt hatine cem Îsa û gotinê: «Li nav P'adşatîya Ezmananda *jî me* k'î ye yê herî mezin?» ² Îsa gazî zar'okekê li cem xwe kir, ew nava wanda da sekinandinê ³ û got: «Ez rast dibêjime we, heger hûn venegerin û nebîne mîna zar'okan, hûn t'u car nak'evine P'adşatîya Ezmanan. ⁴ Awa k'î ku mîna vê zar'okê xwe biç'ûk ke, ew e yê herî mezin P'adşatîya Ezmananda. ⁵ Û k'î ku zar'eke aha bi navê min qebûl bike, ew min qebûl dike.

WEY LI DINYAYÊ BONA JI RÊ DEXISTINÊ
(Marqos 9:42-48; Lûqa 17:1-2)

⁶ Lê k'î ku ji van biç'ûkan yekî, yê ku bawerîya xwe min tîne, ji rê derxe, wîr'a hê qenc e, ku beraşek stûyê wîva bê girêdanê û binê be'rêda bixeniqe. ⁷ Wey li dinyayê, bona ewên ku merivan ji rê derdixin. *Usa* nabe, ku ev tişt nebin, lê wey li wî, bi k'îjanî meriv ji rê dik'evin.

* 17:24 Li gora Qanûna Mûsa nalekî «duzîvê» çawa xerc bona p'aristxanê didan- Derk'. 30:13

Metta 18,19

⁸ Heger dest yan nigê te ji rê te derxe, wî jêke û ji xwe bavêje. Ter'a hê qenc e, ku tu qop yan seqet bik'evî nava jîyînê, ne ku du dest yan du nigên te hebin û bêyî avîtinê nava agirê heta-ha-tê. ⁹ Û heger ç'evê te ji rê te derdixe, wî derxe û bavêje. Ter'a hê qenc e ku tu bi ç'evêkî bik'evî nava jîyînê, ne ku bi du ç'evan bêyî avîtinê nava agirê dojê.

MESELA PEZA UNDA BÛYÎ (Lûqa 15:3-7)

¹⁰ Miqatî xwe bin, ku hûn ji van biç'ûkan yekî bêhurmet nekin, çimkî ez dibêjime we, ku milyak'etên wan li ezmanan t'imê rûyê Bavê minî ezmanan dibînin. ¹¹ Kur'ê Meriv hat, ku yê undabûyî biger'e û rizgar bike. ¹² Hûn çawa difikirin? Heger sed pezên merivekî hebin û ji wan yek unda be, ewê nod nehan ç'îya-baniyanda nehêle û neçe ya undabûyî neger'e? ¹³ Lê çaxê bibîne, ez rast dibêjime we, ewê bona wê hê gelekî şa be, ne ku bona nod nehên din, ku unda nebûne. ¹⁴ Usa jî Bavê weyî ezmanan naxaze ku ji van biç'ûkan yek unda be.

BIRÊ KU GUNEH DIKE (Lûqa 17:3)

¹⁵ Heger birê te neheqîyê li te bike, çaxê tu û ew t'enê ne, wî şîret ke. Heger ewî guhdarîya te kir, te îdî birayê xwe qazinc kir. ¹⁶ Lê heger guhdarîya te nekir, yekî yan duduyên din jî xwer'a hilde, ku: <Bi devê du yan sê şehdan her tişt bê makkirinê>. ¹⁷ Lê heger ewî guhdarîya wan jî nekir, civînêr'a bêje. Û heger guhdarîya civînê jî nekir, bira ew ter'a bibe mîna hêtanos[†] û xercgiran.

¹⁸ Ez rast dibêjime we, çî ku hûn li ser erdê girêdin, li ezmên jî wê girêdayî be û çî ku hûn li ser erdê vekin, li ezmên jî wê vekirî be.

¹⁹ Ez dîsa dibêjime we, heger li ser erdê ji we dudu bi t'ifaq bona tişteki dua bikin û bixazin, Bavê minî ezmanan wê bide we. ²⁰ Çimkî li k'u du yan sê meriv bi navê min bicivin, ez li wir nava wanda me».

MESELA BAXŞANDIN Û NEBAXŞANDINÊ

²¹ Hingê Petrûs nêzîkî wî bû û gotê: «Xudan, çaxê birayê min neheqîyê li min bike, ez çend caran gerekê bibaxşîname wî, heta heft caran?» ²² Îsa gotê: «Ez nabêjime te heta heft caran, lê heta heftê caran heft. ²³ Çimkî P'adşatîya Ezmanan mîna vê yekê ye: P'adşakî xast li xulamên xwer'a hesabê xwe bike. ²⁴ Çaxê dest bi hesaban kir, yek anîne cem wî, ku dehe hezar telantî[‡] deyndarê wî bû. ²⁵ Lê çimkî wî nikaribû ew deyn bida, xweyê wî ferman da, ku ew, jina wî, lawên wî û hemû hebûka wî bêne firotanê, ku deynê wî bê dayîne. ²⁶ Hingê xulam deverûy xwe avîte nigê wî, jê lava kir got: <Li min sebir bike, ezê hemû jî li te vegeřnim>. ²⁷ Dilê xweyê wî li ser wî şewitî, ew berda û deynê wî jî baxşandê. ²⁸ Lê gava ew xulam derk'et çû, rastî xulam-hevalekî xwe hat, yê ku sed zîvî[§] deyndarê wî bû, qir'ika wî girt û got: <Tu çî deyndarê min î bide>! ²⁹ Hingê xulam-hevalê wî xwe avîte nigê wî, lava jê kir û got: <Li min sebir ke. Ezê li te vegeřnim>. ³⁰ Lê wî guh nedayê, çû ew avîte hebsê, heta ku ew deynê xwe bide. ³¹ Gava xulam-hevalên wîyî din ew tiştê bûyî dîtin, gelekî ber xwe k'etin û çûn her çî ku bibû xweyê xwer'a gotin. ³² Hingê xweyê wî gazî wî kir û got: <Xulamê xirab! Min deynên te hemû bona wê yekê baxşande te, ku te ji min lava kir. ³³ Lê *gelo* ne lazim bû, ku tu jî li xulam-hevalê xwe bihatayî rehmê, çawa ez te hatime rehmê?> ³⁴ Û xweyê wî hêrs k'et, ew da destê celatan, heta ku ew deynên xwe hemû bida. ³⁵ Usa jî Bavê minî ezmanan wê li serê we her kesî bike, heger hûn bi hub û rez nebaxşînine birayê xwe».

PIRSA JINBER'DANÊ (Marqos 10:1-12)

19 ¹ Gava Îsa ew xeber ser hevda anîn, ji Celîlê derk'et hate sînorê Cihûstanê, wî aliyê ç'emê Ûrdunê. ² Gelek k'oma merivan pey wî çûn û ewî li wir ewana qenc kirin. ³ *Hineke jî* fêrisîyan nêzîkî wî bûn, ku wî bicêribînin, jê pirsîn: «Gelo li gora Qanûnê rast e, ku bona her manîkê mêr jina xwe ber'de»? ⁴ Ewî caba wan da got: «Gelo we ne xandye, serê-sêrîda Efirandar <ew nêr û mê xuliqandin>? ⁵ Û got: <Ji ber vê yekê mêr wê dê û bavê xwe bihêle û xwe li jinê bigire û her du wê bibine bedenek>. ⁶ Awa îdî ew ne dudu ne, lê bedenek in. Lema ewên ku Xwedê kirine yek, bira meriv *wan* ji hevdu neqetîne».

⁷ Wan jêr'a got: «Lê çima Mûsa t'emî da, ku mêr nivîsara jinber'danê bide jinê û wê ber'de»? ⁸ Ewî li wan vegeřand got: «Mûsa ji dest serhişkîya we destûr da, ku hûn jinên xwe ber'din. Lê serê-sêrîda ne usa bû. ⁹ Ez wer'a dibêjim, k'î ku jina xwe bêy manîya qavîyê ber'de û yekê din bistîne, ew zinêk'arîyê dike».^{††}

¹⁰ Şagirtên wî gotinê: «Heger nava jin û mêrda zehmeteke aha heye, hê qenc e qet hevdu nestînin». ¹¹ Îsa wan'a got: «Her kes vê yekêda qewat nake, lê t'enê ew, k'îjanan'a hatye dayîne. ¹² Çimkî nemêr hene, ku ji zikmakîyêda usa bûne, nemêr jî hene, ku bi destê merivan bûne nemêr û nemêr jî hene, ku bona P'adşatîya Ezmanan wana xwe kirine nemêr. K'ê dikare xwe zefî ke, bira usa bike».

* 18:16 Qanûna Ducarî 19:15.

† 18:17 T'evgirêdana cihûyan hêtanosan'a t'unekû, çimkî wan Xwedê nediheband.

‡ 18:24 Bahê telantekî maşê k'arkerekî panzdeh salan zêdetir bû.

§ 18:28 Bahê zîvekî weke rojxebateke k'arkerekî bû.

** 19:4,5 Destpêbûn 1:27, 2:24.

†† 19:9 Destnivîsarên hinekanda ew jî heye: «Û k'î ku ya berdayî bistîne zinêk'arîyê dike.»

Metta 19,20

ÎSA DUA-DIROZGE ZAR'OKAN DIKE
(Marqos 10:13-16; Lûqa 18:15-17)

¹³ Hingê zar'ok anîne cem Îsa, ku destên xwe dayne ser wan û dua-dirozge li wan bike. Lê şagirtên wî li yên danîn hilatin. ¹⁴ Îsa got: «Bira ew zar'ok bêne cem min, pêşîya wan negirin, çimkî P'adşatîya Ezmanan p'ar'a yên usa ye». ¹⁵ Û Îsa destên xwe danîne ser wan, *dua-dirozge kir* û ji wir çû.

CAHILEKÎ DEWLEMEND LI JÛYÎNA HETA-HA-TÊ DİGER'E
(Marqos 10:17-31; Lûqa 18:18-30)

¹⁶ Yek nêzîkî wî bû, got: «Dersdarê qenc! Ez çî qencîyê bikim, ku jÛyîna heta-ha-tê war bim»? ¹⁷ Ewî gote wî: «Tu çima minr'a dibêjî qenc? T'enê Yekî qenc heye~ *Xwedê*. Lê heger tu dixazî, bik'evî jÛyîna heta-ha-tê, t'emîyên *Xwedê* bîne sêrî». ¹⁸ Ewî ji Îsa pirsî: «K'îjan in»? Îsa got: «Nekuje, zinêk'arîyê neke, nedize, şehdetîya derew nede, ¹⁹ dê û bavê xwer'a hurmetê bike* û hevalê xwe weke xwe hiz bike». ²⁰ Wî cahilî got: «Min ev hemû hemû xwey kirine. Îdî çî kêmasîya min heye»? ²¹ Îsa got: «Heger tu dixazî k'amîl bî, her'e hebûka xwe bifiroşe bide feqîran, hingê xezna te wê li ezmanan hebe. Û pey min were». ²² Gava wî cahilî ev xeber bihîstin, ber xwe k'et, çû, çimkî hebûka wî gelek bû.

²³ Hingê Îsa gote şagirtên xwe: «Ez rast dibêjime we, dewlemendanr'a zehmet e, ku bik'evine P'adşatîya Ezmanan. ²⁴ Ez dîsa dibêjime we, deve wê qula derzîyêr'a hê rihet derbaz be, ne ku dewlemend bik'eve P'adşatîya *Xwedê*. ²⁵ Gava şagirtan ev yek bihîst, gelekî ecêb man û gotin: «Îdî k'î dikare rizgar be»? ²⁶ Îsa li wan nihêrî, got: «Ew tişt ji destê mêriv nayê, lê ji destê *Xwedê* her tişt tê».

²⁷ Wê gavê Petrûs lê vegerand got: «Awa me hemû tişt hiştîye û pey te hatine, lê axirîya me wê çawa be»? ²⁸ Îsa gote wan: «Ez rast dibêjime we, çaxê Kur'ê Meriv Dinya Nûda li ser t'extê xweyî rûmetê rûnê, hûnên ku pey min tèn, ser donzdeh k'ursîyan rûnên û dîwana donzdeh qebîlên[‡] Îsraêlê bikin. ²⁹ Û her kesê ku mala xwe yan birayên birayên xwe yan xûşkên xwe yan bavê xwe yan dîya xwe yan lawên xwe yan erdên xwe bona navê min hiştîne, ewê sed bare bistîne û jÛyîna heta-ha-tê jî wê war be. ³⁰ Lê gelekên pêş wê bibine paş û gelekên paş wê bibine pêş».

K'ARKER Û MAŞÊ WAN

20 ¹ «P'adşatîya Ezmanan mîna vê yekê ye: Merivekî xweymilk' sibehê zû rabû, ku bona baxê xwe k'arkeran bigire. ² Ewî k'arkeranr'a peyman girêda, ku rojê zîvekî bide wan û ew şandine nava baxê xwe. ³ Nêzîkî siheta nehan[§] derk'et, hinekên din dîtin, ku betal bazarêda sekinî bûn, ⁴ gote wan: «Hûn jî her'ine nava baxê min û çî maş wer'a dik'eve, ezê bidime we». Ew jî çûn. ⁵ Dîsa siheta donzdehan û siheta sisyan derk'et û usa kir. ⁶ Û nêzîkî siheta pêncan derk'et, hinekên din jî dîtin, ku betal sekinî bûn, gote wan: «Çima hûn li vir t'emamîya rojê betal sekinî ne»? ⁷ Wan gote wî: «t'u kesî em bi k'irê negirtin». Ewî wanr'a got: «Hûn jî her'ine nava baxê min».

⁸ Berî êvarê, xweyê bax wek'ilê mala xwer'a got: «Gazî k'arkeran ke, maşê wan bide, ji yên paşin destpê ke heta yên pêşin». ⁹ Ew k'arkerên ku siheta pêncan hatibûn, ji wan her yekî zîvek stand. ¹⁰ Gava yên pêşin jî hatin, ew difikirîn, ku wê zêde bistînin. Lê ji wan her yekî jî zîvek stand. ¹¹ Gava maşê xwe standin, hindava xweyê baxda bîna xwe teng kirin û gotin: ¹² «Me t'emamîya giranîya rojê û germa wê k'işand, lê evên ku paşwaxtîyê hatin, qet sihetekê jî nexebitîn, te ew weke me kirin». ¹³ Malxê ji wan yekîr'a got: «Heval! Ez neheqîyê li te nakim. Tu minr'a li ser zîvekî qayl nebûyî? ¹⁴ Maşê xwe bistîne û her'e. Ez dixazim çawa ku min da te, usa jî bidime evê paşin. ¹⁵ Yan îzina min ser hebûka min nîne, ku ez çawa bixazim usa bikim? yan tu hevsûdîyê dikî, ku ez merd im»? ¹⁶ Û aha yên paş wê bibine pêş û yên pêş wê bibine paş, çimkî gazîkirî gelek in, lê hîlbijartî hindik».

ÎSA CARA SISYAN BONA MIRINA XWE DIBÊJE
(Marqos 10:32-34; Lûqa 18:31-34)

¹⁷ Çaxê Îsa hildik'işya Orşelîmê, her donzdeh şagirtên xwe xwer'a birin û rêda başqe gote wan: ¹⁸ «Va ye em hevraz diçine Orşelîmê. Kur'ê Meriv wê bik'eve destê serokên k'ahînan û qanûnzanan. Ewana wê bona wî *qirara* kuştinê derxin ¹⁹ û wî bidine destê hêtanosan, ku qerfê xwe wî bikin, bidine ber qamçîyan û xaç kin. Lê roja sisyan ewê ji mirinê zêndî be».

XASTINA DÛYA KUR'ÊN ZEBEDÎ
(Marqos 10:35-45)

²⁰ Hingê dîya kur'ên Zebedî t'evî her du kur'ên xwe hate cem Îsa, ser nigên wîda ta bû, tişteke jê dixast. ²¹ Îsa jê pirsî: «Tu çî dixazî»? Wê got: «Bêje, ku ev her du kur'ên min, yek li alîyê teyî rastê, yê din jî li alîyê teyî ç'epê rûnên, nava P'adşatîya teda». ²² Lê Îsa li wan vegeand got: «Hûn nizanin çî dixazin. Gelo hûn dikarin ji wê k'asê vexwin, ya ku ezê vexwim yan bi wê nixamtinê bêne nixamtinê, bi k'îjanê ezê bêne nixamtinê»? Wana gotê: «Belê, em dikarin». ²³ Ewî gote wan: «Rast e hûnê wê k'asa min vexwin û bi wê nixamtinê bêne nixamtinê, lê *destûra* rûniştina li alîyê minî rastê û ç'epê ne destê minda ye. Ew cî bona wan in, k'îjananr'a ji Bavê minda hatine hazirkirin».

* 19:19 Derk'etin 20:12-16; Qanûna Ducarî 5:16-20.

† 19:19 Qanûna K'ahîntîyê 19:18.

‡ 19:28 Ji donzdeh kur'ên Îsraêl donzdeh qebîl pêşda hatin. Ji qebîlan jî, bi navên serokan berek pêşda hatin, ku ji donzdehan zêdetir bûn. Mesele: Bereka Dawid, bereka Ebîya (Yûhennayê nixamdar ji wê berekê bû) û yên din.

§ 20:3 Bi yûnanî aha ye: «Siheta sisyan.» Bona cihûyan, hingê roj sibehê zû siheta 6-da destpê dibû.

²⁴ Her dehe şagirtên din gava ev bihîstin, dilê wan ji her du bira ma. ²⁵ Lê Îsa gazî wan cem xwe kir û got: «Hûn dizanin, ku mîrên miletan zordestîyê ser cimeta xwe dikin û giregirên wan hikumî ser wan dikin. ²⁶ Lê nava weda gerekê usa nebe. K'î ku nava weda dixaze bibe yê mezin, gerekê bibe berdestîyê we. ²⁷ Û li nav weda k'î ku dixaze bibe pêş, gerekê bibe xulamê we, ²⁸ çawa Kur'ê Meriv~ ew nehatye ku wîr'a berdestîyê bikin, lê ku ew berdestîyê bike û canîya xwe bide, ku geleman bik'ir'e».

ÎSA Ç'EVÊN DU KORAN VEDIKE
(Marqos 10:46-52; Lûqa 18:35-43)

²⁹ Gava ewana ji Erîhayê derk'etin, k'omeke merivane giran da pey wî çû. ³⁰ Du kor ser wê rê rûniştibûn. Gava wana bihîst ku Îsa derbaz dibe, kirine qîr'în û gotinê: «Xudan, Kur'ê Dawid, me were rehmê». ³¹ Wê k'oma merivan li wan hilat, ku dengê xwe bibir'in, lê wana hê kire qîr'în û gotinê: «Xudan, Kur'ê Dawid, me were rehmê!» ³² Îsa sekini, gazî wan kir û got: «Hûn çi ji min dixazin, ku ez bona we bikim?» ³³ Wana gote wî: «Xudan, bira ç'evên me vebin». ³⁴ Dilê Îsa li ser wan şewtî û dest danî ser ç'evên wan. Û hema cîda ç'evên wan dîtî, dane pey Îsa çûn.

ÎSA BI RÛMET DIÇE ORŞELÎMÊ
(Marqos 11:1-11; Lûqa 19:28-38; Yûhenna 12:12-19)

21 ¹ Gava ew nêzikî Orşelîmê bûn, hatine gundê Beytfacê, berbi ç'iyayê Zeytûnê. Hingê Îsa du şagirtên xwe şandin ² û gote wan: «Her'ine wî gundê pêşberî xwe û hûnê k'ereke girêdayî çeşik li ber bibînin. Wan vekin bînine cem min. ³ Heger yek tiştêkî bêje we, hûn bêjinê: <Xudan' a lazim in> û ewê zû wan bişîne». ⁴ Eva usa bû, ku ew gotina p'êxember bê sêrî, ku dibêje: ⁵ «Bêjine bajarê Sîyonê: <Va P'adşê te tê cem te, milûk û li k'erê û çeşika k'erê sîyarbûyî>».*

⁶ Şagirt çûn û çawa Îsa t'emî dabû, wana usa kir. ⁷ K'er û çeşik anîn, k'incên xwe avîtine ser wan û Îsa li wan sîyar bû. ⁸ K'omeke merivane giran k'incên xwe li ser rê radixistin, hinekan jî çiqilên daran dibir'în û li ser rê radixistin. ⁹ K'oma merivan, ku li pêşîya wî û pey wî diçû, dikire qîr'în û digot: «Hosanna Kur'ê Dawid' a! Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê!»[†] Hosanna li jorê!»

¹⁰ Gava Îsa k'ete Orşelîmê, bajar pêda hejya û pirsîn: «Ev k'î ye?» ¹¹ K'oma merivan gotin: «Eva, Îsayê P'êxember e, ji Nisreta Celîlê».

P'ARISTXANÊDA ZAR'OK PESINÊ ÎSA DIDIN
(Marqos 11:15-19; Lûqa 19:45-48; Yûhenna 2:13-22)

¹² Îsa k'ete p'aristxana Xwedê û hemûyên ku p'aristxanêda dik'ir'în û difirotin derxistin. T'extên serafan û k'ursîyên kewofiroşan welgerandin ¹³ û gote wan: «Nivîsar e: <Mala min wê mala duakirinê bê hesabê>,[‡] lê we ew kirye şkefta t'alank'aran!»[§]

¹⁴ Li wir, p'aristxanêda kor û seqet hatine cem wî û ewî ew qenc kirin. ¹⁵ Lê çaxê serokên k'ahînan û qanûnzanan ew k'iryametên ku Îsa kirin dîtî û usa jî ew zar'okên ku p'aristxanêda dikirine qîr'în û digotin: «Hosanna Kur'ê Dawid' a!» hêrs k'etin ¹⁶ û gotine wî: «Tu dibihêyî ev çi dibêjin?» Îsa gote wan: «Belê. We qet nexandye ku: <Te pesindayîn bi zarên t'ifalan û şîrxuran meyaser kir >?»^{**}

¹⁷ Ewî ew li wir hiştin, ji bajêr derk'et çû Beytanyayê û şev li wir ma.

DARA HÊJÎRÊYE NIFIRKIRÎ Û PIRSA HIKUMÊ ÎSA
(Marqos 11:12-14, 20-24, 11:27-33; Lûqa 20:1-8)

¹⁸ Sibehê zû, gava ew vegerya bajêr, birçî bû. ¹⁹ Li ser rê dareke hêjîrê dît, nêzikî wê bû, lê pêştirî belgan tiştêkî din pêva nedît û darêr'a got: «Ji vir hada tuê heta-ha-tê ber nedî!» Û pêr'a-pêr'a dar hişk bû.

²⁰ Çaxê şagirtan ev yek dît, zendegirtî man û gotin: «Çawa ev dara hêjîrê pêr'a-pêr'a hişk bû?» ²¹ Îsa caba wan da û got: «Ez rast dibêjime we, heger bawerîya we hebe û hûn dudilî nebin, ne t'enê hûnê çi ku hate serê vê dara hêjîrê bikin, lê heger vî ç'iyayîr'a jî bêjin: <Rabe xwe bavêje be'rê>, wê bibe. ²² Heger bawerîya we hebe, hûn çi ku nava duada bixazin, hûnê bistînin».

²³ Gava ew hate p'aristxanê û cimet hîn kir, serokên k'ahînan û rûspîyên cimetê hatine cem wî û gotinê: «Tu bi çi hikumî van kiran dikî? K'ê ev hikum daye te?» ²⁴ Îsa li wan veğerand got: «Ezê jî tiştêkî ji we bipirsim. Heger we caba min da, ezê jî bêjime we bi çi hikumî van kiran dikim. ²⁵ Hikumê nixamtina Yûhenna ji k'u bû? Ji ezmên bû yan ji merivan?» Ew nava hevda şewrîn û gotin: «Heger em bêjin: <Ji ezmên bû>, ewê bêje me: <Lê çima we bawerîya xwe wî neanî?» ²⁶ Lê heger em bêjin: <Ji merivan bû>, em ji k'oma van merivan ditirsîn, çimkî hemû qebûl dikin, ku Yûhenna p'êxember bû». ²⁷ Wan caba Îsa da û gotin: «Em nizanin». Ewî jî gote wan: «Ez jî nabêjime we, ku ez bi çi hikumî van kiran dikim.

* 21:5 Zekerîya 9:9.

† 21:9 Zebûr 118:26.

‡ 21:13 Îşaya 56:7.

§ 21:13 Yêremîya 7:11.

** 21:16 Zebûr 8:2.

²⁸ *Bêjin*, weva çawa k'ifş dibe? Du kur'ên merivekî hebûn. Ewî kur'ê xweyî mezinr'a got: <Lawo! Îro her'e nava baxda bixebite>. ²⁹ Wî lê vegerand got: <naçim>, lê paşê p'ošman bû, çû. ³⁰ Hingê bav çû cem yê din, ewî jî aha got: <Belê, ezê her'im, bavo>, lê neçû. ³¹ Niha ji van her du kur'an k'îjanî gur'a bavê xwe kir? Wan gotê: «Yê mezin». Îsa jî gote wan: «Ez rast dibêjime we, ku xercgir û qav berî we wê bik'evine P'adşatîya Xwedê. ³² Çimkî Yûhenna hat, ku rîya rastîyê nîşanî we bike, we bawerîya xwe wî neanî, lê xercgir û qavan bawerîya xwe wî anîn. We ev tişt dît jî, lê dîsa we xwe neşkênand, ku bawerîya xwe wî banîya.

MESELA BAX Û BAXVANAN
(Marqos 12:1-12; Lûqa 20:9-19)

³³ Meseleke din jî bibihên. Merivekî xweymilk' hebû, bax danî, dorê sûr kir, hewzek têda k'ola, kelak çê kir û ew da baxvanan û çû welatekî din. ³⁴ Çaxê dema bert'opkirinê nêzîk bû, ewî xulamên xwe şandine cem baxvanan, ku ji berê baxê wî jêr'a binin. ³⁵ Baxvanan xulamên wî girtin, yekî xistin, yê din kuştin û yekî din jî dane ber keviran. ³⁶ Ewî xulamne din şandin, ji yê pêşin gelectir û wana usa jî anîne serê wan. ³⁷ Axirîyê, ewî kur'ê xwe şande cem wan û got: <Belkî ji kur'ê min şerm bikin>. ³⁸ Lê gava baxvanan kur'ê wî dît, gotine hev: <Ev e warxurê wî. Werin em vî bikujin û bibine xweyê mîrata wî>. ³⁹ Û ew girtin ji bax derxistine der û kuştin. ⁴⁰ Çaxê xweyê bax bê, wê çi serê wan baxvanan bike? ⁴¹ Gotine wî: «Wê qir'a wan neheqan bîne û bax bide baxvanên usa, yê ku wê waxtda berê baxê wî bidinê».

⁴² Îsa gote wan: «We nivîsarêda qet nexandye? <Ew kevirê ku hosteyan wêda avît, bû serê enîşkê. Ev yek ji Xudanda bû û li ber ç'evên me heyr-hujmek'ar e!> ⁴³ Bona vê yekê ez dibêjime we, ku P'adşatîya Xwedê ji we wê bê standinê û miletekî usar'a bê dayînê, ku bona wî ber bîne. ⁴⁴ K'î ku ser vî kevirêda bik'eve, wê hûrdexaşi be û ew kevir ser k'êda bik'eve, wê wî bihincir'îne».

⁴⁵ Gava serokên k'ahînan û fêrisîyan meselên wî bihîstin, fem kirin ku wî ew anî ser wan. ⁴⁶ Xastin wî bigirin, lê ji k'oma merivan tirsyan, çimkî wana ew weke p'êxemberekî qebûl dikirin.

MESELA DEWATÊ
(Lûqa 14:15-24)

22 ¹ Dîsa Îsa bi meselan wanr'a xeber da û got: ² «P'adşatîya Ezmanan mîna vê yekê ye: P'adşakî dewata kur'ê xwe kir. ³ Ewî xulamên xwe şandin, ku gazî xandîyên dewatê kin, lê wana nexastin bîn. ⁴ Xulamne din şandin û got: <Bêjine Xandîyan: Min canege û heywanên xweyê dermalîkirî serjêkirine û nanê xwe hazir kirye, her tişt hazir e. K'erem kine dewatê>! ⁵ Lê wana pişt guhê xweva avît~ yek çû erdê xwe û yê din t'ucaretîya xwe. ⁶ Yê mayîn jî xulamên wî xistin û kuştin. ⁷ Gava p'adşê bihîst, hêrs k'et, ordîya xwe şand, ewên ku xulamên wî kuştin qir'a wan anî, bajarê wan jî şewtand. ⁸ Hingê wî xulamên xwer'a got: <Dewat hazir e, lê xandî ne hêja bûn. ⁹ Rabin her'ine serê rîya û k'ê ku bibînin, gazî dewatê kin>. ¹⁰ Û ew xulam derk'etine serê rîyan, k'î ku dîtin, qenc û xirab, hemû civandin û mala dewatê bi xandîyanva t'ije bû.

¹¹ Lê gava p'adşa çû hindur, ku xandîyan binihêre, merivek li wir dît, ku k'inca dewatê lê nîbû, ¹² gotê: <Heval! Tu çawa bêy k'inca dewatê k'etî vir?> Dengê wî hate bir'înê. ¹³ Wê demê p'adşê berdestîyanr'a got: <Dest û p'iyên wî girêdin, bigirin bavêjine tarîya derva. Li wir wê bibe qir'în û ç'irke-ç'irka diranan>.

¹⁴ Awa gazîkirî gelek in, lê hilbijartî hindik».

PIRSA XERC DAYÎNÊ Û ZÊNDÎBÛNA MIRÎYAN
(Marqos 12:13-27; Lûqa 20:20-40)

¹⁵ Hingê fêrisî çûn *hev* şewrîn, ku çawa wî bi xeberan bigirin. ¹⁶ Wana şagirtên xwe t'evî Hêrodesyan şandine cem wî û gotinê: «Dersdar! Em dizanin, ku tu yekî rast î û rîya Xwedê rast hîn dikî. Minetê ji t'u kesî nagirî, çimkî firqîyê nakî nava merivan. ¹⁷ Niha mer'a bêje, bi fikira te, lazim e em xerc bidine qeyser yan na?»

¹⁸ Îsa qelpîya wan dizanibû, got: «Çima hûn min dicêribînin, durûno? ¹⁹ P'erê xercdayîne nîşanî min kin». Wana zîvek wîr'a anî. ²⁰ Îsa ji wan pirsî: «Ev nivîsar û sifet yê k'ê ne?» ²¹ Gotine wî: «Yên Qeyser in». Hingê gote wan: «Awa çi yê Qeyser in, bidine Qeyser û çi yê Xwedê ne, bidine Xwedê». ²² Gava wan bihîst zendegirtî man, ew hiştin û çûn. ²³ Wê rojê ji sadûqîyên ku digotin mirî zêndî nabin, hinek hatine cem Îsa jê pirsîn ²⁴ û gotinê: «Dersdar! Mûsa got: <Heger yek bêzuret bimire, birayê wî bira jina wî bistîne û zuret pey birê xwe xe>. ²⁵ Awa heft bira li cem me hebûn. Birê mezin zewicî, bêzuret mir, jina wî birayê wîr'a ma. ²⁶ Usa jî hate serê birayê dudan û yê sisyan, xulese *ev yek* hate serê her heftan jî. ²⁷ Li pey hemûyanr'a ew jin jî mir. ²⁸ De niha bêje, Roja Zêndîbûna mirîyan ew jin wê ji wan her heftan bibe jina k'îjanî? Çimkî hemûyan jî ew standibû».

²⁹ Îsa li wan vegerand got: «Hûn xalîfî ne, çimkî ne nivîsaran dizanin, ne jî qewata Xwedê. ³⁰ Roja Zêndîbûna mirîyan ne wê bizewicin, ne jî mêr kin, lê ewê mîna milyak'etên ezmên bin. ³¹ Lê derheqa zêndîbûna mirîyanda, gelo we xebera Xwedêye wer'a gotî nexandye? ³² <Ez Xwedêye Îbrahîm, Xwedêye Îshaq û Xwedêye Aqûb im>.† Xwedê ne Xwedêye mirîyan e, lê Xwedêye zêndîyan e». ³³ Gava k'oma merivan ev tişt bihîstin, li ser hînkirina wî zendegirtî man.

* 21:42 Zebûr 118:22,23.

† 22:32 Derk'etin 3:6.

Metta 22,23

T'EMÏYA HERE MEZIN
(Marqos 12:28-34; Lûqa 10:25-28)

³⁴ Lê gava fêrisîyan bihîst, ku Îsa sadûqî dengbir'î kirin, hemû li cîkî civyan. ³⁵ Hingê ji wan qanûnzanan yekî pirs da Îsa, ku wî bicêribîne û got: ³⁶ «Dersdar. Qanûnêda t'emîya here mezin k'îjan e?» ³⁷ Îsa gotê: «<Xudan Xwedêyê xwe hiz bike, bi t'emamîya dilê xwe, bi t'emamîya canîya xwe û bi t'emamîya hişê xwe>.* ³⁸ Ev e t'emîya pêşin û here mezin. ³⁹ Û ya dudan jî mîna vê ye: <Hevalê xwe weke xwe hiz bike>.[†] ⁴⁰ Hemû nivîsarên p'êxemberan û Qanûnê ji van her du t'emîyanva girêdayî ne».

MESÎH KUR'Ê K'Ê YE?
(Marqos 12:35-37; Lûqa 20:41-44)

⁴¹ Gava fêrisî civyan, Îsa ji wan pirsî ⁴² û got: «Hûn bona Mesîh çî difikirin, t'exmîna we ew kur'ê k'ê ye?» Gotine wî: «Kur'ê Dawid e». ⁴³ Îsa gote wan: «Lê çawa Dawid bi Ruh wî Xudanê xwe hesab dike? çimkî wî got: ⁴⁴ <Xudan gote Xudanê min: Li alîyê minî rastê rûnê, heta ku ez dijminên te bikime binê p'iyên te>.[‡] ⁴⁵ Heger Dawid wî <Xudan> hesab dike, ew çawa dibe kur'ê wî?» ⁴⁶ Û t'u kesî nikaribû caba wî bida û li pey wê rojê'a t'u kesî newêrbû pîrsek ji wî bikira.

HEVZA XWE JI QANÛNZAN Û FÊRISÎYAN BIKIN
(Marqos 12:38-40; Lûqa 11:37-52; 20:45-47)

23 ¹ Hingê Îsa k'oma merivan'ra û şagirtên xwer'a xeber da û got: ² «Qanûnzana û fêrisî ser k'ursiyê Mûsa rûniştine. ³ Îdî ew çî wer'a bêjin xwey kin û biqedînin, lê mîna wan nekin, çimkî ew dibêjin, lê nakin. ⁴ Barên giran û zehmet girêdidin, datînine ser milên merivan, lê ew xwexa naxazin t'ilîya xwe jî bidinê. ⁵ Ew her tiştî dikin, ku li ber merivan bêne k'ifşê. Keşkülên[§] *p'rtûkane* mezin mil û enîyên xweva girêdidin û rîşiyên k'incên xwe dirêj dikin. ⁶ Li şayîyanda serê jorin hiz dikin, k'inîştanda k'ursiyên pêşin, ⁷ Ew *hiz dikin* bazaranda silavê bistînin û meriv jî bêjine wan: <Mamoste>. ⁸ Lê bira wer'a nebêjin: <Mamoste>, çimkî dersdarê we yek e, ew Mesîh e û hûn hemû jî bira ne. ⁹ Li ser dinyayê hûn *t'u kesî'ra* nebêjin: <Bavo>, çimkî Bavê we yek e, ew li ezmên e. ¹⁰ Ne jî wer'a bêjin: <Rêber>, çimkî Rêberê we yek e, ew Mesîh e. ¹¹ Bira nava wêda yê herî mezin bibe berdestiyê we. ¹² K'î ku xwe bilind bigire, ewê nimiz be, lê k'î ku xwe nimiz bigire, ewê bilind be. ¹³ Lê wey li we qanûnzana û fêrisiyên durû! Hûn derê P'adşatîya Ezmanan li ber merivan dadidin. Ne hûn dik'evinê û ne jî wan dihêlin, yên ku dixazin bik'evinê. ¹⁴ Wey li we qanûnzana û fêrisiyên durû! Ku hûn malên jinebîyan hûfî xwe dikin, lê *alîkîva jî* duayê xwe dirêj dikin, ku ji merivan bêne dîtinê. Bona vê yekê dîwana we wê hê giran be. ¹⁵ Wey li we qanûnzana û fêrisiyên durû! Hûn li be'r û bejan diger'in, ku yekî nebawer bînine ser rîya xwe. Û gava hûn digihîjine meremê xwe, hûn wî du car ji xwe zêdetir dikine p'ara dojê. ¹⁶ Wey li we rêberên kor, hûn dibêjin: <K'î ku bi p'aristxanê sond dixwe, ne tişteke e. Lê k'î ku bi zêr'ê p'aristxanêda sond dixwe, dibe deyndar>. ¹⁷ Hey bêaqil û korno! K'îjan mezin e, zêr' yan p'aristxane, ku zêr' helal dike? ¹⁸ Usa jî hûn dibêjin: <K'î ku bi qurbangehê sond dixwe ne tişteke e, lê k'î bi hedîya ser qurbangehê sond dixwe, dibe deyndar>. ¹⁹ Hey bêaqil û korno! K'îjan e mezin? Hedî yan qurbangeh, ku hedîyê helal dike? ²⁰ Awa, k'î bi qurbangehê sond dixwe, ew him bi wê sond dixwe, him jî bi hemû tiştên ku ser wê hene. ²¹ K'î ku bi p'aristxanê sond dixwe, ew him bi wê sond dixwe, him jî bi wî, k'î wêda dimîne. ²² Û k'î ku bi ezmên sond dixwe, ew him bi k'ursiya Xwedê sond dixwe, him jî bi yê ser rûniştî. ²³ Wey li we qanûnzana û fêrisiyên durû! Hûn dehekên pûngê, anîsoyê û kêmunê didin, lê tiştên Qanûnêye pêş- heqiyê, rehmê û baweriyê davêjine pişt xwe. We Gereke ev bikirana û dest ji tiştên mayîn nek'îşanda. ²⁴ Rêberên kor! Hûn k'ermêşan diparzinin, lê deveyan dadiqurtînin! ²⁵ Wey we qanûnzana û fêrisiyên durû! Hûn t'as û fincanan rûyê dervava paqij dikin, lê hindurva t'ijî timayî û ç'evbirçîtî ne. ²⁶ Fêrisiyê kor! Berê pêşda hindurê fincan û t'asê paqij ke, ku derva jî paqij be. ²⁷ Wey li we qanûnzana û fêrisiyên durû! Hûn mîna t'irbên sipîkirî ne, ku ji derva bedew k'ifş dibin, lê hindurva bi hestiyên mirîyan û bi her heramiyêva t'ijî ne. ²⁸ Usa jî hûn ji derva merivanva rast têne k'ifşê, lê hindurva durû û neheq in.

²⁹ Wey li we qanûnzana û fêrisiyên durû! Hûn t'irbên p'êxemberan çê dikin û t'irbên yên rast dixemilînin ³⁰ û dibêjin: <Heger em rojên bavên xweda bûna, meyê t'evî wan xûna p'êxemberan nerêta>. ³¹ Îdî hûn niha xwexa didine îzbatkirinê, ku hûn lawên wan bavan in, yên ku p'êxember kuştine. ³² De kêmasîya xirabiyên bavên xwe t'emam kin. ³³ Me'rno! Ç'êjikên meran! Hûnê çawa ji dîwana dojê birevin?

³⁴ Bona vê yekê ezê p'êxemberan, serwaxtan û qanûnzanan bişnime cem we û hûnê ji wan hinekan bikujin, xaç kin, hinekan jî k'inîştên xweda bidine ber qamçîyan û bajar-bajar bizêrînin. ³⁵ Hemû xûna bêsûce ku li ser rûyê erdê hatye rêtinê wê bê ser we~ ji xûna Habîlê bêsûc *girtî* heta xûna Zekerîyayê kur'ê Berexîya, yê ku we nava p'aristxanê û qurbangehêda kuşt. ³⁶ Ez rast dibêjime we, ev xûn hemû wê bê serê vî nisilî.

* 22:37 Qanûna Ducarî 6:5.

† 22:39 Qanûna K'ahintiyê 19:18.

‡ 22:44 Zebûr 110:1.

§ 23:5 Qanûna Ducarî 6:4-9, 11:18-21. Qanûnzana cihûyan mîna milik û berenîyan xwer'a çê dikirin û nivîsarên sereke têda xwey dikirin.

³⁷ Orşelîm! Orşelîm! Te p'êxember dikuştin û şandîyên cem xwe didane ber keviran! Çend caran min xast lawên te bicivanda, çawa mirîşk cûcûkên xwe dicivîne bin baskên xwe, lê te nexast! ³⁸ Awa mala te wê xirabe û destjêberdayî bimîne. ³⁹ Ez dibêjime we, îdî ji vir hada hûn min nabînin, heta ku bêjin: <Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê>».*

ÎSA BONA WÊRANBÛNA P'ARISTXANÊ Û AXIRÎYA DINYAYÊ DIBÊJE
(Marqos 13:1-31; Lûqa 21:5-33)

24 ¹ Gava Îsa ji p'aristxanê derk'et çû, şagirt çûne cem wî, ku xanîyên p'aristxanê nîşanî wî kin. ² Îsa wanr'a got: «Hûn van hemûyan dibînin? Ez rast dibêjime we, ev hemûyên jî wêran bin, vê derê kevirê li ser kêvir nemîne!»

³ Gava ser ç'iyayê Zeytûnê ew rûniştibû, şagirtên wî t'enê hatine cem û jê pirsîn: «Bêje me, ev tişt wê çiçax bibin? Û nîşana hatina te û axirîya vê dinyayê wê çi be?» ⁴ Îsa caba wan da, got: «Miqatî xwe bin, ku t'u kes we nexapîne, ⁵ çimkî gelek wê bi navê min bên û bêjin: <Ez im Mesîh> û wê gelean bixalifînin. ⁶ Hûnê deng û be'sê şer'an bibihên, lê miqatî xwe bin, xwe unda nekin. Gereke ev tişt bibin, lê ew hê ne axirî ye. ⁷ Miletê rabe li ser milet, p'adşatî li ser p'adşatîyê, cî-cîyan xelayî, nexaşîya mirinê û erdhej wê bibin. ⁸ Lê ev hemû mîna êşa k'ulfetê ye, ku destpê dike lê digire. ⁹ Hingê wê we bidine te'lî-tengîyê, we bikujin û bona navê min hûnê ber ç'evên her miletan reş bin. ¹⁰ Hingê gelek wê ji rê bik'evin, wê nemamîya hevdu bikin û ber ç'evê hev reş bin. ¹¹ Gelek p'êxemberên derew wê derk'evin û gelean bixalifînin. ¹² Ji dest zêdebûna neheqîyê hizkirina gelean wê sar be. ¹³ Lê k'î heta axirîyê teyax ke, ewê rizgar be. ¹⁴ Û ev Mizgînîya P'adşatîyê wê li nava t'emamîya dinyayêda bê dannaşînkirinê, ku her miletanr'a bibe şehdetî û hingê axirî wê bê.

¹⁵ Çaxê hûn Heramîya Wêrankirinê[†] li cîyê pîroz cîgirtî bibînin, çawa ku Danîyêl p'êxember got, (yê bixûne bira bira fem bike), ¹⁶ hingê ewên ku Cihûstanêda ne bira birevine ç'îyan. ¹⁷ Yê ser xanî ye, bira danek'eve, ku ji malê tişteki hilde. ¹⁸ Û ewê ku li k'ewşên e, bira venegere ku p'otê xwe hilde. ¹⁹ Lê li wan rojanda wey li hemlan û destdergûşan! ²⁰ Dua bikin, ku reva we nek'eve zivistanê yan jî roja şemîyê. ²¹ Çimkî hingê tengasîke usa mezin wê bibe, ku ji destpêbûna dinyayêda heta niha mîna wê nebûye û ne jî wê bibe. ²² Heger ew roj kin nebûna, t'u bedenê rizgar nebûya, lê boy xatirê hilbijartîyan ew roj wê kin bin.

²³ Hingê, heger yek wer'a bêje: <Va ye Mesîh vir e> yan <Wa ye wir e>, bawer nekin. ²⁴ Çimkî mesîh û p'êxemberên derew wê derên, nîşan û k'iryametên mezin bikin, ku bikaribin hilbijartîyên *Xwedê* jî bixalifînin. ²⁵ Va ye min hê pêşda wer'a got. ²⁶ Heger wer'a bêjin: <Va ye Mesîh ber'iyêda ye>, dernek'evin, yan: <Wa ye, ew wê odêda ye>, bawer nekin. ²⁷ Çimkî çawa birûsk ji rohilatê birq dide û heta roavayê k'ifş dibe, wê hatina Kur'ê Meriv jî bi wî awayî be. ²⁸ «Li k'u cendekên mirî hebin, teyrê jî li wir t'op bin».

²⁹ Li pey tengasîya wan rojanr'a, rûyê te'vê wê bê girtinê û hîvê jî ronaya xwe nede, steyrk wê ji ezmên bik'evin û t'opên ezmanan wê ji rîyên xwe derk'evin.[‡] ³⁰ Hingê nîşana Kur'ê Meriv wê li ezmên k'ifş be û her miletên dinyayê wê şîne bikin, çaxê bibînin Kur'ê Meriv li ser e'wrên ezmên bi qewat û rûmeta mezin tê. ³¹ Ewê milyak'etên xwe bi dengê bor'iyane bilind bişîne û hilbijartîyên wî wê ji her çar qulban bicivînin~ ji p'er'ekî ezmên heta p'er'ê din.

³² Ji dara hêjîrê dersekê hîn bin. Çaxê çiqilên wê ter' dibin û belgên wê dibişkivin, îdî hûn zanin, ku havîn nêzîk e. ³³ Usa jî çaxê hûn van her tiştan bibînin, bizanibin ku ev tişt nêzîk e, li ber şemîkê ye. ³⁴ Ez rast dibêjime we, eva nisila derbaz nabe, heta ku ev hemû tişt nebin. ³⁵ Erd û ezmanê derbaz bin, lê gotinên min t'u car derbaz nabin.

ROJ Û SIHET VEŞARTÎ NE
(Marqos 13:32-37; Lûqa 17:26-30, 34-36)

³⁶ Lê bona wê rojê û wê sihetê t'u kes nizane, ne jî milyak'etên ezmanan lê t'enê bav.[§] ³⁷ Çawa ku li rojên Nuhda Nuhda bûn, li *dema* hatina Kur'ê Merivda jî wê usa bibin. ³⁸ Çawa ku wan rojên berî tofanêda merivan dixwarin, vedixwarin, dizewicîn û mêr dikirin, heta wê roja ku Nuh k'ete gemîyê ³⁹ û meriv pê nehesîyan, heta ku lîyî rabû û hemû jî xeniqandin. Li *dema* hatina Kur'ê Merivda jî wê usa be. ⁴⁰ Hingê du meriv wê li nav erdê xweda bin, yekê bê hildanê û yê din bê hiştinê. ⁴¹ Û du k'ulfet wê li ser k'arê destarekî bin, yekê bê hildanê, ya din bê hiştinê. ⁴² Awa hişyar bimînin, çimkî hûn nizanin Xudanê weyê k'îjan rojê bê. ⁴³ Lê vê yekê bizanibin, heger xweyê malê bizanibûya, ku k'îjan dema şevêda dizê bihata, wê hişyar bima û nehišta, ku mala wî derevekira. ⁴⁴ Lema, hûn jî hazir bin, çimkî Kur'ê Meriv wê siheteke usada bê, ku hûn ne ç'evnihêrî ne.

XULAMÊ AMIN Û YÊ BÊAMIN
(Lûqa 12:35-48)

⁴⁵ Awa k'î ye ew xulamê amin û serwaxt, ku axayê wî ew ser xulamên xwe k'ifş kir, ku xwarina wan waxtda

* 23:39 Zebûr 118:26.

† 24:15 Danîyêl 9:27; 11:31; 12:11.

‡ 24:29 Îşaya 13:10; 34:4.

§ 24:36 Destnivîsarên hinekanda «ne jî Kur'» heye.

bide wan? ⁴⁶ Xwezî li wî xulamî, ku gava axayê wî bê, wî usa bibîne. ⁴⁷ Ez rast dibêjime we, ewê wî dayne ser t'emamîya hebûka xwe. ⁴⁸ Lê heger xulamê xirab dilê xweda bêje: <Axayê min hatina xwe derengî êxist> ⁴⁹ û destpê ke xulam-hevalên xwe xe û t'evî yên pey îçkê bixwe û vexwe, ⁵⁰ axayê wî xulamî wê rojeke usada bê, ku ewê ne hîvîyê be û siheteke usada, ku ewê nizanibe. ⁵¹ Ewê xulêm qet-qetî ke û p'ara wî wê t'evî durûyan ke. Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka diranan.

MESELA DEHE QÎZÊN BIK'IR

25 ¹ Hingê P'adşatîya Ezmanan wê mîna vê yekê be: Dehe qîzên bik'ir ç'irayên xwe hildan pêşîya zavêda çûn. ² Ji wan pênc serwaxt bûn, lê pênc bêfem. ³ Bêfeman ç'irayên xwe hildan, lê rûn xwer'a hilnedan, ⁴ lê serwaxtan bi t'evî ç'irê rûn jî derdananda xwer'a hildan. ⁵ Çaxê zava derengî k'et, hemû jî hênijîn û k'etine xewê. ⁶ Nîvê şevê dengê hat: <Va ye zava tê! Pêşîya wîda her'in>! ⁷ Hingê hemû bik'ir rabûn ç'irayên xwe saz kirin. ⁸ Bêfeman gote serwaxtan: <Ji wî rûnê xwe bidine me jî, çimkî ç'irayên me vêdisin>. ⁹ Lê serwaxtan li wan veğerand got: <Na, belkî ev rûn t'êra me û we neke. Baş e, ku hûn her'ine cem ewên ku difroşin xwer'a bik'ir'in>. ¹⁰ Ê dema ew çûn bik'ir'in, zava hat û ewên hazir bi wîr'a k'etine dewatê û derî hate girtinê. ¹¹ Paşê bik'irên dîn jî hatin û gotin: <Xudan, Xudan! Derî li me veke>! ¹² Lê wî caba wan da got: <Ez rast dibêjime we, ez we nas nakim>. ¹³ Awa hişyar bimînin, çimkî hûn ne roja hatina Kur'ê Meriv dizanin, ne jî sihetê.

MESELA SÊ XULAMAN

¹⁴ Hingê P'adşatîya Ezmanan wê mîna vê yekê be: Merivek wê derk'eta rêwîtyê, wî gazî xulamên xwe kir, hebûka xwe sparte wan. ¹⁵ Pênc telant dane yekî, dudu dane yekî û telantek jî da yekî~ her kesîr'a weke qewata wî û zû rêk'et çû. ¹⁶ Yê pênc telant standibûn, zû çû bi wan xebitî û pêncên din jî *serda* qazinc kirin. ¹⁷ Usa jî, yê ku du telant standibûn, duduyên din jî qazinc kirin. ¹⁸ Lê ewî ku telantek standibû, çû erd k'ola û zîvê axayê xwe têda veşart. ¹⁹ Pey gelek waxtr'a axayê wan xulaman hat û xast hesabê xwe t'evî wan bike. ²⁰ Yê ku pênc telant standibûn pêşda hat, pênc telantên din jî anîn û got: <Axayê min, te pênc telant dabûne min. Min ser wanda pêncên din jî qazinc kirin>. ²¹ Axayê wî gotê: <Eferim, xulamê baş û amin! Tu nava tiştên hindikda amin mayî, ezê te daynime ser gelek tiştan. Bik'eve şayîya axayê xwe>!

²² Yê ku du telant standibûn, ew jî hat û got: <Ez xulam! Te du telant dabûne min. Min duduyên din jî li ser wanda qazinc kirin>. ²³ Axayê wî gotê: <Eferim, xulamê baş û amin! Tu nav tiştên hindikda amin mayî, ezê te daynime ser gelek tiştan. Bik'eve şayîya axayê xwe>!

²⁴ Lê yê telantek standibû hat û got: <Axayê min, min dizanibû, ku tu merivekî sert î. Ji wê dera te neçandye didirûyî û ji dera te ne reşandye t'op dikî. ²⁵ Ez jî tirsyam çûm min telantê te erdêda veşart. Hanê, ya te ter'a>. ²⁶ Axayê wî lê veğerand got: <Xulamê xirab û xwer'anedîtî! Te dizanibû, ku ez ji wê dera ku min neçandye didirûm û ji wê dera ku min nereşandye t'op dikim, ²⁷ çima te zîvê min neda serafan, ku ez bihatama min telantê xwe bi qazincêva bîstanda? ²⁸ Niha wî telantî jê bistînin û bidine wî deh telantên k'ê hene. ²⁹ Çimkî yê k'ê ku heye, wîr'a wê bê dayîne û serda wê zêde be, lê yê k'ê ku t'une, çî wî jî heye wê jê bê standinê. ³⁰ Lê ew xulamê bêkêr bavêjine tarîya derva. Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka diranan>.

MESELA PÊZ Û BIZINAN

³¹ Dema ku Kur'ê Meriv bi rûmeta xweva t'evî hemû milyak'etan bê, hingê wê li ser k'ursîya xweye rûmetê rûnê ³² her millet jî wê li ber hizûra wî bicivin. Ewê wan ji hev başqe ke, çawa şivan pêz ji bizinan vediqetîne. ³³ Ewê pêz li alîyê xweyî rastê bide sekinandinê, lê bizinan li alîyê ç'epê. ³⁴ Hingê P'adşa wê yên li alîyê xweyî rastêr'a bêje: <Werin, dirozgelêbûyên Bavê min! Ê wê P'adşatîyê war bin, ya ku bona we ji dema efirandina dinyayêda hazir bûye. ³⁵ Çimkî ez birçî bûm we xurek da min, t'î bûm we av da min, xerîb bûm, we ez qebûl kirim, ³⁶ tazî bûm, we ez k'inc kirim, nexaş bûm, hûn ser minda hatin, hebsêda bûm, hûn hatine dîtina min>. ³⁷ Hingê yên rast wê wîr'a bêjin: <Xudan, me çîçax tu birçî dîtî û xurek daye te? yan me tu t'î dîtî û av daye te? ³⁸ Me çîçax tu xerîb dîtî û tu qebûl kirî yan jî tu tazî dîtî û tu k'inc kirî? ³⁹ Çîçax me tu nexaş yan hebsêda dîtî û em hatine dîtina te?> ⁴⁰ P'adşa jî wê bêje wan: <Ez rast dibêjime we, heger we qencî bona ji van birakî minî herî biç'ûk kir, we bona min kir>.

⁴¹ Hingê ewê yên alîyê ç'epêr'a bêje: <Nifirlêbûyîno! Dûrî min k'evin, her'ine nava agirê heta-ha-tê, ku bona Şeytan û milyak'etên wî hazir bûye. ⁴² Çimkî ez birçî bûm, we xurek neda min, t'î bûm, we av neda min, ⁴³ xerîb bûm, we ez qebûl nekirim, tazî bûm, we ez k'inc nekirim, nexaş û hebsêda bûm, hûn li ser minda nehatin>. ⁴⁴ Hingê ewana wê wîr'a bêjin: <Xudan! Me çîçax tu birçî yan t'î yan xerîb yan tazî yan nexaş yan hebsêda dîtî û me alîk'arî neda te?>

⁴⁵ Hingê ewê caba wan bide û bêje: <Ez rast dibêjime we, heger we qencî bona yekî ji evên herî biç'ûk nekir, we bona min jî nekir>. ⁴⁶ Ê ewana wê her'ine nava cizareta heta-ha-tê, lê yên rast wê her'ine nava jîyîna heta-ha-tê>.

ŞÛWRA KUŞTINA ÎSA

(Marqos 14:1-2; Lûqa 22:1-2; Yûhenna 11:45-53)

26 ¹ Gava Îsa ev hemû xeber xilaz kirin, şagirtên xwer'a got: ² «Hûn dizanin, ku du rojan şûnda wê Cejina Derbazbûnê be û Kur'ê Meriv xaçkirinêr'a wê bê dayîne».

Metta 26

³ Hingê serokên k'ahînan û rûspîyên cimetê li seraya serokk'ahînda, ku navê wî Qeyafa bû, civyan ⁴ û li hev şewrîn, ku Îsa dizîva bi fêlbazîyê bigirin, bikujin. ⁵ Lê wan digot: «Bira ev yek cejinêda nebe, ku cimet ranebe miqabilî me».

ÎSA BEYTANYAYÊDA TÊ GULRÛNKIRINÊ
(Marqos 14:3-9; Yûhenna 12:1-8)

⁶ Çaxê Îsa li Beytanyayê mala Şimhûnê k'otîda bû, ⁷ k'ulfetek, ku derdanek rûnê wêye bînxaş hebû û ew derdan ji alabastirê bû, ew hate cem Îsa û gava ew li ser sifrê rûniştibû, rûn ser serê wîda kir. ⁸ Gava şagirtan eva yeka dît, li wan xaş nehat û gotinê: «Çima ev zîyan bû? ⁹ Eva rûna dikaribû bi bahakî giran bihata firotanê û feqîran'a bihata belakirinê».

¹⁰ Lê Îsa vê yekê hesya û gote wan: «Çima hûn xatirê wê k'ulfetê dik'evin? Ewê tiştêkî qenc bona min kir. ¹¹ Feqîr wê her t'im wer'a hebin, lê ezê her t'im ne t'evî we bim. ¹² Ewê bona danîna mine li t'irbê ew rûn rête ser bedena min. ¹³ Ez rast dibêjime we, dinyayêda li k'u eva Mizgînîya bê dannasînkirinê, wê kirina vê k'ulfetê jî bona bîranîna wê bê gotinê».

CIHÛDA NEMAMÎYA ÎSA DIKE
(Marqos 14:10-11; Lûqa 22:3-6)

¹⁴ Hingê yekî ji her donzdehan, ku Cihûdayê Îsxeryotî dihate gotinê, çû cem serokên k'ahînan ¹⁵ û got: «Hûn çi bidîne min, ku ez wî bidime destê we»? Û wana sî zîv wîr'a soz dan. ¹⁶ Ji wir şûnda ew mecalekê diger'ya, ku çawa Îsa bide destê wan.

ŞÎVA CEJINA DERBAZBÛNÊ Û ŞÎVA XUDAN
(Marqos 14:12-26; Lûqa 22:7-23; Yûhenna 13:21-30; 1 Korintî 11:23-25)

¹⁷ Li roja pêşin, ya Cejina Nanê Şkeva, şagirt hatine cem Îsa û jêr'a gotin: «Tu li k'u dixazî Şîva Cejina Derbazbûnê bixwî, ku em bona te hazir bikin»? ¹⁸ Ewî jî got: «Her'ine bajêr, cem filan merivî û bêjine wî: <Dersdar dibêje: Roja min nêzîk e. Ezê Cejina Derbazbûnê şagirtên xweva t'evayî mala teda derbaz kim>». ¹⁹ Û şagirtan usa kir, çawa ku Îsa ferman dabû wan û Şîva Cejina Derbazbûnê hazir kirin.

²⁰ Êvarê ew t'evî her donzdehan ser sifrê rûnişt. ²¹ Gava wana hê dixwar, Îsa got: «Ez rast dibêjime we, yekî ji nava we wê nemamîya min bike». ²² Şagirt gelekî ber xwe k'etin û ji wan her kesî gotê: «Xudan, xa ne ez im»? ²³ Ewî li wan veğerand got: «Ewê ku parîyê xwe t'evî min t'asêda kir, ewê nemamîya min bike. ²⁴ Hemî Kur'ê Meriv wê usa her'e, çawa ku bona wî hatye nivîsarê, lê wey li wî, k'î nemamîya Kur'ê Meriv bike! Wîr'a hê qenc bû, ku ew qet dinê nek'eta». ²⁵ Cihûdayê ku wê nemamîya wî bikira, lê veğerand got: «Dersdar, xa ne ez im»? Îsa wîr'a got: «Te bi zarê xwe got».

²⁶ Û hê wana nan dixwar, Îsa nan hilda şikirî da, ker kir da şagirtan û got: «Hanên, hildin bixwin. Eva bedena min e». ²⁷ Peyr'a k'as hilda şikirî da û da wan got: «Hûn hemû jî ji vê vexwin, ²⁸ eva xûna min e, bona Peymana nû, ku bona baxşandina gunehên gelekên tê rêtinê. ²⁹ Lê ez dibêjime we, îdî ez ji vir hada jî berê vê mêmê venaxwim, heta wê roja ku ezê t'evî we P'adşatîya Bavê xweda ji ya nû vexwim». ³⁰ Paşê wana zebûrek stira, derk'etin çûne ç'iyayê Zeytûnê.

ÎSA DERHEQA ÎNK'ARÎYA PETRÛSDA DIBÊJE
(Marqos 14:27-31; Lûqa 22:31-34; Yûhenna 13:36-38)

³¹ Hingê Îsa gote wan: «Îşev hûn hemûyên jî ji min p'îşk bin her'in, çimkî nivîsar e: <Ezê li şivên xim û pez jî wê bela-belayî bin>». ³² Lê çaxê ez ji mirinê zêndî bim, ezê berî we her'ime Celîlê». ³³ Petrûs lê veğerand got: «Heger hemû jî ji te p'îşk bin dîr k'evin, lê ez qet ji te naçim». ³⁴ Îsa gote wî: «Ez rast dibêjime te, hema îşev, hê berî bangdana dîk, tuê sê caran min înk'ar kî». ³⁵ Petrûs gotê: «Heger dem bê, ezê bi ter'a bimirim jî, lê qet te înk'ar nakim». Hemû şagirtan jî usa digotin.

ÎSA LI GÊTŞEMANÎYÊ DUA DIKE
(Marqos 14:32-42; Lûqa 22:39-46)

³⁶ Hingê Îsa wanr'a t'evayî çû cîkî ku jêr'a Gêtşemanî dibêjin û şagirtanr'a got: «Li vir rûnên, heta ez her'im dera han dua bikim». ³⁷ Wî Petrûs û her du kur'ên Zebedî xwer'a hildan, k'eser hatê, ber xwe k'et. ³⁸ Hingê gote wan: «Dilê min haqas derd û k'eder e, mîna ber mirinê. Vir bimînin û t'evî min hişyar bin». ³⁹ Hinekî pêşda çû deverû xwe avît dua kir û got: «Bavo! Heger dibe, bira eva k'asa ji min derbaz be, lê ne ku xastina min be, lê bira ya te be».

⁴⁰ Paşê hate cem şagirtan, ew razayî dîtin û gote Petrûs: «We nikaribû sihetekê t'evî min hişyar bimana? ⁴¹ Hişyar bimînin û dua bikin, ku hûn nek'evine nava cêribandinê. Belê, ruh razî ye, lê beden sist e».

⁴² Careke din Îsa dîsa çû dua kir û got: «Bavo! Heger, heta ku ez vê k'asê venexwim, nabe ku ew ji min derbaz be, bira daxaza te be». ⁴³ Û Îsa hat, ew dîsa xewêda dîtin, ç'evên wan ji xewê venedibûn. ⁴⁴ Û ew hiştin çû, cara sisyan dua kir, dîsa ew xeber gotin.

* 26:31 Zekerîya 13:7.

⁴⁵ Hingê hate cem şagirtan û gote wan: «Hûn hela hê razayî ne û rihet dibin? Waxt pêr'a gihîşt, ku Kur'ê Meriv bik'êve destê gunehk'aran. ⁴⁶ Rabin em her'in. Va ye, ewê ku nemamîya min dike nêzik bû».

BENDKIRINA ÎSA

(Marqos 14:43-50, 53-65; Lûqa 22:47-55 63-71; Yûhenna 18:3-14, 19-24)

⁴⁷ Ewî hê xeber dida, Cihûdayê ku yek ji wan her donzdehan bû hat. Wî ji aliyê serokên k'ahînan û rûspîyên cimêtêda k'omeke merivane giran xwer'a anîbû, bi daran û şûran. ⁴⁸ Nemamê wî eşaret dabû wan û gotibû: «Ez her'ime rûyê k'ê, ew e, wî bigirin».

⁴⁹ Hingê Cihûda nêzikî Îsa bû û got: «Silav li te, dersdar!» û çû rûyê wî. ⁵⁰ Îsa gote wî: «Heval, tuê çi bikî zû bike!» Hingê ew pêşda hatin, dest avîtine Îsa û ew girtin. ⁵¹ Yekî ji ewên ku t'evî Îsa bû, rabû şûrê xwe k'işand li xulamê serokk'ahîn xist û guhê wî pekand. ⁵² Wê gavê Îsa gote wî: «Şûrê xwe bike cî. K'î şûr hilde, ewê bi şûr her'e. ⁵³ Te t'irê ez nikarim ji Bavê xwe bixazim, ku pêr'a-pêr'a ji donzdeh ordîyan zêdetir milyak'etan bigihîne min? ⁵⁴ Lê nivîsar wê çawa bêne sêrî, ku dibêjin, gerekê *her tişt* aha bin?»

⁵⁵ Wê gavê Îsa gote wê k'oma merivan: «Qey bêjî, hûn derk'etine ku yekî t'alank'ar bigirin, ku bi daran û şûran hatine min bigirin? Ê ne ez her roj t'evî we p'aristxanêda rûdiniştim û min hûn hîn dikirin, lê we ez nedigirtim. ⁵⁶ Lê ev her tişt bûn, ku nivîsarên p'êxemberan bêne sêrî». Wê demê hemû şagirtan ew hişt û revîn. ⁵⁷ Lê yên ku Îsa girtin, ew birine cem Qeyafayê serokk'ahîn, k'u qanûnzana û rûspî civyabûn. ⁵⁸ Petrûs jî ji dûrva heta hewşa serokk'ahîn, p'ê-p'ê pey wî çû k'ete hindur û li nav xizmetk'aran rûnişt, ku bizanibe axirî wê çawa be. ⁵⁹ Serokên k'ahînan û t'emamîya civîna giregiran jî şehdetîke derew miqabilî Îsa diger'yan, ku wî bikujin, ⁶⁰ lê nedîtin. Gelek şehdeyên derew jî hatin, dîsa manîk nedîtin. Paşê du şehdeyên derew pêşda hatin ⁶¹ û gotin: «Evî got: <Ez p'aristxana Xwedê dikarim hilşînim û nava sê rojanda wê dîsa çê kim>».

⁶² Serokk'ahîn rabû ser p'îyan û gote wî: «Bona van şehdetiyên ku evana miqabilî te didin tu çima cabekê nadi?» ⁶³ Lê Îsa dengê xwe nekir. Serokk'ahîn dîsa gote wî: «Ez te bi Xwedêyê zêndî didime sondê. Mer'a bêje, tu yî Mesîh, Kur'ê Xwedê?» ⁶⁴ Îsa gotê: «Te bi zarê xwe got. Lê ez dibêjime we, hûnê ji vir hada Kur'ê Meriv li cem Yê Zor, li aliyê *wîyî* rastê rûniştî û li ser e'wrên ezmênva tê bibînin».

⁶⁵ Hingê serokk'ahîn k'incên xwe qelaştin û got: «Evî k'ifirî kir! Îdî şehde çî mer'a ne? Va ye we niha k'ifiriyê wî bihîst? ⁶⁶ Weva çawa k'ifş dibe?» Wana jî lê vegerand got: «Wîr'a dik'êve, ku bikujin».

⁶⁷ Hingê t'û rûyê wî kirin û bi k'ulman lêdan, hinekan jî şemaq lê didan ⁶⁸ û digotinê: «Mesîh, mer'a p'êxembertiyê bike, k'a k'î bû, ku te xist?»

PETRÛS ÎSA ÎNK'AR DIKE

(Marqos 14:66-72; Lûqa 22:56-62; Yûhenna 18:15-18, 25-27)

⁶⁹ Hingê Petrûs derva li hewşêda rûniştibû. Carîk hate cem wî û got:

«Tu jî t'evî Îsayê Celîlê bûyî». ⁷⁰ Lê ewî li ber hemûyan înk'ar kir got: «Ez nizanim tu çî dibêjî».

⁷¹ Gava ew çû ber dergê, yeke din ew dît û gote yên li wir hizûr: «Evî han jî t'evî Îsayê Nisretê bû». ⁷² Wî dîsa bi sond înk'ar kir got: «Ez wî merivî nas nakim». ⁷³ Demekê şûnda jî merivên wir çûne cem Petrûs û gotinê: «Bi rastî jî tu ji wan î, çimkî zaravê te jî te difiroşe». ⁷⁴ Hingê wî da nifiran, sond xwar got: «Ez wî merivî nas nakim». *Hema* wê gavê dîk bang da ⁷⁵ û Petrûs ew gotina Îsa bîr anî, ku gotibûyê: «Berî bangdana dîk, tuê sê caran min înk'ar kî». Ew derk'ete derva û k'ele-k'el girîya.

PÎLATO Û DÎWANA KUŞTINA ÎSA

(Marqos 15:1-20; Lûqa 23:1-5,13-25; Yûhenna 18:28-39-19:2,3,16)

27 ¹ Çaxê sibeh ron bû, t'evayîya serokên k'ahînan û rûspîyên cimêtê li hev şewrîn, ku Îsa çawa bidine kuştinê.

² *Ben anîn* ew girêdan, birin dane destê Pîlatoyê welî.

³ Hingê Cihûdayê ku nemamîya wî kir, dît ku Îsa hate bendkirinê, p'oşman bû, çû ew sî zîv vegerande serokên k'ahînan û rûspîyan ⁴ û got: «Min guneh kir. Ez bûme bayîsê xûna bêşûc». Wana jî gotê: «Mer'a çî? Tu zanî». ⁵ Ewî jî ew zîv avîtine nav p'aristxanê, derk'et çû xwe dardakir.

⁶ Serokên k'ahînan zîv hildan û gotin: «Ne rast e, ku em van t'evî xezna p'aristxanê kin, çimkî ew maşê xûnê ye». ⁷ Hingê ew li hev şewrîn û bi wan zîvan erdê Axînker k'ir'în, bona gor'ên xerîban. ⁸ Lema ew erd heta îro jî «Erdê Xûnê» tê gotinê. ⁹ Hingê ew gotina bi zarê Yêremîya p'êxember hate sêrî: «Sî zîv bahê wê dan, weke wî bahê ku lawên Îsraêlê qayl bûn ¹⁰ û ew dane erdê Axînker, çawa ku Xudan ferman da min».*

¹¹ Îsa ber welî sekinî, welî ji wî pirsî û got: «Tu yî P'adşayê cihûyan?» Îsa gote wî: «Te bi zarê xwe got». ¹² Lê gava serokên k'ahînan û rûspîyan ew gunehk'ar dikirin, ewî qet caba t'u kesî neda. ¹³ Hingê Pîlato gote wî: «Tu nabihêyî çiqas şikyatê te dîkin?» ¹⁴ Ewî dîsa caba t'u kesî neda, heta ku welî jî şaş ma.

¹⁵ Xeysetê welî bû, ku cejinêda bi xastina k'oma merivan girtîkî ji hebsê wanr'a berda. ¹⁶ Hingê girtîkî hebsêyî k'ifş hebû, navê wî Barabas. ¹⁷ Gava ew civyan, Pîlato wanr'a got: «Hûn k'îjanî dixazin ez bona we ber'dim~ Barabas yan Îsayê ku Mesîh tê gotinê?» ¹⁸ Ewî dizanibû, ku ji hevsûdîyê Îsa dabûne destê wî.

* 27:10 Zekerîya 11:12-13; Yêremîya 32:6-9.

¹⁹ Çaxê ew li herema dîwanê rûniştibû, jina wî cab serda şand got: «K'arê te ewî bêstûc nek'eteye, çimkî îşev xewnêda bona wî gelek tişt hate serê min». ²⁰ Lê serokên k'ahînan û rûspîyan k'oma merivan razî kir, ku Barabas bixazin û Îsa unda bikin. ²¹ Welî dîsa gote wan: «Hûn ji van her duyan k'îjanî dixazin, ku ez wer'a ber'dim»? Wana jî lê veğerand: «Barabas!» ²² Pîlato gote wan: «Lê ez Îsayê ku jêr'a Mesîh dibêjin çawa bikim»? Hemûyan jî got: «Bira bê xaçkirinê!» ²³ Welî got: «Evî çi xirabî kirye»? Hingê wana dengê xwe hê bilind kirin û gotin: «Bira bê xaçkirinê!» ²⁴ Pîlato jî dît, ku t'u tişt alîk'arîyê nade, lê hê şer' û de'w destpê dibe, av hilda li ber hizûra k'oma merivan destên xwe şuştin û got: «Ez ji xûna vî bêstûc im. Hûn xwexa binihêrin». ²⁵ Û t'emamîya cimetê caba wî da got: «Bira xûna wî li ser me û lawên me be!» ²⁶ Hingê Pîlato Barabas wanr'a berda, lê Îsa da ber qamçîyan û da destê wan, ku bê xaçkirinê.

²⁷ Hingê eskerên welî Îsa birine hindurê rewşxana *welî* û t'emamîya refa *eskeran* ser wî civya. ²⁸ K'inc jê şiqitqndin û çuxekî sorê-gevez lê kirin. ²⁹ Paşê t'acgulîk ji stirîyan vegirtin dane sêrî û qamîşek jî dane destê wîyî rastê. Hingê li ber wî çok dan, qerfê xwe wî kirin û gotin: «Xaş be, P'adşayê Cihûyan!» ³⁰ T'ûyî wî kirin, qamîş hildan sêrî xistin. ³¹ Pey qerfkirinêr'a çuxê sor jê êxistin û k'incên wî lê kirin û ew dane pêşîya xwe birin, ku xaç bikin.

XAÇKIRIN, MIRIN Û GOR'ÊDA DANÎNA ÎSA
(Marqos 15:21-47; Lûqa 23:26-56; Yûhenna 19:17-30, 38-42)

³² Gava ew derk'etine derva, eskeran yekî ji Kûrênê dît, navê wî Şimhûn, p'êyî ser kirin, ku xaçê Îsa hilde. ³³ Ew gihîştine wê dera ku jêr'a Golgota digotin, ku tê femkirinê: «Cîyê Qafê *mirîyan*». ³⁴ Şerab, zirav t'evkirî, danê ku vexwe. Lê gava wî te'm kir, nexast vexwe.

³⁵ Ew xaç kirin, ser k'incên wî p'eşk avitin û li nav hevda bela kirin. ³⁶ Paşê li wir rûniştin, nobedarî li wî kirin.

³⁷ Neheqîya wî nivîsîn danîn fêza serê wî: «Ev Îsa, P'adşayê Cihûyan e».

³⁸ Hingê du t'alank'ar jî bi wîr'a hatine xaçkirinê, yek li alîyê rastê û yê din jî li alîyê ç'epê. ³⁹ Ewên ku wirr'a derbaz dibûn ew bêhurmet dikirin, serê xwe dihejandin ⁴⁰ û digotinê: «Ne teyê p'aristxane hilşanda û sê rojanda çê kira? De xwe rizgar ke, heger tu Kur'ê Xwedê yî! Ji xaç were xwarê!» ⁴¹ Usa jî serokên k'ahînan, qanûnzanan û rûspîyan t'evayî qerfê xwe wî dikirin û digotin: ⁴² «Xelq rizgar kir, lê nikare xwe rizgar bike! Gelo ev ne P'adşayê Îsraêlê ye? De bira niha ji xaç bê xwarê û emê bawerîya xwe wî bînin. ⁴³ Gumana xwe danî ser Xwedê, de bira niha wî rizgar bike, heger *Xwedê* jê razî ye, çimkî digot: «Ez Kur'ê Xwedê me»». ⁴⁴ T'alank'arên bi wîr'a hatine xaçkirinê jî usa ew bêhurmet dikirin.

⁴⁵ Nîvro, ji siheta donzdehan heta siheta sisyan t'emamîya erdê bû tarî. ⁴⁶ Nêzîkî siheta sisyan Îsa bi dengê bilind kire qîr'în û got: «Êlî, Êlî, lama sabaxtanî»? Ku tê femkirinê: «Xwedêyê min, Xwedêyê min, te çima ez ber'dam»? ⁴⁷ Ewên nêzîk sekinî, gava ev xeber bihistin, gotin: «Ew gazî Êlyas dike». ⁴⁸ Yekî jî wan lez bezî, kevzê hilda sirkêda kir, qamîşek pêva danî û da wî, ku vexwe. ⁴⁹ Lê hinekên din gotin: «Bisekine. Em binihêrin, k'a Êlyasê bê wî rizgar ke?»

⁵⁰ Îsa dîsa bi dengê bilind kire gazî û ruhê xwe da. ⁵¹ Hingê p'erda p'aristxanê ji serî heta binî qelişî, bû du tîşan. Erd hejya, kevir qelişîn, ⁵² t'irb vebûn û gelek qalibên mirîyên buhurtî zêndî bûn~ ⁵³ Ew jî t'irban, pey zêndîbûna Îsar'a derk'etin û çûne Bajarê pîroz û gelean ew dîtin.

⁵⁴ Gava sersed û yên pêr'a ku nobedarî Îsa dikirin, erdhej û her tiştên bûyî dîtin, saw û tirsê ew girtin û gotin: «Rastî jî ev Kur'ê Xwedê bû!»

⁵⁵ Li wir gelek k'ulfet jî hebûn, ku ji dûrva dinihêrin. Ew ji Celîlê bona xizmetkirinê li pey Îsa hatibûn~ ⁵⁶ Meryema Mejdelaî, Meryema dîya Aqûb û Ûsiv û dîya her du kur'ên Zebedî jî li nava wanda bû.

⁵⁷ Berî êvarê merivekî dewlemendî ji Arîmetayê, navê wî Ûsiv, hat. Ew jî yek ji şagirtên Îsa bû. ⁵⁸ Ew çû cem Pîlato û cinyazê Îsa ji wî xast. Wê gavê Pîlato ferman da, ku cinyaz bê dayîne. ⁵⁹ Ûsiv cinyaz hilda, qedekê k'itanîyî paqijda k'efen kir ⁶⁰ û li t'irba nûda danî, ku bona xwe qeyakêda k'olabû. Paşê ewî kevirê mezî holî ber derê t'irbê kir û çû. ⁶¹ Meryema Mejdelaî û Meryema din li wê derê bûn û pêşberî t'irbê rûniştibûn.

NOBEDARÊN T'IRBÊ

⁶² Roja din, ku pey înyêr'a^s ye, serokên k'ahînan û fêrisîyan civyane cem Pîlato, ⁶³ gotin: «Em xulam, bîra meda meda ye, ku ewî derewîn çaxê hê zêndî bû digot: «Ezê roja sisyan ji mirinê zêndî bim». ⁶⁴ Niha fermanê bide, ku heta roja sisyan miqatî t'irbê bin, nebe ku şagirtên wî bèn wî bidizin û cimetêr'a bêjin: «Ew ji mirinê zêndî bûye». Û xalifandina paşin ji ya pêşin xirabtir be». ⁶⁵ Pîlato wanr'a got: «Va ne, wer'a eskerên nobedar. Her'in, çawa hûn dizanin usa jî miqatîyê t'irbê bikin». ⁶⁶ Ew jî çûn miqatî li t'irbê kirin~ kevir mor kirin û eskerên nobedar li ber danîn.

^{*} 27:35 Destnivîsarên axirîyêda ev jî heye: «Ku gotina p'êxember bê sêrî: «K'incên min hev bela kirin û ser çuxê min p'eşk avitin»» (Zebûr 22:18).

[†] 27:46 Zebûr 22:1.

[‡] 27:48 lûfika ku avêda şîn dibe.

[§] 27:62 Fikira xebera «înî» bi zimanê îbranî ev e: «t'ivdarekdîtin.»

Metta 28

ÎSA JI MIRINÊ ZÊNDÎ DIBE

(Marqos 16:1-8; Lûqa 24:1-12; Yûhenna 20:1-10)

28 ¹ Pey şemîyêr'a~ roja yekşemê, serê sibehê zû Meryema Mejdolanî û Meryema din hatin, ku t'irba wî binihêrin. ² Nişkêva erd qayîm hejya, çimkî milyak'etekî Xudan ji ezmên hate xwarê, kevir ji ber t'irbê wêda kir û li ser rûnişt. ³ Dîndara wî mîna birûskê bû, k'incên wî jî mîna berfê sipî bûn. ⁴ Nobedar ji tirsra wî t'evîhev bûn û bûne mîna mirîyan. ⁵ Milyak'et wan k'ulfetanr'a got: «Netirsin! Ez dizanim, ku hûn wî Îsayî diger'in, yê ku hate xaçkirinê. ⁶ Ew ne li vir e, çimkî ji mirinê zêndî bûye, çawa ku wî gotibû. Werin wî cîyê ku ew lê hate danînê binihêrin. ⁷ Zû her'in şagirtên wîr'a bêjin: <Ew ji mirinê zêndî bûye û ewê berî we her'e Celîlê. Li wir hûnê wî bibînin>. Va ye min wer'a got».

⁸ Ewana bi saw û şabûneke mezin lez ji t'irbê derk'etin û lezandin, ku şagirtanr'a bêjin. ⁹ Nişkêva Îsa rastî wan hat û got: «Silav li we!» Ewana nêzîkî wî bûn, xwe avîtine nigên wî girtin û ew hebandin. ¹⁰ Hingê Îsa gote wan: «Netirsin! Her'in birayên minr'a bêjin, ku ew her'ine Celîlê û li wir wê min bibînin».

¹¹ Gava k'ulfet çûn, ji nobedaran hinek hatine bajêr û tiştên ku bibûn serokên k'ahînanr'a gotin. ¹² Serokên k'ahînan t'evî rûspîyan civyan û şêwrîn. Paşê wana gelek p'ere dane nobedaran ¹³ û gotin: «Bêjin: <Çaxê em xewêda bûn, şagirtên wî hatin ew dizîn>. ¹⁴ Û heger ev yek bigihîje ber guhê welî, emê ziman jêr'a bibînin û we bêxem bihêlin». ¹⁵ Wana jî p'ere hildan û usa kirin, çawa ku hatibûne hînkirinê. Û ev gotin li nava cihûyanda heta roja îroyîn bela bûye.

T'EMÎYA ÎSAYE JI BOY MILETAN

(Marqos 16:14-18; Lûqa 24:36-49; Yûhenna 20:19-23; K'arên Şandîyan 1:6-8)

¹⁶ Her yanzdeh şagirt jî çûne Celîlê, wî ç'îyayê ku Îsa wanr'a gotibû. ¹⁷ Gava ew dîtin, ew hebandin, lê hinek dudilî bûn. ¹⁸ Îsa nêzîkî wan bû, wanr'a xeber da got: «Hemû hikumê erd û ezmên minr'a hate dayînê. ¹⁹ Niha her'in her miletan bikine şagirt û bi navê Bav, Kur' û Ruhê Pîroz wan binixêmin ²⁰ û hemû t'emîyên ku min dane we miletan hîn bikin, ku ew wan xwey bikin. Awa, ji îroda girtî, heta axirîya dinyayê ez t'evî we me!» Amîn!

MIZGÎNÎ YA KU MARQOS NIVÎSÎ

PÊŞGOTIN

Bona k'arê Îsa Mesîh, usa jî eva Mizgîniya hatye nivîsarê û navê yê nivîsk'ar Marqos bûye. Marqos ew xwexa Yûhenna-Marqos e, bona k'ê kitêba K'arê Şandiyanda û usa jî çend nameyên şandiyanda hatine nivîsarê. Ewî t'evî Pawlos û Barnabas gelekî rêwîti kirye û usa jî t'evî Petrûsê şandî Xwedêr'a xizmetî kirye.

Mizgîniya Îsa Mesîhe ku Marqos nivîsî jî nava her çar Mizgîniyanda ya here kin e. Hizkî wî hê gelek şehdetiya k'arên Îsa Mesîh daye û hê zelal û kurt nivîsiye.

Marqos Îsa Mesîh çawa yekî xweyhikum tîne li ber ç'evan û hikumê wî nava hemû k'arên wîda dide k'ifşê.

Vê Mizgîniyêda hema pêşda zelal nivîsar e, ku Îsa Kur'ê Xwedê ye û usa jî tê k'ifşê, ku Îsa çawa hêdî-hêdî xwe şagirtên xweva dide naskirinê, ku ew Mesîh e, awa gotî K'ifşiriyê Xwedê ye. Û ew bona xwe dibêje, ku ew çawa Kur'ê Meriv hatye dinyayê, ku jîyîna xwe bide, ku merivan jî qeydên guneh û jî undabûnê rizgar bike. Ew li ser k'arên Îsa hê gelek disekine, ne ku li ser hînkirina wî.

Marqos bona Yûhennayê nixamdar, nixamtina wî û cêribandina Îsa kin nivîsiye. Ew carekêva derbazî ser k'arên Îsaye hekîmtiyê dibe. Ew dide k'ifşê, ku çiqas diçû şagirtên wî ew hê k'ûr nas dikirin, lê dijminên wî jî k'îna wî hê zêde digirtin. Û paşê bona heftiya Îsaye xilaziyê nivîsiye~ bona xaçbûn û rabûna wîye jî mirinê.

SERECEMA MIZGÎNÎYÊ

Dannasîn û k'arên Yûhennayê nixamdar (1:1-13)

Dannasîn û k'arên Îsaye li Celîlê (1:14-9:50)

Meşa Îsaye jî Celîlê heta Orşelîmê (10:1-52)

Heftiya Îsaye paşin (11:1-15:47)

Girtin, dîwankirin, xaçkirin û zêndîbûna Îsa (14:43-16:8)

Pey zêndîbûnêr'a Îsa şagirtanva k'ifş dibe û hiljorî ezmên dibe (16:9-20)

DANNASÎNA YÛHENNA YÊ NIXAMDAR (Metta 3:1-12; Lûqa 3:1-18; Yûhenna 1:19-28)

1 ¹ Destpêbûna Mizgîniya Kur'ê Xwedê Îsa Mesîh bi vî cûreyî bû~ ² Çawa li *kitêbên* p'êxemberanda hatye nivîsarê: «Awa ezê qasidê xwe pêşiya teva bişînim, ku bona te rê hazir bike». ³ «Dengê ber'iyêda dike gazî: <Rîya Xudan hazir bikin û şiverêyên wî rast bikin>».[†]

⁴ Awa Yûhenna ber'iyêda k'ifş bû, cimet dinixamt û dannasîn dikir, ku jî gunehkirinê vegezin û bêne nixamtinê, ku gunehên wan bêne baxşandinê. ⁵ Ji her aliyên erdê Cihûstanê û hemû Orşelîmyan dihatine cem, gunehên xwe didane rûyê xwe û li ç'emê Ûrdunêda bi destê wî dihatine nixamtinê. ⁶ Yûhenna k'inceke jî pirça deveyê xwe kiribû û li piştê xwe jî qayîşeke ç'erm girêdabû. Xwarina wî kulî û hingivê çolê bû. ⁷ Wî dannasîn dikir û digot: «Yekî jî min qewattir wê bê. Ez ne hêja me, ku ta bim û benên p'êlavên wî jî vekim. ⁸ Min hûn bi avê nixamtin, lê ewê bi Ruhê Pîroz we binixême».

NIXAMTIN Û CÊRIBANDINA ÎSA (Metta 3:13-4:11; Lûqa 3:21-22; 4:1-13)

⁹ Û wan rojanda Îsa jî bajarê Nisreta Celîlê hat û ç'emê Ûrdunêda bi destê Yûhenna hate nixamtinê. ¹⁰ Û hema ew jî avê derk'et, dît ezman vebû û Ruh mîna kewekê li ser wî danî. ¹¹ Û dengê jî ezmanan hat, ku digot: «Tu yî, Kur'ê minî delal, ez jî te razî me».

¹² Hingê Ruh Îsa derxiste ber'iyê. ¹³ Ew çil rojan ber'iyêda ma û jî Şeytan hate cêribandinê. Ew t'evî rewiran bû û milyak'etan wîr'a xizmetî kirin.

K'ARÊN ÎSAYE LI QEZA CELÎLÊDA Û ŞAGIRTÊN WÎYE PÊŞIN (Metta 4:12-22; Lûqa 4:14-15; 5:1-11)

¹⁴ Pey hebskirina Yûhennar'a Îsa çû qeza Celîlê û dest bi dannasîna Mizgîniya Xwedê kir ¹⁵ û digot: «Waxt t'emam bûye, P'adşatiya Xwedê nêzîk bûye, jî gunehkirinê vegezin û bawerîya xwe Mizgîniyê bînin!»

¹⁶ Gava Îsa li devê gola Celîlê diger'ya, wî Şimhûn û Endrawsê birayê wî dîtin. Wana t'or' davîte golê, çimkî mesîgir bûn. ¹⁷ Îsa gote wan: «Pey min werin, ezê we bikime nêç'îrvanên merivan». ¹⁸ Wana jî hema jî wê demêda t'or'ên xwe hiştin û pey wî çûn. ¹⁹ Dema ku Îsa jî wir pêşda çû, kur'ên Zebedî~ Aqûb û Yûhennayê birayê wî jî dîtin. Wana qeyikêda t'or'ên xwe hîvês dikirin. ²⁰ Hingê Îsa gazî wan kir, wana jî bavê xwe Zebedî t'evî k'arkeran qeyikêda hişt û pey wî çûn.

ÎSA RUHÊ HERAM DEXDIXE (Lûqa 4:31-37)

²¹ Ewana gihîştine Kefernahûmê. Roj şemî bû, Îsa rast k'ete k'inîştê û dest bi hînkirinê kir. ²² Li ser hînkirina wî cimet zendegirtî mabûn, çimkî wî mîna yekî xweyhikum ew hîn dikirin, ne ku mîna qanûnzanan. ²³ Hingê k'inîştê wanda merivek hebû, ku bi ruhê heramva girtî bû. Wî kire qîr'în û got: ²⁴ «Tu çi jî me dixazî, ay Îsayê Nisretê? Tu hafî, ku me bidî undakirinê? Ez dizanim tu k'î yî. Tu Pîrozê Xwedê yî!» ²⁵ Îsa lê hilat û got: «Ker' be û jê derk'ev!» ²⁶ Hingê ruhê heram ew veç'irikand û bi dengê bilind kire qîr'în û jî wî derk'et. ²⁷ Hemû zendegirtî man, hevr'a k'etine pîrs-pîrsîyaran û digotin: «Ev çi yek e? Çi hînkirineke nû ye? Ew bi hikum ferman ser ruhên heram dike û ew jî êlimî wî dibin». ²⁸ Û nav-dengê Îsa pêr'a-pêr'a belayî hemû der-dorên Celîlê bû.

* 1:2 Malaxî 3:1.

† 1:3 Îşaya 40:3.

Marqos 1,2

ÎSA GELEK NEXAŞAN QENC DIKE
(Metta 8:14-17; Lûqa 4:38-45)

²⁹ Gava Îsa ji k'inîştê derk'et, t'evî Aqûb û Yûhenna rast çû mala Şimhûn û Endraws. ³⁰ Xwesîya Şimhûn germêda p'aldayî bû. Hingê bona wê gotine Îsa. ³¹ Îsa jî nêzik bûyê, destê wê girt, rakire ser p'îyan û germa wê danî, ew jî rabû wanr'a xizmetî kir. ³² Berî êvarê, gava ro çû ava, hemû nexaş û yên cinak'etî anîne cem wî. ³³ T'emamîya cimeta bajêr li ber dêrî civya. ³⁴ Îsa gelek meriv ji cûr'e-cûr'e nexaşîyan qenc kirin. Gelek cin jî derxistin û nedihîşt ku cin xeber din, çimkî wan dizanibûn ku ew k'î ye.

³⁵ Qereberbanga sibehê Îsa rabû, derk'et çû cîkî xewle û li wir dua kir. ³⁶ Şimhûn û yên wîr'a li Îsa ger'yan ³⁷ û gava wana ew dît, gotinê: «Hemû li te diger'in». ³⁸ Îsa got: «Em her'ine gund-bajarên nêzik, ku ez li wan deran jî dannasîn kim, çimkî bona vê yekê hatime». ³⁹ Û li t'emamîya Celîlê diger'ya, k'inîştên wanda dannasîn dikir û cin derdixistin.

ÎSA YEKÎ K'OTÎ PAQIJ DIKE
(Metta 8:1-4; Lûqa 5:12-16)

⁴⁰ Û yekî k'otî hat, li ber Îsa k'ete ser çokan, reca ji wî kir û got: «Heger tu bixazî, dikarî min paqij kî». ⁴¹ Dilê Îsa lê şewtî, destê xwe dirêj kir lê k'et û got: «Ez dixazim. Paqij be!» ⁴² Û pey vê gotinêr'a hema cîda k'otîbûn ji wî çû ew paqij bû. ⁴³ Îsa pêr'a-pêr'a ew derxiste der, sert t'emî da wî ⁴⁴ û gotê: «Binihêre t'u kesîr'a t'u tiştî nebêjî, lê her'e xwe nîşanî k'ahîn ke û çawa Mûsa t'emî daye, hedîya xwe bide, ku hemûyanr'a bibe şehdetî, ku tu paqij bûyî». ⁴⁵ Lê ew meriv derk'et aşkere destpê kir got û eva yeka bela kir, usa ku îdî Îsa nikaribû aşkere biçûya bajarekî, lê ji bajêr der, li cîyên xewle dima. Û ji her alîyanva cimet dihatine cem wî.

ÎSA GUNEHÊN YEKÎ ŞILÛŞET AFÛ DIKE Û WÎ QENC DIKE
(Metta 9:1-8; Lûqa 5:17-26)

2 ¹ Pey çend rojanr'a Îsa vegerya Kefernahûmê. Hingê hat bihîstinê, ku ew malda ye. ² Malda haqas meriv civyan, ku heta ber dêrî jî cî nemabû. Îsa jî xebera Xwedê ew hîn dikirin. ³ Û hingê çar merivan şilûşetek hildayî anîne cem Îsa. ⁴ Lê gava ji dest k'oma merivan rê nedîtin, ku nêzikî wî bûna, wan banê xanî ji wirda qul kir, k'u Îsa bû û merivê şilûşet ber'êva daxistine jêrê. ⁵ Gava Îsa bawerîya wan dît, gote yê şilûşet: «Lawo, gunehên te hatine baxşandinê». ⁶ Hinekên ji qanûnzanan, ku li wir rûniştibûn, dilê xweda digotin: ⁷ «Çima ev van xeberên usa dibêje, ew k'ifirî dike? Pêştirî Xwedê k'î dikare gunehan afû bike» ⁸ Destxweda Îsa ruhê xweda pê hesya, ku evana aha difikirin got: «Çima hûn tiştên aha dilê xweda difikirin? ⁹ K'îjan rihet e, şilûşetr'a bêjin: <Gunehên te hatine baxşandinê>? yan bêjinê: <Rabe ber'a xwe hilde û biger'e>? ¹⁰ Lê ku hûn bizanibin, ku hikumê Kur'ê Meriv heye li ser dinyayê gunehan afû bike», ¹¹ gote yê şilûşet: «Ez ter'a dibêjim, rabe ber'a xwe hilde, her'e mala xwe». ¹² Ew jî pêr'a-pêr'a li ber ç'evên hemûyan rabû, ber'a xwe hilda, derk'et çû. Hemû jî heyr-hujmek'ar man, şikirî dane Xwedê û gotin: «Me tiştêkî usa qet nedîtye!»

ÎSA GAZÎ LÊWÎ DIKE
(Metta 9:9-13; Lûqa 5:27-32)

¹³ Îsa dîsa çû devê golê. T'emamîya k'oma merivan dihate cem wî û ewî jî ew hîn dikirin. ¹⁴ Gava Îsa rêda çû, Lêwîyê kur'ê Halfawo li cîyê xerchildanê rûniştî dît û gotê: «Li pey min were». Ew jî rabû pey Îsa çû. ¹⁵ Çaxê Îsa mala Lêwîda ser sifrê bû, gelek xercgir û gunehk'ar t'evî wî û şagirtên wî li ser sifrê rûniştibûn, çimkî yên pey wî diçûn gelek bûn. ¹⁶ Gava qanûnzanan jî nava fêrisîyan dîtin, ku Îsa bi xercgir û gunehk'aranva t'evayî li ser sifrê rûniştî ye, ji şagirtên wî pirsîn: «Çima ew t'evî xercgir û gunehk'aran dixwe û vedixwe»? ¹⁷ Gava Îsa bihîst, gote wan: «Yên silamet ne hewcê hekîm in, lê nexaş. Ez ne hatime gazî yên rast kim, lê gunehk'aran».

PIRSA ROJÎGIRTINÊ
(Metta 9:14-17; Lûqa 5:33-39)

¹⁸ Carekê şagirtên Yûhenna û fêrisîyan rojî digirtin. Çend meriv hatine cem Îsa û jê pirsîn: «Çima şagirtên Yûhenna û yên fêrisîyan rojîyê digirin, lê şagirtên te rojîyê nagirin»? ¹⁹ Îsa gote wan: «Gelo dibe ku xandîyên dewatê rojî bigirin, çaxê zava t'evî wan e? Ew nikarin rojî bigirin, heta ku zava t'evî wan e! ²⁰ Lê roj wê bîn, çaxê zava ji wan bê hildanê, hingê wê rojî bigirin. ²¹ T'u kes pê p'arçê nû k'inca kevn p'îne nake. Heger p'îne ke, p'arçê k'inca kevinva dirûtî wê zorê li k'inca kevn bike û cîyê qelişî wê ji berê xirabtir be.

²² Û ne jî kesek şeraba nû dike meşkên kevn. Heger usa bike, şeraba nû wê meşkan bit'eqîne, him şerabê unda be, him jî meşk. Lê şeraba nû dikine meşkên nû».

PIRSA ROJA ŞEMÎYÊ
(Metta 12:1-8; Lûqa 6:1-5)

²³ Îsa rojêke şemîyê nava zevîyanr'a derbaz dibû û şagirtên wî rêva destpê kirin simbilên gênim çinîn. ²⁴ Fêrisîyan gote Îsa: «Binihêre! Çima şagirtên te roja şemîyêda tiştê necayîz dikin»? ²⁵ Îsa li wan vegeand got: «We qet nexandye, ku Dawid ji hewcetîyê çî kir, çaxê ew û yên pêr'a birçî bûn? ²⁶ Ew li dema Evyatarê serokk'ahînda k'ete Xana Xwedê û nanê Xwedêr'a dayî xwar, ku ew nan pêştirî k'ahînan ne cayîz bû, ku yekî din bixwara. *Hela* serda jî ew nan da yên t'evî xwe». ²⁷ Paşê ser gotina xweda zêde kir got: «Rojê şemîyê bona mêriv hate danînê, ne ku meriv bona roja şemîyê! ²⁸ Û aha Kur'ê Meriv Xudanê roja şemîyê ye jî».

Marqos 3,4

ÎSA ROJA ŞEMÎYÊ MERIVÊ DESTK'ÎŞYAYÎ QENC DIKE
(Metta 12:9-14; Lûqa 6:6-11)

3 ¹ Û Îsa dîsa k'ete k'inîştê. Li wir merivek hebû, ku destê wî k'îşyabû. ² Ç'evê hinekan li ser Îsa bû, gelo roja şemîyê ewê wî qenc ke yan na, ku xeyba wî bikin. ³ Îsa merivê destk'îşyayî'a got: «Rabe vê govekêda bisekine!» ⁴ Paşê gote wan: «Roja şemîyê cayîz e qencîyê bikin yan xirabîyê? Ruhekî rizgar kin yan unda kin?» Lê wan deng nekir. ⁵ Îsa bi hêrs dora xwe nihêrî, bona serhişkîya wan ber xwe k'et û gote wî merivî: «Destê xwe dirêj ke». Ewî jî dirêj kir û destê wî qenc bû. ⁶ Fêrisî derk'etine derva û bi lez t'evî hêrodesîyan şewra xwe kirine yek, ku çawa bikin wî bidine kuştinê. ⁷ Îsa t'evî şagirtên xwe çû devê golê. Ji Celilê k'omeke merivane giran pey wî çû. ⁸ Çaxê wana kirinên wî bihîstin, ji Cihûstanê, Orşelîmê, Edovmê, wî alîyê Ûrdunêyî rohilatê, usa jî ji qeza Sûr û Saydê gelek meriv hatine cem wî. ⁹ Û Îsa ji dest k'oma merivan şagirtên xwer'a got, ku bona wî qeyikekê hazir bikin, ku wî *nava hevda* negvêşin. ¹⁰ Çimkî Îsa gelek meriv qenc kirin, usa ku yên nexaş t'opî ser wî dibûn, ku destê xwe bidanê. ¹¹ Dema ku ruhên heram ew didîtin, li ber wî xwe deverûya davîtine erdê, dikirine qîr'în û digotin: «Tu Kur'ê Xwedê yî!» ¹² Lê Îsa sert li wan hildîhat, ku bona wî nekine dengî.

HILBIJARTINA HER DONZDEHAN
(Metta 10:1-4; Lûqa 6:12-16)

¹³ Îsa rabû ç'îyê û merivên ku wî dixastin gazî wan li cem xwe kirin. Ew jî çûne cem. ¹⁴ Wî donzdeh meriv hilbijartin û navên wan danîn «şandî», ku t'evî wî bimînin û wan bişîne, ku dannasîn bikin. ¹⁵ Û hikum da wan, ku cinan derxin. ¹⁶ Her donzdehên hilbijartî ev in: Şimhûn (ku navê wî guhast Petrûs), ¹⁷ Aqûbê Zebedî û Yûhennayê birê wî, (ewî navê Boanerces li wan kir, ku tê femkirinê: «Lawên Gur'înîyê») ¹⁸ Endrawîs, Fîlîpo, Bertolomeyo, Metta, T'ûma, Aqûbê kur'ê Halfawo, T'adayo, Şimhûnê Kenanî ¹⁹ û Cihûdayê Îsxeryotî, yê ku bû nemamê Îsa.

BÊT'İFAQÎ MAL Û P'ADŞATÎYAN WÊRAN DIKE
(Metta 12:22-32; Lûqa 11:14-23; 12:10)

²⁰ Paşê Îsa çû malekê. Û dîsa haqas k'oma merivan *wir* civya, ku heta nanê xwe jî nikaribûn bixwarana. ²¹ Çaxê pismamên ji xûn û qinêta wî bihîstin, derk'etin ku wî bigirin, çimkî wan digot: «Ewî hişê xwe unda kirye!» ²² Û ew qanûnzane ku ji Orşelîmê dak'etibûn, digotin: «Belzebûl wîda heye! Ew cinan bi hikumê mîrê cinan derdixe!» ²³ Îsa jî gazî wan cem xwe kirin û bi meselan gote wan: «Şeytan çawa dikare xwexa xwe derxe? ²⁴ Heger nav P'adşatikêda bêt'ifaqî hebe, ew nikare bimîne. ²⁵ Mala ku bêt'ifaqî bik'evê, ew mal nikare bimîne. ²⁶ Heger Şeytan rabe ber xwe û dutîretî çêbe, ew nikare bimîne, wê xilazîya wî bê. ²⁷ Lê belê t'u kes nikare bik'ewe mala yekî qewat û hebûka wî t'alan ke, heger berê pêşda ewî qewat girênde. Û çaxê girêde, hingê wê bikaribe mala wî t'alan ke.

²⁸ Ez rast dibêjime we, her guneh û k'ifirî, ku bikin wê li merivên dinyayê bêne baxşandinê, ²⁹ lê k'î ku k'ifirî Ruhê Pîroz bike, li wî t'u car nayê baxşandinê. Ewê bi wî gunehî heta-ha-tê sûcdar be». ³⁰ Îsa ev yek got, çimkî wan digot: «Ruhê heram wîda heye».

DÊ Û BIRAYÊN ÎSA
(Metta 12:46-50; Lûqa 8:19-21)

³¹ Hingê dê û birayên Îsa hatin, li derva sekinîn, yek şandine pey wî û gazî kirinê. ³² K'oma merivane ku dora wî rûniştibû gotêda: «Dîya te û birayên te derva pîrsa te dikin». ³³ Îsa caba wan da û got: «Dîya min û birayên min k'î ne?» ³⁴ Hingê li yên dora xwe rûniştî nihêrî û got: «Awa, dê û birayên min! ³⁵ Her k'ê ku daxaza Xwedê bine sêrî, ew e birê min, xûşka min û dîya min».

MESELA T'OXIMREŞ Û ŞIROVEKIRINA WÊ
(Metta 13:1-23; Lûqa 8:4-15)

4 ¹ Îsa dîsa li devê golê dest bi hînkirinê kir. K'omeke merivane usa giran li dora wî civya, ku ew k'erbî wan k'ete qeyikê û li ser golê rûnişt. T'emamîya k'oma merivan li devê golê bû ² û wî bi meselan gelek tişt ew hîn dikirin. Hînkirina xweda digot: ³ «Guhdarî! T'oximreş rabû çû, ku t'oxim biçîne. ⁴ Gava ewî t'oxim direşand, ji wan hinek k'etine devê rê, teyrede hatin û ew xwarin. ⁵ Û hinek k'etine li ser erdê kevirî, li k'u xwelî kêmbû. Ew zû şîn bûn, çimkî xwelî ne k'ûr bû. ⁶ Gava te'v derk'et, ew qimilîn û çimkî rawên wan t'unekbûn, hişk bûn. ⁷ Û hinekên din k'etine nava stîrîyan, stîrî rabûn ew xeniqandin û ber nedan. ⁸ Û hinekên din jî k'etine nava erdê qenc, şîn bûn, mezin bûn û ber dan, yê sî *bare*, yê şêst, yê jî sed». ⁹ Û Îsa *wanr'a* got: «Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê».

¹⁰ Gava Îsa t'enê ma, her donzdehan t'evî yên dora wî, bona van meselan jê pîrsîn. ¹¹ Ewî caba wan da û got: «Wer'a hatye dayîne, ku hûn sur'ên P'adşatiya Xwedê bizanibin, lê bona ewên ku derva ne, her tişt bi meselan tê gotinê, ¹² ku: <Çiqasî jî binihêrin, nebînin, çiqasî jî bibihên, fem nekin, ku nebe vegerin û li wan bê afûkirinê>».*

¹³ Hingê Îsa gote wan: «Hûn vê meselê fem nakin? Lê îdî hemû meselan hûnê çawa fem bikin? ¹⁴ T'oximreş xeberê biçîne. ¹⁵ Ewên *mîna erdê* devê rê ne, ew in, ku gava dibihên, hema cîda Şeytan tê û xebera dilê wanda

* 4:12 Îşaya 6:9,10.

Marqos 4,5

çandî derdixe. ¹⁶ Ewên *mîna* erdê kevirî ew in, *yên* ku gava xeberê dibihên, ew zû bi *dilê* şa wê hildidin, ¹⁷ lê çimkî rawên wan t'üne, dirêj t'ab nakin. Çaxê bona xeberê rastî tengasîyan yan zêrandinê tên, zû ji rê dik'evin. ¹⁸ Û ewên *mîna erdê* stirî, ku lê hate çandinê ew in, ku xeberê dibihên, ¹⁹ xemên vê dinyayê, derewên dewlemendîyê û havijîyên tiştên din dik'evine navê û xeberê dixeniqînin û ew bê ber dimînin. ²⁰ Û ewên *mîna erdê* qenc, ku lê hate çandinê jî ew in, ku çaxê xeberê dibihên, wê hildidin û ber didin, yê sî *bare*, yê şêst, yê jî sed».

Ç'IRA VÊXISTÎ
(Lûqa 8:16-18)

²¹ Û gote wan: «Gelo ç'irê bona çi tînine hindur? Bona bin t'extnivîsarê yan bona binê ber'ê? Ê ne bona danîna ser p'êç'irê? ²² T'u tiştê veşartî t'oneye, ku neyê aşkerekirinê û ne jî tiştêkî dizîva, ku nek'eve ber ronayê. ²³ Guhê k'êyî bihistinê heye bira bibihê».

²⁴ Îsa gote wan: «Tiştên hûn dibihên bidine ber hesêb. Hûn bi çi çapê bipîvin, bi wê pîvanê jî wê wer'a bê pîvanê û serda jî wê hê zêde be. ²⁵ Çimkî ya k'ê ku heye, wê hê lê zêde be û ya k'ê ku t'üne ye, çî wî heye jî wê jê bê standinê».

T'OXIM ÇAWA ŞÎN DIBE

²⁶ Û Îsa got: «P'adşatîya Xwedê mîna vê yekê ye: Merivek li nava erdêda t'oxim diçîne. ²⁷ Û radizê, radibe. Şev û roj t'oxim şîn dibe, bilind dibe û ew meriv pê nahese, ku ev çawa dibe. ²⁸ Lê çaxê ew tê çandinê û digihîje, ji hemû p'incar'an bilindtir dibe û çiqilên mezin dide, usa ku teyredên ezmên dikarin xwe bidine ber sîya wê». ²⁹ Çaxê ku ber digihîje, meriv dest bi k'arê de'sê dikin, çimkî waxtê nandirûnê pê'r'a gihîştîye».

MESELA HEBA T'OXIMÊ XERDALÊ
(Metta 13:31-32,34,35; Lûqa 13:18-19)

³⁰ Îsa got: «Em P'adşatîya Xwedê mîna çi bikin? yan jî em wê bi çi meselê şirovekin? ³¹ Ew mîna hebeke t'oximê xerdalê ye, ya ku ji hemû t'oximên ku li ser erdê têne çandinê hûrtir e. ³² Lê çaxê ew tê çandinê û digihîje, ji hemû p'incar'an bilindtir dibe û çiqilên mezin dide, usa ku teyredên ezmên dikarin xwe bidine ber sîya wê».

³³ Îsa bi gelek meselên aha wan'a haqas xeber dida, çiqas wan dikaribû fem bikira. ³⁴ Bêy mesele wan'a t'u tişt nedigot, lê şagirtên xwer'a başqe her tişt şirovedikir.

BA Û GOL JÎ ÊLIMÎ ÎSA DIBIN
(Metta 8:23-27; Lûqa 8:22-25)

³⁵ Hema wê rojê, gava bû berî êvar, Îsa gote şagirtên xwe: «Em derbazî wî berî golê bin». ³⁶ Şagirt ji k'oma merivan qetyan, Îsa hildane qeyika xwe û çûn. Qeyikên din jî t'evî wî bûn. ³⁷ De îcar li dora wan firtoneke mezin rabû, pêlan usa li qeyikê dixistin, ku îdî lê-lê bû bi avê t'ije bûya. ³⁸ Lê Îsa li ser paşîya qeyikê serê xwe danîbû ser be'lgî û razabû. Wana ew hişyar kir û gotinê: «Dersdar, ne xema te ye? Em unda dibin». ³⁹ Îsa rabû, li bayê hilat û hikumî li ser golê kir got: «Bisekine, ker' be»! Firtonê danî û her tişt rihet bû. ⁴⁰ Îsa gote wan: «Çima hûn ditirsin? çawa hê bawerîya we t'üne?» ⁴¹ Saweke mezin li wana girt û gotine hevdu: «Gelo ev k'î ye, ku ba û gol jî êlimî wî dibin?»

ÎSA YEKÎ CINAK'ETÎ QENC DIKE
(Metta 8:28-34; Lûqa 8:26-39)

¹ Ewana derbazî wî berî gola Celîlê bûn û gihîştine cî-miskenê Girasînê. ² Gava Îsa ji qeyikê derk'et, hingê ji nav gor'istanê merivek rastî wî hat, yê ku ruhê heram pê'r'a bû. ³ Ew nav gor'istanêda dima û t'u kesî îdî nikaribû bi zincîran jî ew girêda. ⁴ Çimkî gelek caran ew bi qeyd û zincîran girêdabûn, lê wî zincîr qetandibûn û qeyd şkenandibûn. T'u kesî nikaribû ew zeft bikira. ⁵ T'imê şev û roj li gor'istanêda û ser ç'îyan bû, dikire qîr'e-qîr' û pê keviran xwe birîndar dikir.

⁶ Gava ewî ji dûrva Îsa dît, revî, xwe avîte ber nigan ⁷ û bi dengêkî bilind kire qîr'în got: «Tu ji min çi dixazî, Îsayê Kur'ê Xwedêyê Herî Jor? Tu Xwedê kî, min nede cizaretê!» ⁸ Ewî ev yek digot, çimkî Îsa digotê: «Hey ruhê heram! Ji vî merivî derk'eve!» ⁹ Îsa jê pirsî: «Navê te çi ye?» Ewî jî got: «Navê min Lêgêyon e, çimkî em gelek in». ¹⁰ Û gelekî reca ji Îsa dikir, ku wan ji wî cî-miskenî dernexe. ¹¹ Wir li sîngê ç'iyê kerîkî berazayî mezin diç'êrya. ¹² Ruhên heram reca ji Îsa kirin û gotin: «Me bişîne nava berazan, ku em bik'evine nava wan». ¹³ Ewî jî destûr da wan û ruhên heram derk'etin û k'etine nava berazan. Ew kerî nêzîkî du hezar berazan bû, ew jorda revîn, xwe ji kendêlda avîtine golê û xeniqîn. ¹⁴ Berazvan revîn çûne bajar û gundan û eva yeka gilî kirin. Binelî jî hatin, ku tiştê bûyî bibînin. ¹⁵ Û hatine cem Îsa, nihêrîn, wê ew merivê cinak'etî, ku k'omeskereke cinan pê'r'a bû, k'incên wî lê, ser hişê xweda hatî rûniştî ye. Hingê ew tirsyan. ¹⁶ Ewên ku ev yek dîtibûn jî cimetêr'a gotin, ku çi li t'evî yê cinak'etî û berazan bû. ¹⁷ Hingê wana reca ji Îsa kir, ku ew ji cî-miskenê wan her'e.

¹⁸ Gava Îsa k'ete qeyikê, yê ku cinak'etî bû, reca jê kir, ku wî'r'a her'e. ¹⁹ Lê Îsa nehişt û gote wî: «Vegera mala xwe û neferên mala xwer'a bêje, ku Xudan bona te çi kir û çawa li te hate rehmê». ²⁰ Ew jî çû û destpê kir çî ku Îsa bona wî kiribû qeza Dêkapolîsêda bela kir û her kes ecêb dima.

Marqos 5,6

QÎZIKA MIRÎ Û K'ULFETA NEXAŞ
(Metta 9:18-26; Lûqa 8:40-56)

²¹ Gava Îsa dîsa bi qeyikê derbazî wî berî din bû, k'omeke merivane giran li dora wî civya. Gava ew li devê golê bû, ²² yekî ji serk'arên k'inîştê, navê wî Yayîro, hate cem wî û gava ewî Îsa dît, xwe avîte nigên wî, ²³ gelek reca jê kir û got: «Qîzika min ber mirinê ye. Were destên xwe dayne ser, ku qenc be û bijî». ²⁴ Îsa rabû wîr'a çû.

K'omeke merivane giran pey wî diçû û zehmet didane wî. ²⁵ Li wir k'ulfetek jî hebû, ku donzdeh salên wê bûn, ser xûnê vebibû. ²⁶ Ewê gelek zehmet ji destê hekîman k'işandibû û hemû hebûka xwe xerc kiribû, lê t'u ç'are lê nebibû û serda hê xirab bibû. ²⁷ Ewê bona Îsa bihîst, piştêva hate nava k'oma merivan û li k'inca wî k'et. ²⁸ Çimkî ewê dilê xweda digot: «Heger ez t'enê k'incên wî jî k'evim, ezê qenc bim». ²⁹ Û pêr'a-pêr'a xûn jê ç'ikya û ewê xwe derxist, ku ji êşa xwe qenc bû. ³⁰ Îsa cîda pê hesya, ku qewatek jê çû, ser k'oma merivanda zivir'î û pirsî: «K'ê k'incên min k'et?» ³¹ Şagirtên wî gotinê: «Tu dinihêrî, ku k'oma merivan zehmetê dide te, lê tu dibêjî: <K'ê min k'et?»» ³² Lê Îsa li dora xwe dinihêrî, ku bibîne, k'a k'ê ev yek kir. ³³ Hingê k'ulfet li xwe hesya, ku çî li t'evî wê bû, ew bi tîrsê û lerizekê hat xwe avîte ber *nigên* wî û her tişt rast got. ³⁴ Îsa gote wê: «Evdê! Bawerîya te tu qenc kirî. Bi *dilê* rihet her'e û ji êşa xwe qenc be».

³⁵ Îsa hê xeber dida, ji mala serk'arê k'inîştê meriv hatin û gotin: «Qîza te mir, îdî zehmetê nede dersdar». ³⁶ Lê Îsa li ser gotina wan, serokê k'inîştêr'a got: «Netirse, t'enê bawer bike!» ³⁷ Ewî nehişt t'u kes pey wî her'e, pêştirî Petrûs, Aqûb û Yûhennayê birê wî. ³⁸ Gava gihîştine mala serokê k'inîştê, Îsa nihêrî wê hêwerza wan e~ digirîn û dikine qar'eqar'. ³⁹ Gava ew k'ete hindur, gote wan: «Çima hûn dikin qalmeqalm û digirîn? Zar'ok nemirye, lê hênijîye». ⁴⁰ Wana qerfê xwe wî dikir. Lê Îsa hemû derxistine derva, *t'enê* dê û bavê qîzikê û her sê şagirtên xwe xwer'a hildan û k'ete *wî cîyê* ku qîzik lê bû. ⁴¹ Destê qîzikê girt û gote wê: «Talîta qûm!» ku tê femkirinê: «Qîzik, ter'a dibêjim, rabe!» ⁴² Qîzik pêr'a-pêr'a rabû û ger'ya. Ew donzdeh salî bû. Ewên ku dîtin gelekî ecêb man. ⁴³ Îsa sert t'emî da wan, ku vê yekê t'u kesîr'a nebjîn û gote wan, ku xwarinê bidine wê.

BAJARÊ KU ÎSA WIR MEZIN BIBÛ WÎ QEBÛL NAKE
(Metta 13:53-58; Lûqa 4:16-30)

⁶ ¹ Îsa ji wir derk'et û çû cî-miskenê xwe. Şagirtên wî jî pey çûn. ² Gava roja şemîyê hat, wî k'inîştêda dest bi hînkirinê kir û gelekên ku *gotinên wî* bihîstin zendegirtî man û digotin: «Evî han ev tişt ji k'u anîne? Ev çî serwaxtî ye, ku wîr'a hatye dayinê? Ev çî k'iryamet in, ku bi destê wî dibin? ³ Ê ne ev necar e? Ê ne ev kur'ê Meryemê û birê Aqûb, Yûsês, Cihûda û Şimhûn e? Ê ne xûşkên wî li vir nava meda ne?» Û aha ewana ji wî k'ûvî bûn.

⁴ Îsa gote wan: «P'êxember t'u deran ne bêhurmet e, lê t'enê cî-miskenê xwe, nava merivên xwe û mala xweda». ⁵ Ewî li wê derê nikaribû t'u k'iryamet bikira, lê t'enê destê xwe danî ser çend nexaşan û ew qenc kirin. ⁶ Ew ser nebawerîya wan ecêb ma.

ŞANDINA HER DONZDEHAN
(Metta 10:5-15; Lûqa 9:1-6)

Îsa li gundên der-doran diger'ya û hîn dikir. ⁷ Wî her donzdeh gazî cem xwe kirin, destpê kir ew cot-cot şandin û hikumê li ser ruhên heram da wan. ⁸ T'emî da wan û got: «Bona rê, pêştirî kewazekê, t'u tiştî xwer'a hilnedin~ ne nan, ne tûrik û ne jî p'ere li piştêka xweda. ⁹ P'êlavên xwe p'ê kin, du dest kiras xwer'a hilnedin». ¹⁰ Serda zêde kir gote wan: «Ew mala ku hûn her'inê, wê malêda jî bimînin, heta ku hûn ji wir derk'evin. ¹¹ Wê dera ku we qebûl nekin û guhdarîya gotina we nekin, çaxê hûn ji wir derên, t'oza nigên xwe dawşînin, ku wanr'a bibe şehdetî».

¹² Ew jî rê k'etin çûn û dannasîn dikirin, ku meriv ji gunehkirinê vejerin. ¹³ Wana gelek cin derdixistin û gelek nexaş jî gulrûn dikirin û ew qenc dikirin.

KUŞTINA YÛHENNAYÊ NIXAMDAR
(Metta 14:1-12; Lûqa 9:7-9)

¹⁴ Hêrodes p'adşa ev yek bihîst, çimkî nav û dengê Îsa bela bibû. Hinekan digot: «Eva Yûhennayê nixamdar e, ji nav mirîyan zêndî bûye, lema jî pê *destê* wî k'iryamet têne kirinê». ¹⁵ Lê hinekan jî digotin: «Eva Êlyas e». Hinekên din jî digotin: «Eva p'êxemberekî mîna p'êxemberên berê ye». ¹⁶ Lê gava Hêrodes ev yek bihîst, got: «Eva Yûhenna ye, serê k'îjanî min lêxistye, ew ji nav mirîyan zêndî bûye!» ¹⁷ Çimkî Hêrodes *meriv* şandibû Yûhenna girêdabû û avitibû hebsê, ji rûyê Hêrodîya jina Filîpoyê birayê xweda, ku wî ew standibû, ¹⁸ lê Yûhenna jêr'a gotibû: ku «Ne rast e tu jina birê xwe bistîni». ¹⁹ Lema Hêrodîyayê k'îna Yûhenna girtibû, dixast wî bide kuştinê, lê nikaribû, ²⁰ çimkî Hêrodes ji Yûhenna vedik'işîya û ew xwey dikir. Ewî dizanibû, ku Yûhenna merivekî rast û buhurtî ye. Û gelek tiştanda guhdarîya gotina wî dikir. ²¹ Awa carekê mecal vebû. Hêrodes bona roja jidêbûyîna xwe, esilzadanr'a, serhezaren eskeran û giregîrên Celîlêr'a mesref danî. ²² Gava qîza Hêrodîyayê k'ete hindur û reqîsî û ev yek dilê Hêrodes û t'eglîfkirîyên li sifrê rûniştî xaş hat. Hingê p'adşê gote qîzikê: «Çî dilê ter'a derbaz dibe û ji min bixazî, ezê bidime te». ²³ Û ewî wêr'a sond xwar got: «Tu çî ji min bixazî, ezê bidime te, heta nivê p'adşatiya xwe jî!» ²⁴ Qîzik derk'ete derva û çû ji dîya xwe pirsî: «Ez çî bixazim?» Dê jî got: «Serê Yûhennayê nixamdar». ²⁵ Qîzikê lezand çû cem p'adşê û xastina xwe wîr'a got: «Ez dixazim, ku niha tu

Marqos 6,7

serê Yûhennayê nixamdar li ser sinîyê bidî min». ²⁶ P'adşa gelekî ber xwe k'et, lê çimkî li ber t'eglîfkirîyan sond xwaribû, nexast ji xatirê wê derê. ²⁷ P'adşê pê'r'a-pê'r'a ferman da celat, ku her'e serê Yûhenna bîne. Celat jî çû hebsêda serê wî lêxist ²⁸ û li ser sinîyê anî û da keç'ikê. Ewê jî ew hilda bir da dîya xwe. ²⁹ Gava şagirtên Yûhenna ev yek bihîstin, hatin cinyazê wî birin kirine t'irbê.

ÎSA PÊNC HEZAR MERIVAN T'ÊR DIKE
(Metta 14:13-21; Lûqa 9:10-17; Yûhenna 6:1-14)

³⁰ Şandî vegeryane cem Îsa û hemû tiştên ku kiribûn û hîn kiribûn jê'r'a gotin. ³¹ Îsa gote wan: «Niha werin em t'enê her'ine cîkî xewle û hinekî rihet bin». Çimkî gelek dihatin-diçûn, wana mecala nanxwarinê jî nedidît. ³² Û ew t'enê bi qeyikê çûne cîkî xewle. ³³ Lê gelean ku çûyîna wan dît, ew nas kirin û ji hemû bajaran peya bezîn û berî wan gihîştine wir. ³⁴ Gava Îsa ji qeyikê derk'et û k'omeke merivane giran dît, hingê dilê wî li ser wan şewtî, çimkî ew mîna pezên bêy şivan bûn. Destpê kir gelek tişt ew hîn kirin. ³⁵ Û çimkî îdî dereng bû, şagirtên wî hatin û gotinê: «Ev der cîkî xikî-xwelî ye, waxt jî îdî dereng e. ³⁶ Bihêle ku ew her'ine gund û bergên der-doran û xwer'a xurek bik'ir'in». ³⁷ Lê Îsa li wan vegerand got: «Hûn xurek bidine wan!» Jê'r'a gotin: «*Dixazî* em her'in weke bahê dusid zîvî nan bik'ir'in û wan bidine xwarinê?»

³⁸ *Wî* gote wan: «Her'in binihêrin, çend nanê we hene». Gava ew pê hesyan, gotinê: «Pênc nan û du mesî». ³⁹ Wî ferman da, ku hemû jî k'om-k'om li ser gîhayê şîn rûnên. ⁴⁰ Ew jî k'om-k'om~ sed-sed, pêncî-pêncî li ser erdê rûniştin.

⁴¹ Îsa her pênc nan û her du mesî hildan, berê xwe ezmênda kir şikirî da, ew nan ker kirin û da şagirtên xwe, ku ew daynine ber k'oma merivan. Û her du mesî jî li hemûyan bela kir. ⁴² Hemûyan xwarin û t'êr bûn. ⁴³ Ji wan nan û mesîyan donzdeh seleyên t'ijî hûrikên *bermayî* dane hev. ⁴⁴ Yên ku ji wî nanî xwarin weke pênc hezar mêran bûn.

ÎSA PEYA LI SER AVÊR'A DIÇE
(Metta 14:22-33; Yûhenna 6:16-21)

⁴⁵ Destxweda ewî p'êyî ser şagirtên xwe kir, ku bik'evine qeyikê û pêşîya wî derbazî wî berî gola Beytsaydayê bin, heta ku ew cimetê verêke. ⁴⁶ Pey verêkirinê'r'a ew rabû ç'iyê, ku dua bike. ⁴⁷ Gava ku bû berî êvar, qeyik nava golêda bû û Îsa t'enê devê golê bû. ⁴⁸ Îsa dît, ku şagirt bi zehmeteke giran bêrên qeyikê dik'işînin, çimkî ba miqabilî wan bû. Nêzîkî qereberbangê Îsa ser golê'r'a peya diçû nêzîkî wan dibû. Wî xast ber wan'r'a derbaz bûya, ⁴⁹ lê gava wana dît, ku Îsa ser golê'r'a p'îya diçe, wan t'irê xeyalekê dibînin, kirine qîr'in. ⁵⁰ Çimkî hemûyan jî ew dît û tirsyan. Lê Îsa wê demê deng da wan û got: «Ser xwe bin! Ez im. Netirsin!» ⁵¹ Hingê ew k'ete qeyikê~ cem wan û ba seqirî. Şagirt li dilê xweda gelekî met'elmayî man û ecêb diman, ⁵² çimkî ew çî ku li ser nan jî bû, hê ne dik'ete hişê wan, femê wan dadayî bû.

ÎSA CÊNÎSARTÊDA NEXAŞAN QENC DIKE
(Metta 14:34-36)

⁵³ Ew derbazî wî berî golê bûn, gihîştine beja Cênîsartê û qeyik girêdan. ⁵⁴ Û gava ji qeyikê peya bûn, cimetê pê'r'a-pê'r'a Îsa nas kir. ⁵⁵ Û virda-wêda t'emamîya wê qezayêva bezîn~ nexaş ber'anva danîne wê dera ku dibihîstin Îsa lê bû. ⁵⁶ Her deran, ku Îsa diçûyê, heger bajar bûna yan gund û berge bûna, nexaş meydananda dadanîn û hîvî jê dikirin, ku t'enê serê p'êşa k'incên wî k'evin. Û her kesên ku lê dik'etin, ji nexaşiyên xwe qenc dibûn.

RÊ-RIZMÊ KAL-BAVAN Û XEBERA XWEDÊ
(Metta 15:1-9)

7 ¹ Fêrisîyan û hinek qanûnzanan ku ji Orşelîmê hatibûn dora Îsa girtin. ² Wana dît, ku ji şagirtên wî hinekan bi destên qirêj, awa gotî, destneşûştî nan dixwin, ³ çimkî fêrisî û hemû cihû pey rê-rizmê kal-bavên xwe diçin, heta destên xwe baş neşon, nan naxwin ⁴ û ji bazarê jî çî tînin, heta avê nexin, naxwin. Gelek tiştên din jî hene, ku ji kal û bavên hildane û diqedînin. Mesele, şuştina t'asan, şerbikan û firaqên sifir. ⁵ Hingê fêrisî û qanûnzanan ji Îsa pirsîn: «Çima şagirtên te pey rê-rizmê kal û bavên naçin û bi destneşûştî nan dixwin?» ⁶ Ewî li wan vegerand got: «Îşaya qenc li ser we durûyan p'êxembertî kirye! Çawa ku hatye nivîsarê: <Eva cimeta bi zarê xwe minr'a hurmetê dike, lê dilê wan ji min dûr e. ⁷ Badîhewa minr'a xizmetîyê dikin, t'emîyên merivan çawa qanûnên min cimetê hîn dikin>.*

⁸ Hûn t'emîyên Xwedê dihêlin û xwe rê-rizmê merivayî digirin: şuştin-veşuştina k'inc û feraqan û gelek tiştên aha dikin». ⁹ Û got: «Hûn qenc t'emîyên Xwedê bêhurmet dikin, ku rê-rizmê xwe xwey bikin. ¹⁰ Mesele, Mûsa gotye: <Dê û bavê xwer'a hurmetê bike> û <Ewê ku nifir li dê û bavê xwe bike, gerekê bê kuştinê>.[†] ¹¹ Lê hûn dibêjin: <K'î ku dê yan bavê xwer'a bêje: <Ew alîk'arîya ku gerekê te ji min bistanîda *Xwedê'r'a dikime* qurban>, (awa gotî hedî), ¹² *usa* hûn îdî nahêlin, ku ew dê û bavê xwer'a tişteki bike! ¹³ Û aha, hûn bi wan rê-rizmê xweye ku derbazî nisilên nû dikin xebera Xwedê p'êpes dikin. Hûn gelek tiştên aha dikin».

* 7:7 Îşaya 29:13.

† 7:10 Derk'etin 20:12; 21:17.

Marqos 7,8

TIŞTÊN KU MERIV PÊ DIHERIMIN
(Metta 15:10-20)

¹⁴ Hingê Îsa dîsa gazî k'oma merivan li cem xwe kir û gote wan: «Hûn hemû guhdarîya min bikin û fem bikin. ¹⁵ Tişteki usa nîne, ku ji derva her'e nava mêriv û wî biherimîne, lê ew tiştên ku ji wî dertên, ew mêriv diherimînin». ¹⁶ Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê».

¹⁷ Gava ew ji k'oma merivan qetya hate mal, şagirtên wî manîya wê meselê jê pirsîn. ¹⁸ Îsa li wan vegerand got: «Hûn jî femekor in? Hê hûn fem nakin? çî ku diçe dêv, diçe nava hinavê mêriv, ew nikare wî biherimîne. ¹⁹ Çimkî ew ne ku dik'eve dilê wî, lê diçe hinavê wî û ji wir jî dertê der». (Awa îdî hemû xwarin jî helal in.) ²⁰ Û got: «Ew tiştên ku ji dilê mêriv derdik'evin, ew wî diherimînin. ²¹ Çimkî ji hindur~ ji dilê meriv fikirên xirab derdik'evin: Qavî, dizî, kuştin, ²² zinêk'arî, timayî, xirabî, fêlbazî, necayîzî, ç'evê xirab, buxdanbêjî, k'ubarî û bêaqilî. ²³ Ev hemû tiştên xirab ji dil derdik'evin û mêriv diherimînin».

BAWERÎYA K'ULFETA SÛRYANÎ
(Metta 15:21-28)

²⁴ Îsa ji wê derê rabû çû sînore Sûrê. Çû malekê û nedixast t'u kes pê bihesya, lê nikaribû veşartî bima. ²⁵ K'ulfeteke ku qîzika wê bi ruhê heramva girtî bû, bona Îsa pê hesya, lez hat û xwe avîte ber nigên wî. ²⁶ Ew k'ulfet ne cihû bû, esilê xweda sûryanîya ji Fîniqiyayê bû. Ewê lava ji Îsa kir, ku ji qîza wê cin derxe. ²⁷ Îsa gote wê: «Bihêle pêşda bira zar'ok t'êr bin, çimkî ne baş e, ku nan ji ber zar'okan hildin û bavêjine li ber san». ²⁸ Ewê li wî vegerand got: «Belê Xudan, ne se jî ji wan hûrikên bermayî dixwin, çî ku ji sifra zar'okan dimîne». ²⁹ Hingê wî gote wê k'ulfetê: «Bona xatirê vê gotina te, tu dikarî her'î. Cin ji qîzika te derk'et». ³⁰ K'ulfet çû mala xwe, nihêrî, wê qîzik nav nivînêda p'aldayî ye û cin jî jê derk'et ye.

MERIVEKÎ KER' Û LAL XEBER DIDE

³¹ Pey wê yekê'a Îsa ji sînore Sûrê derk'et, nava Saydêr'a derbaz bû û qeza Dêkapolisêr'a heta gola Celîlê hat. ³² Merivekî ker' û lal anîne cem wî û hîvî ji wî kirin, ku destê xwe dayne ser. ³³ Îsa ew meriv ji k'oma merivan dût xist, t'ilîyên xwe kirine guhên wî, destê xweda t'ûkir, li zimanê wî da. ³⁴ Û berê xwe ezmênda kir, k'eser hatê û got: «Effata!» ku tê femkirinê: «Vebe!» ³⁵ Û dest xweda guhên wî bihîstin, zimanê wî vebû û zelal dest bi xeberdanê kir. ³⁶ Îsa t'emî li wan kir, ku *vê yekê* t'u kesîr'a nebêjin. Lê ewî çiqas t'emî li wan dikir, wana haqas zêde bela dikirin. ³⁷ Meriv gelekî ecêb mabûn û digotin: «Evî hemû tişt baş kir: Yên ker' dide bihîstinê û yên lal jî dide xeberdanê».

ÎSA ÇAR HEZAR MERIVAN T'ÊR DIKE
(Metta 15:32-39)

8 ¹ Wan rojanda dîsa k'omeke merivane giran civya. Tişteki wanî xwarinê t'unebû. Îsa gazî şagirtên xwe kir û got: ² «Dilê min ser vê k'oma merivan dişewte. Eva sê roj e t'evî min e û tişteki wanî xwarinê t'une. ³ Heger ez wan birçî verêkime malên wan, dilê wanê rêva xweva her'e û hinekên ji wan jî ji cîyên dût hatine». ⁴ Şagirtên wî lê vegerandin û gotin: «Li vê ber'iyêda emê ji k'u haqas nan dest xin, ku vê cimetê t'êr kin?» ⁵ Îsa ji wan pirsî: «Çend nanên we hene?» Wana got: «Heft».

⁶ Hingê ferman da, ku k'oma merivan li erdê rûnê. Ewî ew heft nan hildan şikirî da, ew ker kirin û paşê dane şagirtên xwe, ku daynine ber k'oma merivan. Wana ew danîne ber wan. ⁷ Çend mesîyên wane hûr jî hebûn. Îsa bona wan jî şikirî da û got: «Van jî daynine ber k'oma merivan». ⁸ Wana xwar û t'êr bûn. Paşê heft zembîl ji hûrikên bermayî dane hev.

⁹ Ewên ku xwarin, weke çar hezar merivan bûn. Gava ku Îsa ew verêkirin, ¹⁰ pêr'a-pêr'a t'evî şagirtên xwe k'ete qeyikê û çûne qeza Dalmanûtayê.

HEVÎRTIŞKÊ FÊRISÎYAN Û HÊRODES
(Metta 16:1-12)

¹¹ Fêrisî hatin û destpê kirin Îsar'a k'etine de'wê. Ew dicêribandin û ji wî nişanek ji ezmên dixastin. ¹² K'esereke k'ûr hate Îsa û got: «Çima eva nisila nişanekê digêr'e? Ez rast dibêjime we, ku vî nisilîr'a t'u nişan nayê dayînê». ¹³ Wî ew hiştin, dîsa k'ete qeyikê û derbazî wî berî golê bû.

¹⁴ Şagirtan bîr kiribû, ku xwer'a nan hildana. Li qeyikêda pêştirî nanekî t'u tişteki wanî xwarinê t'unebû. ¹⁵ Îsa t'emî da wan got: «Miqatî xwe bin, hevza xwe ji hevîrtişkê fêrisîyan û Hêrodes bikin». ¹⁶ Lê ewana nava hevda xeber didan û digotin: «Nanê me t'une, lema aha dibêje». ¹⁷ Îsa nava xweda dizanibû, gote wan: «Çima hûn nava hevda xeber didin, ku nanê we t'une? Hela hê hûn fem nakin? Û nak'eve hişê we, hê dilê we tevîzî ye? ¹⁸ Ç'evê we hene, hûn nabînin? Guhê we hene, hûn nabihên? Gelo nayê bîra we, ¹⁹ çaxê min pênc nan bona pênc hezar merivan ker kirin? We ji hûrikên bermayî çend seleyên t'ijî dane hev?» Wan lê vegerand got: «Donzdeh». ²⁰ «Û çaxê min heft nan bona çar hezar merivan ker kirin, we çend zembîlên t'ijî bermayî dane hev?» Wana got: «Heft». ²¹ Îsa gote wan: «Lê çima hûn hê fem nakin?»

²² Û ew hatine Beytsaydayê. Hinekan merivekî kor anî cem Îsa û lava ji wî kirin, ku destê xwe dayne ser wî. ²³ Ewî jî destê merivê kor girt, ji gund derxiste der, ç'evên wî bi t'ûka xwe şil kirin û destên xwe danîne ser wî û pirsî: «Tu tişteki dibînî?» ²⁴ Ewî jî nihêrî û got: «Ez merivan dibînim, ku mîna baxan in, lê diger'in». ²⁵ Dîsa Îsa destên xwe danîne ser ç'evên wî, wî merivî zûr bû nihêrî û ç'evên wî vebûn û her tişt zelal dît. ²⁶ Îsa ew şande mala wî, jêr'a got: «Gundda nekî dengî».

ŞEHDETÎYA PETRÛS Û GOTINA ÎSA BONA MIRIN Û ZÊNDÎBÛNA XWE

(Metta 16:13-28; Lûqa 9:18-27)

²⁷ Îsa t'evî şagirtên xwe çû gundên Qeyserîya Filîpoyê û li rêda ji şagirtên xwe pirsî: «Bi t'exmîna merivan ez k'î me?» ²⁸ Wan lê vegerand got: «Hinek dibêjin Yûhennayê nixamdar e, hinekên din dibêjin Êlyas e, hinekên mayîn jî dibêjin yekî ji p'êxemberan e». ²⁹ Îsa pirs da wan: «Lê hûn çi dibêjin? Bi t'exmîna we ez k'î me?» Petrûs lê vegerand got: «Tu Mesîh î». ³⁰ Ewî t'emî li wan kir, ku derheqa wîda t'u kesîr'a t'u tiştî nebêjin.

³¹ Pey vê yekêr'a Îsa destpê kir şagirtên xwe hîn kir, ku Kur'ê Meriv gerekê gelekî biçerçire, ji aliyê rûspîyanda, serokên k'ahînda û qanûnzana wêda bê avîtinê û bê kuştinê, lê roja sisyan wê ji mirinê zêndî be. ³² Ewî ev yek zelal got. Hingê Petrûs ew da alîkî û lê hilat. ³³ Lê Îsa ser milê xweva zivirî û li şagirtên xwe nihêrî, li Petrûs hilat û got: «Dûrî min k'êve, Şeytan! Çimkî nêt-fikira te ne ji Xwedê ye, lê ji merivayê ye».

³⁴ Paşê Îsa gazî k'oma merivan û şagirtên xwe kirin, gote wan: «Heger yek dixaze pey min bê, bira xwe înk'ar ke, xaçê xwe hilde û pey min bê. ³⁵ Çimkî k'î dixaze kesa xwe rizgar bike, ewê wê unda bike û k'î ku kesa xwe bona min û Mizgînîyê unda bike, ewê wê rizgar bike. ³⁶ Çi qazinc, heger meriv t'emamîya dinyayê dest bîne, lê kesa xwe unda bike? ³⁷ Yan jî meriv ber kesa xweva çi dikare bide? ³⁸ Ewê ku min û xeberên min nava vî nisilê xalîfî û gunehk'arda şerm hesab bike, Kur'ê Meriv jî wê wî şerm hesab bike, çaxê rûmeta Bavê xweva t'evî milyak'etên pîroz bê». ³⁹ Û wî gote wan: «Ez rast dibêjime we, ku hinekên li vir hizûr, wê mirinê nebînin, heta ku P'adşatîya Xwedê bi qewat tê nebînin».

ŞAGIRT NAVA NÛR Û RÛMETÊDA ÎSA DIBÎNIN

(Metta 17:1-13; Lûqa 9:28-36)

9 ¹ Pey şeş rojanr'a Îsa Petrûs, Aqûb û Yûhenna xwer'a hildan, ew rakirine ser ç'îyakî bilind, li k'u ew t'enê bûn. Hingê li ber ç'evê wan reng-rûyê wî hate guhastinê. ² K'incên wî usa çil-qerqaş bûn û usa biriqîn, ku li ser rûyê erdê t'u tişteki şûstinê nikaribû ew haqasî sipî bikira. ³ Hingê Êlyas û Mûsa wanva k'ifş bûn û Îsar'a xeber dan. ⁴ Petrûs gote Îsa: «Dersdar, çiqas baş e, ku em li vir in! De emê sê oban çê kin, yekê ter'a, yekê Mûsar'a û yekê jî Êlyasr'a». ⁵ Ewana usa tirsya bûn, ku Petrûs nizanibû çi bêje. ⁶ Wê gavê e'wrek k'ifş bû û li ser wan kire sî û dengê ji e'wr hat: «Ev e, Kur'ê minî delal! Guhdarîya wî bikin!» ⁷ Nişkêva şagirtan li dora xwe nihêrî, pêştirî Îsa t'u kes nedîtin. Û ⁸ Gava ji ç'îyê dadik'etin, Îsa t'emî li wan kir got: «We çi dît t'u kesîr'a nebêjin, heta ku Kur'ê Meriv ji mirinê zêndî be». ⁹ Şagirtan ev t'emî xwey kir û ji hevdu pirsîn, ku manîya zêndîbûna ji mirinê çi ye. ¹⁰ Û wan jê pirsî: «Gelo çima qanûnzana dibêjin pêşda gerekê Êlyas bê?»

¹¹ Ewî jî gote wan: «Rast e, pêşda Êlyas wê bê û her tiştî qedîm ke. Lê çima hatye nivîsarê, ku Kur'ê Meriv gerekê gelekî biçerçire û bê bêhurmetkirinê? ¹² Lê ez wer'a dibêjim, Êlyas hatye jî û çawa ku bona wî hatibû nivîsarê, usa jî anîne serê wî, çawa dilê wan xast».

ÎSA XORTEKÎ CINAK'ETÎ QENC DIKE

(Metta 17:14-21; Lûqa 9:37-43)

¹³ Gava vegeryane cem şagirtên din, dîtin dora wan k'omeke merivane giran girtye û qanûnzana jî wanr'a k'etibûne de'wê. ¹⁴ Hingê t'emamîya k'oma merivan, ku Îsa dît, gelekî ecêb man, berbi wî bezîn û silav danê. ¹⁵ Îsa jî şagirtan pirsî: «Hûn bona çi wanr'a k'etine de'wê?»

¹⁶ Ji nav k'oma merivan yekî li wî vegerand got: «Dersdar! Min kur'ê xweyî bi ruhê lalva girtî anî cem te. ¹⁷ Ew k'u pê digire wî erdê dixê, k'ef dêv dik'êve, diranan diç'irikîne û req dibe. Min hîvî ji şagirtên te kir, ku vî ruhî derxin, lê nikaribûn».

¹⁸ Îsa li wan vegerand got: «Hey nisilê nebawer! Heta çiqax ezê t'evî we bim? heta çiqax ezê li we sebir bikim? Wî bînine cem min». ¹⁹ Wana ew anî cem Îsa. Çaxê ku ruhê heram ç'ev Îsa k'et, pêr'a-pêr'a xort veç'irikand. Ew k'ete erdê, k'ef dêv k'et û p'irpitî. ²⁰ Îsa jî bavê wî pirsî: «Ji çiqaxda eva yeka li wî dibe?» Wî got: «Ji zar'otîyêda. ²¹ Û vî ruhî gelek caran eva avîtye nava êgir û avê, ku wî bikuje. Lê heger ji destê te tê, ç'arekê bike, bira dilê te li ser me bêşe, alîk'arîya me bike!» ²² Îsa gote wî: «Belê, heger ji destê te tê, ku bawer bikî? Bona yê bawer dike her tişt jî dibe». ²³ Wê gavê bavê xort kire qîr'în û got: «Ez bawer dikim. Alîk'arîya min jî nebawerîyê bike!» ²⁴ Gava Îsa dît, ku k'oma merivan lezelez t'opî ser wî dibe, li ruhê heram hilat û got: «Hey ruhê ker' û lal, ez fermanê didim: Ji wî derk'êve û careke din nek'evî nava wî!» ²⁵ Wî ruhî kire qîr'în, xort qayîm veç'irikand û jê derk'et. Û ew bû mîna mirîyan, usa ku gelek digot: «Ew mir!» ²⁶ Lê Îsa destê wî girt, ew rakir. Xort jî rabû ser p'îyan. ²⁷ Gava Îsa k'ete malê, şagirtên wî başqe jê pirsîn: «Çima me nikaribû ew cin derxista?» ²⁸ Îsa li wan vegerand got: «Cinê vî cûr'eyî bi t'u tiştî dernayê, pêştirî bi dua».*

* 9:29 Destnivîsarên paşwaxtîyêda aha ye: «Pêştirî bi dua û rojîyê.»

Marqos 9,10

ÎSA DÎSA BONA MIRINA XWE DIBÊJE
(Metta 17:22-23; Lûqa 9:43-45)

²⁹ Ew ji wir çûn û nav Celîlêr'a derbaz bûn. Îsa nedixast t'u kes vê yekê bihese, ³⁰ çimkî wî şagirtên xwe hîn dikir û digote wan: «Kur'ê Meriv wê bik'êve destê merivan, ewê wî bikujin, lê pey kuştinêr'a roja sisyan wê zêndî be». ³¹ Lê wana ev gotin fem nedikir, ditirsyan jî, ku jê bipirsin.

K'Î YE YÊ HERÎ MEZIN?
(Metta 18:1-5; Lûqa 9:46-48)

³² Ew hatine Kefernahûmê. Û gava Îsa malêda bû, ji şagirtan pirsî: «Hûn rêda bona çi hevr'a k'etibûne de'wê»? ³³ Wan deng nekir, çimkî rêda nava hevda xeber dabûn, k'a ji wan k'î ye yê herî mezin. ³⁴ Îsa rûnişt, gazî her donzdehan kir û gote wan: «Heger yek dixaze bibe yê pêş, gerekê bibe yê herî paş û xulamê hemûyan». ³⁵ Û destê zar'okê girt, nava wanda da sekinandinê, paşê ew zar'ok da hemêza xwe û gote wan: ³⁶ «K'î zar'oke aha bi navê min qebûl bike, ew min qebûl dike. Û k'î min qebûl dike, ew ne ku min, lê ewî ez şandime qebûl dike».

YÊ NE MIQABILÎ ME YE, EW T'EVÎ ME YE
(Lûqa 9:49-50)

³⁷ Yûhenna Îsar'a got: «Dersdar! Me merivek dît, ku bi navê te cin derdixistin, lê me nehişt, çimkî ew pey me nayê». ³⁸ Lê Îsa got: «Pêşîya wî negirin. T'u kes nîne, ku bi navê min k'iryametekê bike û pêr'a-pêr'a bikaribe hindava minda xeberên bêhurmetîyê bêje. ³⁹ Çimkî ewê ku ne miqabilî me ye, ew t'evî me ye. ⁴⁰ Ez rast dibêjime we, ewê ku t'ase av bide we, bona xatirê wê yekê, ku hûn p'ara Mesîh in, ewê maşê xwe t'u car unda neke.

JI RÊ DERXISTIN
(Metta 18:6-9; Lûqa 17:1-2)

⁴¹ K'î ku ji van biç'ûkan yekî, yê ku bawerîya xwe min tîne, ji rê derxe, bona wî hê qenc e, ku beraşek stûyê wîva bê girêdanê û bê avîtinê nava be'rê. ⁴² Heger destê te, te ji rê derdixe, wî jêke! Ter'a hê qenc e, ku tu qop bik'evî jîyînê, ne ku du destên te hebin û her'î dojê~ nava agirê ku qet natemire. ⁴³ Li wir kurm wê hişk nebin û agirê jî netemire.

⁴⁴ Heger nigê te, te ji rê derdixe, wî jêke! Ter'a hê qenc e, ku tu bêy nig bik'evî jîyînê, ne ku du nigên te hebin û bêyî avîtinê nava dojê. ⁴⁵ Li wir kurm wê hişk nebin û agirê jî netemire.

⁴⁶ Heger ç'evê te, ji rê te derdixe, wî derxe! Ter'a hê qenc e, ku tu bi ç'evêkî bik'evî P'adşatîya Xwedê, ne ku du ç'evên te hebin û bêyî avîtinê nava dojê. ⁴⁷ Li wir kurm wê hişk nebin û agirê jî netemire». ⁴⁸ Çimkî her merivek wê bi êgir bê xwêkirinê û her qurban wê bi xwê bê xwêkirinê. ⁴⁹ Xwê tiştêkî baş e. Lê heger ew te'ma xwe unda ke, hûnê çawa dîsa te'ma wê lê vege'rînin? Bira te'ma xwê nava weda hebe û hevr'a bi haştîyê bijîn».

PIRSA JINBER'DANÊ
(Metta 19:1-12; Lûqa 16:18)

10 ¹ Îsa ji wir rabû çû sînôrê Cihûstanê û derbazî wî berî ç'emê Ûrdunê bû. Dîsa k'oma merivan dorê girt û çawa xeysetê wî bû, wî dîsa ew hîn kirin. ² *Hineke ji fêrisîyan nêzikî wî bûn û ku wî bicêribînin jê pirsîn:* «Gelo li gora Qanûnê rast e, ku mêr jina xwe ber'de»? ³ Îsa caba wan da û got: «Mûsa çi t'emî da we»? ⁴ Wana got: «Mûsa destûr da, ku mêr nivîsara jinber'danê binivîse û jinê ber'de». ⁵ Lê Îsa wan'a got: «Ji dest serhişkîya we Mûsa ev t'emî wer'a nivîsî. ⁶ Lê serê-sêrida~ li dema efirandinê <Xwedê ew nêr û mê xuliqandin>. ⁷ <Ji ber vê yekê mêr wê dê û bavê xwe bihêle û xwe li jinê bigire ⁸ û her du wê bibine bedenek>.† Awa ewana îdî ne dudu ne, lê bedenek in. ⁹ Ji boy vê yekê ewên ku Xwedê ew kirine yek, bira meriv wan ji hevdu neqetîne». ¹⁰ Gava ew dîsa malêda bûn, bona vê yekê şagirtan ji wî pirsîn. ¹¹ Îsa gote wan: «K'î jina xwe ber'de û yeke din bistîne, hindava wêda zinêk'arîyê dike ¹² û heger jin jî mêrê xwe ber'de û yekî din bistîne, zinêk'arîyê dike».

P'ADŞATÎYA XWEDÊ P'ARA K'Ê YE
(Metta 19:13-30; Lûqa 18:15-30)

¹³ Awa zar'ok danîne cem Îsa, ku ew destê xwe dayne ser wan, lê şagirt li yê danîn hilatin. ¹⁴ Gava Îsa ev yek dît, hêrs k'et û wan'a got: «Bira ew zar'ok bêne cem min, pêşîya wan negirin, çimkî P'adşatîya Xwedê p'ara yê aha ye. ¹⁵ Ez rast dibêjime we, k'î P'adşatîya Xwedê mîna zar'okê qebûl neke, ew t'u car nak'êve nava wê». ¹⁶ Paşê ew zar'ok dane hemêza xwe, dest danî ser wan û dua-dîrozge li wan kir.

¹⁷ Gava Îsa rîya xweda diçû, yek berbi wî bezî, li ber wî çok veda û jê pirsî: «Dersdarê qenc, ez çi bikim, ku jîyîna heta-ha-tê war bim?»

¹⁸ Îsa gote wî: «Çima tu min'a dibêjî qenc? Qenc t'enê Xwedê ye, pêştirî wî yekî din t'une. ¹⁹ Tu t'emîyan dizanî: <Nekuje, zinêk'arîyê neke, nedize, şehdetîya derew nede, t'u kesî belengaz neke, dê û bavê xwer'a hurmetê bike>».‡

²⁰ Ewî got: «Dersdar, ev hemû jî min ji xortîyêda xwey kirine». ²¹ Îsa lê nihêrî, ew hiz kir û got: «Kêmasîke te

* 9:48 Îşaya 66:24.

† 10:6-8 Destpêbûn 1:27; 2:24.

‡ 10:19 Derk'etin 20:12-16;

hê heye. Her'e çî te heye bifiroşe, belayî feqîran ke, hingê xezna te wê li ezmên hebe. ²² Û pey min were». ²³ Li ser vê gotinê wî reng-rûyê xwe guhast û medekirî çû, çimkî gelek hebûka wî hebû. ²⁴ Îsa dora xwe nihêrî û gote şagirtên xwe: «Dewlemendan' a çiqas zehmet e, ku bik'evine P'adşatîya Xwedê!» ²⁵ Şagirt ser van gotinên wî ecêb man, lê Îsa dîsa dûmayî kir got: «Lawno! Wan' a çiqas zehmet e bik'evine P'adşatîya Xwedê, yên ku gumana xwe datînine ser hebûkê!» ²⁶ Deve wê qula derzîyê' a hê rihet derbaz be, ne ku dewlemend bik' eve P'adşatîya Xwedê». ²⁷ Şagirt gelekî ecêb man û gotine hev: «Îdî k'î dikare rizgar be?» ²⁸ Îsa li wan nihêrî û got: «Ew tişt ji destê mêriv nayê, lê ne ku ji destê Xwedê, çimkî ji destê Xwedê her tişt tê». ²⁹ Hingê Petrûs destpê kir gote wî: «Awa me her tişt hiştîye û pey te hatine». ³⁰ Îsa wan' a got: «Ez rast dibêjime we, t' u kes nîne, ku bona min û Mizgînîyê mal yan bira yan xûşk yan dê yan bav yan law yan erdên xwe hiştîbin ³¹ û li vê dinyayêda sed bare malan, biran, xûşkan, dê û law û erdan li t' evî zêrandinan nestîne û dinê axretêda jî jîyîna heta-ha-tê wê *bistîne*. ³² Lê gelekên pêş wê bibine paş û yên paş wê bibine pêş».

ÎSA CARA SISYAN BONA MIRINA XWE DIBÊJE
(Metta 20:17-19; Lûqa 18:31-34)

³² Awa ewana li rêda hevraz diçûne Orşelîmê, Îsa pêşîya wanva diçû, şagirt ecêb diman û ewên li pey wî dihatin ditirsyan. Ewî dîsa her donzdeh dane alîkî û destpê kir ew tiştên ku wê bihatana serê wî wan' a got: ³³ «Va ye em hevraz diçine Orşelîmê. Kur'ê Meriv wê bik' eve destê serokên k' ahînan û qanûnzanan. Ewê wî' a *qirara* kuştinê derxin û wî bidine destê hêtanosan[†] ³⁴ û ewana jî wê qerfê xwe li wî bikin, t' ûkinê, bidine ber qamçîyan, wî bikujin, lê roja sisyan ewê ji mirinê zêndî be».

XASTINA AQÛB Û YÛHENNA
(Metta 20:20-28)

³⁵ Hingê kur'ên Zebedî~ Aqûb û Yûhenna nêzîkî Îsa bûn û gotinê: «Dersdar, em dixazin ku em çî hîvî ji te bikin, tu bona me bikî». ³⁶ Ewî jî pirs da wan: «Hûn çî dixazin, ku ez bona we bikim?» ³⁷ Wan jê' a got: « Mer' a k' eremê bike, ku rûmeta teda ji me yek li alîyê teyî rastê, yek jî li alîyê teyî ç' epê rûnê». ³⁸ Îsa gote wan: «Hûn nizanin çî dixazin. Gelo hûn dikarin ji wê k' asê vexwin, ya ku ezê vexwim? yan jî bi wê nixamtinê bêne nixamtinê bi k' îjanê ezê bêne nixamtinê?» ³⁹ Wan gote wî: «Em dikarin». Îsa gote wan: «Belê, ji wê k' asa ku ezê vexwim hûnê vexwin û bi wê nixamtina ku ezê bêne nixamtinê, hûnê bêne nixamtinê, ⁴⁰ lê *destûra* rûniştina li alîyê minî rast û ç' epê ne destê minda ye. Ew cî bona wan in, k' îjanan' a hatine hazirkirinê». ⁴¹ Gava her dehe şagirtên din ev yek bihîst, dilê wan jî Aqûb û Yûhenna ma. ⁴² Lê Îsa gazî wan cem xwe kirin û got: «Hûn dizanin ku mîrên miletan zordestîyê li ser cimeta xwe dikin û giregîrên miletan jî hikumî li ser wan dikin. ⁴³ Lê nava weda gerekê ne usa be. K' î ku nava weda dixaze bibe yê mezin, gerekê bibe berdestîyê we. ⁴⁴ Û k' î ku nava weda dixaze bibe pêş, gerekê bibe xulamê hemûyan. ⁴⁵ Çimkî Kur'ê Meriv jî nehatye ku wî' a berdestîyê bikin, lê ew xwexa berdestîyê bike û canîya xwe bide, ku gelekên bik' ir' e».

ÎSA Ç' EVÊ P' ARSEKEKÎ KOR LI BAJARÊ ERÎHAYÊDA VEDIKE
(Metta 20:29-34; Lûqa 18:35-43)

⁴⁶ Paşê ew hatine Erîhayê. Gava Îsa bi şagirtên xwe û k' omeke merivane giranva t' evayî ji bajêr derk' et, Kur'ê Tîmeyo~ Bartîmeyoyê kor li ser rê rûniştîbû, p' ars dikir. ⁴⁷ Gava bihîst, ku Îsayê Nisretê derbaz dibe, destpê kir kire qîr' in û got: «Îsayê Kur'ê Dawid, min were rehmê!» ⁴⁸ Gelekên li wî hilat, ku dengê xwe bibir' e, lê wî hê dikire qîr' in û digot: «Kur'ê Dawid, min were rehmê!» ⁴⁹ Îsa sekinî û got: «Gazî wî kin». Gazî yê kor kirin û gotine wî: «Ç' evê te ron! Rabe *bisekine*, gazî te dike». ⁵⁰ Ewî jî p' otê xwe avît, rabû ser p' îyan û hate cem Îsa. ⁵¹ Îsa jê pirsî: «Tu çî ji min dixazî, ku ez bona te bikim?» Yê kor got: «Dersdar, dixazim ç' evên min bibînin». ⁵² Û Îsa gote wî: «Her' e, bawerîya te tu qenc kirî». Û hingê ç' evên wî dîtin, da pey Îsa çû.

ÎSA BI RÛMET DIÇE ORŞELÎMÊ
(Metta 21:1-11; Lûqa 19:28-40; Yûhenna 12:12-19)

11 ¹ Gava ewana nêzîkî Orşelîmê bûn, gundên Beytfacê û Beyta-nyayêva gihîştine ç' îyayê Zeytûnê, hingê Îsa du şagirtên xwe şandin ² û wan' a got: «Her' ine wî gundê pêşberî xwe. Hema çawa hûn bik' evinê, hûnê çeşikeke girêdayî bibînin, ku hê t' u kes lê sîyar nebûye. Wê vekin û bînin. ³ Û heger yek ji we bipirse bêje: <Çima hûn vê yekê dikin?> bêjinê: <Xudan' a lazim e û ewê pê' a-pê' a bişîne vir>». ⁴ Ew şagirt çûn û li ber derî, k' ûçêda, çeşikeke girêdayî dîtin. Gava vedikirin, ⁵ hinekên wir sekinî pirsîn: «Hûn çî dikin? çima wê çeşikê vedikin?» ⁶ Şagirtan caba wan usa da, çawa Îsa wan' a gotibû. Û ew hiştin. ⁷ Çeşik Îsar' a anîn, k' incên xwe avîtime ser wê û ew li wê sîyar bû. ⁸ Gelekên jî k' incên xwe ser rê radixistin, hinekan jî ji k' ewşên çiqilên daran dibir' in, ser rê radixistin. ⁹ Yên ku li pêşîya wî û pey wîva diçûn dikirine qîr' in: «Hosanna! Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê!» ¹⁰ Bimbarek e P' adşatîya bavê me Dawid, ku tê. Hosanna li jorê!»

¹¹ Îsa k' ete Orşelîmê, çû p' aristanê. Li ber ç' evê xwer' a her tişt derbaz kir, lê çimkî îdî êvar bû, t' evî her donzdehan çû Beytanyayê.

* 10:21 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «Û xaçê xwe hilde, pey min were.»

† 10:33 Hêtanos ew bûn, yên ku p' ût dihebandin.

‡ 11:9 Zebûr 118:25,26.

Marqos 11,12

ÎSA NIFIR DARA HÊJÎRÊ DIKE
(Metta 21:18-19)

¹² Roja din, gava ew ji Beytanyayê derdik'etin, Îsa birçî bû. ¹³ Ji dûrva dareke hêjîrêye belgdayî dît, berbi wê çû, ku belkî tişteki ser bibîne. Gava gihîşte darê, pêştirî belgan t'u tişt nedît, çimkî hê ne waxtê hêjîran bû. ¹⁴ Hingê ewî darê'a got: «Bira îdî t'u kes berê te t'u car nexwe». Şagirtên wî ev gotin bihîstin.

ÎSA P'ARISTXANÊDA
(Metta 21:12-17; Lûqa 19:45-48; Yûhenna 2:13-22)

¹⁵ Ew hatine Orşelîmê. Îsa k'ete p'aristxanê û destpê kir ewên ku p'aristxanêda dik'ir'în û difirotin derxistine derva. T'extên serafan û k'ursîyên kewfiroşan welgerandin ¹⁶ û îzina t'u kesî neda, ku tişteki p'aristxanê'a derbaz ke. ¹⁷ Ew hîn kirin û got: «Ê ne nivîsar e: <Mala min bona her miletan wê mala duakirinê bê hesabê>? Lê we ew kirye şkefta t'alank'aran». ¹⁸ Serokên k'ahînan û qanûnzanan eva yeka bihîstin, destpê kirin mecalekê biger'in, ku bikine fesalê wî bikujin. Ewana ji wî ditirsyan, çimkî k'oma merivan t'emam pêva ser hînkirina wî zendegirtî mabû. ¹⁹ Berî êvarê ew ji bajêr derk'etin.

DERSA DARA HÊJÎRÊ
(Metta 21:20-22)

²⁰ Serê sibehê, gava ewana ber dara hêjîrê'a derbaz bûn, dîtin wê ew ji rawê xweda hişk bûye. ²¹ Hate bîra Petrûs û wî Îsar'a got: «Dersdar, binihêre, ew dara hêjîrêye ku te nifir lê kir hişk bûye». ²² Îsa gote wan: «Bawerîya we bira ser Xwedê hebe. ²³ Ez rast dibêjime we, k'î ku vî ç'iyayîr'a bêje: <Rabe xwe bavêje be'rê> û dudilî nebe, lê bawer bike, ku gotina wî wê bê sêrî, wê usa jî bibe. ²⁴ Bona vê yekê ez dibêjime we, hûn çî ku nava duada bixazin, bawer bikin, ku hûnê bistînin û xastina we wê bibe. ²⁵ Ê çaxê hûn disekinin dua dikin, heger tişteki we hindava yekîda hebe bibaxşînine wî, ku Bavê weyî ezmanan jî neheqîyên we bibaxşîne we. ²⁶ Lê heger hûn nebaxşînin, Bavê weyî ezmanan jî neheqîyên we nabaxşîne we».

PIRSA LI SER HIKUMÊ ÎSA
(Metta 21:23-27; Lûqa 20:1-8)

²⁷ Ê ew dîsa hatine Orşelîmê. Dema ku Îsa p'aristxanêda diger'ya, serokên k'ahînan, qanûnzanan û rûspî hatine cem wî ²⁸ û jê pirsîn: «Tu bi çî hikumî van tiştan dikî? K'ê ev hikum daye te, ku tu van kiran bikî?» ²⁹ Îsa gote wan: «Ezê jî tişteki ji we bipirsim. Heger we caba min da, ezê jî wer'a bêjim, ez bi çî hikumî van kiran dikim: ³⁰ Hikumê nixamtina Yûhenna ji ezmên bû yan ji merivan? Caba min bidin!» ³¹ Ew nava hevda şewrîn û gotin: «Heger em bêjin: <Ji ezmên bû>, wê bêje: <Lê çima we bawerîya xwe wî neanî>? ³² Lê heger em bêjin: <Ji merivan bû>» Ew ji k'oma merivan ditirsyan, çimkî hemûyan qebûl kiribû, ku Yûhenna rast p'êxember bû. ³³ Caba Îsa dan û gotin: «Em nizanin». Îsa gote wan: «Ez jî wer'a nabêjim, ku bi çî hikumî van kiran dikim».

MESELA BAX Û BAXVANAN
(Metta 21:33-46; Lûqa 20:9-19)

12 ¹ Ê bi meselan dest bi xeberdanê kir, wan'r'a got: «Merivekî bax danî, dorê sûr kir, hewzek têda k'ola, kelak çê kir û ew da baxvanan, *bona p'aletîyê* û çû welatekî din. ² Waxtê *bert'opkirinêda* xulamêk şande cem baxvanan, ku ji berê bax bistîne. ³ Lê wana ew girt, lêxistin û destevala verêkirin. ⁴ Ê ewî dîsa xulamêkî din şande cem wan, lê wana serê wî şkenand û ew bêhurmet kirin. ⁵ Ewî yekî din şand, wana ew jî kuşt. Wî gelekên din şandin, wana ji wan hinekan xistin û hinek jî kuştin. ⁶ Bona wî t'enê yek mabû, ku bişanda, kur'ê wîyî delal. Xulese rabû ew jî şand, got: <Belkî ji kur'ê min şerm bikin>. ⁷ Lê baxvan li hev şewrîn û gotin: <Ev e warxurê wî! Werin em vî bikujin, mîratê mer'a bimîne>. ⁸ Hingê ew girtin kuştin û cinyazê wî ji bax derxistine der. ⁹ De îcar xweyê bax wê çî bike? Ê ne ewê bê qir'a baxvanan bîne û bax bide hinekên din? ¹⁰ Çima we ew nivîsar nexandye? <Ew kevirê ku hosteyan wêda avît, bû serê e'nîşkê. Eva yeka ji Xudanda bû û li ber ç'evên me ew heyr-hujmek'ar e>! ¹² *Serokên cihûyan* fem kirin, ku Îsa eva mesele anî ser wan, xastin wî bigirin, lê ji k'oma merivan tirsyan û ji k'erba ew hiştin çûn.

PIRSA XERC DAYÎNÊ Û ZÊNDÎBÛNA MIRÎYAN
(Metta 22:15-33; Lûqa 20:20-40)

¹³ Paşê wana hineke ji fêrisîyan û piştgirên Hêrodes şandine cem wî, ku wî bi xeberên devê wî bigirin. ¹⁴ Ew hatin û gotine wî: «Dersdar! Em dizanin, ku tu yekî rast î. Minetê ji t'u kesî nagirî, çimkî firqiyê nakî nava merivan, lê rîya Xwedê rast hîn dikî. Gelo rast e xerc bidine Qeyser yan na? Em bidin yan nedin?» ¹⁵ Lê durûtîya wan Îsava vebû got: «Çima hûn min dicêribînin? Min'r'a zîvekî bînin, ku ez binihêrim». ¹⁶ Wana jê'r'a zîvek anî. Ewî pirs da wan: «Ev nivîsar û sifet yên k'ê ne?» Wana got: «Yên Qeyser in». ¹⁷ Îsa gote wan: «Ku usa ye, çî yên Qeyser in bidine Qeyser û çî ku yên Xwedê ne bidine Xwedê». Ê ser wî ecêb man.

¹⁸ Hinek sadûqîyên ku digotin mirî zêndî nabin, hatine cem Îsa û jê pirsîn: ¹⁹ «Dersdar! Mûsa mer'a nivîsiye:

* 11:17 Îşaya 56:7; Yêremîya 7:11.

† 12:11 Zebûr 118:22,23.

<Heger birê yekî bêzuret bimire û jinê bihêle, birayê wî bira jina wî bistîne û zuret pey birê xwe xe>. ²⁰ Awa heft bira hebûn. Birê mezin jinek stand, bêzuret mir. ²¹ Yê pey wîr'a ew jin stand, ew jî bêzuret mir, usa jî hate serê yê sisyan. ²² Xulese van her heftan jî ew jin stand û bêzuret mirin, pey wanr'a ew jin jî mir. ²³ De îcar, Roja Zêndîbûnê~ çaxê mirî zêndî bin, evê bibe jina ji wan k'îjanî? çimkî her heftan jî ew standibû>.

²⁴ Îsa li wan vegerand got: «Hûn *hema* ji bona vê yekê xalîfî ne, ku ne nivîsaran dizanin û ne jî qewata Xwedê? ²⁵ Çaxê mirî zêndî bin, wê ne bizewicin, ne jî mêr kin, çimkî ewê mîna milyak'etên ezmanan bin. ²⁶ Lê derheqa zêndîbûna mirîyanda, gelo we Kitêba Mûsada nexandye~ serhatîya dara mormorkêda, ku çawa Xwedê Mûsar'a dibêje: <Ez Xwedêyê Îbrahîm, Xwedêyê Îshaq û Xwedêyê Aqûb im>? ²⁷ Ew ne Xwedêyê mirîyan e, lê Xwedêyê zêndîyan e. Bi rastî jî hûn lap xalîfî ne!»!

T'EMÎYA HERE MEZIN
(Metta 22:34-40; Lûqa 10:25-28)

²⁸ Qanûnzaneke ku de'w-doze wan bihîst û dît ku çawa Îsa qenc caba wan da, nêzîkî Îsa bû û jê pirsî: «K'îjan e t'emîya ser her t'emîyanr'a»? ²⁹ Îsa lê vegerand: «T'emîya ser t'emîyanr'a ev e: <Bibihê, Îsraêl! Xudan Xwedêyê me Xudaneke e. ³⁰ Xudan Xwedêyê xwe hiz bike, bi t'emamîya dilê xwe, bi t'emamîya canîya xwe, bi t'emamîya hişê xwe û bi t'emamîya qewata xwe>. ³¹ Ev e temîya pêşin. ³¹ Ya dudan jî ev e: <Hevalê xwe weke xwe hiz bike>. ³² Li ser wanr'a t'u t'emî nîne». ³² Qanûnzana jî gote wî: «Rast e, Dersdar! Te rast got, ku Xudan yek e û pêştirî wî yekî din t'une. ³³ Û bi t'emamîya dil, bi t'emamîya aqil û bi t'emamîya qewatê Xwedê hizkirin û hevalê xwe jî weke xwe hizkirin ser her qurbanên şewitandinê û qurbanên mayînr'a ye». ³⁴ Îsa dît, ku wî bi aqilî caba xwe da, gote wî: «Tu ji P'adşatîya Xwedê ne dîr î». Pey vê yekêr'a, îdî t'u kesî newêrbû tişteke ji wî bipirsîya.

MESÎH KUR'Ê K'Ê YE?
(Metta 22:41-46; Lûqa 20:41-44)

³⁵ Gava Îsa p'aristxanêda hîn fikir, got: «Qanûnzana çawa dibêjin, ku Mesîh kur'ê Dawid e? ³⁶ Ê ne Dawid xwexa bi Ruhê Pîroz dibêje? <Xudan gote Xudanê min: Li aliyê minî rastê rûnê, heta ez dijminên te bikime binê p'îyên te>. ³⁷ Awa, Dawid ku xwexa wî Xudan hesab dike, îdî Mesîh çawa dibe kur'ê Dawid?»

HEVZA XWE JI QANÛNZANAN BIKIN
(Metta 23:1-36; Lûqa 20:45-47)

Wê k'oma merivane giran bi hewas guhdarîya Îsa fikir. ³⁸ Hînkirina xweda ewî digot: «Hevza xwe ji wan qanûnzanan bikin, yên ku hiz dikin bi k'incên dirêj biger'in, bazaranda silavê bistînin, ³⁹ k'inîştanda k'ursîyên pêşin bigirin û şayîyanda jî serê jorin rûnên. ⁴⁰ Evana alîkîva malên jinebîyan hûfî xwe dikin, aliyê dinva jî bi durûtî duayê xwe dirêj dikin. Dîwana wanê hê giran be».

HEDÎYA JINEBÎYA K'ESÎB
(Lûqa 21:1-4)

⁴¹ Îsa li pêşberî p'eredanga p'aristxanê rûnişt û nihêrî, ku k'oma merivan çawa p'ere davîtine p'eredangê. Gelek dewlemendan gelek avîtinê. ⁴² Jinebîke k'esîb jî hat û du pol avîtinê, ku dikire qurûşek. ⁴³ Îsa gazî şagirtên xwe cem xwe kirin û gote wan: «Ez rast dibêjime we, ku evê jinebîya k'esîb ji van hemûyan zefîr avîte p'eredangê, ⁴⁴ Van hemûyan ji zêdeya hebûka xwe avîtinê. Lê evê vê k'esîbîya xweda çî wê hebû, ku bi wê xwe xwey bikira, hemû avîtê».

ÎSA BONA WÊRANBÛNA P'ARISTXANÊ Û AXIRÎYA DINYAYÊ DIBÊJE
(Metta 24:1-44; Lûqa 21:5-33)

13 ¹ Gava Îsa ji p'aristxanê derk'et, ji şagirtên wî yekî gotê: «Dersdar! Hela binihêre ev çî kevir in û çî xanî ne!»! ² Îsa li wî vegerand got: «Tu van xanîyên mezin dibînî? Ev hemûyên jî wêran bin, li vir kevirê li ser kêvir nemîne!»!

³ Gava Îsa ser ç'iyayê Zeytûnê, li pêşberî p'aristxanê rûniştibû, Petrûs, Aqûb, Yûhenna û Endrawisva başqe jê pirsîn: ⁴ «Bêje me, ew tiştê çîçax bibin? Û çî nîşan wê li dema bûyîna van tiştan bibe?» ⁵ Hingê Îsa caba wan da û got: «Miqatî xwe bin, ku t'u kes we nexapîne. ⁶ Gelek wê bi navê min bên û bêjin: <Ez im Mesîh> û wê gelean bixalîfînin. ⁷ Çaxê hûn dengê şer'an û be'sa şer'an bibihên, xwe unda nekin. Gerekê ev tişt bibin, lê ew hê ne axirî ye. ⁸ Miletê rabe li ser millet, p'adşatîyê rabe li ser p'adşatîyê, cî-cîyan erdhej, xelayî û raberîbûn wê bibin. Lê ev hemû mîna êşa k'ulfetê ye, ku destpê dike pê digire.

⁹ Miqatî xwe bin! Wê we bibine ber dîwanan û k'inîştanda wê we xin. Bona min wê we li ber hizûra welî û p'adşan bidine sekinandinê, ku hûn ber wan şehdetîyê bidin. ¹⁰ Gerekê pêşda Mizgînî li her milletanr'a bê dayîne. ¹¹ Çaxê we bigirin bibine ber dîwanê, pêşda xem nekin, ku hûnê çî bêjin. Lê hingê çî wer'a bê dayîne, wê jî bêjin, çimkî ne ku hûnê xeber din, lê Ruhê Pîroz. ¹² Bira birayê xwe wê bide kuştinê û bav kur'ê xwe. Law wê rabine

* 12:26 Derk'etin 3:6.

† 12:30 Qanûna Ducarî 6:4,5.

‡ 12:31 Qanûna K'ahintîyê 19:18.

§ 12:36 Zebûr 110:1.

ber dê-bavê xwe û wana bidine kuştinê. ¹³ Û bona navê min hûnê ber ç'evên hemûyan reş bin. Lê yê heta xilazîyê teyax ke, ewê rizgar be.

¹⁴ Çaxê hûn Heramîya Wêrankirinê* bibînin, ku li cîyê *pîrozda* cî girtye, çî ku ne cayîz e», (yê dixûne bira fem bike) «hingê ewên ku Cihûstanêda ne bira birevine ç'îyan. ¹⁵ Û ewê ku ser xanî ye bira jorda neyê xwarê û nek'eve hindur, ku tiştêkî hilde. ¹⁶ Û ewê ku k'ewşênda ye bira venegere, ku p'otê xwe hilde. ¹⁷ Lê wey li hemlan û destdergûşan wan rojanda! ¹⁸ Dua bikin, ku ev tişt li zivistanê nebin. ¹⁹ Çimkî wan rojanda wê tengasîke usa bibe, ku ji wê rojêda, ku Xwedê dinya efiandye heta niha nebûye û ne ji wê bibe. ²⁰ Heger Xudan ew roj kin nekirina, t'u kesê rizgar nebûya, lê bona xatirê wan hilbijartîyên ku wî hilbijartine, ewî ew roj kin kirine.

²¹ Hingê, heger yek wer'a bêje: <Mesîh va ye li vir e> yan jî: <Wa ye dera han e>, bawer nekin. ²² Çimkî mesîh û p'êxemberên derew wê derk'evin. Wê nîşan û k'iryametan bikin û heger ji destê wanva bê, wê yên hilbijartî jî bixalifînin. ²³ Lê hûn miqatî xwe bin! Min her tişt hê pêşda wer'a got. ²⁴ Lê wan rojanda, pey wê tengasiyêr'a, <rûyê te'vê wê bê girtinê û hîvê ronaya xwe nede, ²⁵ steyrk wê ji ezmên bik'evin û t'opên ezmanan wê ji rîyên xwe derk'evin>.[†]

²⁶ Û hingê wê bibînin, Kur'ê Meriv bi qewat û rûmeta mezin e'wranva tê. ²⁷ Hingê ewê milyak'etên xwe bişîne û hilbijartîyên xwe ji her çar qulban bicivîne~ ji p'er'ê erdê girtî heta p'er'ê ezmên. ²⁸ Ji dara hêjîrê dersekê hûn bin: Çaxê çiqilên wê ter' dibin û belgên wê dibişkivin, îdî hûn dizanin, ku havîn nêzîk e. ²⁹ Usa jî çaxê hûn bibînin, ku ev yek dibin, bizanîbin ku *hatina Kur'ê Meriv* nêzîk e, li ber şemîkê ye. ³⁰ Ez rast dibêjime we, eva nisila derbaz nabe, heta ku ev her tişt nebin. ³¹ Erd û ezmanê derbaz bin, lê gotinên min t'u car derbaz nabin. ³² Lê bona wê rojê û sihetê t'u kes nizane, ne milyak'etên ezmên, ne jî Kur', lê t'enê Bav. ³³ Miqatî xwe bin! Hişyar bimînin û dua bikin! Çimkî hûn nizanin çîçax waxt wê pêr'a bigihîje. ³⁴ Ev dem mîna vê yekê ye: Merivek mala xwe dihêle û diçe rêwîtiyê. Berî çûyîne t'emîya mala xwe dide xulamên xwe~ k'arê ji wan her kesî dide wan û ferman dike ser dergêhvan, ku hişyar bimîne. ³⁵ Bona vê yekê hişyar bimînin, çimkî hûn nizanin malxê malê wê çîçax bê, êvarê yan nîvê şevê yan li dema bangdana dîk yan serê sibehê. ³⁶ Nebe ku nişkêva ew bê û we xewêda bigire. ³⁷ Ez çî dibêjime we, hemûyan'r'a dibêjim: Hişyar bimînin!»

ŞÊWRA KUŞTINA ÎSA

(Metta 26:1-5; Lûqa 22:1-2; Yûhenna 11:45-53)

14 ¹ Awa du rojan şûnda wê Cejina Derbazbûnê û Cejina Nanê Şkeva bibûya. Serokên k'ahînan û qanûnzanan mecalekê dager'yan, ku çawa Îsa dizîva bi fêlbazîyê bigirin, bikujin, ² wan digot: «Bira ev yek cejinêda nebe, ku cimet ranebe ber me».

ÎSA BEYTANYAYÊDA TÊ GULRÛNKIRINÊ

(Metta 26:6-13; Yûhenna 12:1-8)

³ Gava Îsa li Beytanyayê mala Şimhûnê k'otîda li ser sifrê rûniştî bû, k'ulfetek hat, derdaneke wêye alabastirêyî rûnê nardêyî safî û gelekî qîmetgiran hebû. Wê ew şûşe şkenand û ew rûn rête ser serê Îsa.

⁴ Hinekên li wir hêrs k'etin û hevr'a digotin: «Heyfa vî rûnî! Çima eva zîyana bû? ⁵ Me dikaribû ev rûn sêsîd zîvî zêdetir bifirota û belayî feqîran kira». Û aha ew k'ulfet rezîl kirin. ⁶ Lê Îsa got: «Ji wê k'ulfetê vegezin! Çima hûn xatirê wê dik'evin? Ewê tiştêkî qenc bona min kir. ⁷ Feqîr wê her t'im wer'a bin. Çîçax hûn bixazin, dikarin qencîyê li wan bikin. Lê ezê her t'im ne nava weda bim. ⁸ Çî ji destê wê dihat ewê kir. Ewê pêşda bedena min bona danîna mine li t'irbê ez gulrûn kirim. ⁹ Ez rast dibêjime we, dinyayêda li k'u eva Mizgînîya bê dannasînkirinê, wê kirina vê k'ulfetê jî bona bîranîna wê bê gotinê».

CIHÛDA NEMAMÎYA ÎSA DIKE

(Metta 26:14-16; Lûqa 22:3-6)

¹⁰ Hingê Cihûdayê Îsxeryotî, yekî ji her donzdehan, çû cem serokên k'ahînan, ku Îsa bide destê wan. ¹¹ Wan jî gava ev bihîst, şa bûn û p'ere soz dane wî. Cihûda jî hingêda mecalekê diger'ya, ku çawa Îsa bide destê wan.

ÎSA Û ŞAGIRT ŞÎVA CEJINA DERBAZBÛNÊ DIXWIN

(Metta 26:17-25; Lûqa 22:7-13, 21-23; Yûhenna 13:21-30)

¹² Roja pêşine Cejina Nanê Şkevada, ku berxa qurbana Cejina Derbazbûnê dihate serjêkirinê, şagirtan jî Îsa pirsî: «Tu li k'u dixazi Şîva Cejina Derbazbûnê bixwî, ku em her'in ter'a hazir bikin?» ¹³ Îsa du şagirtên xwe şandin û gote wan: «Her'ine bajêr. Merivek wê rastî we bê, cêr'ê avê li ser milan. Pey wî her'ine wê mala ku ew diçe ¹⁴ û xweyê malê'r'a bêjin: <Dersdar dibêje: K'anê ye ew oda mêvanan, ya ku ezê wêda bi şagirtên xweva t'evayî Şîva Cejina Derbazbûnê bixwim?» ¹⁵ Hingê ewê li qatê jorin odexaneke mezine hevdayî û hazir nîşanî we bike, li wir bona me Şîvê hazir bikin». ¹⁶ Şagirt k'etine rê, çûne bajêr û çawa ku Îsa wan'r'a gotibû usa jî dîtin û Şîva Cejina Derbazbûnê hazir kirin.

¹⁷ Berî êvarê Îsa t'evî her donzdehan çû wê derê. ¹⁸ Gava li ser sifrê rûniştin û nan dixwarin, Îsa got: «Ez rast

* 13:14 Danîyêl 9:27; 11:31; 12:11.

† 13:25 Îşaya 13:10; 34:4.

dibêjime we, yekî ji we, yê ku t'evî min nan dixwe wê nemamîya min bike». ¹⁹ Ew ber xwe k'etin û destpê kirin yeko-yeko jê pirsîn: «Xa ne ez im»? ²⁰ Ewî gote wan: «Ji we her donzdehan ew e, yê ku parîyê xwe t'evî min t'asêda dike. ²¹ Rast Kur'ê Meriv wê usa her'e, çawa bona wî hatye nivîsarê. Lê wey li wî merivê ku nemamîya Kur'ê Meriv bike! Wîr'a hê qenc bû, ku ew qet nehata dinyayê».

ŞÎVA XUDAN

(Metta 26:26-30; Lûqa 22:14-20; 1 Korintî 11:23-25)

²² Gava wana hê nan dixwar, Îsa nan hilda şikirî da, ker kir da şagirtan û got: «Han hildin! Eva bedena min e». ²³ Peyr'a k'as hilda şikirî da û da wan. Hemûyan jî ji wê vexwar. ²⁴ Ê gote wan: «Eva xûna min e, bona Peymana Nû, ku bona gelekane tê rêtinê. ²⁵ Ez rast dibêjime we, îdî ji vir hada ez ji berê vê mêmê venaxwim, heta wê roja ku ezê P'adşatîya Xwedêda ji ya nû vexwim». ²⁶ Paşê wana zebûrek stira û derk'etin çûne ç'iyayê Zeytûnê.

ÎSA DERHEQA ÎNK'ARÎYA PETRÛSDA DIBÊJE

(Metta 26:31-35; Lûqa 22:31-34; Yûhenna 13:36-38)

²⁷ Ê Îsa gote wan: «Hûn hemûyên jî îşev ji min p'îşk bin her'in, çimkî nivîsar e: <Ezê şivên xim û pezê belabelayî bin>». ²⁸ Lê çaxê ez ji mirinê zêndî bim, ezê berî we her'ime Celîlê». ²⁹ Petrûs gote wî: «Heger hemû jî ji te p'îşk bin dîr k'evin, lê ez na».

³⁰ Îsa gote wî: «Ez rast dibêjime te, hema îşev, hê berî ku dîk du caran bang bide, tuê sê caran min înk'ar kî». ³¹ Lê Petrûs hê zêde dida zora xwe digot: «Heger cî bê, ezê ter'a bimirim jî, lê qet te înk'ar nakim!» Hemûyan jî aha digot.

ÎSA LI GÊTŞEMANÎYÊDA DUA DIKE

(Metta 26:36-46; Lûqa 22:39-46)

³² Pey wê yekêr'a ew çûne wê dera ku jêr'a Gêtşemanî dibêjin û wî gote şagirtên xwe: «Li vir rûnên, heta ez dua bikim». ³³ Wî Petrûs, Aqûb û Yûhenna xwer'a birin û destpê kir k'eser k'işand û xweda şewtî. ³⁴ Wî gote wan: «Dilê min haqas derd û k'eder e, mîna ber mirinê. Li vir bimînin û hişyar bin». ³⁵ Hinekî pêşda çû, xwe deverûya avîte erdê û dua kir, ku heger mecal hebe, eva siheta ser wîr'a derbaz be. ³⁶ Ê got: «Abba, Bavo! Her mecal ji destê te tê. Evê k'asê ji min dîr xe. Lê ne ku daxaza min be, lê ya te be».

³⁷ Paşê hate cem şagirtan, ew razayî dîtin û gote Petrûs: «Şimhûn, tu razayî? Tu nikaribûyî sihetekê hişyar bimayî? ³⁸ Hişyar bimînin, dua bikin, ku nek'evine nav cêribandinê. Belê, ruh razî ye, lê beden sist e».

³⁹ Dîsa çû dua kir, hema ew xeber gotin. ⁴⁰ Ê hat dîsa ew xewêda dîtin, çimkî ç'evên wan ji xewê venedibûn. Ê nizanibûn çi caba wî bidana. ⁴¹ Cara sisyan jî hat, gote wan: «Hûn hê razayî ne û rihet dibin? Bes e! Dem pêr'a gihîşt. Va, Kur'ê Meriv dik'eve destê gunehk'aran. ⁴² Rabin em her'in. Va ye, yê nemamîya min dike nêzik bû».

BENDKIRINA ÎSA

(Metta 26:47-68; Lûqa 22:47-55, 63-71; Yûhenna 18:3-14, 19-24)

⁴³ Hema hingê, gava wî hê xeber dida, Cihûdayê ku yek ji her donzdehan bû hat. Wî ji alîyê serokên k'ahînan, qanûnzanan û rûspîyanda k'omeke merivane giran xwer'a anîbû, bi daran û şûran. ⁴⁴ Awa nemamê wî eşaret dabû wan û gotibû: «Ez her'ime rûyê k'ê, ew e, wî bigirin û bi fesal bibin». ⁴⁵ Hema hingê Cihûda hate cem Îsa û got: «Dersdar!» û çû rûyê wî.

⁴⁶ Wan destên xwe dirêjî Îsa kirin girtin. ⁴⁷ Lê yekî ji yên t'evî Îsa sekinî, şûrê xwe k'işand xulamê serokk'ahîn xist û guhê wî pekand. ⁴⁸ Hingê Îsa gote wan: «Qey bêjî, hûn derk'etine ku yekî t'alank'ar bigirin, ku bi daran û şûran hatine min bigirin? ⁴⁹ Ê ne ez her roj t'evî we p'aristxanêda bûm, min hûn hîn dikirin, lê we ez nedigirtim. Lê ev yek bû, ku nivîsar bêne sêrî». ⁵⁰ Hingê hemû şagirtan ew hişt û revîn. ⁵¹ Cahilek pey wî diçû, p'arçekî k'itanî li bedena wîye tazî wergirtî bû. K'oma merivan ew girt, ⁵² lê wî ew k'itan hişt û tazî ji destê wan revî. ⁵³ Îsa birine cem serokk'ahîn. Hemû serokên k'ahînan, rûspî û qanûnzanan wir civyan. ⁵⁴ Petrûs dîrva p'ê-p'ê pey wî çû, heta ku k'ete hewşa serokk'ahîn. Wir t'evî nobedaran ew li ber êgir rûnişt û xwe germ dikir. ⁵⁵ Serokên k'ahînan û t'emamîya civîna giregiran jî li şehdetîke miqabilî Îsa dager'yan, ku wî bikujin, lê ne didîtin. ⁵⁶ Gelekane miqabilî wî şehdetîya derew dida, lê şehdetîyên wan li hev nedigirtin. ⁵⁷ Hingê hinek rabûn û miqabilî wî şehdetîya derew dan û gotin: ⁵⁸ «Me bihîst, ku vî merivî digot: <Ezê vê p'aristxana bi destan çê kirî hilşînim û sê rojanda p'aristxaneke dine ne bi destan çê kim>». ⁵⁹ Lê şehdetîya wan jî li hev nedigirt. ⁶⁰ Hingê serokk'ahîn nava wanda rabû ser p'îyan û ji Îsa pirsî: «Bona van şehdetîyên ku evana miqabilî te didin çima tu cabekê nadi?» ⁶¹ Lê ewî dengê xwe nekir û t'u cab neda. Serokk'ahîn dîsa ji wî pirsî û got: «Tu yî Mesîh, Kur'ê Yê Pîroz?» ⁶² Îsa got: «Ez im. Ê hûnê Kur'ê Meriv li cem Yê Zor, li alîyê wîyî rastê rûniştî û li ser e'wrên ezmênva tê bibînin». ⁶³ Hingê serokk'ahîn k'incên xwe qelaştin û got: «Îdî şehde çî mer'a ne? ⁶⁴ We k'ifirîyên wî bihîst! Weva çawa k'ifş dibe?» Hemûyan jî ew neheq kirin gotin, ku ew yê kuştinê ye. ⁶⁵ Hingê hinekan destpê kir t'ûyî wî kirin, rûyê wî nixamtin, dane ber k'ulman û jêr'a gotin: «De p'êxembertîyê bike!» Nobedaran jî ew bir û dane ber şemaqan.

* 14:27 Zekerîya 13:7.

Marqos 14,15

PETRÛS ÎSA ÎNK'AR DIKE

(Metta 26:69-75; Lûqa 22:56-62; Yûhenna 18:15-18, 25-27)

⁶⁶ Gava Petrûs li jêrê hewşêda bû, ji cariyên serokk'ahîn yek hate wir. ⁶⁷ Ewê ku dît Petrûs xwe li ber êgir germ dike, lê nihêrî û got: «Tu jî t'evî Îsayê nisretî bûyî». ⁶⁸ Lê wî înk'ar kir got: «Ez nizanîm û fem nakim tu çi dibêjî». Ew jî hewşê derk'ete sivderê, dîk bang da. ⁶⁹ Gava cariyê ew li wir dît, dîsa merivên dora xwer'a got: «Eva jî yekî ji wan e». ⁷⁰ Lê ewî dîsa înk'ar kir. Û hinekî şûnda, yên li wir hizûr dîsa gotine Petrûs: «Bi rastî jî tu ji wan î, çimkî ji Celîlê yî û zaravê te jî te difiroşe». ⁷¹ Lê Petrûs dest bi nifiran kir, sond xwar û got: «Ez wî merivî nas nakim, bona k'îjanî hûn dibêjin». ⁷² Pêr'a-pêr'a dîk cara dudan bang da. Û Petrûs ew gotina ku Îsa wîr'a gotibû anî bîra xwe: «Berî ku dîk du caran bang bide, tuê sê caran min înk'ar kî». Û destpê kir girîya.

PÎLATO Û DÎWANA KUŞTINA ÎSA

(Metta 27:1-2, 11-30; Lûqa 23:1-25; Yûhenna 18:28-39-19:2,3,16)

15 ¹ Serê sibehê zû serokên k'ahînan t'evî rûspîyan, qanûnzanan û t'emamîya civîna giregiran şewrîn. Îsa girêdan û birin dane destê Pîlato. ² Pîlato jî wî pirsî û got: «Tu yî P'adşayê cihûyan»? Ewî cab da û got: «Te bi zarê xwe got». ³ Serokên k'ahînan gelek tiştanda ew gunehk'ar dikirin. ⁴ Pîlato dîsa jî wî pirsî û got: «Tu qet cabekê nadi? Binihêre, çiqasî ji te gilî dikin!» ⁵ Lê Îsa îdî t'u cab neda wî, heta ku Pîlato şaş ma. ⁶ Awa her Cejina Derbazbûnêda xeysetê welfî bû, ku girtikî hebsê bona cimetê ber'de, k'îjan ku wan bixasta. ⁷ Hebsêda girtik hebû, navê wî Barabas, ku t'evî hevalên xweyê raberîk'ar serhildanêda meriv kuştibûn. ⁸ K'oma merivan civya û ji welfî xast ku ew li anegorî wî xeysetê xwe xastina wan bike. ⁹ Pîlato jî wanr'a got: «Hûn dixazin ku ez bona we P'adşayê cihûyan ber'dim»? ¹⁰ Ewî dizanibû, ku serokên k'ahînan jî dest hevsûdiyê Îsa dabûne destê wî. ¹¹ Lê serokên k'ahînan k'oma merivan hê hîn kirin, ku ew Barabas bixazin, ku bona wan bê ber'danê. ¹² Pîlato dîsa jî wan pirsî got: «Lê ez îdî ewî ku hûn jêr'a P'adşayê cihûyan dibêjin çawa bikim»? ¹³ Wana kire qîr'în û got: «Wî xaç bike!» ¹⁴ Pîlato gote wan: «Çima? Evî çi xirabî kirye»? Lê wana hê *bilind* dikire qîr'în: «Wî xaç bike!» ¹⁵ Pîlato xast k'oma merivan razî bikira, Barabas bona wan berda. Îsa da ber qamçîyan û da destê wan, ku bê xaçkirinê.

¹⁶ Hingê eskeran ew bire hindurê serayê, awa gotî, hewşa rewşxana welfî û t'emamîya refa eskeran dora wî civandin. ¹⁷ Çuxekî şîrk lê kirin û ji stirîyan t'aculik vegirtî dane sêrî. ¹⁸ Destpê kirin silav danê û gotin: «Xaş be P'adşayê cihûyan!» ¹⁹ Pê qamîşê serê wî dixistin, t'û dikirinê û li ber wî çokdayî ta dibûn. ²⁰ Lê pey qerfkirinêr'a, çuxê şîrk jê existin, k'incên wî lê kirin û derxistine derva, ku xaç bikin.

XAÇKIRIN, MIRINA Û GOR'ÊDA DANÎNA ÎSA

(Metta 27:32-61; Lûqa 23:26-56; Yûhenna 19:17-30, 38-42)

²¹ Şimhûnê ji Kûrênê~ bavê Skender û Rûfo wîr'a derbaz dibû, ew jî k'ewşên dihat. Eskeran p'êyî ser wî kir, ku xaçê Îsa ew hilde. ²² Îsa birine wê dera ku wêr'a Golgota digotin, ku tê femkirinê: «Cîyê Qafên *mirî*». ²³ Şeraba zimir t'evxistî danê ku vexwe, lê wî venexwar. ²⁴ Ew xaç kirin, ser k'incên wî p'êşk avîtin, k'a k'êr'a wê çi bik'eve û nava hevda bela kirin. ²⁵ Û sibehê sihet nehe bû, gava ew xaç kirin. ²⁶ Nivîsara neheqîya wî ev bû: «P'ADŞAYÊ CIHÛYAN». ²⁷ Bi wîr'a du t'alank'ar jî xaç kirin, yek li aliyê wîyî rastê, yê din li aliyê ç'epê. ²⁸ Û aha ew nivîsar hate sêrî, ya ku dibêje: «Ew zulmk'aranr'a hate hesabê». ²⁹ Û ewên ku wîr'a diçûn-dihatî, ew bêhurmet dikirin, serê xwe dihejandin û digotinê: «Hêy! Ê ne teyê p'aristxane hilşanda û sê rojanda çê bikira, ³⁰ de xwe rizgar ke, ji xaç were xwarê!» ³¹ Usa jî serokên k'ahînan t'evî qanûnzanan nava hevda qerfê xwe lê dikirin û digotin: «Xelq rizgar kir, lê xwe nikare rizgar bike! ³² De bira niha Mesîh, P'adşayê Îsraêlê ji xaçê bê xwarê, ku em bibînin û bawer bikin». Yên bi wîr'a hatibûne xaçkirinê jî ew bêhurmet dikirin.

³³ Nivro jî siheta donzdehanda heta sisyan, t'emamîya erdê bû tarî. ³⁴ Îsa siheta sisyan bi dengê bilind kire qîr'în got: «Êloyî, Êloyî, lama sabaxtanî»? Ku tê femkirinê: «Xwedêyê min, Xwedêyê min, çima te ez ber'dam?»*

³⁵ Ewên ku nêzik sekinî bûn, gava ev xeber bihistin, gotin: «Binihêrin, ew gazî Êlyas dike». ³⁶ Ji wan yek bezî, kezv sirkêda kir, qamîşek pêva danî û dirêjî *ber devê* wî kir, ku vexwe û got: «Bisekinin. Em binihêrin k'a Êlyasê bê wî bîne xwarê».

³⁷ Îsa bi dengê bilind kire qîr'în û ruhê xwe da. ³⁸ Hingê p'erda p'aristxanê ji sêrî heta binî qelişî, bû du tîşan. ³⁹ Sersedê ku li pêşberî Îsa sekinî bû, gava dît Îsa çawa kire qar'în û ruhê xwe da, got: «Bi rastî jî ev meriv Kur'ê Xwedê bû!» ⁴⁰ Li wê derê k'ulfet jî hebûn, ku dîrva li vê yekê dinihêrîn. Meryema Mejdelaî, Meryema dîya her du biran~ Aqûbê biç'ûk û Yûsê û usa jî Seloma nav wanda bûn. ⁴¹ Evana hingê, çaxê Îsa li Celîlê bû, pey wî diçûn û jêr'a xizmetî dikirin. Pêştirî van, gelek k'ulfetên din jî wir hebûn, ku t'evî Îsa hatibûne Orşelîmê.

⁴² Ev yek berî êvara înyê bû~ roja berî şemîyê. ⁴³ Ûsivê Arîmetyayê, ku yekî xweyhurmet û endemê civîna giregiran bû, hat. Ew jî hîvîya P'adşatîya Xwedê bû. Wî turuş kir, çû cem Pîlato, cinyazê Îsa jê xast. ⁴⁴ Pîlato bihist, ku Îsa îdî mirye, ecêb ma. Gazî sersed kir û jê pirsî: «Rast ew usa zû mir»? ⁴⁵ Gava ew jî sersed rastî pê hesya, cinyaz da Ûsiv. ⁴⁶ Wî qedekê k'itanî k'ir'î, cinyaz anî xwarê, bi *wî qedekî* k'efen kir, t'irbêda danî, ya ku qeyêda k'olayî bû û keviyek hol kire ber derê t'irbê. ⁴⁷ Meryema Mejdelaî û Meryema dîya Yûsê dîtin ew dera ku ew lê hate danî.

* 15:34 Zebûr 22:1.

Marqos 16

ÎSA JI MIRINÊ ZÊNDÎ DIBE

(Metta 28:1-8; Lûqa 24:1-12; Yûhenna 20:1-10)

16 ¹ Pey roja şemîyêr'a Meryema Mejdelañî, Meryema dîya Aqûb û Seloma çûn biharet k'ir'în, ku her'in cinyazê Îsa din. ² Roja heftûyêye pêşin serê sibehê zû, waxtê derk'etina te'vê, ew çûne ser t'irbê. ³ Wana hevr'a digot: «K'ê wê bona me kevir ji ber derê t'irbê hol ke»? ⁴ Çimkî kevir gelekî mezin bû. Û gava li jor nihêrîn, dîtîn, wê kevir ji ber t'irbê hol kirî ye. ⁵ Û gava çûne hindurê t'irbê, nihêrîn, wê cahilekî çuxê sipî xwe wergirtî li alîyê rastêva rûniştî ye. K'ulfet gelek zendegirtî man. ⁶ Ewî gote wan: «Zendegirtî nemînin! Îsayê Nisretê, ku hûn wî diger'in, yê ku hate xaçkirinê, ew ji mirinê zêndî bûye! Ew ne li vir e. Va ye ew cîyê ku ew lê danî bû. ⁷ Lê niha her'in bêjine şagirtên wî û Petrûs, ku ewê berî we her'e Celîlê. Li wir hûnê wî bibînin, çawa wî wer'a gotye». ⁸ Ew k'ulfet ji t'irbê derk'etin revîn, çimkî saw û tirsê ew girtibûn û dilerizîn. T'u kesîr'a jî tişteke negotin, çimkî saw k'etibû ser wan.

ÎSA XWE NÎŞANÎ MERYEMA MEJDELANÎ DIKE

(Metta 28:9-10; Yûhenna 20:11-18)

⁹ Gava Îsa roja heftûyêye pêşin sibehê zû ji mirinê zêndî bû, wî pêşiyê xwe nîşanî Meryema Mejdelañî kir, ji k'îjanê heft cin derxistibûn. ¹⁰ Ew jî çû ev yek gote wan, yên ku t'evî Îsa *gund û bajaran* ger'yabûn, ku şîn dikirin û digiryan. ¹¹ Lê gava wana bihîst, ku Îsa zêndî ye û xwe nîşanî Meryemê kirye, bawer nekirin.

ÎSA XWE NÎŞANÎ DU ŞAGIRTAN Û YANZDEH ŞAGIRTAN DIKE

(Metta 28:16-20; Lûqa 24:13-49; Yûhenna 20:19-23; K'arên Şandîyan 1:6-8)

¹² Pey van tiştanr'a ewî reng-nîgareke dinda xwe nîşanî ji wan dudan kir, yên ku diçûne k'ewşên. ¹³ Ewana jî çûn ew xeber gîhandine yên mayîn. Lê gotina wan jî bawer nekirin.

¹⁴ Pey vê yekêr'a Îsa xwe nîşanî yanzdehan kir, gava ew li ser sifrê rûniştibûn. Ewî bona nebawerî û serhişkîya wan li wan hilat, ku bawerîya xwe wan neanîn, yên ku ew ji mirinê zêndîbûyî dîtibûn. ¹⁵ Û gote wan: «Her'ine her çar qulbên dinyayê û Mizgînîyê bidine her merivan. ¹⁶ Ewê ku bawer bike û bê nixamtinê wê rizgar be, lê ewê ku bawer neke dîwana wî wê bibe. ¹⁷ Ewên ku bawer dikin, ev nîşanê wanr'a dîhar bin: Bi navê min wê cinan derxin, bi zimanên nû xeber din, ¹⁸ me'ran bi destê xwe wê bigirin û heger tişteke je'rî jî vexwin, t'u zirarê li wan nebe. Ewana wê destên xwe daynine ser nexaşan û nexaş wê qenc bin».

HILJORBÛNA ÎSA

(Lûqa 24:50-53; K'arên Şandîyan 1:9-11)

¹⁹ Awa pey wê xeberdana t'evî wanr'a Xudan bilindî ezmên bû û li alîyê Xwedêyî rastê rûnişt. ²⁰ Şagirt jî çûn, li her deran dannasîn kirin. Destê Xudan jî t'evî k'arê wan bû û xebera xwe bi nîşanên ku bi destên wan dibûn qedîm dikir.

MIZGÎNÎ YA KU LÛQA NIVÎSÎ

PÊŞGOTIN

Ev k'itêb bona k'arê Îsa Mesîh e û yekî yûnan jî, navê wî Lûqa nivîsî. Ew hekîm û dîrokzan bû. Wî t'evî Pawlos gelekî rêwîti kirye û nava k'arê şandîtiya Pawlosda jî gelekî alîk'arîya wî kirye.

Lûqa bona jiyîna Îsa hê zêde nivîsiye, ji bûyîna Yûhennayê nixamdarda girtî heta rabûna Îsaye ji nava mirîyan. Û Lûqa kitêbeke din jî derheqa belabûna Mizgîniyêda nivîsiye, ya ku nav dibe «K'arên Şandîyan».

Ev Mizgîni dide k'ifşê, ku Îsa ye ew Rizgarkirê ji Xwedêda sozdayî, yê ku wê bi hizkirina Xwedê bona cimeta Îsraêlê û hemû merivan azayî hazir bikira.

Vê Mizgîniyêda hene çend p'arên berbiç'ev, yê ku Mizgîniyên dinda nehatine nivîsarê, soz-mesele: stirana milyak'etan, ya Meryemê, ya Zekerîya û ya Şimhûnê kal, Îsayê donzdeh salî p'aristxanêda, mesela «kur'ê undabûyî», vegeza t'alank'arekî li ser xaç û çend tiştên din.

SERECEMA KITÊBÊ

Pêşgotin (1:1-4)

Jidêbûyîna Yûhennayê nixamdar, ya Îsa û zar'otîya wan (1:5-2:52)

Xizmetîya Yûhennayê nixamdar (3:1-20)

Îsa bi avê tê nixamtinê û tê cêribandinê (3:21-4:13)

Dannasîn û k'arên Îsaye li Celilê (4:14-9:50)

Meşa Îsaye ji Celilê heta Orşelîmê (9:51-19:27)

Heftîya Îsaye paşin (19:28-23:56)

Girtin, dîwankirin, xaçkirin, mirin û zêndibûna Îsa (22:47-23:56)

Îsa zêndî dibe, şagirtanva k'ifş dibe û diçe ezmên (24:1-53)

PÊŞGOTINA LÛQA TÊYOFÎLOR'A

1 ¹ Niha gelean destpê kirye, ku serhatîya wan tiştên nava meda bûyî usa rêz kin, ² çawa ku ewên pêşda bi ç'evan dîtîbûn mer'a gotin û xizmetîya belakirina vê Mizgîniyê dikirin. ³ Usa, Têyofloyê xweyhurmet, min jî rê têra dît, bi wî cûreyî ter'a binivîsim, çawa yekî ku hê zûva pey wan hemû tiştan k'etîme û rast haş ji pê heme, ⁴ ku tu rastîya wan tiştan bizanibî, çi hîn bûyî.

MIZGÎNÎYA MILYAK'ET BONA JIDÊBÛYÎNA YÛHENNAYÊ NIXAMDAR

⁵ Çaxê Hêrodes p'adşayê Cihûstanê bû, ji bereka Ebîya k'ahînek hebû, navê wî Zekerîya. Jina wî jî ji esilê Harûn bû, navê wê Êlîzabêt. ⁶ Ev her du jî li ber Xwedê rast bûn û nava her t'emî û heqîya Xudanda bêqusûr diçûn. ⁷ Zar'ên wan t'unekûn, çimkî ji Êlîzabêtê zar' nedibûn û her duyan jî rojên xwe derbaz kiribûn.

⁸ Awa çaxê Zekerîya li dora bereka xweda ber hizûra Xwedê xizmetîya k'ahîntîyê dikir, ⁹ bi qirara k'ahîntîyê p'êşk p'ara wî k'et, ku her'e p'aristxana Xudan û bixûrê bişewtîne. ¹⁰ Û dema şewtandina bixûrê t'emamîya cimete derva dua dikir. ¹¹ Hingê milyak'etê Xudan wîva k'ifş bû, ku k'êleka t'extbixûrê, alîyê rastêva sekinî bû. ¹² Gava Zekerîya ew dît, t'evîhev bû û saw k'işand. ¹³ Lê milyak'et gote wî: «Netirse Zekerîya! Duayê te hate bihîstinê, jina te Êlîzabêtê ter'a kur'ekî bine û navê wî daynî Yûhenna. ¹⁴ Ewê ter'a bibe *manîya* şabûn û reqasê û gelek wê bi bûyîna wî şa bin. ¹⁵ Çimkî ewê li ber Xudan yekî mezin be, şerab-araqê wê qet venaxwe û hê zikê dîya xweda bi Ruhê Pîroz wê t'ije be. ¹⁶ Û ji lawên Îsraêl wê gelean berbi Xudan Xwedêyê wan vegefirne. ¹⁷ Ewê bi ruh û qewata Êlyas p'êxember pêşîya Xudanva her'e, wê dilê bavan ser lawên wanda û neelîman berbi femdarîya yê rast vegefirne, ku cimeteke bona Xudan hazir bike».

¹⁸ Zekerîya gote milyak'et: «Ez vê yekê çawa bizanibim? Ez kalemêr im û jina min jî îdî rojên xwe derbaz kirye».

¹⁹ Milyak'et lê vegefirand got: «Ez Cibrayîl im, ku li ber hizûra Xwedê disekinim. Hatime şandinê, ku ter'a xeber dim û vê mizgîniyê bidime te. ²⁰ Niha tuê lal bî û nikaribî xeber dî, heta wê roja ku ev tişt bêne sêrî, çimkî te bawerîya xwe wan gotinên min neanî, ku wê waxtê xweda bêne sêrî».

²¹ Heta hingê cimete hîvîya Zekerîya bû û ecêb dima, ku ew p'aristxanêda derengî dik'et. ²² Û çaxê ew derk'ete derva, îdî nikaribû wanr'a xeber da. Wana fem kir, ku p'aristxanêda tişt hatye li ber ç'evan. Û ewî bi nîşanan wanr'a xeber dida û lal ma. ²³ Û çaxê rojên xizmetîya wî xilaz bûn, çû mala xwe. ²⁴ Pey wan rojanr'a, jina wî, Êlîzabêt du halîda k'ifş bû û pênc mehan ewê ev tişt veşartî hişt û digot: ²⁵ «Van rojanda Xudan bona min çi, kir, ku ser halê minda nihêrî û qara min ji nava merivan da hildanê».

MIZGÎNÎYA MILYAK'ET BONA JIDÊBÛYÎNA ÎSA

²⁶ Meha şeşanda Xwedê milyak'et Cibrayîl şande bajarekî Celilê, ku navê wî Nisret bû, ²⁷ cem qîzeke bik'ir, navê wê qîzîkê Meryem, ya ku merivekî navê wî Ûsivr'a nîşankirî bû, yê ku ji mala Dawid bû. ²⁸ Milyak'et wêva k'ifş bû û got: «Silav li te, qîzîka k'erem lê bûyê, Xudan t'evî te ye».*

²⁹ Ewa ser gotina wî t'evîhev bû û fikirî: «Gelo ev çi silav e?» ³⁰ Milyak'et jêr'a got: «Meryem, netirse! Çimkî ji Xwedêda bona te k'erem bû. ³¹ Niha tuê duhalî bî, kur'ekî binî û navê wî Îsa daynî. ³² Ewê yekî mezin be û Kur'ê Yê Herî Jor bê gotinê. Û Xudan Xwedê t'extê bavê wî Dawid wê bidê. ³³ Û ewê heta-ha-tê p'adşatîyê li ser mala Aqûb bike û xilazîya P'adşatîya wî wê t'unebe».

* 1:28 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «Tu nav k'ulfetanda bimbarek î.»

³⁴ Meryemê gote milyak'et: «Ev yekê çawa bibe, çimkî ez hela hê qîz im?» ³⁵ Milyak'et lê vegerand got: «Ruhê Pîroz wê te hilde bin hikumê xwe û qewata Yê Herî Jor wê li te bike sî. Lema ew Pîrozê ku ji te bibe, ewê Kur'ê Xwedê bê gotinê. ³⁶ Va ye omida te Êlîzabêtê jî wê mezinayîya xweda eva meha şaşan e kur'ekîda duhalî ye, ya ku bêber dihate gotinê. ³⁷ Çimkî cem Xwedê t'û tiştêkî nebûyîne t'une». ³⁸ Hingê Meryemê got: «Ez carîya Xudan im. Bira mîna wê gotina te bona min bibe». Û milyak'et ji wir çû.

MERYEM SERÎKÎ ÊLÎZABÊTÊ DIXE

³⁹ Wan rojanda Meryem rabû lez çû aliyê ç'îyan, bajarekî Cihûdayê. ⁴⁰ Ew k'ete mala Zekerîya û silav da Êlîzabêtê. ⁴¹ Gava Êlîzabêtê silava Meryemê bihîst, zar'ok zikê wêda list. Êlîzabêt bi Ruhê Pîrozva t'ije bû ⁴² û bi dengekî bilind kire gazî got: «Tu li nav k'ulfetanda bimbarek î, berê zikê te jî bimbarek e. ⁴³ Ev çawa bû, ku dîya Xudanê min ser mînda hat? ⁴⁴ Gava dengê silava te gihîşte guhê min, zikê mînda zar'okê jî şabûna list. ⁴⁵ Xwezî li wê, k'ê bawerîya xwe gotina Xudan tîne, ku çî jêr'a hatye gotinê, wê bê sêrî». ⁴⁶ Meryemê got: «Kesa min pesinê Xudan dide ⁴⁷ û ruhê min bi Xwedê Rizgarkirê min şa dibe, ⁴⁸ çimkî wî li ser milûkîya carîya xweda nihêrî. Ji vir hada her nisil wê xwezîya xwe min bînin, ⁴⁹ çimkî Xwedêyê Zor bona min tiştên gelek mezin kirin. Navê wî pîroz e. ⁵⁰ Rehma wî qurne-qurne li ser wan e, yên ku ji wî ditirsin. ⁵¹ Qewata destê xwe wî da k'ifşê û yên dilê xweda k'ubar-babax bela-belayî kirin. ⁵² Yên qewat ji k'ursîyan anîne xwarê û yên milûk bilind kirin. ⁵³ Yên birçî bi tiştên qenc t'êr kirin û yên dewlemend destevala verêkirin. ⁵⁴ Rehma xwe anî bîra xwe, alî xulamê xwe Îsraêl kir, ⁵⁵ çawa wî kal-bavên mer'a bona Îbrahîm û zuretê wî gotibû û *sozê* heta-ha-tê dabû». ⁵⁶ Û Meryem weke sê mehan cem Êlîzabêtê ma, paşê vegerya mala xwe.

JIDÊBÛYÎNA YÛHENNA YÊ NIXAMDAR

⁵⁷ Dema zar'anîna Êlîzabêtê pêr'a gihîşt, wê kur'ek anî. ⁵⁸ Heval-hogirên wê bihîstin, ku Xudan rehma xweye mezin bona wê kirye, t'evî wê şa dibûn. ⁵⁹ Roja heyştanda hatin, ku zar'okê sinet kin û navê bavê wî Zekerîya lê kin. ⁶⁰ Lê dîya wî got: «Na, navê wî gerekê Yûhenna be».

⁶¹ Wêr'a gotin: «Nava merivên teda bi wî navî t'û kes t'une». ⁶² Hingê wana bi nîşanan ji bavê pirsîn, ku çî navî dixaze wî ke. ⁶³ Ewî jî t'extek xast û li ser nivîsî: «Navê wî Yûhenna ye». Hemû ecêb man. ⁶⁴ Pêr'a-pêr'a zar-zimanê wî vebû, xeber da, şikirî da Xwedê. ⁶⁵ Tirs k'ete ser hemû cîranên wan û li nava t'emamîya ç'îyayên Cihûstanêda bona vê yekê dihate gotinê. ⁶⁶ Hemûyên ku dibihîstin, bîra xweda xwey dikirin, digotin: «Gelo ev kur'ik wê bibe çî?» Û destê Xudan pêr'a bû.

P'ÊXEMBERTÎYA ZEKERÎYA

⁶⁷ Bavê wî Zekerîya bi Ruhê Pîroz t'ije bû, p'êxembertî kir û got: ⁶⁸ «Şikir Xudan Xwedêyê Îsraêlêr'a, ku serîk da cimeta xwe û azayî jêr'a anî. ⁶⁹ Wî ji mala xulamê xwe Dawid bona me strûkî* rizgarkirinê derxist, ⁷⁰ çawa ewî hê berê-berêda bi zarê p'êxemberên xweye pîroz gotye, ⁷¹ ku em ji dijminên xwe û ji destên hemû xêrnexazan rizgar bin, ⁷² ku rehme li kal-bavên me bike, peymana xweye pîroz ⁷³ û sonda ku bavê me Îbrahîmr'a xwar wê bîr bîne û bide me ⁷⁴ ku ji destê dijminan azabûyî, em bêy saw û tirs bikaribin wîr'a xizmetîyê bikin, ⁷⁵ bi rastîyê û helalîyê, li her rojên jîyîna xweda. ⁷⁶ Tu jî, kur'iko, tuê p'êxemberê Yê Herî Jor bêyî gotinê, tuê pêşîya Xudanva her'î, ku rîya wî hazir bikî ⁷⁷ û zanebûna azayîyê bidî cimeta wî~ *zanebûna* baxşandina gunehên wan. ⁷⁸ Bi rehme û huba Xwedêyê me, ku mîna te'va ku jorda dertê, usa wê serîkî bide me ⁷⁹ û wan ronahî ke, yên ku li tarîstanîyê û bin sîya mirinêda dimînin û nigên me wê dayne li ser rîya haştîyê».

⁸⁰ Kur'ik mezin dibû, bi ruh qewat digirt û heta roja Îsraêlêva k'ifş bû jî li ber'îyêda dima.

JIDÊBÛYÎNA ÎSA

(Metta 1:18-25)

2 ¹ Wan rojanda ji Awgûstoyê Qeyser ferman derk'et, ku *merivên* hemû erdê *bin hikumê wîda* bêne navnivîsarê. ² Ev navnivîsara pêşin hêna Kûrênuyê welîyê Sûryayêda hate kirinê. ³ Her kes diçûne bajarê xwe, ku navê xwe bide nivîsarê. ⁴ Ûsiv jî ji bajarê Nisreta Celîlê rabû hevraz çû Cihûstanê, bajarê jidêbûyîna Dawid, ku Beytlehm dibêjin, çimkî ew ji mal û bereka Dawid bû. ⁵ Ew t'evî dergîstîya xwe Meryemê çû, ku navên xwe *wîr* bidine nivîsarê. Meryem jî duhalî bû. ⁶ Çaxê ewana li Beytlehmê bûn, dema zar'anîna wê pêr'a gihîşt ⁷ û *ewê* kur'ê xweyî nixurî anî, p'êçekêda p'êça û afirda danî, çimkî mêvanxanêda bona wan cî t'unebû.

MILYAK'ET Û ŞIVAN

⁸ Li wir, çolêda şivan hebûn, ku nobedarîya şevê li kerîyê pezên xwe dikirin. ⁹ Milyak'etê Xudan wanva k'ifş bû û rûmeta Xudan dora wan şewq da, ew gelekî tirsyan. ¹⁰ Lê milyak'et gote wan: «Netirsin! Ez hatime Mizgînîya şabûneke mezin bidime we, ku wê bona t'emamîya millet be. ¹¹ Îro wer'a bajarê Dawidda Rizgarkirek bû, ew Mesîh Xudan e. ¹² Eva wer'a bibe nîşan, hûnê zar'okê p'êçekêda p'êçayî afirda danî bibînin». ¹³ Nişkêva bi wîr'a t'evayî ordîke milyak'etên ezmanîye mezin k'ifş bû, pesinê Xwedê didan û digotin: ¹⁴ «Şikir Xwedêyê Herî Jorr'a, ser dinyayê haştî wan merivanr'a, k'îjan *kirê* Xwedê begem bikin».

* 1:69 Stirû (qoç) nîşana qewatê ye.

¹⁵ Gava milyak'et ji wan dûr k'etin hilk'îşyane ezmên, şivanan gotine hev: «Werin em heta Beytlehmê her'in û ev tiştê bûyî, ku Xudan em pê hesandin, bibînin».

¹⁶ Û bi lez hatin, Meryem, Ûsiv û zar'oka afirda razayî dîtîn. ¹⁷ Gava dîtîn, çi ku bona kur'ik wanr'a hatibû gotinê, gotine wan. ¹⁸ Her kesên ku ev tişt ji şivanan dibihîstin, zendegirtî diman. ¹⁹ Lê Meryemê ev her tişt dilê xweda xwey dikirin û li ser wan difikirî. ²⁰ Şivan vegeryan û bona tiştên bihîstî û dîtî pesin û şikirî didane Xwedê, ku çawa wanr'a hatibû gotinê *usa jî hebû*.

ÎSA P'ÊŞKÊŞI XWEDÊ DIKIN

²¹ Roja heyştan, çaxê zar'ok sinet kirin, navê wî danîn Îsa, çawa ku bona vê yekê milyak'et hê berî duhalîbûna dê gotibû.

²² Çaxê anegorî Qanûna Mûsa çilê wê t'emam bû, kur'ik birine Orşelîmê, ku wî p'êşkêşî Xudan bikin, ²³ çawa ku Qanûna Xudanda nivîsar e: «Her nixurîkî nêrîn, ku ji dîya xwe dinê k'eve, ew bijarê Xudan be»* ²⁴ û li gora gotina Qanûna Xudan «Cotek fatimok yan jî du cûcûkên kewan»† hedî bê dayînê.

²⁵ Hingê merivek Orşelîmêda hebû, navê wî Şimhûn. Ew merivekî rast û xwedêtirs bû û hîvîya berdilîya Îsraêlê bû. Ruhê Pîroz jî li ser wî bû ²⁶ û wîr'a gotibû: «Heta tu Mesîhê Xudan nebînî, namirî». ²⁷ Hingê ew bi rêberîya Ruh hate p'aristxanê. Çaxê Ûsiv û Meryemê Îsayê zar'ok anîn ku li gora qirara Qanûnê bona wî bikin, ²⁸ Şimhûn kur'ik hilda hemêza xwe, şikirî da Xwedê got: ²⁹ «Ya Xudan, niha li gora sozê xwe bi haştî xulamê xwe ber'de. ³⁰ Çimkî ç'evê min rizgarkirina te dît, ³¹ ya ku te li ber ç'evên her miletan hazir kirye, ³² ku bibe ronaya ber ç'evên hêtanosan û rewşa cimeta te Îsraêlê».

³³ Ûsiv û dîya wî Meryem ser tiştên ku Şimhûn bona wî digotin, zendegirtî mabûn. ³⁴ Şimhûn dua-dirozge li wan kir û dîya wî Meryemêr'a got: «Evê Îsraêlêda bibe manîya k'etin-rabûna gelek û nîşana miqabilîyê ³⁵ ku fikirên gelek dilan bêne k'îfşê. Û dilê ter'a jî wê şûr derbaz be».

³⁶ Li wir ji malbeta Aşêr, qîzeke Fanowêle p'êxember hebû, navê wê Hanna. Ewê gelek sal derbaz kiribû û pey qîztîya xwer'a heft salan cem mêrê xwe mabû. ³⁷ Ew jinebîke heyştê çar salî bû û ji p'aristxanê dûr nedik'et, şev û roj bi dua û rojîgirtinê Xwedê diheband. ³⁸ Eva jî wê demê hat, şikirî da Xwedê û t'evî wan, ku Orşelîmêda ç'evnihêrya rizgarîyê bûn, derheqa kur'ikda xeber da.

³⁹ Gava Ûsiv û Meryemê her tişt li gora Qanûna Xudan kirin, vegeryane Celîlê~ bajarê xwe Nisretê. ⁴⁰ Kur'ik mezin dibû û qewat digirt, bi serwaxtîyê t'ije dibû û k'erema Xwedê jî t'evî wî bû.

ÎSAYÊ DONZDEH SALÎ P'ARISTXANÊDA

⁴¹ Dê û bavê wî her sal Cejina Derbazbûnêda diçûne Orşelîmê. ⁴² Çaxê Îsa bû donzdeh salî, li gora qirarê ew hevraz çûne cejinê. ⁴³ Gava rojên *xizmetîya* cejinê xilaz bûn û paşda vedigeryan, lê Îsayê xort Orşelîmêda ma. Lê Ûsiv û dîya wî haş jî wî t'unekûn, ⁴⁴ wan t'irê t'evî rêwîyan e, *lema* rîya rojekê hatin, nava heval-hogiranda li wî ger'yan. ⁴⁵ Çaxê ew nedîtîn, paşda vegeryane Orşelîmê, li wî ger'yan. ⁴⁶ Roja sisyan wana ew p'aristxanêda dît. Ew t'evî dersdaran rûniştibû, guhdarîya wan dikir û pirs didane wan. ⁴⁷ Hemûyên ku xebardana wî dibihîstin, ser zanebûn û cabdayînên wî zendegirtî diman. ⁴⁸ Gava wan ew dît, hujmek'ar man û dê gote wî: «Lawo! Çima te usa anî serê me? Ez û bavê te bi k'el û bîn li te diger'yan». ⁴⁹ Îsa gote wan: «Çima hûn li min diger'yan? We nizanibû ez gerekê mala Bavê xweda bim»? ⁵⁰ Lê wana fem nekir wî çi got. ⁵¹ Ew wanr'a vegerya hate Nisretê û gur'a wanda bû. Lê dîya wî ev her tişt dilê xweda xwey dikirin. ⁵² Û Îsa bi serwaxtî û bejinê pêşda diçû û bi k'emalî li ber Xwedê û li ber merivan mezin dibû.

DANNASÎNA YÛHENNA YÊ NIXAMDAR
(Metta 3:1-12; Marqos 1:1-8; Yûhenna 1:19-28)

3 ¹ Panzdeh salîya p'adşatîya Tîberyoyê Qeyserda, li dema ku Pîlatoyê Pontîyo welîyê Cihûstanê bû, Hêrodes serokê Celîlê bû, Filîpoyê birê wî serokê qeza Îtûryayê û Traxonîdayê bû, Lûsanyas jî serokê Avêlînyayê bû, ² Henan û Qeyafa jî serokk'ahîn bûn. Hingê xebera Xwedê ber'îyêda Yûhennayê kur'ê Zekerîyar'a hat ³ û Yûhenna hate her der-dorên ç'emê Êrdunê dannasîn dikir, ku cimete jî gunehkirinê vegere û bi avê bê nixamtinê, ku Xwedê bibaxşîne wan, ⁴ çawa kitêba Îşaya p'êxemberda nivîsar e, ku dibêje: «Dengê ber'îyêda dike gazî: <Rîya Xudan hazir bikin û şiverêyên wî rast bikin. ⁵ Her gelî bira t'ije bin, her ç'îya-banî nimiz bin, rîyên xaro-marro rast bin û ç'el-ç'ûl dûz bin. ⁶ Û her kes wê rizgarîya Xwedê bibîne>>».[‡]

⁷ Gelek dihatine cem Yûhenna, ku bi destê wî bêne nixamtinê. Ewî wanr'a digot: «Ç'êjikên meran! K'ê hûn hîn kirin, ku ji hêrsa tê birevin? ⁸ De bi kirên qenc bidine k'îfşê, ku hûn ji gunehkirinê vegeryane. Û dest bi vê *gotinê* nekin nebêjin: <Îbrahîm bavê me ye>. Ez dibêjime we, ku Xwedê ji van kevîran jî dikare lawan Îbrahîmr'a derxe. ⁹ Va balt'e ber rawê darê danî ye. Her dara ku berê qenc neyne, wê bê bir'inê û avîtinê nava êgir».

¹⁰ K'omên merivan jê pirsîn gotin: «Lê em çi bikin»? ¹¹ Ewî li wan vegeand got: «Du dest k'încên k'ê hene, bira yekê bide wî, yê k'ê ku t'une û xurekê k'ê heye, bira dîsa usa bike». ¹² Xercgir jî hatin ku bêne nixamtinê û gotine

* 2:23 Derk'etin 13:2, 12, 15.

† 2:24 Qanûna K'ahîntîyê 12:8.

‡ 3:6 Îşaya 40:3-5.

Lûqa 3,4

wî: «Dersdar, em çi bikin»? ¹³ Ewî gote wan: «Çiqas ji we tê xastinê ji wê zêdetir nestînin». ¹⁴ Eskeran jî jê pirsî: «Lê em çi bikin»? Gote wan: «T'u kesî neşêlinin, bêbextîyê li xelqê nekin û bi maşê xwe razî bin».

¹⁵ Cimet hîvîyê bû û bona Yûhenna dilê xweda difikirîn: «Gelo ev e Mesîh»? ¹⁶ Yûhenna li hemûyan veğerand got: «Ez we bi avê dinixemim, lê yekî ji min qewattir wê bê. Ez ne hêja me benên p'êlavên wî jî vekim. Ewê we bi Ruhê Pîroz û êgir binixême. ¹⁷ Bêra wîye bêderê dêstda ye. Ewê bêdera xwe paqij ke, genim bike embara xwe, lê ka wê bi agirê ku natemire bişewitîne».

¹⁸ Awa Yûhenna bi gelek tiştên din jî xelq şîret dikirin û Mizgînî dida. ¹⁹ Lê gava wî li Hêrodesê serok jî hilat, bona Hêrodîya jina birê wî û hemû xirabîyên ku wî dikirin, ²⁰ hingê Hêrodes ser van kirinanda ev neheqî jî zêde kir, ku Yûhenna avîte hebsê.

NIXAMTINA ÎSA

(Metta 3:13-17; Marqos 1:9-11)

²¹ Çaxê cimet hemû dihate nixamtinê, Îsa jî hate nixamtinê. Wê dema ku dua kir, ezman vebû ²² û Ruhê Pîroz bi dîndara keweke bedenî ser wî danî û dengê ji ezmên hat ku digot: «Tu yî, kur'ê minî delal, ez ji te razî me».

MALBETA ÎSA

(Metta 1:1-17)

²³ Îsa çaxê dest bi k'arê xwe kir, ew nêzîkî sî salî bû û *meriv* difikirîn ku ew kur'ê Ûsivê Elî bû, ²⁴ *Elîyê* Metatê Lêwîyê Melkêyê Yannay, *Yannayê* ²⁵ Ûsivê Metîtyayê Amosê Nehûm, *Nehûmê* Hesliyê ²⁶ Necayê Mehatê Metîtyaya, *Metîtyayê* Şemeyînê Yûsêxê ²⁷ Yodayê Yûhenan, *Yûhenanê* Rêşayê Zerûbabelê Şaltiyêlê Nerî, ²⁸ *Nerîyê* Melkêyê Êdîyê Qosamê Êlmedam, *Êlmedamê* ²⁹ Êrê Ûsivê Êliyazerê Yorîm, *Yorîmê* Metatê ³⁰ Lêwîyê Şimhûnê Cihûda, *Cihûdayê* Ûsivê Yonamê ³¹ Êlyaqîmê Melyo, *Melyoyê* Menayê Metîtyayê Natanê ³² Dawid, *Dawidê* Yêşayê Ovêdê Bowazê Selmon, *Selmonê* ³³ Nehşonê Amînadavê Aramê Hesrûnê Pêrêşê ³⁴ Cihûdayê Aqûb, *Aqûbê* Îshaqê Îbrahîmê Têrahê ³⁵ Nehor, *Nehorê* Serûxê Rêwoyê Pêlêgê Eber, *Eberê* ³⁶ Şalahê Qênanê Arpaxşadê Sam, *Samê* Nuhê ³⁷ Lamexê Metûşelayê Henox, *Henoxê* Yarêdê Mehalêlê ³⁸ Qênanê Enoş, *Enoşê* Sêt'ê Adem, Ademê Xwedê.

CÊRIBANDINA ÎSA

(Metta 4:1-17; Marqos 1:12-15)

⁴ ¹ Îsa bi Ruhê Pîrozva t'ijî ji Ûrdunê vegerya, çû ber'îyê û Ruh rêberîya wî dikir ² û çil rojan ew ji Şeytan hate cêribandinê. Ewî wan rojanda t'u tişt nexwar û çaxê ew roj derbaz bûn, birçî bû.

³ Hingê Şeytan gote wî: «Heger tu Kur'ê Xwedê yî, de vî kevirîr'a bêje, ku bibe nan». ⁴ Îsa lê veğerand got: «Nivîsar e: <Meriv t'enê bi nan najî, lê bi her xebereke Xwedê>».*

⁵ Hingê Şeytan ew rakire ser cîkî bilind, deqêda hemû p'adşatîyên dinyayê nişanî wî dan ⁶ û gotê: «Ezê rewş û serwêrîya van her tiştan bidime te, çimkî min'r'a hatye dayînê û k'êr'a ku bixazim ezê bidimê. ⁷ Heger niha tu deverûya bêyî û min bihebînî, ev her tişt wê bibine yên te. ⁸ Îsa lê veğerand got: «Nivîsar e: <Xudan Xwedêyê xwe bihebîne û t'enê wîr'a xizmetîyê bike>!»†

⁹ Paşê Şeytan Îsa bire Orşelîmê, ser bilindciya banê p'aristxanê ew da sekinandinê û gotê: «Heger tu Kur'ê Xwedê yî, de xwe ji vir bavêje xwarê. ¹⁰ Çimkî nivîsar e: <Xwedê wê t'emîya te bide milyak'etên xwe, ku te xwey bikin> ¹¹ û: <Ewê te ser destên xwe bigirin, ku nigê te kêvir nek'eve>».‡ ¹² Îsa lê veğerand got: «Hatye gotinê ku: <Xudan <Xudan Xwedêyê xwe necêribîne>!»§ ¹³ Û gava Şeytan her cêribandinên *xwe* xilaz kirin, demekê ji wî dûr k'et.

¹⁴ Îsa bi qewata Ruh vegerya Celîlê û nav-dengê wî belayî her aliyên wî erdî bû. ¹⁵ Ewî k'inîştên wanda hîn dikir û hemûyan pesinê wî didan.

BAJARÊ KU ÎSA WIR MEZIN BIBÛ WÎ QEBÛL NAKE

(Metta 13:53-58; Marqos 6:1-6)

¹⁶ Ew hate Nisretê, wî cîyê ku ew wir mezin bibû û mîna xeysetê xwe roja şemîyê k'ete k'inîştê û rabû ku bixûne.

¹⁷ Kitêba Îşaya p'êxember dane wî û gava kitêba gulomatkkirî vekir, ew cî dît ku aha nivîsar bû: ¹⁸ «Ruhê Xudan li ser min e, çimkî ewî ez gulrûn kirim, ku Mizgînîyê bidime feqîran û ez şandime ku hêsîran'r'a boy serbestîyê û koran'r'a boy dîtinê dannasîn kim, azayîyê bidime wan, yên ku hatine şêlandinê ¹⁹ û sala Xudane rehm-k'eremê bidime naskirinê». ** ²⁰ Û kitêb hev p'êça, da berdestî û rûnişt. K'inîştêda her kes zûr bibûn li wî dinihêrin. ²¹ Ewî destpê kir wan'r'a got: «Ev nivîsara ku îro we bihîst hate sêrî». ²² Hemûyan jî şehdetîya wî didan û ser xebardana wîye merîfetî zendegirtî mabûn û digotin: «Ê ne ev kur'ê Ûsiv e»? ²³ Ewî gote wan: «Hemî hûnê vê bendgotinê ser min bêjin: <Hekîmo! De xwe qenc ke>. Û <Ew tiştên me bihîstin, ku te Kefernahûmêda kirin, vir: cî-miskenê xweda jî bike>». ²⁴ Û got: «Ez rast dibêjime we, her p'êxember cî-miskenê xweda nayê hildanê. ²⁵ Ez rastîyê dibêjime we, Îsraêlêda gelek jinebî hebûn, hêna Êlyasda, çaxê sê sal şeş mehan ezman hate girtinê û t'emamîya

* 4:4 Qanûna Ducarî 8:3.

† 4:8 Qanûna Ducarî 6:13.

‡ 4:11 Zebûr 91:11,12.

§ 4:12 Qanûna Ducarî 6:16.

** 4:19 Îşaya 61:1,2.

welêtda bû xelayîke giran. ²⁶ Lê Êlyas t'u kesîr'a nehate şandinê, pêştîrî jinebîya ji bajarê Serepta Saydêr'a. ²⁷ Û hêna Êlîşa p'êxemberda gelek k'otî jî Îsraêlêda hebûn û ji wan t'u kes paqij nebû, pêştîrî Nemanê sûryanî». ²⁸ Gava hemûyên k'inîştêda ev yek bihîstin, hêrs k'etin. ²⁹ Rabûn ew ji bajêr derxistin, birin ser wî ç'îyayê ku bajarê wan li ser hatibû çêkirinê, ku wî ji kendalda bavêjin. ³⁰ Lê ew nav wanr'a derbaz bû çû.

ÎSA RUHÊ HERAM DEDIXE
(Marqos 1:21-28)

³¹ Îsa dak'et hate bajarê Kefernahûma Celîlê û rojên şemiyê ew hîn dikirin. ³² Ew ser hînkirina wî zendegirtî mabûn, çimkî xebardana wî bi hikum bû. ³³ Û k'inîştêda merivekî, ku ruhê cinayî heram pêr'a hebû, bi dengê bilind kire qîr'în got: ³⁴ «Çi te me k'etye? Îsayê Nisretê. Tu hatî me bidî undabûnê? Ez dizanim tu k'î yî~ Tu Pîrozê Xwedê yî!» ³⁵ Îsa lê hilat got: «Ker' be û jê derk'ewe!» Cin ew ber wan erdê xist û bêy zirardayîn ji wî derk'et. ³⁶ Hemû zendegirtî man, hevr'a digotin: «Ev çi xeber e? Ew bi hikum û qewatê fermanê dike ser ruhên heram û derdik'evin?» ³⁷ Û be'sa wî li her der-doran bela dibû.

ÎSA XWESÛYA ŞIMHÛN Û GELEK NEXAŞAN QENC DIKE
(Metta 8:14-17; Marqos 1:29-34)

³⁸ Ew ji k'inîştê derk'et û çû mala Şimhûn. Xwesûya Şimhûn germa bilindda k'ûr dinelya û bona wê hîvî ji wî kirin. ³⁹ Îsa pêşberî wê sekinî, li germê hilat û germa wê danî. Û pêr'a-pêr'a rabû ser p'îyan û wanr'a xizmetî kir. ⁴⁰ Gava ro diçû ava, hemûyên ku cûr'e-cûr'e nexaşiyên wan hebûn, ew anîne cem wî. Îsa destê xwe danî ser ji wan her kesî û ew qenc kirin. ⁴¹ Ji geleskan jî cin derdik'etin, dikirine qîr'în û digotin: «Tu Kur'ê Xwedê yî!» Lê Îsa li wan hilat û nedihîşt ew xeber din, çimkî dizanibûn ku ew Mesîh e.

⁴² Sibeh ku zelal bû, Îsa rabû çû cîkî xewle. K'oma merivan li wî diger'ya û heta cem wî hatin, nedihîştin ku ew dest ji wan bik'îşîne. ⁴³ Lê ewî gote wan: «Gerekê ez bajarên dînda jî Mizgînîya P'adşatîya Xwedê bidim, çimkî ez bona wê yekê hatime şandinê». ⁴⁴ Û k'inîştên Cihûstanêda dannasîn dikir.

ÎSA GAZÎ ŞAGIRTÊN XWEYE PÊŞIN DIKE
(Metta 4:18-22; Marqos 1:16-20)

⁵ ¹ Carekê Îsa li ber gola Cênîsartê sekinî bû û k'oma merivan dora wî girt, ku xebera Xwedê bibihê. ² Ewî li devê golê du qeyik dît, mesîgir ji wan derk'etibûn û t'or'ên xwe dişûştin. ³ Ew k'ete qeyikeke ji wan, ku ya Şimhûn bû û hîvî ji wî kir, ku qeyikê hinekî ji bejê dûr xe. Û rûnişt, ji qeyikê k'oma merivan hîn kir. ⁴ Çaxê wî xebardana xwe xilaz kir, gote Şimhûn: «Qeyikê bajo ser k'ûrayîyê û t'or'ên xwe bavêjine nêç'îrê». ⁵ Şimhûn lê vegerand got: «Mamoste, em t'emamîya şevê xebitîn, lê me t'u tişt negirt, lê boy xatirê te ezê t'or'an bavêjimê». ⁶ Û gava gotina wî kirin, haqas mesî k'etinê, ku t'or'ên wan diqetîyan. ⁷ Û bi nîşanan gazî hevalên xweyê qeyika dînda dikirin, ku bên alî wan bikin. Ew hatin û her du qeyik jî t'îje kirin, hindik mabû nuq bûna. ⁸ Gava Şimhûn-Petrûs ev yek dît, xwe avîte ber çokên Îsa û got: «Xudan, dûrî min her'e, ez yekî gunehk'ar im». ⁹ Çimkî bona wan mesîyên girtî saw k'ete ser wî û hemûyên pêr'a. ¹⁰ Aqûb û Yûhennayê kur'ên Zebedî jî nava wanda bûn, yên ku hevalên Şimhûn bûn. Îsa gote Şimhûn: «Netîrse! Ji vir hada tuê bibî nêç'îrwanê merivan». ¹¹ Û qeyik derxistine bejê û her tişt hiştin, pey wî çûn.

ÎSA YEKÎ K'OTÎ PAQIJ DIKE
(Metta 8:1-4; Marqos 1:40-45)

¹² Çaxê Îsa bajarekîda bû, li wir merivekî serda-pêda k'otî hebû. Gava wî Îsa dît, deverûya xwe avît, lava ji wî kir got: «Xudan! Heger bixazî, dikarî min paqij kî». ¹³ Îsa destê xwe dirêjî wî kir, lê k'et û got: «Dixazim. Paqij be!» Û pêr'a-pêr'a k'otîbûn jê çû. ¹⁴ Îsa t'emî da wî, ku vê yekê t'u kesîr'a nebêje û got: «Her'e xwe nîşanî k'ahîn ke û çawa Mûsa t'emî daye~ hedîya paqijbûna xwe bide, ku hemûyanr'a bibe şehdetî, ku tu paqij bûyî». ¹⁵ Nav û dengê Îsa hê zêde bela dibû û k'oma merivane giran dicivîya, ku guhdarîya wî bikin û ji nexaşiyên xwe qenc bin. ¹⁶ Lê ewî xwe li cîyên xewle digirt û dua dikir.

ÎSA GUNEHÊN YEKÎ ŞILÛŞET AFÛ DIKE Û WÎ QENC DIKE
(Metta 9:1-8; Marqos 2:1-12)

¹⁷ Rojekê, çaxê ewî hîn dikir, fêrisî û dersdarên Qanûnê jî rûniştibûn, ku ji her gundên Celîlê, Cihûstanê û Orşelîmê hatibûn. Qewata Xudan hizûr bû, ku Îsa nexaşên wan qenc bike. ¹⁸ Wê demê çend merivan yekî şilûşet ber'êva anîn û dixastin ew bibirana hindur û li ber Îsa danîna. ¹⁹ Û gava wana ji dest k'oma merivane giran t'u rê nedît, ku wî bînine hindur, rabûne ser xênî, selên *ban* dane alîkî û ber'êva ew daxistine nava malê, li ber Îsa. ²⁰ Gava ewî bawerîya wan dît, gote yê şilûşet: «Evdoyê, gunehên te hatine baxşandinê». ²¹ Qanûnzana û fêrisîyan destpê kir fikirîn û gotine hev: «Ev k'î ye, ku k'ifirî dike? Pêştîrî Xwedê k'î dikare gunehan afû bike?» ²² Îsa fikirên wan hesya li wan vegerand got: «Hûn dilê xweda çi difikirin? ²³ K'îjan rihet tê gotinê: <Gunehên te hatine baxşandinê> yan: <Rabe û biger'e>?» ²⁴ Lê ku hûn bizanibin, ku hikumê Kur'ê Meriv heye li ser dinyayê gunehan afû bike», gote yê şilûşet: «Ter'a dibêjim, rabe ber'a xwe hilde her'e mala xwe». ²⁵ Ew jî li ber ç'evên wan pêr'a-pêr'a rabû û ber'a ku li ser p'aldayî bû hilda çû mala xwe û şikirî dida Xwedê. ²⁶ Her kes heyr-hujmek'ar man û şikirî didane Xwedê û bi sawa mezin digotin: «Îro me tiştên nebûyî dît».

Lûqa 5,6

ÎSA GAZÎ LÊWÎ DIKE
(Metta 9:9-13; Marqos 2:13-17)

²⁷ Pey wê yekêr'a Îsa derk'et, li cîyê xerchildanê xercgirekî rûniştî dît, navê wî Lêwî û gotê: «Pey min were». ²⁸ Ewî jî her tişt hiştin, rabû pey wî çû. ²⁹ Lêwî mala xweda wîr'a hurmeteke mezin kir. T'evî wan gelek xercgir û hinekên mayîn jî li ser sifrê rûniştibûn. ³⁰ Fêrisîyan û qanûnzanan bîna xwe teng kirin û şagirtên wîr'a gotin: «Çima hûn xercgir û gunehk'aranr'a dixwin û vedixwin?» ³¹ Îsa li wan veğerand got: «Yên silamet ne hewcê hekîm in, lê nexaş. ³² Ez nehitime gazî yê rast kim, lê gazî gunehk'aran berbi t'obekirinê *bikim*».

PIRSA ROJÎGIRTINÊ
(Metta 9:14-17; Marqos 2:18-22)

³³ Wan jî Îsa pirsî: «Çima şagirtên Yûhenna û usa jî yê fêrisîyan t'imê rojî digirin û dua dikin, lê şagirtên te dixwin-vedixwin?» ³⁴ Wî jî got: «Gelo hûn dikarin bêjine xandîyên dewatê, ku ew rojî bigirin, heta hê zava t'evî wan e? ³⁵ Lê roj wê bèn, çaxê zava ji wan bê hildanê, wan rojanda ewana wê rojî bigirin».

³⁶ Ewî meseleke din jî gote wan: «Tu kes ji p'arçê nû nabir'e û k'inca kevn p'îne nake. Heger usa bike, him p'arçê nû diqelêşe, him jî kevn û nû li hev nakin. ³⁷ Ê ne jî kesek şeraba nû dike meşkên kevn. Heger usa bike, şeraba nû wê meşkan bit'eqîne û birije, meşk jî wê xirab bin. ³⁸ Lê gerekê şeraba nû bikine meşkên nû. ³⁹ Ê tu kes kes pey şeraba kevn'r'a naxaze ya nû vexwe, çimkî ya kevn hê li wî xaş tê».

PIRSA ROJA ŞEMÎYÊ Û QENC BÛNA MERIVÊ DESTK'ÎŞYAYÎ
(Metta 12:1-14; Marqos 2:23-3:6)

6 ¹ Rojêke şemîyê Îsa nava zevîyanr'a derbaz dibû, şagirtên wî simbilên genim diçinîn, destên xweda difirikandin û dixwarin. ² Lê hinekên jî fêrisîyan got: «Çima hûn roja şemîyê tiştê necayîz dikin?» ³ Îsa li wan veğerand got: «We nexandye Dawid çi kir, çaxê ew û yê pêr'a birçî bûn? ⁴ Ê ne ew k'ete Xana Xwedê û nanê Xwedêr'a dayî hilda, him xwexa xwar, him jî da yê t'evî xwe, ku t'û kesîr'a ne cayîz bû bixwara, pêştirî k'ahînan?» ⁵ Û vegerya gote wan: «Kur'ê Meriv Xudanê şemîyê ye jî».

⁶ Roja şemîke din Îsa çû k'inîştê, ku hîn bike. Merivek li wir hebû, ku destê wîyî rastê k'îşyabû. ⁷ Ç'evên qanûnzanan û fêrisîyan li Îsa bûn, gelo ewê roja şemîyê nexaşan qenc bike yan na, ku manîke wan hebe xeyba wî bikin. ⁸ Lê Îsa fikirên wan hesya û wî merivê destk'îşyayîr'a got: «Rabe vê govekêda bisekine». Ew jî rabû *li wir* sekinî. ⁹ Hingê Îsa gote wan: «Ezê pirsekê bidime we. Roja şemîyê çi cayîz e, Qencîyê bikin yan xirabîyê? Ruhekî rizgar bikin yan unda bikin?» ¹⁰ Û Îsa li hemûyên dora xwe nihêrî, wî merivîr'a got: «Destê xwe dirêj ke». Ewî jî usa kir û destê wî qenc bû. ¹¹ Hingê ewana jî hêrsa xweda dişewtîn, nava hevda dişewrîn, ku çi bînine serê Îsa.

HILBIJARTINA HER DONZDEH ŞANDÎYAN
(Metta 10:1-4; Marqos 3:13-19)

¹² Wan rojanda Îsa çû ser ç'îyê, ku dua bike û t'emamîya şevê ber Xwedê bi duakirinê derbaz kir. ¹³ Gava sibeh zelal bû, wî gazî şagirtên xwe kirin û donzdeh meriv ji nav wan hilbijartin û navên wan danî «şandî»: ¹⁴ Şimhûnê ku navê wî danî Petrûs û birayê wî Endraws, Aqûb û Yûhenna, Fîlîpo û Bertolomeyo, ¹⁵ Metta û Tûma, Aqûbê Halfawo û Şimhûnê ku welatp'arêz dihate gotinê. ¹⁶ Cihûdayê Aqûb û Cihûdayê Îsxeryotî, ku nemamîya wî kir.

ÎSA DANNASÎN DIKE Û QENC DIKE
(Metta 4:23-25)

¹⁷ Ew wanr'a dak'et û rastekêda sekinî. Li wir k'omeke şagirtane mezin û k'oma merivane cimetane giran ji t'emamîya Cihûstanê, Orşelîmê û ji devê be'ra Sûrê û Saydê civyayî bûn. ¹⁸ Ewana hatibûn, ku guhdarîya wî bikin û ji nexaşîyên xwe qenc bibin. Û yê ku ji ruhên heram dizêryan jî qenc dibûn. ¹⁹ Û t'emamîya k'oma merivan jî divedand, ku *hema* wî k'evin, çimkî qewat ji wî derdik'et û ji wan her kes qenc dibû.

YÊN XWEZÎ Û NE XWEZÎ
(Metta 5:1-12)

²⁰ Îsa berê xwe şagirtên xweda kir û got: «Xwezî li we feqîran, çimkî P'adşatîya Xwedê ya we ye. ²¹ Xwezî li we, ku niha hûn birçî ne, çimkî hûnê t'êr bin. Xwezî li we, ku niha hûn digirîn, çimkî hûnê bik'enin. ²² Xwezî li we, çaxê bona Kur'ê Meriv hûn ber ç'evên merivan reş bin, çaxê we qebûl nekin, we bêhurmet kin û navê xirab ser we derxin. ²³ Wê rojê hûn şa bin û bireqisin, çimkî maşê we ezmênda gelek e, çimkî kal-bavên wan jî hindava p'êxemberanda usa dikirin. ²⁴ Lê wey li we dewlemendan, çimkî we berdîlîya xwe standye. ²⁵ Wey li we, ku niha t'êr in, çimkî hûnê birçî bin. Wey li we, ku niha hûn dik'enin, çimkî hûnê bigirîn û şînê bikin. ²⁶ Wey li we, ku bona wê hemû meriv qenc xeber didin, çimkî kal-bavên wan jî bona p'êxemberên derew usa dikirin.

DIJMINÊN XWE HIZ BIKIN
(Metta 5:38-48; 7:12)

²⁷ Lê ez we guhdaranr'a dibêjim, dijminên xwe hiz bikin, xêrnexazên xwer'a qencîyê bikin. ²⁸ Dua-dirozge li wan bikin, yê ku nifiran li we dikin û yê xirabîyê li we dikin bona wan dua bikin. ²⁹ Heger yek rûyê te xe, yê din jî bide ber û yê ku *bi zorê* p'otê te ji te bistîne, kirasê xwe jî jêr'a bihêle. ³⁰ Bide wî, k'î ji te dixaze û k'î ji te distîne

* 5:38 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «ku her du jî bêne xweykirinê.»

paşda nexaze. ³¹ Û çawa hûn dixazin meriv bona we bikin, usa jî hûn bona wan bikin. ³² Heger hûn t'ênê hizdarên xwe hiz dikin, çi qazinc? Ê ne gunehk'ar jî hizdarên xwe hiz dikin? ³³ Û heger hûn qencîdarên xwer'a qencîyê bikin, çi qazinc? Ê ne gunehk'ar jî usa dikin? ³⁴ Û heger hûn deyn didine yên usa, ji k'îjanan guman in paşda bistînin, çi qazinc? Ê ne gunehk'ar jî deyn didine gunehk'aran, ku dîsa haqasî paşda bistînin? ³⁵ Lê hûn dijminên xwe hiz bikin, qencîyê bikin, deyn bidin û hîvîya vegerandinê nemînin. *Hingê* maşê weyê gelek be û hûnê bibine lawên Yê Herî Jor. Çimkî ew bona bêşêkiran jî, nerastan jî qenc e. ³⁶ Dilrehm bin, çawa Bavê we dilrehm e.

HÎNKIRINA LI SER LOMEKIRINÊ
(Metta 7:1-5)

³⁷ Lome nekin û lome wê li we nebin, dîwanê nekin û dîwana weyê neyê kirinê, bibaxşînin, wê li we bê baxşandinê. ³⁸ Bidin, wer'a wê bê dayînê, bi *derdanêke* çapa mezin dewisandî, hejandî û qûçkirî wê dagirine p'êşa we. Çimkî bi çi derdanê hûn bipîvin, bi wê jî wer'a wê bê pîvanê». ³⁹ Ewî meselek jî gote wan: «Gelo kor dikare rêberîyê koran bike? Ê ne her duyê jî bik'evine k'orê? ⁴⁰ Şagirt ji dersdarê xwe ne mestir e, lê yê ku xandina xwe baş pêk tîne, dikare mîna dersdarê xwe be. ⁴¹ Çima tu zilîkê ç'evê birê xweda dibînî, lê k'êranê ç'evê xweda nabînî? ⁴² Yan jî çawa tu dikarî bêjî birê xwe: <Birao, bihêle ji ç'evê te zilîk derxim>, lê k'êranê ç'evê xweda nabînî? Durû! Pêşda ji ç'evê xwe k'êran derxe. Paşê tuê qenc bibînî, ku ji ç'evê birê xwe zilîk çawa derxî.

DAR JI BERÊ XWE TÊ NASKIRINÊ
(Metta 7:17-20; 12:33-35)

⁴³ Dara qenc berê xirab nade, ne jî dara xirab berê qenc. ⁴⁴ Her dar ji berê xwe tê naskirinê, t'u kes ji stirîyan hêjîran naçîne û ne jî ji mormorkê, tirî. ⁴⁵ Merivê qenc, ji xezna dilê xweyê qenc, qencîyê dertîne, lê merivê xirab, ji xezna dilê xweyê xirab xirabîyê dertîne. Çi dilê mêrivda heyê, zar jî wê dibêje.

MALA YÊ SERWAXT Û MALA YÊ BÊAQIL
(Metta 7:24-27)

⁴⁶ Çima hûn minr'a <Xudan! Xudan!> dibêjin, lê wan tiştên ku ez dibêjime we hûn nakin? ⁴⁷ Her k'ê ku tê cem min, gotinên min dibihê û diqedîne, ez wer'a bêjim mîna k'ê ye. ⁴⁸ Ew mîna merivekî ye, yê ku malê çê dike, ew erdê dik'ole k'ûr dike, rikinê wê li ser kêvir datîne. Û çaxê lêyî radibe, ç'em li wê malê dixê, ew naheje, çimkî baş çê kirî ye. ⁴⁹ Lê ewê ku xeberên min dibihê û naqedîne, mîna merivekî ye, yê ku ser xwelfîyê xwer'a bêy rikin malê çê dike. Çaxê ç'em lê dixê, zû hildîşê û wêranbûna wê gelek giran dibe».

ÎSA XULAMÊ SERSEDEKÎ QENC DIKE
(Metta 8:5-13)

7 ¹ Gava Îsa ew gotinên ku wê guhdaranr'a bigota xilaz kirin, çû Kefernahûmê. ² Wir sersedek hebû, ku xulamê wî yekî bona wî hêja, nexaş ber mirinê bû. ³ Sersed bona Îsa bihîst, rûspîyên cihûyan şandine cem wî û hîvî jê kir, ku bê xulamê wî rizgar bike. ⁴ Ew hatine cem Îsa, gelekî hîvî jê kirin û gotin: «Ew hêja ye, ku wîr'a tu vê qencîyê bikî, ⁵ çimkî ew mîletê me hiz dike û bona me k'inîşt jî çê kirye». ⁶ Hingê Îsa wanr'a çû. Gava nêzikî malê bû, sersed çend hevalên xwe şandine pêşîya wî û gotê: «Xudan, xwe nede zehmetê, çimkî ez ne hêja me, ku tu bêyî mala min. ⁷ Lema min xwe layîqî te negirt, ku bihatama pey te jî, t'ênê xeberekê bêje û xulamê minê qenc be. ⁸ Çimkî ez xwexa jî merivekî bin hikumda me û bin destê minda jî esker hene. Ez yekîr'a dibêjim: <Her'e>, diçe, yê dinr'a dibêjim: <Were>, tê û xulamê xwer'a dibêjim: <Evî tiştî bike>, dike». ⁹ Gava Îsa ev yek bihîst, ser wî zendegirtî ma û ser wê cimetêda vegerya, ya ku pey wî dihat û got: «Ez wer'a dibêjim, min Îsrâêlêda jî bawerîke aha li cem t'u kesî nedîtye». ¹⁰ Û ewên *sersed* şandibûn vegeryane mal, dîtî wê ew xulam qenc bûye.

ZÊNDIKIRINA KUR'Ê JINEBÎYÊ

¹¹ Roja din Îsa çû bajarekî bi navê Nayîn, şagirtên wî jî t'evî k'omeke merivane giranva wîr'a diçûn. ¹² Gava nêzikî dergê bajêr bû, mirîk derdixistin. Ew kur'ê jinebîkêyî tayê-t'ênê bû û gelek hewarî ji bajêr pêr'a diçûn. ¹³ Gava Xudan dê dît, dilê wî lê şewitî, gotê: «Negirî». ¹⁴ Ew nêzikî darbestê bû girt û ewên ku dibirin sekinîn, Îsa got: «Xorto! Ter'a dibêjim, rabe!» ¹⁵ Mirî rabû rûnişt, destpê kir xeber da û Îsa ew da dîya wî. ¹⁶ Saw k'ete ser hemûyan, şikirî didane Xwedê û digotin: «P'êxemberekî mezin nava meda derk'etye!» «Xwedê serik daye cimeta xwe!» ¹⁷ Nav û dengê wî belayî t'emamîya Cihûstanê û der-dorê wê bû.

PIRSA YÛHENNA YÊ NIXAMDAR Û CABA ÎSA
(Metta 11:1-19)

¹⁸ Şagirtên Yûhenna bona van her tiştan wîr'a gotin. Yûhenna jî gazî du şagirtên xwe kir ¹⁹ û ew şandine cem Xudan, ku jê bipirsîn: «Tu ew î, yê ku gerekê bihata yan em hîvîya yekî din bin?» ²⁰ Ew meriv hatine cem Îsa û gotin: «Yûhennayê nixamdar em şandine cem te û pîrsekê ji te dike: Tu ew î, yê ku gerekê bihata yan em hîvîya yekî din bin?» ²¹ Û wê demê Îsa gelek ji nexaşîyan, derban, ji ruhên xirab qenc kirin û ç'evên gelek koran vekirin. ²² Îsa li wan vegeand got: «Her'in, çi we dît û bihîst Yûhennar'a bêjin: Kor dibînî, seqet diger'in, k'otî paqîj dibin, ker' dibihên, mirî zêndî dibin û feqîranr'a jî Mizgînî tê dayînê. ²³ Û xwezî li wî, k'ê minda nak'êve şikê». ²⁴ Gava ewên ku Yûhenna şandibûn çûn, Îsa destpê kir k'oma merivanr'a bona wî got: «Hûn derk'etine ber'iyê

çi binihêrin? Qamîşekî ku ji bayê diheje? ²⁵ Lê hûn derk'etin çi binihêrin? Merivekî k'incên nazik li xwe kirî? Ê ne ewên k'incên nazik li xwe dikin û jîyîna baş derbaz dikin, ew rewşxanên p'adşanda ne? ²⁶ Lê hûn derk'etin çi binihêrin? P'êxemberekî? Belê, ez dibêjime we, ji p'êxemberekî jî zêdetir. ²⁷ Eva ew e, bona k'îjanî nivîsar e: <Va ye ezê qasidê xwe pêşîya teva bişînim. Ewê rîya te pêşîya teva hazir bike>. ²⁸ Ez dibêjime we, ji nava ewên ku ji k'ulfetan dinê k'etine, ji Yûhenna mestir t'u p'êxember nebûye, lê P'adşatîya Xwedêda yê herî biç'ûk ji wî mestir e». ²⁹ Çaxê t'emamîya cimetê, usa jî xercgiran ev yek bihîst, t'ivdîra Xwedê rast hesab kirin, çimkî bi nixamtina Yûhenna hatibûne nixamtinê. ³⁰ Lê fêrisî û qanûnzanan bona xwe t'ivdîra Xwedê wêda avît, çimkî wan nexast bi *destê* Yûhenna bêne nixamtinê.

³¹ Îsa serda zêde kir got: «Ez merivên vî nisilî bi çi bidime ber hev? yan ew mîna k'ê ne? ³² Ew mîna wan zar'okan e, yên ku bazarêda rûniştî ne, gazî hevdu dikin û dibêjin: <Me bona we zurnê xist, hûn nereqîsîn û bona we beyt got, hûn negirîyan>. ³³ Yûhennayê nixamdar hat, ne nan dixwar, ne jî şerab vedixwar, we digot: <Çin wîda heye>. ³⁴ Kur'ê Meriv hat, dixwe û vedixwe, hûn bona wî dibêjin: <Ew yekî pey xwarin û vexwarinê k'etî ye, hevalê xercgir û gunehk'aran e>. ³⁵ Lê serwaxtîyê bi her lawên xwe rastîya xwe da k'ifşê».

ÎSA MALA ŞIMHÛNDA DIBAXŞINE K'ULFETA GUNEHK'AR

³⁶ Yekî fêrisî hîvî ji Îsa kir, ku t'evî wî xwarinê bixwe. Ew jî çû mala wî fêrisî, ser sifrê rûnişt. ³⁷ Û wî bajarîda k'ulfeteke gunehk'ar hebû. Gava ku wê bihîst ew mala fêrisîda ser sifrê rûniştî ye, derdaneke alabastirêda rûnê bînxaş anî ³⁸ piştêva ber nigên wî sekinî girîya, bi hêsirên xwe nigên wî şil kirin û bi p'or'ê serê xwe jî ziha kirin. Paşê nigên wî ramûsa, bi rûnê bînxaş jî gulrûn kirin. ³⁹ Gava fêrisîyê ku ew t'eglîf kiribû ev yek dît, dilê xweda got: «Heger eva p'êxember bûya, wê bizanibûya ew k'ê ye û yeke çawa ye, ku destê xwe dayê». Çimkî yeke gunehk'ar bû. ⁴⁰ Îsa gote wî: «Şimhûn, tişteki min heye, ku ter'a bêjim». Ewî jî got: «K'erem ke bêje, dersdar». Îsa got: ⁴¹ «Du deyndarên merivekî hebûn, yek pênsid zîvî deyndarê wî bû, yê din pêncî. ⁴² Lê çimkî tişteki wan t'unebû, ku deynê xwe bidana, ewî baxşande her duyan jî. Niha ji wan her duyan k'îjan wê wî gelek hiz bike? ⁴³ Şimhûn lê vegeand got: «T'exmîna min ewê ku gelek li wî hate baxşandinê». Îsa gote wî: «Te rast tê derxist». ⁴⁴ Û ser k'ulfetêda vegerya, gote Şimhûn: «Vê k'ulfetê dibînî? Ez hatime mala te, bona nigên min te av neda, lê evê bi hêsirên xwe nigên min şil kirin û bi p'or'ê serê xwe jî ziha kirin. ⁴⁵ Te ramûsanek neda min, lê ji hingêda ku ez hatime vir, evê dest ji ramûsana nigên min nek'işandye. ⁴⁶ Te serê min gulrûn nekir, lê evê bi rûnê bînxaş nigên min gulrûn kirin. ⁴⁷ Lema ez dibêjime te, gunehên vê, ku gelek bûn, hatine baxşandinê, lema evê gelek hiz kir. Çimkî k'êr'a gelek tê baxşandinê, ew gelek jî hiz dike. Lê k'êr'a hindik tê baxşandinê, ew hindik hiz dike». ⁴⁸ Û gote wê: «Gunehên te hatine baxşandinê». ⁴⁹ Hingê yên wîr'a ser sifrê rûniştibûn nava xweda digotin: «Ev k'î ye, ku heta gunehan jî dibaxşîne? ⁵⁰ Û Îsa gote wê k'ulfetê: «Bawerîya te tu rizgar kirî. Bi *dilê* rihet her'e».

PEYÇÛYÊN ÎSA

8 ¹ Ji wir şûnda Îsa gund û bajarên diger'ya, dannasîn dikir, Mizgînîya P'adşatîya Xwedê dida û her donzdeh şagirt jî wîr'a bûn, ² usa jî çend k'ulfetên ku ji ruhên xirab û nexaşîyan qenc bibûn *pey wî diçûn*~ Meryema ku wêr'a Mejdelaî digotin, ya ku heft cin jê derk'etibûn ³ û Yohana jina Xûzayê wek'îlxercê mala Hêrodes, Sosin û gelekên mayîn, yên ku bi hebûka xweva wanr'a berdestî dikirin.

MESELA T'OXIMREŞ Û ŞIROVEKIRINA WÊ
(Metta 13:1-23; Marqos 4:1-20)

⁴ Gava k'omeke merivane giran ji gelek bajarên cem Îsa civya, wî meselek got: ⁵ «T'oximreş rabû çû, ku t'oxim biçîne. Çaxê wî direşand, hinek k'etine devê rê û hatine p'êpeskirinê, teyredên ezmên jî hatin ew xwarin. ⁶ Hinek jî k'etine li cîyê kevirî û çaxê şîn bûn, ji dest kêmasîya şilayê hişk bûn. ⁷ Hinek jî k'etine nava stirîyan, stirî wanr'a şîn bûn û ew xeniqandin. ⁸ Hinekên din jî k'etine nava erdê qenc, şîn bûn, sed bare ber dan». Gava ev got, kire gazî: «Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê!»

⁹ Şagirtên wî jê pirsîn: «Manîya vê meselê çi ye? ¹⁰ Wî got: «Wer'a hatye dayînê, ku sur'ên P'adşatîya Xwedê bizanibin, lê yên mayîn'r'a bi meselan tê xebardanê, ku: <Binihêrin, lê nebînin, bibihên û fem nekin>». ¹¹ Awa ev e manîya vê meselê: T'oxim xebera Xwedê ye. ¹² *Merivên mîna* devê rê ew in, ku xeberê dibihên, lê Şeytan tê xeberê ji dilê wan derdixe, ku nebe ew bawer bikin û rizgar bin. ¹³ *Merivên mîna* cîyê kevirî ew in, ku çaxê dibihên, bi *dilê* şa xeberê hildidin. Lê *xeber dilê wanda* bêy raw e, ewana demeke kin bawer dikin û li dema cêribandinê dik'evin. ¹⁴ *Merivên mîna erdê* stirî ew in, yên ku xeberê dibihên, xemên dinyayêva, dewlemendîyêva û şabûna vê jîyînêva mijûl dibin, dixeniqin û bêy ber dimînin. ¹⁵ Û *merivên mîna* erdê qenc jî ew in, yên ku bi hub û rez xeberê dibihên, dilê xweda wê xwey dikin û bi sebir berê xwe didin.

Ç'IRA VÊXISTÎ
(Marqos 4:21-25)

¹⁶ T'u kes ç'ira vexistî nake binê firaqê, ne jî dike binê ber'ê, lê datîne ser p'êç'irê, ku ewên dik'evine hindur ronayê bibînin. ¹⁷ Çimkî tişteki veşartî t'une ku derneyê û ne jî tişteki dizîva, ku k'ifş nebe û neyê ber ronayê.

* 8:10 Îşaya 6:9.

Lûqa 8,9

¹⁸ Awa ser wan tiştên ku hûn dibihên bifikirin, çimkî k'êr'a ku heye, wê hê lê zêde be û k'êr'a ku t'une, tiştê wî t'irê heye jî, wê jê bê standinê».

DÊ Û BIRAYÊN ÎSA

(Metta 12:46-50; Marqos 3:31-35)

¹⁹ Hingê dê û birayên wî hatine cem, lê ji dest zefbûna k'oma merivan nikaribûn nêzîkî wî bûna. ²⁰ Cab dane wî ku: «Dîya te û birayên te derva sekinî ne û dixazin te bibînin». ²¹ Ewî jî li wan veğerand got: «Dê û birayên min ew in, yên ku xebera Xwedê dibihên û diqedînin».

BA Û GOL JÎ ÊLİMÎ ÎSA DIBIN

(Metta 8:23-27; Marqos 4:35-41)

²² Rojê Îsa bi şagirtên xweva t'evayî k'ete qeyikê û gote wan: «Em derbazî wî berî golê bin». Û rêk'etin. ²³ Gava qeyikêda diçûn, ew xewra çû. Û li golê bû firtonek, qeyik t'ije av dibû, ew nava qezîyayêda bûn. ²⁴ Hingê şagirt nêzîkî wî bûn, ew hişyar kirin û gotinê: «Mamoste, mamoste! Em unda dibin!» Ew rabû, li bayê û pêlên avê hilat, ew seqirîn û bû rihefî. ²⁵ Hingê ewî gote wan: «Bawerîya we k'anê ye»? Û wana bi saw, ecêbmayî gotine hev: «Gelo ev k'î ye, ku ferman dike ser ba û avê jî û ew êlimî wî dibin?»

ÎSA YEKÎ CINAK'ETÎ QENC DIKE

(Metta 8:28-34; Marqos 5:1-20)

²⁶ Ewana bi qeyikê çûne cî-miskenê Girasînê, pêşberî Celîlê. ²⁷ Gava Îsa derk'ete bejê, ji wî bajarî merivek derk'ete pêşîya wî, ku cin nava wîda hebûn. Ewî zûva ne k'inc li xwe dikirin û ne jî malda dima, nava gor'istanêda dima. ²⁸ Gava wî Îsa dît, kire qîr'în k'ete ber wî û bi dengêkî bilind got: «Tu çi ji min dixazî Îsa, Kur'ê Xwedêyê Herî Jor? Ez reca ji te dikim, min nede cizaretê!» ²⁹ Çimkî Îsa ferman dabû ser ruhê heram, ku ji wî merivî derk'eve. Ew gelek caran cinan dik'et û çaxê bi qeyd û zincîran jî girê didan, wî dîsa qeyd diqetandin û cinan ew çolan dixist. ³⁰ Hingê Îsa jê pirsî got: «Navê te çi ye»? Wî got: «Lêgêyon», çimkî gelek cin k'etibûne nava wî. ³¹ Û cinan lava ji wî fikir, ku fermanê nede, ku ew her'ine k'ora gelfîyê bêbin. ³² Li wir kerîke berazayî mezin hebû, ku ser ç'iyê diç'êrya. Cinan reca jê fikir, ku destûrê bide wan, ew her'in bik'evine nava berazan. Ewî destûr da. ³³ Û cin ji wî merivî derk'etin, çûn k'etine nava berazan û ew kerî jorda revî, xwe ji kendalda avîtime golê, xeniqîn. ³⁴ Gava berazvanan ev dît, revîn çûn û ev yek bajar û gundanda gotin. ³⁵ Meriv rabûn çûn, ku tiştê bûyî bibînin. Gava hatine cem Îsa, nihêrîn, wê ew merivê ku cin jê derk'etibûn, k'incên wî lê, ser hişê xweda hafî, li ber nigên Îsa rûniştî ye. Hingê ew tirsyan. ³⁶ Ewên ku ev yek dîtibûn, yên mayîn'a gotin, ku çawa yê cinak'etî qenc bû. ³⁷ Hingê hemû binelîyên der-dorên Girasînê hîvî ji Îsa kirin, ku ji wan dûr k'eve, çimkî saweke mezin ew girtibûn. Ew jî k'ete qeyikê û paşda vegerya. ³⁸ Lê ew merivê ku cin jê derk'etibûn lava ji wî kir, ku ew jî wîr'a her'e. Lê Îsa ew verêkir û got: ³⁹ «Vegera mala xwe û çi ku Xwedê bona te kir bêje». Û ew çû, çi ku Îsa bona wî kiribû t'emamîya bajêrda digot û dikire dengî.

QÎZIKA MIRÎ Û K'ULFETA NEXAŞ

(Metta 9:18-26; Marqos 5:21-43)

⁴⁰ Gava Îsa vegerya, k'oma merivan ew qebûl kir, çimkî hemû jî hîvîya wî bûn. ⁴¹ Merivekî navê wî Yayîro, serk'arê k'inîştê, hat xwe avîte nigên Îsa, hîvî jê kir, ku bê mala wî. ⁴² Çimkî t'enê qîzeke wî hebû~ donzdeh salî û ew jî ber mirinê bû. Gava Îsa diçû, k'oma merivan tengasî didanê. ⁴³ Wir k'ulfetek jî hebû, ku donzdeh salên wê bûn, ser xûnê vebibû. Ewê hemû hebûka xwe dabû hekîman, lê t'u kesî ç'are lê nekiribû. ⁴⁴ Eva piştêva hat, serê p'êşa k'inca Îsa k'et û pêr'a-pêr'a xûnê ç'ikîya. ⁴⁵ Îsa got: «Ew k'î bû, ku min k'et»? Gava t'u kesî hilnedida ser xwe, Petrûs got: «Mamoste, k'oma merivan te digvêşe, tengasîyê dide te û tu dibêjî, k'î bû, min k'et?». ⁴⁶ Lê Îsa got: «Yek min k'et, çimkî min xwe derxist, ku ji min qewat derk'et». ⁴⁷ Gava wê k'ulfetê dît ku ew nehate veşartinê, lerizî, hat xwe avîte ber *nigên* wî û pêş t'emamîya cimetêva wîr'a got, ku bona çi wî k'et û çawa pêr'a-pêr'a qenc bû. ⁴⁸ Ewî gotê: «Evdê! Bawerîya te tu qenc kirî. Bi *dilê* rihet her'e». ⁴⁹ Wî hê xeber dida, ji mala serk'arê k'inîştê yek hat got: «Qîza te mir, îdî zehmetê nede dersdar». ⁵⁰ Gava Îsa ev bihîst, gotê: «Netirse, t'enê bawer bike û ewê bijî». ⁵¹ Gava ew çû mal, nehişt t'u kes her'e hindur, pêştirî Petrûs, Yûhenna, Aqûb û dê û bavê qîzikê. ⁵² Hemû digiryan û şîna wê dikirin, lê Îsa got: «Negirîn. Ew nemirye, lê hênijîye». ⁵³ Wana qerfê xwe pê fikir, çimkî dizanibûn ku ew mirî ye. ⁵⁴ Îsa hemû derxistine derva destê wê girt, deng dayê got: «Qîzik, rabe!» ⁵⁵ Û ruhê wê lê vegerya, pêr'a-pêr'a rabû ser xwe. Îsa ferman da, ku xurek bidine wê. ⁵⁶ Dê û bavê wê zendegirtî man. Lê ewî t'emî da wan, ku vê yekê t'u kesîr'a nebêjin.

ŞANDINA HER DONZDEHAN

(Metta 10:5-15; Marqos 6:7-13)

9 ¹ Îsa her donzdeh şagirtên xwe gazî cem xwe kirin, qewat û hikum da wan, ku hemû cinan derxin û ji nexaşîyan qenc bikin. ² Ew şandin, ku P'adşatîya Xwedê dannasîn bikin û nexaşan qenc bikin ³ û gote wan: «Bona rê t'u tiştî hilnedin~ ne kewaz, ne tûrik, ne nan, ne zîv, ne jî du dest kiras. ⁴ Çi mala ku hûn her'inê, wir bimînin û ji wir rêk'evin. ⁵ Û ew dera ku we qebûl neke, gava hûn ji wî bajarî dertên, t'oza nigên xwe dawşînin, ku wanr'a bibe şehdetî». ⁶ Û şagirt rabûn, gund-gund ger'yan û her deran Mizgînî dan û nexaş qenc kirin.

Lûqa 9

XIRABÎYA HËRODES
(Metta 14:1-12; Marqos 6:14-29)

⁷ Awa Hêrodesê serok bona her kirinên Îsa bihîst û t'evîhev bû, çimkî hinekan digot: «Eva Yûhenna ye, ji nava mirîyan zêndî bûye» ⁸ û hinekan jî digot: «Êlyas e, k'ifş bûye» û hinekên mayîn jî digotin: «Eva yekî ji p'êxemberên berê ye, zêndî bûye». ⁹ Hêrodes got: «Min serê Yûhenna da lêxistinê, lê eva k'î ye ku ez derheqa wîda van tiştan dibihê?» Û wî dixast Îsa bidîta.

ÎSA PËNC HEZAR MERIVAN T'ËR DIKE
(Metta 14:13-21; Marqos 6:30-44; Yûhenna 6:1-14)

¹⁰ Gava şandî vegeryan û çî kiribûn Îsar'a gotin, wî şandîyên xwe başqe xwer'a hildan û çûne cîkî xewle, berbi bajarê Beytsaydayê. ¹¹ Gava k'oma merivan pê hesya, pey wî çû. Îsa ew qebûl kirin û wan'a li ser P'adşatîya Xwedê xeber dida û yê ku hewcê qencbûnê bûn qenc kirin. ¹² Berî êvarê her donzdeh hatine cem û gotine wî: «K'oma merivan ber'de, ku her'in gund û bergên der-doran cî-war bin û xurek xwer'a dest xin, çimkî em li cîkî xikî-xwelî ne». ¹³ Wî gote wan: «Hûn xurek bidine wan». Wan jî lê vegeand got: «Pêştirî pënc nan û du mesîyan, îdî tişteki meyi din t'une, heger em neçin cimetê hemûyanr'a xurek nek'ir'in?»

¹⁴ Çimkî qasî pënc hezar mêran bûn. Ewî jî gote şagirtên xwe: «Cimetê pëncî-pëncî bidine rûniştandinê». ¹⁵ Û usa kirin~ hemû jî dane rûniştandinê. ¹⁶ Ewî ew pënc nan û her du mesî hildan, berê xwe ezmênda kir şikirî da, ker kir û da şagirtan, ku belayî k'oma merivan kin. ¹⁷ Hemûyan jî xwar t'êr bûn û donzdeh sele jî hûrikên bermayî dane hev.

ŞEHDETÎYA PETRÛS Û GOTINA ÎSA BONA MIRIN Û ZÊNDÎBÛNA WÎ
(Metta 16:13-28; Marqos 8:27-9:1)

¹⁸ Carekê Îsa başqe t'evî şagirtên xwe dua dikir, *hîngê* jî wan pirsî: «Bi t'exmîna cimetê ez k'î me»? ¹⁹ Wana lê vegeand got: «Hinek dibêjin Yûhennayê nixamdar e, hinekên din dibêjin Êlyas e, hinekên din jî dibêjin, yekî ji p'êxemberên berê ye, zêndî bûye». ²⁰ Ewî jî wan pirsî: «Lê hûn çî dibêjin? Bi t'exmîna we ez k'î me»? Petrûs lê vegeand got: «Tu Mesîhê Xwedê yî».

²¹ Hîngê Îsa sert t'emî da wan, ku wê yekê t'u kesîr'a nebêjin. ²² Û ewî got: «Kur'ê Meriv gerekê geleki biçerçire, ji alîyê rûspîyanda, serokên k'ahînananda û qanûnzanananda wêda bê avîtinê û bê kuştinê, lê roja sisyan wê ji mirinê zêndî be».

²³ Û Îsa hemûyanr'a got: «Heger yek dixaze pey min bê, bira kesa xwe înk'ar bike û her roj xaçê xwe hilde û pey min bê. ²⁴ Çimkî k'î ku dixaze kesa xwe rizgar bike, ewê unda bike û k'î ku kesa xwe bona min unda bike, ewê rizgar bike. ²⁵ Çî qazinc, heger meriv t'emamîya dinyayê dest bîne, lê kesa xwe unda bike yan zirarê xe? ²⁶ Û k'î min û xeberên min şerm hesab bike, Kur'ê Meriv jî wê wî şerm hesab bike, çaxê ew bi rûmeta xwe û ya Bavê bi t'evî milyak'etên pîroz bê. ²⁷ Ez rast dibêjime we, ku hinekên li vir hizûr, wê mirinê nebînin, heta ku P'adşatîya Xwedê bibînin».

ŞAGIRT ÎSA NAVA NÛR Û RÛMETËDA DIBÎNIN
(Metta 17:1-8; Marqos 9:2-8)

²⁸ Pey van gotinanr'a weke heyşt rojan şûnda, Îsa Petrûs, Yûhenna û Aqûb hildan çûne ser ç'îyê, ku dua bikin. ²⁹ Gava Îsa dua kir, rengê sifetê wî hate guhastinê, k'incên wî çîl-qerqas bûn, biriqîn. ³⁰ Û du merivan wîr'a xeber didan, yek Mûsa bû, yek jî Êlyas. ³¹ Ewana bi rûmet k'ifş bûn û bona mirina wî xeber didan, ku Orşelîmêda wê bibûya. ³² Ç'evên Petrûs û yê pêr'a jî xewê giran bibûn, lê gava hişyar bûn, rûmeta Îsa û her du merivên cem sekinî dîtin. ³³ Gava ewana jî wî dûr k'etin, Petrûs Îsar'a got: «Mamoste, çiqas baş e em li vir in! De emê sê oban çê kin, yekê ter'a, yekê Mûsar'a û yekê jî Êlyasr'a». Çimkî wî nizanibû çî dibêje. ³⁴ Gava ewî hê xeber dida, e'wrek hat û ser wan kire sî. Û gava k'etine bin wî e'wrî, ew tirsyan. ³⁵ Û jî wî e'wrî dengê hat ku digot: «Ev e, Kur'ê min, Bijartîyê min! Guhdarîya wî bikin!» ³⁶ Gava ew deng hat, Îsa t'enê ma. Wana dengê xwe bir'î û çî ku dîtibûn, wan rojanda, t'u kesîr'a negotin.

ÎSA XORTEKÎ CINAK'ETÎ QENC DIKE Û BONA MIRINA XWE DIBÊJE
(Metta 17:14-18,22,23; Marqos 9:14-27, 30-32)

³⁷ Roja din, gava ew jî ç'îyê dak'etin, k'omeke merivane giran pêşîya Îsada hat. ³⁸ Û jî nav k'oma merivan merivekî kire gazî û got: «Dersdar, ez hîvî ji te dikim, bi ç'evê rehme kur'ê min binihêre. Ew tayê minî t'enê ye, ³⁹ ruhekî xirab wî digire û nişkêva dike qîr'în, vediç'irike, k'ef dêv dik'eve, hûrdexaşî dibe û bi zorekê ji wî dûr dik'eve. ⁴⁰ Min lava ji şagirtên te kir, ku cin jê derxin, lê wan nikaribû». ⁴¹ Îsa got: «Nisilê nebawer û xalifî! heta çîçax ezê t'evî we bim û li we sebir kim? Kur'ê xwe bîne vir». ⁴² Gava hê dihat, cin ew erdê xist û p'irpitî. Îsa li ruhê heram hilat, xort qenc kir û da bavê wî. ⁴³ T'emamîya cimetê ser mezinayîya Xwedê zendegirtî mabû.

Û gava ser her tiştên ku Îsa dikirin hemû ecêb mabûn, ewî gote şagirtên xwe: ⁴⁴ «Hûn van xeberan bîra xweda xwey kin: Kur'ê Meriv wê bik'eve destê merivan». ⁴⁵ Lê wana ev yek fem nekîr, çimkî ev ji wan veşartî bû, ku fem nekin û turuş nedikirin jî bona wê yekê ji wî bipirsîyana.

Lûqa 9,10

K'Î YE YÊ HERÎ MEZIN?
(Metta 18:1-5; Marqos 9:33-37)

⁴⁶ Nava şagirtanda pirsek pêşda hat, ku ji nava wan k'î ye yê herî mezin. ⁴⁷ Lê Îsa fikirên dilê wan hesya, zar'okek anî cem xwe da sekinandinê ⁴⁸ û gote wan: «K'î ku evê zar'okê bi navê min qebûl bike, ew min qebûl dike. Û k'î ku min qebûl dike, yê ez şandim qebûl dike. Çimkî k'î ku nava we hemûyanda yê herî biç'ûk e, ew e yê herî mezin».

YÊ NE MIQABILÎ WE YE, EW T'EVÎ WE YE
(Marqos 9:38-40)

⁴⁹ Yûhenna rabû û got: «Mamoste, me merivek dît, ku bi navê te cin derdixistin, lê me nehişt, çimkî ew li pey me nayê». ⁵⁰ Lê Îsa gote wî: «Pêşîya wî negirin, çimkî ewê ku ne miqabilî we ye, ew t'evî we ye».

GUNDEKÎ SAMERÎYANA ÎSA QEBÛL NAKE

⁵¹ Û çaxê ew rojên ku *wanda* Îsa wê bihata hildanê nêzik bûn, ewî berê xwe Orşelîmêda kir, ku her'e wir. ⁵² Û pêşîya xwe meriv şandin, ew jî çûne gundekî Sameryayê, ku bona wî hazirîyê bibînin. ⁵³ Lê samerîyan ew li wir qebûl nekir, çimkî berê wî Orşelîmêda bû. ⁵⁴ Gava şagirtên wî Aqûb û Yûhenna ev yek dît, gotin: «Xudan, tu dixazî ku em ji ezmên agir bixazin, bira bibare û qir'a van bîne?»* ⁵⁵ Lê ew vegerya, li wan hilat.† ⁵⁶ Û çûne gundekî din.

CABDARÎYA YÊN PEY ÎSA DIÇIN
(Metta 8:19-22)

⁵⁷ Û çaxê ewana rêda diçûn, yekî gote wî: «Tu k'uda jî her'î ezê pey te bêm». ⁵⁸ Îsa gotê: «Bona rûvîyan k'or hene, teyredên ezmên'r'a jî hêlîn, lê bona Kur'ê Meriv cîk t'une ku serê xwe lê dayne». ⁵⁹ Îsa yekî din'r'a got: «Pey min were». Wî jî got: «Xudan! Destûrê bide min, ez her'im pêşda bavê xwe bikime gor'ê». ⁶⁰ Lê Îsa gotê: «Bira mirî mirîyê xwe bikime gor'ê. Tu her'e P'adşatîya Xwedê dannasîn ke». ⁶¹ Yekî din jî got: «Ezê pey te bêm Xudan, lê t'enê destûrê bide min, ku ez pêşda xatirê xwe ji neferên mala xwe bixazim». ⁶² Îsa got: «K'î ku destê xwe datîne ser k'otan û pişt xweva vedigere, ew ne hêjayî P'adşatîya Xwedê ye».

ŞANDINA HEFTÊ DU ŞAGIRTAN

10 ¹ Pey vê yekê'r'a Xudan heftê du şagirtên din jî hilbijartin û ewana cot-cot pêşîya xweva şandine wan bajarên û deran, li k'u xwexa gerekê biçûya ² û gote wan: «Nandirûn gelek e, lê k'arker hindik in. Awa hîvî ji xweyê nandirûnê bikin, ku k'arkeran nandirûna xwer'a bişîne. ³ Her'in, ez we mîna berxan dişînime nava guran. ⁴ Xwer'a ne k'îsik hildin, ne tûrik, ne jî p'êlavan. Û rêva silavê nedine t'u kesî, ⁵ çî mala ku hûn her'inê, pêşîyê bêjin: <Haştî vê malê'r'a>. ⁶ Û heger wir merivekî hêjayî haştîyê hebe, haştîya weyê li ser wî bimîne. Lê heger t'unebe, wê li we vegere. ⁷ Wê malêda bimînin, çî xwarinê ku bidine we, wê jî bixwin û vexwin, çimkî k'arker hêjayî maşê xwe ye. Û mal-mal neger'in. ⁸ K'îjan bajarê ku hûn her'inê û we qebûl bikin, çî daynine ber we, bixwin. ⁹ Nexaşên navda qenc kin û bêjine wan: <P'adşatîya Xwedê nêzikî we bûye>. ¹⁰ Lê ew bajarên ku hûn her'inê û we qebûl nekin, derk'evine meydanên wan û bêjin: ¹¹ <Em wê t'oza ku ji bajarê we nigên meva girtye jî li ser weda dawdişînin. Lê vê yekê bizanibin ku P'adşatîya Xwedê nêzikî we bûye>. ¹² Ez wer'a dibêjim, Roja Axretê halê Sodomê wê ji ya wî bajarî çêtir be».

BAJARÊN NEBAWER Û VEGERA HEFTÊ DUDAN
(Metta 11:20-24)

¹³ Îsa got: «Wey li te Xorazîn! Wey li te Beytsayda! Heger ew k'iryametên ku nava weda bûn, Sûr û Saydayêda bibûna, ewan zûva k'urx û k'oziyêda rûniştî wê ji xirabîyê vegeryana. ¹⁴ Lê Roja Axretê halê Sûr û Saydayê wê ji halê we hêsatir be. ¹⁵ Û tu Kefernahûm, te t'irê tuê heta ezmên bilind bî? Lê tuê heta dojê[‡] her'i xwarê!

¹⁶ K'ê guhdarîya we dike, guhdarîya min dike û ewê we ji xwe dûr dixê, ew min ji xwe dûr dixê, lê k'ê min ji xwe dûr dixê, ew ewî ez şandime ji xwe dûr dixê».

¹⁷ Ew heftê du şagirt şa vegeryan û gotin: «Xudan, saya navê te cin jî elimî me dibûn». ¹⁸ Ewî gote wan: «Min Şeytan dît ji ezmên k'etî, mîna birûska ku jorda tê xwarê. ¹⁹ Awa min hikum daye we, ku hûn me'r û dûp'işkan û hemû qewata dijmin p'êpes kin û t'u tişt wê zirarê nede we. ²⁰ Lê bi wê yekê şa nebin, ku cin elimî we dibin, lê şa bin, ku navên we li ezmanan nivîsar e».

BI DESTÊ K'Ê XWEDÊ NAS BIKIN
(Metta 11:25-27; 13:16-17)

²¹ Hingê ew bi Ruhê Pîroz şa bû û got: «Şikir navê te be Bavo, Xudanê erd û ezman, ku te ev tişt ji zaneyan û bilanan veşart û li ber zar'okan vekir. Belê Bavo, çimkî aha li te xaş hat. ²² Her tişt ji Bavê min min'r'a hatye dayînê. T'u kes nizane Kur' k'î ye, pêştirî Bavê û t'u kes nizane Bav k'î ye, pêştirî Kur' û ewê *bizanibin*, k'êr'a

* 9:54 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «Çawa Êlyas kir.»

† 9:55 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «Û got: <Hûn nizanin xweyê çî ruhî ne. Çimkî Kur'ê Meriv nehat, ku ruhê merivan unda ke, lê rizgar ke>».

‡ 10:15 Cenimê

ku Kur' bixaze Bavê bide naskirinê». ²³ Û hingê ser şagirtên xweda vegerya û wan'r'a başqe got: «Xwezî li wan ç'evan, ku ew jî wê dibînin çî ku hûn dibînin. ²⁴ Çimkî ez dibêjime we, ku gelek p'êxemberan û p'adşan xastin ew tiştên hûn dibînin bidîtana, lê nedîtin û ew tiştên hûn dibihên bibihîstana, lê nebihîstin».

MESELA SAMERÎYÊ QENC

²⁵ Awa qanûnzaneke rabû ew cêriband û got: «Dersdar, ez çî bikim, ku jîyîna heta-ha-tê bistînim?» ²⁶ Ewî jî ji wî pirsî: «Qanûnêda çî nivîsar e? Tu çî dixûnî?» ²⁷ Ewî lê vegerand got: «<Xudan Xwedêyê xwe hiz bike, bi t'emamîya dilê xwe, bi t'emamîya canîya xwe, bi t'emamîya qewata xwe û bi t'emamîya hişê xwe>, <hevalê xwe jî, weke xwe hiz bike>». ²⁸ Û Îsa got: «Te rast got. Usa bike û tuê bijîy». ²⁹ Lê ewî xast xwe rûspî ke, gote Îsa: «Hevalê min k'î ye?» ³⁰ Îsa lê vegerand got: «Merivek hebû, ku ji Orşelîmê dadik'ete Erîhayê. Ew k'ete destê t'alank'aran û wan ew tazî kir, lêxistin û nîvkuştî hiştin çûn. ³¹ Usa bû ku k'ahînek wê rêda dihat. Gava wî ew dît, berr'a derbaz bû çû. ³² Usa jî yekî lêwî[†] hat, gihîşte wir, li wî nihêrî, berr'a derbaz bû çû. ³³ Paşê rêwîkî samerî hat. hat. Gava ew dît, dilê wî pê şewtî. ³⁴ Nêzîkî wî bû, bizir û şerab birînên wî dan, p'êça û ew danî ser k'erkedanê xwe bire mêvanxanê û bona wî xem kir. ³⁵ Roja din du zîv derxistin dane xweyê mêvanxanê û got: <Xizmetîyê bona vî bike, tu çî jî zêde ser xerc bikî, çaxê vegeryam, ezê li te vegefînim>.

³⁶ Niha t'exmîna te, ji wan her sêyan k'îjan bû hevalê wî merivê ku k'ete destê t'alank'aran?» ³⁷ Ewî jî got: «Ewê ku dilê wî pê şewtî». Îsa gote wî: «Her'e tu jî usa bike».

ÎSA MALA MERTA Û MERYEMÊDA

³⁸ Çaxê rêk'etin çûn, Îsa k'ete gundekî. K'ulfeteke navê wê Merta ew mala xweda qebûl kir. ³⁹ Xûşkeke wê jî hebû, navê wê Meryem, ew ber nigên Xudan rûniştibû û guhdarîya xeberên wî dikir. ⁴⁰ Merta jî ku gelek t'ivdarekdîtîneva giro bû, hat sekinî û Îsar'a got: «Xudan, qet ne xema te ye, ku xûşka min li vê t'ivdarekdîtîneva ez t'enê hiştîme? Bêjê bira alî min bike». ⁴¹ Xudan lê vegerand got: «Merta, Merta, tu bona gelek tiştan xeman dikî û t'evîhev dibî. ⁴² Lê t'enê tiştêk lazim e, ew p'ara qenc jî Meryemê xwer'a hilbijart û ji wê nayê hildanê».

HÎNKIRINA LI SER DUAKIRINÊ

(Metta 6:9-13; 7:7-11)

11 ¹ Carekê Îsa cîkî dua dikir, gava xilaz kir, ji şagirtên wî yekî gotê: «Xudan, me hînî duakirinê ke, çawa ku Yûhenna şagirtên xwe hîn kirin». ² Ewî gote wan: «Çaxê hûn dua dikin, aha bêjin: Bavê meyî ezmanan, Navê te pîroz be. P'adşatîya te bê, daxaza te be, çawa li ezmên usa jî ser dinyayê. ³ Nanê meyî rojê roj bi roj bide me. ⁴ Û gunehên me bibaxşîne me, çimkî em jî dibaxşînine hemû deyndarên xwe û me nebe ser cêribandinê, lê me ji yê xirab rizgar ke». ⁵

⁵ Û gote wan: «Ji we k'î ye, ku hevalekî wî hebe û nîvê şevê bê mala wî jêr'a bêje: <Hevalo, deynî sê nanan bide min, ⁶ çimkî pismamekî min ji rê dageryaye hatye mala min, tiştêkî minî xwarinê t'une, ku daynime ber wî>. ⁷ Û gelo ew jî ji hindurva lê vegefîne û bêje: <Derî îdî dadayî ye, ez zar'okên xweva jî nava cî-nivînananda ne, zehmetê nede min, ez nikarim rabim nan bidime te>. ⁸ Ez wer'a dibêjim, heger ew bona hevaltîyê jî ranebe nan nedê, lê bona recayê wî wê rabe, çiqas jêr'a lazim be wê bidê. ⁹ Ez dibêjime we, bixazin hûnê bistînin, biger'in hûnê bibînin, derî xin wê li ber we vebe. ¹⁰ Çimkî k'î dixaze distîne, k'î diger'e dibîne û k'î ku derî dixê, li ber wî vedibe. ¹¹ Ji we k'îjan e ew bavê ku kur'ê wî mesî jê bixaze, dewse me'r bidê, ¹² yan hêkê bixaze, dúp'işkê bidê? ¹³ Hûn ku xirab in, lê dizanin tiştên qenc bidine lawên xwe, lê çiqas zêde Bavê li ezmanan wê Ruhê Pîroz bide wan, yên jê dixazin».

BÊT'İFAQÎ MAL Û P'ADŞATÎYAN WÊRAN DIKE

(Metta 12:22-30; Marqos 3:20-27)

¹⁴ Carekê Îsa cinekî lal ji yekî derdixist, gava cin derk'et, yê lal xeber da û k'oma merivan zendegirtî ma. ¹⁵ Lê ji wan hinekan got: «Ew cinan bi hikumê Belzebûlê mîrê cinan derdixê». ¹⁶ Hinekan jî ew dicêriband, nîşanên ezmên jê dixastin. ¹⁷ Lê Îsa fikirên wan hesya gote wan: «Her p'adşatîya ku nava wêda t'ifaq t'unebe wê wêran be û mala ku bêt'ifaqî bik'evê, ew mal namîne. ¹⁸ Heger Şeytan nava xweda bêt'ifaq be, p'adşatîya wî wê çawa bimîne? çimkî hûn dibêjin, ku ez bi hikumê Belzebûl cinan derdixim. ¹⁹ Heger ez bi Belzebûl cinan derdixim, lê yên pey wer'a tîn bi çî derdixin? Heger usa be, ewê bibine hakimên we. ²⁰ Lê heger ez bi destê Xwedê cinan derdixim, usa ye P'adşatîya Xwedê gihîştîye we. ²¹ Çaxê yekî qewat bi ç'ek xweyîyê mala xwe dike, zîrar t'û hebûka wî nak'eve. ²² Lê çaxê yekî ji wî qewattir bê, wê wî bigire û ç'ekên ku ew wanda guman bû wê jê bistîne, hebûka wî jî wê bela-belayî ke. ²³ K'î ku ne t'evî min e, ew miqabilî min e û k'î ku bi t'evî min t'op nake, ew bela dike».

* 10:27 Qanûna Ducarî 6:5; Qanûna K'ahîntîyê 19:18.

† 10:32 Qebîleke Îsraêlê ser navê Lêwîyê kur'ê Aqûb «lêwî» dihatine gotinê. Ev qebîl nava Îsraêlêda Qanûna Xwedê hîn dikirin.

‡ 11:2 Destnivîsarên hinekanda «daxaza te be, çawa li ezmên usa jî li ser erdê» t'une.

§ 11:4 Destnivîsarên hinekanda «lê me ji yê xirab rizgar ke» t'une

** 11:11 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «Kur'ê wî nan jê bixaze, kevir bidê?»

Lûqa 11,12

PAŞDA HATINA RUHÊ HERAM
(Metta 12:43-45)

²⁴ Çaxê ruhê heram ji mêriv derdik'eve, li cîyê bê av diger'e, ku rihetîyê bibîne û gava nabîne, dibêje: <Ez vegerime wê mala xwe, ji k'u derk'etîme>. ²⁵ Û çaxê tê, wê malê paqijkirî û hevdayî dibîne. ²⁶ Hingê diçe heft cinên dine ji xwe xirabtir jî tîne, dik'evine wir dimînin. Û axirîya wî merivî ji pêşîyê xirabtir dibe».

XWEZÎYA RAST

²⁷ Gava Îsa hê xeber dida, ji nava k'oma merivan k'ulfetekê bi dengê bilind gote wî: «Xwezî li wê malzar'ê, ku tu xweda xweykirî û wan bistanan, ku şîr dane te». ²⁸ Lê ewî got: «Hê xwezî li wan, yên ku xebera Xwedê dibihên û pêk tînin».

K'IRYAMETEK JI ÎSA TÊ XASTINÊ
(Metta 12:38-42;)

²⁹ Gava k'oma merivan dora wî dicivîya, Îsa destpê kir got: «Ev nisil xirab e, nîşanekê dixaze, lê jêr'a nîşaneke din nayê dayîne pêştirî nîşana Ûnis p'êxember. ³⁰ Çawa Ûnis bona Nînewê bû nîşan, usa jî Kur'ê Meriv wê vî nisilîr'a bibe nîşan. ³¹ Xanimp'adşa Başûrê wê Roja Axretê t'evî merivên vî nisilî rabe û wan neheq bike, çimkî ew ji serê dinyayê hat, ku serwaxtîya Silêman bibihê û va ye yekî ji Silêman mestir li vir heye. ³² Merivên Nînewê Roja Axretê wê t'evî vî nisilî rabin û wan neheq kin, çimkî ewana bi dannasîna Ûnis ji gunehkirinê vegeryan. Va ye yekî ji Ûnis mestir li vir heye.

Ç'IRA BEDENÊ
(Metta 5:15; 6:22-23)

³³ T'u kes ç'irê vênaxe û danayne cîyê xewle, ne jî dike binê firaqê, lê datîne ser p'êç'irê, ku ewên dik'evine hindur, ronayê bibînin. ³⁴ Ç'ira bedena te ç'evê te ye. Heger ç'evê te baş e, t'emamîya bedena teyê ronahî be. Lê heger ç'evê te xirab e, bedena teyê jî tarî be. ³⁵ Haş ji xwe hebe, dibe ku ew ronaya nava teda tarî ye. ³⁶ Heger t'emamîya bedena te ronahî ye û p'areke tarî t'une, hemû jî wê ronahî be, çawa ç'ira bi şewqa xwe te ronahî dike».

NEHEQÎYA FÊRISÎYAN Û QANÛNZANAN
(Metta 23:1-36; Marqos 12:38-40; Lûqa 20:45-47)

³⁷ Gava wî xeberdana xwe ser hevda anî, yekî fêrisî hîvî jê kir ku t'evî wî her'e nan bixwe. Ew jî çû, li ser sifrê rûnişt. ³⁸ Gava yê fêrisî dît ku wî berî nanxwarinê destên xwe neşuştin, zendegirtî ma. ³⁹ Lê Xudan gote wî: «Awa hûn fêrisî t'as û fîncanan rûyê dervava paqij dîkin, lê dilê we hindurva bi timayê û xirabîyanva t'ijî ye. ⁴⁰ Bêfemno! Ewê ku derva çê kir, hindur çê nekir? ⁴¹ Awa bi çîva *derdanên* we t'ijî ne, bi wan xwer'a qencîyê bikin û her tişt wê wer'a helal be. ⁴² Lê wey li we fêrisîyan! Hûn deheka pûngê, cet'riyê û her p'incar'an didin, lê heqîyê û hizkirina Xwedê pişt guhê xweva davêjin. Gerekê we ev tişt bikirana û dest ji yên mayîn nek'işanda. ⁴³ Wey li we fêrisîyan, ku hûn k'iniştanda k'ursîyên pêşin hiz dîkin, bazaranda jî silavan. ⁴⁴ Wey li we! Hûn mîna gor'ên bêy nav-nîşan in, ku meriv ser wan diger'in û nizanin». ⁴⁵ Ji qanûnzanan yekî lê vegerand got: «Dersdar, bi wan xeberan tu me jî bêhurmet dikî». ⁴⁶ Ewî got: «Wey li we qanûnzanan jî, çimkî hûn barên giran didine ser merivan, lê hûn t'ilîke xwe jî nadine wan baran. ⁴⁷ Wey li we, ku hûn t'irbên wan p'êxemberan çê dîkin, yên ku kal-bavên we ew kuştine. ⁴⁸ Bi wê yekê hûn şehdetîya xwe didin, ku hûn kirinên kal-bavên xwe begem dîkin. Wan p'êxember dikuştin, hûn t'irbên wan çê dîkin. ⁴⁹ Lema jî serwaxtîya Xwedê got: <Ezê p'êxember û şandîyan bişînim cem wan, ji wan hinekan wê bikujin, hinekan jî bizêrinin>. ⁵⁰ Lema xûna her p'êxemberan, ku ji dema efirandina dinyayêda hatye rêtinê, ji vî nisilî wê bê xastinê, ⁵¹ ji xûna Habîl heta xûna Zekerîya, ku nava qurbangêhê û p'aristaxnêda hate rêtinê. Ez rast dibêjime we, ji vî nisilî wê bê xastinê. ⁵² Wey li we qanûnzanan, ku we k'ilîta zanebûnê hildaye. Hûn ne k'etinê û ne jî we hiştîye ku yên dixazin bik'evinê». ⁵³ Û gava ew rabû ku her'e, qanûnzanan û fêrisî qilqilîn, bona gelek tiştan wîr'a k'etine de'wê. ⁵⁴ Û ber devê wî sekinî bûn, ku bi xeberekê bikaribin wî bigirin û gunehk'ar kin.

HEVZA XWE JI DURÛTÎYÊ BIKIN

12 ¹ Hingê, gava bi hezaran meriv civyan, usa ku ser hevr'a derbaz dibûn, wî pêşîyê destpê kir gote şagirtên xwe: «Hevza xwe ji hevîrtirşkê fêrisîyan bikin, ya wan durûtî ye. ² Tiştêkî dizîva t'une, ku aşkere nebe û ne jî veşartî, ku dernek'eve. ³ We çî tarîyêda gotye, ewê ronayêda bê bihîstinê û we çî li malê guhanda xeber daye, ewê ser banan bibe dengî.

JI K'Ê BITIRSIN?
(Metta 10:28-31)

⁴ Ez we, pismamên xwer'a dibêjim, ji wan netirsin, yên bedenê dikuujin, ji wê pêştir tiştêkî din nikarin bikin. ⁵ Lê ezê wer'a bêjim, ku hûn ji k'ê bitirsin. Ji wî bitirsin, yê ku pey kuştinêr'a jî hikumê wî heye bavêje dojê. Belê, ez dibêjime we ji wî bitirsin! ⁶ Ê ne pênc ç'ivîk bi du diravan têne firotanê? Lê Xwedê ji wan yekî jî bîr nake. ⁷ Usa jî her t'êlekî serê we jimartî ye. Netirsin, hûn ji gelek ç'ivîkan qîmettir in.

Lûqa 12

ÎQRARÎ, ÎNK'ARÎ Û K'IFIRÎ
(Metta 10:32-33; 12:32; 10:19-20)

⁸ Ez wer'a dibêjim, k'î ku li ber merivan min îqrar ke, Kur'ê Meriv jî wê wî li ber milyak'etên Xwedê îqrar bike. ⁹ Û k'î ku min li ber merivan înk'ar ke, ewê jî li ber milyak'etên Xwedê bê înk'arkirinê. ¹⁰ Û k'î ku tiştêkî miqabilî Kur'ê Meriv bêje, wê wî bê baxşandinê. Lê k'î ku k'ifirîyan Ruhê Pîroz bike, li wî nayê baxşandinê. ¹¹ Û çaxê we bibine k'inîştan yan li ber hakim û mîrên hikumetê, hûn xem nekin, ku hûnê çawa caba xwe bidin yan çi bêjin. ¹² Çimkî Ruhê Pîrozê wê demê we hîn bike, ku çi lazim e hûn bêjin».

MESELA DEWLEMENDÊ BÊFEM

¹³ Û ji nav k'oma merivan yekî gote wî: «Dersdar, bêje birê min, bira warê bavê min t'evî min p'areveke». ¹⁴ Ewî jî gotê: «Heval, k'ê ez ser we hakim yan jî p'arker k'ifş kirime»? ¹⁵ Û gote wan: «Miqatî xwe bin û hevza xwe ji ç'evquliyê bikin, çimkî jîyîna mêriv hebûka wîva ne girêdayî ye». ¹⁶ Ewî meselek jî gote wan: «Zevîya merivekî dewlemend gelek ber da. ¹⁷ Ewî dilê xweda got: <Ez çawa bikim? Cî jî t'une ku deremeta xwe bikimê>. ¹⁸ Û got: <Ezê aha bikim, embarên xwe hilşînim û yên mezin çê kim, hemû deremet û hebûka xwe jî bikime wir. ¹⁹ Û ezê xwer'a bêjim: Evdo! Te bona xwe t'êra gelek salan, gelek hebûk t'op kirye, bike, bixwe, vexwe û şa be>. ²⁰ Lê Xwedê gotê: <Bêfemo! Îşev ruhê teyê ji te bê standinê. Ev hebûka ku te hazir kirye k'êr'a wê bimîne?> ²¹ Usa jî wê bê serê her kesî, yê ku bona xwe xeznê dide ser hev û bi Xwedê dewlemend nabe».

HÎNKIRINA LI SER XEMKIRINÊ
(Metta 6:25-34)

²² Û ewî gote şagirtên xwe: «Lema ez dibêjime we, bona jîyîna xwe xem nekin, ku hûnê çi bixwin, ne jî bona bedena xwe, ku hûnê çi li xwe kin. ²³ Çimkî jîyîn ji xwarinê zêdetir e û beden jî ji k'incan. ²⁴ Qar'qar'an binihêrin, ne diçînin, ne jî didirûn, ne kewarên wan hene, ne jî embar, lê Xwedê risqê wan digihîne. Hûn çiqasî ji teyredan qîmettir in. ²⁵ Îdî ji we k'î dikare bi xemxurîya xwe deqekê ser jîyîna xweda zêde ke? ²⁶ Heger hûn wî tiştê herî biç'ûk nikarin bikin, çima îdî bona tiştên mayîn xem dikin? ²⁷ Sosinan binihêrin, çawa şîn dibin, ne dixebitin û ne jî dirêsin. Ez wer'a dibêjim, ku Silêman jî nava hemû xezna xweye mezinda mîna ji wan yekê xwe nekir. ²⁸ Heger gîhayê çolê, ku îro heye, sibê davêjine nava êgir, Xwedê usa dixemilîne, lê çiqas zêde wê li we ke, kêmbawerno? ²⁹ Li van tiştan neger'in, ku hûnê çi bixwin yan çi vexwin. Ber xwe nek'evin. ³⁰ Çimkî miletên vê dinyayêye p'ûtp'arêz li pey wan her tiştan dik'evin, lê Bavê we dizane, ku hewcetîya we li wan tiştan heye. ³¹ Lê hûn li P'adşatîya Xwedê biger'in û ew tiştên hewce wer'a wê bêne dayînê.

XEZNA EZMANAN
(Metta 6:19-21)

³² Netirse, keriyê biç'ûk! Çimkî li Bavê we xaş hat, ku p'adşatîyê bide we. ³³ Hebûka xwe bifiroşin û xwer'a qencîyê bikin. Hûnê xwer'a k'îsikê ku narize û xezna ezmanîye ku kêman nabe qazinc kin. Li wê derê ne dizê nêzîk bê û ne jî bizûzê bixwe. ³⁴ Çimkî xezna we li k'u be, dilê weyê jî li wê derê be.

XULAMÊ HIŞYAR
(Metta 24:45-51)

³⁵ Bira piştta we girêdayî û ç'irên we vexistî bin. ³⁶ Hûn mîna wan merivan bin, yên hîvîya axayê xwe ne, ku ewê çiçax ji dewatê vegere, ku çaxê bê dêrî xe, pêr'a-pêr'a rabin dêrî lê vekin. ³⁷ Xwezî li wan xulamên, ku çaxê axayê wan bê, wan hişyar bibîne. Ez rast dibêjime we, ewê piştta xwe girêde, wan li sifrê bide rûniştandinê û wan'r'a berdestîyê bike. ³⁸ Û heger axayê wan nivê şevê yan berbanga sibehê bê û wan usa bibîne, ew xulam hê xwezî ne. ³⁹ Lê hûn vê yekê bizanibin, heger xweyê malê bizanibûya dizê k'îjan sihetê bihata, wê nehiştta mala wî derevekira. ⁴⁰ Awa hûn jî hazir bin, çimkî wê sihetêda Kur'ê Meriv wê bê, ku fikira wer'a derbaz nabe».

XULAMÊ AMIN Û XULAMÊ BÊAMIN

⁴¹ Petrûs got: «Xudan, ev mesele te t'enê bona me got yan bona hemûyan»? ⁴² Xudan got: «K'î ye ew wek'îlxercê amin û serwaxt, ku axayê wî ser xulamên xwe wî serok k'ifş bike, ku waxtda xwarinê bide wan. ⁴³ Xwezî li wî xulamî, ku çaxê axayê wî bê, wî usa bibîne. ⁴⁴ Ez rast dibêjime we, ewê wî dayne ser hemû hebûka xwe. ⁴⁵ Lê heger ew xulam dilê xweda bêje: <Axayê min hatina xwe derengî dêxe> û destpê ke xulam û carîyan xe, bixwe, vexwe û serxaş be, ⁴⁶ axayê wî xulamî wê rojêke usada bê, ku ew ne hîvîyê ye û siheteke usada, ku ew nizane. Wê wî qet-qetî ke û p'ara wî t'evî p'ara bêaminan ke. ⁴⁷ Û ew xulamê ku daxaza axayê xwe dizane û xwe hazir nake, ne jî li gora daxaza wî dike, wê gelekî bê lêdanê. ⁴⁸ Lê yê ji nezaniya xwe tiştêkî hêjayî lêdanê dike, wê hindikî bê lêdanê. K'êr'a gelek hatye dayînê, wê gelek jî jê bê xastinê û k'êr'a gelek hatye spartinê, cabdarîya wî jî wê gelek be.

NEFERÊN MALÊ WÊ JI HEV CUDE BIN
(Metta 10:34-36)

⁴⁹ Ez hatim, ku êgir bavêjime ser dinyayê û min çawa dixast îdî alav bida. ⁵⁰ Lê nixamtineke min heye, ku bi wê ez gerekê bême nixamtinê û

Lûqa 12,13

dilê min qet ne rihet e, heta ku ew bê sêrî. ⁵¹ We t'irê ez hatime dinyayêr'a haştîyê bikim? Ez wer'a dibêjim na, lê bona cudebûnê *hatime*. ⁵² Ji vir hada malekêda, ku pênc meriv hebin, wê ji hev cude bin, sisê wê miqabilî dudan bin, dudu miqabilî sisyan. ⁵³ Bavê rabe miqabilî kur', kur' jî bavê, dê qîzê, qîz jî dê, xwesî ji bûkê, bûk jî xwesîyê».

NÎŞANÊN ZEMÊN
(Metta 16:2-3; 5:25-26)

⁵⁴ Ê ewî k'oma merivanra jî got: «Çaxê ji roavayê e'wr dertê, hûn zû dibêjin: <Baranê bibare> û usa jî dibe. ⁵⁵ Ê çaxê bayê başûrê tê, hûn dibêjin: <Hewa wê germ be> û usa dibe. ⁵⁶ Durûno! Hûn rûyê ezmên vedinihêrin, ku hewayê çawa be, lê vî zemanî çawa venanihêrin?»

⁵⁷ Çima hûn xwexa nadine li ber hesaban, ku k'îjan e rast? ⁵⁸ Çaxê neyarê te, te k'aşî cem hakim dike, bike, ku rêva wîr'a li hev bêyî. Nebe ew te bide destê hakim û hakim jî te bide destê celat û ew jî te bavêje hebsê. ⁵⁹ Ez ter'a dibêjim, tu ji wir dernak'evî heta p'erê xweyî paşin nedî».

GUNEH MÊRIV UNDA DIKE Û MESELA DARA BÊ BER

13 ¹ Hingê hinek hatin Îsar'a bona wan celfîlyan gotin, xûna k'îjanan Pîlato t'evî xûna qurbanên wan kiribû. ² Îsa li wan vegeand got: «We t'irê ew celfîlyên ku ev hate serê wan, ji hemû celfîlyên din gunehk'artir bûn? ³ Ez wer'a dibêjim, na! Lê heger hûn ji gunehkirinê venegerin, hûn her kesê jî mîna wan unda bin. ⁴ Yan jî ew hîjdeh merivên ku kela Sîlwamê ser wanda hilşîya mirin, we t'irê ew ji hemû binelîyên Orşelîmê, gunehk'artir bûn? ⁵ Na! Ez wer'a dibêjim, heger hûn ji gunehkirinê venegerin, hûn her kesê jî mîna wan unda bin».

⁶ Ewî eva mesela jî got: «Nava baxê merivekîda dareke hêjîrê hebû. Rojekê ew hat, ku ser wê ber biger'e, lê nedît. ⁷ Hingê baxvanr'a got: <Eva sê sal e ez tîm, berê vê dara hêjîrê diger'im, lê nabînim. Vê bibir'e, çima badîhewa cî girtye?> ⁸ Baxvan lê vegeand got: <Axayê *min*, îsal jî li wê sebir ke. Ezê dora wê vedim û p'eyn bidimê. ⁹ Heger saleke din ber bide, qenc e, lê heger nede, paşê bibir'e».

ÎSA ROJA ŞEMÎYÊ K'ULFETA QONCIKÎ QENC DIKE

¹⁰ Rojêke şemîyê Îsa k'inîstekêda hîn dikir. ¹¹ Li wir k'ulfetêke qoncikî hebû, ku hîjdeh salên wê bû, ruhê nexaştîyê pêr'a bû. Ewê qet nikaribû xwe rast bikira. ¹² Gava Îsa ew dît, gazî wê kir got: «Evdê! Tu ji nexaştîya xwe aza yî!» ¹³ Ê destên xwe danîn ser wê, ew pêr'a-pêr'a rast bû û şikirî dida Xwedê. ¹⁴ Lê serk'arê k'inîstê hêrs k'et, ku Îsa roja şemîyê nexaş qenc kir û k'oma merivanra got: «Şeş roj bona k'arkirinê hene, hûn nava wan rojanda dikarin bînin qenc bin, ne ku roja şemîyê». ¹⁵ Xudan lê vegeand got: «Durûno! K'ê ji we roja şemîyê gayê xwe yan k'era xwe ji afir' venake û nabe ser avê? ¹⁶ Ê ne eva jî qîza Îbrahîm e, ku hîjdeh salên wê bû, Şeytan ew girêdabû. Gelo ne lazim bû ku ew roja şemîyê ji wê qeydê *girêdayî* vebûya?» ¹⁷ Ê gava ev yek got, hemûyên ku miqabilî wî bûn şermî man. Ê t'emamîya k'oma merivan bona wan k'iryametên rûmetî, ku wî dikirin şa dibû.

MESELÊN T'OXIMÊ XERDALÊ Û HEVÎRTIRŞKÊ
(Metta 13:31-33; Marqos 4:30-32)

¹⁸ Peyr'a Îsa got: «P'adşatîya Xwedê mîna çi ye? Ez wê mîna çi bikim? ¹⁹ Ew mîna hebeke t'oximê xerdalê ye, ku merivekî hilda bostanê xweda çand. Ê çaxê ew mezin bû, bû dar, teyredên ezmên hêlînên xwe ser çiqilên wê çê kirin».

²⁰ Ewî dîsa got: «Ez P'adşatîya Xwedê mîna çi bikim? ²¹ Ew mîna hevîrtirşk e, ku k'ulfetêke hilda nava sê kod arda stira, heta ku hemû hilat».

DERÊ TENG
(Metta 7:13-14, 21-23)

²² Îsa gund û bajarar'n'a derbaz dibû, hîn dikir û berbi Orşelîmê diçû. ²³ Yekî gote wî: «Xudan, gelo hindik in, ewên ku wê rizgar bin?» Îsa gote wan: ²⁴ «Bicedînin, ku derê tengra hûn bik'evine hindur, çimkî ez dibêjime we, gelekê bixazin bik'evine û wê nikaribin. ²⁵ Ê peyr'a, çaxê xweyê malê rabe derî dade, hingê hûnê derva bimînin û derî xin bêjin: <Em xulam, derî li me veke>. Ewê li we vegeandê bête: <Ez nizanim hûn ji k'u ne>. ²⁶ Hingê hûnê bêjin: <Me li ber hizûra te xwar, vexwar û te k'ûçên meda *em* hîn dikirin>. ²⁷ Lê ewê bête: <Ez wer'a dibêjim, nizanim hûn ji k'u ne. Ji min dîr k'evin, hûn hemûyên ku neheqîyê dikin>! ²⁸ Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka diranan, çaxê hûn Îbrahîm, Îshaq, Aqûb û hemû p'êxemberan P'adşatîya Xwedêda bibînin, lê xwe jî derva avîti. ²⁹ Ê ji rohilat-roavayê û bakur-başûrê wê bînin, P'adşatîya Xwedêda ser sifrê rûnên. ³⁰ Awa hinekên paş wê bibine pêş û hinekên pêş wê bibine paş».

ÎSA LI SER ORŞELÎMÊ DILOVÎNE
(Metta 23:37-39)

³¹ Wê demê çend fêrisî hatin û gotine wî: «Rabe ji vir her'e, çimkî Hêrodes dixaze te bikuje». ³² Ewî gote wan: «Her'in wî rûvîyîr'a bêjin, ku ez îro, sibê cinan derdixim, nexaşan qenc dikim û roja sisyan ezê bigihîjime meremê xwe. ³³ Lê îro, sibê, dusibe ez gerekê rîya xweda her'im, çimkî nabe ku p'êxemberek ji Orşelîmê der unda be. ³⁴ Ay Orşelîm! Orşelîm! Te p'êxember dikuştin û şandîyên cem xwe didane ber keviran. Çend caran min

xast lawên te usa bicivanda, çawa mirîşk cûcûkên xwe bin baskên xweda dicivîne, lê te nexast! ³⁵ Awa mala te wê xirabe bimîne. Ez dibêjime we, îdî hûnê min nebînin, heta ku hûn bêjin: <Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê>».*

ÎSA NEXAŞEKÎ AVZÊ QENC DIKE

14 ¹ Rojêke şemîyê bona nanxwarinê Îsa çû mala serk'arekî fêrisîyan. Wana ç'evê xwe ji ser wî dûr nedixist. ² Û pêşberî wî merivekî bi nexaşîya avzê hebû. ³ Îsa ji qanûnzana û fêrisîyan pirsî got: «Roja şemîyê qenckirin cayîz e yan na?» ⁴ Wana dengê xwe nekir. Hingê ewî nexaş girt, qenc kir û verêkir. ⁵ Paşê wî gote wan: «K'er yan gayê k'îjanî ji we, heger bik'eve bîrê, roja şemîyê pê'r'a-pê'r'a wê dest nevejê dernexe?» ⁶ Wan nikaribû caba vê pîrsa wî bidana.

YÊ BILIND WÊ NIMIZ BE, YÊ NIMIZ WÊ BILIND BE

⁷ Û Îsa meselek gote wan merivên t'eglîfbûyî, gava dît, ku çawa ewana xwe serê jorin digirtin: ⁸ «Çaxê yek gazî te dewatê dike, tu serê jorin rûnenî, nebe ku yekî ji te hurmettir jî alîyê wîda t'eglîfkirî be ⁹ û xweyê dewatê bê bêje te: <Ji k'erema xwe cî bide filan kesê>. Hingê tuê ji şerma xwe rabî serê jêrin rûneyî. ¹⁰ Lê çaxê te t'eglîf dikin, her'e serê jêrin rûnê, ku çaxê xweyê dewatê bê ter'a bêje: <K'ere m ke, derbazî jorê be>! Hingê hurmeta te wê li ber ç'evên hemû rûniştîyan bilind be. ¹¹ Çimkî k'î xwe bilind bigire, wê nimiz be û k'î xwe nimiz bigire, wê bilind be».

¹² Û Îsa t'eglîfdarê xwer'a got: «Çaxê tu firavîne yan şîvê datîni, gazî heval-hogir, bira-pismam yan jî cîranên xweyê dewlemend neke, nebe ew jî te t'eglîf kin û qencîya te li te vegeîrin. ¹³ Lê çaxê tu xwarinekê datîni, gazî feqîr, seqet, kulek û koran ke. ¹⁴ Hingê tuê xwezî bî, çimkî ewana nikarin qencîya te li te vegeîrin, lê Roja Zêndîbûna yên rast, ku ji mirinê rabin, wê li te bê vegeîrandinê».

MESELA ŞAYÎYA GIRAN

(Metta 22:1-10)

¹⁵ Gava ji yên hizûr yekî ev bihîst, gote wî: «Xwezî li wî, yê P'adşatîya Xwedêda wê nan bixwe». ¹⁶ Lê Îsa gotê: «Merivekî şayîke giran hazir kir û gelek meriv t'eglîf kirin. ¹⁷ Çaxê dema şayîyê pê'r'a gihîşt, ewî xulamê xwe şand, ku hemû t'eglîfbûyan'a bêje: <Her tişt îdî hazir e, k'erem kin werin>. ¹⁸ Lê her yekî manîk girt. Yê pêşin wîr'a got: <Min xwer'a erd k'ir'îye, ez ese gerekê her'im binihêrim. Ez hîvî ji te dikim, bibaxşîne min>. ¹⁹ Û yê din got: <Min pênc cot ga k'ir'îne diçim ku wan bicêribînim. Ez hîvî ji te dikim, bibaxşîne min>. ²⁰ Yê sisyan jî got: <Ez zewicî me, lema nikarim bê>. ²¹ Û ew xulam vegerya hat, ev her tişt axayê xwer'a gotin. Hingê axa hêrs k'et gote xulamê xwe: <Zû her'e meydan û k'ûçên bajêr, feqîran, qopan, seqetan û koran t'op ke bîne vir>. ²² Peyr'a xulê got: <Axayê min, te çawa ferman da, min usa jî kir, lê dîsa cî heye>. ²³ Û axa gote xulê: <Derk'eve ser rê û dirban, zorê li her kesî bike bîne vir, ku mala min t'ije be. ²⁴ Awa ez dibêjime we, ku ji wan merivên t'eglîfkirî t'u kes ji şayîya min wê tiştêkî te'm neke»>».

ÇAWA BIBINE ŞAGIRTÊ ÎSA

(Metta 10:37-38)

²⁵ Pey vê yekêr'a k'omeke merivane giran Îsar'a diçû û ew ser wanda vegerya got: ²⁶ «Heger yek pey min bê û min ji dê û bavê xwe, ji jin û lawên xwe, ji xûşk û birayên xwe û usa jî ji xwe zêdetir hiz neke, nikare bibe şagirtê min. ²⁷ Û k'î ku xaçê xwe hilnede pey min neyê, ew nikare bibe şagirtê min. ²⁸ Ji we k'î ye, ku bixaze bilindcîkê çê ke, pêşiyê rûnenî hesabê xwe neke, ku gelo qewata wîyê bigihîjê bîne sêrî yan na? ²⁹ Nebe ku rîkinê wê dayne û nikaribe bîne sêrî û yên bibînin lê bik'enin ³⁰ û bêjin: <Evî merivî destpê kir çê ke û nikaribû banîya sêrî>. ³¹ Yan jî k'îjan p'adşa p'adşakî dinr'a bik'eve nava şer', wê pêşiyê neşewre, ku gelo wê bikaribe bi dehe hezaran ber bîst hezarên ku têne ser wî, şer' bike? ³² Heger ew pê nikaribe, çaxê hê dûr e wê qasidê xwe bişîne, bona li hevhatinê hîvî jê bike. ³³ Awa ji we her k'ê ku destê xwe ji her çî wî heye nek'işîne, nikare bibe şagirtê min.

XWÊYA BÊTE'M

(Metta 5:13; Marqos 9:50)

³⁴ Xwê tiştêkî baş e. Lê heger ew te'ma xwe unda bike, paşê wê bi çî te'mê bistîne? ³⁵ Ne dewsa xwêlyê wê bigire û ne jî dewsa p'eyn. Wê wêda bavêjin. Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê».

PEZA UNDABÛYÎ

(Metta 18:12-14)

15 ¹ Awa hemû xercgir û gunehk'ar nêzîkî wî dibûn, ku guh bidana gotinên wî. ² Lê fêrisî û qanûnzanan bîna xwe teng dikir û digotin: «Eva gunehk'aran qebûl dike û wanr'a nan dixwe». ³ Û Îsa wanr'a eva mesela got: ⁴ «Ji we k'î ye ew merivê ku sed pezên wî hebin û çaxê yekî ji wan unda ke, nod nehan çol û bestan nehêle û pey ya undabûyî biger'e, heta ku wê bibîne? ⁵ Û çaxê bibîne, wê ji şabûna dayne ser milê xwe, ⁶ vegere malê, gazî der û

* 13:35 Zebûr 118:26.

cîranan ke û wanr'a bêje: <T'evî min şa bin! Min peza xweye undabûyî dît>. ⁷ Ez wer'a dibêjim, usa jî li ezmên bona gunehk'arekî ku t'obe dike, wê hê şabûneke mezin bibe, ne ku bona nod nehên rast, k'îjananr'a t'obekirin ne hewce ye.

ZÎVÊ UNDABÛYÎ

⁸ Yan k'îjan k'ulfeta e, ku dehe zîvên wê hebin û çaxê yekî ji wan unda bike, wê ç'irê vênexe, malê gêzî neke û qenc lê nager'e, heta ku zîvê xwe bibîne? ⁹ Û çaxê ew bibîne, wê gazî der û cîranan ke û wanr'a bêje: <T'evî min şa bin! Min zîvê xweyî undakirî dît>. ¹⁰ Ez wer'a dibêjim, usa jî milyak'etên Xwedê bona gunehk'arekî ku t'obe dike şa dibin».

KUR'Ê JI RÊ K'ETÎ Û BIRÊ WÎ

¹¹ Îsa got: «Du kur'ên merivekî hebûn. ¹² Yê biç'ûk gote bavê: <Bavo, ji hebûka xwe çî p'ara min dik'eve, bide min>. Û ewî hebûk wanr'a p'arevekir. ¹³ Pey çend rojanr'a kur'ê biç'ûk her tiştên xwe t'op kir çû welatekî dûr. Li wir ewî jîyîna rêke xirab derbaz kir û hemû hebûka xwe p'ûç kir. ¹⁴ Û çaxê t'u tişt dêstda nema, wî welatîda jî bû xelayîke giran û ew k'ete halekî giran. ¹⁵ Çû cem bajarvanekî wî welatî ma û ewî ew şande k'ewşên ber berazan. ¹⁶ Ew hewce bû, ku zikê xwe bi wan xirmûfên ku berazan dixwar t'êr bikira, lê t'u kesî ew jî nedidayê. ¹⁷ Lê çaxê ew ser hişê xweda hat, got: <Çiqas k'arkerên t'êre-t'îjî mala bavê mînda hene, lê ez vir jî birçîna dimirim. ¹⁸ Ez rabim her'ime cem bavê xwe û bêjime wî: Bavo, min hindava teda û ezmênda guneh kir. ¹⁹ Ez îdî ne hêjayî kur'tîya te me. T'enê mîna k'arkerêkî xweyî k'irêkirî min hilde>. ²⁰ Û rabû hate cem bavê xwe. Lê gava hê jî dûrva bavê ew dît, dilê wî lê şewtî, berbi wî bezî, ew hemêz kir û ramûsa. ²¹ Kur' gotê: <Bavo, min hindava teda û ezmênda guneh kir. Ez îdî ne hêja me, ku lawê te jî bême hesabê>. ²² Lê bavê wî gote xulamên xwe: <Zû bikin, çuxê herî rind bînin lê kin, gustîlkê bikine t'ilîyê û solan jî bikine nigan. ²³ Canegeyê dermalîkirî bînin serjêkin, em bixwin û şa bin. ²⁴ Çimkî ev kur'ê min mirî bû, *nîha* zêndî ye, undabûyî bû, hate dîtîne>. Û dest bi şayîyê kirin. ²⁵ Hingê kur'ê wîyî mezin li k'ewşên bû. Gava hat nêzikî malê bû, dengê stiran û reqasê bihîst. ²⁶ Ewî gazî ji xulaman yekî kir û jê pirsî: <Ev çî hewal e?> ²⁷ Xulêm gote wî: <Birê te hatye, bavê te canegeyê dermalîkirî serjêkirye, çimkî ew zêndî û silamet vegeryaye>. ²⁸ Birê wî hêrs k'et û nexast her'e hindur. Bav derk'ete derva, lava jî wî kir. ²⁹ Ewî li bavê xwe vegeand got: <Eva çiqas salên min in ez ter'a xulamtiyê dikim û ji gotina te dernek'etime, lê te karek jî nedaye min ku min t'evî heval-hogirên xwe k'êf bikira. ³⁰ Lê gava ew kur'ê teyî ku hebûka te bir, t'evî qavan p'ûç kir hat, te bona wî canegeyê dermalîkirî serjêkir>. ³¹ Bavê gotê: <Lawo, tu her t'im t'evî min î û hemû hebûka min ya te ye. ³² Gerekê em şa bin û bik'enin, çimkî ev birê te mirî bû, *nîha* zêndî ye û undabûyî bû, hate dîtîne>».

WEK'ÎLXERCÊ BÊAMIN, LÊ SERWAXT

16 ¹ Îsa gote şagirtên xwe: «Merivekî dewlemend hebû, wek'îlxercêkî wî hebû. Rojekê gilî gihîşte ber guhê wî, ku wek'îlxercê wî hebûka wî p'ûç dike. ² Wî jî gazî wî kir got: <Ev ez bona te çî dibihêm? Hesabê wek'îlxercîya xwe bide, çimkî îdî tu nikarî wek'îlê xerc bî>. ³ Wî wek'îlxercî dilê xweda got: <Ez çî bikim? Axayê min jî wek'îlxercîyê min derdixe, cotk'arî jî destê min nayê, ji p'arskirinê jî şerm dikim. ⁴ Ez dizanim niha çî bikim, ku çaxê ez jî wek'îlxercîyê derk'evim, *meriv* malên xweda min hildin>. ⁵ Ewî yeko-yeko gazî deyndarên axayê xwe kirin û yê pêşîn'r'a got: <Tu çiqasî deyndarê axayê min î?> ⁶ Wî got: <Sed k'ûp* bizirê zeytûnê>, gote wî: <Han nivîsara xwe hilde û zû rûnê binivîse pêncî>. ⁷ Paşê yê dinr'a got: <Tu çiqasî deyndar î?> Ewî jî got: <Sed ç'el† genim>, gote wî: <Han nivîsara xwe hilde û binivîse heştê>. ⁸ Û axa pesinê wek'îlxercê bêamin da, ku ewî bi aqilî kir, çimkî merivên vê dinyayê hindava xweda jî merivên ronayê serwaxttir in. ⁹ Ez wer'a dibêjim, hûn bi hebûka nerast hevalan xwer'a dest bînin û çaxê hebûk kêmbê, ewana wê we li tamê heta-ha-têda hildin. ¹⁰ Ewê ku nava *hebûka* hindikda amin e, nava *ya* gelekda jî amin e, lê ewê ku nava *hebûka* hindikda bêamin e, nava *ya* gelekda jî bêamin e. ¹¹ Heger hûn nava vê hebûka nerastda bêamin bûn, k'ê wê hebûka rast bide we? ¹² Heger hûn nav *hebûka* xelqêda ne amin bin, ya we k'ê wê bide we? ¹³ Xulamek nikare du axanr'a xulamtiyê bike, çimkî yan wê hîlê wî jî yekî her'e û yê din hiz bike yan jî wê hurmeta yekî bigire û yê din bêhurmet ke. Hûn nikarin him Xwedê'r'a, him jî hebûkê'r'a xulamtiyê bikin».

QANÛN Û P'ADŞATÎYA XWEDÊ
(Metta 11:12-13; 5:31-32; Marqos 10:11-12)

¹⁴ Fêrisîyan, ku p'erehiz bûn, gava ev her tişt bihîstin, qerfê xwe Îsa dikirin. ¹⁵ Îsa gote wan: «Hûn xwe ber merivan şofî dikin, lê Xwedê dilê we dizane, çimkî ew tiştên nav merivanda xweyêhurmet e, ew li ber Xwedê heram e. ¹⁶ Zemanê Qanûn û p'êxemberan heta Yûhenna bû, peyr'a P'adşatîya Xwedê tê dannasînkirinê û her kes divedîne, ku bi qewatê bik'eve wir. ¹⁷ Lê erd û ezman wê hê rihet derbaz bin, ne ku ji Qanûnê niqitkek unda be. ¹⁸ K'î jina xwe ber'de û yeke din bistîne, zinêk'arîyê dike. Û k'î ya mërber'dayî distîne, ew jî zinêk'arîyê dike.

* 16:6 K'ûpekî cihûyan qasî 35 litir av hildida.

† 16:7 Ç'eleke cihûyan qasî hewzekî 390 litirî bû.

¹⁹ Merivekî dewlemend hebû, ku k'incên şîrk û k'itanê xas li xwe dikir û her roj şa dibû û k'êf dikir. ²⁰ Merivekî feqîr jî hebû, navê wî Lazar. Ew nava p'izikên p'îsda ber derê yê dewlemend k'etî bû. ²¹ Û ç'evê wî ser bermayîyê sifra yê dewlemendda dima, ku dixast birçîbûna xwe pê bişkênanda. Se jî dihatin, birînên wî dalastin. ²² Roja yê feqîr hat, ew mir, milyak'etan ew bire cem Îbrahîm. Yê dewlemend jî mir, kirine gor'ê. ²³ Çaxê ew li cenimê cizaretêda bû, serê xwe bilind kir, jî dûrva Îbrahîm dît, Lazar jî hemêzêda. ²⁴ Wî deng dayê û got: <Bavê Îbrahîm, min were rehmê. Lazar bişîne, ku serê t'ilîya xwe avêda ke bîne dev-lêvê min şil ke, çimkî k'ûra vî agirîda ez dişewtim>. ²⁵ Lê Îbrahîm got: <Lawo! Bîr bîne, ku te qencîyên p'ara xwe li dema jîyîna xweda standine, lê Lazar zelûlî dîtye. Niha jî ew li vir berdilîyê distîne, lê tu nava cizaretêda yî. ²⁶ Û pêştirî vê yekê jî nava me û weda gelîkî bêbin bûye navbir'î, ku yên vir, heger bixazin jî, nikarin derbazî cem we bin û ne jî yên wir dikarin derbazî cem me bin>. ²⁷ Hingê ewî got: <Bavo, ku usa ye, hîvî ji te dikim, tu wî bişîne mala bavê min, ²⁸ çimkî pênc birayên min jî hene, bira her'e şehdetîya vir bide wan, ku ew jî neyêne vê dera cizaretê>. ²⁹ Lê Îbrahîm got: <Mûsa û p'êxemberên wan hene. Bira guhdarîya wan bikin>. ³⁰ Ewî jî got: <Na, bavê Îbrahîm, heger ji nava mirîyan yek her'e cem wan, wê ji gunehkirinê vegezin>. ³¹ Hingê Îbrahîm gote wî: <Ewana ku guhdarîya Mûsa û p'êxemberan nakin, wê ne jî bawer bikin, heger yek ji nava mirîyan zêndî be jî>».

GUNEHKIRIN, BAXŞANDIN, BAWERÎ Û BORCDARÎ

17 ¹ Îsa gote şagirtên xwe: «Nabe ku bayîsê ji rê k'etinê t'unebe, lê wey li wî, yê bibe bayîsê vê yekê. ² Wîr'a hê qenc e, ku beraşek stûyê wîva bê girêdanê û avîtinê nava be'rê, ne ku ew ji evên biç'ûk yekî ji rê derxe. ³ Mîqatî xwe bin! Heger birê te guneh bike, wî hilê, heger ser kirina xwe p'oşman be, bibaxşîne wî. ⁴ Heger nava rojêda heft caran neheqîyê li te bike û vegere bêje te: <Ez t'obe dikim>, tu bibaxşîne wî».

⁵ Şandîyan gote Xudan: «Bawerîya me zêde ke». ⁶ Xudan got: «Heger bawerîya we weke hebeke t'oximê xerdalê hebe û vê dara t'ûtêr'a bêjin: <Ji vir rabe û be'rêda daçike>, ewê gur'a we bike.

⁷ Ji we k'îjan e, ewê ku xulamekî wîyî cotk'ar yan şivan hebe, çaxê ew ji k'ewşên bê, wîr'a bêje: <K'erem ke bilezîne ser sifrê>? ⁸ Gelo wê nebêje wî: <Şîva min hazir bike, pišta xwe girêdayî minr'a berdestîyê bike. Ez bixwim û vexwim û paşê jî tu bixwe û vexwe>? ⁹ Û gelo bona ew tiştên ku xulêmr'a hatine fermankirinê û wî kirine, axayê wî wê jêr'a bêje: <Zef razî me>? ¹⁰ Usa jî hûn, çaxê ew her tiştên ku wer'a hatine fermankirinê bikin, bêjin: <Em xulamên bêtêr in. Çi ku li me dik'et, me ew kir>».

QENCKIRINA DEHE K'OTÎYAN

¹¹ Gava Îsa berbi Orşelîmê diçû, nava Sameryayê û Celîlêr'a derbaz dibû. ¹² Gava ew dik'ete gundekî, deh merivên k'otî rastî wî hatin, dûr sekinîn ¹³ û bi dengêkî bilind gotinê: «Îsayê mamoste, li me were rehmê». ¹⁴ Gava Îsa ew dît, gote wan: «Her'in xwe nişanî k'ahînan kin». Û gava ew hê diçûn, paqij bûn. ¹⁵ Lê gava ji wan yekî dît ku ew paqij bûye, paşda vegerya, bi dengêkî bilind şikirî dida Xwedê. ¹⁶ Ewî deverûya xwe avîte ber nigên Îsa û razîbûn dida wî. Ew samerî bû. ¹⁷ Hingê Îsa got: «Ê ne her dehe jî paqij bûn, lê ew nehên din k'anê ne? ¹⁸ Çima pêştirî evî xerîb kesekî ji wan venegerya, ku bihata şikirî bida Xwedê? ¹⁹ Û gote wî: «Rabe her'e. Bawerîya te tu qenc kirî».

HATINA P'ADŞATÎYA XWEDÊ

(Metta 24:23-28, 37-41)

²⁰ Gava fêrisîyan ji Îsa pirsî, ku P'adşatîya Xwedê wê çiçax bê, ewî li wan vegeand got: «P'adşatîya Xwedê aşkere nayê. ²¹ Ne jî wê bêjin: <Va ye, vir e>! yan jî: <Wa ye, dera han e>! Çimkî P'adşatîya Xwedê nava weda ye». ²² Û şagirtên xwer'a got: «Roj wê bîn, ku hûnê hizreta rojeke Kur'ê Meriv bin, lê nabînin. ²³ Û heger bêjine we: <Va ye, vir e>! yan: <Dera han e>! pey nek'evin neçin. ²⁴ Çimkî çawa birûsk ji alîkî ezmên birq dide û t'emamîya ezmên ronahî dike, roja Kur'ê Meriv jî wê usa be. ²⁵ Lê pêşîyê ew gerekê gelekî biçerçire û ji vî mîletî wêda bê avîtinê. ²⁶ Çawa rojên Nuhda dibûn, usa jî wê rojên Kur'ê Merivda bibin. ²⁷ Hingê dixwarin, vedixwarin, dizewicîn, mêr dikirin, heta wê roja ku Nuh k'ete gemîyê, lêyî rabû qir'a hemûyan anî. ²⁸ Usa jî çawa rojên Lûtta bûn, dixwarin, vedixwarin, dik'ir'în, difirotin, direşandin û çê dikirin, ²⁹ lê wê roja ku Lût ji Sodomê derk'et, agir û k'irk'ût ji ezmên barî, qir'a hemûyan anî. ³⁰ Wê rojê jî wê usa be, çaxê Kur'ê Meriv k'ifş be.

³¹ Wê rojê k'î ser xênî ye û hebûka wî jî malda, bira jorda neyê, ku tiştêkî hilde û ewê li k'ewşên e, bira paşda venegere. ³² Jina Lût bînine bîra xwe. ³³ K'î ku dixaze jîyîna xwe rizgar bike, wê unda bike, lê k'î ku jîyîna xwe unda bike, wê rizgar bike. ³⁴ Ez wer'a dibêjim, wê şevê heger du meriv nivînekêda bin, yekê bê hildanê, yê din hiştinê. ³⁵ Û heger du k'ulfet li ser destar'ekî bin, yekê bê hildanê û ya din bê hiştinê. ³⁶ Û heger du meriv li k'ewşên bin, yekê bê hildanê û yê din hiştinê». ³⁷ Wan lê vegeand got: «Xudan, evê li k'u bibe»? Ewî gote wan: «Li k'u cendekên mirî hebin, teyr jî wê li wir t'op bin».

MESELA JINEBÎYÊ Û HAKIM

18 ¹ Îsa şagirtanr'a meselek jî bona wê yekê got, ku her t'im dua bikin û aciz nebin, ² got: «Bajarekîda hakimek hebû, ew ji Xwedê ne ditirsya û ne jî ji merivan şerm dikir. ³ Wî bajarîda jinebîk jî hebû, ew her t'im dihate cem

wî û digot: <Heqîyê bike, min ji destê neyarê min rizgar ke>. ⁴ Hakim gelek waxt guh nedida wê, lê paşê wî xwexa xwer'a got: <Ez ji Xwedê natirsim û ji merivan jî şerm nakim, ⁵ lê bona xatirê wê yekê, ku eva jinebîya tê zehmetê dide min, ezê jêr'a heqîyê bikim, ku îdî t'imê neyê min aciz neke>». ⁶ Û Xudan got: «Bibihên ku hakimê nerast çi got. ⁷ Gelo Xwedê jî hilibijartîyên xwer'a wê heqîyê neke, yên ku şev û roj hewara xwe wî datînin? yan ewê caba wan derengê bêxe? ⁸ Ez wer'a dibêjim, wê pêr'a-pêr'a heqîyê bike. Lê çaxê Kur'ê Meriv bê, gelo wê li ser dinyayê bawerîyê bibîne?»

MESELA FÊRISÎ Û XERCGIR

⁹ Ev mesele jî bona wan got, yên ku li xweda guman bûn, yançiyê ewe rast in û hemûyên mayîn ber tiştêkî hesab nedikirin. ¹⁰ «Du meriv rabûne p'aristxanê, ku dua bikin. Yek fêrisî bû, yek jî xercgir. ¹¹ Yê fêrisî t'enê sekinî bû û ber xweda aha dua dikir: <Xwedêyê min, şikirdar im, ku ez ne mîna wan merivan im, ku t'alan dikan, neheqîyê û zinêk'arîyê dikan û ne jî mîna vî xercgirî me. ¹² Lê heftîyê du caran rojî digirim û ji hemû qazınca xwe jî dehekê didim>. ¹³ Lê ewî xercgir dîr sekinî bû, rûyê wî nedigirt li ezmên jî binihêrya, sîngê xwe dixist û digot: <Xwedê, li min gunehk'arî were rehmê>. ¹⁴ Ez wer'a dibêjim, ku eva rasthesabbûyî çû mala xwe, ne ku yê fêrisî, çimkî k'î xwe bilind bigire, wê bê nimizkirinê, lê k'î xwe nimiz bigire, wê bê bilindkirinê».

ÎSA DUA-DIROZGE ZAR'OKAN DIKE
(Metta 19:13-15; Marqos 10:13-16)

¹⁵ T'ifal jî anîne cem Îsa, ku destê xwe dayne ser wan. Gava şagirtan ev dît, li yên danîn hilatin. ¹⁶ Lê Îsa gazî zar'okan kir û got: «Bira ew zar'ok bêne cem min, pêşîya wan negirin, çimkî P'adşatîya Xwedê p'ara yên aha ye. ¹⁷ Ez rast dibêjime we, k'î P'adşatîya Xwedê mîna zar'okê qebûl neke, ew t'u car nak'eve nava wê».

YEKÎ MÎR JÎYÎNA HETA-HA-TÊ DIGER'E
(Metta 19:16-30; Marqos 10:17-31)

¹⁸ Yekî mîr ji wî pirsî û got: «Dersdarê qenc, ez çi bikim, ku jîyîna heta-ha-tê war bim?» ¹⁹ Îsa gote wî: «Çima tu minr'a dibêjî qenc? Qenc, t'enê Xwedê ye, pêştirî wî yekî din nîne. ²⁰ Tu t'emîyan dizanî: <Zinêk'arîyê neke, nekuje, nedize, şehdetîya derew nede, dê û bavê xwer'a hurmetê bike>». ²¹ Ewî jî got: «Ev hemû jî min ji xortîya xweda xwey kirine». ²² Gava Îsa ev yek bihîst, gote wî: «Tiştêkî te hê kême e, her tiştên xwe bifiroşe, belayî feqîran ke, hingê xezna te wê li ezmanan hebe. Û pey min were». ²³ Gava ewî ev yek bihîst, beşera wî xirab bû, çimkî gelekî dewlemend bû. ²⁴ Îsa dît ku beşera wî nexaş e, got: «Çiqasî zehmet e bona yên xweyhebûk, ku bik'evine P'adşatîya Xwedê. ²⁵ Deve wê qula derzîyêr'a hê rihet derbaz be, ne ku dewlemend bik'eve P'adşatîya Xwedê». ²⁶ Ewên ku dibihîstin, gotin: «Îdî k'î dikare rizgar be?» ²⁷ Îsa got: «Ew tiştê ku ji destê mêriv nayê, Xwedê dikare bike». ²⁸ Petrûs got: «Awa me her tiştên xwe hiştine û pey te hatine». ²⁹ Ewî gote wan: «Ez rast dibêjime we, her k'ê ku bona P'adşatîya Xwedê mal yan jin û law yan xûşk û bira yan dê û bav hiştibe, ³⁰ wê vê dinyayêda hê zêde bistîne û dinya dinda jî jîyîna heta-ha-tê».

ÎSA CARA SISYAN BONA MIRINA XWE DIBÊJE
(Metta 20:17-19; Marqos 10:32-34)

³¹ Ewî her donzdeh dane alîkî û gote wan: «Em va hevraz diçine Orşelîmê û her tiştên ku bi destê p'êxemberan bona Kur'ê Meriv hatine nivîsarê wê bêne sêrî. ³² Ewê bik'eve destê hêtanosan, wê qerfê xwe wî bikin, bêhurmet kin, t'ûkinê, ³³ bidine ber qamçîyan û bikujin. Lê roja sisyan wê ji mirinê zêndî be». ³⁴ Şagirtan jî van xeberan t'u tişt fem nekirin. Ev yek ji wan veşartî bû û ev gotin ne dik'ete hişê wan.

ÎSA Ç'EVÊ P'ARSEKEKÎ KOR LI BAJARÊ ERÎHAYÊDA VEDIKE
(Metta 20:29-34; Marqos 10:46-52)

³⁵ Gava ew nêzîkî Erîhayê bû, yekî kor li ser rê rûniştî p'ars dikir. ³⁶ Û gava bihîst ku k'oma merivan ber wîr'a derbaz dibe pirsî: «Ev çi hewal e?» ³⁷ Wîr'a gotin: «Îsayê Nisretê derbaz dibe». ³⁸ Hingê wî kire qîr'în û got: «Îsa, Kur'ê Dawid, min were rehmê!» ³⁹ Û yê ku pêşîyê diçûn, li wî hilatin, ku dengê xwe bibir'e, lê ewî hê dikire qîr'în: «Kur'ê Dawid, min were rehmê!» ⁴⁰ Îsa cîda sekinî û ferman da, ku wî bînine cem. Û gava yê kor nêzîkî wî bû, ewî jê pirsî û got: ⁴¹ «Tu çi ji min dixazî ku ez bona te bikim?» Ewî got: «Xudan, dixazim ç'evên min bibînin». ⁴² Îsa gote wî: «Bira bibînin, bawerîya te tu qenc kir!» ⁴³ Û pêr'a-pêr'a ç'evên wî dîtin, da pey Îsa çû û şikirî dida Xwedê. T'emamîya wê cimetê, ku ev yek dît, pesinê Xwedê didan.

ÎSA Û ZEXAYO

19 ¹ Îsa Erîhayêr'a derbaz dibû. ² Merivekî dewlemend hebû, serk'arê xercgiran, navê wî Zexayo. ³ Wî dixast Îsa bidîta, k'a ew k'î ye, lê ji dest k'oma merivan nikaribû bidîta, çimkî bejinêda kin bû. ⁴ Ew pêşda bezî, rabû ser dareke hêjîrêye stîrî, ku Îsa bibîne, çimkî hema li wirra Îsayê derbaz bûya. ⁵ Û gava Îsa hate wir û li jor nihêrî, gotê: «Zexayo! Zû bike ji wir were xwarê, çimkî îro ez gerekê mêvanê te bim». ⁶ Zexayo lezelez jorda hate xwarê

* 18:20 Qanûna Ducarî 5:16-20.

Lûqa 19,20

û bi *dilê* şa ew qebûl kir. ⁷ Hemûyên ku ev yek dîtîn, bîna xwe teng dikirin û digotin: «Ew bû mêvanê merivekî gunehk'ar». ⁸ Lê Zexayo pêş hemûyanva sekinî û gote Xudan: «Xudan, va ye ez nivê hebûka xwe didime feqîran û min ji k'ê bi neheqî çî jî standibe, ezê çar bare lê vegehinim». ⁹ Îsa gote wî: «Îro ev mal rizgar bû, çimkî eva jî lawê Îbrahîm e. ¹⁰ Bona vê yekê Kur'ê Meriv hat, ku yên undabûyî biger'e û rizgar bike».

MESELA DEHE ZÊR'AN
(Metta 25:14-30)

¹¹ Û wana hê ev tişt dibihîstin, Îsa meselek jî anî ser nêzîkbûna xweye li Orşelîmê û wê fikira wan, ku wan t'irê P'adşatîya Xwedê wê zûtîrekê k'ifş be. ¹² Ewî got: «Merivekî esilzade çû welatekî dûr, ku p'adşatîya xwe bistîne û vegere. ¹³ Gazî dehe xulamên xwe kir, dehe zêr' dane wan û got: «Hanên pê k'ar bikin, heta ez vegehim». ¹⁴ Lê bajarvanan k'îna wî girtibû, li pey wîr'a qasid şandine cem û gotin: «Em naxazin ew li ser me p'adşatîyê bike». ¹⁵ Û çaxê ewî p'adşatîya xwe stand vegerya, gazî wan xulaman kir, yên ku ewî p'ere dabûne wan, ku bizanibe, k'a *jî wan* her yekî çiqas qazinc kirye. ¹⁶ Yê pêşîn hat û got: «Ez xulam, zêr'ekî te dehe zêr' qazinc kirin». ¹⁷ Axayê wî gotê: «Eferim, xulamê baş! Tu nava wî tiştê hindikda amin mayî, serwêrîyê ser dehe bajarvan bike». ¹⁸ Yê dudan jî hat û got: «Ez xulam, zêr'ekî te pênc zêr' qazinc kirin». ¹⁹ Axayê wî gote wî: «Tu jî ser pênc bajarvan be». ²⁰ Paşê yekî din hat û got: «Ez xulam, va ye zêr'ê te, min destmalêda p'êçayî hildabû. ²¹ Çimkî ji te ditirsyam, min dizanibû tu merivekî sert î, çî te nedanîye wê hildidî û çî te neçandye wê didirûyî». ²² Û wî gotê: «Ezê hema bi devê te dîwana te bikim, xulamê xirab! Heger te dizanibû ku ez merivekî sert im, çî min nedanîye hildidim û çî neçandye didirûm, ²³ çima te p'erê min neda serafan, ku ez bihatama min ew bi qazincêva bista?» ²⁴ Û gote hizûran: «Wî zêr'î ji wî bistînin û bidine ewê ku deh zêr'ên wî hene». ²⁵ Gotine wî: «Xudan, *îdf* deh zêr'ên wî hene». ²⁶ Ewî got: «Ez dibêjime we, yê k'ê ku heye, wîr'a wê bê dayîne, lê yê k'ê ku t'une, çî jî heye, *ew jî* wê jê bê standîne. ²⁷ Lê belê, wan dijminên min jî, yên ku nedixastin ez p'adşatîyê li ser wan bikim, bînine vir, ber ç'evê min wan bikujin».

ÎSA BI RÛMET DIÇE ORŞELÎMÊ
(Metta 21:1-11; Marqos 11:1-11; Yûhenna 12:12-19)

²⁸ Îsa pey vê xebirdanêr'a pêşda çû, ku hevraz rabe Orşelîmê. ²⁹ Gava nêzîkî gundên Beytfacê û Beytanyayê bû, wê dera ku jêr'a digotin ç'iyayê Zeytûnê, hingê du şagirtên xwe şand ³⁰ û got: «Her'ine wî gundê pêşberî xwe, gava bik'evînê, hûnê çeşikeke girêdayî bibînin ku hê t'u kes lê sîyar nebûye, wê vekin û bînin. ³¹ Heger yek ji we bipirse: «Hûn çima wê vedikin»? bêjinê, Xudanr'a lazim e». ³² Ewên şandî çûn, çawa wanr'a hatibû gotinê, usa jî dîtîn. ³³ Û wana hê çeşik vedikir, xweyên wê gotine wan: «Hûn çima wê çeşikê vedikin»? ³⁴ Şagirtan got: «Xudanr'a lazim e». ³⁵ Û ew anîne cem Îsa, k'incên xwe avîtime ser wê û Îsa lê sîyar kirin. ³⁶ Gava diçû, cimetê k'incên xwe ser rê radixistin. ³⁷ Û gava ew nêzîkî p'êberjêra ç'iyayê Zeytûnê bû, t'emamiya k'oma şagirtan destpê kirin şa dibûn û bi dengê bilind bona hemû k'iryametên ku dîtîbûn şikirî didane Xwedê ³⁸ û digotin: «Bimbarek e P'adşayê ku bi navê Xudan tê! Haştî li ezmên û şikirî li jorê!» ³⁹ Lê ji nav k'oma merivan çend fêrisîyan Îsar'a got: «Dersdar, li şagirtên xwe hilê». ⁴⁰ Ewî li wan vegehand got: «Ez wer'a dibêjim, heger evana dengê xwe bibir'in, kevirê bikine qîr'in».

ÎSA BONA ORŞELÎMÊ DIGIRÎ
(Metta 23:37-39)

⁴¹ Û gava nêzîkî Orşelîmê bû, li bajêr nihêrî, serda girîya ⁴² û got: «Xwezî te hema îro bizanibûya haştîya te çîva girêdayî ye! Lê niha ji ber ç'evên te hate veşartinê. ⁴³ Çimkî ser teda wê *ew* roj bèn, ku dijminên teyê dora te çeperê girêdin û ji her alîyanva hicûmî ser te bikin. ⁴⁴ Wê te û lawên te nava teda bikine ax û xwelî û kevir li ser kevir wê nehêlin. Çimkî dema ku Xwedê serîk da te, tu xwe nehesîyayî».

ÎSA P'ARISTXANÊDA
(Metta 21:12-17; Marqos 11:15-19; Yûhenna 2:13-22)

⁴⁵ Û k'ete p'aristxanê, destpê kir yên ku dik'ir'in û difirotin jê derxistin ⁴⁶ û gote wan: «Nivîsar e: «Mala min wê mala duakirinê be». Lê we ew kirye şkefta t'alank'aran». ⁴⁷ Û her roj p'aristxanêda hîn dikir, lê serokên k'ahînan, qanûnzana û giregirên cimetê pey *wî* k'etibûn, ku çawa wî bikujin. ⁴⁸ Lê t'u tişt nikaribûn bikirana, çimkî cimet hemû wîva girêdayî bû û guhdarîya wî dikir.

PIRSA LI SER HIKUMÊ ÎSA
(Metta 21:23-27; Marqos 11:27-33)

20 ¹ Û rojêke ji wan rojanda, gava ewî p'aristxanêda xelq hîn dikir û Mizgînî dida, serokên k'ahînan û qanûnzana bi rûspîyanva t'evayî hatine cem wî ² û gotin: «Bêje me, bi çî hikumî tu van kiran dikî? K'ê ev hikum daye te»? ³ Ewî li wan vegehand got: «Ez jî tiştêkî ji we bipirsim û hûn bêjine min: ⁴ Hikumê nixamtina Yûhenna ji ezmên bû yan ji merivan»? ⁵ Ew nava hevda şêwrîn û gotin: «Heger em bêjin: «Ji ezmên bû», wê bêje: «Lê we

* 19:38 Zebûr 118:26.

† 19:46 Îşaya 56:7; Yêremîya 7:11.

çima bawerîya xwe wî neanî? ⁶ Lê heger em bêjin: <Ji merivan bû>, t'emamîya cimetê wê me bide ber keviran, çimkî ewana bawer in, ku Yûhenna p'êxember bû». ⁷ Wana caba wî da û gotin: «Em nizanin ji k'u bû». ⁸ Îsa gote wan: «Ez jî wer'a nabêjim, ku bi çi hikumî ez van kiran dikim».

MESELA BAX Û BAXVANAN
(Metta 21:33-46; Marqos 12:1-12)

⁹ Îsa destpê kir eva mesela gote cimetê: «Merivekî bax danî, ew da baxvanan û waxtekî dirêj çû welatekî din. ¹⁰ Û waxtê bert'opkirinêda xulamêk şande cem baxvanan, ku ji berê bax wîr'a bişînin, lê baxvanan xulamê wî xistin û destvala verêkirin. ¹¹ Axa xulamêkî din jî şand, wan wî jî xist, ew bêhurmet kirin û destvala verêkirin. ¹² Yê sisyan jî şand, vana eva jî birîndar kir û ji bax derxistin. ¹³ Xweyê bax got: <Ez çi bikim? Kur'ê xweyî delal bişînim, belkî ji wî şerm bikin>. ¹⁴ Çaxê baxvanan ew dît, li hev şêwrîn û gotin: <Ev e warxurê wî. Werin em wî bikujin, ku mîrata wî mer'a bimîne>. ¹⁵ Ew jî bax derxistine der û kuştin. Îdî xweyê bax wê çi bîne serê wan? ¹⁶ Ê ne ewê bê qir'a wan baxvanan bîne û bax bide hinekên din». Gava ev yek bihîstin, gotin: «Xwedê neke». ¹⁷ Îsa li wan nihêrî û got: «Lê ew çi ye, ku nivîsar e? <Ew kevirê ku hosteyan wêda avît, ew bû serê e'nîşkê>». ¹⁸ Her k'ê ku ser vî kevirêda bik'eve, wê hûrdexaşi be û ew kevir ser k'êda bik'eve, wê wî bihincir'îne». ¹⁹ Serokên k'ahînan û qanûnzanan wê demê xastin wî bigirin, çimkî fem kirin, ku ewî eva mesele anî ser wan, lê ji cimetê tirsyan.

PIRSA XERC DAYÎNÊ Û ZÊNDÎBÛNA MIRÎYAN
(Metta 22:15-33; Marqos 12:13-27)

²⁰ Û ç'evên wan ser Îsa bûn, wan çend merivên cesûs şandin, ku bi durûtî xwe danîbûne dewsa *merivên* rast, ku wî bi xeberan bigirin û bidine destê hikumetê û dîwana welî. ²¹ Wan ji wî pirsî û gotinê: «Dersdar, em dizanin ku tu rast xeber didî û hîn dikî, firqiyê nakî nava merivan, lê rîya Xwedê rast hîn dikî. ²² Gelo rast e, ku em xerc bidine Qeyser yan na?» ²³ Ewî fêlbazîya wan fem kir, wan' a got: «Hûn çima min dicêribînin? ²⁴ Zîvekî nîşanî min bikin. Ev nivîsar û sifetê k'ê ne ser *zîv*?» ²⁵ Wana got: «Yên Qeyser in». Ewî jî gote wan: «Ku usa ye, çi yê Qeyser in, bidine Qeyser û çi yê Xwedê ne, bidine Xwedê». ²⁶ Û li ber cimetê nikaribûn ew bi xeberên wî bigirtana û li ser cabdayîna wî zendegirtî dengê xwe bir'in.

²⁷ Ji sadûqîyan hinekên ku digotin miriyê zêndî nebin, hatine cem wî jê pirsîn û gotin: ²⁸ «Dersdar, Mûsa mer'a nivîsiye: <Heger birê yekî bizewice û bêzuret bimire, birayê wî bira jina wî bistîne û zuret pey birê xwe xe>». ²⁹ Awa heft bira hebûn. Birê mezin jinek stand, bêzuret mir. ³⁰ Peyr'a yê dudan ³¹ û paşê yê sisyan ew jin stand, usa wan her heftan jî ew jin stand û zar'ok pey wan nek'etin, mirin. ³² Pey hemûyan' a ew jin jî mir. ³³ De îcar Roja Zêndîbûna mirîyan ewê bibe jina ji wan k'îjanî? Çimkî her heftan jî ew standîbû». ³⁴ Îsa li wan veğerand got: «Merivê vê dinyayê dizewicin û mêr dikin. ³⁵ Lê ewên ku bigihîjine dinê axretê û hêjayî zêndîbûna mirîyan bin, wê ne bizewicin û ne jî mêr kin. ³⁶ Çimkî ewê îdî nikaribin bimirin, ew weke milyak'etan e. Ew lawên Xwedê ne, çimkî ewana p'ara zêndîbûnê ne. ³⁷ Lê bona zêndîbûna mirîyan, Mûsa jî daye k'îfşê. Serhatîya dara mormorkêda ew bona Xudan dibêje: <Xwedêyê Îbrahîm, Xwedêyê Îshaq, Xwedêyê Aqûb>». ³⁸ Awa Xwedê ne Xwedêyê mirîyan ye, lê yê zêndîyan e, çimkî bona wî hemû jî zêndî ne». ³⁹ Ji qanûnzanan hinekan lê veğerand got: «Dersdar, te qenc got». ⁴⁰ Û îdî t'u kesî newêrbû tişteki jî ji wî bipirse.

MESÎH KUR'Ê K'Ê YE?
(Metta 22:41-46; Marqos 12:35-37)

⁴¹ Îsa gote wan: «Çawa dibêjin ku Mesîh kur'ê Dawid e? ⁴² Dawid bi xwe kitêba Zebûranda dibêje: <Xudan gote Xudanê min: Li aliyê minî rastê rûnê, ⁴³ heta ku dijminên te bikime binê p'iyên te>». ⁴⁴ Awa heger Dawid wî Xudan hesab dike, îdî ew çawa dibe kur'ê Dawid?»

HEVZA XWE JI QANÛNZANAN BIKIN
(Metta 23:1-36; Marqos 12:38-40; Lûqa 11:37-54)

⁴⁵ Hê t'emamîya cimetê guhdarî dikir, ewî gote şagirtên xwe: ⁴⁶ «Hevza xwe ji wan qanûnzanan bikin, yê ku hiz dikin bi libasên dirêj biger'in, bazaranda silavê bistînin, k'inîştanda k'ursiyên pêşin bigirin û şayîyanda jî serê jorin rûnên. ⁴⁷ Alîkîva malên jinebîyan hûfî xwe dikin, aliyê dinva jî bi durûtî duayê xwe dirêj dikin. Dîwana wan wê hê giran be».

HEDÎYA JINEBÎYA K'ESÎB
(Marqos 12:41-44)

21 ¹ Îsa nihêrî, dît ku dewlemendan hedîyên xwe davîtine p'eredanga p'aristxanê. ² Ewî jinebîke k'esîb jî dît, ku du pol avîte wir ³ û Îsa got: «Ez rast dibêjime we, ku evê jinebîya k'esîb ji van hemûyan zêdetir avîtê. ⁴ Çimkî wan hemûyan ji bermayiyên xwe avîtine nava hedîyên Xwedê, lê evê vê k'esîbîya xweda her tiştên ku wê pê xwe xwey bikira avîtê».

* 20:17 Zebûr 118:22.

† 20:28 Qanûna Ducarî 25:5.

‡ 20:37 Derk'etin 3:6.

§ 20:43 Zebûr 110:1.

⁵ Û gava hinekan bona p'aristxanê digotin, ku bi kevirên bedew û p'êşkêşan hatye xemilandinê, wî got: ⁶ «Van her tiştên ku hûn dibînin, roj wê bîn ku ev hemûyên jî wêran bin, li vir kevirê li ser kêvir nemîne!»

⁷ Ji wî pirsîn gotinê: «Dersdar, ev tişt wê çiçax bibin? Û li dema bûyîna van tiştan çi nîşan wê bibe?» ⁸ Ewî got: «Miqatî xwe bin, ku hûn neyêne xapandinê, çimkî gelek wê bi navê min bîn û bêjin: <Ez im Mesîh> û: <Ew waxt nêzîk e>, pey wan neçin. ⁹ Çaxê hûn bona şer' û de'wan bibihên, netirsîn, çimkî gerekê pêşîyê ev tişt bibin, lê axirîya dinyayê ne hingê ye». ¹⁰ Hingê gote wan: «Miletê rabe li ser millet, p'adşatî li ser p'adşatîyan, ¹¹ cî-cîyan erdhejên mezin, xelayî û nexaşîya mirindariyê wê bibin, li ezmên jî tiştên saw û tirs û nîşanên mezin wê bibin. ¹² Lê berî van her tiştan, wê dest bavêjine we, we bizêrînin, bibine ber k'inîştan û bikine hebsan. Bona navê min wê we bibine ber hizûra p'adşan û welîyan. ¹³ Evê wer'a bibe manî, ku hûn bona min şehdetîyê bidin. ¹⁴ Û awa vê yekê bînine bîra xwe, ku pêşda xem nekin, hûnê çi caba xwe bidin. ¹⁵ Çimkî ezê zar-ziman û serwaxtiyê bidime we, ku dijminên weyê nikaribin li ber we xeber din yan bisekinin. ¹⁶ Dê û bavên we, bira-pismam û hevalên we wê nemamîya we bikin û ji we hinekan jî wê bikujin. ¹⁷ Bona navê min hûnê ber ç'evên hemûyan reş bin. ¹⁸ Lê mûk wê ji serê we kêm nebe. ¹⁹ Bi sebira xwe hûnê ruhê xwe rizgar bikin. ²⁰ Lê çaxê hûn bibînin ku ordîyan dora Orşelîmê girtye, hingê bizanibin ku wêranbûna wê nêzîk e. ²¹ Hingê ewên Cihûstanêda ne, bira birevine ç'îyan û ewên Orşelîmêda ne, bira derk'evin, ewên k'ewşênda ne, bira venegerine bajêr. ²² Çimkî ew roj, rojên heyfhildanê ne, ku her çi hatye nivîsarê bê serî. ²³ Lê wey li yê duhalî û destdergûşan li wan rojanda, çimkî tengasîke mezin wê bê serê dinyayê û hêrsa *giran* li ser vê cimetê. ²⁴ Ewê bi devê şûr bik'evin û nava her milletanda hêsr bêne birinê. Orşelîm jî wê ji milletên *p'ûtp'arêz* bê p'êpeskirinê, heta ku waxtê wan miletan xilaz be.

²⁵ Ser te'vê, hîvê û steyrkan nîşan wê bibin. Li ser dinyayê jî ji dest dengê xuşînîya pêlên be'rê milletê bibizdîn û xwe unda kin. ²⁶ Dilên merivan jî ji tîrsa wê bihelin, ji dest wan tiştên ku wê bêne serê t'emamîya dinyayê, çimkî t'opên ezmanan wê ji rîyên xwe derên. ²⁷ Û hingê wê bibînin Kur'ê Meriv e'wanva bi qewat û rûmeta mezin tê. ²⁸ Çaxê ev tişt destpê bibin, hûn rabin serê xwe bilind kin, çimkî azabûna we îdî nêzîk e».

²⁹ Û meselek gote wan: «Hûn dara hêjîrê û hemû daran binihêrin. ³⁰ Çaxê dibişkivin, hûn bi wê yekê dizanin ku havîn nêzîk e. ³¹ Usa jî çaxê hûn bibînin ku ev tişt dibin, bizanibin ku P'adşatîya Xwedê nêzîk e. ³² Ez rast dibêjime we, ku eva nisila derbaz nabe, heta ku ev her tişt nebin. ³³ Erd û ezmanê derbaz bin, lê gotinên min t'u car derbaz nabin. ³⁴ Lê hûn miqatî xwe bin, nebe ku dilê we xwarin, vexwarin û xemên vê dinyayêva girêdayî be û nişkêva ew Roj ser weda bê. ³⁵ Çimkî ew Roj wê mîna t'elê bê pêşîya her merivên li ser dinyayê. ³⁶ Hişyar bimînin û her t'im dua bikin, ku hûn bikaribin ji wan her tiştên ku wê bibin birevin rizgar bin û li ber hizûra Kur'ê Meriv rûspî bisekinin». ³⁷ Îsa rojê p'aristxanêda hîn fikir, lê şevê diçû ser ç'îyayê Zeytûnê dima. ³⁸ Û t'emamîya cimetê sibehê zû diçû p'aristxanê, cem wî, ku guhdarîya wî bikin.

ŞÊWRA KUŞTINA ÎSA

(Metta 26:1-5, 14, 16; Marqos 14:1-2, 10-11; Yûhenna 11:45-53)

22 ¹ Cejina Nanê Şkeva nêzîk bû, ya ku nav dibû Cejina Derbazbûnê. ² Serokên k'ahîn û qanûnzanan dixastin wî bikujin, lê mecalekê dager'yan, çimkî ji cimetê ditirsyan. ³ Hingê Şeytan k'ete qelpê dilê Cihûdayê ku Îsxeryotî dihate gotinê, ew yek ji wan her donzdehan bû. ⁴ Eva rabû çû serokên k'ahînan'a û serk'arên xizmetk'arên p'aristxanê'a xeber da, ku Îsa bide destê wan. ⁵ Evana şa bûn û wîr'a qayl bûn, ku p'ere bidinê. ⁶ Cihûda razî bû û hilda ser xwe, ku mecalê bibîne û wî bi dizî cimetêva bide destê wan.

ŞÎVA CEJINA DERBAZBÛNÊ

(Metta 26:17-25; Marqos 14:12-21; Yûhenna 13:21-30)

⁷ Roja Cejina Nanê Şkeva hat, ku gerekê berxa qurbana Cejina Derbazbûnê bihata serjêkirinê. ⁸ Îsa Petrûs û Yûhenna şandin û got: «Her'in Şîva Cejina Derbazbûnê mer'a hazir bikin, ku em bixwin». ⁹ Wana jê pirsî: «Tu li k'u dixazî em wê hazir bikin?» ¹⁰ Ewî jî gote wan: «Gava hûn bik'evine bajêr, merivek wê rastî we bê, cêr'ê avê li ser milan. Pey wî her'ine wê mala ku ew diçê ¹¹ û xweyê malê'a bêjin: <Dersdar dibêje: K'anê ye ew oda mêvanan, ya ku ezê têda şagirtên xweva t'evayî Şîva Cejina Derbazbûnê bixwim?» ¹² Hingê ewê li qatê jorin odexaneke mezine hevdayî nîşanî we bike û li wir jî hûn hazir bikin». ¹³ Ewana çûn, çawa ku wan'a gotibû usa jî dîtin û Şîva Cejina Derbazbûnê hazir kirin.

ŞÎVA XUDAN

(Metta 26:26-30; Marqos 14:22-26; 1 Korintî 11:23-25)

¹⁴ Û çaxê dem pêr'a gihîşt, Îsa şandîyên xweva t'evayî li ser sifrê rûnişt ¹⁵ û gote wan: «Ez gelekî hizreta vê Şîva Cejina Derbazbûnê bûm, ku t'evî we, berî ku ez biçerçirim, min bixwara. ¹⁶ Çimkî ez dibêjime we, ez îdî ji vê t'u car naxwim, heta ku P'adşatîya Xwedêda bibe». ¹⁷ Û k'as hilda, şikirîya xwe ji Xwedê anî û got: «Hildin evê û nava hevda bela kin. ¹⁸ Ez wer'a dibêjim, ku ez îdî ji mêwa tirîyê venaxwim, heta ku P'adşatîya Xwedê bê». ¹⁹ Û nan hilda şikirî da, ker kir da wan û got: «Eva bedena min e, ku bona we tê dayînê. Vê yekê bona bîranîna min bikin».

²⁰ Usa jî pey Şîvêr'a k'as hilda û got: «Eva k'asa peymanî nû ye, pê xûna min girêdayî, ku bona we tê rêtinê. ²¹ Û va ye destê yê nemamîya min wê bike, li ser vê sifrê t'evî min e. ²² Hemî Kur'ê Meriv wê usa her'e, çawa bona wî nivîsar e, lê wey li wî merivî, k'î wê nemamîya Kur'ê Meriv bike». ²³ Wana destpê kir ji hev nava hevda pirsîn, ku gelo ji wan k'ê wê yekê bike?

DE'WA BONA MEZINAYÎYÊ

²⁴ Û nava wanda de'w pêşda hat, ku ji wan k'îjan wê yê herî mezin bê hesabê. ²⁵ Îsa gote wan: «P'adşayên miletan hikumî li ser cimeta xwe dikin û yên ku zordestîyê li ser wan dikin qencîdar têne gotinê. ²⁶ Lê hûn usa nebin, yê nav wedayî herî mezin, bira bibe mîna yê herî biç'ûk û yê serk'ar jî bira bibe mîna xulêm. ²⁷ Niha k'î ye mezin, yê li sifrê rûniştî yan berdestî? Ê ne yê li sifrê rûniştî? Û ez nava weda mîna berdestîkî me.

²⁸ Hûn in, yên ku nava cêribandinên mînda heta niha t'evî min mane. ²⁹ Û ezê P'adşatîyê bidime we, çawa Bavê min ew da min, ³⁰ ku hûn P'adşatîya mînda ji sifra min bixwin û vexwin û ser k'ursîyan rûnên, dîwana donzdeh qebîlên Îsraêlê bikin.

ÎSA BONA ÎNK'ARÎYA ŞIMHÛN-PETRÛS DIBÊJE
(Metta 26:31-35; Marqos 14:27-31; Yûhenna 13:36-38)

³¹ Şimhûn! Şimhûn! Va ye Şeytan xast mîna genim we bêjingê xe. ³² Lê min bona te dua kir, ku bawerîya te kêmbê û çaxê tu vegeerî, dil bidî ber birayên xwe». ³³ Petrûs gote wî: «Xudan, ez hazir im bi ter'a bik'evime hebsê jî û kuştinê jî». ³⁴ Lê Îsa gotê: «Petrûs! Ez ter'a dibêjim, îro hê berî bangdana dîk, tuê sê caran bêjî, ku min nas nakî».

TENGAŞÎYA MEZIN

³⁵ Û Îsa gote wan: «Çaxê min hûn bêy k'îsik, tûrik û p'êlav şandin, hûn hewcê tiştekî bûn»? Wana got: «Na». ³⁶ Hingê got: «Lê niha k'îsikê k'ê heye bira hilde û usa jî tûrik. Û k'î bêy şûr e, bira k'incên xwe bifiroşe û xwer'a şûrekî bik'ir'e. ³⁷ Lê ez dibêjime we, ku ev gotina nivîsar jî gerekê li ser min bê sêrî, *ku*: <Ew t'evî nerastan hate hesabê>». Û çî ku bona min nivîsar e, ser bûyînê ye». ³⁸ Şagirtan got: «Xudan, vane li vir du şûr hene». Ew jî gote gote wan: «Bes e».

ÎSA SERÊ Ç'ÎYAYÊ ZEYTÛNÊ DUA DIKE
(Metta 26:36-46; Marqos 14:32-42)

³⁹ Û Îsa li gora xeysetê xwe rabû çû ç'îyayê Zeytûnê, şagirtên wî jî pey wî çûn. ⁴⁰ Û gava gihîşte cî, gote wan: «Dua bikin, ku hûn nek'evine nava cêribandinê». ⁴¹ Û xwexa weke kewkîkirina kevirêkî ji wan dûr k'et, çok veda dua kir ⁴² û got: «Bavo, heger daxaza te ye, evê k'asê jî min dûr xe. Lê bira daxaza te be, lê ne ya min». ⁴³ Û jî ezmên milyak'etek wîva k'ifş bû û qewat da wî. ⁴⁴ Ewî nava te'î-tengîya giranda hê bi k'el û bîn dua dikir. Xûdana wî mîna dilopên xûnêye gir dirijyane erdê. ⁴⁵ Û jî dua rabû, hate cem şagirtên xwe, ewana k'erbî k'ederê razayî dîtîn. ⁴⁶ Û gote wan: «Hûn çima radizên? Rabin dua bikin, ku nek'evine nava cêribandinê».

BENDKIRINA ÎSA
(Metta 26:47-56; Marqos 14:43-50; Yûhenna 18:3-11)

⁴⁷ Ewî hê xeber dida, k'omeke merivan ser wîda girt û yekî jî her donzdehan, navê wî Cihûda, pêşîya wan k'etibû û nêzikî wî bû, ku her'e rûyê wî. ⁴⁸ Îsa gote wî: «Cihûda! Tu bi ramûsanê Kur'ê Meriv didî destê wan»? ⁴⁹ Gava ewên t'evî wî dîtîn wê çî bibe, gotine wî: «Xudan, em bi şûr wan xin»? ⁵⁰ Û jî wan yekî bi şûr xulamê serokk'ahîn xist û guhê wîyî rastê pekand. ⁵¹ Hingê Îsa got: «Bes e, bihêlin». Û dest da guhê wî, qenc kir. ⁵² Paşê Îsa gote serokên k'ahînan, mîrên p'aristxanê û rûspîyên ku hatibûne ser wî: «Qey bêjî, hûn derk'etine, ku bi şûr û daran yekî t'alank'ar bigirin? ⁵³ Ê ne ez her t'im t'evî we p'aristxanêda bûm, lê we destê xwe nedida min. Lê niha waxtê we û hikumê taristanîyê ye».

PETRÛS ÎSA ÎNK'AR DIKE
(Metta 26:57,58, 67-75; Marqos 14:53-54, 66-72; Yûhenna 18:12-18, 25-27)

⁵⁴ Û ew girtin, birin kirine mala serokk'ahîn. Petrûs jî ji dûrva p'ê-p'ê li pey wî diçû. ⁵⁵ Gava wana goveka hewşêda agir vexist û dorê rûniştin, Petrûs jî li wir t'evî wan rûnişt. ⁵⁶ Û carîkê ew li ber agir rûniştî dît, lê nihêrî, got: «Ev jî t'evî wî bû». ⁵⁷ Lê Petrûs înk'ar kir got: «Ez wî nas nakim, evdê!» ⁵⁸ Demekê şûnda yekî din ew dît û got: «Tu jî ji wan î». Petrûs got: «Pismam, ez ne ji wan im». ⁵⁹ Û weke sihetekê jî derbaz bû, yekî din jî dida zora xwe û digot: «Hema rast ev meriv jî t'evî wî bû, çimkî ji Celîlê ye». ⁶⁰ Lê Petrûs got: «Filan kes! Tu çî dibêjî? Ez nizanîm!» Û hê xeber dêvda bû, pêr'a-pêr'a dîk bang da. ⁶¹ Xudan li ser Petrûsda vegerya wî nihêrî, hingê Petrûs gotina Xudan anî bîra xwe, ku wîr'a gotibû: «Îro hê berî bangdana dîk, tuê sê caran min înk'ar kî». ⁶² Û Petrûs derk'ete derva û k'ele-k'el girîya.

* 22:37 Îşaya 53:12.

† 22:47 Destnivîsarên hinekanda heye: «Çimkî gotibû wan: <Her'ime rûyê k'ê, ew e>».

Lûqa 22,23

ÎSA LI BER CIVÎNA GIREGIRAN
(Metta 26:59-66; Marqos 14:55-64; Yûhenna 18:19-24)

⁶³ Û ewên nobedarî Îsa dikirin, qerfê xwe wî dikirin, lêdixistin. ⁶⁴ Ç'evên wî girêdan û jê dipirsîn digotin: «De p'êxembertîyê bike, k'a k'î bû ku te xist?» ⁶⁵ Û bi gelek gotinên mayîn jî ew bêhurmet dikirin.

⁶⁶ Gava sibeh zelal bû, k'oma rûspîyên cimetê, serokên k'ahînan û qanûnzanan civyan. Îsa k'aşî dîwanxana xwe kirin ⁶⁷ û gotinê: «Heger tu yî Mesîh, bêje me?» Îsa gote wan: «Heger ez wer'a bêjim jî, yek e hûn bawer nakin. ⁶⁸ Û heger pîrsekê jî bidime we, hûnê caba min nedin. ⁶⁹ Ji vir hada Kur'ê Meriv wê li cem Xwedêyê Zor, li alîyê wîyî rastê rûnê». ⁷⁰ Hemûyan bi hevr'a got: «Ku usa ye tu Kur'ê Xwedê yî?» Ewî jî gote wan: «Hûn xwexa dibêjin, ku ez ew im». ⁷¹ Wana got: «Îdî şehde çî mer'a ne? Me xwexa ji devê wî bihîst».

ÎSA LI BER PÎLATO
(Metta 27:1-2, 11-14; Marqos 15:1-5; Yûhenna 18:28-38)

23 ¹ Û ew k'oma merivan pêva, bi hevr'a rabûn, Îsa birine cem Pîlato. ² Û dest bi xeybê kirin gotin: «Me ev meriv dît ku milletê me dixalîfîne û ne jî dihêle ku xerc bidine Qeyser. Bona xwe jî dibêje: <Ez Mesîh P'adşa me>». ³ Pîlato jî wî pîrsî got: «Tu yî p'adşayê cihûyan?» Wî lê veğerand got: «Te bi zarê xwe got». ⁴ Pîlato serokên k'ahînan û k'oma merivanra got: «Ez t'u neheqîyê vî merivîda nabînim». ⁵ Lê ewana ser ya xwe bûn û digotin: «Evî merivî nava t'emamîya Cihûstanêda, ji Celîlê girtî heta vira bi hînkirina xweva cimet t'evîhev kirye».

ÎSA LI BER HÊRODES

⁶ Gava Pîlato bona Celîlê bihîst, pîrsî: «Ev meriv ji Celîlê ye?» ⁷ Gava pê hesya, ku ew ji bin hikumê Hêrodes e, ew şande cem Hêrodes, çimkî wan rojanda ew jî hatibû Orşelîmê. ⁸ Gava Hêrodes Îsa dît, gelekî şa bû. Ewî hê zûva dixast ew bidîta, çimkî gelek tişt bona wî bihîstibûn û hizretê bû, ku k'iryametekê bi destê wî bibîne. ⁹ Hêrodes gelek pîrs danê, lê Îsa caba t'u pîrsekê neda. ¹⁰ Serokên k'ahînan û qanûnzanan jî sekinî bûn û gelekî ew gunehk'ar dikirin. ¹¹ Hêrodes jî bi eskerên xweva ew bêhurmet kir, pê k'enyar, paşê k'inceke rewş da lêkirinê û dîsa paşda ser Pîlatoda şand. ¹² Wê rojê Pîlato û Hêrodes li hev hatin, çimkî berî hingê nava wanda dijminatî hebû.

DÎWANA KUŞTINA ÎSA
(Metta 27:15-26; Marqos 15:6-15; Yûhenna 18:39-19:16)

¹³ Pîlato gazî serokên k'ahînan, mîran û cimetê kir, ¹⁴ gote wan: «We ev meriv anî ber dîwana min, çawa yekî ku cimetê dixalîfîne. Awa min pêş weva her tişt jê pîrsî, lê ji wan xirabîyên hûn gilî dikin, min t'u tişt li ser vî merivî nedît. ¹⁵ Û ne jî Hêrodes dît, lema ewî ew li ser meda veğerand. Evî tiştêkî usa nekiryê, ku bê kuştinê. ¹⁶ Ez wî bidime ber qamçîyan û ber'dim». (¹⁷ Çimkî cejinêda lazim bû, ku bona wan ese girtîkî hebsê berda.) ¹⁸ T'emamîya k'oma merivan bi hevr'a kirine qîr'in û gotin: «Wî li rûbarî dinyayê nehêle! Barabas bona me ber'de!» ¹⁹ Barabas yekî bona serhildan û merivkuştina bajêrda bûyî hatibû bendkirinê. ²⁰ Pîlato dîsa destpê kir wanr'a xeber da, çimkî wî dixast Îsa bida ber'danê. ²¹ Lê wana hê dikire qîr'in û digotin: «Xaç ke! Wî xaç ke!» ²² Ewî cara sisyan gote wan: «Evî çî xirabî kirye? Min t'u neheqî li ser vî nedît, ku bê kuştinê. Ez wî bidime ber qamçîyan û ber'dim». ²³ Lê ewana ser ya xwe bûn, bi dengê bilind dikirine qîr'in û dixastin ku ew bê xaçkirinê. Û dengê wan derbaz bû. ²⁴ Pîlato qirara xwe da, ku bi ya dilê wan be. ²⁵ Û çawa wan xast, ewî yê ku bona serhildanê û merivkuştinê bendkirî bû, ji hebsê berda. Lê Îsa hişte ser ya dilê wan.

XAÇKIRIN Û MIRINA ÎSA
(Metta 27:31-56; Marqos 15:21-41; Yûhenna 19:17-30)

²⁶ Û gava eskeran Îsa dane pêşîya xwe birin, yekî kûrênî, navê wî Şimhûn, ku ji k'ewşên dihat, girtin û xaç danîne ser milê wî, ku li pey Îsa bibe. ²⁷ Û k'oma merivane giran li pey wî diçû, usa jî ew k'ulfetên ku şîna wî dikirin û digir'yan. ²⁸ Îsa li ser wanda vegerya û got: «Qîzên Orşelîmê! Ser minda negirîn, lê ser xwe û lawên xweda bigirîn. ²⁹ Çimkî roj wê bîn, ku wê bêjin: <Xwezî li wan k'ulfetên bêber, ku zar'ok neanîne û nemêjandine>. ³⁰ Hingê merivê destpê kin bêjin: <Ç'îyano! Ser meda bik'evin. Gîrno! Me veşêrin>». ³¹ Heger aha serê dara ter' dikin, lê halê dara hişk wê çawa be?»

³² Du merivên neheq jî anîn, ku pêr'a bêne kuştinê. ³³ Û gava gihîştine wê dera ku „Qaf” tê gotin, li wir ew xaç kirin. Û ewên neheq jî yek li alîyê rastê xaç kirin û yek jî li alîyê ç'epê. ³⁴ Hingê Îsa got: «Bavo, bibaxşîne van, çimkî nizanin çî dikin». Ser k'incên wî p'êşk avîtin ku nava hevda bela kin ³⁵ Û cimet sekinî bû dinihêrî. Mîrên wan jî qerfê xwe li wî dikirin û digotin: «Xelq rizgar kirin, de bira xwe jî rizgar ke, heger ew e Mesîh, hilbijartîyê Xwedê». ³⁶ Esker jî li wî dik'enyar, pêşda dihatin, sirke didane wî ³⁷ û digotinê: «Heger tu yî p'adşayê cihûyan, de xwe rizgar ke». ³⁸ Û fêza serê wî bi yûnanî, latînî û îbranî nivîsar bû: «EVA P'ADŞAYÊ CIHÛYAN E».

³⁹ Ji wan neheqên dardakirî, yekî Îsa bêhurmet dikir digot: «Tu ne Mesîh î? De me rizgar ke, xwe jî pêr'a». ⁴⁰ Lê hevalê wî lê hilat û got: «Tu ji Xwedê natirsi? Ê ne tu jî hema wî cezayîda yî? ⁴¹ Ev maşê me ye, ku ez û tu anegorî kirên xwe dik'işînin, lê evî t'u xirabî nekiryê». ⁴² Û gote Îsa: «Xudan, min bîr bînî, çaxê bi P'adşatîya xweva bêyî». ⁴³ Îsa gote wî: «Ez rast dibêjime te, îro tuê t'evî min buhîştêda bî».

* 23:30 Hoseya 10:8.

⁴⁴ Gava nîvro sihet nêzîkî donzdehan bû, t'emamîya erdê heta siheta sisyan bû tarî ⁴⁵ û rûyê te'vê hate girtinê. P'erdeya p'aristxanê nîvîda bû du tîşan. ⁴⁶ Ê Îsa bi dengê bilind kire gazî got: «Bavo, ruhê xwe didime destê te». Ê gava ev yek got, ruhê xwe da. ⁴⁷ Sersed ev tiştê bûyî ku dît, şikirî da Xwedê û got: «Bi rastî eva merivekî rast bû». ⁴⁸ Ê t'emamîya k'oma merivan, ku li wir bona t'emaşê civya bû, eva yeka ku dît, sîngên xwe dixistin, paşda vedigeryane malên xwe. ⁴⁹ Hemû nasên wî jî û ew k'ulfetên ji Celîlê hatibûn jî, dûr sekinî bûn û ev tişt diditin.

T'IRBA ÎSA

(Metta 27:57-61; Marqos 15:42-47; Yûhenna 19:38-42)

⁵⁰ Merivek hebû, navê wî Êsiv, ew yekî qencî şîrhelal û endemê civîna giregirên cihûyan bû. ⁵¹ Eva ji bajarê Arîmetya Cihûstanê bû û xwexa jî hîvîya P'adşatîya Xwedê bû. Ew t'evî şêwr û kirina civîna wan nebibû. ⁵² Ew rabû çû cem Pîlato û cinyazê Îsa ji wî xast. ⁵³ Cinyaz ji xaçê anî xwarê, qedekê k'itanîda k'efen kir û nava t'irba qeyêda k'olayî danî, ku t'u car wêda t'u kes nehatibû danînê. ⁵⁴ Ew roja îniyê bû, ku sibeha şemîyê destpê dikir. ⁵⁵ Ê ew k'ulfetên ku ji Celîlê Îsar'a hatibûn, ew jî pey Êsiv çûn û ew t'irb dîtî, ku çawa cinyazê wî têda hate danînê. ⁵⁶ Ê paşda vegeryan, biharet û rûnê bînxaş hazir kirin û anegorî t'emîya Qanûnê roja şemîyê rihet bûn.

ÎSA JI MIRINÊ ZÊNDÎ DIBE

(Metta 28:1-10; Marqos 16:1-8; Yûhenna 20:1-10)

24 ¹ Roja yekşemê sibehê zû, wan k'ulfetan biharetên hazirkirî hildan çûne ser t'irbê. ² Lê wana ji ber t'irbê kevir holkirî dît. ³ Gava k'etine hindur, cinyazê Xudan Îsa nedîtin. ⁴ Ê hê ew bona vê yekê met'elmayî mabûn, nişkêva du merivên k'incnûrîn li ber wan sekinîn. ⁵ Ê gava k'ulfet ji tîrsa deverû k'etin, wana gote wan: «Hûn çima yê zêndî nava miriyanda diger'in? ⁶ Ew ne vir e, zêndî bûye. Bînine bîra xwe, ku çaxê ew hê Celîlêda bû, çî gote we: ⁷ <Gerekê Kur'ê Meriv bik'eve destê merivên nerast, bê xaçkirinê û roja sisyan ji mirinê zêndî be>». ⁸ Ê wana gotina Îsa bîr anîn ⁹ û ji t'irbê vegeryan, eva yeka her yanzdehan û hemûyên dinr'a gotin. ¹⁰ Yên ku şandîyanr'a gotin, evana bûn, Meryema Mejdelaî, Yohana û Meryema dîya Aqûb, bi t'evî hinekên mayîn. ¹¹ Ev yek şandîyanva çawa gotineke *merivê* çelqayî k'ifş bû û bawerîya xwe wan k'ulfetan neanîn. ¹² Lê Petrûs rabû revî berbi t'irbê, qûz bû nihêrî, t'enê k'efenê wî wir bû û met'elmayî çû û difikirî, gelo ew çawa bû.

LI SER RÎYA EMWASÊ

(Marqos 16:12-13)

¹³ Wê rojê du şagirt diçûne gundekî navê wî Emwas, ku ji Orşelîmê donzdeh kîlomêtirî dûr bû. ¹⁴ Wan bi hevr'a bona her tiştê bûyî xeber didan. ¹⁵ Ê gava wana nava hevda xeber didan û dişêwrîn, Îsa xwexa jî nêzîkî wan bû, bi wanr'a çû. ¹⁶ Lê ç'evên wan girtî bûn, ku wî nas nekin. ¹⁷ Îsa gote wan: «Hûn çima usa medekirî ne? Ê vê rêda çî hev'r'a xeber didin?» ¹⁸ Yekî ji wan, navê wî Klêpas, lê vegerand got: «Êw çawa ye, ji Orşelîmê t'enê te nebihîstye, ku van rojên paşinda li wir çî bûye?» ¹⁹ Ewî pirs da wan: «Çî bûye?» Wana lê vegerand got: «Bona Îsayê Nisretê, ku ew bi kirin û xeberên xwe li ber Xwedê û t'emamîya millet p'êxemberekî zor bû ²⁰ û çawa serokên k'ahînan û mîrên me nemamîya wî bi kuştinê kirin, xaç kirin. ²¹ Me t'irê ewê Îsraêlê aza ke, lê eva roja sisyan e, ku ev tişt bûne. ²² Lê ji nav meda jî çend k'ulfetan em bi ecêb hiştin. Ew sibehê zû çûbûne ser t'irbê ²³ û cinyazê wî li wir nedîtîbûn, vegeryan hatin gotin, ku: <Me milyak'et dîtî, wana mer'a got, ku ew zêndî ye>. ²⁴ Ê ji me hinek jî çûne ser t'irbê, çawa wan k'ulfetan gotibû, hema usa bû, lê Îsa nedîtin». ²⁵ Hingê ewî gote wan: «Hey merivên bê fikir, çi qasî zehmet hûn bawerîya xwe hemû gotinên p'êxemberan tînin? ²⁶ Ê ne gerekê Mesîh biçerçîrya û bik'eta rûmeta xwe?» ²⁷ Ê wî destpê kir ji *nivîsarên* Mûsa û hemû p'êxemberan çî ku wana kitêbanda bona wî nivîsî bûn, wanr'a şirovekirin. ²⁸ Ê gava nêzîkî wî gundî bûn, ku diçûnê, ewî usa da k'ifşê, ku ew diçe cîkî dûr. ²⁹ Lê wana zor li wî kir û got: «Îşev li cem me bimîne, çimkî êvar e, ro çûye ava». Ê ew çû hindur, ku li cem wan bimîne. ³⁰ Lê gava ew wanr'a li ser sifrê rûnişt, nan hilda, şikirîya xwe ji Xwedê anî, ker kir da wan. ³¹ Hingê ç'evên wan vebûn, ew nas kirin û ew ji ber ç'evê wan betavebû. ³² Wana gote hev: «Lema, çaxê ewî rêda mer'a xeber dida û nivîsar mer'a şirovedikirin, şabûn dik'ete dilê me». ³³ Hema wê demê ewana rabûn vegeryane Orşelîmê û her yanzdeh t'evî yê mayîn civyayî dîtî, ³⁴ ku digotin: «Bi rastî Xudan zêndî bûye û Şimhûnva k'ifş bûye!» ³⁵ Paşê wan her duyan got, ku çawa rêda rastî Îsa hatine û gava wî nan ker kir, wan ew nas kir.

ÎSA XWE NÎŞANÎ ŞAGIRTÊN XWE DIKE

(Metta 28:16-20; Marqos 16:14-18; Yûhenna 20:19-23; K'arên Şandîyan 1:6-8)

³⁶ Wana hê li ser vê yekê xeber dida, Îsa nava wanda sekinî û gote wan: «Haştî wer'a». ³⁷ Ew ji tîrsa bizdîyan û wan t'irê xeyalekî dibînin. ³⁸ Lê ewî gote wan: «Hûn çima şaşmayî ne û dudilî ne? ³⁹ Awa dest û p'iyên min binihêrin, ez xwexa me. Destên xwe bidine min û binihêrin, çimkî goşt û hestûyên ruh t'unene, çawa hûn dibînin yê min hene». ⁴⁰ Gava ev yek got, dest û p'iyên xwe nîşanî wan kirin. ⁴¹ Ê ji şabûna wan hê bawer nedikir, heyr-hujmek'ar mabûn, ewî gote wan: «Qet tiştêkî xwarinê li cem we heye?» ⁴² Wana çîtîk mesîyê pijandî da wî. ⁴³ Ewî jî hilda li ber ç'evên wan xwar ⁴⁴ û gote wan: «Ev bûn ew gotinên, ku çaxê ez t'evî we bûm, min wer'a digotin ku: <Gerekê her tiştên ku bona min Qanûna Mûsada, nivîsarên p'êxemberan û Zebûranda nivîsar bûn bihatana sêrî>». ⁴⁵ Hingê femê wan vekir, ku nivîsaran fem bikin. ⁴⁶ Ê gote wan: «Aha nivîsar e, ku Mesîh gerekê

* 24:42 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «û mirt'oxa hingiv.»

biçerçire Lûqa 24

û roja sisyan ji mirinê zêndî be ⁴⁷ û ji Orşelîmê girtî, nava her miletanda, bi navê wî wê bê dannasînkirinê, ku ji gunehkirinê vegehin û baxşandina gunehan bistînin. ⁴⁸ Ê hûn in şehdeyên van her tiştan. ⁴⁹ Awa ezê sozê Bavê xwe wer'a bişînim. Orşelîmêda bimînin, heta ku ji jor hûn qewatê bistînin».

HILJORBÛNA ÎSA

(Marqos 16:19-20; K'arên Şandîyan 1:9-11)

⁵⁰ Ê ewê ew heta Beytanyayê birin, destên xwe bilind kirin, dua-dirozge li wan kir. ⁵¹ Ê hê dirozge dikir, ji wan qetya, hiljor berbi ezmên hate birinê. ⁵² Şagirtan jî ew heband û bi *dilê* şa vegeryane Orşelîmê. ⁵³ Ê her t'im p'aristxanêda bûn û pesinê Xwedê didan.

MIZGÎNÎ YA KU YÛHENNA NIVÎSÎ

PÊŞGOTIN

Nivîsk'arê vê kitêbê aşkere navê xwe nenivîsîye. Lê zelal tê femkirinê, ku ew Yûhennayê kur'ê Zebedî bûye~ yekî ji her donzdeh şagirtên Îsa, yê ku kitêba «Aşkeretî»-yê jî nivîsîye. Li gora fikira gelek zaneyan, ev kitêb xilazîya sedsalîya pêşinda hatye nivîsarê.

Vê Mizgînyêda Yûhenna hê zêde li ser pîrsa jîyîna heta-ha-tê disekine, ya ku meriv bi bawerîya ser navê Kur'ê Xwedê Îsa Mesîh dikare bistîne.

«Mizgînyîya ku Yûhenna nivîsî» himberî her sê Mizgînyên mayîn bi stîleke din hatye nivîsarê. Vê Mizgînyêda usa jî çend serhatîyên din hatine nivîsarê, yên ku Mizgînyên dinda t'unene. Soz-mesele: dewata li Qanayêda, xeberdana Îsaye t'evî Nîkodêmo, k'ulfeta samerî, qencbûna nexaşê sî û heyşt salan, qencbûna yê ji zîmkakîyêda kor, zêndîkirina Lazarê mirî û çend tiştên din.

Mizgîndarên din~ ya Metta, Marqos û Lûqa hê gelek li ser kirên Îsaye li Celîlê disekinin, lê Yûhenna li ser kirên Îsaye Orşelîmêda gelekî disekine. Her sêyên pêşin hê zêde bi meselên Îsa hînkirina wî dibêjin, lê Yûhenna bona hînkirina wî û t'evgirêdana wîye t'evî Bav Xwedê û bona Xwedêtiya Îsa aşkere dibêje.

Mizgînyîya Yûhennada k'ifş e, ku Îsa Heyînê heta-ha-tê ye, yê ku bi bedena merivayî hat û nava dîroka merivayêda bi k'arên xweye qenc hate naskirinê. Û wî îzbat kir, ku ew e Rizgarkirê dinyayê û Ew e GOTINA Xwedê~ (Îsa ye Ew HEYÎNÊ zêndî û neefîrî, bi k'ijanî her hêyînên li erd û ezmên çê bûn.)

SERECEMA KITÊBÊ

Pêşgotin (1:1-18)

Şehdetîya Yûhennayê nixamdar û şagirtên Îsaye pêşin (1:19-51)

K'arên Îsaye li der-dorên ç'emê Ûrdunê û Celîlê (2:1-12:50)

Berî xaçbûnê xeberdana Îsa t'evî şagirtan (13:1-17:26)

Girtin, dîwankirin, xaçkirin, mirin û zêndîbûna Îsa (18:1-19:42)

Zêndîbûna Îsa û k'ifşbûna wî şagirtanva (20:1-31)

Paşgotin û k'ifşbûna Îsaye li Celîlêda (21:1-25)

GOTIN

1 ¹ Hê destpêkêda Gotin hebû. Gotin t'evî Xwedê bû û Gotin bi xwe Xwedê bû. ² Ew destpêkêda Xwedêr'a bû. ³ Her tişt bi wî çê bû û bêy wî t'u tişt ne bû, çi ku bû. ⁴ Jîyîn ew bû û jîyîn jî ronaya merivan bû. ⁵ Ronahî tarîstanîyêda şewq dide û tarîstanîyê li wî nikaribûye.

⁶ Ji Xwedêda merivekî şandî hebû, navê wî Yûhenna. ⁷ Ew bona şehdetîyê hat, ku şehdetîya li ser ronahîyê bide, ku hemû bi wî bawer bikin. ⁸ Ew ronahî ne xwexa bû, lê hat ku şehdetîya li ser ronahîyê bide. ⁹ Ronahîya rast ew e, yê ku tê dinyayê û her merivan ronahî dike. ¹⁰ Ronahî dinyayêda bû û dinya bi wî çê bû, lê dinyayê ew nas nekir. ¹¹ Ew hate cem cimeta xwe, lê cimeta wî ew hilneda. ¹² Lê k'ê ew hilda, ewî *destûr* da, ku heqîya wan hebe bibine lawên Xwedê, ewên ku bawerîya xwe navê wî tînin. ¹³ Evana ne ji xûnê, ne ji xastina bedenê, ne jî ji xastina merivayê bûne, lê ji Xwedê bûne. ¹⁴ Gotin bû beden û nav meda cî-yêr bû. Me rûmeta wî dît, rûmeta Kur'ê Bavêyî Tayê-t'enê, bi k'erem û rastîyêva t'ijî.

¹⁵ Yûhenna bona wî şehdetî da û bi dengê bilind got: «Ev e, ewê ku min bona wî digot: <Yê pey minr'a tê, ew ser minr'a ye, çimkî berî min ew hebû>».

¹⁶ Ji t'am-t'ijeyîya wî me hemûyan k'erem ser k'eremêda stand. ¹⁷ Çimkî Qanûn bi destê Mûsa hate dayînê, lê k'erem û rastî bi destê Îsa Mesîh bûn. ¹⁸ T'u kesî t'u car Xwedê nedîtye, lê ewî Tayê-t'enê, ku hemêza Bavêda ye, wî ew aşkere kir.

ŞEHDETÎYA YÛHENNAYÊ NIXAMDAR (Metta 3:1-12; Marqos 1:1-8; Lûqa 3:15-17)

¹⁹ Şehdetîya Yûhenna eva bû~ gava cihûyan ji Orşelîmê k'ahîn û lêwî şandin, ku ji wî bipirsin, k'a ew k'î ye, Yûhenna aşkere bona xwe got, ²⁰ înk'ar nekir, aşkere got: «Ez ne Mesîh im». ²¹ Wana jê pîrsî: «Lê tu k'î yî? Êlyas î? Wî got: «Na». «P'êxemberê sozdayî yî? Cab da: «Na». ²² Hingê gotinê: «De bêje, tu k'î yî, ku em cabekê ewên em şandiner'a bibin. Tu bona xwe çi dibêjî? ²³ Wî got: «Ez ew deng im, ku ber'îyêda dike gazî: <Rîya Xudan rast bikin>!* çawa Îşaya p'êxember gotye». ²⁴ Ewên ku hatibûne şandinê ew ji fêrisîyan bûn. ²⁵ Wana jê pîrsî: «Lê îdî çima *bi avê* dinixêimî, heger tu ne Mesîh î, ne Êlyas î û ne jî p'êxemberê *sozdayî*? ²⁶ Yûhenna li wan vegerand got: «Ez bi avê dinixêimim, lê nav weda yek heye, ku hûn wî nas nakin. ²⁷ Û ew~ ew e, yê ku pey minr'a tê û ez ne hêja me benên p'êlavên wî jî vekim». ²⁸ Ev her tişt li wî berî Ûrdunê~ Beytanyayêda bûn, wî cîyê ku Yûhenna wir dinixamt.

²⁹ Roja din Yûhenna dît Îsa berbi wî tê, got: «Va ye! Bexê Xwedê, ku gunehên dinyayê hildide! ³⁰ Ev e, ewê ku min bona wî digot: <Pey minr'a yek wê bê, ku ser minr'a ye, çimkî ew berî min hebû>. ³¹ Min nizanibû ew k'î ye, lê hatime bi avê dinixêimim, ku wî Îsraêlêva bidime naskirinê».

³² Yûhenna eva şehdetîya da û got: «Min dît ku Ruh ji ezmên mîna kewekê hat li ser wî danî û ma. ³³ Min nizanibû ew k'î ye, lê yê ez şandim, ku bi avê binixêimim, minr'a got: <Tu k'ê bibînî ku Ruh tê ser *wî* datîne û dimîne, ew e, yê ku bi Ruhê Pîroz dinixême>. ³⁴ Min jî dît û şehdetî da, ku ev e Kur'ê Xwedê».

* 1:23 Îşaya 40:3.

³⁵ Roja din Yûhenna dîsa t'evî du şagirtên xwe sekinî bû. ³⁶ Wî Îsa nihêrî, ku wirr'a derbaz dibe, got: «Va ye Berxê Xwedê!» ³⁷ Du şagirtên wî ev yek ku bihîstin, pey Îsa çûn. ³⁸ Îsa li pişt xweva zivirî, dît ku ewana pey wî tîn, gote wan: «Hûn çi dixazin?» Wan gote wî: «Rebbî, (ku tê femkirinê~ Dersdar), tu li k'u derê dimînî?» ³⁹ Gote wan: «Werin hûnê bibînin». Ew çûn û wan dît ew li k'u dimîne. Sihet îdî nêzîkî çaran bû û ew wê rojê li cem wî man.

⁴⁰ Yekî ji wan her duyan, Endrawsê birayê Şimhûn-Petrûs bû, yên ku ji Yûhenna bihîstin û pey Îsa çûn. ⁴¹ Ewî zû birayê xwe Şimhûn dît û gote wî: «Me Mesîh dît», ku tê femkirinê: «Yê K'ifşkirî».* ⁴² Wî ew anî cem Îsa. Û Îsa li Şimhûn nihêrî got: «Tu Şimhûnê kur'ê Yûhenna yî, tuê Kîfas bêyî gotinê» (awa gotî «Petrûs», ku tê femkirinê: «Qeya»).

ÎSA GAZÎ FÎLÎPO Û NATANYÊL DIKE

⁴³ Roja din Îsa qîrar kir ku her'e Celîlê. Wî Fîlîpo dît û gote wî: «Pey min were!» ⁴⁴ Fîlîpo ji Beytsaydayê bû, ji bajarê Endraws û Petrûs. ⁴⁵ Fîlîpo çû Natanyêl dît û gote wî: «Ewî ku bona wî Mûsa Qanûnêda û p'êxemberan jî nivîsarên xweda nivîsîne me ew dît~ Îsayê Kur'ê Ûsivê ji Nisretê». ⁴⁶ Natanyêl jê pirsî: «Qet dibe ku ji Nisretê tiştekî baş derk'eve?» Fîlîpo gote wî: «Were bibîne!» ⁴⁷ Gava Îsa dît ku Natanyêl berbi wî tê, bona wî got: «Va ye îsraêlîkî rastî-paqij, ku dilda mixeneti t'une». ⁴⁸ Natanyêl jê pirsî: «Tu çawa min nas dikî?» Îsa lê vegerand got: «Hê Fîlîpo gazî te nekiribû, çaxê tu li bin dara hêjîrêda rûniştî bûyî, min tu dîtî». ⁴⁹ Natanyêl gotê: «Dersdar, tu yî Kur'ê Xwedê! Tu yî P'adşayê Îsraêlê!» ⁵⁰ Îsa lê vegerand got: «Tu bona vê yekê bawer dikî, ku min ter'a got: «Min tu li bin dara hêjîrê dîtî?» Tuê tiştên ji vê mestir bibîni». ⁵¹ Û gote wî: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, hûnê ezman vebûyî bibînin û milyak'etên Xwedê, ku ji ser *namîla* Kur'ê Meriv diçine jor û tene xwarê».

DEWATA BAJARÊ QANAYA CELÎLÊDA

2 ¹ Du rojan şûnda bajarê Qanaya Celîlêda dewatek hebû. Dîya Îsa jî li wir bû. ² Îsa û şagirtên wî jî gazî wê dewatê bibûn. ³ Gava şerab kêmbû, dîya Îsa gote wî: «Şeraba wan nema». ⁴ Îsa lê vegerand got: «Evdê, çî te min k'etye? Hê ne waxtê min e». ⁵ Dîya wî berdestîyanr'a got: «Çi ku wer'a bêje, bikin». ⁶ Şeş k'urnên kevirî wir hebûn, ku li gora *qîrara* şûştin-veşûştina cihûyan li wir danîbûn. Ji wana her k'urnekê ji heystê heta sed bîst lîtir av hildida. ⁷ Îsa gote wan: «Van k'urnan t'ije av kin». Wana jî ew dêvr'a dagirtin. ⁸ Paşê gote wan: «Niha hinekî dagirin, bibin bidine serdewatî». Wana jî ew bir. ⁹ Gava serdewatî ji wê ava ku bibû şerab te'm kir, (wî nizanibû ji k'u ye, lê berdestîyên ku av k'işandibûn dizanibûn), wî deng da zavê ¹⁰ gotê: «Her meriv berê pêşda şeraba xweye baş datîne ser sifrê û paşê, çaxê vexwarî ne, ya nebaş dik'işîne. Lê te şeraba baş heta niha hiştîye».

¹¹ Eva k'iryameta *destê* Îsaye pêşin bû, ku wî kir, li Qanaya Celîlêda. Û aha ewî rûmeta xwe da k'ifşê û şagirtên wî bawerîya xwe wî anîn.

¹² Pey vê yekêr'a, Îsa t'evî dê û birayên xwe û şagirtên xwe çû Kefernahûmê, lê gelek rojan li wir neman.

ÎSA P'ARISTXANÊDA

(Metta 21:12-13; Marqos 11:15-17; Lûqa 19:45-46)

¹³ Cejina cihûyane Derbazbûnê nêzîk bû, Îsa hevraz çû Orşelîmê. ¹⁴ Ewî dît ku hinek P'aristxanêda dewar, pez û kew difiroşin, usa jî yên ku p'ere diguhastin rûniştî bûn. ¹⁵ De wî ji benan qamçîk çê kir û hemû ji p'aristxanê derxistin, pez û dewarên wanva *t'evayî*, p'erên serafan rêtin û t'extên wan welgerandin. ¹⁶ Kewfiroşanr'a jî got: «Vana ji vir hildin! Îdî mala Bavê min nekine bazar!» ¹⁷ Hate bîra şagirtên wî, ku aha hatye nivîsarê: «Xîreta mala te agir dilê min dixê».† ¹⁸ Hingê cihûyan jê pirsî: «Tuê bi çi nîşanê mer'a îzbat kî, ku ter'a destûr heye, van tiştan bikî?» ¹⁹ Îsa li wan vegerand got: «Vê p'aristxanê hilşînin, nava sê rojanda ezê wê bidime sekinandinê». ²⁰ Hingê cihûyan got: «Nava çil şeş salanda eva p'aristxana hatye çêkirinê. Tuê çawa wê nava sê rojanda bidî sekinandinê?» ²¹ Lê Îsa derheqa p'aristxana bedena xweda digot. ²² Peyr'a çaxê ew ji mirinê zêndî bû, şagirtan ew gotina wî anî bîra xwe û bawerîya xwe nivîsarê û gotina Îsa anîn.

ÎSA HAŞ JI DILÊ HER KESÎ HEY E

²³ Awa gava Îsa Cejina Derbazbûnêda li Orşelîmê bû, gelek ew nîşanên ku wî dikirin dîtî û bawerîya xwe navê wî anîn. ²⁴ Lê Îsa aminîya xwe li wan nedanî, çimkî wî her kesî nas dikir. ²⁵ Ew ne hewce bû, ku yekî bona merivekî şehdetî bida wî, çimkî wî dizanibû, ku dilê merivda çî heye.

ÎSA Û NIKODÊMO

3 ¹ Ji fêrisîyan merivek hebû, navê wî Nikodêmo, ji serokekî cihûyan bû. ² Eva şev hate cem Îsa û gote wî: «Mamoste, em dizanin ku tu ji Xwedêda çawa dersdar hatî, çimkî ew nîşanên tu dikî, t'u kes nikare bike, heger Xwedê ne pêr'a be».

³ Îsa lê vegerand got: «Ez rast, bêxêlif dibêjime te, heger meriv dîsa nû nebe, nikare P'adşatîya Xwedê bibîne».

* 1:41 Bi yûnanî aha ye: «XRÎSTOS», ku bi zimanê yûnanî tê femkirinê: «Yê Gulrûnkirî.»

† 2:17 Zebûr 69:9.

⁴ Nîkodêmo jê pîrsî: «Meriv, ku îdî kal bûye, çawa dikare dîsa nû bibe? Qet dibe ku ew careke din bik'êve zîkê dîya xwe û dîsa ji dê bibe?» ⁵ Îsa lê vegerand got: «Ez rast, bêxêlif dibêjime te, heta ku meriv ji avê û Ruh nebe, ew nikare bik'êve P'adşatîya Xwedê. ⁶ Yê ji bedenê dibe beden e, yê ji Ruh dibe ruh e. ⁷ Tu ecêb nemîne ku min gote te: Hûn gerekê dîsa nû bibin. ⁸ Ba* li k'u derê dixaze radibe. Tu dengê wî dibihêyî, lê nizanî ji k'u tê û k'uda diçe. Her kesê ji Ruh dibe jî usa ye».

⁹ Nîkodêmo ji wî pîrsî: «Ew çawa dibe?» ¹⁰ Îsa lê vegerand got: «Tu dersdarekî Îsraêlê yî û hê van tiştan nizanî? ¹¹ Ez rast, bêxêlif dibêjime te, çî tiştê em dizanin wê dibêjin, çî tiştê me dîtye şehdetîya wê yekê didin, lê hûn şehdetîya me hîlnadin. ¹² Ez ku li ser tiştên vê dinyayê wer'a dibêjim hûn bawer nakin, lê heger li ser tiştên li ezmanan bêjim hûnê çawa bawer bikin? ¹³ T'u kes neçûye ezmên, pêştirî ewî ji ezmên hat~ Kur'ê Meriv. ¹⁴ Û çawa Mûsa ber'îyêda me'r bilind kir, usa jî gerekê Kur'ê Meriv bê bilindkirinê, ¹⁵ ku her k'ê wî bawer bike, jîyîna wîye heta-ha-tê hebe. ¹⁶ Çîmkî Xwedê usa dinya hiz kir, ku heta Kur'ê xweyî tayê-t'enê da, ku her k'ê wî bawer bike unda nebe, lê jîyîna wîye heta-ha-tê hebe. ¹⁷ Çîmkî Xwedê Kur'ê xwe neşande dinyayê, ku dîwana dinyayê bike, lê ku dinya bi wî rizgar be. ¹⁸ Yê wî bawer bike, dîwana wî nabe, lê yê bawer nake, dîwana wî îdî bûye, çîmkî wî Kur'ê Xwedêyî tayê-t'enê bawer nekir. ¹⁹ Ev e, ew dîwan: Ronahî hate dinyayê, lê merivan ji ronayê zêdetir tarîstanî hiz kir, çîmkî kirên wan xirabî bûn. ²⁰ Her k'ê ku xirabîyê dike, ew ronayê hiz nake. Ew xwe li ronayê nagire, ku kirinên wî neyêne k'îfşê. ²¹ Lê yê rastîyê dike, ew xwe li ronayê digire, ku bê k'îfşê, kirên wî bi *daxaza* Xwedê hatine kirinê».

ÎSA Û YÛHENNAYÊ NIXAMDAR

²² Pey vê yekêr'a Îsa û şagirtên wî çûne qeza Cihûstanê. Îsa li wir t'evî wan dima û dinixamt. ²³ Yûhenna jî li Eynona nêzikî Salîmê dinixamt, çîmkî av li wir gelek bû. Meriv dihatine wê derê û diniximîn. ²⁴ Yûhenna hê neavîtîbûne hebsê.

²⁵ Hingê nava şagirtên Yûhenna û cihûkîda li ser pîrsa rizmên şûştin-veşûştinê de'w pêşda hat. ²⁶ Ew şagirt çûne cem Yûhenna û wîr'a gotin: «Dersdar, ewî ku li wî berî ç'emê Ûrdunê t'evî te bû û te bona wî şehdetî da, awa xwexa dinixême û hemû diçine cem wî».

²⁷ Yûhenna cab da got: «T'u meriv nikare tişteki hilde ser xwe, heger ji ezmênda wîr'a nehatibe dayîne. ²⁸ Hûn xwexa şehdeyên min in, ku min gotye: <Ez ne Mesîh im, lê yê pêşîya wîva şandî me>. ²⁹ Bûk ya k'ê be, ew e zava. Lê çawa omîdê zavê sekinî bona wî dibihê û bi dengê wî şa dibe, usa niha dilê min jî bi şabûnêva t'îje bû. ³⁰ Ew gerekê mezin be, lê ez biç'ûk bim.

³¹ Ewê ji jor hatye, ew ser hemûyanr'a ye. Ewê ji vê dinyayê ye, ji vê dinyayê xeber dide. Lê yê ji ezmên hatye, ew ser hemûyanr'a ye. ³² Wî çî dît û bihîst bona wê yekê şehdetîyê dide, lê t'u kes şehdetîya wî hîlnade. ³³ Yê şehdetîya wî hildide, ew mak dike, ku Xwedê rast e. ³⁴ Ewê ku Xwedê şandye ew gotinên Xwedê dibêje, çîmkî ew Ruhê Xwedê dide wî çap lê t'üne. ³⁵ Bav Kur' hiz dike û her tişt daye destê wî. ³⁶ Yê bawerîya xwe Kur' tîne, jîyîna wîye heta-ha-tê heye. Û yê ku gur'a Kur' nake, ew jîyîne nabîne, lê hêrsa Xwedê li ser wî dimîne».

K'ULFETA SAMERÎ Û HEBANDINA BI RUH Û RASTÎ

⁴ ¹ Fêrisîyan bihîst ku Îsa ji Yûhenna zêdetir şagirtan dicivîne û bi avê dinixême, ² lê bi rastî, ne ku Îsa xwexa dinixamt, lê şagirtên wî dinixamtin. ³ Hingê Îsa ku *bona fêrisîyan* pê hesya, Cihûstan hişt û dîsa çû Celîlê.

⁴ Usa bû ku ew Sameryayêr'a gerekê derbaz bûya. ⁵ Ew hate bajarekî Sameryayê, ku navê wî Sûxar bû. Ew der nêzikî wî erdî bû, ya ku Aqûb dabû kur'ê xwe Ûsiv. ⁶ Bîreke Aqûb li wê derê bû. Îsa usa jî rêwîtyê westîyayî, rex bîrê rûnişt. Îdî roj dema nîvro bû.

⁷ K'ulfeteke samerî hat, ku avê bik'îşîne. Îsa gote wê: «Ca *avekê* bide ez vexwim». ⁸ Şagirtên wî jî çûbûne bajêr xurek bik'îr'in. ⁹ Wê k'ulfeta samerî gote wî: «Tu ku cihû yî û ez jî k'ulfeteke samerî me, çawa ji min avê dixazî? Çîmkî t'evgirêdana cihûyan t'evî samerîyanan qet t'unebû. ¹⁰ Îsa lê vegerand got: «Heger te dayîna Xwedê bizanibûya û bizanibî k'î ye ter'a dibêje: <Avê bide ez vexwim>, teyê ji wî av bixasta û wî wê ava jîyîne bida te». ¹¹ K'ulfetê gote wî: «Xweyo, tişteki teyî pê avê bik'îşînî t'üne û bîr jî k'ûr e! De îcar tuê ava jîyîne ji k'u bînî? ¹² Çîma tu ji bavê me Aqûb mestir î, yê ev bîr daye me û ji vê ewî, lawên wî, pez û dewarên wî vexwarine? ¹³ Îsa caba wê da got: «Her kesê ji vê avê vexwe, ewê dîsa t'î be. ¹⁴ Lê yê ji wê avê vexwe, ya ku ez bidimê, ewê qet t'î nebe. Belê, ew ava ezê bidimê, wê dilê wêda bibe kanîke avê, ku bona jîyîna heta-ha-tê wê bide der». ¹⁵ K'ulfetê gotê: «Xweyo, de ji wê avê bide min, ku ez îdî t'î nehim û neyem ji vir avê nek'îşînim».

¹⁶ Îsa lê vegerand got: «Her'e gazî mêrê xwe ke û were vir». ¹⁷ K'ulfetê caba wî da got: «Mêrê min t'üne». Îsa gote wê: «Te rast got: <Mêrê min t'üne>, ¹⁸ çîmkî pênc mêrên te hebûne û yê niha jî, ku tu pêr'a yî, ne mêrê te ye. Te eva yeka rast got». ¹⁹ K'ulfetê gote wî: «Xweyo, ez dibînim tu p'êxember î. ²⁰ Kal û bavên me li ser vî ç'îyayî Xwedê hebandine, lê hûn dibêjin çîyê Xwedê hebandinê gerekê li Orşelîmê be». ²¹ Îsa gote wê: «Evdê, min bawer bike, dem wê bê, ku hûnê ne li ser vî ç'îyayî û ne jî li Orşelîmê Bavê bihebînin. ²² Hûn samerî wî dihebînin, k'îjanî nas nakin, lê em wî dihebînin, k'îjanî nas dikin, çîmkî rizgarî ji *nav* cihûyan tê. ²³ Lê dem wê bê, ku îdî pêr'a gihîştye jî, ku yên rast dihebînin wê bi ruh û rastîyê Bavê bihebînin, çîmkî Bav yên aha dihebînin diger'e.

* 3:8 Bi zimanên yûnanî û îbranî xebera «Ba» û «Ruh» yek in.

²⁴ Xwedê ruh e û yê ku wî dihebînin jî gerekê bi ruh û rastîyê wî bihebînin». ²⁵ K'ulfetê gote wî: «Ez dizanim, ku Mesîhê bê» (yanî «Yê K'ifşkirî»). «Çaxê ew bê, wê derheqa her tiştîda mer'a bêje». ²⁶ Îsa wêr'a got: «Ez *hema* Ew im, ku ter'a xeber didim».

²⁷ Ser xebardana wanda şagirt hatin. Ew gelekî ecêb man, ku wî wê k'ulfetêr'a xeber dida, lê t'u kesî negotê: «Tu çi dixazî?» yan «li ser çi wêr'a xeber didî»? ²⁸ Hingê k'ulfetê cêr'a xwe hişt, çû bajêr û cimêr'a got: ²⁹ «Werin wî merivî bibînin, yê ku her tiştên ku min kiribûn, minr'a got. Gelo ev e Mesîh»? ³⁰ Ew ji bajêr derk'etin û hatine cem wî.

³¹ Nava wî waxtîda şagirtên wî lava jê dikirin û digotinê: «Dersdar, tişteki bixwe!» ³² Lê ewî gote wan: «Xurekê minî xwarinê heye, hûn nizanin». ³³ Şagirtan ji hevdu pirsî: «Gelo kesekî bona wî xurek anîye?»

³⁴ Îsa gote wan: «Xurekê min ew e, ku daxaza ewî ez şandime bikim û k'arên wî bînime sêrî. ³⁵ Gelo hûn xwexa nabêjin: «Heta nandirûnê hê çar meh hene»? Va ye, ez wer'a dibêjim, ç'evên xwe bilind kin, zevîyan binihêrin, ew çawa zer bûne, hazir ber dirûnê ne! ³⁶ Yê didirû maşê xwe distîne û bona jîyîna heta-ha-tê ber t'op dike, ku yê diçîne û yê didirû bi hevr'a şa bin. ³⁷ Li vir ev gotin rast e, ku: «Yek diçîne, yekî din didirû». ³⁸ Min hûn şandin, ku wê bidirûn, li ser çi hûn nexebitîne, hinekên din xebitîn, lê we berê wê xebatê hilda».

³⁹ Gelek samerîyên ji wî bajarî bona gotina wê k'ulfetê bawerîya xwe Îsa anîn, ku digot: «Her tiştên ku min kiribûn, minr'a got». ⁴⁰ Û çaxê samerî hatine cem wî, lava ji wî kirin, ku ew li cem wan bimîne. Ew jî du rojan li wir ma. ⁴¹ Gelekan bona wê xebardana wî, bawerîya xwe li wî anîn ⁴² û digotîne wê k'ulfetê: «Em îdî ne ku bi gotina te bawer dikin, lê me xwexa bihîst û em dizanin, ku rast ev e Rizgarkirê dinyayê».

ÎSA KUR'Ê XIZMETK'AREKÎ QENC DIKE

⁴³ Pey van her du rojanr'a ew ji wir rabû çû Celîlê. ⁴⁴ Îsa xwexa şehdetî dabû, ku rûmeta p'êxember cî-miskenê wîda t'une. ⁴⁵ Gava ew hate Celîlê, celîliyan ew qebûl kir, çimkî ewana jî bona Cejîna Derbazbûnê çûbûne Orşelîmê û tiştên ku ewî kiribûn dîtibûn.

⁴⁶ Îsa dîsa çû Qanaya Celîlê, li k'u av kiribû şerab. Wê derê xizmetk'arekî rewşxanê hebû, ku kur'ê wî li Kefernahûmê nexaş bû. ⁴⁷ Gava wî bihîst, ku Îsa ji Cihûstanê hatye Celîlê, hate cem wî û lava jê kir, ku her'e Kefernahûmê kur'ê wîyî ber mirinê qenc bike. ⁴⁸ Îsa gote wî: «Heta ku hûn nîşan û k'iryametan nebînin, qet bawer nakin». ⁴⁹ Xizmetk'arê rewşxanê gote wî: «Ez xulam, were em her'in, hela hê kur'ê min nemirye». ⁵⁰ Îsa lê vegerand got: «Her'e, kur'ê te silamet e». Wî merivî jî bawerîya xwe wê gotina Îsa anî û çû. ⁵¹ Ew hê rêda bû, xulamên wî pêşîya wîda hatin ç'evronahî danê û gotin: «Kur'ê te silamet e». ⁵² Ewî ji xulamên xwe pirsî: «K'îjan sihetêda ew berbi qencbûnê çû»? Wana gotê: «Duhu pey nîvrora, siheta yekê germê jê berda». ⁵³ Hingê bavê kur'îk fem kir, ku ew *hema* ew sihet bû, çaxê Îsa jêr'a got: «Kur'ê te silamet e». Û aha wî û t'emamîya kesên mala wî bawer kirin. ⁵⁴ Eva nîşana dudan bû, ku Îsa kir, çaxê ji Cihûstanê hate Celîlê.

ÎSA NEXAŞÊ SÎ Û HEYŞT SALAN QENC DIKE

5 ¹ Pey vê yekêr'a cejîneke cihûyan hat û Îsa hevraz çû Orşelîmê. ² Orşelîmêda, li ber «Dergehê Pêz» hewzek hebû, ku bi îbranî wêr'a digotin Beythasta, pênc hêwangehên wê hebûn. ³ Wan hêwangehanda gelek nexaş p'aldayî bûn: Yê kor, şilûşet û k'ût. ⁴ Evana hîvîya hev'etina avê bûn, çimkî milyak'etekî Xudan dem-demî dihate hewzê û av li hev dixist. Û pey hev'etina avêr'a, k'ê berî hemûyan bik'eta avê, ew ji nexaşıya xwe qenc dibû. ⁵ Merivek li wir hebû, ku nexaşê sî heyşt salan bû. ⁶ Îsa gava ew li wir p'aldayî dît û dizanibû jî, ku ew zûva nexaş e, gote wî: «Tu dixazî qenc bî»? ⁷ Yê nexaş lê vegerand got: «Ez xulam, kesekî min t'une, ku çaxê av li hev dik'eve, min bavêje hewz. heta ku ez xwe dilipitînim, yekî din berî min xwe davêjê». ⁸ Îsa gote wî: «Rabe ber'a xwe hilde û biger'e». ⁹ Pêr'a-pêr'a ew meriv qenc bû, ber'a xwe hilda û ger'ya. Û ew roj şemî bû. ¹⁰ Hingê cihûyan gote wî merivê qencbûyî: «Îro şemî ye! Bi *Qanûnê* destûr nîne, ku tu ber'a xwe hildî». ¹¹ Ewî li wan vegerand got: «K'ê ez qenc kirim ewî minr'a got: «Ber'a xwe hilde û biger'e». ¹² Wana jê pirsî: «Ew k'î bû, ku gote te: «Ber'a xwe hilde û biger'e»?» ¹³ Lê yê qencbûyî nizanibû ew k'î bû, çimkî Îsa xwe nava k'oma merivanda betavekir. ¹⁴ Pey vê yekêr'a Îsa ew p'aristxanêda dît û gote wî: «Binihêre, tu qenc bûyî! Îdî gunehan neke, ku tişteki hê xirab neyê serê te».

¹⁵ Ew meriv çû cihûyanr'a gilî kir, ku yê ew qenc kirye Îsa ye. ¹⁶ Bona vê yekê îdî cihû pey Îsa k'etin, çimkî wî ev tişt roja şemîyê dikirin. ¹⁷ Hingê Îsa li wan vegerand got: «Bavê min heta niha dixebite, ez jî dixebitim». ¹⁸ Lema cihû hê dişewrîn, ku wî bikujin, çimkî wî ne t'enê roja şemîyê t'eribandibû, lê Xwedê kiribû bavê xwe û xwe weke Xwedê girtibû.

HIKUMÊ ÎSAYE JI XWEDÊDA

¹⁹ Lema Îsa gote wan: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, Kur' nikare xweserîxwe tişteki bike, pêştirî wan tiştên ku ew dibîne, çi ku Bav dike, ew jî dike. Bav çi dike, Kur' jî usa dike. ²⁰ Çimkî Bav Kur' hiz dike û her tiştên ku ew dike nîşanî Kur' dike. Ewê tiştên hê mezin nîşanî wî bike û hûnê ecêb bimînin. ²¹ Çawa ku Bav dikare mirîyan zêndî ke û jîyîne bide wan, usa jî Kur' dikare k'îjanan ew dixaze, jîyîne bide wan. ²² Serda jî Bav dîwana t'u kesî nake, lê hemû hikumê dîwankirinê daye Kur', ²³ ku hemû hurmeta Kur' bigirin, çawa hurmeta Bavê digirin. Yê bona Kur' hurmetê nake, ew hurmetê Bavêr'a jî nake, yê ku ew şandye.

²⁴ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, her k'ê ku guh bide gotinên min û bawerîya xwe ewî ez şandime bîne, jîyîna wîye heta-ha-tê heye û dîwana wî nayê kirinê, lê ew ji mirinê derbazî jîyîne bûye. ²⁵ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, waxt tê û pêr'a gihîştîye jî, ku mirî wê dengê Kur'ê Xwedê bibihên û ewên ku bibihên wê bijîn. ²⁶ Çimkî çawa nava Bavêda jîyîndarî heye, usa jî ewî ew yek kir, ku li nava Kur'da jî jîyîndarî hebe. ²⁷ Wî hikumê dîwankirinê jî da wî, çimkî ew Kur'ê Meriv e. ²⁸ Ser vê yekê ecêb nemînin, çimkî waxt nêzik dibe, ku hemûyên gor'anda wê dengê wî bibihên. ²⁹ Yê qencî kirine wê bona jîyîne zêndî bin, lê yê xirabî kirine bona dîwanê.

³⁰ Ez bi xwe nikarim tiştêkî bikim. Çawa dibihêm, usa dîwanê dikim. Dîwana ez dikim rast e, çimkî ne ku daxaza xwe diger'im, lê daxaza ewî ez şandime. ³¹ Heger ez bona xwe şehdetîyê bidim, şehdetîya min ne rast e. ³² Lê yekî din heye, ku bona min şehdetîyê dide û ez dizanim ew şehdetîya ku ew bona min dide rast e. ³³ We meriv şandine cem Yûhenna û wî şehdetîya rastîyê da. ³⁴ Lê ez ne hewcê şehdetîya mêriv im, ez van tiştan dibêjim, ku hûn rizgar bin. ³⁵ Yûhenna ç'irakî vêk'etî bû, ku ronahî dida. We xast hinek waxt bi ronaya wî şa bin. ³⁶ Lê şehdetîke din bona min heye, ku ser şehdetîya Yûhennar'a ye. Çimkî ew k'arên ku Bavê spartine min, ku wan bînimê sêrî, hema ew k'arên ez dikim şehdetîya min didin, ku Bavê ez şandime. ³⁷ Û Bavê ku ez şandime, ewî xwexa bona min şehdetî daye. We t'u car ne dengê wî bihîstîye, ne rûyê wî dîtye ³⁸ û ne jî xebera wî dilê weda dimîne, çimkî hûn wî bawer nakin, k'îjan ku Bavê şandyê. ³⁹ Hûn nivîsaran vek'olin, çimkî bi ya we, bi wan jîyîna weye heta-ha-tê heye. Û hema ew nivîsar bi xwe şehdetîya min didin. ⁴⁰ Lê hûn naxazin bêne cem min, ku jîyîna we hebe.

⁴¹ Ez ne hîvîyê me, ku meriv pesinê min bidin, ⁴² lê we nas dikim û dizanim, ku dilê weda hizkirina Xwedê t'üne. ⁴³ Ez bi navê Bavê xwe hatim û hûn min qebûl nakin. Lê heger yekî din bi navê xwe bê, hûnê wî qebûl kin. ⁴⁴ Hûnê çawa bikaribin min bawer bikin, heger rûmeta navê xwe hûn ji hevdu diger'in, lê ew rûmeta ku ji Xwedêyî bêhimber e nager'in? ⁴⁵ Nefikirin ku ezê li ber Bavê we neheq kim. Yek heye, ku we neheq dike, ew hema ew Mûsa ye, yê ku we gumana xwe danîye ser. ⁴⁶ Heger we Mûsa bawer bikira, weyê ez jî bawer bikirama, çimkî ewî bona min nivîsîye. ⁴⁷ Lê heger hûn bawerîya xwe nivîsarên wî naynin, hûnê çawa gotinên min bawer bikin?

ÎSA PÊNC HEZAR MERIVAN T'ÊR DIKE
(Metta 14:13-21; Marqos 6:30-44; Lûqa 9:10-17)

6 ¹ Pey vê yekêra Îsa derbazî wî berî gola Celîlê, awa gotî, gola Teberîyayê bû. ² K'omeke merivane giran li pey wî diçû, çimkî wana ew k'iryamet dîtibûn, yê ku wî li ser nexaşan kiribûn. ³ Îsa rabû ser ç'îyê û li wir t'evî şagirtên xwe rûnişt. ⁴ Cejina cihûyane Derbazbûnê nêzik bû.

⁵ Gava Îsa li dora xwe nihêrî, dît k'omeke merivane giran berbi wî tê, wî gote Fîlîpo: «Emê nan ji k'u bik'ir'in, ku ev meriv bixwin?» ⁶ Wî ev got, ku wî bicêribîne, çimkî wî xwexa dizanibû wê çî bikira. ⁷ Fîlîpo lê vegerand got: «Bahê dusid zîvî nan jî t'êra van nake, hema ku her yekîra parîk jî bik'eve!» ⁸ Ji şagirtan yekî, Endrawisê birê Şimhûn-Petrûs gotê: ⁹ «Vir xortek heye, ku pênc nanên wîye ceh û du mesîyên wî hene. Lê bona haqas merivan ev çî ye?»

¹⁰ Îsa got: «Merivan li erdê bidine rûniştandinê». Li wir şînayî gelek bû, ew mêrên ku rûniştin, weke pênc hezaran bûn. ¹¹ Hingê Îsa ew nan hildan şikirî da û belayî yê rûniştî kirin. Û aha jî mesî bela kirin, çiqas ku wan xast. ¹² Û gava t'êr xwarin, ewî gote şagirtên xwe: «Wan hûrikên bermayî bidine hev, ku t'u tişt dêris nebe». ¹³ Şagirtan jî ew dane hev û ji ber ewên ku pênc nanên ceh xwaribûn, donzdeh sele hûrikên bermayî t'ije kirin.

¹⁴ Gava van merivan dît ku Îsa eva nîşana kir, gotin: «Rast ev e ew p'êxemberê ku wê bihata dinyayê!» ¹⁵ Hingê Îsa pê hesya, ku ewana wê bîn û bi destê zorê wî bibin, ku bikine p'adşa, dîsa ew t'enê rabû ç'îyê.

ÎSA PEYA LI SER AVÊR'A DIÇE
(Metta 14:22-27; Marqos 6:45-52)

¹⁶ Berî êvarê, şagirtên wî dak'etine devê golê. ¹⁷ K'etine qeyikekê û rê k'etin, ku derbazî Kefernahûmê bin, wî berî golê. Îdî tarî k'etibû erdê, lê Îsa hê xwe wanr'a negîhandibû. ¹⁸ Firtoneke qayîm rabû, golê da ber pêlan. ¹⁹ Gava wan bêr k'işandin û qasî pênc-şeş kilomêtiran pêşda çûn, wan dît wê Îsa peya ser golêr'a tê nêzikî qeyikê dibe. Saw û tîrsê ew girtin, ²⁰ lê Îsa gote wan: «Netirsin, ez im!» ²¹ Hingê wan xast wî hildine qeyikê. Qeyik pêr'a-pêr'a gihîşte wî alîyê ku wan dixast biçûnayê.

²² Roja din ew k'oma merivane ku li wî berî golê mabû, dizanibû, ku li wir, alîyê wan t'enê qeyikek hebû, ew jî şagirtên wî t'enê k'etibûnê derbaz bibûn, lê Îsa nek'etibû wê qeyikê. ²³ Ji alîyê Teberîyayê hinek qeyikên din hatin nêzikî wir bûn, wê dera ku pey şikirdarîya Xudanr'a nan xwaribûn. ²⁴ Gava merivan dît, ku ne Îsa li wir e û ne jî şagirtên wî, hingê ew xwexa jî k'etine qeyikan û çûne Kefernahûmê, ku Îsa biger'in.

ÎSA YE NANÊ JÎYÎNA HETA-HA-TÊ

²⁵ Gava wana Îsa li wî berî golê dît, gotine wî: «Dersdar, tu çiçax hatî vê derê?» ²⁶ Îsa li wan vegerand got: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, hûn min ne ku bona wê yekê diger'in, ku we nîşan dîtine, lê bona wê yekê, ku we ji wî nanî xwar û t'êr bûn. ²⁷ Ne ku bona wê xureka ku dêris dibe bixebitin, lê bona wê xureka, ya ku jîyîna heta-ha-têda dimîne, ewê ku Kur'ê Meriv wê bide we, çimkî Bav Xwedê mora xwe danîye ser wî».

²⁸ Wê demê wan jê pîrsî: «Em çî gerekê bikin, ku k'arê *daxaza* Xwedê bikin?» ²⁹ Îsa li wan vegerand got: «K'arê

Xwedê ev e, ku hûn bawerîya xwe wî bînin, yê ku ji alîyê wîda hatye şandinê». ³⁰ Wana gote wî: «Ku usa ye, tuê çi nîşanê bikî, ku em bibînin û bawerîya xwe te bînin? Tuê çi k'arî bikî? ³¹ Kal û bavên me ber'îyêda mana xwarin, çawa hatye nivîsarê: <Wî ji ezmên nan bona xwarina wan da>».*

³² Îsa gote wan: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, yê ji ezmên nan da we, ew ne ku Mûsa bû, lê Bavê min. Belê, ew wî nanê ezmanîye rast dide we! ³³ Çimkî ew nanê Xwedê dide ew e, ku ji ezmên tê xwarê û jîyînê dide dinyayê».

³⁴ Wan lê veğerand got: «Em xulam, de her dem vî nanî bide me».

³⁵ Îsa gote wan: «Ez im nanê jîyînê. Her k'ê ku bê cem min, ew qet birçî nabe û her k'ê ku min bawer bike, qet t'î nabe. ³⁶ Lê çawa min wer'a got, we ez dîtîm jî, lê hûn hê bawer nakin. ³⁷ Ew hemûyên ku Bav dide min, wê bêne cem min û her k'ê ku bê cem min, ez wî t'u car dernaxim. ³⁸ Çimkî ez ji ezmên hatime xwarê, ne ku daxaza xwe bikim, lê daxaza ewî ez şandime. ³⁹ Daxaza ewî ez şandime ev e, ku ez ji hemûyên ku wî dane min t'u kesî unda nekim, lê Roja Axretêda wan ji mirinê zêndî kim. ⁴⁰ Çimkî daxaza Bavê min ev e, her k'ê ku Kur' bibîne û wî bawer bike, jîyîna wîye heta-ha-tê hebe. Û Roja Axretêda jî ezê wî ji mirinê zêndî kim».

⁴¹ Cihûyan hindava wîda bîna xwe teng kirin, çimkî wî got: «Nanê ku ji ezmên hate xwarê ez im». ⁴² Û digotin: «Ne eva Îsayê kur'ê Ûsiv e? Em dê û bavê wî nas dikin. Îdî eva çawa dibêje: <Ez ji ezmên hatime xwarê>?»

⁴³ Îsa cab da û gote wan: «Nava hevda nekine p'iste-p'ist. ⁴⁴ T'u kes nikare bê cem min, heta ku Bavê ez şandime, wî nek'îşîne berbi min. Û Roja Axretê ezê wî ji mirinê zêndî kim. ⁴⁵ Kitêbên p'êxemberanda hatye nivîsarê: <Hemû wê ji Xwedêda hînbûyî bin>.† Her k'ê ku ji Bav bibihê û hîn be wê bê cem min. ⁴⁶ T'u kesî Bav nedîtye. Ewê ku ji Xwedê ye, t'enê wî Bav dîtye. ⁴⁷ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, ewê ku bawer dike jîyîna wîye heta-ha-tê heye. ⁴⁸ Ez im nanê jîyînê. ⁴⁹ Kal û bavên we ber'îyêda mana xwarin, lê mirin. ⁵⁰ Ev e ew nanê ku ji ezmên hatye xwarê, ku her kesê jê bixwe namire. ⁵¹ Ez im nanê jîyînê, ku ji ezmên hatime xwarê. K'î ji vî nanî bixwe, wê heta-ha-tê bijî. Ew nanê ku ezê bona jîyîna dinyayê bidim, ew bedena min e».

⁵² Ser vê yekê cihû hevr'a k'etine de'wê û gotin: «Evî han çawa dikare bedena xwe bide me, ku em bixwin»? ⁵³ Hingê Îsa gote wan: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, heta hûn bedena Kur'ê Meriv nexwin û xûna wî venexwin, jîyînê nava weda t'unebe. ⁵⁴ Ewê ku bedena min bixwe û xûna min vexwe, wê jîyîna wîye heta-ha-tê hebe û ezê Roja Axretê wî ji mirinê zêndî kim. ⁵⁵ Çimkî bedena min e xwarina rast û xûna min jî vexwarina rast. ⁵⁶ Yê ku bedena min dixwe û xûna min vedixwe, nava minda dimîne, ez jî nava wîda. ⁵⁷ Çawa Bavê zêndî ez şandim û bi destê Bavê ez zêndî me, aha jî k'ê ku min bixwe, wê bi destê min zêndî bimîne. ⁵⁸ Ev e, ew nanê ku ji ezmên hatye xwarê. Ev ne mîna wî manayî ye, ku kal û bavên we xwarin, lê mirin. Ewê ku vî nanî bixwe, wê heta-ha-tê bijî».

⁵⁹ Îsa ev xeber k'inîştêda gotin, çaxê wî Kefernahûmêda hîn dikir. ⁶⁰ Ji şagirtên wî gelek gava ev xeber bihîstin, gotin: «Ev çi xeberne giran in! K'î dikare guhdarîya gotinên wî bike»? ⁶¹ Lê Îsava vebû, ku şagirt li ser vê yekê nava hevda bîna xwe teng dikin, gote wan: «Ev yek we p'îşk dike? ⁶² Lê hûnê hingê çi bêjin, heger bibînin Kur'ê Meriv radişe wir~ çiyê ku berê lê bû? ⁶³ Ruh jîyînê dide, t'u qazınca bedenê t'une. Ew gotinên ku min wer'a gotin, ruh û jîyîn in. ⁶⁴ Lê nava weda hinek hene bawer nakin». Îsa hê serê-sêrîda dizanibû k'î bawer nake û k'î ye ewî ku wê nemamîya wî bike. ⁶⁵ Û wî got: «Lema min wer'a got: T'u kes nikare bê cem min, heta ku ew yek ji alîyê Bavêda wîr'a nehatibe dayîne».

⁶⁶ Bona vê yekê ji şagirtên wî gelek paşda çûn û îdî t'evî wî nediger'yan. ⁶⁷ Hingê Îsa ji her donzdehan pirsî: «Xa hûn jî naxazin her'in»? ⁶⁸ Şimhûn-Petrûs lê veğerand got: «Xudan, emê her'ine cem k'ê? Gotinên jîyîna heta-ha-tê cem te ne. ⁶⁹ Me bawer kirye û em dizanin, ku tu yî Pîrozê Xwedê». ⁷⁰ Îsa li wan veğerand got: «Gelo min hûn her donzdeh ne hilbijartin? Lê yekî ji nava we şeytan e». ⁷¹ Ewî ev yek bona Cihûdayê kur'ê Şimhûnê Îsxeryotî digot, çimkî rast e ew yekî ji her donzdehan bû, lê dîsa wê nemamîya Îsa bikira.

ÎSA Û BIRAYÊN WÎ

7 ¹ Pey vê yekêr'a Îsa Celîlêda diger'ya. Wî nedixast Cihûstanêda biger'ya, çimkî cihû pey wî k'etibûn, ku ew bikuştana. ² Gava Cejina cihûyane «Obe-çêkirinê» nêzik bû, ³ birayên wî gotinê: «Ji vir rabe her'e Cihûstanê, ku şagirtên te ew kirinên ku tu dikî bibînin. ⁴ Çimkî merivê ku dixaze aşkere xwe bide naskirinê, kirinên xwe venaşêre. Heger tu xweyê van kirinan î, xwe dinyayêva bide naskirinê». ⁵ Birayên wî jî bawerîya xwe wî nedanîn. ⁶ Îsa gote wan: «Waxtê min hê nehatye, lê waxtê we t'im hazir e. ⁷ Dinya nikare bibe neyarê we, lê neyarê min e, çimkî ez şehdetîyê didim, ku kirinên wê xirab in. ⁸ Hûn hevraz her'ine vê cejinê, lê ez hê nayême vê cejinê, çimkî waxtê min hê ne t'emam e».

⁹ Îsa ew yek gote wan û li Celîlêda ma. ¹⁰ Lê gava birayên wî hevraz çûne cejinê, ew jî rabû çû wir, lê ne ku aşkere, lê dizîva. ¹¹ Hingê cihû cejinêda li wî diger'yan û digotin: «Ew k'anê ye»? ¹² Nav k'oma merivanda bona wî gelek xeberdan diçû. Hinekan digot: «Ew merivekî qenc e», hinekan jî digot: «Na, ew cimetê ji rê derdixe». ¹³ Lê ji tîrsa cihûyan, t'u kesî aşkere bona wî newêrbû tişteq bigota. ¹⁴ Lê nîvê cejinêda Îsa hevraz çû k'ete p'aristxanê û dest bi hînkirinê kir. ¹⁵ Cihû ecêb diman û digotin: «Ev nexandî ye, çawa haqas nivîsaran dizane»? ¹⁶ Îsa li wan veğerand got: «Hînkirina min ne ji min e, lê ji wî, yê ez şandime. ¹⁷ Heger merivek bixaze

* 6:31 Derk'etin 16:4; Zebûr 78:24.

† 6:45 Îşaya 54:13.

daxaza wî pêk bîne, wê hingê bizanibe, gelo ev hînkirina min ji Xwedê ye yan ez xweserîxwe xeber didim. ¹⁸ Yê xweserîxwe xeber dide, ew navê xwe diger'e, lê ewê ku navê yê ew şandye diger'e, ew yekî rast e û li cem wî qelpî t'une. ¹⁹ Ê ne Mûsa Qanûn da we? Û ji we t'u kes jî Qanûnê naqedîne. Çima hûn dixazin min bikujin?» ²⁰ Cimetê lê vegerand got: «Tu cinak'etî yî! K'î dixaze te bikuje?» ²¹ Îsa li wan vegerand got: «Min kirek kir û hûn hemû jî ecêb mane. ²² Mûsa sinetkirin da we, (lê ew ne ku ji Mûsa hat, lê ji kal-bavan) û hûn roja şemîyê mêriv sinet dikin. ²³ Heger hûn roja şemîyê jî zar'okan sinet dikin, ku Qanûna Mûsa net'eribe, îdî çima hêrsa xwe ser min radikin, ku min roja şemîyêda merivek pêda-pêda qenc kir?» ²⁴ Anegorî dîtina ç'evan dîwanê nekin, lê anegorî rastîyê dîwanê bikin».

²⁵ Hingê hinekên ji Orşelîmê gotin: «Eva ne ew e, ku dixastin ew bikuştana?» ²⁶ Û va ye ew aşkere xeber dide û t'u kes jî tiştêkî nabêje wî. Dibe ku mîr pê hesyane, ku rast eva Mesîh e? ²⁷ Lê rast em dizanin eva ji k'u ye. Lê çaxê Mesîh bê, t'u kes wê nizanibe ew ji k'u ye».

²⁸ Hingê Îsa p'aristxanêda waxtê hînkirinê bi dengê bilind got: «Hûn min nas dikin û zanin ez ji k'u me? Ez xweserîxwe nehatime. Yê ez şandime, ew ser rastîyê ye, hûn jî wî nas nakin. ²⁹ Ez wî nas dikim, çimkî ez ji wî me û ewî ez şandime».

³⁰ Hingê xastin wî bigirin, lê t'u kesî nikaribû ew bigirta, çimkî waxtê wî hê nehatibû. ³¹ Lê ji k'oma merivan gelek bawerîya xwe wî anî û gotin: «Çaxê Mesîh bê, ji kirinên vî zêdetir wê nîşanan bike?»

³² Fêrisîyan ji nava cimetê ew p'iste-p'ista derheqa wîda bihîst û serokên k'ahînan xizmetk'ar şandin, ku wî bigirin. ³³ Îsa got: «Ezê hinek waxt jî t'evî we bimînim, paşê her'ime cem ewî ez şandime. ³⁴ Hûnê min biger'in, lê nabînin. Cîyê ezê lê bimînim, hûn nikarin bîn». ³⁵ Hingê cihûyan gotine hevdu: «Ev merivê k'uda her'e, ku em wî nebînin? Qey nêta wî heye her'e nava cimeta meye ku li nav yûnananda bela bûye û yûnanan hîn bike?» ³⁶ Ev çî xebardan e ew dike: «Hûnê min biger'in, lê nebînin, cîyê ezê lê bimînim, hûnê nikaribin bîn»?

Ç'EMÊN AVA JÛYÎNÊ

³⁷ Roja xilazîyê, roja cejinêye here k'ifş, Îsa sekinî û bi dengêkî bilind got: «Heger yek t'î ye, bira bê cem min û vexwe. ³⁸ Ewê min bawer bike, çawa ku nivîsar dibêje: «Wê ji nav-dilê wî ç'emên ava jÛyîne biherikin». ³⁹ Îsa ev xeber bona wî Ruhê Pîroz got, k'îjan wê bawermendên wî bîstandana. Û Ruhê Pîroz hê nehatibû dayîne, çimkî Îsa hê nehatibû rûmetkirinê.

⁴⁰ Gava wana ev gotin bihîst, hinekên ji k'oma merivan gotin: «Rastî jî eva ew p'êxember e». ⁴¹ Hinekan jî got: «Eva Mesîh e», lê hinekên din jî gotin: «Çima Mesîh wê ji Celîlê bê?» ⁴² Ê ne nivîsar dibêje, ku Mesîh wê ji nisilê Dawid û ji gundê Dawid bê~ ji Beytlehmê?» ⁴³ Û aha bona wî li nav k'oma merivanda dutîretî çê bû. ⁴⁴ Hinekên ji wan xastin ew bigirtana, lê t'u kesî dest neda wî.

⁴⁵ Awa xizmetk'ar vegeryane cem fêrisî û serokên k'ahînan. Wana pirsî: «We çima ew neanî?» ⁴⁶ Xizmetk'aran li wan vegerand got: «T'u kesî t'u car mîna wî merivî xeber nedaye!» ⁴⁷ Hingê fêrisîyan li wan vegerand got: «Ewî îdî serê we jî t'ije kirye?» ⁴⁸ Ji mîr û fêrisîyan qet t'u kesî bawerîya xwe jê anîye? ⁴⁹ Pêştîrî vê cimeta reben, ku Qanûnê nîzane û nîfir lê ye». ⁵⁰ Nîkodêmo~ ewî ku hê pêşda çûbû cem Îsa û ji fêrisîyan bû gote wan: ⁵¹ «Gelo Qanûna me dîwana mêriv dike, heta ku guhdarîya wî neke û nizanibe ew çî dike?» ⁵² Li wî vegerandin û gotin: «Xa tu jî ne ji Celîlê yî? K'ûr lê binihêre û tuê bibînî, ku ji Celîlê t'u p'êxember dernak'evin». ⁵³ Û her kes çû mala xwe.

LI JINEKE GUNEHK'AR TÊ BAXŞANDINÊ

8 ¹ Îsa jî çû ç'îyayê Zeytûnê. ² Serê sibehê zû ew dîsa vegerya p'aristxanê, t'emamîya cimetê hate cem wî. Ew rûnişt û destpê kir ew hîn kirin. ³ Qanûnzana û fêrisîyan jineke ku zinêkirinêda hatibû girtinê anîn û li ber hemûyan dane sekinandinê. ⁴ Wana gotine wî: «Dersdar, ev k'ulfet li dema zinêkirinê hate girtinê. ⁵ Qanûnêda Mûsa t'emî daye me, ku em yê aha bidine ber keviran. Awa tu çî dibêjî?» ⁶ Bi vê gotinê ew dicêribandin, ku bikaribin wî neheq derxin. Lê Îsa qûz bû û bi t'ilîya xwe li ser erdê nivîsî. ⁷ Lê gava wan bêmolet jê dipirsîn, ewî serê xwe bilind kir û gote wan: «Nava weda k'î bêguneh e, bira kevirê pêşin ew bavêje wê». ⁸ Û dîsa serê xwe qûz kir û bi t'ilîya xwe ser erdê nivîsî. ⁹ Wana ku ev yek bihîst, ji mezinan girtî yek-yek derk'etin. Îsa t'enê ma û ew k'ulfet jî li wir sekinî mabû. ¹⁰ Îsa serê xwe bilind kir û gote wê: «Evdê, ew k'anê ne? T'u kesî dîwana te nekir?» ¹¹ Ewê gotê: «T'u kes nema, Xudan!» Îsa got: «Ez jî dîwana te nakim. Her'e û îdî ji vir hada gunehan neke».

RONAYA JÛYÎNÊ

¹² Îsa dîsa wanr'a xeber da û got: «Ez im ronaya dinyayê. K'ê pey min bê, wê t'u car tarîyêda neger'e, lê ronaya wîye jÛyîne wê hebe». ¹³ Fêrisîyan lê vegerand got: «Şehdetîyê tu bona xwe didî, şehdetîya te ne rast e». ¹⁴ Îsa caba wana da û got: «Heger ez xwexa şehdetîyê bona xwe didim, şehdetîya min rast e, çimkî ez dizanim ji k'u hatime û k'uda diçim. Lê hûn nizanin ez ji k'u t'em yan k'uda diçim. ¹⁵ Hûn li gora dîtina ç'evan dîwanê dikin, lê ez dîwana t'u kesî nakim. ¹⁶ Heger dîwanê bikim jî, dîwana min rast e, çimkî ez ne t'enê me, ez û Bav~ yê ku ez şandime, em t'evayî ne. ¹⁷ Qanûna weda jî nivîsar e, ku şehdetîya du merivan rast e. ¹⁸ Ez bona xwe şehdetîyê didim û bona min Bavê ku ez şandime jî şehdetîyê dide».

¹⁹ Hingê wan jê pirsî: «K'anê ye bavê te?» Îsa li wan vegerand got: «Hûn ne min nas dikin, ne jî Bavê min.

Heger we ez nas bikirama, weyê Bavê min jî nas bikira». ²⁰ Îsa ev xeber p'aristxanêda li dema hînkirina xwe gotin, li wê odêda, li k'u p'êşkêş dihatine t'opkirinê, lê t'u kesî ew negirt, çimkî waxtê wî hê nehatibû.

YÊ ÎSA BAWER NAKE WÊ NAVA GUNEHÊN BIMIRE

²¹ Wî dîsa gote wan: «Ez diçim, hûnê min biger'in û nava gunehên xweda hûnê bimirin. Wê dera ku ezê her'imê hûn nikarin bîn». ²² Ser vê yekê cihûyan got: «Gelo evê xwe bikuje, ku dibêje: <Wê dera ku ezê her'imê hûn nikarin bîn>?»

²³ Îsa gote wan: «Hûn ji vê jêrê ne, ez ji jorê me, hûn ji vê dinyayê ne, lê ez ne ji vê dinyayê me. ²⁴ Lema min wer'a got, ku hûnê nava gunehên xweda bimirin. Heger hûn bawer nekin ku ew EZ IM,^{*} hûnê nava gunehên xweda bimirin». ²⁵ Hingê pirs dane wî: «Tu k'î yî»? Îsa gote wan: «Ez ew im, ku hê serê-sêrîda wer'a dibêjim. ²⁶ Gelek tişt hene ku derheqa weda bêjim û dîwana we bikim. Lê yê ez şandime ser rastîyê ye û min çî ji wî bihîstye, dinyayêra wê dibêjim».

²⁷ Wana gotina wî fem nekir, ku ewî bona Bavê wanr'a got. ²⁸ Hingê Îsa gote wan: «Çiçax hûn Kur'ê Meriv bilind kin, hingê hûnê bizanibin ku EZ EW IM û min qet t'u tişt xweserîxwe nekiryê, lê çawa Bavê ez hîn kirime, usa xeber didim. ²⁹ Ê yê ez şandime t'evî min e û ewî ez t'enê nehiştîme, çimkî ez her gav k'arên ku wî xaş tên dikim». ³⁰ Gava Îsa aha xeber da, gelek merivan bawerîya xwe wî anî.

RASTÎ MÊRIV AZA DIKE

³¹ Hingê Îsa wan cihûyanr'a, yên ku bawerîya xwe wî anîn got: «Heger hûn nava hînkirina minda bimînin, hûnê rast şagirtên min bin. ³² Hûnê rastîyê nas bikin û rastî wê we aza bike». ³³ Wana lê vegerand got: «Em ji nisilê Îbrahîm in û t'u car me xulamî t'u kesîra nekiryê. Tu çawa dibêjî: <Hûnê aza bin>?»

³⁴ Îsa li wan vegerand got: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, her k'ê ku guneh dike, ew xulamê guneh e. ³⁵ Xulam heta-ha-tê malêda namîne, lê kur' heta-ha-tê dimîne. ³⁶ Awa heger Kur' we aza bike, hûnê rast aza bin. ³⁷ Ez dizanim ku hûn ji nisilê Îbrahîm in, lê hûn dixazin min bikuji, çimkî xeberên min dilê weda cî nagirin. ³⁸ Min çî cem Bavê xwe dîtye, ez wê dibêjim, we jî çî ji bavê xwe bihîstye, wê yekê dikin».

³⁹ Wana lê vegerand got: «Bavê me Îbrahîm e». Îsa gote wan: «Heger hûn lawên Îbrahîm bûna, weyê kirên Îbrahîm bikirana. ⁴⁰ Lê niha hûn kuştina min dîger'in, merivekî ku ji Xwedê rastî bihîstye û wer'a dibêje. Îbrahîm tiştê aha nekir. ⁴¹ Hûn kirên bavê xwe dikin». Hingê gotine wî: «Em ji rîya zinêk'arîyê dinê nek'etine! Bavekî me heye~ Xwedê». ⁴² Îsa gote wan: «Heger Xwedê Bavê we bûya, weyê ez hiz bikirama, çimkî ez ji cem Xwedê rabûm hatime vir. Ez xweserîxwe ne hatime, lê ewî ez şandime. ⁴³ Çima hûn tiştên ez dibêjim fem nakin? çimkî hûn nikarin gotinên min sebir bikin. ⁴⁴ Hûn bavê xweda ji Şeytan in û dixazin xastinên bavê xwe bînine sêrî. Ew ji serê-sêrîda merivkuj bû û wî qet xwe rastîyê negirtye, çimkî nava wîda rastî t'une. Çaxê ew derew dike, ew heyîntîya xwe dide k'ifşê, çimkî ew derewîn e û bavê derewan e. ⁴⁵ Lê çimkî ez rastîyê dibêjim, hûn min bawer nakin. ⁴⁶ Ji we k'î dikare bona guneh li min hilê? Awa heger rastîyê dibêjim, çima hûn min bawer nakin? ⁴⁷ K'ê ji Xwedê ye, ew gotinên Xwedê dibihê. Hûn gotinên Xwedê ji boy wê yekê nabihên, çimkî hûn ne ji Xwedê ne».

ÎSA Û ÎBRAHÎM

⁴⁸ Cihûyan lê vegerand got: «Çima em rast nabêjin, ku tu samerî yî û nava teda cin heye». ⁴⁹ Îsa wanr'a got: «Nava minda cin t'une. Ez Bavê xwer'a hurmetê dikim, lê hûn min bêhurmet dikin. ⁵⁰ Ez rûmeta navê xwe nager'im, lê yek heye, ku lê dîger'e û serda dinihêre. ⁵¹ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, heger yek gotina min xwey bike, ew qet mirinê nabîne». ⁵² Hingê cihûyan gotine wî: «Îdî em dizanin ku tu çina dik'evî! Îbrahîm jî mir, p'êxember jî mirin û niha tu dibêjî: <Heger yek gotina min xwey bike, qet namire>. ⁵³ Çima tu ji bavê me Îbrahîm çêtir î? Ew mir, p'êxember jî mirin. Tu xwe dewsa k'ê hesab dikî?»

⁵⁴ Îsa cab da: «Heger ez xwexa rûmeta navê xwe bilind kim, rûmeta min ne tiştek e. Ewê ku rûmeta min bilind dike, ew Bavê min e, k'îjanîra hûn dibêjin: <Xwedêyê me ye>. ⁵⁵ Hûn qet wî nas nakin, lê ez wî nas dikim. Heger ez bêjim, ez wî nas nakim, ezê jî mîna we derew derêm, lê ez wî nas dikim û gotina wî xwey dikim. ⁵⁶ Bavê we Îbrahîm heyra wê roja minda bû, wî dît û şa bû». ⁵⁷ Hingê cihûyan gotine wî: «Tu hê pêncî salî t'uneyî! Te Îbrahîm jî dîtye?» ⁵⁸ Îsa gote wan: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, hê berî Îbrahîm EZ HEME». ⁵⁹ Hingê wan kevir hildan, ku bavêjine wî, lê Îsa xwe ji wan vedizî û ji p'aristxanê derk'ete derva çû.

ÎSA Ç'EVÊN YEKÎ JI ZIKMAKÎYÊDA KOR VEDIKE

⁹ ¹ Gava Îsa derbaz dibû, wî merivekî ji zikmakîyêda kor dît. ² Şagirtên wî jê pirsîn: «Dersdar, gunehê k'ê ye, ku eva ji dîya xwe kor bûye? Gunehê wî ye yan yê dê û bavê wî»? ³ Îsa li wan vegerand got: «Ne gunehê wî ye, ne jî yê dê-bavê wî, lê aha bûye, ku kirên Xwedê li ser wî bîne k'ifşê. ⁴ Heta ku roj heye, gerekê ez kirên ewî ez şandime bikim. Şev tê, hingê t'u kesê nikaribe tiştêkî bike. ⁵ Heta ez dinyayêda me, ronaya dinyayê me».

⁶ Ewî ev yek got, t'ûyî erdê kir, ji t'ûkê her'î çê kir, her'î ç'evên wî merivî da ⁷ û gotê: «Her'e hewzê Sîlwamêda

* 8:24 Şirovekirinê bin rêza 8:58-da bixûnin.

† 8:58 Derk'etin 3:13-14 Mûsa ji Xwedê navê wî pirsî. Xwedê got: «EZ IM HEYÎN»
Gotina Îsaye <EZ IM>, fikira wê li gotina Xwedê digire. Usa heyîntîya Îsa Mesîh ya Xwedê bû.

(ku «Şandî» tê femkirinê) rûyê xwe bişo». Ew jî çû rûyê xwe şuşt û bi ç'evên vebûyî vegerya.

⁸ Li vir cîranên wî û ewên berê ew dîtibûn, ku wî p'ars dikir, digotin: «Eva ne ewî kor bû, ku rûniştî p'ars dikir»? ⁹ Hinekan digot: «Eva ew e», hinekan jî digot: «Na, ne ew e, lê rengê wîda ye». Lê wî xwexa digot: «Ez ew im». ¹⁰ Awa jê pirsîn: «Ku usa ye, ç'evên te çawa vebûn»? ¹¹ Wî li wan veğerand got: «Ew merivê ku jêr'a Îsa dibêjin, ewî her'î çê kir, li ç'evên min da û gote min: <Her'e hewzê Sîlwamêda rûyê xwe bişo>. Ez jî çûm, min rûyê xwe şuşt û ç'evên min vebûn». ¹² Wana jê pirsî: «K'a ew k'u ye»? Wî got: «Nizanim».

¹³ Wana ew merivê ku berê kor bû, birine cem fêrisîyan. ¹⁴ Ew roja ku Îsa her'î çê kir û ç'evên wî vekirin, şemî bû. ¹⁵ Fêrisîyan jî jê pirsî, ku çawa ç'evên wî vebûne? Ewî gote wan: «Her'î li ç'evên min da, min rûyê xwe şuşt û niha dibînim». ¹⁶ Hingê hinekên ji fêrisîyan got: «Ev meriv ne ji Xwedê ye, çimkî ew roja şemîyê xweyê nake». Lê hinekan jî digot: «Merivekî gunehk'ar çawa dikare van k'iryametên bike»? Û aha nava wanda bû dutîretî. ¹⁷ Hingê, dîsa gotine ewî ku kor bû: «Tu bona ewî ku ç'evên te vekirin çî dibêjî»? Ewî jî got: «Ew p'êxember e».

¹⁸ Cihûyan bawer nedikir, ku ew *berê* kor bûye û ç'evên wî vebûne, heta ku gazî dê û bavê wî kirin ¹⁹ û ji wan pirsîn: «Ev e ew kur'ê weyî ku we digot, jî zikmakîyêda kor e? Lê ev çawa niha dibîne»? ²⁰ Dê û bavê wî li wan veğerand got: «Em dizanin ku eva kur'ê me ye û ji zikmakîyêda kor bûye. ²¹ Lê ew çawa niha dibîne, em nizanin yan k'ê ç'evên wî vekirine, em wê *yekê* jî nizanin. Ew îdî mezin e, ji wî bipirsîn, bira xwexa caba xwe bide». ²² Dê û bavê wî ji tîrsa cihûyan aha gotin, çimkî cihûyan hê pêşda bi hevr'a qîrar kiribûn: ku <Heger yek bêje, Îsa Mesîh e, ewê ji k'înîştê bê derxistinê>. ²³ Lema dê û bavê wî gotin: «Ew îdî mezin e, ji wî bipirsîn».

²⁴ Awa cara dudan wan gazî merivê ku kor bû kirin û gotinê: «Şikîrîyê bide Xwedê! Em zanin, ku ew meriv gunehk'ar e». ²⁵ Ewî li wan veğerand got: «Ez nizanim ew gunehk'ar e yan na, lê t'enê tiştêkî dizanim, ku ew *berê* kor bûm û niha dibînim». ²⁶ Dîsa ji wî pirsîn: «Ewî t'evî te çî kir? ç'evên te çawa vekirin»? ²⁷ Ewî li wan veğerand got: «Min hinek pêşda gote we, lê we guhdarî nekir. Hûn çima dixazin dîsa bibihên? Dibe ku hûn jî dixazin bibîne şagirtên wî»? ²⁸ Wana ew bêhurmet kir û gotin: «Tu yî şagirtê wî, lê em şagirtên Mûsa ne! ²⁹ Em dizanin, ku Xwedê Mûsara xeber daye, lê bona vî em nizanin ew ji k'u ye!»

³⁰ Evî merivî li wan veğerand got: «Hema ev e ecêba reş, ku hûn nizanin ew ji k'u ye, lê wî ç'evên min vekirin. ³¹ Em dizanin, ku Xwedê dengê gunehk'aran nabihê. Lê heger merivek Xwedêra xizmetîyê dike û daxaza wî pêk tîne, Xwedê dengê wî dibihê. ³² Hê berêda qet t'u caran nehatye bihîstinê, ku yekî ç'evên merivekî ji zikmakîyêda kor vekiribin. ³³ Heger ev meriv ne ji Xwedê bûya, wî nikaribû t'u tişt bikira». ³⁴ Caba wî dan û gotin: «Tu serda-pêda nav gunehanda dinê k'etî û me hîn dikî»? Û ew ji k'înîştê derxistin.

³⁵ Gava Îsa bihîst, ku ew derxistin, çû ew dît û gote wî: «Tu Kur'ê Xwedê bawer dikî»? ³⁶ Ewî pirsî û got: «Ez xulam, ew k'î ye, ku ez wî bawer bikim»? ³⁷ Îsa gotê: «Te ew dît û ew e, yê niha ter'a xeber dide». ³⁸ Ewî got: «Xudan, ez bawer dikim!» û ber wî ta bû. ³⁹ Îsa got: «Ez bona dîwankirinê hatime vê dinyayê, ku yên nabînin bibînin û yên dibînin kor bin».

⁴⁰ Hinekên ji fêrisîyan li wir hizûr, gava ev yek bihîstin, gotine wî: «Çima em jî kor in»? ⁴¹ Îsa gote wan: «Heger hûn kor bûna, gunehê weyê t'unekûna. Lê niha hûn ku dibêjin: <Em dibînin>, didine k'ifşê, ku hûn nava gunehên xweda dimînin».

ŞIVAN Û DERÊ PEZ

10 ¹ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, yê ku dêrîra nak'êve axilê pêz, lê dereke dinra dik'evê, ew diz û t'alank'ar e. ² Lê yê ku dêrîra dik'evê, ew şivanê pêz e. ³ Dergehvan dêrî li ber wî vedike, pez dengê wî dibihên û ew navo-navo gazî pezên xwe dike û wan derdixê derva. ⁴ Çaxê ew pezên xwe hemûyan derdixê, pêşîya wan dik'êve û pez jî li pey wî diçin, çimkî dengê wî nas dikin. ⁵ Pez t'u car pey yê xerîb naçin, lê jê direvin, çimkî dengê yê xerîb nas nakin».

⁶ Îsa ev mesele gote wan, lê wan fem nekir, ku wî çî wanr'a digot.

⁷ Îsa dîsa gote wan: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, ez im derê pêz. ⁸ Ew hemûyên ku berî min hatine diz û t'alank'ar in, lê pêz guhdarîya wan nekiryê. ⁹ Ez im derî. Yê bi destê min bik'êve hindur, wê rizgar be. Ewê bik'êve hindur, derk'êve û ç'êre bibîne. ¹⁰ Diz t'enê bona dizîyê, kuştinê û qir'kirinê tê. Lê ez hatime, ku *bi min* jîyîna wan hebe~ ya here qenc.

¹¹ Ez im şivanê qenc. Şivanê qenc jîyîna xwe bona pezên xwe dide. ¹² Lê yê k'irêgirtî, ku ne şivan e û pez jî ne yên wî ne, gava dibîne gur tê, pêz dihêle direve. Gur jî dik'êve nava pêz p'îre-p'îreyî dike. ¹³ Yê k'irêgirtî direve, çimkî ew bona maşstandinê k'ar dike, heyfa wî pêz nayê. ¹⁴ Ez im şivanê qenc. Ez pezên xwe nas dikim û ew jî min nas dikin û ¹⁵ çawa ku Bav min nas dike, ez jî usa wî nas dikim û jîyîna xwe bona pezên xwe didim. ¹⁶ Pezên mine din jî hene, yên ku ne ji vî axilî ne. Gereke ez wan jî bînim û ewanayê dengê min bibihên û *bi hevr'a* wê bibin kerîk û şivanek. ¹⁷ Bav bona vê yekê min hiz dike, çimkî ez jîyîna xwe didim, ku dîsa wê bistînim. ¹⁸ T'u kes wê *jîyîne* ji min nastîne, lê ez bi xwe wê didim. Hikumê min heye, ku ez wê bidim û hikumê min heye, ku dîsa wê bistînim. Min ev t'emî ji Bavê xwe standyê».

¹⁹ Bona vê xeberdanê dîsa nava cihûyanda bû dutîretî. ²⁰ Ji wan geleşkan digot: «Cin wîda heye, ew dîn e. Çima hûn guhdarîya wî dikin»? ²¹ Hinekên din jî digotin: «Ev xeberdan ne ya cinak'etîyan e. Cin qet dikare ç'evên koran veke?»

²² Hingê li Orşelîmêda Cejina Pîrozkirina P'aristxanê bû û zivistan bû. ²³ Îsa p'aristxanêda li hêwangeha Silêmanda diger'ya. ²⁴ Cihûyan dora wî girt û jê pirsîn: «H'eta çiçax tuê me dudilî bihêlî? Heger tu yî Mesîh, mer'a aşkere bêje!» ²⁵ Îsa li wan vegerand got: «Min wer'a got, lê we bawer nekir. Ew kirinên ku bi navê Bavê xwe dikim, ew bona min şehdetîyê didin, ²⁶ lê hûn bawer nakin, çimkî hûn ne ji pezên min in. ²⁷ Pezên min dengê min dibihên, ez jî wan nas dikim û ew pey min tên. ²⁸ Û ez jîyîna heta-ha-tê didime wan û ew qet unda nabin û t'u kesê wan ji destê min dernexe. ²⁹ Ew Bavê ku ewana dane min, ser her kesîra ye û t'u kes nikare wan ji destê Bavê min derxe. ³⁰ Ez û Bav yek in».

³¹ Wir cihûyan dîsa kevir hildan, ku wî xîn. ³² Îsa gote wan: «Min ji Bavê gelek kirên qenc nîşanî we dan. Hûn bona k'îjan kirî min didine ber keviran?» ³³ Cihûyan lê vegerand got: «Em bona kirên qenc te nadine ber keviran, lê bona k'ifirîyan! Çimkî tu meriv î, lê xwe dikî Xwedê».

³⁴ Îsa li wan vegerand got: «Ê ne Qanûna weda nivîsar e, ku Xwedê got: <Hûn xwedê ne>?» ³⁵ Heger ew wan <xwedê> hesab dike, k'îjananra xebera Xwedê hatye dayînê (û nabe jî ku ew nivîsar p'ûç derê), ³⁶ lê çawa, k'îjan Bavê pîroz kir û şande dinyayê, hûn wîr'a dibêjin: <Tu k'ifirîyan dikî>? Bona wê, ku min got: <Ez Kur'ê Xwedê me>. ³⁷ Heger ez kirên Bavê xwe nakim, min bawer nekin. ³⁸ Lê ku dikim, heger hûn min jî bawer nakin, hema bawerîya xwe wan kirinên ez dikim bînin, ku hûn bizanibin û fem bikin, ku Bav nava minda ye, ez nava wîda». ³⁹ Hingê dîsa xastin wî bigirin, lê Îsa ji destê wan filitî.

⁴⁰ Îsa dîsa derbazî wî alîyê ç'emê Ûrdunê bû û wê derê ma~ wî cîyê ku Yûhenna pêşda dinixamt. ⁴¹ Gelek meriv dihatine cem wî û dilê xweda digotin: «Yûhenna t'u nîşan nekir, lê çi tiştên ku Yûhenna derheqa vî merivîda gotine, her tişt rast derk'etin». ⁴² Û gelek li wir bawerîya xwe Îsa anî.

MIRIN Û ZÊNDÎBÛNA LAZAR

11 ¹ Ji gundê Meryemê û xûşka wê Mertayê~ ji Beytanyayê, merivekî bi navê Lazar hebû, ew nexaş k'et. ² Eva ew Meryem bû, ya ku bi rûnê bînxaş Xudan gulrûn kiribû û nigên wî bi p'or'ê *serê* xwe paqij kiribûn û ew Lazarê nexaş jî birê wê bû. ³ Awa *van* her du xûşkan *meriv* şandine cem Îsa û gotinê: «Xudan, ewî tu wî hiz dikî nexaş e». ⁴ Îsa gava eva yeka bihîst, got: «Eva nexaşîya ne ya mirinê ye, lê bona rûmeta Xwedê ye, ku rûmeta Kur'ê Xwedê bi wê bilind be».

⁵ Îsa Mert'a, xûşka wê û Lazarê birê wan hiz dikirin. ⁶ Lê gava wî bihîst, ku Lazar nexaş e, wî du rojên din jî li wê derê xwe derengî êxist. ⁷ Peyr'a gote şagirtên xwe: «Dîsa em her'ine Cihûstanê». ⁸ Şagirtan gote wî: «Dersdar, cihû va diger'yan, ku tu bidana ber keviran, dîsa tu diçî wir?» ⁹ Îsa li wan vegerand got: «Roj ne donzdeh sihet e? Heger yek rojê biger'e ew nalik'ume, çimkî ronaya vê dinyayê dibîne. ¹⁰ Lê heger yek şevê biger'e, ew dilik'ume, çimkî ronahî pêr'a t'une». ¹¹ Pey vê xeberdanê ewî gote wan: «Lazarê pismamê me k'etye xewê, lê ezê her'im wî hişyar kim». ¹² Şagirtan gote wî: «Xudan, heger ew xewêda ye, wê hişyar be». ¹³ Îsa derheqa mirina wîda digot, lê wan t'irê ew bona razana wî dibêje. ¹⁴ Hingê Îsa aşkere gote wan: «Lazar mir. ¹⁵ Û ez bona we şa me, ku ne wir bûm, ku hûn bawer bikin. Lê dîsa werin em her'ine cem wî». ¹⁶ Hingê T'ûmayê ku digotine wî «Heval-cêwî», gote şagirtên hevalên xwe: «Em jî her'in, ku bi wîr'a bimirin».

¹⁷ Gava Îsa çû, dît wê îdî çar roj bûn, ku *Lazar* danîbûne t'irbê. ¹⁸ Beytanya nêzikî Orşelîmê bû, weke sê kîlomêtiran jê dûr bû. ¹⁹ Gelek cihû hatibûne cem Mertayê û Meryemê, ku bona mirina birê wan ber dilê wanda bîn. ²⁰ Û hema Mertayê bihîst Îsa tê, pêşîya wîda çû, lê Meryem malda ma. ²¹ Mertayê gote Îsa: «Xudan, heger tu li vir bûyayî, birê min nedimir. ²² Lê niha jî ez zanim, tu çî ji Xwedê bixazî, wê bide te». ²³ Îsa gote wê: «Birayê teyê zêndî be». ²⁴ Mertayê lê vegerand: «Ez dizanim, Roja Axretê~ Roja Zêndîbûnê ewê zêndî be». ²⁵ Îsa gote wê: «**Ez im Zêndîbûn û Jiyîn!** Yê bawer bike, heger bimire jî wê bijî. ²⁶ Û ewê dijî û min bawer dike, ew qet namire. Tu vê yekê bawer dikî?» ²⁷ Mertayê gote wî: «Belê Xudan, ez bawer dikim, ku tu Mesîh î, Kur'ê Xwedê, yê ku wê bihata dinyayê».

²⁸ Pey vê gotinêr'a, çû gazî xûşka xwe Meryemê kir û dizîva gotê: «Dersdar hatye û gazî te dike». ²⁹ Gava wê bihîst, zû rabû çû. ³⁰ Îsa hê nek'etibû gund, lê li wir mabû, k'u Mert'a pêşîya wîda çûbû. ³¹ Cihûyên ku malda cem wê bûn û ber dilê wêda dihatin, gava dîtin Meryem zû rabû, derk'ete derva, dane pey wê çûn. Wan t'irê ew diçe ser t'irbê, ku bigirî. ³² Gava Meryem gihîşte wir, k'u Îsa bû, ew dît, xwe avîte ber nigan û got: «Xudan, heger tu li vir bûyayî, birê min nedimir». ³³ Gava Îsa dît ku ew û cihûyên ku pêr'a hatibûn digirîn, k'esera k'ûr hatê û dilê wî êşya. ³⁴ Û jî wan pirs kir: «We ew li k'u kirye gor'ê?» Gotine wî: «Xudan, were û bibîne». ³⁵ Îsa girîya. ³⁶ Hingê cihûyan got: «Hela binihêrin, çiqas ew hiz dikir!» ³⁷ Ji wan hinekan jî digot: «Evî ku ç'evên yê kor vekirin, nikaribû usa bikira, ku ev meriv jî nemira?»

³⁸ Li ser vê yekê dîsa k'esera k'ûr hate Îsa û ew çû ser t'irbê. Ew t'irb şkeftek bû û kevirek ber devê wê bû. ³⁹ Îsa got: «Vî kevirî wêda kin». Xûşka yê mirî~ Mertayê gote wî: «Xudan, niha îdî bîn k'etye, îro çarê wî ye mirye». ⁴⁰ Îsa gote wê: «Min ter'a negot, heger tu bawer bikî, tuê rûmeta Xwedê bibînî?» ⁴¹ Hingê kevir wêda kirin. Îsa serê xwe bilind kir û got: «Bavo, zef razî me, ku te dengê min bihîst. ⁴² Ez dizanim ku tu her dem dengê min dibihêyî, lê min bona xatirê vê cimeta hizûr got, ku *ewana* bawer bikin, ku te ez şandime».

⁴³ Pey vê gotinêr'a bi dengekî bilind kire gazî: «Lazar, derk'êve!» ⁴⁴ Yê mirî jî dest û p'îyên wî bi k'itan k'efenkîrî û rûyê wî bi destmalekê nixamtî derk'ete derva. Îsa gote wan: «Wî vekin û ber'din bira biger'e».

P'ÊXEMBERTÎYA QEYAFAYA LI SER ÎSA

⁴⁵ Hingê gelek cihûyên ku hatibûne cem Meryemê, ev kirina Îsa ku dîtî, bawerîya xwe wî anîn. ⁴⁶ Lê hinek jî ji wan çûne cem fêrisîyan û ev kirina Îsa wanr'a gotin. ⁴⁷ Hingê fêrisî û serokên k'ahînan civîna giregiran hev t'op kirin û gotin: «Em çi bikin? Ev meriv gelek nîşanan dike. ⁴⁸ Heger em wî aha bihêlin, hemû wê bawerîya xwe wî bînin û romayî jî wê bên, cîyê meyî pîroz wêran kin û k'oka milletê me jî bînin».

⁴⁹ Yekî ji wan~ Qeyafayê ku wê salê serokk'ahîn bû, gote wan: ⁵⁰ «Hûn qet tiştekî nizanin! Û ne jî difikirin, ku mer'a hê qenc e, bona cimete merivek bimire, lê t'emamîya millet unda nebe». ⁵¹ Eva yeka ewî bi hemdê xwe negot, lê çimkî ew serokk'ahîne wê salê bû, p'êxembertî kir, ku Îsa wê bona millet bimire. ⁵² Û ne t'enê bona millet, lê bona lawên Xwedêye belabûyî jî, ku wan bicivîne û bike yek. ⁵³ Awa îdî pey wê rojêr'a şewra kuştina Îsa kirin. ⁵⁴ Bona vê yekê Îsa îdî aşkere nava cihûyanda nediger'ya, lê ji wir çû ber'iyê, cîkî nêzikî bajarê ku jêr'a Efrayîm digotin û t'evî şagirtên xwe li wir ma.

⁵⁵ Cejina cihûyane Derbazbûnê nêzik bû, gelek merivên ji der-doran berî cejinê hevraz çûne Orşelîmê, ku li gora qîrarê xwe paqij bikin. ⁵⁶ Hingê ewana li wê derê Îsa diger'yan û p'aristxanêda disekinîn, ji hevdu dipirsîn: «Hûn çi dibêjin? Gelo rast ewê neyê vê cejinê?» ⁵⁷ Fêrisî û serokên k'ahînan jî ferman derxistibûn, heger yek bizanibe ew li k'u ye, gerekê wan pê bihesînin, ku ew wî bigirin.

GULRÛNKIRINA ÎSA LI BEYTANYAYÊDA
(Metta 26:6-13; Marqos 14:3-9)

12 ¹ Awa şeş roj berî Cejina Derbazbûnê, Îsa hate Beytanyayê, wê dera ku Lazar lê dima, ewî ku ji nav mirîyan zêndî kiribû. ² Li wir wan wîr'a hurmetek kir. Mertayê xizmetî dikir, Lazar jî t'evî Îsa nava wanda li ser sifrê rûniştibû. ³ Hingê Meryemê litirek* rûnê nardêyî safî û qîmetgiran hilda, li ser nigên Îsada rêt û pê p'or'ê xwe nigên wî ziha kirin. Bîna rûnê nardê mal hilda. ⁴ Lê ji şagirtên wî yekî~ Cihûdayê Îsxeryotî, yê ku wê paşê nemamîya wî bikira got: ⁵ «Çima ev rûnê nardê sêsid zîvî nehate firotanê, ku li feqîran bihata belakirinê?» ⁶ Ewî ku eva yeka digot, xema wî ne feqîr bûn, lê çimkî ew diz bû, k'îsikê p'eran cem wî bû û çî ku dik'etê, ewî jê diçopand. ⁷ Hingê Îsa gotê: «Ji wê k'ulfetê vegere. Îdî çima vî rûnî heta roja ku min bikine gor'ê xwey bike? ⁸ Feqîrê her t'im t'evî we bin, lê ezê her t'im ne t'evî we bim».

⁹ Ji cihûyan gelek bihistin ku Îsa li wê derê ye hatin. Ew ne ku t'enê bona Îsa hatin, lê ku Lazarê ji nav mirîyan zêndî kirye jî bibînin. ¹⁰ Hingê serokên k'ahînan hev şewrîn ku Lazar jî bikujin, ¹¹ çimkî rûyê wîda gelek cihû diçûn, bawerîya xwe Îsa danîn.

ÎSA BI RÛMET DIÇE ORŞELÎMÊ
(Metta 21:1-11; Marqos 11:1-11; Lûqa 19:28-40)

¹² Roja din k'omeke merivane giran, ku hatibû cejinê, gava bihist ku Îsa tê Orşelîmê, ¹³ wan çiqilên xurmê hildan pêşîya wîda çûn û kirine qîr'în: «Hosanna! Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê†, P'adşayê Îsraêlê!»

¹⁴ Îsa çeşikek dît û lê sîyar bû, çawa nivîsar e: ¹⁵ «Netirse Qîza Sîyonê. Va ye p'adşayê te tê, li çeşika k'erê sîyar bûyî»‡.

¹⁶ Şagirtên wî pêşîyê eva yeka fem nekirin, lê çaxê Îsa k'ete rûmeta xwe, hingê hate bîra wan, ku bona wî eva yeka hatibû nivîsarê û wana bona wî ev yek kir. ¹⁷ Ew cimeta ku hingê t'evî wî bû, şehdetîya wê yekê dida, ku wî Lazar ji mirinê zêndî kir û ferman da, ku ji gor'ê derê. ¹⁸ Lema cimete pêşîya wîda çû, çimkî wan bihistibû, ku ewî ev nîşana kirye. ¹⁹ Fêrisîyan jî digotîne hev: «Hûn dinihêrin eva yeka ji qewata me der e. Va ye t'emamîya dinyayê pey wî çû!»

ÎSA BONA MIRINA XWE DIBÊJE

²⁰ Çend yûnan jî nav wanda bûn, yên ku cejinêda bona hebandinê hevraz rabibûne Orşelîmê. ²¹ Ew hatine cem Fîlîpoyê ji bajarê Beytsayda Celîlê, hîvî jê kirin gotin: «Em xulam, em dixazin Îsa bibînin». ²² Fîlîpo çû ev yek gote Endraws, Endraws û Fîlîpo *hevr'a* çûn Îsar'a gotin. ²³ Îsa li wan vegeand got: «Ew siheta ku Kur'ê Merivê bê rûmetkirinê pêr'a gihîşt. ²⁴ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, heger liba gênim nek'êve erdê û nemire, ewê t'enê bimîne, lê heger ew bimire, wê gelek ber bide. ²⁵ Yê kesa xwe hiz dike, ewê unda ke, lê ewê ku vê dinyayêda ne yarê kesa xwe ye, ew wî bona jîyîna heta-ha-tê xwey dike. ²⁶ Yê bixaze minr'a xizmetîyê bike, bira pey min bê. Ez li k'u derê bim, xizmetk'arê minê jî li wir be. Heger yek minr'a xizmetîyê dike, Bav jî wê wîr'a hurmetê bike. ²⁷ Niha agir dilê min girtye. Ez çi bêjim? Bêjim: <Bavo, min ji vê sihetê rizgar ke>? Ê ne ez bona vê sihetê hatime? ²⁸ Bavo, navê xwe bilind ke». Hingê dengê ji ezmên hat: «Min bilind kir û ezê dîsa bilind kim!»

²⁹ K'oma merivên wir, ku dibihîstin, gotin: «Gur'înîya ezmên bû».

* 12:3 Litireke romîyan hingê weke 325 giramî bû.

† 12:13 Zebûr 118:25,26.

‡ 12:15 Zekerîya 9:9.

Hinekan jî di got: «Milyak'etekî wîr'a xeber da». ³⁰ Îsa cab da û got: «Ev deng bona min nehat, lê bona we. ³¹ Niha ye waxtê dîwana vê dinyayê, niha mîrê vê dinyayê wê ji navê bê avîtinê. ³² Çaxê ez ji axa erdê berbi jor bême hildanê, ezê hemûyan bik'işînimê berbi xwe». ³³ Ewî bi vê gotinê dida femkirinê, ku ewê bi çi cûreyî bimire.

³⁴ Hingê k'oma merivan lê vegerand got: «Me ji Qanûnê bihîstye, ku Mesîh wê heta-ha-tê bimîne. Îdî tu çawa dibêjî: <Gerekê Kur'ê Meriv berbi jor bê hildanê>? K'î ye ew <Kur'ê Meriv>»? ³⁵ Îsa gote wan: «Hinek waxt jî ronahî wê wer'a be. Bimeşin, heta ku ronahî wer'a ye, nebe ku tarî ser weda bê. Ewê tarîyêda dimeşe, ew nizane k'uda diçe. ³⁶ heta ku ronahî wer'a ye, bawerîya xwe ronayê binin, ku hûn bibine lawên ronayê».

NEBAWERÎYA CIHÛYAN

Gava Îsa ev tişt gotin çû û ji wan xwe veşart. ³⁷ Hizkî Îsa ber ç'evên wan haqas nîşanan jî kirin, lê dîsa wana bawerîya xwe li wî nedanî, ³⁸ ku ev gotina Îşaya p'êxember bê sêrî, ku: «Xudan, k'ê bawerîya xwe wê xebera me got anî? Û *qewata* milê Xudan gihîşte k'ê? *

³⁹ Bona wê yekê wana nikaribû bawer bikirana, çimkî Îşaya aha jî gotye: ⁴⁰ «Xwedê ç'evên wan kor kirin û hişê wan tevizand, ku bi ç'evan nebînin, bi hiş fem nekin û venegerin, ku ez wan qenc bikim».*

⁴¹ Îşaya aha got, çimkî wî rûmeta Îsa dît û bona wî xeber da. ⁴² Lê dîsa ji mîrên *cihûyan* gelean bawerîya xwe li wî anîn. Lê ji tîrsa fêrisîyan, wê yekêda xwe nedidane k'ifşê, ku ji k'inîştê neyêne derxistinê. ⁴³ Belê, wan hê hiz kir, ku rûmeta wan li cem merivan hebe, ne ku cem Xwedê.

HAKIMÊ ROJA AXRETÊ GOTINA ÎSA YE

⁴⁴ Hingê Îsa bi dengê bilind got: «Yê bawerîya xwe min tîne, ew min bawer nake, lê ewî ez şandime *bawer dîke*. ⁴⁵ Û ewê min dibîne, ewî ez şandime dibîne. ⁴⁶ Ez çawa ronahîdar hatime dinyayê, ku her kesê bawerîya xwe min bîne, tarîyêda nemîne. ⁴⁷ Heger yek gotina min bibihê û wê pêk neyne, ez dîwana wî nakim. Ez nehatime ku dîwana dinyayê bikim, lê ku dinyayê rizgar bikim. ⁴⁸ Yê ku min dide alîkî û gotinên min hildade, yek heye ku wê dîwana wî bike, ew gotina ku min gotye, ewê Roja Axretê dîwana wî bike. ⁴⁹ Çimkî min xweserîxwe negot, lê Bavê ku ez şandime, ewî t'emî daye min, ku ez çi gerekê bêjim û çi xeber dim. ⁵⁰ Û ez dizanim, ku t'emîya wî jîyîna heta-ha-tê ye. Awa çi ez dibêjim, çawa Bavê gotye min, ez usa dibêjim».

ÎSA NIGÊN ŞAGIRTAN DIŞO

13 ¹ Berî Cejna Derbazbûnê, Îsa zanibû siheta wî pêr'a gihîstye, ku ji vê dinyayê derê her'e cem Bavê. Ewî hemûyên xweyê vê dinyayêda, ku hiz kiribûn, heta xilazîyê jî ew hiz kirin. ² Li dema şîvxwarinê, Şeytan qelpê xirab avîte dilê Cihûdayê kur'ê Şimhûnê Îsxeryotî, ku nemamîya Îsa bike. ³ Îsa dizanibû ku Bavê her tişt daye destê wî, ew ji cem Xwedê hatye û dîsa wê vegere cem Xwedê. ⁴ Hingê ew ji şîvê rabû, p'otê xwe da alîkî û p'êşgîrek hilda li pişta xwe p'êça. ⁵ Paşê av kire legenekê û destpê kir nigên şagirtên xwe şuştin û bi p'êşgîra p'êçayî ziha kirin. ⁶ Gava dor gihîşte Şimhûn-Petrûs, wî got: «Xudan, tuê nigên min bişoyî»? ⁷ Îsa lê vegerand got: «Ez niha çi dikim tu fem nakî, lê paşê tuê fem bikî». ⁸ Petrûs gote wî: «Tuê t'u car nigên min neşoyî!» Îsa lê vegerand got: «Heger ez nigên te neşom, p'ara teyê minr'a t'unebe». ⁹ Şimhûn-Petrûs gote wî: «Xudan, ku usa ye, ne t'enê nigên min, lê dest û serê min jî bişo!» ¹⁰ Îsa got: «Yê hatye şuştinê, pêştirî nigên wî, dereke din ne hewce ye bê şuştinê. Ew pêda-pêda paqij e. Hûn paqij in, lê ne her kes». ¹¹ Çimkî Îsa dizanibû k'î wê nemamîya wî bike, bona wê yekê got: «lê ne her kes e paqij».

¹² Gava nigên wan şuştin, p'ot avîte namila xwe û dîsa li ser sifrê rûnişt. Pirs da wan: «Gelo hûn zanin min bona we çi kir? ¹³ Hûn min Dersdar û Xudan hesab dikin, hûn rast dikin, ez hema usa jî heme. ¹⁴ Awa ez, ku Xudan û Dersdar im û min nigên we şuştin, gerekê hûn jî nigên hevdu bişon. ¹⁵ Min nexşek nîşanî we da, ku çawa min bona we kir, usa jî hûn bikin. ¹⁶ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, xulam ji axayê xwe ne mestir e, ne jî yê hatye şandinê ji yê ew şandyê mestir e. ¹⁷ Heger hûn vê yekê zanin, hûnê xwezî bin, çaxê biqedînin.

ÎSA BONA BENDKIRINA XWE DIBÊJE
(Metta 26:20-25; Marqos 14:17-21; Lûqa 22:21-23)

¹⁸ Ez bona we hemûyan nabêjim, çimkî ez dizanim min k'î hilbijartine, lê gerekê nivîsar bê sêrî, ku: <Yê nanê min xwar pehîn avîte min>†.

¹⁹ Ez nihava, hê berî bûyînê van tiştan dibêjime we, ku çaxê bibin hûn bawer bikin, ku ew EZ IM.‡ ²⁰ Ez rast, bêxêlif dibêjime we, k'î wî qebûl bike, k'îjanî ez dişînim, ew min qebûl dike û ewê min qebûl dike, ewî ez şandime qebûl dike».

²¹ Îsa gava eva yeka got, ruhda gelekî qilqilî, wî aşkere şehdetî da û got: «Ez rast, bêxêlif dibêjime we, yekî ji we wê nemamîya min bike».

²² Şagirtan şaşmayî hevdu nihêrî, ku gelo ew bona k'ê dibêje. ²³ Ji şagirtan yekî, yê ku Îsa jê hiz dikir, xwe spartibû ber dilê Îsa. ²⁴ Şimhûn-Petrûs wîr'a bi ç'evan dikir, ku bipirse: «K'a ew bona k'ê dibêje». ²⁵ Ewî jî xwe

* 12:38 Îşaya 53:1; 12:40 Îşaya 6:10.

† 13:18 Zebûr 41:9.

‡ 13:19 Şirovekirinê bin rêza 8:58-da bixûnin.

avîte hemêza Îsa û pirsî: «Xudan, ew k'î ye?»²⁶ Îsa cab da got: «Vî parîyê *nan* ez t'asêda kim bidime k'ê, ew e». Û parî t'asêda kir, da Cihûdayê kur'ê Şimhûnê Îsxeryotî.²⁷ Ewî hema çawa parî ji dêst hilda, Şeytan k'ete nava wî. Îsa gote wî: «Tuê çi bikî zû bike». ²⁸ Lê yên li ser sifrê rûniştibûn, t'u kesî fem nekir, ewî çima wîr'a aha got. ²⁹ Hinekan fikirîn, ku k'îsikê p'eran cem Cihûda ye, Îsa wîr'a dibêje: «Tiştên cejinêda mer'a lazim bik'ir'e», yan jî «tiştêkî bide feqîran». ³⁰ Ewî jî gava ew parî hilda, pêr'a-pêr'a derk'ete derva. Îdî şev bû.

T'EMÎYA NÛ~ HEVDU HIZ BIKIN

³¹ Gava ew derk'ete derva, Îsa got: «Niha Kur'ê Meriv hate rûmetkirinê û Xwedê jî bi wî hate rûmetkirinê. ³² Heger Xwedê bi wî hate rûmetkirinê, Xwedê jî wê bi xwe wî rûmet bike û zûtirê wê wî rûmet bike. ³³ Lawno! Ezê demeke kin jî t'evî we bim, lê *paşê* hûnê li min biger'in û çawa min cihûyanra got, niha wer'a jî dibêjim, hûn nikarin bêne wî cîyê ku ez diçimê.

³⁴ Ez t'emîke nû didime we: Hevdu hiz bikin. Çawa min hûn hiz kirin, usa jî hûn hevdu hiz bikin. ³⁵ Bi vê yekê hemûyên bizanibin, ku hûn şagirtên min in, heger hûn hevdu hiz bikin».

ÎSA DERHEQA ÎNK'ARÎYA PETRÛSDA DIBÊJE
(Metta 26:31-35; Marqos 14:27-31; Lûqa 22:31-34)

³⁶ Şimhûn-Petrûs gotê: «Xudan, tuê k'uda her'î?» Îsa lê vegerand got: «Ew cîyê ez diçimê, tu niha nikarî pey min bêyî wir, lê paşê tuê pey min bêyî». ³⁷ Petrûs gotê: «Xudan, çima ez nikarim niha pey te bêm? Ezê bona te jîyîna xwe jî bidim». ³⁸ Îsa lê vegerand got: «Tuê jîyîna xwe bona min bidî? Ez rast, bêxêlif dibêjime te, hê dîk bang nedayî tuê sê caran min înk'ar kî.

RÎYA BERBI BAVÊ

14 ¹ Dilê we bira neqilqile. Xwedê bawer bikin û min jî bawer bikin. ² Mala Bavê minda cîyên mayînê gelek hene, ez niha diçim cîyê we hazir bikim. Heger cî t'unebûya, *çima* minê wer'a negota? ³ Çaxê ez her'im cîyê we hazir bikim, ezê dîsa bêm û we bibime cem xwe, ku ez li k'u bim, hûn jî li wir bin. ⁴ Hûn rîya wî cîyê ez diçimê dizanin».

⁵ Tûma got: «Xudan, em nizanin k'uda diçî, emê çawa rê bizanibin?» ⁶ Îsa gote wî: «Ez im, rê, rastî û jîyîn. T'enê bi min yek dikare bê cem Bavê. ⁷ We ku ez nas kirime, hûnê Bavê min jî nas bikin. Awa ji vir hada hûn wî nas dikin û we ew dîtye».

⁸ Filîpo gote wî: «Xudan, tu Bavê nîşanî me ke, besî me ye!» ⁹ Îsa gote wî: «Filîpo! Haqas waxt ez t'evî we me û hê tu min nas nakî? yê ez dîtîme, wî Bav dîtye. Tu çawa dibêjî: «Bavê nîşanî me ke?» ¹⁰ Tu bawer nakî, ku ez nava Bavêda me û Bav nava minda ye? Ev xeberên ku ez wer'a dibêjim, xweserîxwe nabêjim, lê ew Bavê nava minda dimîne, ew e ku ya xwe dike. ¹¹ Min bawer bikin, ku ez nava Bavêda me û Bav jî nava minda ye. Lê heger na, hema boy van kirên min bawer bikin. ¹² Ez rast, bêxêlif dibêjime we, k'î min bawer bike, ew kirên ez dikim, ewê jî bike. Û kirên ji van mestir jî wê bike, çimkî ez diçime cem Bavê xwe. ¹³ Pê navê min hûn çi bixazin, ezê bikim, ku Bav pê Kur'ê bê rûmetkirinê. ¹⁴ Heger pê navê min hûn tiştêkî bixazin ezê bikim.

ÎSA SOZ DIDE KU RUHÊ PÎROZ BIŞÎNE

¹⁵ Heger hûn min hiz dikin, hûnê t'emîyên min xwey bikin. ¹⁶ Ezê jî hîvî ji Bavê bikim û ewê Piştovanekî din bide we, ku heta-ha-tê t'evî we bimîne. ¹⁷ Ew Ruhê rastîyê ye, ku dinya nikare wî qebûl bike, çimkî ne wî dibîne û ne jî nas dike. Lê hûn wî nas dikin, çimkî ew t'evî we dimîne û wê nava weda be.

¹⁸ Ez we sêwî nahêlim, *dîsa* ezê bême cem we. ¹⁹ Demeke kin şûnda îdî dinyayê min nebîne, lê hûnê min bibînin. Ez ku dijîm, hûnê jî bijîm. ²⁰ Wê rojê hûnê bizanibin, ku ez nava Bavê xweda me, hûn nava minda, ez jî nava weda.

²¹ K'î t'emîyên min qebûl dike û wan xwey dike, ew e ku min hiz dike. Û k'î min hiz dike, ewê ji alîyê Bavê minda bê hizkirinê. Ezê jî wî hiz bikim û xwe wîva bihesînim».

²² Cihûda, ne yê Îsxeryotî, gotê: «Xudan, ewê çawa be, ku tuê xwe meva bihesînî, lê dinyayêva na?»

²³ Îsa lê vegerand got: «Her k'ê ku min hiz bike, wê gotina min xwey bike, Bavê min jî wê wî hiz bike û emê bêne cem wî, t'evî wî bimîn. ²⁴ K'î min hiz nake, ew gotinên min xwey nake. Ev gotina ku hûn dibihên ne ya min e, lê ya Bavê min e, yê ku ez şandime. ²⁵ Ez van tiştan wer'a dibêjim, heta hê li cem we me. ²⁶ Lê Piştovan~Ruhê Pîroz, ku Bav wê bi navê min bişîne, ewê we hînî her tiştî ke û her tiştên ku min wer'a gotine, wê bîne bîra we.

²⁷ Ez haştîyê wer'a dihêlim, haştîya xwe didime we. Ez usa nadim, çawa ku dinya dide. Bira dilê we neqilqile û netirsin! ²⁸ We bihîst, ku min wer'a got: «Ezê her'im, lê *dîsa* ezê bême cem we!» Heger we ez hiz bikirama, hûnê şa bûna, ku ez diçime cem Bavê, çimkî Bav ser min'a ye. ²⁹ Û niha ev tişt min berî bûyînê gotine we, ku çaxê ew bibin, hûn bawer bikin. ³⁰ Îdî ezê t'evî we dirêj xeber nedim, çimkî va ye mîrê vê dinyayê tê. Hikumê wî qet li ser min t'une, ³¹ lê bira dinya bizanibe, ku ez Bavê hiz dikim û Bavê çawa t'emî daye min ez usa dikim. Rabin, em ji vir her'in.

15 ¹Ez im k'ola tirîyêye rast, Bavê min jî baxvan e. ²Her çiqila ku minva ye û ber nade ew dibir'e. Lê çiqila ku ber dide, ew wê ji çirpîyan paqij dike, ku hê gelek ber bide. ³Hûn îdî paqij in, bi wan xeberên ku min wer'a gotine. ⁴Nav mînda bimînin, ez jî nav weda. Çawa çiqil nikare xwexa ber bide, heger k'olêva nemîne, usa jî hûn nikarin, heger minva nemînin. ⁵Ez im k'ola tirîyê, hûn jî çiqil in. Ewê ku minva dimîne û ez jî wîva, ewê gelek ber bide, çimkî bêy min hûn nikarin t'u tiştî bikin. ⁶Heger yek minva nemîne, ew mîna çiqilekî wêda avîti ye, ku hişk dibe, t'op dikin davêjine nava êgir, dişewtînin. ⁷Heger hûn nava mînda bimînin û gotinên min jî nava weda bimînin, çî hûn dixazin bixazin, wê wer'a bê dayîne. ⁸Bi vê yekê Bavê minê bê rûmetkirinê, çaxê hûn gelek ber bidin û bi wê yekê bidine k'ifşê, ku hûn bûne şagirtên min.

⁹Bav çawa min hiz dike, usa jî ez we hiz dikim. Hizkirina mînda bimînin. ¹⁰Heger hûn t'emîyên min xwey bikin, hûnê hizkirina mînda bimînin, çawa min t'emîyên Bavê xwe xwey kirin û hizkirina wîda dimînim. ¹¹Min ev tişt wer'a gotin, ku şabûna min nava weda bimîne û şabûna we t'emam be. ¹²Ev e t'emîya min: Hevdu hiz bikin, çawa ku min hûn hiz kirin. ¹³Ser wê hizkirinê'a t'u hizkirin nîne, ku yek jîyîna xwe ber hevalên xweva bide. ¹⁴Hûn hevalên min in, heger wan t'emîyan xwey bikin, yê ku ez didime we. ¹⁵Ji vir hada ez we xulam hesab nakim, çimkî xulam haş pê nîne, ku axayê wî çî dike. Min hûn heval hesab kirin, çimkî her tiştên ku min ji Bavê xwe bihîstin, min hûn pê hesandin. ¹⁶Ne ku we ez hilbijartim, lê min hûn hilbijartin û k'ifş kirin, ku hûn her'in ber bidin û berê we bimîne. Hingê hûn çî ku pê navê min ji Bavê bixazin, ewê bide we. ¹⁷Ez t'emîya vê yekê didime we: hevdu hiz bikin.

NEYARÏYA DINYAYÊ

¹⁸Heger dinya neyarê we be, bizanibin ku berî we ewê neyarî li min kirye. ¹⁹Heger hûn p'ara dinyayê bûna, dinya wê yê xwe hiz bikirana. Lê min hûn ji dinyayê hilbijartine~ hûn ne p'ara dinyayê ne, lema dinya ne yarê we ye. ²⁰Wê xebera mine gotî bînine bîra xwe, ku: <Xulam ne ser axayê xwer'a ye>. Heger wan ez zêrandime, wê we jî bizêrînin. Heger gotina min xwey kirine, wê gotina we jî xwey bikin. ²¹Lê van hemû tiştan wê bona navê min bînine serê we, çimkî ewana ewî ez şandime nas nakin.

²²Heger ez nehatama û min wan'r'a xeber neda, gunehên wan wê t'unekbûya. Lê niha ew nikarin xwe bêguneh derxin. ²³Ewê ku neyarê min e, ew neyarê Bavê min e jî. ²⁴Heger min ew kirên ku t'u kesî nekirine, nav wanda nekirana, gunehên wanê t'unekbûna. Lê niha dîtin, him bûne neyarê min, him jî neyarê Bavê min, ²⁵ku ew gotina Qanûna wanda hatye nivîsarê bê sêrî: <Çikî boş-badîhewa bûne neyarên min>.*

²⁶Çaxê ew~ Piştovan bê, k'îjanî ezê ji Bavê wer'a bişînim, ew Ruhê ku wê rastîyê wer'a bêje, yê ku ji Bavê dertê, hingê ewê bona min şehdetîyê bide. ²⁷Hûnê jî şehdetîyê bidin, çimkî serê-sêrîda hûn t'evî min bûne.

16 ¹Min ev tişt wer'a gotin, ku hûn p'işk nebin. ²Ewana wê we ji k'inîştan derxin. Dem jî wê bê, ku k'î we bikuje, wê hesab bike ku ew Xwedêra xizmetîyê dike. ³Wê van tiştan bikin, çimkî wana ne Bav nas kir û ne jî ez nas kirim. ⁴Lê belê, min ev tişt wer'a gotin, ku çaxê ew dem bê, hûn bînine bîra xwe, ku min ev tişt gotine we.

K'ARÊ RUHÊ PÎROZ

Min serê-sêrîda ev tişt wer'a negotin, çimkî ez t'evî we bûm. ⁵Lê niha ez diçime cem ewî ku ez şandime û ji we t'u kes ji min napirse: <Tuê k'uda her'î?> ⁶Min ku ev tişt wer'a got, lema dilê we k'eserêva t'ije bûye. ⁷Lê ez rastîyê dibêjime we, bona we hê baş e, ku ez her'im. Heger neçim, Piştovan wê neyê cem we, lê heger her'im, ezê wî bişînime cem we. ⁸Çaxê bê, ewê li dinyayê hilê, bona guneh, bona rastîyê û bona dîwana Xwedê. ⁹Bona guneh, çimkî ewana bawerîya xwe min naynin. ¹⁰Bona rastîyê, çimkî ez diçime cem Bavê xwe û îdî hûnê min nebînin. ¹¹Bona dîwanê, çimkî dîwana mîrê vê dinyayê bûye.

¹²Hê gelek tiştên minî gotinê wer'a hene, lê niha hûn nikarin wan bibin. ¹³Lê çaxê ew Ruhê Rastîyê bê, ewê we bibe berbi hemû rastîyê. Çimkî ewê ne ku xwesarîxwe xeber de, lê çî bibihê, wê ewê yekê xeber de û tiştên ku hê nebûne wê wer'a bêje. ¹⁴Ewê rûmeta navê min bilind ke, çimkî ewê ji min bistîne û wer'a bêje. ¹⁵Her tiştên Bavê, ku hene ew yê min in. Lema min bona Ruh got, ku wê ji min bistîne û wer'a bêje.

BERXWEK'ETIN Û ŞABÛN

¹⁶Demeke kin şûnda hûnê min nebînin û dîsa demeke kin şûnda hûnê min bibînin». ¹⁷Li vir ji şagirtên wî hinekan gotine hevdu: «Eva çî gotin e, ku ew mer'a dibêje? <Demeke kin şûnda hûnê min nebînin> û dîsa <demeke kin şûnda hûnê min bibînin>. Usa jî dibêje ku: <Ezê her'ime cem Bavê>?» ¹⁸Û wana digot: «Ev <demeke kin> ku dibêje, ew çî ye? Em fem nakin ew çî dixaze bêje».

¹⁹Îsa zanibû, ku ew dixazin jê bipirsin, hingê gote wan: «Hûn bona vê gotina min ji hevdu dipirsin, ku min got: <Demeke kin şûnda hûnê min nebînin> û dîsa <demeke kin şûnda hûnê min bibînin>?» ²⁰Ez rast, bêxêlif dibêjime we, hûnê şî û girî bin, lê dinyayê k'êfxaş be, hûnê k'eserêda bin, lê k'esera we wê bibe k'êfxaşî. ²¹Çaxê jinek dik'eve ber zar'ê, êşên wê pê digirin, çimkî siheta wê pê'r'a gihîştaye. Lê çaxê zar'ok dibe, îdî ji dest wê şabûnê, ku

* 15:25 Zebûr 35:19; 69:4.

merivek hate dinyayê, ew êş nayê bîrê. ²² Rast e hûn jî niha ber xwe dik'evin, lê ezê dîsa we bibînim û dilê weyê bi şabûnêva t'ije be û t'u kesê wê şabûnê ji we nestîne. ²³ Wê rojê hûnê ji min t'u tiştî nepirsin. Ez rast, bêxêlîf dibêjime we, hûn bi navê min çî ji Bavê bixazin, ewê bide we. ²⁴ Heta niha we bi navê min t'u tişt nexastye. Bixazin, hûnê bistînin, usa ku şabûna we t'emam be.

ÎSA DINYA BINDEST KIR

²⁵ Min ev tişt wer'a bi meselan gotin. Waxt wê bê ku ezê îdî bi meselan wer'a xeber nedim, lê aşkere derheqa Bavêda wer'a bêjim. ²⁶ Wê rojê hûnê pê navê min bixazin û ez nabêjime we, ku ezê bona we hîvî ji Bavê bikim. ²⁷ Bav xwexa we hiz dike, çimkî we ez hiz kirim û bawer kir, ku ez ji Xwedêda hatime. ²⁸ Ez ji Bavê qetyam û hatime dinyayê. Dîsa ez dinyayê dihêlim û diçime cem Bavê».

²⁹ Şagirtên wî gotinê: «Awa tu niha aşkere xeber didî, lê ne bi meselan. ³⁰ Niha em fem dikin, ku tu her tiştî dizanî û ne hewce ye ji te bipirsin, tu pêşda cabê didî. Lema em bawer dikin, ku tu ji cem Xwedê hatî».

³¹ Îsa gote wan: «Niha hûn bawer dikin? ³² Awa waxt wê bê û hatye jî, ku hûnê bela-belayî bin, her kes wê her'e cîyê xwe û min t'enê bihêle. Lê ez ne t'enê me, çimkî Bav minr'a ye. ³³ Min ev tişt wer'a gotin, ku bi min haştîya we hebe. Hûnê dinyayêda tengasfîyê bibînin, lê serxwe bin! Min dinya bindest kirye».

ÎSA BONA BAWERMENDAN DUA DIKE

17 ¹ Çaxê Îsa ev tişt gotin, berê xwe ezmênda kir got: «Bavo, dem pêr'a gihîştîye. Kur'ê xwe rûmet ke, ku Kur' jî te rûmet bike, ² mîna wî hikumê ku te li ser t'emamîya merivayê daye wî, ku jîyîna heta-ha-tê bide hemûyên ku te dane wî. ³ Ev e jîyîna heta-ha-tê, ku ew te çawa Xwedêyê rastî bêhimber nas bikin û *usa jî* Îsa Mesîhê ku te ew şandye *nas bikin*. ⁴ Min tu li rûbarê erdê rûmet kirî~ ew k'arê te dabû, ku ez bikim, min anî sêrî. ⁵ Bavo, bi wê rûmeta mine ku hê berî efrandina dinyayê li cem te hebû niha min li ber xwe rûmet bike.

⁶ Min navê te wan merivan hesand, yên ku te ji dinyayê dane min. Ew yên te bûn, te dane min û wana gotina te xwey kir. ⁷ Niha îdî ew zanin ku her tiştên te dane min ew ji te ne. ⁸ Ew xeberên te dane min, min dane wan, wana jî ew hildan û wê rastîyê hesyan, ku ez ji te hatime û bawer kirin ku te ez şandime. ⁹ Ez bona wan hîvî dikim, ne ku bona dinyayê, lê bona yên ku te dane min, çimkî ew yên te ne. ¹⁰ Çî ku yên min in, ew yên te ne, çî ku yên te ne, ew yên min in. Û ez bi wan rûmetkirî me. ¹¹ Niha ez têm cem te, îdî ne dinyayêda me, lê ew dinyayêda ne. Ay Bavê Pîroz! Bi wî navê xweyî ku te daye min van xwey bike, ku bibine yek, çawa ez û tu yek in. ¹² Çaxê ez t'evî wan li dinyayêda bûm, min bi navê teyî ku te da min ew xwey dikirin. Min ew xwey kirin û ji wan t'u kes unda nebû, pêştirî yê undabûnêra dayî, ku nivîsar bê sêrî. ¹³ Lê niha ez têm cem te û van tiştan dinyayêda dibêjim, ku şabûna min dilê wanda seranser be. ¹⁴ Min xebera te gîhande wan û dinya bû neyarê wan, çimkî ew ne ji dinyayê ne, çawa ez ne ji dinyayê me. ¹⁵ Ez hîvî nakim, ku tu wan ji dinyayê hildî, lê ku wan ji Yê Xirab xwey bikî. ¹⁶ Ew ne ji dinyayê ne, çawa ez ne ji dinyayê me. ¹⁷ Wan bi rastîya xwe pîroz bike. Xebera te rastî ye. ¹⁸ Çawa te ez şandime dinyayê, min jî ew şandine dinyayê. ¹⁹ Bona wan ez xwe pîroz dikim, ku ew jî bi rastîyê pîroz bin.

²⁰ Lê ne t'enê bona wan ez hîvî dikim, lê bona wan jî, yên ku bi gotina wan wê bawerîya xwe min bînin, ²¹ ku hemû jî bibine yek. Bavo, çawa tu nava minda yî û ez nava teda me, usa jî bira ew nava meda, t'evî me bibine yek û aha dinyayê bawer bike, ku te ez şandime. ²² Ew rûmeta te da min, min da wan, ku ew bibine yek, çawa ez û tu yek in: ²³ Ez nava wanda, tu jî nava minda, ku ewana yektîyêda seranser bin û dinya bizanibe, ku te ez şandim û wan usa hiz dikî, çawa min hiz dikî.

²⁴ Ay Bavo, ez dixazim ku ez li k'u bim, ewên te dane min ew jî t'evî min bin, ku ew rûmeta te daye min bibînin, çimkî hê berî efrandina dinyayê te ez hiz kirime. ²⁵ Ey Bavê rast! Dinya te nas nake, lê ez te nas dikim û evana jî dizanin, ku te ez şandime. ²⁶ Min tu wanva dayî naskirinê û ezê hê bidime naskirinê, ku ew hizkirina ku te ez pê hiz kirime nava wanda be û ez jî nava wanda bim».

BENDKIRINA ÎSA Û ÎNK'ARÎYA PETRÛS
(Metta 26:47-75; Marqos 14:43-72; Lûqa 22:47-71)

18 ¹ Pey vê xebirdanêra Îsa şagirtên xweva t'evayî derbazî wî alîyê averêja Qedronê bû. Li wê derê baxek hebû, Îsa şagirtên xweva k'ete wir. ² Cihûda jî, yê ku wê nemamîya wî bikira, ew cî dizanibû, çimkî Îsa û şagirtên wî gelek caran li wir dicivyan. ³ Awa Cihûda k'omeke eskeran û xizmetk'aran xwer'a ji alîyê fêrisî û serokên k'ahînanada hildabû û bi ç'iran, agir û ç'ekan hate wê derê. ⁴ Îsa her tişt zanibû, ku wê çî bê serê wî, pêşda çû û gote wan: «Hûn li k'ê diger'in»? ⁵ Wana lê vegerand got: «Îsayê Nisretê!» Îsa gote wan: «EZ IM». ⁶ Cihûdayê ku nemamîya wî kiribû jî t'evî wan bû. ⁷ Gava got: «EZ IM!» ewana paşda vek'işyan û k'etine erdê. ⁸ Hingê Îsa dîsa ji wan pirsî: «Hûn k'ê diger'in»? Wan got: «Îsayê Nisretê». ⁹ Îsa li wan vegerand got: «Min wer'a got, ez im. Awa heger hûn li min diger'in, bihêlin bira ewana her'in». ¹⁰ Bi vê yekê ew xebera wî pêşda gotibû hate sêrî: «Ewên ku te dane min, ji wan t'u kes min unda nekir».

¹¹ Hingê Şimhûn-Petrûs ew şûrê ku cem bû k'işand û avîte xulamê serokk'ahîn û guhê wîyî rastê pekand. Navê wî xulamî Malxo bû. ¹² Îsa gote Petrûs: «Şûr bike qabê! Ez çawa wê k'asê venexwim, ya ku Bavê daye min?»

* 18:4 Şirovekirinê bin rêza 8:58-da bixûnin.

¹² Pey vê yekêr'a eskeran, serhezar û xizmetk'arên cihûyan Îsa girtin û girêdan. ¹³ Pêşîyê ew birine cem xezûrê Qeyafayê serokk'ahînê wê salê~ cem Henan. ¹⁴ Qeyafa ew bû, yê ku cihû şîret kiribûn û gotibû: «mer'a hê qenc e, ku bona cimetê merivek bimire».

¹⁵ Şimhûn-Petrûs û şagirtekî din pey Îsa diçûn. Ew şagirtê ku nasê serokk'ahîn bû t'evî Îsa k'ete hewşa serokk'ahîn, ¹⁶ lê Petrûs derva li ber dêrî sekinî. Paşê ew şagirtê nasê serokk'ahîn derk'et dergehvanr'a xeber da û Petrûs bire hindur. ¹⁷ Hingê carîya ku dergehvan bû ji Petrûs pirsî: «Dibe ku tu jî ji şagirtên vî merivî yî»? Petrûs got: «Ne ji wan im».

¹⁸ Û hewa ku sar bû, xulam û xizmetk'aran pê k'omirê agir vêxistin, sekinî bûn, xwe germ dikirin. Petrûs jî li cem wan sekinî bû û germ dibû.

¹⁹ Hingê serokk'ahîn ji Îsa derheqa şagirtên wî û hînkirina wîda pirsî. ²⁰ Îsa caba wî da got: «Min dinyayêr'a aşkere xeber daye, min her t'im li k'iniştanda û usa jî p'aristxanêda hîn kirye, li k'u hemû cihû dicivyan. Min t'u tişt dizîva negotye. ²¹ Tu çima ji min dipirsî? Ji yên ku bihîstine bipirse, k'a min çi gotye wan. Ew dîzanin min çi gotye».

²² Gava Îsa ev yek got, xizmetk'arekî li wir sekinî şemaqek wî xist, got: «Tu çawa caba serokk'ahîn didî»? ²³ Îsa lê vegerand got: «Heger min şaş xeber da, şaşîya min bêje. Lê heger ez rast dibêjim, tu çima min dixî»? ²⁴ Hingê Henan ew girêdayî şande cem Qeyafayê serokk'ahîn.

²⁵ Şimhûn-Petrûs hê li wir sekinî xwe germ dikir. Ji wî pirsîn: «Dibe ku tu jî ji şagirtên wî yî»? Ew înk'ar kir û got: «Ne ji wan im». ²⁶ Xulamekî serokk'ahîn, ji xwexatîya wî, yê ku Petrûs guhê wî pekandibû, jê pirsî: «Ê ne nava baxda min tu t'evî wî dîtî»? ²⁷ Hingê Petrûs dîsa înk'ar kir û wê demê dîk bang da.

ÎSA LI BER PÎLATO

(Metta 27:1-2, 11-31; Marqos 15:1-20; Lûqa 23:1-5, 13-25)

²⁸ Îsa ji cem Qeyafa birine rewşxanê. Serê sibehê zû bû, cihû nek'etine rewşxana *welî*, ku li gora qirara şûştin-veşûştinê ew xwe neherimînin, ku bikaribin Cejina Derbazbûnêda bixwin. ²⁹ Hingê Pîlato derk'ete derva, hate cem wan û got: «Hûn vî merivî çîda neheq dikin?»

³⁰ Wana lê vegerand got: «Heger ew ne zulmk'ar bûya, meyê ew neda destê te». ³¹ Hingê Pîlato gote wan: «Hûn xwexa ewî hildin û anegorî qanûna xwe dîwana wî bikin». Cihûyan lê vegerand got: «Bi *Qanûnî* destûra me nîne, ku em kesekî bikujin». ³² Ev aha bû, ku ew gotina Îsa bê sêrî, ku pêşda gotibû, ewê çawa bimire.

³³ Hingê Pîlato dîsa k'ete rewşxanê, gazî Îsa kir û jê pirsî: «Tu yî P'adşayê cihûyan»? ³⁴ Îsa lê vegerand got: «Tu vê yekê bi xwe dibêjî yan hinekên din bona min ter'a gotine?»

³⁵ Pîlato got: «Çima ez cihû me? Miletê te û serokên k'ahînan tu dane destê min. Te çi kirye»? ³⁶ Îsa cab da, got: «P'adşatîya min ne ji vê dinyayê ye. Heger p'adşatîya min ji vê dinyayê bûya, berdestîyên minê şer' bikirana, ku ez nek'etama destê cihûyan. P'adşatîya min ne ji vê dinyayê ye».

³⁷ Hingê Pîlato gote wî: «Ku usa ye tu p'adşa yî»? Îsa cab da û got: «Tu bi xwe dibêjî min: <Tu p'adşa yî>. Ez bona vê yekê bûme û bona vê yekê hatime dinyayê, ku bona rastîyê şehdetîyê bidim. Her k'ê ku ji rastîyê ye, guh dide dengê min». ³⁸ Pîlato jê pirsî: «Rastî çi ye?»

Pey vê pirsêr'a, Pîlato dîsa derk'ete derva~ cem cihûyan û gote wan: «Ez t'u neheqîyê vîda nabînim. ³⁹ Lê erf-edetê weda ev heye, ku ez Cejina Derbazbûnêda girtîkî hebsê bona we berdim. Awa hûn dixazin ez p'adşayê cihûyan bona we berdim?»

⁴⁰ Hingê wan dîsa kire qîr'în û gotin: «Ne ku vî merivî, lê Barabas ber'de»! Barabas jî yekî t'alank'ar bû.

19 ¹ Hingê Pîlato Îsa bir da ber qamçîyan. ² Eskeran jî t'acgulîk ji stirîyan vegirtin û dane serê wî û çuxekî şîrk li wî kirin. ³ Li ber wî disekinîn û digotin: «Xaş be, P'adşayê cihûyan»! Û şemaq lê didan.

⁴ Pîlato dîsa derk'ete derva û gote wan: «Ez niha wî tînime derva cem we, ku hûn bizanibin min t'u sûc wîda nedîye». ⁵ Hingê t'acgulîya stirî serê Îsa û çuxê şîrk lê derk'ete derva. Pîlato gote wan: «Va ye ew meriv»!

⁶ Gava serokên k'ahînan û xizmetk'aran ew dît, kirine qîr'în û gotin: «Wî xaç ke, wî xaç ke»! Pîlato gote wan: «Hûn wî bibin xaç kin. Ez xwexa t'u sûcî wîda nabînim».

⁷ Cihûyan lê vegerand got: «Qanûneke me heye, gerekê anegorî wê qanûnê ew bê kuştinê, çimkî wî xwe Kur'ê Xwedê hesab kir».

⁸ Gava Pîlato ev yek bihîst, hê tirs k'ete ser. ⁹ Ew dîsa çû hindurê rewşxanê û gote Îsa: «Tu ji k'u yî»? Lê Îsa caba wî neda. ¹⁰ Pîlato gotê: «Tu minr'a xeber nadî? Nizanî, ku hikumê min heye te berdim û hikumê min heye te bidime xaçkirinê?»

¹¹ Îsa lê vegerand got: «Heger ji jor ter'a nehata dayînê, t'u hikumê te wê li ser min nebûya. Lema gunehê wî, yê ez dame destê te hê mezin e».

¹² Pey wê yekêra Pîlato *manîkê* diger'ya, ku Îsa berda, lê cihûyan kire qîr'în û gotin: «Heger tu vî merivî ber'dî, ne hevalê Qeyser î! Her k'ê ku xwe p'adşa hesab dike, ew raberî Qeyser e»!

¹³ Gava Pîlato ev yek bihîst, Îsa derxiste derva û xwexa li herema dîwanê rûnişt, wî cîyê ku wêra digotin:

«Selê Kevirî», bi îbranî «Gabata». ¹⁴ Roja îniya* Cejina Derbazbûnê bû, nîvro nêzikî siheta donzdehan Pîlato cihûyanra got: «Va ye p'adşayê we»!

¹⁵ Lê wana kire qîr'în: «Wî bibe, wî bibe! Wî xaç ke»! Pîlato gote wan: «P'adşayê we xaç kim»? Serokên k'ahînan lê vegerandin: «Pêştîrî Qeyser p'adşakî meyi din t'une»! ¹⁶ Hingê ewî Îsa da destê wan, ku bê xaçkirinê.

XAÇKIRIN Û MIRINA ÎSA
(Metta 27:32-56; Marqos 15:21-41; Lûqa 23:26-49)

Wan Îsa hilda birin. ¹⁷ Îsa xaçê xwe hilda û derk'ete wê dera ku jêr'a «Cîyê Qafê *mirîyan*» digotin, bi îbranî «Golgota». ¹⁸ Li wê derê ew t'evî du merivên din xaç kirin, her yek li alîkî wî, Îsa nava wanda bû. ¹⁹ Pîlato t'extek jî nivîsî û fêza xaç xist, ku aha nivîsar bû: «ÎSAYÊ NISRETÊ, P'ADŞAYÊ CIHÛYAN». ²⁰ Gelek cihûyan ev nivîsara ser t'ext xandin, çimkî ew dera ku Îsa lê hatibû xaçkirinê nêzikî bajêr bû û bi îbranî, latîni û yûnanî hatibû nivîsarê. ²¹ Serokk'ahînen cihûyan Pîlator'a gotin: «Nenivîse <P'adşayê cihûyan>! Lê binivîse <Wî got: Ez P'adşayê cihûyan im>». ²² Pîlato got: «Min çi nivîsî, nivîsî».

²³ Gava eskeran Îsa xaç kirin, k'incên wî hildan, kirine çar p'aran, her eskerekîr'a p'arek. Lê çuxê wî ji sêrî heta binî hûnandî û bêdirûn bû. ²⁴ Hingê gotine hevdu: «Werin em vê neqelêşin, lê p'êşk bavêjin, k'a wê p'ara k'ê bik'eve». *Ev aha bû*, ku nivîsar bê sêrî, ku dibêje: «K'incên min li nav hevda p'arevekirin û ser çuxê min p'êşk avîtin».† Awa eskeran ev tişt kir.

²⁵ Li ber xaçê Îsa dîya wî, xatîya wî Meryema jina Klopas û Meryema Mejdalanî sekinî bûn. ²⁶ Îsa ku dîya xwe û ew şagirtê ku wî ew hiz dikir li wir sekinî dîtin, gote dîya xwe: «Evdê! Va ye kur'ê te»! ²⁷ Paşê gote şagirtê xwe: «Va ye dîya te»! Ji hingêda vî şagirtî ew bire mala xwe.

²⁸ Pey vê yekêr'a Îsa zanibû, ku her tiştên wê bibûna îdî bûn, hingê got: «Ez t'î me», ku nivîsar bê sêrî. ²⁹ Li wir derdaneke sirkêva dagirtî hebû. Wana kevez sirkêda kir, serê *mijtika kevezê* pêva danîn û dirêjî ber devê wî kirin. ³⁰ Gava Îsa sirke vexwar, got: «T'emam bû»! Serê xwe daxist û ruhê xwe da.

³¹ Ev yek ku roja îniyêda bû, cihûyan nedixast cinyaz li ser xaç bimana, çimkî ew şemî bona wan rojeke gelekî k'ifş bû. Wana hîvî ji Pîlato kir, ku hestûyên renên xaçbûyîyan bêne şkênandinê û ji wir bêne hildanê. ³² Hingê esker hatin, pêşiyê hestûyên renên yekî şkênandin û peyr'a renên yê din, ku t'evî wî hatibû xaçkirinê. ³³ Lê gava ewana nêzikî Îsa bûn û dîtin ew îdî mirye, wana hestûyên renên wî neşkênandin. ³⁴ Lê dîsa ji eskeran yekî rim kire nekxa wî û pêr'a-pêr'a avê û xûnê dane der. ³⁵ Yê ev yek dît şehdetî da, ku hûn jî bawer bikin. Şehdetîya wî rast e û ew dizane ku rastiyê dibêje. ³⁶ Eva yeka bû, ku ew nivîsar bê sêrî: «T'u hestûyê wî wê neyê şkênandinê».‡ ³⁷ Nivîsareke din jî aha dibêje: «Ewê li wî binihêrin, k'êleka k'ê qul kirin».§

T'IRBA ÎSA
(Metta 27:57-61; Marqos 15:42-47; Lûqa 23:50-56)

³⁸ Pey vê yekêr'a Ûsivê ji Arîmetiyayê, ku şagirtê Îsa bû, lê ji tîrsa cihûyan xwe nedida k'ifşê, hîvî ji Pîlato kir, ku cinyazê Îsa ji xaçê bine xwarê û Pîlato destûr dayê. Hingê ew çû cinyazê Îsa ji xaç anî xwarê. ³⁹ Nîkodêmo jî wîr'a hat, yê ku pêşda şev hatibû cem Îsa, wî weke sî kilogiram ûd û zimir nava hevxiştî anî. ⁴⁰ Cinyazê Îsa hildan, li anegorî rizmê cihûyan biharet lê dan û ew qedekê k'itanîda k'efen kirin. ⁴¹ Li wê dera ku Îsa lê hatibû xaçkirinê baxek hebû û wî baxîda jî t'irbeke nû hebû, ku hê t'u kes têda nehatibû danînê. ⁴² Îsa wê t'irbêda danîn, çimkî roja îniya cihûyan bû, t'irb jî nêzik bû.

T'IRBA VALA
(Metta 28:1-10; Marqos 16:1-8; Lûqa 24:1-12)

20 ¹ Roja yekşemê, qereberbanga sibehê zû, Meryema Mejdalanî çû ser t'irbê. Nihêrî, wê kevir ji ber *devê* t'irbê wêda kirî ye. ² Pêr'a-pêr'a revî çû cem Şimhûn-Petrûs û şagirtê din, yê ku Îsa jê hiz dikir û wanr'a got: «Xudan ji t'irbê derxistine û em nizanin ew danîne k'u»!

³ Petrûs û şagirtê din *lez* derk'etin û çûne berbi t'irbê. ⁴ Her du jî hevr'a direvyan, lê şagirtê din ji Petrûs zûtir direvya û berî wî gihîşte ser t'irbê. ⁵ Wî xwe qûz kir û nihêrî, k'efen li wir e, lê xwexa nek'ete hindur. ⁶ Hingê Şimhûn-Petrûs, ku pey wî dihat gihîştê, k'ete hindurê t'irbê, nihêrî, wê k'efen li wir e ⁷ û destmala sêrî ne t'evî k'efen bû, lê qatkirî alîkî danî bû. ⁸ Paşê şagirtê din jî k'ete hindur, yê ku berî *Petrûs* gihîştibû ser t'irbê. Wî dît û bawer kir. ⁹ Wana hê nivîsar fem nekîribû, ku gerekê Îsa ji mirinê zêndî bûya. ¹⁰ Pey vê yekêr'a şagirt vegeryane malên xwe.

ÎSA XWE NÎŞANÎ MERYEMA MEJDELANÎ DIKE
(Marqos 16:9-11)

¹¹ Lê Meryem ji t'irbê der sekinî bû û digirya. Wê bi girî xwe qûz kir û li hindurê t'irbê nihêrî, ¹² hingê didît, wê du milyak'etên k'incîpî, li wî cîyê ku cinyazê Îsa lê danîbû rûniştine, yek berserîyê, yê din bînp'îyê.

* 19:14 Fikira xebera «îni» bi zimanê îbranî ev e: «t'ivdarekdîtin.»

† 19:24 Zebûr 22:18.

‡ 19:36 Derk'etin 12:46; Zebûr 34:20.

§ 19:37 Zekerîya 12:10.

¹³ Milyak'etan wêr'a got: «Evdê! Tu çima digirîy?» Meryemê got: «Xudanê min hildane û ez nizanîm ew danîne k'u». ¹⁴ Gava ewê eva yeka got, li pişt xweva zivir'î û dît Îsa li wir sekinî ye, lê wê nizanîbû ew Îsa ye. ¹⁵ Îsa gote wê: «Evdê, tu çima digirîy? Tu li k'ê diger'î?» Meryemê t'irê qey baxvan e, got: «Xweyo, heger te ew hildaye, bêje min te ew danîye k'u, ku ez wî ji wir hildim». ¹⁶ Îsa got: «Meryem!» Meryemê berê xwe wîda kir û bi îbranî got: «Rabbonî!» ku tê femkirinê: «Dersdar».

¹⁷ Îsa gote wê: «Min negire, çimkî ez hê ranebûme cem Bavê xwe. Lê her'e cem birayên min û bêje wan. <Ezê rabime cem Bavê xwe û cem Bavê we, cem Xwedêyê xwe û cem Xwedêyê we>». ¹⁸ Meryema Mejdelanî çû cem şagirtan û got: «Min Xudan dît» û Îsa çî wêr'a gotibû wanr'a got.

ÎSA XWE NÎŞANÎ ŞAGIRTAN DIKE
(Metta 28:16-20; Marqos 16:14-18; Lûqa 24:36-49)

¹⁹ Hema wê êvarê, roja yekşemê, çaxê şagirt hevr'a civyayî bûn û ji tirsî cihûyan jî derî dadayî bûn, Îsa hat nava wanda sekinî û gote wan: «Haştî wer'a». ²⁰ Ev tişt got û dest û nekxa xwe nîşanî wan kirin. Hingê şagirt gelekî şa bûn, gava Xudan dît. ²¹ Îsa dîsa got: «Haştî wer'a. Çawa ku Bavê ez şandim, usa jî ez we dişînim». ²² Eva yeka ku got, p'ifî ser wan kir û gote wan: «Hanên Ruhê Pîroz *bistîn*». ²³ Hûn gunehên k'ê bibaxşînin, ewê bêne baxşandinê, lê li k'ê nebaxşînin, li wan neyê baxşandinê».

TÛMAYÊ KÊMBAWER Û MEREMÊ VÊ KITÊBÊ

²⁴ Çaxê Îsa hat, Tûmayê ku yekî ji her donzdehan bû, ku wîr'a «Heval-cêwî» digotin, ne t'evî wan bû ²⁵ Hingê şagirtên din gotine wî: «Me Xudan dît». Ewî gote wan: «Heta ez destên wîda cîyê mixan nebînim, t'îliya xwe nekime cîyê mixan û destê xwe jî nekime nekxa wî, bawer nakim».

²⁶ Pey heşt rojanr'a, şagirtên Îsa dîsa malda bûn û Tûma jî wanr'a bû. Derî dadayî bûn, lê Îsa hat, nava wanda sekinî û got: «Haştî wer'a». ²⁷ Paşê gote Tûma: «T'îliya xwe bîne û destên min binihêre, destê xwe jî bîne û bike nekxa min. Nebawer nibe, lê bawermend be!»

²⁸ Tûma lê veğerand got: «Xudanê min û Xwedêyê min!» ²⁹ Îsa gotê: «Te ez dîtîm lema bawer kir? Xwezî li wan, yên nedîtine, lê bawer dikin!»

³⁰ Îsa li ber şagirtên xwe gelek nîşanên din jî kirin, yên ku vê kitêbêda nehatine nivîsarê. ³¹ Lê ev hatine nivîsarê, ku hûn bawer bikin, ku Îsa ye Mesîh, Kur'ê Xwedê û bi vê bawerîya ser navê wî jîyîna we hebe.

ÎSA Û GIRTINA MESÎYAN

21 ¹ Pey vê yekêr'a Îsa dîsa xwe li devê gola Teberîyayê nîşanî şagirtên xwe kir. Ew aha bû: ² Şimhûn-Petrûs, Tûmayê ku jêr'a digotin «Heval-cêwî», Natanyêlê ji Qanaya Celîlê, kur'ên Zebedî û du şagirtên Îsaye din hevr'a bûn. ³ Şimhûn-Petrûs gote wan: «Ez diçim mesîyan bigirim». Wana gote wî: «Em jî ter'a tèn». Hingê ew rabûn çûn k'etine qeyikê, lê wê şevê t'u tişt negirtin.

⁴ Berbangê Îsa li devê golê sekinî, lê şagirtan nizanîbû ew Îsa ye. ⁵ Hingê Îsa gote wan: «Lawikno! Qet we tişteki xwarinê girtye?» Wana lê veğerand got: «Na». ⁶ Wî gote wan: «T'or'ê bavêjine alîyê qeyikêye rastê, hûnê bigirin». Wana jî t'or' avit û ji p'iranîya mesîyan nikaribûn t'or' bik'işandana. ⁷ Hingê wî şagirtê ku Îsa jê hiz dikir gote Petrûs: «Ew Xudan e!» Şimhûn-Petrûs gava bihîst ku ew Xudan e, k'incê xwe avîte ser xwe, çimkî ew tazî bû û xwe avîte golê. ⁸ Lê şagirtên din t'or' mesîyanva k'işandin û bi qeyikê gihîştine bejê, çimkî ne dûr bûn, lê weke sed mêtirî dûrî bejê bûn.

ÎSA T'EVÎ ŞAGIRTÊN XWE NAN DIXWE

⁹ Gava ew derk'etine bejê, wir agirê ji k'omirê vexistî dît, mesî li ser û nan jî li ber. ¹⁰ Îsa gote wan: «Hinek ji wan mesîyên ku we niha girtine bînin». ¹¹ Şimhûn-Petrûs jî k'ete qeyikê û t'or' k'işande bejê, ya ku sed pêncî sê mesîyên gir têda bûn. Haqas gelek bûn jî, lê dîsa t'or' neqelişî.

¹² Îsa gote wan: «Werin taştê bixwin». Ji şagirtan t'u kesî jî turuş nekir jê bipirsîya: «Tu k'î yî?» Çimkî wana dizanîbû ku ew Xudan e. ¹³ Hingê Îsa nêzik bû, ew nan hilda da wan û usa jî mesî. ¹⁴ Eva îdî cara sisyan bû, ku Îsa pey mirin û zêndîbûna xwer'a şagirtên xweva k'ifş bû.

ÎSA, PETRÛS Û ŞAGIRTÊ HIZKIRÎ

¹⁵ Pey firawîn xwarinêr'a, Îsa pirs da Şimhûn-Petrûs: «Şimhûnê kur'ê Yûhenna, tu min ji wan zêdetir hiz dikî?» Petrûs gote wî: «Belê Xudan, tu dizanî ku ez te hiz dikim». Îsa gote wî: «Bexên min biç'êrîne».

¹⁶ Îsa cara dudan gote wî: «Şimhûnê kur'ê Yûhenna, tu min hiz dikî?» Ewî got: «Belê Xudan, tu dizanî ez te hiz dikim». Îsa gote wî: «Şivantîyê pezên min bike».

¹⁷ Îsa cara sisyan ji Petrûs pirsî: «Şimhûnê kur'ê Yûhenna, tu min hiz dikî?» Hingê Petrûs ber xwe k'et, ku wî sê caran wîr'a got: «Tu min hiz dikî?» û got: «Xudan, tu her tiştî dizanî, tu dizanî ku ez te hiz dikim». Îsa wîr'a got: «Pezên min biç'êrîne. ¹⁸ Ez rast, bexêlif dibêjime te, çaxê tu xort bûyî, te xwexa qayîşa xwe girêdida û k'uda te dixast diçûyî. Lê çaxê tu kal bî, tuê destên xwe bilind kî û yekî din wê piştî te girêde û te bibe wê dera ku tu naxazî her'êyî». ¹⁹ Wî ev yek got, da k'ifşê, ku ewê bi mirina çî cûr'eyî rûmetê bide Xwedê. Pey vê yekêr'a wî

Yôhenna 21

gote Petrûs: «Pey min were». ²⁰ Hingê Petrûs pey xweva zivir'î, dît ew şagirtê ku Îsa wî hiz dike pey wan tê. Eva ew şagirt bû, yê ku li dema Şîvê xwe avîtibû hemêza Îsa û gotibû: «Xudan k'î ye ewê ku wê nemamîya te bike»? ²¹ Petrûs gava ew dît, ji Îsa pirsî: «Xudan, lê îcar evê çawa be»? ²² Îsa gote wî: «Heger ez bixazim, ku ew bimîne heta ez bê, çî ter'a ye? Tu pey min were!» ²³ Eva gotina nava biratîyêda *usa* bela bû, yanê ew şagirt wê nemire. Lê Îsa bona wî negotibû, ku ewê namire, lê gotibû: «Heger ez bixazim, ku ew bimîne heta ez bê, çî ter'a ye»? ²⁴ Eva ew şagirt e, yê ku bona van tiştan şehdetîyê dide, usa jî ev *Mizgînî* nivîsî. Em dizanin ku şehdetîya wî rast e. ²⁵ Û hê gelek kirên din jî hene, yên ku Îsa kirine. Heger ew bi hûr-gilî bihatana nivîsarê, bi t'exmîna min, ew kitêbên nivîsar wê dinyayêda cî nebûna.

K'ARÊN ŞANDÎYAN

PÊŞGOTIN

Ev Kitêba «K'arên Şandîyan» bi destê Lûqayê mizgîndar hatye nivîsarê û ew dûmayîya kitêba «Mizgîniya» ku wî nivîsî ye. Bi vê nivîsarê tê k'ifşê, ku peyçûyên Îsa Mesîh bi rêberîya Ruhê Pîroz li Orşelîmêda, Cihûstanêda, Sameryayêda û welatên mayînda çawa bûne şehdeyên Îsa. Vê kitêbêda em dîroka belabûna mesîhîyê dibînin. Ew ji Filistîne, ji nava cihûyan destpê bû û paşê bû bawerîya gelek miletan. Usa jî tê k'ifşê, ku civîna Mesîhe nû bi çî te'lî-tengîyê bingeha xwe girt û çawa bi alîk'arîya Ruhê Pîroz nava wan oxirmên giranda pêşda diçû.

Em dikarin vê kitêba «K'arên Şandîyan» belayî ser van sê p'aran kin:

1. Belabûna mesîhîyê Orşelîmêda. (1:1-8:3)
2. Belabûna mesîhîyê Cihûstanêda, Sameryayêda, Şamêda û der-dorên Filistînêda (8:4-12:25)
3. Belabûna mesîhîyê li nava welatên der-dorên Be'ra Mezinda heta Romayê (13:1-28:31)

Ji k'arên vê kitêbêda nivîsar, yên here berbiç'ev ew in, ku k'arên Ruhê Pîroz aşkere tene k'ifşê, ku ji Roja Pêncîye hesabda girtî, li Orşelîmê li ser bawermendanda barî, qewat da wan û rêberîya wan kir û civîn nava k'arê Xwedêda şidand.

SERECEMA KITÊBÊ

Soz, t'emî û hiljorbûna Îsa (1:1-11)
Hilbijartina Matîyo û dannasînen li Orşelîmê (1:15-8:3)
Dannasînen li Cihûstan û Sameryayê (8:4-12:25)
Rêwîtiya Pawlose pêşîn (13:1-14:28)
Şewra civîna li Orşelîmê (15:1-35)
Rêwîtiya Pawlose dudan (15:36-18:22)
Rêwîtiya Pawlose sisyan (18:23-21:16)
Pawlos Orşelîmêda û birina wîye heta Romayê (21:17-28:31)

SOZ Û T'EMÎYA ÎSA (Lûqa 24:49)

1 ¹ Têyoffloyê xweyhurmet, kitêba xweye pêşinda min li ser wan hemû tiştên bûyî nivîsîn, çî ku ji serê-sêrîda Îsa kir û hîn kir, ² heta wê roja ku bi Ruhê Pîroz t'emî li şandîyên xweye hilbijartî kir û hiljor berbi ezmên hate birinê. ³ Pey wê yekê'a, ku ew çerçirî, wî xwe gelek caran nîşanî wan dida û îzbat dikir, ku rast ew zêndî ye. Navbera çil rojîda wanva k'ifş dibû û bona P'adşatîya Xwedê wanr'a xeber dida. ⁴ Carekê çaxê ewî t'evî wan nan dixwar, hingê t'emî da wan got: «Ji Orşelîmê dernek'evin, lê hîvîya sozê Bavê bisekinin, bona k'îjanî we ji min bihîst. ⁵ Yûhenna bi avê nixamt, lê hûnê çend rojan şûnda bi Ruhê Pîroz bêne nixamtinê».

HILJORBÛNA ÎSA (Marqos 16:19-20; Lûqa 24:50-53)

⁶ Gava şagirt bi hevr'a cîkî bûn, wan ji Îsa pirsîn û gotinê: «Xudan, vî waxtîda tuê P'adşatîya Îsraêlê dîsa qedîm kî?» ⁷ Ewî li wan vegerand got: «Ew pirs li we nak'evê, ku hûn wan waxt û zemanan bizanibin, yên ku Bavê bi hikumê xwe k'ifş kirine. ⁸ Lê çaxê Ruhê Pîroz bê ser we, hûnê qewatê bistînin û ji Orşelîmê girtî t'emamîya Cihûstanêda, Sameryayêda û heta serê dinyayê bibine şehdeyên min». ⁹ Gava ev yek got, ber ç'evên wan hiljor berbi ezmên hate birinê û e'wreki ew ji ber ç'evê wan veşart.

¹⁰ Ew hê zûr bibûn li çûyîna wîye ezmên dinihêrin, wê du merivên k'incipî cem wan sekinîn ¹¹ û gotin: «Gelî celîfîyan! Hûn çima usa sekinî ne û li ezmên dinihêrin? Ew Îsayê ku ji nav we hiljorî ezmên bû, wê usa jî bê, çawa we çûyîna wîye li ezmên dît».

HILBIJARTINA MATÎYO

¹² Hingê ewana ji ç'îyayê Zeytûnê vegeryane Orşelîmê, ku rîya rojeke şemîyê dûrî Orşelîmê bû. ¹³ Gava hatine bajêr, çûne odexana jorin, wî cîyê ku Petrûs û Yûhenna, Aqûb, Endrawîs, Fîlîpo, Tûma, Bertolomeyo, Metta, Aqûbê Halfawo, Şimhûnê welatp'arêz û Cihûdayê Aqûb têda diman. ¹⁴ Van hemûyan her t'im hevr'a bi t'evî k'ulfetan û Meryema dîya Îsa û birayên wî dua dikirin.

¹⁵ Wan rojanda Petrûs nava bawermendanda rabû, (li wir weke sed bîst merivî bûn) û got: ¹⁶ «Gelî birano! Gerekê ev nivîsar bihata sêrî, çawa ku Ruhê Pîroz hê berî vê yekê bi zarê Dawid bona Cihûda gotibû, ku ew bû rêberê ewên ku Îsa girtin. ¹⁷ Ew t'evî me nav hesabê meda bû û p'ara wî jî nava vê xizmetîyêda bû».

¹⁸ Ewî bi maşê kirê xweyî neheq erdek stand û ser sêrî k'et, zik lê qelişî dil-hinavê wî hemû rijyan. ¹⁹ Eva yeka hemû binelîyên Orşelîmêva aşkere bû, heta ku bi zimanê xwe jî wî erdir'a «Heqildima» nav kirin, awa gotî, «Erdê xûnê». ²⁰ Petrûs dûmayî kir got: «Çawa kitêba Zebûranda jî nivîsar e: <De bira mala wî wêranbûyî be, t'u kes têda nemîne> û: <K'arê xizmetîya wî bira yekî din bistîne>». ²¹ Awa gerekê yekî ji wan be, yên ku t'emamîya wî waxtî waxtî t'evî me bûne, çaxê Xudan Îsa bi mer'a t'evayî diger'ya, ²² ji nixamtina Yûhennada girtî heta wê roja ku ew ji nav me hiljorî ezmên bû. Ew gerekê t'evî me bibe şehdeyê zêndîbûna wîye ji mirinê».

²³ Du meriv dane sekinandinê, yek Ûsivê ku jêr'a Barsabo digotin (ku navê wî danîbûn Yûsto) û yê dîn Matîyo.

²⁴ Dua kirin û gotin: «Xudan, tu ku dilê her kesî dizanî, ji van her duyan k'îjanî tu hildibijêrî bide k'ifşê, ²⁵ ku vê

* 1:20 Zebûr 69:25; 109:8.

xizmetîya şandîtyê bistîne, ji k'îjanê Cihûda k'et, ku her'e cîyê xwe». ²⁶ P'êşk li ser wan avîtin, ew p'ara Matîyo k'et û ewa li ser hesabê yanzdeh şandîyanda zêde bû.

HATINA RUHÊ PÎROZ

2¹ Gava Roja Pêncîye k'ifş hat, hemû jî hevr'a cîkî bûn. ² Nişkêva ji ezmên mîna dengê bayê qayîm dengê hat û ew mala ku têda rûniştibûn pêda t'ije kir. ³ Hingê zimanên mîna alava êgir wanva k'ifş bûn û li ser ji wan her kesî danîn. ⁴ Hemû bi Ruhê Pîrozva t'ije bûn û destpê kirin zimanên başqe xeber dan, çawa ku Ruhê Pîroz ew didane xeberdanê.

⁵ Hingê Orşelîmêda cihûyên xwedêtirs diman, ew ji nav her milletên bin p'er'ê ezmên hatibûn. ⁶ Çaxê ew deng hat, k'omeke merivane giran civya û t'evîhev bû, çimkî dibihîstin, ku ewana bi zimanên ji wan her kesî xeber didan ⁷ û heyr-hujmek'ar, zendegirtî digotin: «Ê ne ev hemûyên ku xeber didin ji Celîlê ne? ⁸ Lê çawa ji me her kes wî zimanî dibihê, k'îjanêda em dinê k'etine? ⁹ Partoyî, medî, îlamî, binelîyên Mesopotamyayê, Cihûstanê, Kepedokyayê, Pontosê, Asyayê, ¹⁰ Firîgyayê, Pamfilyayê, Misirê û yên alîyê Lîbya nêzikî Kûrênê, usa jî xerîbên ji Romê, ¹¹ cihû û yên ku bawerîya cihûyan hildane, usa jî kirêtî û e'reb. Em dibihên ku evana bi zimanê me li ser k'arên Xwedêye mezin dibêjin». ¹² Hemûyan heyr-hujmek'ar û şaşmayî digotîne hevdu: «Ev çi hewal e»? ¹³ Lê hinekan jî qerf dikirin û digotin: «Pê şeraba nû serxaş bûne».

DANNASÎNA PETRÛS Û YEKTÎYA BAWERMENDAN

¹⁴ Hingê Petrûs t'evî her yanzdehan rabû û bi dengê bilind gote wan: «Gelî cihûno û hemûyên ku Orşelîmêda dimînin! Bira eva yeka weva aşkere be û guh bidine xeberên min. ¹⁵ Evana ne serxaş in, çawa hûn difikirin, hê sibeh zû sihet nehe ye. ¹⁶ Lê eva ew e, çi ku Yowêl p'êxember gotye: ¹⁷ <Rojên axirîyêda, Xwedê dibêje, wê aha be: Ezê ji Ruhê xwe ser hemû merivanda bibarînim, kur' û qîzên weyê p'êxembertîyê bikin, cahilên weyê dîtînokan bibînin û kal-pîrên weyê jî xewnan *bibînin*. ¹⁸ Ezê wan rojanda Ruhê xwe ser xulam û carîyên xweda jî bibarînim û wê p'êxembertîyê bikin. ¹⁹ Jor li ezmên tiştên ecêb bidime k'ifşê û jêr li ser erdê jî nîşanan~ xûn û agir, dû û dûxan. ²⁰ Te'vê biqare û hîvê jî sor be mîna xûnê, hê berî hatina Roja Xudane mezine nave nîşan. ²¹ Û wê aha be, ku her k'î gazî navê Xudan bike wê rizgar be>».

²² Gelî îsraêlîyan, van xeberan bibihên! Îsayê Nisretê, ku ji Xwedêda merivekî k'ifşkirî bû, bi *destê* wî Xwedê nava weda nîşan, k'iryamet û k'arên zor kirin, çawa hûn xwexa jî dizanin. ²³ Xwedê hê pêşda bona wî qîrar kiribû û bi zanebûna Xwedê ew k'ete destê we û we jî ew bi destê nerastan darva qemitand, kuşt. ²⁴ Lê Xwedê cizaretên mirinê vekirin~ ew ji mirinê zêndî kir, çimkî ji zefta mirinê der bû, ku hikumî ser wî bikira. ²⁵ Dawid bona wî dibêje: <Min t'imê Xudan pêşîya xweva didît, çimkî ew li alîyê minî rastê ye, ku nelik'umim. ²⁶ Lema dilê min şa bû, zimanê min jî ji şabûna reqîsî, bedena min jî wê bi guman bijî, ²⁷ çimkî tuê kesa min cenimêda nehêlî û ne jî tuê bihêlî, ku Pîrozê te birize. ²⁸ Te rîyên jîyîne minva dane naskirinê û tuê şabûna dîndara xweva min t'ije kê>.[†]

²⁹ Gelî birano! Hewce ye ku ez bona Dawidê bavpêşê me aşkere bêjime we, ku ew mir û kirine t'irbê, t'irba wî heta roja îro jî nava meda ye. ³⁰ Lê ew ku p'êxember bû, wî dizanibû ku Xwedê bi sond wîr'a soz daye, ku ji bedena wî yekî zêndî ke û dayne ser t'extê wî. ³¹ Ewî eva yeka hê pêşda dît û bona zêndîbûna Mesîh got, ku kesa wî cenimêda nehate hiştinê û ne jî bedena wî rizî. ³² Eva Îsa ye, yê ku Xwedê ew ji mirinê zêndî kir û em hemû jî şehde ne. ³³ Xwedê ew hilk'işand da alîyê xweyî rastê, ewî jî Ruhê Pîrozî sozdayî ji Bavê stand û jorda barand, çawa hûn niha dibînin û dibihên. ³⁴ Rast e Dawid neçûbû ezmanan, lê wî xwexa eva yeka got: <Xudan gote Xudanê min, li alîyê minî rastê rûnê, ³⁵ heta ez dijminên te bikime binê p'îyên te>.[‡] ³⁶ Niha bira t'emamîya mala Îsraêlê qenc bizanibe, ku ew Îsayê we xaç kir, Xwedê ew him kire Xudan, him jî Mesîh».

³⁷ Gava wana eva yeka bihîst, dilê xweda p'oşman bûn, gotine Petrûs û şandîyên mayîn: «Em çi bikin, birano»? ³⁸ Petrûs gote wan: «Vegerin û bira ji we her kes bi navê Îsa Mesîh bona baxşandina gunehan bê nixamtinê û hûnê Ruhê Pîroz p'êşkêş bistînin. ³⁹ Ev soz bona we û lawên we ye, usa jî bona hemûyên dûr e, ewên ku Xudan Xwedê me wê gazî wan ke».

⁴⁰ Petrûs bi gelek xeberên din jî bi merîfetî şehdetî dida û hîvî jî wan dikir digot: «Xwe ji vî nisilê neheq aza kin». ⁴¹ Ewên ku xeberên wî hildan, bi avê hatine nixamtinê û wê rojê weke sê hezaran li hev zêde bûn. ⁴² Wan t'imê xwe li hînkirina şandîyan digirt, li hev dicivyan, nan ker dikirin û dua dikirin.

⁴³ Saw û tirs k'ete ser her kesî û bi destê şandîyan gelek k'iryamet û nîşan dibûn. ⁴⁴ Hemû bawermend cîkî bûn û her tiştên wan yek bûn. ⁴⁵ Hebûk û milk'ê xwe jî difirotin û belayî hemûyên hewce dikirin. ⁴⁶ Her roj bi t'ifaq diçûne p'aristxanê, malanda nan ker dikirin û bi dilê şa û rast xwarin dixwarin, ⁴⁷ şikirîya xwe Xwedê danîn û t'emamîya cimetê jî hurmeta wan digirt. Xudan jî roj bi roj hesabê rizgarbûyîyan zêde dikir.

QENCBÛNA YÊ NIGANDA SEQET

3¹ Carekê Petrûs û Yûhenna li dema duakirina siheta sisyan hildik'işîyane p'aristxanê. ² Merivekî seqet hebû,

* 2:21 Yowêl 2:28-32.

† 2:28 Zebûr 16:8-11.

‡ 2:35 Zebûr 110:1.

ji zikmakîyêda niganda, ku her roj danîn ber dergehê p'aristxanêyî ku Bedew dihate gotinê dadanîn, ku ji yên dihatine p'aristxanê p'ars bikira. ³ Evî ku dît Petrûs û Yûhenna dik'evine p'aristxanê, lava ji wan kir ku tiştêkî bidinê. ⁴ Petrûs û Yûhenna li wî nihêrîn û Petrûs got: «Li me binihêre!» ⁵ Ewî jî li wan nihêrî û ç'evê wî lê bû, ku wê tiştêkî ji wan bistîne. ⁶ Hingê Petrûs got: «Zêr' û zîvê min t'une, lê çî min heye ezê bidime te. Bi navê Îsa Mesîhê Nisretê rabe biger'e». ⁷ Destê wîyî rastê girt rakir, pêr'a-pêr'a qudûmê çokan û gûzekên wî şidyan. ⁸ Wî hevr'az banzda û sekînî, destpê kir ger'ya û t'evî wan k'ete p'aristxanê diger'ya, banzdidî û şikirî dida Xwedê. ⁹ Çaxê t'emamîya cimetê dît ku ew diger'e û şikirîyê dide Xwedê, ¹⁰ nas kirin ku ew e, yê bona p'arsê ber dergehê p'aristxanêyî Bedew rûdinişt. Û bona tiştê li ser wî bûyî zendegirtî û heyr-hujmek'ar mabûn.

PETRÛS HÊWANGEHA SILÊMANDA DANNASÎN DIKE

¹¹ Evî ku Petrûs û Yûhenna ber'nedidan, t'emamîya cimetê bi ecêbmayî berbir'î wan bezî hate wê dera ku jêr'a hêwangeha Silêman digotin. ¹² Petrûs ev yek ku dît, gote cimetê: «Gelî Îsraêlîyan! Çima hûn ser vê yekê ecêb mane? Çima bi cûrekî li me dinihêrin? Qey bêjî me bi qewat yan xwedênasiya xwe ew da ger'andinê? ¹³ Xwedêyê Îbrahîm, Îshaq, Aqûb û Xwedêyê kal-bavên me, Berdestîyê xwe Îsa rûmet kir. We nemamîya wî kir û li ber Pîlato ew jî xwe dûr xist, çaxê ewî qîrar kiribû ku wî ber'de. ¹⁴ We yê pîroz û rast ji xwe dûr xist û xast, ku yê merivkuj bona we bê ber'danê. ¹⁵ We ç'evkanîya jîyînê kuşt, lê Xwedê ew ji mirinê zêndî kir, em xwexa şehde ne. ¹⁶ Û bawerîya ser navê Îsa qewat da wî merivî, k'îjanî hûn dibînin û nas dikin. Belê, bawerîya ser navê wî eva li ber ç'evên we hemûyan qenc kir. ¹⁷ Niha gelî birano, ez zanim, ku we jî mîna mîrên xwe ji nezanîya xwe ew xirabî kir. ¹⁸ Lê Xwedê çawa berî vê yekê bi zarê hemû p'êxemberan bona cizareta Mesîhê xwe gotibû, usa jî kir. ¹⁹ Awa ji xirabîyê dûr k'evin û veqerine berbi Xwedê, ku gunehên we bêne retkirinê. ²⁰ Hingê waxtên jîyîndarîyê ji hizûra Xudan wê bîn û ewê Îsa bişîne~ wî Mesîhê ku berêda bona we k'ifş kirî ye. ²¹ Gerekê ew li ezmên bimîne, heta ku her tiştî bîne sêrî, çawa ku Xwedê hê berê pêşda bi zarê p'êxemberên xweyê pîroz gotibû. ²² Belê Mûsa got: <Xudan Xwedêyê we wê ji nav birayên we p'êxemberekî mîna min wer'a derxe. Her çî ku wer'a bêje, gerekê hûn guhdarîya wî bikin. ²³ Her k'î guhdarîya wî p'êxemberî neke, ji nav cimetê wê bê bir'inê û undakirinê>. ²⁴ Û hemû p'êxemberan jî, ji Samoyêl girtî û yên peyr'a çî ku gotine, bona van rojan xeber dane. ²⁵ Hûn in warxurên p'êxemberan û wê peymanê, ya ku Xwedê t'evî kal-bavên we qedîm kir. Ewî gote Îbrahîm: <Bi zuretê te dua-dirozge wê her mîletên dinyayê bibe>. ²⁶ Xwedê Berdestîyê xwe Îsa bona her mîletan zêndî kir û pêşda şande cem we, ku dua-dirozge li we bike û aha we her kesî ji xirabîyên we veqerîne».

PETRÛS Û YÛHENNA LI BER CIVÎNA GIREGIRAN

¹ Petrûs û Yûhenna hê cimetêr'a xeber didan, k'ahînan û mîrê xizmetk'arên p'aristxanê t'evî sadûqîyan ser wanda girtin. ² Ewana aciz bibûn, çimkî wana cimet hîn dikir, ku Îsa ji mirinê zêndî bûye û îzbat dikirin, ku mirî wê zêndî bin. ³ Ew girtin avîtine hebsê heta, roja din, çimkî îdf berî êvar bû. ⁴ Lê gelekên ku xeber dibihîstin bawer kirin û hesabê wan gihîşte pênc hezaran.

⁵ Roja din mîr, rûspî û qanûnzan li Orşelîmê civyan. ⁶ Henanê serokk'ahîn, Qeyafa, Yûhenna, Skender û hemûyên mayîne ji xûn-qinêta serokk'ahîn ku li wir bûn, ⁷ Petrûs û Yûhenna nava xweda dane sekinandinê û pirsîn: «We bi çî qewatê yan bi çî navî eva yeka kir?» ⁸ Wê demê Petrûs bi Ruhê Pîrozva t'ijî gote wan: «Gelî mîrên cimetê û rûspîyan! ⁹ Heger bona vê qencîya ku vî seqetîr'a bû îro hûn ji me dipirsin, ku ew çawa qenc bûye, ¹⁰ bira weva û t'emamîya mîletê Îsraêlêva aşkere be, ku eva bi saya navê Îsa Mesîhê Nisretê li ber we qencbûyî sekinî ye, Îsayê ku we xaç kir û Xwedê ew ji mirinê zêndî kir. ¹¹ Ew e <ew kevirê ku ji we hosteyan hate bêrûmetkirinê û bû serê e'nîşkê>. ¹² Bi kesekî mayîn rizgarbûn t'une, çimkî bin p'er'ê ezmênda navekî din merivanr'a nehatye dayînê, ku em bikaribin bi wî rizgar bin».

¹³ Gava wan bêtirsîya Petrûs û Yûhenna dît û pê hesyan, ku evana merivne nexandî û nezan in, ecêb man û nas kirin, ku ew t'evî Îsa bûne. ¹⁴ Û ew merivê qencbûyî dîtin, ku t'evî wan sekînî bû û nikaribûn tiştêkî bigotana. ¹⁵ Hingê ferman dane ser wan, ku ew ji civîna giregiran derên û hevr'a şêwrîn, ¹⁶ gotin: «Em t'evî van merivan çî bikin? çimkî hemû binelîyên Orşelîmêva aşkere ye, ku bi destê van k'iryameteke berç'ev bû û em nikarin înk'ar kin. ¹⁷ Lê ku nava cimetêda hê bela nebe, em gefê li wan bixwin, ku bi wî navî qet kesîr'a xeber nedin».

¹⁸ Dîsa gazî wan kirin, t'emî kirine ser wan, ku bi navê Îsa qet xeber nedin û hîn nekin. ¹⁹ Lê Petrûs û Yûhenna li wan veqerandin û gotin: «Hûn xwexa bifikirin, k'a li ber Xwedê gelo rast e, ku em gur'a we bikin, lê ne ya Xwedê? ²⁰ Em nikarin bona wan tiştên me xwexa dîtin û bihîstin nekine dengî». ²¹ Wana dîsa gef li wan xwar û ber'dan. Û manîk ser wan nedîtin, ku ceza bidana wan, ji cimetê jî vedik'îşyan, çimkî hemûyan jî bona ew tiştê bûyî şikirî didane Xwedê. ²² Û ew merivê ku ev k'iryameta qencbûnê bona wî bû ji çil salî jortir bû.

DUAYÊ BAWERMENDAN

²³ Gava Petrûs û Yûhenna hatine ber'danê, ew çûne cem k'oma xwe û wanr'a her tişt gilî kirin, çî ku serokên k'ahînan û rûspîyan wanr'a gotibûn. ²⁴ Wana jî gava bihîst, hevr'a bi dengê bilind gazî Xwedê kirin û gotin: «Ya

* 3:23 Qanûna Ducarî 18:15, 18, 19.

† 3:25 Destpêbûn 22:18;

‡ 4:11 Zebûr 118:22.

K'arên Şandîyan 4,5

Xudan, Efirandarê erd, ezmên, be'rê û her tiştên nava wanda, ²⁵ te bi Ruhê Pîroz bi zarê bavê me Dawidê berdestîyê xwe got: «Çima hêtanos* qîlqîlîn û millet jî li ser tiştên p'ûç fikirîn? ²⁶ P'adşayên dinyayê hazir sekinîn û mîr hevr'a miqabilî Xudan û Mesîhê wî civyan».† ²⁷ Belê, rast vî bajarîda li ser berdestîyê te, Îsayê pîroz civyan, civyan, yê ku te ew gulrûn kir, Hêrodes û Pîlatoyê Pontosê t'evî miletan û cimeta Îsraêlê civyan ²⁸ û wan ew tişt kirin, çi ku te hê berêda anegorî qewat û qîrara xwe k'ifş kiribû ku bibin. ²⁹ Niha, ya Xudan, ser gefxarina wanda binihêre, xulamên xwer'a k'eremê bike, ku em bêtirs xebera te xeber din û ³⁰ destê xwe dirêj ke, ku bi navê berdestîyê te Îsayê pîroz nexaş qenc bin, nîşan û k'iryamet bibin». ³¹ Hema çawa wana dua kir, ew cîyê lê civyayî bûn hejya û her kes bi Ruhê Pîroz t'ije bû û xebera Xwedê bêtirs xeber didan.

YEKTÎYA BAWERMENDAN

³² Dil û ruhê t'emamîya cimeta bawermendan yek bû. Ji wan t'u kesî hebûka xwer'a nedigot: «Ya min e», lê her tiştên wan yek bû. ³³ Şandîyan bi qewata zor şehdetîya mirin û zêndîbûna Xudan Îsa didan û k'eremeke mezin ser wan hemûyan bû. ³⁴ Nava wanda t'u kes hewcê tiştêkî nîbû. Ewên ku xweyê erdan yan malan bûn, difirotin û qîmetê wan tiştên firotî danîn ³⁵ ber p'iyên şandîyan dadanîn û wana jî k'êr'a çi lazîm bûya bela dikirin. ³⁶ Awa yekî lêwî, ji Qubrisê, navê wî Ûsiv, ku şandîyan jêr'a digot Barnabas, ku tê femkirinê «Yê berdîlyê», ³⁷ erdekî wî hebû, firot, zîv anîn ber p'iyên şandîyan danîn.

HANANÎYA Û SAFÊRÎYA

5 ¹ Lê merivekî navê wî Hananîya jina xwe Safêriyayêva t'evayî milk'ek firot, ² ji qîmetê wê p'arek veşart, ku jin jî haş ji pê hebû û p'ara din jî anî li ber p'iyên şandîyan danî. ³ Hingê Petrûs wîr'a got: «Hananîya! Ev çawa bû, ku Şeytan qelpê xirab avîte dilê te, ku tu Ruhê Pîrozr'a derew bikî û ji qîmetê erdê p'arekê veşêrî? ⁴ Berî firotanê ne ew ya te bû? Û pey firotanêr'a jî qîmetê wê ne destê teda bû? Te çima ev yek kire dilê xwe? Te ne ku merivanr'a derew kir, lê Xwedêr'a». ⁵ Hananîya ev xeber hema bihîstin, k'et ruhê xwe da û tirseke mezin hemûyên ku bihîstin girt. ⁶ Cahil jî rabûn ew k'efen kirin û birine der û kirine gor'ê.

⁷ Weke sê sihetan derbaz bû, jina wî, ku nizanibû çi bûye, k'ete hindur. ⁸ Petrûs jê pirsî: «Bêje min, we milk'ê xwe hema haqasî firot?» Ewê got: «Belê, hema haqasî». ⁹ Hingê Petrûs gote wê: «Hûn çima bûne yek, ku Ruhê Xudan bicêribînin? Ê ne va ye dengê nigên wan merivên ku mêrê te kirine gor'ê, ji pişt dêrî tîn, wê te jî derxine der». ¹⁰ Pêr'a-pêr'a ew k'ulfet k'ete ber nigên wî û ruhê xwe da. Hingê cahil k'etine hindur, ew mirîti dîtin, hildan birin rex mêrê wê kirine gor'ê. ¹¹ Tirseke mezin k'ete ser t'emamîya civînê û wan hemûyên ku ev yek bihîstin.

K'IRYAMETÊN BI DESTÊ ŞANDÎYAN

¹² Bi destê şandîyan gelek nîşan û k'iryamet nava cimetêda dibûn. Hemû bi hevr'a hêwangeha Silêmanda dicivyan. ¹³ T'u kesî ji yên der newêrbû nêzîkî wan bûya, lê belê, cimetê hurmeta wan digirt. ¹⁴ Û k'oma jinan û mêran~ yên ku bawerîya xwe Xudan danîn, hê dîsa zêde dibûn. ¹⁵ Lema xelqê nexaş derdixistine ser rîyan, dadanîne ser darbestan û ber'an, ku çaxê Petrûs derbaz be, hema t'enê sîya wî bik'eve ser ji wan hinekan. ¹⁶ Ji bajarên der-doran jî k'oma merivan dihatine Orşelîmê, wan xwer'a nexaş û yên ku ji ruhên heram dizêryan danîn û hemû jî qenc dibûn.

ZÊRANDINA ŞANDÎYAN

¹⁷ Serokk'ahîn û hemûyên t'evî wî, ku ji k'omela sadûqîyan bûn, hevsûdiyêva t'ijî rabûn ¹⁸ dest avîtine şandîyan, avîtine hebsa t'omerîyê. ¹⁹ Lê milyak'etekî Xudan wê şevê dergehên hebsê vekirin, ew derxistine derva û gote wan: ²⁰ «Her'in p'aristxanêda bisekinin û van hemû gotinên vê jîyînê cimêtar'a bêjin». ²¹ Wana jî guhdarî kir, sibehê zû k'etine p'aristxanê, destpê kirin hîn kirin. Hingê serokk'ahîn k'oma xweva hat û bi t'evî t'emamîya k'oma rûspîyên Îsraêlê civîna giregiran civand û şandîyan hebsê, ku şandîyan bînin. ²² Lê gava berdestî çûn, ew hebsêda nedîtin, vegeryan hatin, gotin: ²³ «Hebs ji her alîyanva dadayî bû û nobedar jî li ber dergehên bûn, lê çaxê me vekir, t'u kes hindurda nedît». ²⁴ Gava serk'arê xizmetk'arên p'aristxanê û serokên k'ahînan ev xeber bihîstin, li ser wê yekê ecêb man, ku gelo çi bûne» ²⁵ Wê demê yek hat gote wan: «Bibihên, ew merivên we avîtibûne hebsê, p'aristxanêda sekinî ne û cimetê hîn dikin!» ²⁶ Hingê serk'arê xizmetk'aran berdestîyanva t'evayî çûn ew anîn, lê ne bi zorbetîyê, çimkî ji cimetê ditirsyan, ku wan nedine ber keviran.

²⁷ Ew birin ber civîna giregiran dane sekinandinê, serokk'ahîn pirs da wan got: ²⁸ «Gelo me sert t'emî neda we, ku hûn bi wî navî hîn nekin? Hela binihêrin, we bi hînkirina xweva Orşelîm t'ije kirye û dixazin cabdarîya xûna wî merivî bavêjine ser me». ²⁹ Petrûs û şandîyên mayînva cab dan gotin: «Em gerekê gur'a Xwedê bikin, ne ya merivan. ³⁰ Xwedêyê kal-bavên me Îsa ji mirinê zêndî kir, yê ku we darva dardakir kuşt. ³¹ Xwedê ew bilind kir danî li alîyê xweyî rastê, ku bibe Rêber û Rizgarkir, ku Îsraêlê vegefirîne *berbî xwe* û gunehên wan bibaxşîne. ³² Em in şehdeyên van tiştan, usa jî Ruhê Pîroz, k'îjan Xwedê da wan, yên ku gur'a wîda ne».

³³ Gava wana ev xeber bihîst, gelekî hêrs k'etin û dixastin wan bikujin. ³⁴ Lê fêrisîkî dersdarê Qanûnê hebû, navê wî Gamalyêl û nava t'emamîya cimetêda jî xweyhurmet bû. Eva civîna giregiranda rabû ser p'îyan, ferman da, ku

* 4:25 T'evgirêdana cihûyan hêtanosanra t'onebû, çimkî ewana jî hebandina Xwedêye rast şihîti bûn û p'ût dihebandin.

† 4:26 Zebûr 2:1,2.

şandîyan demekê derxine derva ³⁵ û gote wan: «Gelî îsraêlîyan! Hindava vanda miqatî xwe bin, ku hûnê çî bikin. ³⁶ Waxtekê T'ewdas pêşda hat, ku xwe dewsa yekî zor danîbû û weke çarsid merivî jî xwe lê girtibûn, ew hate kuştinê, peyçûyên wî jî bela-belayî bûn û kes nema. ³⁷ Pey wîr'a Cihûdayê Celilê jî rojên navnivîsarêda rabû k'omeke merivane giran li pey xwe bir, lê xwexa hate kuştinê û yên pey wî diçûn jî bela-belayî bûn. ³⁸ Û niha ez vê derecêda wer'a dibêjim, ji van merivan vegerin û wan ber'din. Heger ew şêwr yan k'ar merivayî be, wê xirab be, ³⁹ lê heger ji Xwedêda ye, hûn nikarin xirab kin. *Binihêrin*, nebe ku hûn rabine himberî Xwedê».

Civîna giregiran gur'a wî kir, ⁴⁰ Paşê gazî şandîyan kirin, ew dane ber qamçîyan û ferman dane ser wan, ku îdî bi navê Îsa xeber nedîn û ber'dan. ⁴¹ Evana jî ji civîna giregiran çûn, şa dibûn, ku bona navê Îsa hêjayî bêhurmetiyê bûne. ⁴² Her roj li p'aristxanêda û malanda hert'im Mizgînî didan û hîn dikirin, ku Mesîh, ew Îsa ye.

HILBIJARTINA HEFT K'OMEKDARAN

6 ¹ Wan rojanda çaxê şagirt zêde bûn, cihûyên ku bi yûnanî xeber didan hindava cihûyên îbranîda bîna xwe teng dikirin, çimkî jinebîyên wan *alik'arîya* ku her roj dihate belakirinê nedistandin. ² Hingê her donzdehan gazî k'oma şagirtan kirin û gotin: «Ev yek ne rast e, ku em dannasîna xebera Xwedê bihêlin, xurek belakirinêva mijûl bin. ³ Niha gelî birano, ji nava xweda heft merivan hilbijêrin û îzbatî hebe, ku ew bi Ruhê Pîroz û serwaxtîyêva t'ijî ne, ku em wan daynine ser vî k'arî. ⁴ Lê emê li ser k'arê duakirinê û dannasînkirina xeberê bin». ⁵ Eva yeka li hemû bawermendan xaş hat û ev meriv hilbijartin: Steyfan, merivekî bi bawerî û Ruhê Pîrozva t'ijî, Fîlîpo, Prokoro, Nîkanor, Tîmon, Parmênas û Nîkolyê *neçihûyê* ji Entakyayê, ku bawerîya cihûyan hildabû. ⁶ Evana li ber şandîyan dane sekinandinê, şandîyan jî dua kirin û destên xwe dane ser wan. ⁷ Û xebera Xwedê pêşda diçû, hesabê şagirtan Orşelîmêda gelekî zêde dibû û ji k'ahînan jî gelek bawerî hildida.

BENDKIRINA STEYFAN

⁸ Steyfan merivekî bi k'erem û qewata Xwedêva t'ije bû, nav cimetêda k'iryamet û nîşanên mezin dikirin. ⁹ Lê hinekên ji k'inîştî ku Azayî dihate gotinê, cihûyên ji Kûrêne û Skenderyayê û usa jî cihûyên ji qezayên Kîlîkyayê û Asyayê rabûn Steyfan'ra k'etine de'wê. ¹⁰ Lê nikaribûn li ber wê serwaxtîyê û wî Ruhê ku wî pê xeber dida bisekinyana. ¹¹ Hingê dizîva serê çend merivan t'ije kirin, ku bêjin: «Me bihîst, ku evî Mûsa û Xwedê bêhurmet dikirin». ¹² Û aha cimet, rûspî û qanûnzana t'evîhev kirin, dadane Steyfan, ew girtin û k'aşî ber civîna giregiran kirin. ¹³ Şehdeyên derew anîn dane sekinandinê, ku digotin: «Eva dest ji xeberdana miqabilî vî cîyê pîroz û Qanûna Mûsa nak'îşîne. ¹⁴ Me ji devê wî bihîst, ku digot: <Îsayê Nisretê wê vê p'aristxanê hilşîne û rizmên ku Mûsa dane me biguhêze>». ¹⁵ Hemûyên civîna giregiranda rûniştî gava li wî nihêrin, dîtin reng-rûyê wî mîna reng-rûyê milyak'etan bû.

CABDAYÎNA STEYFAN Û KUŞTINA WÎ

7 ¹ Hingê serokk'ahîn gote Steyfan: «Ev tişt rast in»? ² Ewî got: «Gelî bav û birano, guhdar bin! Çaxê bavê me Îbrahîm hê Mesopotamyayêda dima, ku hê neçûbû bajarê Haranê, Xwedêyê rûmetê wîva k'ifş bû ³ û gote wî: <Ji erdê xwe û ji pismamtîya xwe biqete û her'e wî erdê ku ezê nîşanî te bikim>. ⁴ Hingê Îbrahîm ji erdê Kildanîya derk'et û Haranêda ma. Pey mirina bavê wîr'a Xwedê ew cîguhastî vî erdî kir, ku hûn niha têda dimînin. ⁵ Li vir wargehê dewsa nigeckî jî nedayê, lê soz da ku vî erdî çawa milk' bide wî û pey wîr'a jî zuretê wî, çaxê ku hê lawên wî t'unekûn. ⁶ Xwedê Îbrahîm'ra aha got: <Zuretê te wê erdê xelqêda xerîbîyêda be, wê wan bikine *bin barê* xulamtîyê û çarsid salî wan biçerçîrinin. ⁷ Lê dîwana wî miletê ku wê jêr'a bibine xulam> Xwedê got, <ezê bikim û pey wê yekêr'a ewana wê derk'evin û li vê derê min'ra xizmetîyê bikin>. ⁸ Paşê sinet çawa nîşana peymanê da Îbrahîm. Awa çaxê Îshaq jî wî bû, roja heyştan ew sinet kir û Îshaq jî Aqûb *sinet kir*, Aqûb jî her donzdeh kur'ên xwe~ bavpêşên me *sinet kirin*.

⁹ Bavpêşan jî ji hevsûdîyê Ûsiv çawa xulam firotin, ku wî bibine Misirê, lê Xwedê wîr'a bû, ¹⁰ ew ji hemû tengasiyên wî rizgar kir. Çaxê ew ber firewinê p'adşê Misirê sekinî, Xwedê k'erem û serwaxtî dayê, p'adşê jî Ûsiv li ser Misirê û t'emamîya mala xwe kire serok. ¹¹ Hingê li t'emamîya erdê Misirê û Kenanêda bû xelayî û k'etine halê giran, kal-bavên me nikaribûn xurek destxistana. ¹² Gava Aqûb bihîst ku li Misirê genim dest dik'eve, cara pêşin kal-bavên me şandine wir. ¹³ Cara dudan Ûsiv xwe birayên xweva da naskirinê û e'silê wî firewinva aşkere bû. ¹⁴ Hingê Ûsiv şand gazî bavê xwe Aqûb û t'emamîya mala wî kir, ku hev'ra heftê pînc kes bûn. ¹⁵ Aqûb dak'ete Misirê, ew û kal-bavên me li wir mirin. ¹⁶ Cinyazên wan birine Şexemê kirine wê t'irba ku Îbrahîm bi zîvan ji kur'ên Hamorê Şexemê k'ir'îbû.

¹⁷ Çaxê ew waxtê ku Xwedê bi sond Îbrahîm'ra soz dabû nêzîk dibû, cimet Misirêda gelekî zêde bibû. ¹⁸ Hingê p'adşakî din Misirêda rabû, ku derheqa Ûsivda t'u tişt nizanibû. ¹⁹ Ewî fêl û fen hindava miletê meda dikir û kal-bavên me çerçîrandin û heta p'eyî ser wan jî kir, ku ew zar'okên xwe bavêjine der, ku nejin. ²⁰ Hingê Mûsa ji dîya xwe bû, ew yekî gelekî bedew bû û sê mehan mala bavê xweda mezin bû. ²¹ Çaxê ew hate avîtinê, qîza firewin ew kire warxurê xwe û çawa kur' xwer'a mezin kir. ²² Mûsa t'emamîya serwaxtîya misirîyan hîn bû, xeberdan û

* 7:3 Destpêbûn 12:1.

† 7:7 Destpêbûn 15:13,14.

k'arê xweda jî zor bû. ²³ Û çaxê bû çil salî, dilê wîr'a derbaz bû, serîkî bide birayên xwe~ lawên Îsraêl. ²⁴ Ewî yekî îsraêlî dît, ku yekî misirî neheqî lê dikir, ewî piştî yê *îsraêlî* girt, heyf hilda~ yê misirî kuşt. ²⁵ Mûsa t'irê birayên wî wê fem bikin, ku Xwedê wê bi destê wî rizgarîyê bide wan, lê fem nekirin. ²⁶ Roja din ew rastî du îsraêlîyan hat, ku şer' dikirin, xast wan li hev bîne, got: <Evdno! Hûn bira ne, çima neheqîyê hevdu dikin?> ²⁷ Lê yê ku neheqî hevalê xwe dikir, ew de'fda got: <K'ê tu ser me mîr û hakim k'ifş kirî?> ²⁸ Yan tu dixazî min jî mîna wî misirîyê duhu bikujî? ²⁹ Çaxê Mûsa ev yek bihîst, revî çû erdê Midyanê, xerîbîyêda ma û li wir du kur' ji wî bûn.

³⁰ Pey çil salîr'a li ber'îya ç'îyayê Sînayêda, nava alava agirê mormorkêda milyak'etek wîva k'ifş bû. ³¹ Mûsa ku dît, li ser wê yekê ecêb ma. Gava nêzik dibûyê ku binihêre, dengê Xudan bihîst: ³² <Ez Xwedêyê kal-bavên te me~ Xwedêyê Îbrahîm, Îshaq û Aqûb>. [†] Mûsa dilerizî û newêrbû binihêrya. ³³ Hingê Xudan got: <P'êlavên nigên xwe bêxe, çimkî ew cîyê tu lê sekinî yî erdê pîroz e. ³⁴ Belê, min dît ku Misirêda cimeta min diçerçire û zarîniya wan bihîst û dak'etim, ku wan rizgar bikim. De niha were ez te bişînime Misirê>. [‡]

³⁵ Ew Mûsayê ku ji xwe dîr xistin û gotinê: <K'ê tu ser me mîr û hakim k'ifş kirî?> Xwedê bi destê milyak'etê ku nav mormorkêda wîva k'ifş bû, ew çawa mîr û rizgarkir şand. ³⁶ Ewî ewana ji Misirê derxistin, Misirêda, be'ra Sorda û ber'îyêda çil salî nişan û k'iryamet kirin. ³⁷ Ew hema ev Mûsa bû, ku gote lawên Îsraêl: <Xwedê wê ji nav birayên we p'êxemberekî mîna min bona we rake>. [§] ³⁸ Ew hema ev Mûsa bû, ku ber'îyêda nava cimeta bû û li ser ç'îyayê Sînayê jî t'evî wî milyak'etî bû, k'îjanî t'evî wî û kal-bavên me xeber dida. Eva ew bû, yê ku ew xeberên jîyîne hildidan ku bide me.

³⁹ Lê kal-bavên me nexastin gur'a wî bikin, ew ji xwe dîr xistin, dilên xweda vegeryane Misirê ⁴⁰ û gotine Harûn: <Mer'a xwedêyan çê ke, ku pêşîya me k'evin, çimkî em nizanin çî hate serê wî Mûsayê ku em ji erdê Misirê derxistin>. ^{**} ⁴¹ Hema wan rojanda p'ûtekî mîna golikekê çê kirin, qurban wî p'ûtir'a dan û bona k'arê destê xwe k'êf kirin. ⁴² Hingê Xwedê berê xwe ji wan guhast û hişt, ku ew steyrkên ezmên'r'a xizmetîyê bikin, çawa kitêba p'êxemberanda nivîsar e: <Gelo çil salî ber'îyêda we qurban û hedî minr'a dan, Mala Îsraêl? ⁴³ Na, lê we konê Milxom û steyrka Remfan xwedêyê xwe hildidan, ev sûretên ku we çê kirin, ku hûn wan'r'a xizmetîyê bikin. Lema ezê we biguhêzime wî alîyê erdê Babilonê>. ^{††}

⁴⁴ Konê Şehdetîyê ber'îyêda t'evî kal-bavên me bû. Ew usa hate çêkirinê, çawa ewî Mûsar'a xeber da, ferman da, ku mîna wî şikilê ku dîtibû çê ke. ⁴⁵ Paşê kal-bavên me jî ew konê ku ji pêşîyan wan'r'a mabû, hildan anîne vî erdî, wî waxtê ku wan bi t'evî Yêşû ji wan miletan zeft kiribûn û Xwedê ji ber kal-bavên me berî wan miletan dabû. Ew kon heta waxtê Dawid li wir ma. ⁴⁶ Dawid jî ji Xwedê k'erem stand, xast ku xanekê Xwedêyê Aqûbr'a çê ke. ⁴⁷ Lê Silêman bona wî xanek çê kir. ⁴⁸ Lê *bi rastî*, Yê Herî Jor malên bi destan çêkirîda namîne, çawa p'êxember dibêje: ⁴⁹ <Ezman k'ursîyê min e, erd jî binê p'îyên min e. Hûnê çî malê minr'a çê kin? Xudan dibêje. Yan jî çî cîyî bona rihetîya min? ⁵⁰ Ê ne destên min ev her tişt çêkirine?> ^{‡‡}

⁵¹ Serhişkno! K'afirno, dil û guhanda bêsînetno! Hûn t'imê miqabilî Ruhê Pîroz disekinîn, kal-bavên we çawa bûne, hûn jî usa ne. ⁵² Kal-bavên we ji p'êxemberan k'îjan nezêrandin? Wan ew dukuştin, yên ku hê berêda bona hatina Yê Rast digotin. Û va ye we niha jî nemamîya wî kir û kuşt. ⁵³ Qanûn bi destê milyak'etan wer'a hate dayîne, lê we xwey nekir>!

⁵⁴ Gava ev tişt dibihîstin, dilê xweda har dibûn û diranên xwe ser wî diç'irikandin. ⁵⁵ Lê Steyfan bi Ruhê Pîroz t'ijî berê xwe ezmênda kir, rûmeta Xwedê û Îsa jî li alîyê Xwedêyî rastê sekinî dît ⁵⁶ û got: «Va ye ez ezmanê vebûyî û Kur'ê Meriv jî li alîyê Xwedêyî rastê sekinî dibînim!» ⁵⁷ Hingê wana kire qîr'in û guhên xwe girtin, hemû hevr'a dadane wî, ⁵⁸ ew jî bajêr derxistin, dane ber keviran. Şehdan jî k'incên xwe danîne ber nigên cahilekî navê wî Şawûl. ⁵⁹ Gava kevir davîtinê, Steyfan dua dikir û digot: «Xudan Îsa, ruhê min bistîne». ⁶⁰ Hingê wî çok veda, bi dengê bilind kire gazî: «Xudan, vê yekê vanar'a guneh hesab neke». Aha ku got, hênijî. ^{§§}

ŞAWÛL PEY BAWERMENDAN DIK'EVE

8 ¹ Şawûl jî kuştina wîr'a qayl bû. Û wê rojê zêrandineke giran hindava civîna Orşelîmêda destpêbû. Pêştirî şandîyan *bawermend* hemû belayî ser erdên Cihûstanê û Sameryayê bûn. ² Merivên xwedêtirs Steyfan kirine gor'ê û şîneke giran li ser wî kirin. ³ Lê Şawûl gelek zîrar dida civîne, dik'ete malan *qismê* mêr û jin dik'işandin davîtine hebsê.

FÎLÎPO SAMERYAYÊDA MIZGÎNÎYÊ DIDE

⁴ Ewên belabûyî diger'yan, Mizgînîya xeberê didan. ⁵ Fîlîpo jî dak'ete bajarekî Sameryayê, wan'r'a bona Mesîh dannasîn dikir. ⁶ K'oma merivan gava *bona* k'iryametên ku wî dikirin dibihîstin û didîtin bi hub û rez guhdarîya

* 7:28 Derk'etin 2:14.

† 7:32 Derk'etin 3:6.

‡ 7:34 Derk'etin 3:5, 7, 8, 10.

§ 7:37 Qanûna Ducarî 18:15.

** 7:40 Derk'etin 32:1.

†† 7:43 Amos 5:25-27.

‡‡ 7:50 Îşaya 66:1,2.

§§ 7:60 Awa gotî: «Ruhê xwe da.»

gotinên Fîlîpo dikir. ⁷ Ji gelek cinak'etîyan ruhên heram bi dengê bilind dikirine qîr'în û derdik'etin û gelek şilûşet û yên niganda seqet qenc dibûn. ⁸ Hingê şabûneke mezin k'ete wî bajarî.

⁹ Merivek wî bajarîda hebû, navê wî Şimhûn, ewî hê zûva sêrbazî dikir û samerî ecêbmayî dihiştin û xwe jî dewsa yekî zor hesab dikir. ¹⁰ T'emamîya cimetê, ji biç'ûkan heta mezinan bi hub û rez guhdarîya wî dikirin û digotin: «Ev e ew <Qewata Xwedêye mezin> ku dibêjin». ¹¹ Wan bi rezedilî guhdarîya wî dikir, çimkî ewî zûva bi sêrbazîyên xwe ew ecêbmayî hiştibûn. ¹² Lê çaxê bawerîya xwe wê mizgînîya Fîlîpo dida anîn, ya ku bona P'adşatîya Xwedê û navê Îsa Mesîh bû, him mêr him jin, hemû jî pê avê hatine nixamtinê. ¹³ Şimhûn xwexa jî bawer kir, hate nixamtinê û t'imê t'evî Fîlîpo bû. Û gava ew nîşan û k'iryametên zor, ku dibûn didîtin, ecêb dima.

¹⁴ Şandîyên Orşelîmêda çaxê bihîstin, ku Sameryayê xebera Xwedê hildaye, Petrûs û Yûhenna şandîne cem wan. ¹⁵ Ew ku dak'etin, bona wan dua kirin, ku Ruhê Pîroz bistînin, ¹⁶ çimkî heta hingê Ruhê Pîroz hê nehatibû ser ji wan t'u kesî, lê t'enê bi navê Xudan Îsa hatibûne nixamtinê. ¹⁷ Hingê Petrûs û Yûhenna destên xwe danîne ser wan û wana Ruhê Pîroz stand.

¹⁸ Gava Şimhûn dît, ku bi destdanîna şandîyan Ruhê Pîroz distînin, p'ere dirêjî wan kir ¹⁹ û got: «Vî hikumî bidine min jî, ku ez destê xwe daynime ser k'ê, Ruhê Pîroz bistîne». ²⁰ Lê Petrûs gote wî: «Zivê te bira t'evî te ret be! Te t'irê p'êşkêşa Xwedê p'eretî tê standinê! ²¹ Vê yekêda p'ara te t'u tişt t'une, çimkî dilê te li ber Xwedê ne rast e. ²² Niha ji wê xirabîya xwe vegere, hîvî ji Xudan bike, belkî ev nêta teye xirab bê baxşandinê, ²³ çimkî ez te nava te'layîya ziravda û qeydên neheqîyêda dibînim». ²⁴ Şimhûn lê vegerand got: «Hûn bona min dua Xudan bikin, ku ji wan gotinên we t'u tişt neyêne ser min».

²⁵ Pey wê yekêr'a, ku wana şehdetî da û xebera Xudan xeber dan, vegeryane Orşelîmê û li ser rîya xwe gelek gundên Sameryayêda jî Mizgînî didan.

FÎLÎPO Û NEMÊRÊ JI WELATÊ ETYÛPÎYÊ

²⁶ Hingê milyak'etekî Xudan Fîlîpor'a xeberda got: «Rabe her'e alîyê başûrê, ser wê rîya ku ji Orşelîmê dadik'eve Xezayê». Ew der çol bû. ²⁷ Ew jî rabû çû dît, va ye nemêrekî ji Etyûpê, wezîrê Kendaka xanimp'adşa Etyûpê~ wek'ilê t'emamîya xezna wê, bona hebandinê hatibû Orşelîmê. ²⁸ Ew ji wir vedigerya û e'reba xweda kitêba Îşaya p'êxember dixand. ²⁹ Ruh gote Fîlîpo: «Pêşda her'e û rex e'rebêva her'e». ³⁰ Fîlîpo jî bezî nêzîk bûyê, bihîst ku ew kitêba Îşaya p'êxember dixûne û jê pirsî: «Tu ji xandina xwe fem dikî?» ³¹ Ewî got: «Ezê çawa bikaribim fem bikim, heger yek minr'a şiroveneke?» Û hîvî ji Fîlîpo kir, ku rabe rex wî rûnê. ³² Ew cîyê ku wî nivîsarêda dixand ev bû: «Ew mîna peza serjêkirinê hate birinê û çawa berxa li ber hirîbir'ê xwe, devê xwe venake nake k'alîn. ³³ Ew nimiz kirin û maşê wî jê standin. Derheqa silsileta wîda k'ê wê gilî ke? çimkî jîyîna wî ji rûbarê dinyayê hate hildanê».*

³⁴ Nemêr ji Fîlîpo pirsî û got: «Ez hîvî dikim ku bêjî min, p'êxember van tiştan bona k'ê dibêje? Bona xwe yan bona yekî mayîn?» ³⁵ Fîlîpo rabû, ji wê nivîsarêda destpê kir derheqa Mizgînîya Îsada wîr'a şirovekir.

³⁶ Gava rîya xweda diçûn, ew gihîştine avekê û nemêr got: «Va ye av, îdî çi nahêle ku ez bême nixamtinê?» ³⁷ (Fîlîpo gote wî: «Heger tu bi t'emamîya dilê xwe bawer dikî, dikarî». Ewî lê vegerand got: «Ez bawer dikim, ku Îsa Mesîh Kur'ê Xwedê ye».) ³⁸ Û nemêr ferman da, ku e'rebê bidine sekinandinê, her du jî k'etine avê û Fîlîpo nemêr nixamt. ³⁹ Gava ewana ji avê derk'etin, Ruhê Xudan Fîlîpo hilda û îdî nemêr Fîlîpo nedît, ew bi *dilê* şa rîya xweda çû. ⁴⁰ Lê Fîlîpo Aşdodêda k'ifş bû, digerr'ya, Mizgînî dida her bajarî û heta Qeyserîyê jî hat.

VEGERA ŞAWÛL Û DANNASÎNA WÎ ŞAMÊDA

(K'arên Şandîyan 22:6-16; 26:12-18)

⁹ ¹ Şawûl jî heta hingê hê gef li şagirtên Xudan dixwar, ku wan bide kuştinê. Ew çû cem serokk'ahîn, ² jî wî destûrname li ser k'inîştên Şamê xastin, ku hikumê wî hebe mêran û jinan, yên ku li pey vê Rê diçin heger bibîne, wan bigire girêdayî bîne Orşelîmê. ³ Gava diçû nêzîkî Şamê bû, nişkêva ji ezmên ronahîkê dora wî şewq da. ⁴ Ew k'ete erdê û dengê bihîst ku digote wî: «Şawûl, Şawûl! Çima tu min dizêrinî?» ⁵ Ewî jî got: «Tu k'î yî, Xudan?» Wî dengî got: «Ez ew Îsa me, k'îjanî tu dizêrinî.» ⁶ De niha rabe her'e bajêr, ter'a wê bê gotinê tuê çi bikî». ⁷ Ew merivên ku t'evî wî diçûn sar bûn sekinîn û ji zar-ziman k'etin. Wan ew deng dibihîst, lê t'u kes nedidîtin. ⁸ Şawûl jî erdê rabû, ç'evên wî vekirî bûn, lê tişt nedidît. Hingê destê wî girtin birine Şamê. ⁹ Ew sê rojan kor ma, ne xwar û ne jî vexwar.

¹⁰ Şamêda şagirtekî navê wî Hananîya hebû, Xudan dîtinkêda hate ber ç'evan û gote wî: «Hananîya!» Ewî got: «Ez *hazir* im, Xudan». ¹¹ Xudan got: «Rabe her'e wê k'ûça ku wêr'a Rast dibêjin û mala Cihûdada bona yekî ji Tarsûsê, navê wî Şawûl bipirse, çimkî va ye ew dua dike. ¹² Wî dît, wê dîtinkêda merivek hate ber ç'evan, navê wî Hananîya, ew hat destên xwe danîne ser wî, ku ew dîsa bibîne». ¹³ Hananîya lê vegerand got: «Xudan, min bona vî merivî ji gelek bihîstye, ku Orşelîmêda wî çiqas xirabî hindava cimeta teda kirye. ¹⁴ Vir jî hikumê wî ji serokên k'ahînananda heye, ku hemûyên k'î gazî navê te dikin bigire». ¹⁵ Lê Xudan gote wî: «Tu her'e, çimkî min ew çawa k'arkerek hilbijartye, ku navê min hêtanosanva, p'adşanva û lawên Îsraêlêva bide naskirinê. ¹⁶ Ezê nîşanî wî bikim, ku çiqasî gerekê ew bona navê min biçerçire».

* 8:33 Îşaya 53:7,8.

† 9:5 Hinek kitêbanda ev jî heye: «<Tu bi çiftê nikarî her'î şiva sertûj>. Ew jî lerizî û şaşmayî got: <Xudan, çi dixazî ez bikim?> Xudan got.»

K'arên Şandîyan 9,10

¹⁷Hananîya jî çû k'ete wê malê, destê xwe danî ser wî û got: «Şawûl bira! Xudan ez şandime~ ew Îsayê ku rêva rastî te hat, ku tu dîsa bibînî û bi Ruhê Pîrozva t'ije bî». ¹⁸Pêr'a-pêr'a ji ç'evên wî tiştên mîna kapekê warîyan, dît, rabû pê avê hate nixamtinê, ¹⁹xwarin xwar û qewata wî hate cî. Û çend rojan ew cem şagirtên Şamêda ma.

²⁰Û pêr'a-pêr'a Şawûl destpê kir k'inîstanda bona Îsa dannasîn kir û digot ku: «Ew Kur'ê Xwedê ye». ²¹Hemûyên ku dibihîstin, ecêbmâyî diman û digotin: «Eva ne ew e, ku Orşelîmêda yên ku gazî vî navî dikirin dikuştin? Û bona wê yekê jî hatye vir, ku wan bigire û bibe bide destê serokên k'ahînan»? ²²Lê Şawûl hînkirinêda hê qewat dibû, îzbat dikir, ku Mesîh hema Îsa *xwexa* ye û dengê hemû cihûyên Şamêda dida bir'inê.

²³Çaxê gelek roj derbaz bûn, cihû şêwîrîn, ku wî bikujin, ²⁴lê Şawûl nêta wane xirab hesya. Ewana şev û roj ber dergehên bajêr bûn, ku wî bikujin, ²⁵lê şagirtan jî şev ew bi zembîlê dîwêrva daxistin.

ŞAWÛL ORŞELÎMÊDA

²⁶Çaxê Şawûl hate Orşelîmê, wî dikir ku t'evî şagirtan be, lê hemû ji wî ditirsyan, wan bawer nedikir ku ew jî bûye şagirt. ²⁷Hingê Barnabas ew hilda bire cem şandîyan û wanr'a got, ku wî rêda çawa Xudan dîtye û wîr'a xeber daye, Şamêda jî çawa bêtirs navê Îsa dannasîn kirye. ²⁸Şawûl Orşelîmêda t'evî wan radibû-rûdînîşt û bi navê Îsa Xudan bêtirs dannasîn dikir. ²⁹Usa jî t'evî cihûyên ku bi yûnanî xeber didan, bi xeberdanê dik'ete de'wê, wana jî dikir ku wî bikujin. ³⁰Gava biratî vê yekê hesyan, ew berjêr birine Qeyserîyê û derbazî Tarsûsê kirin.

³¹Awa li t'emamîya Cihûstanêda, Celîlêda û Sameryayêda li demekê civînê haştîyê û rihetîyêda bû, *bi ruhanî* şên dibû û tîrsa Xudanda û berdîlyîa Ruhê Pîrozda jî pêşda diçû û bawermend zêde dibûn.

QENCBÛNA EYNÊYAS

³²Petrûs jî her cîyan diger'ya û dak'ete cem pîrozên ku Lîdayêda diman. ³³Li wir merivek dît, navê wî Eynêyas, ku heyşt salên wî bûn şilûşet cî-nivînanda p'aldayî bû. ³⁴Petrûs gote wî: «Eynêyas! Îsa Mesîh te qenc dike. Rabe û cî-nivîna xwe bide hev». Ew pêr'a-pêr'a rabû ser xwe. ³⁵Hemû binelîyên Lîdayê û Şaronê ew dîtin û vegeryane berbi Xudan.

JI MIRINÊ ZÊNDÎBÛNA TABÎTAYÊ

³⁶Yafayêda k'ulfeteke şagirt hebû, navê wê Tabîta, ku femîna wî *navî* «Xezalok» e. Eva nava hemû qencî û xêrkinandana mabû. ³⁷Wan rojanda ew nexaş k'et mir û ew şuştin odexana jorinda danîn. ³⁸Yafa nêzîkî Lîdayê bû. Gava şagirtan bihîst ku Petrûs li wir e, du meriv şandin hîvî kirin û gotin: «Derengî nebe zû were cem me». ³⁹Petrûs jî rabû t'evî wan hat. Gava gihîşte wir, ew birine odexana jorin, hemû jinebîyan dora wî girt û bi girî ew k'inc û kirasên ku jîyîna xweda Xezalokê bona wan dirûtibûn, nişanî wî didan. ⁴⁰Hingê Petrûs hemû derxistine derva, çok veda dua kir û ser cinyazda vegerya got: «Tabît'a! Rabe ser xwe». Ewê ç'evên xwe vekirin, li Petrûs nihêrî, rabû rûnişt. ⁴¹Ewî destê xwe da wê, rakire ser p'îyan, paşê gazî pîrozan û jinebîyan kir, ew zêndî li ber wan da sekinandinê. ⁴²Eva yeka t'emamîya Yafayêda bela bû û gelek bawerîya xwe Xudan anîn. ⁴³Petrûs gelek rojan Yafayêda li mala Şimhûnê ç'ermkerda ma.

KORNÊLYO Û PETRÛS

10¹Qeyserîyêda merivekî navê wî Kornêlyo hebû, refa «Ordîya Îtalyayêda» sersed bû. ²Ew mala xweva yekî xweybawer û xwedêtirs bû, cimeta cihûyanr'a jî gelek rehm dikirin û her t'im dua Xwedê dikir. ³Ewî nîvro nêzîkî siheta sisyan dîtinokêda li ber ç'evên xwe aşkere milyak'etekî Xwedê dît ku hate cem wî û wîr'a got: «Kornêlyo!» ⁴Ewî ku lê nihêrî, saw k'ete ser û got: «Çi ye Xudan»? Milyak'et got: «Dua û rehmên te *kirin* li ber hizûra Xwedê hatine bîranînê. ⁵De niha merivan bişîne Yafayê, gazî Şimhûn ke, k'îjanîr'a Petrûs dibêjin. ⁶Ew mêvanê mala Şimhûnê ç'ermker e, ku devê be'rê dimîne». ⁷Gava ew milyak'etê wîr'a xeber dida çû, ewî gazî du xulamên malê û eskerekî berdestîyî xweybawer kir ⁸û her tişt wanr'a gilî kir şandine Yafayê.

⁹Roja din ewana hê rêda diçûn û nêzîkî bajêr dibûn, Petrûs nêzîkî siheta donzdehan rabû ser xênî, ku dua bike. ¹⁰Ew birçî bû, xast nan bixwe. Hê wana nan hazir dikirin, fikira wî hate hilbirinê. ¹¹Û wî nihêrî, va ye ezman vebû, tiştêkî mîna destexana mezin her çar niç'anva girêdayî dadik'et, dihate xwarê ser erdê. ¹²Ser wê her cûr'e heywanên çarp'ê, şûlikîyên erdê û teyredên ezmên hebûn. ¹³Deng hate wî: «Rabe, Petrûs, serjêke û bixwe». ¹⁴Lê Petrûs got: «Haşa ji min Xudan, min qet tiştêkî haram yan qirêj nexwarye». ¹⁵Cara dudan ew deng hate wî: «Ew tiştê ku Xwedê helal kirye tu haram hesab neke». ¹⁶Eva yeka sê caran bû û hingê ew destexan berbi ezmênva hate birinê.

¹⁷Petrûs hê ecêbmâyî nav xweda difikirî: «Ev çi dîtinok bû min dît»? awa ew merivên Kornêlyo şandibûn li ber dergeh sekinîn û mala Şimhûn pirsîn. ¹⁸Deng dan gotin: «Şimhûnê ku jêr'a Petrûs dibêjin li vir mêvan e»? ¹⁹Petrûs hê ser wê dîtinokê difikirî, Ruh gote wî: «Va ne sê meriv li te diger'in. ²⁰De îdî rabe dak'ave û dudilî nebe, wanr'a her'e, çimkî min ew şandine». ²¹Petrûs jî dak'et çû cem wan merivan û got: «Ez im ewê hûn lê diger'in. Hûn bona çî hatine»? ²²Wan got: «Kornêlyoyê sersed em şandine. Ew merivekî rast û xwedêtirs e, alîyê t'emamîya milletê cihûyanda jî xweyhurmet e. Ewî ferman ji milyak'etekî pîroz stand, ku gazî te mala xwe ke û xeberdana te bibihê». ²³Hingê Petrûs ew gazî malê kirin, cîyê şevê da wan.

Roja din Petrûs rabû wanr'a çû, çend bawermendên Yafayê jî wîr'a çûn. ²⁴ Roja din gihîştine Qeyserîyê, Kornêlyo jî gazî xwexatî û hevalên xwe kiribû û hîvîya wan bû. ²⁵ Gava Petrûs dik'ete hindur, Kornêlyo pêşîya wîda çû û k'ete ber nigên wî, ta bû. ²⁶ Lê Petrûs ew rakire ser p'îyan û got: «Rabe bisekine, ez xwexa jî meriv im». ²⁷ Wîr'a bi xeberdanê k'ete hindur û li wir gelek civyayî dîtin. ²⁸ Ewî gote wan: «Hûn xwexa zanin ku ne xeysetê mêrê cihû ye, ku t'evî miletekî din rabe-rûnî yan çûyîn-hatina wan hevr'a hebe. Lê Xwedê ber min vekir, ku ez t'u kesî p'îs yan heram hesab nekim. ²⁹ Bona wê yekê jî çaxê gazî min kirin, min na-na nekir rabûm hatim. Û niha dipirsim, we bona çi gazî min kirye?»

³⁰ Kornêlyo got: «Berî çar rojan, nêzîkî vî çaxî, gava min duayê siheta sisyan mala xweda dikir, nişkêva merivekî bi k'incên sipîye-birqok li ber min sekinî ³¹ û got: <Kornêlyo! Li ber Xwedê duayên te hatine hildanê û rehmên te kirine jî wî bîr anîn. ³² Niha merivan bişîne Yafayê gazî Şimhûn ke, k'îjanîr'a Petrûs dibêjin, ew mêvanê mala Şimhûnê ç'ermker e, ku devê be'rê dimîne». ³³ Min jî pêr'a-pêr'a *meriv* şandine cem te û te jî qenc kir ku hatî. Niha em hemû jî li ber hizûra Xwedê sekinî ne, ku wan hemû tiştan ji te bibihên, çi ku ji Xudanda ter'a hatye fermankirinê, ku tu mer'a bêjî».

DANNASÎNA PETRÛS MALA KOR'NÊLYODA

³⁴ Petrûs dest bi xeberdanê kir got: «Ez niha fem dikim, ku Xwedê rastî jî firqîyê nake nava miletan. ³⁵ Lê ji nav her miletî, k'î ji wî ditirse û rastîyê dike li wî qebûl e. ³⁶ Hûn îdî baş zanin, ku Xwedê eva xebera lawên Îsraêlr'a şand- Mizgîniya haştîyê bi Îsa Mesîh da, ewî ku Xudanê hemûyan e. ³⁷ Usa jî hûn zanin, ku ji Celîlê girtî t'emamîya Cihûstanêda çi bû, pey wê nixamtinêr'a, ya ku Yûhenna dannasîn kir, ³⁸ çawa Xwedê Îsayê Nisretê bi Ruhê Pîroz û qewatê k'ifş kir, ku bi qencîkirinê gerya û hemûyên ku ji Şeytan hatibûne şêlandinê qenc kirin, çimkî Xwedê wîr'a bû. ³⁹ Em xwexa şehdeyên wan hemû tiştan in, yên ku wî li Cihûstanê û Orşelîmêda kirin. Paşê ew darva dardakirin, kuştin, ⁴⁰ lê Xwedê ew roja sisyan ji mirinê zêndî kir, da aşkerekirinê, ⁴¹ ne ku hemû cimêr'a, lê me şehdeyanr'a, yên ku hê pêşda ji aliyê Xwedêda hatibûne hilbijartinê, ku pey mirin û zêndîbûna wîr'a me bi wîr'a xwar û vexwar. ⁴² Û ewî t'emî li me kir, ku em cimêr'a dannasîn kin û şehdetîyê bidin, ku ew e h'akimê mirîyan û zêndîyan, ji Xwedêda k'ifşkirî. ⁴³ Hemû p'êxemberan şehdetîya wî didin, ku her k'ê bawerîya xwe wî bîne, wê bi saya navê wî baxşandina gunehan bistîne».

⁴⁴ Petrûs hê ev tişt digotin, Ruhê Pîroz hate ser hemûyên ku ev gotin dibihîstin. ⁴⁵ Bawermendên e'silê xweda sinetkirî, yên ku Petrûsr'a hatibûn, zendegirtî bûn, ku Ruhê Pîroz çawa p'êşkêş ser nesinetkirîyanda jî barî, ⁴⁶ çimkî dibihîstin ku wana bi zimanên *xerîb* xeber didan û şikirî didane Xwedê. Hingê Petrûs got: ⁴⁷ «Îdî k'î dikare nehêle, ku evana pê avê bêne nixamtinê, yên ku mîna me Ruhê Pîroz jî standin»? ⁴⁸ Hingê ferman da, ku ew bi navê Îsa Mesîh bêne nixamtinê. Paşê wana hîvî ji wî kir ku çend rojan li wir bimîne.

CABDARÎYA PETRÛS LI BER CIVÎNA ORŞELÎMÊ

11 ¹ Şandî û bawermendên ku li aliyê Cihûstanê diman bihîstin ku hêtanosan jî xebera Xwedê hildaye. ² Gava Petrûs hevr'az çû Orşelîmê, bawermendên e'silê xweda cihû ew neheq dikirin û ³ digotin: «Tu çûyî cem merivên nesinetkirî û te t'evî wan nan xwarye!» ⁴ Hingê Petrûs destpê kir bi yeko-yeko wanr'a şirovekir got: ⁵ «Min bajarê Yafayêda dua dikir, fikira min hate hilbirinê. Û min dîtinokêda li ber ç'evê xwe dît, wê derdaneke mîna destexana mezin ji her çar niç'anva girêdayî ji ezmên dak'et hate xwarê, li ber min sekinî. ⁶ Ez hê zûr bibûm min lê dinihêrî, min dît wê heywanên çarp'ê, rewir, şulikîyên erdê û teyredên ezmên ser hene. ⁷ Hingê min dengê bihîst, ku digote min: <Rabe Petrûs, serjêke û bixwe>. ⁸ Lê min got: <Haşa ji min, Xudan, qet tişteki heram yan p'îs nek'etye devê min>. ⁹ Cara dudan ewî dengî ji ezmên li min vegevand got: <Ew tiştên ku Xwedê helal kirye, tu heram hesab neke>. ¹⁰ Eva yeka sê caran bû û her tişt paşda ezmênva hate k'îşandinê. ¹¹ Hema hingê sê merivên ku ji Qeyserîyê şandibûne pey min ber mala ku em têda diman sekinîn. ¹² Ruh minr'a got: <Wanr'a her'e, dudilî nebî>. Ev her şeş bira jî minr'a hatin û em çûne mala wî merivî. ¹³ Ewî mer'a got, ku çawa mala xweda milyak'et dîtye, ku sekinye wîr'a gotye: <Merivan bişîne Yafayê û gazî Şimhûn ke, yê ku jêr'a Petrûs dibêjin. ¹⁴ Ewê ter'a xeberdanekê bike, bi k'îjanî tuê hemû neferên mala xweva rizgar bî>. ¹⁵ Û min hema dest bi xeberdanê kir, Ruhê Pîroz hate ser wan, çawa pêşîyê hate ser me. ¹⁶ Hingê hate bîra min ew xebera ku Xudan digot: <Yûhenna bi avê nixamt, lê hûnê bi Ruhê Pîroz bêne nixamtinê>. ¹⁷ Awa heger Xwedê hema ew p'êşkêş da wan, ya ku da me, çaxê me bawerîya xwe Xudan Îsa Mesîh anî, ez k'î bûm, ku miqabilî Xwedê bisekinyama?»

¹⁸ Gava ev yeka bihîstin, dengê xwe bir'in, şikirî dane Xwedê û gotin: «Ku usa ye, Xwedê ev mecal da hêtanosan jî, ku ji gunehkirinê vegevin û bijîn».

BAWERMENDÊN BAJARÊ ENTAKYAYÊ

¹⁹ Ewên ku ji ber wê zêrandina pey kuştina Steyfanr'a bela bibûn, gihîştine heta Fînikyayê, Qubrisê û Entakyayê û t'enê cihûyanr'a xeber dannasîn dikirin. ²⁰ Lê ji nav wanda hinek merivên ji Qubrisê û Kûrênê bûn, ku çaxê çûn k'etine Entakyayê û Mizgîniya Xudan Îsa didane merivên ku yûnanî xeber didan. ²¹ Destê Xudan wanr'a bû, gelek bawer kir û vegeryane berbi Xudan.

²² Bona wan ev deng-be'sa gihîşte civîna Orşelîmê, Barnabas şandine Entakyayê. ²³ Gava gihîştê û k'erema

Xwedê dît, şa bû û dil dida wan hemûyan ku bi t'emamîya dilê xwe Xudanr'a amin bimînin. ²⁴ Barnabas merivekî qenc, Ruhê Pîroz û bawerîyêva t'ijî bû. Gelek cimet ser bawermendên Xudanda zêde bû.

²⁵ Hingê Barnabas derbazî Tarsûsê bû, ku li Şawûl biger'e û ²⁶ gava ew dît, anî Entakyayê. Ewana hevr'a t'emamîya salekê t'evî civînê dicivîyan û gelek cimet hîn dikirin. Cara pêşin Entakyayêda şagirt «mesîhî» hatine navkirinê.

²⁷ Wan rojanda ji Orşelîmê p'êxember dak'etine Entakyayê. ²⁸ Yekî ji wan, ku navê wî Hagabo bû, rabû bi Ruh ew pê hesandin, ku t'emamîya dinyayêda wê bibe xelayîke giran. Û usa jî eva xelayîya hêna Klawdyo Qeyserda bû. ²⁹ Hingê şagirtên Entakyayê qîrar kirin, ku ji destê k'êva çiqas tê alîk'ariyê bawermendên Cihûstanêr'a bişînin. ³⁰ Usa jî kirin, bi destê Barnabas û Şawûl berpirsaryên civînêr'a şandin.

KUŞTINA AQÛB Û BENDKIRINA PETRÛS

12 ¹ Wan waxtanda Hêrodes p'adşa destê xwe hilbir'î ser hinekên ji civînê, ku wan biçerçirîne û ² Aqûbê birê Yûhenna bi şûr da kuştinê. ³ Wî dît ku kirina wî li cihûyan xaş hat, rabû Petrûs jî da girtinê. Ev tişt rojên Cejina Nanê Şkevada bûn. ⁴ Gava wî Petrûs girt, avîte hebsê, sparte desta çar eskerê, ku her destek çar-çar esker bûn, ku miqatî wî bin. Fikira wî ew bû, ku pey Cejina Derbazbûnêr'a wî derxe û ber cimete dîwana wî bike. ⁵ Îdî Petrûs hebsêda girêdayî bû, lê civînê bona wî bi dil û can li Xwedêr'a dua dikir.

AZABÛNA PETRÛS

⁶ Wê şevê, ku sibetirê Hêrodes dixwast ew derxista ber cimete û dîwana wî bikira, Petrûs bi zincîran dutaq girêdayî nava du eskeranda razayî bû, nobedaran jî ber dêrî nobedarîya hebsê dikir. ⁷ Nişkêva milyak'etekî Xudan ber Petrûs sekinî, ronayê wir şewq da û niçande k'êleka Petrûs, ew hişyar kir û gotê: «Zû rabe». Zincîr ji destên wî k'etin. ⁸ Hingê milyak'et gote wî: «Piştî xwe girêde û p'êlavên xwe p'ê ke». Ewî jî usa kir. Paşê gote wî: «Qap'ûtê xwe bavêje ser xwe û pey min were». ⁹ Ew jî derk'et û pey wî diçû, lê nizanibû ku ew kirina milyak'et rast e, wî t'irê ew xewnê dibîne. ¹⁰ Ewana ji nobedarên pêşin û dudan derbaz bûn, heta dergehê hesinî hatin, ku wêr'a derdik'etine nav bajêr. Dergeh xwexa li ber wan vebû, ew ji wir derk'etin û k'ûçekê derbaz bûn, nişkêva milyak'et ji wî qetya. ¹¹ Hingê Petrûs ser xweda hat, got: «Ez niha rast zanim, ku Xudan milyak'etê xwe şand û ji destê Hêrodes û ji wan her tiştên ku cihû hîvîyê bûn ez rizgar kirim». ¹² Gava ev yek fem kir, çû mala Meryema dîya Yûhennayê ku wîr'a Marqos digotin, ku li wir gelek civyabûn dua dikirin. ¹³ Petrûs dergeh xist, carîke navê wê Roda çû guhê xwe da ser. ¹⁴ Dengê Petrûs nas kir, ji şabûna dergeh venekir, lê revî çû hindur got: «Petrûs li ber dergeh sekinî ye!» ¹⁵ Wana gote wê: «Te hişê xwe unda kirye»? Lê ew ser ya xwe bû, ku rast e. Wana got: «Qey milyak'etê wî ye?»

¹⁶ Petrûs jî navbir'î nedidayê, ha dergeh dixist. Gava vekirin ew dîtin, hişê serê wan çû. ¹⁷ Ewî destê xwe hejand, ku ker' bin û gilî kir, ku çawa Xudan ew ji hebsê derxistye, usa jî got: «Vê yekê Aqûb û birayên dinr'a jî bêjin». Lê xwexa rabû çû cîkî din.

¹⁸ Sibeh ku safî bû, esker gelekî t'evîhev bûn, ku gelo Petrûs çawa bû? ¹⁹ Gava Hêrodes li wî ger'ya û ew nedît, ji eskeran her tişt pirsî, paşê ferman da, ku ew bêne kuştinê. Peyr'a Hêrodes ji Cihûstanê dak'ete Qeyserîyê û li wir ma.

MIRINA HÊRODES P'ADŞA

²⁰ Hêrodes cimeta Sûr û Saydayêr'a dijminatî dajot. Evana jî hevr'a rabûn hatin, Bilastoyê wek'îlê mala Hêrodesr'a ziman dîtin, hîvî jê kirin, ku ew haşîyê *nava wanda* çê ke, çimkî bajarên wan ji welatê wî p'adşayî xurek distandin. ²¹ Rojeke k'ifşkirî Hêrodes k'incên p'adşatîyê lê, li herema dîwanê rûnişt û bi cimete wanr'a xeber dida. ²² K'oma merivan jî dikire qîr'în û digot: «Eva dengê xwedêkî ye, ne ku yê mêriv e!» ²³ Hema li cîda milyak'etekî Xudan wî xist, ji ber ku wî şikirî neda Xwedê û kurmî bû mir. ²⁴ Lê xebera Xwedê bela dibû û zêde dibû.

²⁵ Barnabas û Şawûl çaxê xizmetîya xwe anîne sêrî, ji Orşelîmê vegeryan. Yûhennayê ku jêr'a Marqos digotin jî xwer'a anîn.

PAWLOS Û BARNABAS GIRAVA QUBRISÊDA

13 ¹ Civîna Entakyayêda çend p'êxember û dersdar hebûn, Barnabas, Şimhûnê ku wîr'a Nîgêr digotin, Lûkyoyê ji Kûrênê, Menayînê, ku t'evî Hêrodesê serok mezin bibû û Şawûl. ² Gava evana nava hebandina Xudanda bûn û rojî digirtin, Ruhê Pîroz wanr'a got: «Barnabas û Şawûl bona wî k'arê ku min gazî wan kirye minr'a cude bikin». ³ Hingê rojî girtin, dua kirin, destên xwe danîne ser wan û ew şandin.

⁴ Awa evana ku ji Ruhê Pîroz hatine şandinê, dak'etine Sêlûkyayê û ji wir bi gemîyê derbazî Qubrisê bûn. ⁵ Gava gihîştine Selamîsê, k'inîştên cihûyanda xebera Xwedê dannasîn dikirin û Yûhenna jî k'omekdarê wan bû. ⁶ Ew t'emamîya wê giravê ger'yan, gihîştine heta Pafosê. Wir p'êxemberekî cihûyanî derew û sêrbaz dîtin, navê wî Baryêşû. ⁷ Eva berdestîkî Sêrgîyo Pawlosê welî bû. Sêrgîyo Pawlos jî merivekî aqil bû, evî gazî Barnabas û Şawûl kir, ku xebera Xwedê bibihê. ⁸ Lê Baryêşûyê sêrbaz, bi yûnanî Êlûmas, miqabilî wan rabû û dixast welî ji bawerîyê bixalifîne. ⁹ Hingê Şawûlê ku Pawlos jî dibêjinê, bi Ruhê Pîroz t'ijî li wî sêrbazî nihêrî ¹⁰ û got:

«Hey mixeneto û hemû fêlbazîyanva t'ijîyo! Ç'êjikê Şeytan! Dijminê hemû rastîyê! Tuê heta çiçax t'erka xalifandina rîyên Xudane rast nedî? ¹¹ Va wê destê Xudan ser te giran be, tuê kor bî û demekê *rûyê* te'vê nebînî». Û destxweda mij û dûman hate ser wî, virda-wêda diçû, rêber dixastin. ¹² Hingê gava welî ev yek dît, bawer kir û ser wê hînkirina bona Xudan ecêb ma.

PAWLOS Û BARNABAS LI BAJARÊ ENTAKYA QEZA PISÎDYAYÊ

¹³ Hingê Pawlos hevalên xweva bi gemîyê ji Pafosê rêk'etin hatine Pergêya Pamfilyayê. Yûhenna li wir ji wan qetya, vegerya Orşelîmê. ¹⁴ Ewana jî ji Pergê çûne Entakya Pisîdyayê û roja şemîyê k'etine k'inîştê rûniştin. ¹⁵ Pey xandina Qanûn û nivîsarên p'êxemberan'ra serk'arên k'inîştê yek şandine cem wan û gotin: «Gelî birano, heger gotineke we heye, ku dil bidine cimetê, k'erem kin bêjin». ¹⁶ Pawlos rabû, destê xwe hejand û got: «Gelî cimeta Îsraêlê û necihûyên ku ji Xwedê ditirsin, guhdar bin! ¹⁷ Xwedêyê vî miletê Îsraêlê kal-bavên me hilbijartin û milet li erdê Misirê~ xerîbîyêda zêde kir. Û bi destê *xweye* zor ew ji wir derxistin, ¹⁸ çil salî ber'îyêda ew xwey kirin. ¹⁹ erdê Kenanêda k'oka heft miletan anî û erdê wan çawa cî-war da cimeta xwe. ²⁰ Ji hingêda, çarsid pêncî salan hakim dane wan, heta dema Samoyêl p'êxember. ²¹ Paşê p'adşa xastin, Xwedê çil salan yekî ji qebîla Binyamîn, Şawûlê kur'ê Kîs da wan. ²² Paşê ew guhast, Dawid ser wan kire p'adşa, ku bona wî şehdetî da got: <Min Dawidê Yêşa, merivekî dilê xwer'a dît, yê ku daxaza min hemû wê bîne sêrî>. ²³ Ji silsileta wî Xwedê mîna sozê xwe Îsraêl'ra Îsayê Rizgarkir derxist. ²⁴ Berî hatina wî, pêşda Yûhenna t'emamîya miletê Îsraêlê'ra dannasîn kir, ku ji gunehkirinê vegehin û bêne nixamtinê. ²⁵ Çaxê Yûhenna k'arê xwe ser hevda anî, got: <Hûn bona min çawa difikirin, ez k'î me? Ez ne ew im, çawa hûn difikirin. Lê va ew pey min'ra tê, ez ne hêja me ku benên p'êlavên nigan *jî* vekim>.

²⁶ Gelî birano, lawên ji xûn-qinêta Îbrahîm û necihûyên nava weda, ku ji Xwedê ditirsin, mer'a ev xebera ku pê rizgar dibin hate şandinê. ²⁷ Binelfiyên Orşelîmê û mîrên wan Îsa çawa Rizgarkir nas nekirin, lê çaxê dîwana wî kirin, gotinên p'êxemberan, anîne sêrî, ya ku her şemî dixûnin. ²⁸ Neheqîya bona kuştinê jî li ser wî nedîtin, lê dîsa hîvî ji Pîlato kirin ku wî bide kuştinê. ²⁹ Çaxê her tiştên ku bona wî nivîsar bûn anîne sêrî, ji dar anîne xwarê kirine t'îrbê. ³⁰ Lê Xwedê ew ji mirinê zêndî kir ³¹ û gelek rojan wî xwe wanva da k'îfşê, yên ku ji Celîlê wî'ra hatibûne Orşelîmê. Niha jî ewana li ber cimetê şehdeyên wî ne. ³² Û em vê Mizgînîyê didine we, ku Xwedê kal-bavên mer'a çî soz dabû, ³³ ew *tişt* lawên wan'ra~ bona me anî sêrî, çaxê Îsa ji mirinê zêndî kir. Çawa Zebûra dudanda jî nivîsar e: <Tu kur'ê min î û îro bona min bûyî>. ³⁴ Bona zêndîbûna wîye ji mirîyan û wê yekê jî ku ewê qet nerize, Xwedê aha gotye: <Ezê wan dua-dirozgên pîrozî amin û Dawid'ra sozdayî ser weda bibarînim>. ³⁵ Zebûrekêda jî dibêje: <ne jî tuê bihêlî ku Pîrozê te birize>. ³⁶ Belê, Dawid zemanê xweda qirara Xwedê'ra xulamî kir, mir û gihîştê pêşiyên xwe, *qalibê wî rizî*. ³⁷ Lê yê ku Xwedê ew ji mirinê zêndî kir nerizî. ³⁸ Niha bira hûn vê yekê bizanibin, gelî birano, ku bi saya Îsa wer'a bona baxşandina gunehan tê dannasînkirinê. Û ji wan her tiştên ku hûn bi Qanûna Mûsa nikaribûn bêsûc bûna, ³⁹ niha k'î ku Îsa bawer bike wê bêsûc be. ⁴⁰ Miqatî xwe bin, nebe ev tiştê ku p'êxemberan gotye bê serê we: ⁴¹ <Binhêrin! Hûnên ku *xeberê* ber tiştêkî hesab nakin, ecêbmayî bin û betavebin, çimkî ezê rojên weda kirekî bikim, kirekî usa, ku heger yek wer'a bêje jî hûnê bawer nekin>». ⁴² Gava Barnabas û Pawlos ji wir derk'etin, *cimetê* hîvî ji wan kir, ku şemîya din jî bona wê yekê wan'ra xeber din. ⁴³ Gava civîna k'inîştê bela bû, gelek cihû û ji necihûyên ku bawerîya cihûyan hildabûn pey Pawlos û Barnabas diçûn. Wan jî wan'ra xeber didan û dilê wan dişidandin, ku t'imê nava k'erema Xwedêda bimînin. ⁴⁴ Lê roja şemîya din deve-devî t'emamîya bajêr civya, ku xebera Xudan bibihê. ⁴⁵ Gava cihûyan ew k'oma merivan dît, ji hevsûdîyê miqabilî gotinên Pawlos sekinîn û k'ifirîn. ⁴⁶ Hingê Pawlos û Barnabas bêtirs gotin: «Gerekê pêşiyê xebera Xwedê wer'a bihata gotinê, lê hûn ku xebera Xwedê ji xwe dîr dixin û xwe layîqî jîyîna heta-ha-tê nagirin, awa emê her'ine berbi hêtanosan. ⁴⁷ Çimkî Xudan aha ferman da ser me: <Min tu kirî ronahîya hêtanosan, ku heta serê dinyayê bibî mecala rizgarbûnê>».

⁴⁸ Gava hêtanosan ev bihîst, şa bûn şikirî didane gotina Xudan. Û yên bona jîyîna heta-ha-tê k'îfşkirî bûn bawer kirin. ⁴⁹ Û xebera Xudan belayî t'emamya welêt bû. ⁵⁰ Lê cihûyan helan dane k'ulfetên xwedêbawere xweyhurmet û giregirên bajêr û miqabilî Pawlos û Barnabas rakirin, ew ji sînoren xwe derxistin. ⁵¹ Wana jî t'oza nigên xwe ser wanda dawşand, çûne Îkonyayê ⁵² û şagirt bi şabûnê û Ruhê Pîrozva t'ije bûn.

PAWLOS Û BARNABAS BAJARÊ ÎKONYAYÊDA

14 ¹ Îkonyayêda jî Pawlos û Barnabas mîna her car k'etine k'inîştî cihûyan û usa xeber dan, ku k'omeke merivane giran ji cihû û yûnanan bawer kirin. ² Lê cihûyên ku bawer nekirin dilê hêtanosan qilqilandin û rakirine miqabilî biran. ³ Awa ewana gelek waxt li wir man, bêtirs ser Xudan xeber didan, Xudan jî xebera k'erema xwe îzbat dikir~ bi destên wan nîşan û k'iryamet didane kirinê. ⁴ Lê dutîretî k'ete bajêr, hinek alîyê cihûyan bûn, hinek jî alîyê şandîyan. ⁵ Hingê hineke ji hêtanosan û cihûyan t'evî mîrên xwe qîrar kirin, ku wan bêhurmet kin û bidine

* 13:33 Zebûr 2:7.

† 13:34 Îşaya 55:3.

‡ 13:35 Zebûr 16:10.

§ 13:41 Hebaqûq 1:5.

** 13:47 Îşaya 49:6.

ber keviran, ⁶ lê ew pê hesyan revîne Lîstrayê û Dêrbê, bajarên Lûkayonyan, usa jî der-dorên wan. ⁷ Û li wan deran Mizgînî didan.

PAWLOS Û BARNABAS LÎSTRAYÊDA Û DÊRBÊDA

⁸ Lîstrayêda yekî ji zikmakîyêda niganda şilûşet rûniştî bû, ku qet neger'yabû. ⁹ Ewî jî guhdarîya Pawlos dikir. Pawlos li wî nihêrî û gava dît ku bawerîya wî bona qencbûnê heye, ¹⁰ bi dengê bilind got: «Rabe ser nigên xwe rast bisekine!» Ewî jî hevraz banzda û destpê kir ger'ya. ¹¹ K'oma merivan gava kirina Pawlos dît, bi dengê bilind bi lûkayonî gotin: «Xwedê nîgara merivanda dak'etine cem me!» ¹² Barnabasar'a Zews digotin, Pawlosar'a Hermês, çimkî xeberdanêda yê pêş ew bû. ¹³ K'urmê p'aristxana Zews, ku li pêşberî bajêr bû, ga bi t'aculîyanva t'evayî anîne ber dergeh, xast ku t'evî k'oma merivan şandîyanr'a bike qurban. ¹⁴ Lê gava şandîyanr' Barnabas û Pawlos ev yek bihîst, k'incên xwe qelaştin û revîne nava k'oma merivan, kirine gazî û gotin: ¹⁵ «Evdno! Hûn çima vê yekê dikin? Em jî binyata xweda merivne mîna we ne, Mizgînîyê didine we, ku hûn ji wan tiştên p'ûç vegezin û berbi Xwedêyê zêndî bîn, yê ku erd, ezman, be'r û hemûyên nava wanda efirandine. ¹⁶ Wî zamanên bihurîda hişt ku her millet rîya xweda her'e. ¹⁷ Lê wî xwe bêy şehdetî nehişt, wer'a qencî kir, ji ezmên baran barand, rez jî demsalanda dane we, bi xurekva hûn t'êr kirin û şabûn jî avîte dilê we». ¹⁸ Bi van gotinan wana bi zorekê k'oma merivan zeft kir, ku qurbanan wanr'a nedîn.

¹⁹ Hingê ji Entakyayê û Îkonyayê cihû hatin, k'oma merivan k'aşî alîyê xwe kirin, Pawlos dane ber keviran û jî bajêr k'aşî der kirin, wan t'irê mirye. ²⁰ Lê gava şagirtan dora wî girt, ew rabû k'ete bajêr û roja din t'evî Barnabas rabû çû Dêrbê.

PAWLOS Û BARNABAS VEDIGERINE ENTAKYAYA QEZA SÛRYAYÊ

²¹ Wana ku wî bajarîda Mizgînî dan û gelek kirine şagirt, vegeryane Lîstrayê, Îkonyayê û Entakyayê. ²² Dilê şagirtan dişidandin û dil didane wan, ku bawerîyêda bimînin û digotin: «Gerekê em bi gelek te'li-tengî dîtîne bik'evine P'adşatîya Xwedê». ²³ Wana bona her civînekê berpirsyar k'ifş kirin, bi rojî dua kirin û ew spartine wî Xudanê ku bawerîya xwe wî anîbûn.

²⁴ Ew nava Pisîdyayêr'a derbaz bûn, paşê hatine Pamfilyayê. ²⁵ Pergêda jî xebera Xwedê dannasîn kirin û dak'etine Entalyayê. ²⁶ Ji wir jî bi gemîyê çûne Entakyayê, wê dera ku spartî k'erema Xwedê bibûn, ku bona wî k'arê ku ser hevda anîn bêjin. ²⁷ Gava hatin, civîn li hev civandin û wanr'a gilî kirin, ku Xwedê t'evî wan çi tişt kirine û çawa dergehê bawerîyê li ber hêtanosan jî vekir. ²⁸ Û li wir gelek waxt t'evî şagirtan man.

CIVATA LI ORŞELÎMÊ

15 ¹ Ji Cihûstanê hinek dak'etibûne Entakyayê û birayên wir hîn dikirin digotin: «Heger hûn li gora rizmê Mûsa neyêne sinetkirinê, rizgar nabin». ² Nava wan, Pawlos û Barnabasda gelek de'w-doz pêşda hat, hingê biratîyê qîrar kir ku bona vê pîrsê Pawlos, Barnabas û ji wan çend kes hevraz her'ine Orşelîmê cem şandî û berpirsyaran. ³ Ew ji civînê hatine verêkirinê û Fînîkyê û Sameryayêva derbaz bûn û hemû bawermendanr'a bona vegera hêtanosan gilî dikirin û bi vê yekê ew gelekî şa kirin. ⁴ Gava gihîştine Orşelîmê civînê, şandîyan û berpirsyaran ew qebûl kirin û çî ku Xwedê t'evî wan kiribûn wanr'a gilî kirin. ⁵ Lê hinek bawermendên ji k'omela fêrisîyan rabûn gotin: «Gerekê van sinet kin û bêjin, ku ew Qanûna Mûsa xwey kin».

⁶ Şandî û berpirsyar civyan, ku bona vê pîrsê bişêwrin. ⁷ Pey gelek de'w-dozêr'a Petrûs rabû ser p'îyan û gote wan: «Gelî birano! Hûn xwexa zanin, ku ji rojên pêşinda ji nav we Xwedê ez hilbijartim, ku hêtanos xebera Mizgînîyê ji zarê min bibihên û bawer bikin. ⁸ Xwedêyê ku haş ji dilan heye da îzbatkirinê, ku *hêtanos* jî li wî qebûl in, çaxê Ruhê Pîroz da wan jî, çawa da me. ⁹ T'u firqî nava me û wanda danenî, bi bawerîyê dilê wan paqij kir. ¹⁰ Îdî çima hûn Xwedê dicêribînin, barekî usa datînine ser stûyê şagirtan, ku ne kal-bavên me karibûne bibin, ne jî me? ¹¹ Ev yek aha nabe, lê em bawer dikin, ku çawa em bi k'erema Xudan Îsa rizgar dibin, usa jî ew».

¹² Hingê t'emamîya civatê dengê xwe bir'î û guh dane ser wan gotinên Barnabas û Pawlos, ku Xwedê bi destên wan çiqas nîşan û k'iryamet nava hêtanosanda kiribûn. ¹³ Gava wana gotina xwe xilaz kir, Aqûb xeberda got: «Gelî birano! Guh bidine min. ¹⁴ Şimhûn gilî kir, ku çawa Xwedê *hé* pêşda rehma xwe li hêtanosan kiribû, ku ji nava wan cimetekê xwer'a derxe, ku navê wî ser wan be. ¹⁵ Vê yekêr'a gotinên p'êxemberan jî li hev digirin, çawa nivîsar e: ¹⁶ <Ji vir hada ezê vegezim, konê Dawidî k'etî dîsa vegirim û cîyên xirabbûyî jî çê kim û wî dîsa bidime sekinandinê, ¹⁷ ku merivên dine mayî û hemû hêtanosên ku navê min ser wan e, li Xudan biger'in. ¹⁸ Xudanê ku ev tişt hê ji dewrên berêda aşkere kirye *vê yekê* dibêje>*. ¹⁹ Lema jî ez aha rê têt'a dibînim, ku em zehmetê nedine ewên ku ji hêtanosan berbi Xwedê têt, ²⁰ lê em namekê wanr'a binivîsin, ku hevza xwe ji wan qurbanên p'ûtanr'a têne dayîne bikin, usa jî ji bînamûsiyê, goştê mirar û xûnê. ²¹ Lê *cihûyanr'a nenivîsin*, çimkî hê ji qurnên berêda her bajarîda Qanûna Mûsa têt hînkirinê û hemû rojên şemîyan jî k'îniştanda têt xandinê».

* 15:18 Amos 9:11,12.

²² Hingê li şandîyan, berpirsyan û t'emamiya civînê xaş hat, ku ji nava xwe çend merivan hilibijêrin û t'evî Pawlos û Barnabas bişînine Entakyayê. Ev bûn yê ku hatine şandinê: Cihûdayê ku wîr'a Barsabo digotin û Sîlas. Nava bawermendanda evana naskirî bûn. ²³ Bi destê wan ev nama nivîsar şandin: «Şandî, berpirsyan û *her* bira silavan li we birayên ji necihûyane li Entakyayê, Sûryayê û Kîlîkyayê dîkin.

²⁴ Me bihîstye, hinek ji nava me derk'etine, ku me t'emî nedane wan, lê wan bi xeberên xwe zehmet dane we û fikirên we t'evîhev kirine, ku dibêjin: «Gerekê bêne sinetkirinê û Qanûna Mûsa xwey bikin». ²⁵ Bona vê yekê li t'emamiya şewra civîna me xaş hat, ku em çend merivan hilibijêrin û t'evî birayên meye delal Barnabas û Pawlos bişînine cem we, ²⁶ yê ku jîyîna xwe dane navê Xudanê me Îsa Mesîh. ²⁷ Awa em Cihûda û Sîlas dişînin, ku ew jî van tiştan bi zarê xwe *wer'a* bêjin. ²⁸ Li Ruhê Pîroz xaş hat, usa jî li me, ku t'u barî nedine ser milê we, pêştirî van tiştên hewce: ku ²⁹ hûn dûrî qurbanên p'ûtan, xûnê, mirariyê û bênamûsiyê bin. Heger hûn xwe ji van tiştan xwey kin, qenc e. *De xatirê we, hûn xaş bin*».

³⁰ Hingê ewana verêkirin, ew jî dak'etine li Entakyayê û cimet civandin, name dane wan. ³¹ Çaxê wan ew xand, bona wê berdilîyê gelekî şa bûn. ³² Cihûda û Sîlas jî, ku p'êxember bûn, bi gelek xeberan dil dane bawermendan û ew şidandin. ³³ Ew gelek waxt li wir man, paşê bawermendan ew bi haştî paşda şandine cem ewên ku ew şandibûn, ³⁴ lê li Sîlas xaş hat, ku wir bimîne. ³⁵ Pawlos û Barnabas jî Entakyayêda diman, t'evî gelekên mayîn xebera Xudan hîn dikirin û dannasîn dikirin.

PAWLOS Û BARNABAS JI HEVDU DIQETIN

³⁶ Çend rojan şûnda Pawlos gote Barnabas: «Were em veşerî serîkî bidine wan biran, k'îjananr'a me hemû bajaranda xebera Xudan dannasîn kirye, em binihêrin k'a halê wan çawa ye». ³⁷ Barnabas dixast Yûhennayê ku jêr'a Marqos digotin jî xwer'a bibirana, ³⁸ lê Pawlos digot ne rast e, ku ew wî xwer'a bibin, yê ku Pamfilyayêda ji wan qetya û t'evî wan k'ar nekir. ³⁹ Û aha ew hevr'a qayl nebûn û ev bû manî, ku ew ji hev qetyan. Barnabas Marqos hilda bi gemîyê çû Qubrisê, ⁴⁰ Pawlos jî Sîlas hilibijart û ji biratiyê spartî k'erema Xudan bûn, rêk'etin çûn. ⁴¹ Li Sûryayê û Kîlîkyayê ew diger'yan, civîn dişidandin.

TÎMOTÊYO

16 ¹ Pawlos hate Dêrbê û Lîstrayê. Wê derê şagirtek hebû, navê wî Tîmotêyo, kur'ê k'ulfeteke cihûye bawermend, lê bavê wî yûnan bû. ² Bawermendên Lîstrayê û Îkonyayê bona wî qenc xeber didan. ³ Pawlos xast wî xwer'a bibe û bona cihûyên wan deran girt ew sinet kir, çimkî hemûyan jî zanibû, ku bavê wî yûnan e. ⁴ Çaxê bajaranr'a derbaz dibûn, wan ew t'emîyên ku şandîyan û berpirsyanên Orşelîmê qîrar kiribûn didane bawermendan, ku xwey bikin. ⁵ Awa *her der* civîn baweriyêda dişidîyan û roj bi roj hesabê wan zêde dibû.

GAZÎYA JI MEKEDONYAYÊ

⁶ Li nava sînoren Firîgya û Galatyayêr'a ewana derbaz bûn, çimkî Ruhê Pîroz nehişt ew qeza Asyayêda xebera Xwedê bêjin. ⁷ Çaxê nêzikî Mîsyayê bûn, kirin ku her'ine Bîtênayê, lê Ruh destûr neda wan ⁸ û ber Mîsyayêva derbaz bûn dak'etine Troyayê. ⁹ Şev Pawlos dîtînokêda dît, wê yekî mekedonî sekinî bû hîvî jê dikir digot: «Were Mekedonyayê alî me bike». ¹⁰ Gava wî ew dîtînok dît, me pêr'a-pêr'a xast her'ine Mekedonyayê. Me fem kir, ku Xwedê me dişîne wir, ku em Mizgînîyê bidine wan.

PAWLOS Û SÎLAS BAJARÊ FÎLÎPYAYÊDA

¹¹ Em ji Troyayê bi gemîyê derk'etin rast çûne Samotraxê, roja din Nêyapolîsê. ¹² Ji wir jî çûne Filîpyayê, bajarekî nehîya Mekedonyayêyî nav-deng, *Romê* hêsîr danîne wir. Wî bajarîda em çend rojan man. ¹³ Roja şemîyê em ji dergehê bajêr derk'etin çûne devê ç'em, çawa em difikirîn, ew der cîyê duakirinê bû. Me rûniştî t'evî k'ulfetên civyayî xeber dida, ¹⁴ ji bajarê Tiyatîrayê k'ulfetek, ku tîrsa Xwedê dilda hebû, navê wê Lîdyâ, wê k'incên şîrk difirotin, guhdarî dikir. Xudan dilê wê vekir, ku guh bide gotinên Pawlos. ¹⁵ Gava ew neferên xweva bi avê hatine nixamtinê, hîvî ji me kir got: «Heger hûn min bawermenda Xudan hesab dîkin, k'erem kine mala min, cem me bimînin». Û zor li me kir, em birin.

¹⁶ Carekê em diçûne cîyê duakirinê, carîk rastî me hat, ku ruhê k'oçektîyê pêr'a bû, evê bi wê k'oçektîyê xweyên xwer'a gelek qazinc danî. ¹⁷ Eva pey Pawlos û me k'etibû, dikire qîr'in û digot: «Ev merivana xulamên Xwedêyê Herî Jor in, ku wer'a bona rîya rizgarbûnê dannasîn dîkin!» ¹⁸ Eva yeka ewê gelek rojan dikir, heta ku Pawlos aciz bû, vegerya û wî ruhîr'a got: «Bi navê Îsa Mesîh fermanê didime te ji wê derê!» Û pêr'a-pêr'a ew ji wê derk'et. ¹⁹ Gava xweyên wê dîtî, ku gumana qazınca wan hate bir'inê, Pawlos û Sîlas girtin, k'aşî meydana bajêr, cem mîran kirin, ²⁰ ew birine ber serokên Romayê û gotin: «Ev merivana cihû ne û bajarê me t'evîhev dîkin. ²¹ Rizmê usa me bajarvanên Romayê hîn dîkin, ku mer'a ne cayîz e wê hildin, ne jî bikin». ²² K'oma merivan hicûmî ser wan kir, serokên bajêr jî k'incên wan qelaştin û ferman dan, ku wan bidine ber şivan. ²³ Pey gelek lêdanêr'a avîtine hebsê û ferman dane serokê hebsê, ku miqat wan xwey bike. ²⁴ Ewî ku ev ferman stand, ew avîtine zindanê û nigên wan qeydanda şidandin.

²⁵ Nêzikî nivê şevê Pawlos û Sîlas dua dikirin û Xwedêr'a distiran, girtîyên hebsê jî guhê xwe dabûne ser wan.

²⁶ Nişkêva erd qayîm hejya, ku heta rikinên hebsê jî leqîyan, pêr'a-pêr'a hemû derî vebûn, qeyd-benên hemûyan jî pêr'a vebûn. ²⁷ Serokê hebsê gava hişyar bû û derên hebsê vekirî dîtîn, şûr k'işand, ku xwe bikuje, çimkî wî t'irê girtîyên hebsê revîne. ²⁸ Lê Pawlos bi dengê bilind kire gazî û got: «T'u zîyanê nede kesa xwe, em hemû jî vir in!» ²⁹ Ewî ç'ira xast, revî hindur, lerizî xwe avîte ber Pawlos û Silas. ³⁰ Ew derxistin û got: «Ez xulam! Ez çi gerekê bikim, ku rizgar bim?» ³¹ Wana jî got: «Bawerîya xwe Xudan Îsa bîne û tuê neferên xweva rizgar bî». ³² Hingê xebera Xudan gotine wî û wan hemûyên mala wîda. ³³ Hema wê şevê serokê hebsê ew birin, birinên wan şuştin û pêr'a-pêr'a ew û neferên wî pê avê hatine nixamtinê. ³⁴ Wî ew anîne mala xwe, sifre li ber wan rast kir û t'emamîya neferên xweva şa bûn, ku bawerîya xwe Xwedê anîn.

³⁵ Çaxê sibeh ron bû, serokên bajêr berdestîyên xwe şandin û gotin: «Wan merivan ber'de». ³⁶ Serokê hebsê ev yek Pawlosr'a got: «Serokan meriv şandine, ku hûn bêne berdanê. Niha rabin bi haştî her'in». ³⁷ Lê Pawlos gote wan: «Wana em~ bajarvanên Romayê, bêy de'w-dîwan bi cimetî dane ber şivan û avîtine hebsê! Niha dixazin bi dizîva me derxin? Na, ev yek nabe, bira ew bèn me derxin». ³⁸ Berdesyîyan ev xeber gîhandine serokên bajêr. Gava ku bihîstin ew bajarvanên Romayê ne, tirsyan ³⁹ hatin xwe avîtine wan, paşê ew derxistin û hîvî kirin, ku ji bajarê wan her'in. ⁴⁰ Ew jî ji hebsê derk'etin çûne mala Lîdyayê, li wir bira dîtîn, dil dane ber wan û çûn.

QALMEQALMA BAJARÊ TÊSALONİKÊDA

17 ¹ Ew Emfîpolîs û Apolonyayêva derbaz bûn hatine Têsalonîkê, wê dera ku k'iniştî cihûyan hebû. ² Pawlos mîna keysetê xwe k'ete nava wan û sê rojên şemîyê t'evî wan dik'ete xeberdanê, ji nivîsaran ³ şirovedikir û wanr'a îzbat dikir, ku gerekê Mesîh biçerçîrya û ji mirinê zêndî bûya û digot: «Ev Îsayê ku ez wer'a dannasîn dikim, ew Mesîh e». ⁴ Hinekên ji wan bawer kirin û xwe li Pawlos û Silas girtin, usa jî k'oma merivane xwedêtirse ji yûnanan û ji gelek k'ulfetên xweyhurmet.

⁵ Lê hinekên ji cihûyan ji hevsûdîyê çend merivên bêkêre ner'ast hildan, kirine qalmeqalm, bajar t'evîhev kirin û h'icûmî ser mala Yason kirin, dixwastin Pawlos û Silas derxistana ber cimetê. ⁶ Gava ew nedîtîn, Yason bi çend biranva t'evayî k'aşî cem serokên bajêr kirin, dikirine qîr'în digotin: «Ewên dinya t'evîhev kirine gihîştine vir jî ⁷ û Yason ew hildane *mala xwe!* Ev hemû miqabilî qîrarên Qeyser diçin û dibêjin: <P'adşakî din heye, navê wî Îsa>». ⁸ Bi van gotinan k'oma merivan û serokên bajêr t'evîhev kirin. ⁹ Hingê ji Yason û yên mayîn cabdarîya bêqezîfîyê standin û ew berdan.

PAWLOS Û SÎLAS BAJARÊ BEROYAYÊDA

¹⁰ Hema çawa tarî k'ete erdê, biratîyê Pawlos û Silas şandine Beroyayê. Ew ku gihîştine wir, çûne k'iniştî cihûyan. ¹¹ *Cihûyên* vir ji yên Têsalonîkê serwaxttir bûn, xebera Xwedê bi dilê t'am hildan û her roj li ser lênihêrandina nivîsaran bûn, k'a gelo ev tişt usa ye. ¹² Ji wana gelek bawer kir, usa jî gelek k'ulfetên yûnane xweyhurmet û mêr jî ne kêmbûn. ¹³ Çaxê cihûyên Têsalonîkê bihîstin ku Pawlos Beroyayêda jî xebera Xwedê dannasîn dike, hatin wir jî helan dane k'oma merivan û ew t'evîhev kirin. ¹⁴ Hingê biratîyê Pawlos zû şandine ber be'rê, lê Silas û Tîmotêyo Beroyayêda man. ¹⁵ Ewên ku Pawlos ver'êdikirin, heta Atînayê ew birin, ji wî bona Silas û Tîmotêyo t'emî standin, ku zû her'ine cem wî û vegeryane *Beroyayê*.

PAWLOS LI BAJARÊ ATÎNAYÊDA

¹⁶ Çaxê Pawlos Atînayêda hîvîya wan bû, dilê wî ne rihet bû, çimkî dît wê bajar nava p'ûtp'arizîyêda bû. ¹⁷ Awa ewî k'iniştêda cihû û yûnanên xwedêbawerr'a xeber dida û li meydanê bajêrda jî her roj rastî k'ê dihat. ¹⁸ Çend filosofên êpîkûrî û stoyxî wir'a k'etine hucetê û hinekan digot: «Evî devbelayî bêt'ewşe çi dixaze bêje?» Hinekan jî digot: «Usa tê k'ifşê, ku eva bona xwedêyên xerîb dannasîn dike». Aha digotin, çimkî ewî bona Îsa û zêndîbûna mirîyan dannasîn dikir. ¹⁹ Hingê ew hildan birine ber civîna Aryopagoyê û gotin: «Em bona wê hînkirina nûye ku tu dannasîn dikî dikarin bizanibin? ²⁰ Tiştên xerîb tu me didî bihîstinê, lema jî em dixazin manîya wan bizanibin». ²¹ Hemû atînî û xerîbên ku wir diman, tiştêkî mayînva mijûl nedibûn, lê t'enê tiştên nû gotinêva yan bihîstinêva.

²² Hingê Pawlos ber civîna Aryopagoyêda sekinî û got: «Gelî atînyan! Ez dibînim, hûn ji her alîyanva hebandinêva gelekî giro ne. ²³ Çimkî çaxê ez geryam û hebandinên we nihêrîn û qurbangehek dît ku ser wê nivîsar bû <XWEDÊYÊ NENASR'A>. Awa ewê ku hûn nas nakin û jêr'a xizmetîyê dikin, ez bona wî wer'a dannasîn dikim. ²⁴ Xwedêyê ku ev dinya û hemûyên nava wêda efirandye, ew Xudanê erd û ezmên e û p'aristxanên bi destan çêkirîda namîne û ²⁵ ne jî ew hewcê xizmetîya destê merivan e, çawa yekî ç'evê wî tiştêkîda, lê ew xwexa jîyînê, bîne û her tiştî dide hemûyan. ²⁶ Wî her milletên dinyayê ji xûnekê xuliqandin, ku li rûbarê t'emamîya dinyayê bijîn û ewî zeman û sînorên cî-miskanen wanr'a k'ifş kirin. ²⁷ Ewî ev yek kirin, ku meriv li wî biger'in, belkî bip'elînin bibînin. Lê ew Xwedê ji me her yekî ne dûr e jî, ²⁸ çimkî em bi wî dijîn, dimeşin û hene. Çawa çend şayîrên we jî gotine: <Em ji e'silê wî ne>. ²⁹ Awa em ku ji Xwedê ne, em gerekê usa hesab nekin yanê Xwedê mîna zêr', zîv yan kevirê bi hiş û hostetîya merivan k'olayî be. ³⁰ Niha Xwedê waxtên nezantîyê nade ber hesaban, lê her deran t'emî li hemû merivan dike, ku ji gunehkirinê vegezin. ³¹ Çimkî Xwedê rojek k'ifş kirye, k'îjanêda dîwana dinyayê wê rast bi destê wî merivî bike, yê ku ewî k'ifş kirye. Xwedê bona dîwankirinê hemûyanr'a dane îzbatkirinê, çaxê ew meriv ji mirinê zêndî kir».

³² Gava bona zêndîbûna mirîyan bihîstin, hinek pê k'enyên, lê hinekan jî got: «Bona wê yekê emê careke din ji

te bibihên». ³³ Û Pawlos ji nav civîna wan derk'et çû. ³⁴ Lê hinekan xwe li wî girt, bawer kirin, Dîyonîsyoyê endemê Aryopagoyê, k'ulfeteke navê wê Damerîs û hinekên mayîn jî nava wanda bûn.

PAWLOS BAJARÊ KORINTÊDA

18 ¹ Ji wir şûnda ji Atînê Pawlos rêk'et çû Korintê. ² Li wir yekî cihû, navê wî Ekîla dît, jidêbûyîna xweda Pontosî. Eva ji Îtalyayê jina xwe Priskîlayêr'a t'evayî nû hatibû, ji ber ku Klawdyoyê qeyser ferman dabû, ku hemû cihû ji Romê derk'evin. Pawlos çû cem wan ³ û çimkî p'êşê wan yek bû~ kon çê dikirin, ew cem wan ma û t'evî wan xebitî. ⁴ Ew her rojên şemîyan k'inîştanda cihûyan û yûnananr'a dik'ete xebendanê û ew didane bawerkirinê.

⁵ Gava Sîlas û Tîmotêyo ji Makedonyayê hatin, Pawlos bi xîret waxtê xwe hemû da hînkirina xeberê û cihûyanr'a şehdetî dida, ku Mesîh, Îsa ye. ⁶ Gava ew miqabilî wî rabûn dik'ifirîn, ewî k'inca xwe dawşand û gote wan: «Xûna we serê we be, ez bêşûc im. Ji vir hada ezê her'ime cem hêtanosan». ⁷ Ew hingê ji wir çû k'ete mala yekî navê wî Tîto- Yûsto. Ew *necihûkî* xwedêtirs bû, mala wî rex k'inîştê bû. ⁸ Kirîspoyê serok'arê k'inîştê jî neferên xweva bawerîya xwe Xudan anî û ji Korintîyan geleskan ku bihîstin, bawer kirin û bi avê hatine nixamtinê.

⁹ Şevêkê Xudan dîtinkêda hate ber ç'evê Pawlos û got: «Netirse, xeber de û dengê xwe nebir'e. ¹⁰ Çimkî ez t'evî te me û t'u kes wê ber te ranebe zîyanê nede te, çimkî gelek cimeta min vî bajarîda heye». ¹¹ Ew li wê derê salekê û şeş mehan ma û xebera Xwedê ew hîn dikirin.

¹² Hêna welîyê Galîyoyê Axayayêda cihû bûne yek, h'icûmî ser Pawlos kirin û birine ber dîwanê ¹³ gotin: «Eva cimetê hîn dike, ku ne li gora Qanûnê Xwedêr'a xizmetîyê bikin». ¹⁴ Gava Pawlos wê dest bi xebendanê bikira, Galîyo gote cihûyan: «Gelî cihûno, heger gilî bona neheqîyê û xirabîyê bûya, dibû ku min guhdarîya we bikira, ¹⁵ lê heger pirs ser xeberan, navan û Qanûna we ye, hûn xwexa binihêrin. Ez naxazim bibime h'akimê van tiştan». ¹⁶ Û ew ji dîwanxanê derxistin. ¹⁷ Hingê hemûyan Sostênîsê serk'arê k'inîştê girtin, li ber dîwanxanê lêxistin, lê qet ne jî xema Galîyo bû.

PAWLOS VEDIGERE ENTAKYAYÊ

¹⁸ Pawlos hê gelek rojan li wir ma û peyr'a xatirê xwe ji biratîyê xwast, bi gemîyê çû alîyê Sûryayê. Priskîla û Ekîla jî t'evî wî bûn. Kenxêrayêda wî p'or'ê xwe kur' kiribû, çimkî ad-qirarkirî bû. ¹⁹ Gava ew gihîştine Efesê, ewî Priskîla û Ekîla li wir hiştin, lê xwexa k'ete k'inîştê û cihûyanr'a k'ete xebendanê. ²⁰ Wana hîvî ji wî kir, ku hinekî dirêj li wir bimîne, lê ew qayl nebû. ²¹ Lê gava ji wan dûr dik'et, got: «Heger Xwedê hiz bike, ezê dîsa ser weda bêm». Û ji Efesê bi gemîyê çû. ²² Çaxê gihîşte Qeyserîyê, hevr'az çû Orşelîmê silav da civînê û paşê dak'ete Entakyayê. ²³ Çaxê hinek waxt li wir ma, rabû berêva k'ete erdê Galatyayê û Firîgyayê û hemû şagirt bawerîyêda dişidandin.

APOLO

²⁴ Cihûkî navê wî Apolo, jidêbûyîna xweda ji Skenderyayê, hate Efesê. Eva gotinbêjekî serxwe û nivîsarên pîrozda jî zanekî zor bû. ²⁵ Ew Rîya Xudanda hînbûyî bû û bi ruhê xîretê bona Îsa rast xeber dida û hîn dikir, lê t'enê haş ji nixamtina Yûhenna hebû. ²⁶ Evî destpê kir k'inîştêda bêtirs xeber da. Lê Priskîlayê û Ekîlayê gava xeberdana wî bihîstin, ew birine cem xwe û hê rast Rîya Xwedê wîr'a şirovekirin. ²⁷ Apolo ku xwast her'e Axayayê, biratîyê dil dane ber û şagirtanr'a jî namek nivîsîn, ku wî qebûl kin. Çaxê ew gihîşte wir, gelekî kêrî wan hat, yên ku bi k'erema Xwedê bibûne bawermend. ²⁸ Çimkî xeberdana wîye bi cimetî ser ya cihûyan dik'et, wî bi nivîsarên pîroz izbat dikir, ku Mesîh, Îsa ye.

PAWLOS EFESÊDA

19 ¹ Çaxê Apolo hê Korintêda bû, Pawlos cîyê jorinr'a derbaz bû dak'ete Efesê, li wir çend şagirt dîtin ² û pirs da wan: «Çaxê we bawer kir, we Ruhê Pîroz stand»? Wana got: «Me qet nebihîstye jî, ku Ruhê Pîroz heye». ³ Ewî gote wan: «Lê hûn bi çî hatine nixamtinê»? Wan got: «Bi nixamtina Yûhenna». ⁴ Pawlos got: «Yûhenna bona ji gunehvegerê nixamt û cimetêr'a got: <Yê pey minr'a tê wî bawer bikin>, yanê Îsa *bawer bikin*». ⁵ Hema ev yek bihîstin, bi navê Xudan Îsa hatine nixamtinê. ⁶ Û gava Pawlos destên xwe danîne ser wan, Ruhê Pîroz hate ser wan, bi zîmanan xeber dan û p'êxembertî kirin. ⁷ Evana weke donzdeh merivan bûn.

⁸ Pawlos k'ete k'inîştê, sê mehan bêtirs li ser P'adşatîya Xwedê wanr'a dik'ete xebendanê û ew didane bawerkirinê. ⁹ Lê çaxê hineke serhişk miqabil derk'etin û li ber cimetê Rîya Xudan bêhurmet dikirin, Pawlos ji wan qetya, şagirt başqe kirin û her roj dersxana Tîranoda wanr'a xeber dida. ¹⁰ Eva yeka du salan k'işand, heta ku hemû cihû û yûnanên qeza Asyayêda xebera Xudan bihîstin.

HER HEFT KUR'ÊN SKÊWA

¹¹ Xwedê bi destê Pawlos gelek k'iryametên zor dikirin, ¹² heta ku ew destmal û şalikên ku Pawlos wan dik'et nexaşanr'a dibirin û ew qenc dibûn, ruhên xirab jî derdik'etin. ¹³ *Wir* çend cihûyên dewrêş hebûn, ku *xelq* didane

* 18:21 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «Ez gerekê ese vê cejina tê Orşelîmêda bim.»

sondê, wan îzin da xwe, ku ser merivên ku ruhên xirab nava wanda hebûn, pê navê Xudan Îsa berî wan *cinan* din û digotin: «Bi wî Îsayê ku Pawlos dannaşin dike em we didine sondê, derk'evin!»¹⁴ Ev yek her heft kur'ên Skêwayê serokk'ahînekî cihûyan dikirin.¹⁵ Carekê ruhê xirab li wan veğerand got: «Ez Îsa nas dikim, Pawlos jî zanim, hûn k'î ne?»¹⁶ Hingê ew merivê ku ruhê xirab wîda bû, xwe avîte wan, qewata wî wanda çû û usa wan xist, ku ew ji wê malê tazî û birîndar revîn.¹⁷ Bona vê yekê hemû cihû û yûnanên ku Efesêda diman pê hesyan. Tirs k'ete ser hemûyan û navê Xudan Îsa bilind dibû.¹⁸ Gelek bawermend jî dihatin gunehên xwe didane rûyê xwe û kirên xwe digotin.¹⁹ Yên ku sêrbazîyêva jî mijûl dibûn, gelek kitêbên xwe t'opî cîkî dikirin û li ber ç'evê hemûyan dişewitandin. Qîmetê wan hesab kirin, bû pêncî hezar zîvî.²⁰ Ê aha xebera Xudan bela dibû û qewat digirt.

DE'WA EFESÊDA

²¹ Çaxê ev tişt bûn, Pawlos qîrar kir, ku Makedonyayê û Axayayêr'a derbazî Orşelîmê be û got: «Pey çûyîna wirar'a ez gerekê her'im Romê jî bibînim». ²² Ewî du k'omekdarên xwe, Tîmotêyo û Êrasto şandine Makedonyayê û ew demeke kin jî li qeza Asyayê ma.

²³ Wan çaxanda bona Rîya Xudan gelek şer'-de'w pêşda hat. ²⁴ Yekî zîvker, navê wî Dîmîtrîyo. Evî p'aristxanên «xwedêya» navê wê Artemîs bi zîv, biç'ûk çê dikirin û gelek qazinc hosteyan'r'a danî. ²⁵ Ewî gazî wan hemû hosteyan, usa jî yê mîna xweyîyê vî p'êşeyî kirin û got: «Gelî hevalno! Hûn zanin, ku qazınca me ji vî k'arî ye. ²⁶ Hûn xwexa dibihên û dibînin, ku evî Pawlosî ne t'enê Efesêda, lê bawerîya we hebe t'emamîya qeza Asyayêda serê gelek cimetan t'ije kirye, ew ji rê derxistine û dibêje: <Ew xwedêyên ku bi destan çêkirî ne, ew ne xwedê ne>. ²⁷ Ziyana wê ne t'enê ew e, ku p'êşê me tê bêhurmetkirinê, lê p'aristxana Artemîs xwedêya mezin wê ber tiştêkî neyê hesabê û wê hurmeta mezinayîya wê bik'eve, ya ku hemû qeza Asyayê û dinya jêr'a xizmetîyê dikin».

²⁸ Gava wana ev yek bihîstin, bi k'în-box t'ije bûn, dikirine qîr'în digotin: «Artemîsa efesîyan mezin e!»²⁹ T'emamîya bajêr qîlqîlî, dest avîtime Gayos û Erîstarxoyê makedonî, ku heval-rêyên Pawlos bûn û hevr'a revîne dîtindarê. ³⁰ Pawlos jî xwast bik'eve nava wê k'oma merivan, lê şagirtan nehişt. ³¹ Ji mîrên qeza Asyayê hinekan jî, ku hevalên wî bûn, meriv şandine cem û hîvî jê kirin, ku neçe dîtindarê. ³² Hingê hinekan tiştêk digot, hinekan jî tiştêkî din dikirine qîr'în, çimkî k'ombûna wan t'evîhevbûyî bû, gelek jî nizanibû ew bona çi civyane. ³³ Hinekan ji k'oma merivan Skender pêşda birin, çimkî cihûyan ew pêşda avîtin. Skender destê xwe bilind kir, xwast caba cimete bide. ³⁴ Lê gava pê hesyan, ku ew cihû ye, hemûyan bi dengekî weke du sihetan kirine qîr'în: «Artemîsa efesîyan mezin e!»

³⁵ Paşê k'atibê bajêr k'oma merivan seqir'and û got: «Gelî efesîyan! K'î nizane, ku bajarê Efesê xweyîtyê p'aristxana Artemîsa mezin dike, ya ku kevirê wêyî pîroz ji ezmên k'etye?»³⁶ Usa ku vê yekêda tiştêkî xêlif t'une, lema jî gerekê hûn xwe rihet xwey kin û t'u tiştî xweserîxwe nekin. ³⁷ We ev meriv anîne vir, vana ne p'aristxane t'alan kirye û ne jî xwedêya me bêhurmet kirine. ³⁸ Awa heger şikîyatê Dîmîtrîyo û hosteyên t'evî wî hindava yekîda heye, bira her'ine dîwanxanê, h'akim hene. Li wir ew dikarin şikîyatê hevdu bikin. ³⁹ Lê heger xwastina we bona tiştêkî din e, bira civateke qanûnîda bê lênihêrandinê. ⁴⁰ Çimkî vê yekêda ziyana me jî heye û bona şer'ê îroyîn emê bêne neheqkirinê û manîk jî t'une, ku em bi wê bikaribin bona vê k'ombûnê cabê bidin». Gava ev yek got, civat bela kir.

PAWLOS DIÇE BERBI MEKEDONYAYÊ Û YÛNANISTANÊ

20¹ Gava qalmeqalm seqirî, Pawlos gazî şagirtan kir, dil da ber wan, xatirê xwe ji wan xwast û rabû çû Makedonyayê. ² Li wan alîyan gerya û bi gelek gotinan dil da wan. Paşê çû Yûnanistanê, ³ weke sê mehan li wir derbaz kir. Gava hazirîya xwe didît ku biçûya Sûryayê, cihûyan bona wî şewreke mixenetîyê kir, *lema* ew jî fikirî ku Makedonyayêva vegere. ⁴ Sopatroyê kur'ê Pîroyê ji Beroyayê, Erîstarxo û Sêkündoyê ji Têsalonîkê, Gayos û Tîmotêyoyê ji Dêrbê, Tixîko û Trofimoyê ji qeza Asyayê wir'a çûn. ⁵ Evana pêşîya me çûne Troyayê û li wir hîvîya me bûn. ⁶ Em jî pey rojên Cejina Nanê Şkevar'a bi gemîyê ji Filîpyayê çûn, pênc rojanda gihîştine Troyayê, cem wan. Em wir heft rojan man.

ZÊNDÎBÛNA EYTÛXO

⁷ Roja heftîyêye pêşin em bona nankerkirinê civyayî bûn, Pawlos ku rojtira din wê biçûya, wan'r'a xeber dida û xeberdana xwe heta nivê şevê dirêj kir. ⁸ Gelek ç'ira wê odexanêda hebûn, li k'u em civyayî bûn. ⁹ Cahilek jî, navê wî Eytûxo, li ser p'encerê rûniştî dihênîjî û k'ete xewa k'ûr. Ê çaxê Pawlos xeberdana xwe dirêj dikir, ew xewa k'ûrda ji jorda~ ji qatê sisyan k'et û ew mirîtî hildan. ¹⁰ Pawlos peyayî jêrê bû, xwe avîte ser wî, da hemêza xwe û got: «Netirsîn, çimkî ruhê wî wîda ye». ¹¹ Paşê rabû hat, nan ker kir xwar û dirêj xeber da, heta sibehê û rabû çû. ¹² Ew cahil jî zêndî û *silamet* anîne mal û gelekî hatine berdilîkirinê.

JI TROYAYÊ BERBI MÎLETOSÊ

¹³ Em çûn k'etine gemîyê û rêk'etin çûne berbi Asosê, me gerekê ji wir Pawlos hilda, çimkî ewî mer'a gotibû: «Ezê peya bêm». ¹⁴ Gava ew li Asosê rastî me hat, me ew hilda çûne Mitûlanê. ¹⁵ Ji wir jî em çûn û roja din

gihîştine pêşberî Xîyayê, rojtira din gihîştine Samosê, sibehtira din jî gihîştine Mîletosê. ¹⁶ Nêta Pawlos hebû bi gemîyê ber Efesê'a derbaz bûya, ku nebe waxtê xwe qeza Asyayêda unda bike, çimkî dilezand, ku heger jê'a li hev bê, Roja Pêncîye k'ifş ew li Orşelîmê be.

PAWLOS XATIRÊ XWE JI BERPIRSYARÊN CIVÎNA EFESÊ DIXAZE

¹⁷ Ewî ji Mîletosê meriv şande Efesê, gazî berpirsyarên civînê kirin. ¹⁸ Gava ew hatine cem wî, gote wan: «Hûn xwexa zanin, ku wê roja pêşinda, çaxê min nigê xwe avîte qeza Asyayê, heta niha wer'a çawa bûme. ¹⁹ Min Xudanr'a t'am şkestî bi gelek hêsiran, nava wan cêribandinanda xizmetî kirye, k'îjan ji şêwrên cihûyan dihatine serê min. ²⁰ Hûn zanin ku min ji gotinên bona we kêrhatî qet xwe nedaye paş, lê her tişt wer'a gotine û aşkere mal-mal hûn hîn kirine. ²¹ Min bi merîfetî him hîvî ji cihûyan, him jî ji necihûyan kir, ku vegerine berbi Xwedê û bawerîya xwe Xudanê me Îsa bînin. ²² Ê va ye ez bin benda Ruhda diçime Orşelîmê, wir wê çî bê serê min, ez nizanîm. ²³ Lê t'enê her bajarîda Ruhê Pîroz min pê dihesîne û dibêje ku: <Ben û tengasî pêşîya te ne>. ²⁴ Lê ez jîyîna xwe layîqî t'u tiştî nagirim, t'enê dikim bigihîjime meremê xwe û wê xizmetîya ku min ji Xudan Îsa standye bînimê sêrî~ Mizgînîya k'erema Xwedê bi merîfetî dannasîn kim.

²⁵ Niha ez zanim, hûn hemûyên ku ez nav wêda geryame û min P'adşatîya Xwedê wer'a dannasîn kirye hûnê îdî rûyê min nabînin. ²⁶ Ji bona vê yekê ez roja îroyîn li ber we şehdetîyê didim, ku ne cabdarê xûna we t'u kesî me, ²⁷ çimkî min xwe neda paş, lê min hemû qirara Xwedê wer'a got. ²⁸ Niha miqatî xwe û t'emamîya wî kerî bin, ya ku Ruhê Pîroz hûn ser berpirsyar k'ifş kirine. Şivantîyê civîna Xwedê bikin, ya ku wî bi xûna xwe qazinc kir. ²⁹ Ez zanim ku pey çûyîna minr'a gurên devxûn wê bik'evine nava we û heyfa wanê kerî neyê. ³⁰ Ji nava we jî meriv wê derên û tiştên xêlif xeber din, ku şagirtan pey xwe bibin. ³¹ Bona vê yekê hişyar bimînin û bîr nekin, ku min hûn her kes, sê salan şev û roj bêy rihetî bi hêsiran şîret kirine.

³² Niha ez we dispêrime Xwedê û xebera jî k'erema wî, ku dikare we *bi ruhanî* şên ke û p'ara we t'evî t'emamîya cimeta xwe bike. ³³ Min havîjîya xwe zêr', zîv û k'incên t'u kesî neanîye. ³⁴ Hûn xwexa zanin, ku ez û yê t'evî min, em hewcê çî jî bûne, ev destên min xebitîne. ³⁵ Min bi hemû k'arên xwe nîşanî we daye, ku çawa gerekê bixebitin û k'omekê bidine k'etîyan. Xebera Xudan Îsa bîr bînin, ku digot: <Xwezî li dayîyan, ne ku standîyan>».

³⁶ Gava ev yek got, t'evî hemûyan çok veda dua kir. ³⁷ Hemû jî gelekî digirîyan, xwe davîtine p'êşîra Pawlos û diçûne rûyê wî. ³⁸ Dilên wan hê zêde bona wê xebera wî dişewitî, ku digot: «Hûn îdî rûyê min nabînin». Paşê ew heta gemîyê ver'êkirin.

PAWLOS DIÇE ORŞELÎMÊ

21 ¹ Gava em ji wan qetyan, bi gemîyê rêk'etin, rast çûn gihîştine Kosê, roja din Rodosê û ji wir jî Patarayê. ² Me gemîk dît ku diçû Fînîkyayê, em k'etinê rêk'etin. ³ Gava Qubris k'ifş bû, me ew alîyê ç'epêva hişt. Em berbi qeza Sûryayê çûn gihîştine bajarê Sûrê, çimkî barê gemîyê wir gerekê bihata valakirinê. ⁴ Me wir şagirt dîtin, em heft rojan cem wan man. Wana bi Ruhê Pîroz digote Pawlos, ku neçe Orşelîmê. ⁵ Lê çaxê me ew roj derbaz kirin, em rabûn çûn û hemû, jin û zar'anva t'evayî em heta ji bajêr der ver'êkirin û devê be'rê me çok veda dua kir. ⁶ Paşê me xatirê xwe ji hev xwast k'etine gemîyê, ewana jî vegeryane malên xwe.

⁷ Me ji Sûrê bi gemîyê rêwîti dîmayî kir gihîştine Pitolêmayê, me wir silav da biratîyê û em rojekê mane cem wan. ⁸ Rojtira din em ji wir rêk'etin çûne Qeyserîyê, mala Fîlîpoyê mizgîndar, ew yekî ji wan her heft k'omekdarên k'ifşkirî bû. Em li cem wî man. ⁹ Çar qîzên wîye bik'ir hebûn, ku p'êxembertî dikirin. ¹⁰ Gava em gelek rojan li wir man, p'êxemberekî navê wî Hagabo ji Cihûstanê dak'et. ¹¹ Gava hate cem me, qayîşa piştî Pawlos hilda, dest û p'iyên xwe girêda û got: «Ruhê Pîroz aha dibêje: <Ew merivê xweyê vê qayîşê cihû wê Orşelîmêda aha wî girêdin û bidine destê hêtanosan>». ¹² Gava me ev yek bihîst, t'evî yê wir me hîvî kir, ku ew ranebe Orşelîmê. ¹³ Lê Pawlos cab da û got: «Hûn çî dikin? çima digirîn û dilê min dişkênin? Orşelîmêda bona navê Xudan Îsa ez ne t'enê girêdanê'a, lê kuştinê'a jî hazir im». ¹⁴ Gava me nikaribû ew razî kira, me dengê xwe bir'î û got: «Bira daxaza Xudan be».

¹⁵ Çend rojan şûnda me k'arê xwe kir, em rabûne Orşelîmê. ¹⁶ Mer'a çend şagirtên ji Qeyserîyê jî hatin, em birine mala şagirtêkî zûva, ku navê wî Minaso bû, ji Qubrisê, ku em li wir bimînin.

PAWLOS DIÇE CEM AQÛB Ê BERPIRSYARAN

¹⁷ Gava em gihîştine Orşelîmê, bawermendan bi şabûnê em qebûl kirin. ¹⁸ Roja din Pawlos mer'a çû cem Aqûb, hemû berpirsyar jî hazir bûn. ¹⁹ Pawlos silav da wan û yek-kek, çî ku Xwedê bi xizmetîya wî nava hêtanosanda kiribû, wanr'a gilî kir. ²⁰ Wana ev yek ku bihîst, şikirî dane Xwedê û usa jî gotine wî: «Binihêre, çiqas hezaran cihûyên bawermend hene û hemû jî xîretk'êşên Qanûnê ne. ²¹ Awa wana derheqa teda bihîstye, ku tu hemû cihûyên nava hêtanosanda hîn dikî, ku dest ji Qanûna Mûsa bik'işînin û kur'ên xwe sinet nekin û pey rê-rizm jî neçin. ²² Niha em çî bikin? Wê e'se bibihên, ku tu hatî. ²³ De rabe çî em ter'a bêjin bike. Li vir, cem me çar merivên ad-qîrarkirî hene. ²⁴ Wan xwer'a hilde, t'evî wan li gora *rîzm* paqij be û xercê wan hilde ser xwe, ku p'or'ê serê xwe kur' kin. Hingê her kes wê zanibe ku ew tiştên derheqa teda bihîstine derew in û tu xwexa jî pey Qanûna Mûsa diçî. ²⁵ Lê bona wan hêtanosên ku ev bawerî hildane, me wanr'a qirara xwe bi nivîsar şandye, ku

ew h'evza xwe ji wan qurbanên p'ûtanr'a dayî, ji xûnê, goştê mirar û bênamûsîyê bikin». ²⁶ Hingê Pawlos roja din ew meriv hildan, t'evî wan paqij bû, k'ete p'aristxanê, ku xilazîya rojên paqijbûnê pê bihesîne, ku çiçax bona wan her kesî hedî wê bê dayîne.

PAWLOS P'ARISTXANÊDA TÊ BENDKIRINÊ

²⁷ Çaxê ew heft roj t'emam bûn, ji cihûyên qeza Asyayê Pawlos p'aristxanêda dîtîn, t'emamîya k'oma merivan t'evrakirin, dest avîtinê ²⁸ û kirine qîr'în gotin: «Hewar, îsraêlîno! Alîk'arîyê bidin! Eva ew meriv e, yê ku li her deran hemûyan miqabilî cimeta me, Qanûna Mûsa û vî cîyî hîn dike, hê serda jî yûnan kirine p'aristxanê, ev cîyê pîroz herimand». ²⁹ Ev yek gotin, çimkî pêşda bajêrda Trofimoyê ji Efesê t'evî wî dîtibûn û wan t'irê Pawlos ew kirye p'aristxanê.

³⁰ T'emamîya bajêr hejya, k'oma merivan bi lez k'om bû, Pawlos girtin ji p'aristxanê k'aşî derva kirin û derên wê pêr'a-pêr'a hatine girtinê. ³¹ Gava wan dikir ku wî bikujin, cab gihîşte serhezare refa eskeran, ku t'emamîya Orşelîmê t'evîhev bûye. ³² Ewî pêr'a-pêr'a esker û sersed hildan, bi lez çû ser wan. Gava wan serhezare eskeranva dîtîn, dest ji Pawlos k'işandin û îdî lînexistin. ³³ Hingê serhezare hate nêzîk, ew girt, ferman da, ku bi zincîran wî dutaq girêdîn. Hingê pirsî: «Ev k'î ye û çi kirye»? ³⁴ Nava k'oma merivanda bona wî her kesekî *bona* tiştêkî başçe dikire qar'eqar'. Ewî ku ji dest qalmeqalma cimete nikaribû rastîyê bizanibe, ferman da wî bibine eskerxanê. ³⁵ Gava Pawlos gihîşte p'êpelîngan, eskeran ew bilindkirî birin, çimkî k'oma merivan ew digvaşt, ³⁶ pey wî diçûn, dikirine qîr'în û digotin: «Wî bikujin»!

³⁷ Wê îdî Pawlos bibirana hindurê eskerxanê, ewî serhezarr'a got: «Îzina min heye ter'a xeber dim»? Ewî got: «Tu bi yûnanî jî zanî? ³⁸ Tu ne ewî misirî yî, yê ku çendek pêşda şer'-de'w çêkir, çar hezar t'alank'arên mêrkuj derxistine ber'îyê». ³⁹ Pawlos got: «Ez merivekî cihû me, ji Tarsûsa Kilîkyayê, ne bajarvanekî bêy nav-nîşan. Ez hîvî ji te dikim, destûrê bide ku ez vê cimete'r'a xeber dim». ⁴⁰ Gava ewî destûr da, Pawlos ser p'êpelîngan sekinî, destê xwe hejand, cimete dengê xwe bir'î, ewî bi zimanê îbranî xeber da got:

22 ¹ «Gelî bav-birano! Hela guh bidine min, ku ez niha caba xwe bidim». ² Gava bihîstin ew bi zimanê îbranî wanr'a xeber dide, dengê xwe lap bir'în. Wî got: ³ «Ez merivekî cihû me, ji dîya xwe bajarê Tarsûsa Kilîkyayêda bûme, lê *vir*, vî bajarîda çawa şagirt ber p'îyê Gamalyêl mezin bûme û hemû Qanûna kal-bavan jî rast hîn bûme, hindava Xwedêda jî xweyxîret bûme, çawa îro ji we her kes. ⁴ Min heta kuştinê jî peyçûyên vê Rê dizêrandin û k'ulfet *bûya*, *yan* mêr *bûya* girêdidan davîtine hebsê. ⁵ Serokk'ahîn û t'emamîya civîna rûspîyan jî şehdê min in. Û ser birayên cihûtîyêdaye li Şamê min name ji wan hildabûn diçûm, ku yên wir jî girêdayî bîname Orşelîmê, ku bidine cezê. ⁶ Û çaxê ez hê rêda diçûm û nêzîkî Şamê bûm, ro nava rojêda nişkêva dora min ji ezmên ronahîke qayîm şewq da. ⁷ Ez k'etîme erdê û min dengê bihîst, ku digote min: <Şawûl! Şawûl! Çima tu min dizêrinî? ⁸ Min lê vegeand: <Tu k'î yî, Xudan? Wî minr'a got: <Ez Îsayê Nisretê me, ewî ku tu dizêrinî>. ⁹ Ewên t'evî min jî ronahî dîtîn, lê dengê ku minr'a xeber dida nedibihîstin. ¹⁰ Hingê min got: <Ez çi bikim, Xudan? Xudan minr'a got: <Rabe her'e Şamê û li wir her tiştê ku bona te k'ifşkirî ye ku bikî, wê ter'a bê gotinê>. ¹¹ Min ku ji dest şewqa wê ronayê nedidît, hingê yên t'evî min destê min girtin, ez birime Şamê.

¹² Yekî navê wî Hananîya, anegorî Qanûnê xwedetirs, nav cihûyên Şamêda jî xweyhurmet, ¹³ eva hate cem min sekinî û got: <Şawûl bira, bibîne>! Min destxweda dît û li wî nihêrî. ¹⁴ Ewî got: <Xwedêyê kal-bavên me tu k'ifş kirî ku daxaza wî bizanibî û Yê Rast bibînî û xebera devê wî bibihêyî, ¹⁵ çimkî tuê ber hemû merivan bona wan tiştên te dîtîn û bihîstin bibî şehdeyê wî. ¹⁶ Îdî çima derengî dêxî? Rabe were nixamtinê, gazî navê wî ke ji gunehên xwe were şuştinê>.

¹⁷ Çaxê ez vegeryame Orşelîmê û p'aristxanêda dua dikir, fikira min hate hilbirinê, ¹⁸ min ew dît û wî minr'a got: <Bike bilezîne ji Orşelîmê derê, çimkî şehdetîya ku tuê bona min bidî ewê hilnedin>. ¹⁹ Min got: <Xudan, ew qenc zanin ku ez bûm, yê her k'inîştanda yên ku bawerîya xwe te danîn, davîtine hebsê û wan dixistin. ²⁰ Çaxê xûna Steyfanê şehdê te dir'ijya, ez xwexa wir hizûr û razî bûm, min nobedarî k'incên yên ew kuştin dikir>. ²¹ Hingê ewî minr'a got: <Her'e, ezê te bişîname dîr cem hêtanosan>».

²² Heta van xebere k'oma merivan guhdarîya wî kir, paşê bi dengê bilind gotin: «Wî li rûbarî dinyayê nehêle! Yên mîna wî gerekê nejin!» ²³ Gava wana dikirine qîr'în, k'incên xwe davîtine *gor* û t'oz radikirine hewê. ²⁴ Serhezare ferman da, ku wî bibine eskerxanê û got: «Bidin ber qamçîyan û jê bipirsin, bizanibin k'a sîcê wî çî ye, ku miqabilî wî usa dikine qar'eqar'». ²⁵ Gava ew bi benên ç'erm girêdan, Pawlos sersedê sekinîr'a got: «Gelo cayîz e, hûn bajarvanekî Romayê xin, yê ku hê dîwana wî nebûye»? ²⁶ Sersed hema ev yek bihîst, çû cem serhezare û got: «Tu çi dikî? Eva meriva bajarvanê Romayê ye». ²⁷ Serhezare nêzîkî Pawlos bû û gote wî: «Bêje min, tu bajarvanê Romayê yî? Ewî got: «Belê». ²⁸ Serhezare lê vegeand got: «Min bi gelek p'eran ew bajarvantî standye». Pawlos got: «Lê ez jidêbûyîna xweda bajarvanê wir im». ²⁹ Û destxweda ewên ku wê lîxistana û gilî jê derxistana ji wî dîr k'etin. Serhezare xwexa jî tirsya, gava bihîst ku bajarvanê Romayê ye, çimkî ewî ew dabû girêdanê.

PAWLOS LI BER CIVÎNA GIREGIRAN

³⁰ Sibetira din serhezare xwast rast bizanibe k'a cihû çima şikîyatê Pawlos dikin, qeydên wî vekirin û ferman da, ku serokên k'ahînan civîna giregirana t'evayî bîn. Hingê Pawlos anî li ber wan da sekinandinê.

23 ¹Pawlos li ser civîna giregiranda nihêrî got: «Gelî birano! Min bi îsafa rihet li ber hizûra Xwedê jîyîna xwe heta îro derbaz kirye». ²Hananîyayê serokk'ahîn ferman da berdestîyên nêzîkî Pawlos, ku dêvda bidinê. ³Hingê Pawlos gote wî: «Xwedê jî wê te xe, dîwarê sîwaxkirî! Tu rûniştî yî û anegorî Qanûnê dîwana min dikî, lê ji Qanûnê der ferman didî ku ew min xin?» ⁴Yên cem Pawlos sekinî gotin: «Tu serokk'ahînê Xwedê bêhurmet dikî?» ⁵Pawlos got: «Birano, min nizanibû ew serokk'ahîn e. Çawa nivîsar e: «Hindava mîrê miletê xweda xirab xeber nede»».*

⁶Hingê Pawlos pê hesya, ku alîkî sadûqî ne, alîkî jî fêrisî, civînêda kire gazî got: «Gelî birano! Ez fêrisî me, kur'ê fêrisîyan! Îro dîwana min dikin, çimkî ez bawerîya xwe zêndîbûna mirîyan tînim». ⁷Gava ev yek got, fêrisî û sadûqî hevr'a k'etine hucetê û dutîretî k'ete nava k'omê, ⁸çimkî sadûqîyan digot ne zêndîbûna mirîyan heye, ne milyak'et, ne jî ruh, lê fêrisîyan her sê jî qebûl dikirin. ⁹Hingê qalmeqalma mezin hê pêşda hat, hineke ji qanûnzananê aliyê fêrisîyan rabûne ser p'îyan, xebirdan û bêtîrs gotin: «Em vî merivîda t'u xirabîyê nabînin. Belkî ruhekî yan milyak'etekî vîr'a xeber daye?» ¹⁰Gava şer'-de'w zêde bû, serhezar tirsya ku ew Pawlos qet-qetî kin, ferman da eskeran ku dak'evin ewî ji nav wan bigirin bibine eskerxanê.

¹¹Şevtira dîn Xudan li ber wî sekinî û got: «Serxwe be, te çawa Orşelîmêda şehdetîya min da, usa jî gerekê şehdetîya min Romêda bidî».

CIHÛ DIXAZIN PAWLOS BIKUJIN

¹²Sibeh ku zelal bû, ji cihûyan hinek bûne yek û sond xwarin, ku heta Pawlos nekujin, ne bixwin, ne jî vexwin. ¹³Ewên ev sond xwarin ji çilî zêdetir bûn. ¹⁴Evana çûne cem serokên k'ahîn û rûspîyan gotin: «Me sond xwarye, heta em Pawlos nekujin, tiştekî nexwin. ¹⁵Awa hûn t'evî civîna giregiran serhezarr'a bêjin, ku sibê ewî bine cem we, yançîye hûn dixazin derheqa wîda her tiştî hê rast bizanibin, emê jî hê berî hatina wî hazir bin, ku wî bikujin». ¹⁶Lê xarziyê Pawlos gava bona vê xweyîntîyê bihîst, hat k'ete eskerxanê Pawlosr'a got. ¹⁷Pawlos jî gazî sersedekî kir got: «Vî xortî bibe cem serhezarr'a, tiştekî dixaze bêjê». ¹⁸Ewî jî xort bire cem serhezarr'a got: «Pawlosê bendkirî gazî min kir, hîvî kir ku vî xortî bînim cem te, tiştekî wîyî gotinê ter'a heye». ¹⁹Serhezarr'a destê wî girt, bire alîkî û pîrsî: «Tu çî dixazî min pê bihesînî?» ²⁰Wî got: «Cihûyan qirar kirye hîvî ji te bikin, ku sibê tu Pawlos bibî ber civîna giregiran, yançîye dixazin derheqa wîda her tiştî hê rast bizanibin. ²¹Lê bawerîya xwe li wan neyne, çimkî ji wan çil merivan zêdetir xwe veşartine, hîvîya wî ne. Wana sond xwarye, ku ne bixwin, ne jî vexwin, heta wî nekujin. Wana niha xwe hazir kirye, hîvîya qirara te ne». ²²Hingê serhezarr'a xort ver'êkir û t'emî dayê: «T'u kesîr'a nebêjî, ku te ev yek minr'a gotye».

PAWLOS DIŞÎNINE QEYSERÎYÊ CEM FELÎKSÊ WELÎ

²³Serhezarr'a gazî du sersedan kir û got: «Dusid eskerî hazir bikin, heftê sîyarî, dusid jî rimdar, ku şev siheta nehan heta Qeyserîyê her'in. ²⁴Usa jî çend hespan hazir kin, ku Pawlos lê sîyar kin, ku bêy qezî wî bibine cem Felîksê welî». ²⁵Namek jî bi vê fikirê nivîsî:

²⁶«Ji Klawdyo Lûsyoyê, Silav Felîksê welîyê xweyhurmetr'a!

²⁷Eva meriva ji cihûyan hatibû girtinê û wê ew bikuştana, ez pê hesyam, ku romayî ye, bi eskeranva gihîştîmê û min ew aza kir. ²⁸Min xwast bizanibim, k'a bona çî şikîyatê wî dikin, min ew bire ber civîna giregirên wan ²⁹û dît, ku şikîyatê wan li ser pîrsên qanûna wan e, lê bona kuştinê yan cezakirinê xirabîya wî t'uneye. ³⁰Çaxê cab gihîşte min, ku cihûyan bona wî merivî t'ele hazir kirye, min pêr'a-pêr'a ew şande cem te û ferman da ser şikîyatîkiran, ku çî wanî miqabilî wî hebe, bira li ber te bêjin».

³¹Eskeran jî anegorî fermana standinê Pawlos şev hildan birine Entîpetrîsê. ³²Roja din yê sîyarî Pawlosr'a danîn, ku wîr'a her'in, lê yê peya vegeryane eskerxanê. ³³Ewên sîyarî gihîştine Qeyserîyê, name dane welî, Pawlos jî dane destê wî. ³⁴Ewî ew name xand, pîrsî ji k'îjan qezayê ye, ku pê hesya ji Kîlîkyayê ye, ³⁵got: «Ezê hingê guhdarîya te bikim, çaxê şikîyatîkirên te bîn». Û ferman da, ku ew rewşxana Hêrodesda bê xweykirinê.

PAWLOS LI BER DÎWANA FELÎKS

24 ¹Pênc rojan şûnda Hananîyê serokk'ahîn t'evî hinek rûspîyan û Tertûloyê xeberebêj dak'et hate Qeyserîyê. Vana *gazinê* hindava Pawlosda gotine welî. ²Û çaxê gazî Pawlos kirin, Tertûlo dest bi şikyatan kir û got: «Bi saya serê te ev miletê me gelek haştî dîtye û nava k'arê xweda gelek pêşda çûye, ³Felîksê xweyhurmet, hert'im, her deran em wan kirinên te dişêkirînin. ⁴Lê ku gelekî serê te neêşînim, hîvî dikim ji k'erema xwe kin guhdarîya me bikî. ⁵Me ev meriv dît, ku mîna belakê k'etye nava hemû cihûyên ser dinyayê û t'evîhev dike, ew rêberê k'omela nisretîyan e. ⁶Evî xwast ku p'arîstxanê jî biherimîne, lê me ew girt. ⁷Heger tu jê bipîrsî, tuê xwexa bikaribî ji wî her tiştî bizanibî, k'a em bona çî şikîyatê wî dikin». ⁹Cihûyan jî gotina wî mak kirin, gotin: «Belê, ev yek usa ye».

* 23:5 Derk'etin 22:28.

† 24:6 Hinek destnivîsaranda ev jî heye: «Me xast dîwana wî gora qanûna xwe bikin, ⁷lê Lûsyoyê serhezarr'a ser meda girt, bi zorê ji destê me stand ⁸ û ferman da, ku şikîyatîkirên wî bêne cem te.»

¹⁰ Gava welî serê xwe hejand, ku ew xeber de, Pawlos lê vegerand got: «Ez zanim, ku gelek sal in tu hakimê vî miletî yî, lema ezê jî bi rezedilî bona xwe cabê bidim. ¹¹ Belê, tu dikarî bizanibî, ku eva donzdeh roj t' une, ez bona hebandinê rabûme Orşelîmê. ¹² Vana ne p'aristxanêda ez dîtîme, ku t'evî yekî bik'evime de'wê, ne jî k'iniştanda, ne jî cîkî din, ku bajêrda k'oma merivan dora xwe bicivînim. ¹³ Niha jî, çi pirsêda ku şikyatê min dikin, ew nikarin gotinên xwe îzbat kin. ¹⁴ Lê ezê aşkere bêjîme te, ku li gora wê Rîya ku ewana wêr'a k'omela şihîfî dibêjin, ez hema usa Xwedêyê kal-bavên xwer'a xizmetîyê dikim. Û çi jî Qanûn û nivîsarên p'êxemberanda nivîsar in, bawer dikim. ¹⁵ Ez Xwedêda jî guman im, çawa ewana jî wê gumanê ne, ku hemûyên heq û neheq wê jî mirinê zêndî bin. ¹⁶ Lema çiqas ji min tê, ez divedînim, ku hemû waxtî li ber Xwedê û merivan bi îsafa rihet bim.

¹⁷ Awa pey gelek salan'a ez vegeryame Orşelîmê, ku alîk'arîyê bidime miletê xwe û hedîya bidim. ¹⁸ Hingê wan li vî k'arîda ez p'aristxanêda paqijbûyî dîtîm. Ez ne t'evî k'oma merivan bûm, ne jî şer'ûdan. ¹⁹ Lê ji wan çend cihûyên qeza Asyayê li wir bûn. Heger hindava minda tiştêkî wanî gotinê hebûya, gerekê ew bihatana ber te bisekinyana û şikyatê min bikirana. ²⁰ Yan jî bira evana bêjin, çaxê ez ber civîna giregiran sekinî bûm, çi xirabî minda dîtîm, ²¹ pêştirî vê yekê, ku min bi dengê bilind nava wanda gotye: <Bona bawerîya zêndîbûna mirîyan hûn îro dîwana min dikin>>.

²² Felîks k'arê wan hişte ser rojêke din, çimkî wî hê qenc bona wê Rê zanibû, hingê ewî got: «Çaxê Lûsyoyê serhezdar dak' eve bê, ezê hingê bona pîrsa we qîrara xwe bidim». ²³ Ewî ferman da sersed, ku Pawlos hinekî aza xwey kin û îzina heval-hogirên wî jî bidin, yên ku wê k'omekdarîya wî bikin.

²⁴ Çend rojan şûnda Felîks t'evî Dirûsîla jina xweyê cihû hat, gazî Pawlos kir û bona wê bawerîya hindava Mesîh Îsada ji wî bihîst. ²⁵ Pawlos hela hê bona rastîyê, xwezefkirinê û dîwana Xwedêye ku wê bê xeber dida, Felîks saw k'îşand û got: «Tu niha her'e. Hema waxtê min hebe, ezê gazî te bikim». ²⁶ Usa jî ew wê gumanê bû, ku ji Pawlos p'ere bîstanda, lema jî gelek caran gazî wî dikir û wîr'a xeber dida.

²⁷ Çaxê du sal derbaz bûn, dewsa Felîks Porkîyo Fêsto bû welî. Felîks jî dixast cihûyan'a qencî bikira, Pawlos hebsêda hişt.

PAWLOS DE'WA DÎWANA QEYSER DIKE

25 ¹ Pey sê rojan'a, çaxê Fêsto hikumê xwe hilda destê xwe, ew jî Qeyserîyê rabû Orşelîmê. ² Serokên k'ahînan û giregirên cihûyan bona Pawlos şikyatê xwe li wî kirin ³ û hîvî kirin, ku qencîyê bike~ wî bîne Orşelîmê, çimkî wana t'ele çê kiribû, ku rêva wî bikujin. ⁴ Lê Fêsto li wan vegerand got: «Pawlosê Qeyserîyêda bendkirî bimîne û ezê xwexa jî zûtirê her'ime wir. ⁵ Belê, ji we jî k'î dikare bira min'a bê û heger neheqîke wî merivî hebe jî, bira wî gunehk'ar ke».

⁶ Li wir ew nehe-dehe rojan nava wanda ma, paşê dak'et çû Qeyserîyê, roja din li herema dîwanê rûnişt, ferman da, ku Pawlos bînin. ⁷ Gava Pawlos hat, cihûyên ku ji Orşelîmê dak'etibûn, dora wî girtin û gelek buxdanên giran li wî girêdan, lê nikaribûn îzbat bikirana. ⁸ Pawlos caba xwe dida û digot: «Min ne hindava Qanûna cihûyanda neheqî kirye, ne hindava p'aristxanêda, ne jî Qeyserda».

⁹ Fêsto jî xast cihûyan'a qencîyê bike, li Pawlos vegerand got: «Tu dixazî rabî Orşelîmê, ku bona van tiştan dîwana te ber min li wir bê kirinê»? ¹⁰ Pawlos got: «Ez li ber dîwana Qeyser sekinî me, li k'u jî dîwana min gerekê bibe. Min t'u xirabî li cihûyan nekiryê, çawa tu bi xwe jî qenc zanî. ¹¹ Awa heger ez neheq im û min tiştêkî usa kirye, ku bême kuştinê, ji mirinê venak'îşim, lê heger neheqîya min vê yekêda t' une, çawa ku ewana şer'an min gilî dikin, t'u kes nikare min bide destê wan. Ez de'wa dîwana Qeyser dikim». ¹² Hingê Fêsto şîretk'aran'a xeber da, paşê li wî vegerand got: «Tu de'wa dîwana Qeyser dikî, gerekê her'î cem Qeyser».

PAWLOS LI BER EGRÎPA P'ADŞA

¹³ Paşî çend rojan, Egrîpa p'adşa û *xûşka wî*~ Bernikê hatine Qeyserîyê, ku Fêsto bimbarek kin. ¹⁴ Çaxê gelek roj li wir derbaz kirin, Fêsto bona Pawlos p'adşê hesand û got: «Vir merivek heye, ku ji hêna Felîksda bendkirî maye. ¹⁵ Çaxê ez çûme Orşelîmê, serokên k'ahînan û rûspîyên cihûyan şikyatê wî li min kirin û hîvî kirin, ku ez dîwana wî bikim. ¹⁶ Min li wan vegerand got, ku ne xeysetê romîyan e, ku merivekî unda kin, heta mecalê nedine yê gunehk'ar, ku li ber şikyatkirên xwe bisekine û rû bi rû ber wan caba xwe bide. ¹⁷ Çaxê ewana hatine vir, min derengî neexist, roja din ez li herema dîwanê rûniştîm û min ferman da, ku wî merivî bînin. ¹⁸ Çaxê yên ew gunehk'ar dikirin rabûn xeber dan, min bona xirabîyên ku şik dibire wî, t'u kesî t'u tişt negot. ¹⁹ Lê li ser çend pîrsên hebandinê de'wa wan hebû û bona Îsakî mirî, ku Pawlos dibêje ew zêndî ye. ²⁰ Hingê min nizanibû çawa ev pîrs safî bikirana, min ji wî pîrsî: <Tu dixazî her'î Orşelîmê û bona van tiştan li wir ber dîwanê bisekinî>? ²¹ Lê gava Pawlos xast ku k'arê wî ber *dîwana* Qeyser bê lênihêrandinê, min ferman da, ku ew bendkirî bimîne, heta ez wî bişînim cem Qeyser». ²² Egrîpa gote Fêsto: «Min jî dixast xeberdana wî merivî bibihîsta». Ewî jî got: «Tuê sibê wî bibihêyî».

²³ Roja din Egrîpa û Bernikê bi rewşa mezin t'evî serhezdar û giregirên bajêr hatine dîwanxanê û Fêsto ferman da, Pawlos anîn. ²⁴ Fêsto got: «Egrîpa p'adşa û hemûyên hizûr! Hûn vî dibînin, t'emamîya cimeta cihûyan, him Orşelîmêda, him jî li vir şikyatê vî ber min dikirin û dikirine qîr'în digotin: <Ew gerekê zêndî nemîne>! ²⁵ Lê min safî kir dît ku evî tiştêkî usa nekiryê ku bê kuştinê û xwexa jî de'wa dîwana Qeyser dike, min qîrar kir ku bişînim.

²⁶ Lê tişteki eseyî bona vî t'une, ku xweyê xwer'a binivîsim, lema min ev anî ber we, hê zêde li ber te, Egrîpa p'adşa, ku ev yek dîsa bê lênihêrandinê û hingê tişteki minî nivîsarê wê hebe. ²⁷ Çimki ez dibînim, ku tişteki bêaqilî ye, ku ez girtîki bişînim û bona sûcê wî t'u tiştî nenivîsim».

CABDARÎYA PAWLOS

26 ¹ Û Egrîpa gote Pawlos: «Destûra te heye bona xwe xeber dî». Hingê Pawlos destê xwe bilind kir, caba xwe da. ² «Egrîpa p'adşa, ez îro xwe bextewar hesab dikim, ku ber te sekinî me û bona hemû şikyatên cihûyane hindava minda caba xwe didim, ³ ez hê *şa me*, ku tu haş ji hemû rê-rizm û pirsên cihûyan heyî. Bona vê yekê ez hîvî ji te dikim, ku bi sebir guh bidî gotinên min.

⁴ Hemû cihû zanin, ku min çawa jîyîna xwe, ji zar'otiyêda girtî, nava miletê xwe û li Orşelîmêda derbaz kirye. ⁵ Ew zûva min nas dikin û heger bixazin, dikarin şehdetiyê bidin, ku anegorî rizmê k'omela dîne meyî sert jî ez fêrisî bûme. ⁶ Û niha jî dîwana min bona gumana wî sozê ku Xwedê daye kal-bavên me tê kirinê, ⁷ hema bona wî sozê ku her donzdeh qebilên me bi hub û rez, şev û roj Xwedê hebandine, ku bigihîjine wê yekê. Hema bona vê gumanê ye, ku cihû şikyatê min dikin, p'adşayî xaş be. ⁸ Çima hûn nikarin bawer bikin, ku Xwedê wê mirîyan zêndî ke?

⁹ Min xwexa jî kiribû deynê *stûyê* xwe, ku gelek tişt miqabilî navê Îsayê Nisretêda bikira ¹⁰ û min Orşelîmêda kir jî. Min ji serokên k'ahînan hikum stand û gelekên ji pîrozên davîtine hebsê û gava dihatine kuştinê, ez jî wê yekê'a qayl bûm. ¹¹ Hemû k'inîştanda gelek caran min ew didane cezayê û zor li wan dikir, ku wê bawerîya xwe înk'ar kin. Min k'îna wan girtibû, heta bajarên xerîbda jî ew dizêrandin.

¹² Awa ez carekê bi hikum û fermana serokên k'ahînan diçûme Şamê. ¹³ Roj nîvro bû, p'adşayî xaş be, rêva min dît ji ezmên ronahîke ji ronaya te'vê zortir dora min û yên minr'a dihatin nedîr da. ¹⁴ Em hemû k'etine erdê, min dengê bihîst, ku bi zimanê îbranî minr'a digot: <Şawûl! Şawûl! Çima tu min dizêrinî? Tu nikarî k'ulman her'î dirêşê>.* ¹⁵ Min got: <Tu k'î yî, Xudan>? Xudan got: <Ez Îsa me, ewî ku tu dizêrinî. ¹⁶ Niha rabe ser p'îyan, ez bona wê yekê teva k'ifş bûm, ku te bikime berdestiyê xwe û şehdeyê wî tiştê ku te dît û wan tiştên ku ezê paşê ber te vekim. ¹⁷ Ezê te ji destê cimeta *cihû* û hêtanosan rizgar kim. Va ye ez te dişînime nava wan, ¹⁸ ku ç'evên wan vekî, ji tarîstanîyê berbi ronayê û ji hikumê Şeytan berbi Xwedê vegezinî, ku bi wê bawerîya ser min, gunehên wan bêne baxşandinê û t'evî cimeta min xweyp'ar bin».

¹⁹ Awa Egrîpa p'adşa, ez miqabilî wê dîtina li berç'evane ji ezmên nesekinîm. ²⁰ Lê min pêşiyê yên Şamê, Orşelîmê û t'emamiya *binelîyên erdê* Cihûstanê'a dannasîn kir, usa jî hêtanosanr'a, ku ji xirabiyê vegezinê berbi Xwedê û kirinên ku ji ye vegeryayî tê xastinê bikin. ²¹ Bona vê yekê cihûyan ez p'aristxanêda girtim, xastin min bikujin. ²² Lê min ji Xwedêda alîk'arî stand û heta îro mame, şehdetiyê didime biç'ûk û mezinan. Tişteki zêde jî min negotye, ji wan tiştên ku p'êxemberan û Mûsa gotibûn, ku wê bibin, ²³ ku gerekê Mesîh biçerçirya û bi zêndîbûna ji nava mirîyan bibûya yê pêşin û ronaya rizgarîyê miletê cihû û hêtanosanr'a dannasîn bikira».

²⁴ Gava Pawlos aha caba xwe da, Fêsto bi dengê bilind got: «Tu *hişê* xwe unda dikî, Pawlos! P'irxandina te, te unda dike». ²⁵ Pawlos got: «Ez xwe unda nakim Fêstoyê xweyhurmet, lê xeberên rast û çê dibêjim. ²⁶ P'adşa haş ji van tiştan heye, lema jî ez *aha* bêtirs xeber didim û bawer im, ku t'u tişt ji wî veşartî ne maye, çimki eva yeka qulçekîda nebûye. ²⁷ Egrîpa p'adşa, tu p'êxemberan bawer dikî? Zanim ku tu bawer dikî». ²⁸ Egrîpa gote Pawlos: «Hindik ma tu min qayl kî, ku bibime mesîhî» ²⁹ Pawlos got: «Ez hîvî ji Xwedê dikim, zû-dereng ne t'enê tu, lê hemûyên ku îro guhdarîya min dikin, usa bin çawa ez im, pêştîrî van qeydan».

³⁰ Hingê p'adşa rabû ser p'îyan, usa jî welî, Bernikê û hemûyên pê'r'a rûniştî. ³¹ Ew derk'etine derva, hevr'a xeber dan û gotin: «Ev meriv tişteki usa nake, ku bê kuştinê yan bendkirinê». ³² Lê Egrîpa Fêstor'a got: «Me dikaribû ev meriv berda, heger evî de'wa dîwana Qeyser nekiribûya».

PAWLOS BI GEMÎYÊ DIBINE BAJARÊ ROMÊ

27 ¹ Gava qîrar kirin ku bi gemîyê em her'ine Îtalyayê, Pawlos û çend girtiyên din dane destê sersedekî navê wî Yûlyo, ji refa eskerên Qeyser. ² Em k'etine gemîke ji Edremîtê, ku gemîwargehên qeza Asyayêva wê biçûya û rêk'etin. Ji Têsalonîkê Erîstarxoyê makedonî jî t'evî me bû. ³ Roja din em Saydayê peya bûn, Yûlyo Pawlosr'a qencî kir, destûr dayê ku her'e cem hevalên xwe, ku bona wî xem bikin. ⁴ Ji wir rêk'etin û ji dest bayê pêşîya me, em teldê Qubrisê'a derbaz bûn. ⁵ Gava em nava be'ra pêşberî Kîlîkyayê û Pamfilyayê'a derbaz bûn, gihîştine Lîkyayê, bajarê Mîrayê. ⁶ Wir sersed gemîke Skenderyayê dît ku diçû Îtalyayê, em kirine wê gemîyê. ⁷ Hêdî-hêdî gelek rojanda em bi zorekê nêzîkî Kinîdyayê bûn. Çimki ba rê nedida me û em binat'ara Kirêtayêva ber Salmonê'a derbaz bûn. ⁸ Em bi zorekê wirr'a çûn gihîştine cîkî, ku Gemîwargehên Bedew digotinê, ku nêzîkî bajarê Laseyayê bû.

⁹ Gelek waxt li wir derbaz bû, rêwîtiya gemîyê jî bi qezîyanva girêdayî bû, Rojên Rojîyê jî îdî derbaz bibû. Pawlos şîret da wan got: ¹⁰ «Ay merivno! Ez dibînim ev rêwîtiya bi gemîyê te'li-tengî û zîyana mezinva girêdayî ye, ne t'enê bona bar û gemîyê, lê bona jîyîna me jî». ¹¹ Lê sersed hê gur'a gemîvan û xweyê wê dikir, ne ku xeberên Pawlos. ¹² Ew gemîwargeh bona derbazkirina zivistanê ne qenc bû, lema jî gelekên ji wan qîrar kirin, ku

* 26:14 Bi yûnanî aha ye: «Tu bi çiftê nikarî bavêjî şîva sertûj.»

ji wir her'in, belkî bikaribin bigihîjine bajarê Fînîkyayê û zivistan li wir derbaz kin. Ev bajar gemîwargeheke girava Kirêtayê ye, ku li roavaya başûr û bakurê dinihêre.

¹³ Gava bayê başûrêyî nerm hat, ew fikirîn, ku îdî gihîştine oxira xwe, lengere k'îşandin rêk'etin û xwe li hêşîya Kirêtayêva girtin çûn. ¹⁴ Lê demekê şûnda firtoneke qayîm li me rabû, ku jêr'a digotin Êvrîkilon. ¹⁵ Firtonê li gemîyê xist û gemî nikaribû miqabilî wê biçûya, me dest jê berda û ba em dibirin. ¹⁶ Me xwe giraveke biç'ûk girt, navê wê Klawda, li wir bi zorekê me qeyik girt ¹⁷ k'îşande jor û bi werisan gemî binîva girêda. Ewana tirsyan, ku nebe gemî lîlêda rûnê, bap'êş daxistin û aha bayê em dibirin. ¹⁸ Ji dest qayîmya firtonê, roja din barê gemîyê rêtine be'rê. ¹⁹ Roja sisyan wana bi destê xwe hacetên gemîyê avîtine be'rê. ²⁰ Ew çend roj bûn te'v û steyrk nedihatine k'îfşê, firtonê jî nediseqirî. De îdî bona rizgarbûnê gumana me lap hate bir'inê.

²¹ Ew çend roj bûn jî em birçî mabûn, Pawlos nava sekinî û got: «Ay evdno, we gerekê gur'a min bikira û ji Kirêtayê dernek'etana, hingê weyê ev te'lî-tengî û zîyan nedîta. ²² Niha jî ez hîvî dikim, ku hûn bîna xwe fire kin, çimkî pêştirî gemîyê zîyanê li me t'u kesî nebe. ²³ Çimkî hema vê şeva derbazbûyî milyak'etekî wî Xwedêyê ku ez p'ara wî me û wîr'a xizmetiyê dikim, minva k'îfş bû ²⁴ û got: <Netirse, Pawlos! Gerekê tu li ber Qeyser bisekinî. Xwedê hemûyên ter'a, yên gemîyêda dane xatirê te>. ²⁵ Niha, evdno, bîna xwe fire kin, çimkî ez Xwedê bawer dikim, ku çawa minr'a hate gotinê, wê usa jî bibe. ²⁶ Lê belê, emê bik'evine beja giravekê».

²⁷ Şeva çardehan bû, ku em be'ra Adrîyatîkêda ji bayê dihatine ajotinê. Nîvê şevê gemîvanan tê derxist, ku digihîştine bejekê, ²⁸ k'ûrpîv avîtinê, dîtin ku weke çil mêtirî bû, hinekî jî pêşda çûn, dîsa avîtinê, dîtin weke sî mêtirî bû. ²⁹ Hingê em tirsyan, ku nebe cîkî kevirî xin, paşîya gemîyêva çar lengere avîtin û bi duakirinê ç'evnihêrya sibehê bûn. ³⁰ Lê gemîvanan xast ji gemîyê birevin, qeyik ji gemîyê daxistin, bi wê manîyê, yanê dixazin pêşîya gemîyêva jî lengeran bavêjin, ³¹ Pawlos gote sersed û eskeran: «Heger evana gemîyêda nemînin, hûn nikarin rizgar bin». ³² Hingê eskeran benên qeyikê qetandin, berdan ku wêda her'e.

³³ Qereberbanga sibehê Pawlos hîvî ji wan hemûyan kir, ku nan bixwin û got: «Eva çardeh roj e hûn ç'evnihêrya *azabûnê ne* û birçî mane, we t'u tişt nexwarye. ³⁴ Awa ez hîvî ji we dikim, nanê xwe bixwin, ku ev jî bona rizgarbûna we ye, t'êlekî p'or'ê serê weyê unda nebe». ³⁵ Û gava ev yek got, nan hilda li ber hemûyan şikirî da Xwedê, ker kir û destpê kir xwar. ³⁶ Hingê bîn hate ber hemûyan û wan nan xwar. ³⁷ Emên gemîyêda dusid heftê şeş meriv bûn. ³⁸ Gava nan t'êr xwarin, genim rêtine be'rê û gemî sivik kirin.

³⁹ Sibeh ku zelal bû, wan erd nas nedikir, lê p'êşeke be'rê raç'ev kirin, ku hêşîya wê hebû û dixastin belkî bikaribin binê gemîyê wir bidine erdê. ⁴⁰ Lengere ji binî qetandin, be'rêda hiştin, hingê werisên zivir'okê jî sist kirin û bap'êşa pêş dane bê, xwe li wê hêşîya be'rê girtin. ⁴¹ Lê li girekî binê avê xistin, *gemî* lîlêda rûnişt, pozê gemîyê têda ma û îdî nehejya, piştî wê jî ji dest qayîmya pêlan hûrdexaşî dibû. ⁴² Hingê eskeran qirar kir bendewaran bikujin, ku sobek'arîyê nedin nerevin. ⁴³ Lê sersed ku dixast Pawlos rizgar bikira, nehişt şêwra wan bê sêrî. Hingê ferman da, ku yên sobek'arîyê zanin, pêşîyê xwe bavêjine avê derêne bejê, ⁴⁴ lê yên mayîn, hinek li ser t'extan, hinek jî li ser p'arçên gemîyê derk'evin. Û aha her kes rizgar bû derk'ete bejê.

GIRAVA MALTAYÊDA

28 ¹ Gava em rizgar bûn, hingê em pê hesyan, ku navê wê giravê Malta ye. ² Bineliyên wir gelek hurmet bona me kirin, wan ji ber wê sermayê û barana ku destpê kir agir vêxistin em qebûl kirin. ³ Hingê Pawlos bermile qirş dane hev û danî ser êgir, me'rek ji dest germê derk'et, xwe avîte destê wî, pêva girt. ⁴ Bineliyan gava rewirê destê wîva dardabûyî dît, gotine hev: «Eva rastî merivkujek e, *hizkî* ji be'rê rizgar bû, lê Xudanê heqîyê nehişt ew bijî». ⁵ Pawlos jî rewirê destê xweva dawşande nava êgir û zîyan li wî nebû. ⁶ Lê ewana hîvîya wê yekê bûn, ku wê biwerime yan nişkêva bik'eve bimire, çaxê gelekî hîvîyê man û dîtin t'u tişt li wî nebû, fikira xwe guhastin û gotin: «Eva xwedêk e».

⁷ Li der-dorên wê derê bergên mîrê wê giravê hebûn, navê k'îjanî Poplîyo bû. Wî mer'a hurmet kir, sê rojan em cem xwe xwey kirin. ⁸ Bavê Poplîyo germêda bi zikêşê nexaş p'aldayî bû. Pawlos çû cem wî, dua kir, destên xwe danîne ser wî û ew qenc kir. ⁹ Gava eva yeka bû, nexaşên mayîne wê giravêda jî dihatin qenc dibûn. ¹⁰ Wana gelek hurmet bona me kirin û gava em rêk'etin, ew tiştên ku bona rê wê kêrî me bihatana mer'a danîn.

JI MALTAYÊ HETA ROMÊ

¹¹ Sê mehan şûnda em bi gemîke Skenderyayê rêk'etin, ku wê jî zivistan li wê giravêda derbaz kiribû, şikilê her du xudanên «Heval-cêwî» jî ser gemîyê bû. ¹² Em gihîştine Sîrekûsê, sê rojan wir man. ¹³ Ji wir jî em çûn gihîştine Rêgîyomê. Rojekê şûnda bayê başûrê hat, em du rojanda gihîştine Potîyolê. ¹⁴ Wir me bira dîtin û hîvî ji me kirin, ku em heftêkê wir bimînin. Û aha em gihîştine Romê. ¹⁵ Birayên wir jî bona me bihîstibûn, pêşîya meda heta Meydana Epîyû û Sê Mêvanxanan hatin. Pawlos ku ew dîtin, şikirî da Xwedê û dilê wî şidyê.

PAWLOS ROMÊDA MIZGÎNÎYÊ DIDE

¹⁶ Gava em gihîştine Romê, sersed yên bendkirî spartine serokesker û ferman dane Pawlos, ku t'enê t'evî wî eskerê ku nobedarîya wî dike bimîne. ¹⁷ Sê rojan şûnda Pawlos gazî giregirên cihûyan kir, gava ew hatin, gote wan: «Gelî birano! Min tişteki miqabilî cimête yan kal û bavan nekiryê, lê Orşelîmêda wana ez girtim dame destê

romîyan. ¹⁸ Gava ez anîme ber dîwanê, xastin min berdin, çimkî li ser min t'u xirabîke hêjayî kuştinê nedîtin. ¹⁹ Lê çaxê cihûyan miqabilî wê yekê xeber dan, min îdî ji bêç'arîya xwe de'wa dîwana Qeyser kir, lê ne bona wê yekê, ku şikyatê milletê xwe bikira, ²⁰ lê min hîvî kir, ku we bibînim û wer'a xeber dim. Belê, ez bona gumana Îsraêlê van qeyd-zincîranda me». ²¹ Wana jî gotine wî: «Me derheqa teda ji Cihûstanê ne name standye û t'u kes jî ji birayên me, ne hatye bona xirabîya te gilî nekiryê yan xeber nedaye. ²² Lê em dixazin ji te bibihên, k'a bîr û bawerîya te ser çî ye, çimkî bona wê k'omelê em îdî pê hesîyane, ku her deran miqabilî wê xeber didin».

²³ Awa rojek k'ifşkirin û wê rojêda gelek hatine wî cîyê ku Pawlos têda dima. Ewî ji sibehê heta êvarê wanr'a bona P'adşatîya Xwedê şirovekir û bi merîfetî dannasîn kir, derheqa Îsada jî bi Qanûna Mûsa û nivîsarên p'êxemberan ew didane bawerkirinê. ²⁴ Hinekan xwe li gotinên wî girtin, hinekan jî bawer nekir. ²⁵ Û dufîretî nava wanda ji wir çûn, gava Pawlos ev yek got: «Ruhê Pîroz bi Îşaya p'êxember t'evî kal-bavên me baş xeber da ²⁶ û got: <Her'e cem vê cimete û bêjê: Hûnê bi guhan bibihên, lê fem nekin, bi ç'evan binihêrin, lê nebînin. ²⁷ Çimkî eva cimeta serhişk e, bi guhan giran dibihên û ç'evên xwe girtine, ku bi ç'evan nebînin, bi guhan nebihên û bi hiş fem nekin, venegerin, ku ez wan qenc kim>.* ²⁸ Awa bira weva aşkere be, ku rizgarkirina Xwedê hêtanosanr'a hate şandinê û ewê guhdarîya wî bikin».†

³⁰ Pawlos t'am du salan mala xweye k'irêkirîda ma û k'î jî ku dihate cem wî, ewî hemû qebûl dikirin. ³¹ Ewî P'adşatîya Xwedê bêtirs û bê pêşgirtin dannasîn dikir û derheqa Xudan Îsa Mesîhda hîn dikir.

* 28:27 Îşaya 6:9,10.

† 28:28 Destnivîsarên hinekanda rêza 29-an jî heye: «Gava ev yek got, cihû derk'etine derva û hevr'a k'etine de'wê.»

NAMA PAWLOS ROMÎYANR'A

PÊŞGOTIN

Pey zêndîbûna Mesîhr'a, çend salan şûnda mesîhî gihîştine heta Romayê jî, awa gotî wî bajarê ku p'ayt'extê Îtalyayê bû, ya Împêratoriya Romayê.

Pawlos, ku ji Xwedêda xizmetîya şandîtiyê standibû, wî xast nava bawermendên Romayêda jî k'ar bike, lema wî ev nama nivîsî. Bi fikira zaneyan ewî ev nama salên 56-57-da nivîsiye. Namêda ew şirovedike, ku çawa bi bawerkirinê meriv k'erema Xwedê distîne û ku t'emamiya merivayê, heger cihû bin yan necihû bin, hewce ne, ku ew li ber Xwedê rast bêne hesabê û haştiya wan Xwedêr'a hebe, çimkî hemû jî bin hikumê gunehanda ne. Pawlos dide k'ifşê, ku li ber Xwedê yê rast ew e, k'i bawerîya xwe Îsa Mesîh tîne. Peyr'a Pawlos derheqa jîyîna nûda dinivîse, ya ku meriv yektîya Mesîhda dest tîne û dide k'ifşê, ku jîyîna bawermendan gerekê bi hizkirinê û rastîyê be. Usa jî Pawlos cîyê cihû û necihûyan li nava qirara Xwedêda tîne li ber ç'evan.

Pawlos pirsên başqe-başqe jî pêşda tîne, şirovedike û hîn dike, ku çawa Xwedê bihebînin, wîr'a xizmetîyê bikin û hindava hikumetêda û hevda çawa rabin-rûnên.

Vê namêda usa jî ew gelekî li ser dîwan û tîrsa Xwedê dinivîse.

SERECEMA NAMÊ

Pêşgotin û meremê Mizgîniyê (1:1-17)

Her meriv gunehk'ar e û hewcê rizgarbûnê ye (1:18-3:20)

Soz-qirarên bona rizgarbûnê (3:21-4:25)

Bi Mesîh jîyîna nû (5:1-8:39)

Qirara Xwedê bona cimeta Îsraêlê (9:1-11:36)

Rabûn-rûniştina bawermendan (12:1-15:13)

Silavên axirîyê, dua-dirozge û şikirdarî (15:14-16:27)

PÊŞGOTIN

1 ¹ Ji Pawlos, xulamê Mesîh Îsa, şandîtiyêr'a gazîkirî û k'ifşkirî, ku wê Mizgîniya Xwedê bela kim, ² ya ku wî hê pêşda nivîsarên pîrozda bi zarên p'êxemberên xwe soz dabû. ³ Eva Mizgîniya li ser Kur'ê Xwedê, Xudanê me Îsa Mesîh e, yê ku bi bedenî ji malbeta Dawid bû, ku ⁴ bi Ruhê pîrozîyê, bi zêndîbûna xweye ji nav mirîyan, zorayêda çawa Kur'ê Xwedê k'ifş bû. ⁵ Bi k'îjanî me k'erema şandîtiyê stand, ku navê wî her miletan bidine naskirinê, ku ew bawer bikin û gur'a Xwedêda bin. ⁶ Nava wanda hûn jî gazîkirîyê Îsa Mesîh in. ⁷ We hemûyanr'a, ku Romayêda dimînin~ hizkirîyên Xwedêr'a, ku pîrozbûnêr'a gazî we kirye, k'erem û haştî, ji Xwedêyê Bavê me û Xudan Îsa Mesîh.

NÊTA PAWLOS Û MIZGÎNÎ

⁸ Berê pêşda ez bi destê Îsa Mesîh bona we hemûyan razîbûnê didime Xwedêyê xwe, çimkî bawerîya we t'emamiya dinyayêda tê gotinê. ⁹ Û ew Xwedêyê ku ez Mizgîniya Kur'ê wîda bi ruh û can wîr'a xizmetîyê dikim, şehdê min e, ku ez her t'im we bîr tînim ¹⁰ û t'imê nava duayên xweda hîvî dikim, ku bi daxaza Xwedê carekê rê bik'eve min ser weda bême. ¹¹ Çimkî ez gelekî heyra dîtina weda me, ku p'êşkêşeke ruhanî bigihînim we, ku hûn bawerîyêda bişidin. ¹² Awa gotî, ez jî wer'a t'evayî, em bêne berdilîkirinê, bi wê bawerîya min û weye her du alîyanva.

¹³ Ez dixazim hûn zanibin, birano, ku gelek caran min xastye bême cem we, ku qazınca min nava weda jî hebe, çawa nava miletên mayînda, lê heta niha rê ber min girtî ye. ¹⁴ Ez borcedarê *her kesî* me~ yûnanên pêşdaçûyî jî, miletên paşdamayî jî, serwaxtan jî û bêfeman jî. ¹⁵ Belê, ez bi hub û rez dixazim Mizgîniyê bidime we jî, yên ku Romayêda dimînin.

¹⁶ Awa ez Mizgîniya Mesîh şerm hesab nakim, çimkî ew qewata Xwedê ye, bona rizgarbûna her bawermendî, pêşda cihûyan, paşê necihûyan. ¹⁷ Çimkî bi Mizgîniyê k'ifş dibe, ku *meriv* rastîya Xwedê bi bawerîyê distîne û bi bawerîyê xweye dike, çawa nivîsar e: «Yê rast bi bawerîyê wê bijî».*

GUNEHK'ARÎYA MERIVAN

¹⁸ *Xezeba* hêrsa Xwedê ji ezmên ser hemû bêxwedêti û neheqîya merivan k'ifş dibe, ku bi neheqîyên xwe nahêlin rastî bê k'ifşê. ¹⁹ Çimkî çî ku lazim e bona Xwedê bizanibin ew pê hesîyane, çimkî Xwedê ew pê hesandin. ²⁰ Ji *dema* efirandîna dinyayêda hunurên wîye nek'ifş, awa gotî, zoraya wîye heta-ha-tê û xwedêtiya wî bi efirînan k'ifş dibin, zelal tîne ber ç'evan. Lema t'u kes nikare xwe rûspî ke. ²¹ Wana Xwedê nas dikir, lê çawa Xwedê pesin nedanê, ne jî jê razî bûn, lê ew fikirên xweda p'ûç bûn û ji dest bêfemîyê k'etine şereşîyê. ²² Wan got: «Eme serwaxt in», lê bêfem derk'etin ²³ û rûmeta Xwedêyê bêlek'e guhêr'în, ew mîna nîgara merivan, teyredan, çarp'ê û şûlikîyên ku p'ûç dibin kirin.

²⁴ Lema Xwedê jî ew dane heramiyê, bi xastina dilê wan, ku bedena xwe nava hevda biherimînin. ²⁵ Wan rastîya Xwedê derewêr'a guhêr'în, *tîştên* efirî hebandin û wanr'a xizmetî kirin, ne ku Efirandarê heta-ha-têr'a, ku hêjayî şikirîyê ye. Amîn.

²⁶ Lema Xwedê ew dane bênamûsiyê, heta jinên wan jî hewcetîya xweye t'ebîyetî ya net'ebîyetîr'a guhêr'în. ²⁷ Usa jî mêran hewcetîya t'ebîyetîye hindava jinêda hiştin, bi temên xweye xirab hindava hevda şewitîn~ mêr

* 1:17 Hebaqûq 2:4.

mêranr'a robotî dikirin û maşê jirêk'etina xweye qazincîkirî standin. ²⁸ Û çawa wan nexast Xwedê zanebûna xweda xwey bikirana, Xwedê jî ew dane fikirên bêhurmet, ku tiştên necayîz bikin. ²⁹ Evana bi her neheqîyê, qavîyê, bêfemîyê, timayîyê û xirabîyanva t'ijî ne, bi hevsûdîyê, merivkujîyê, miqabilîyê, mixenetîyê û xêrnexazîyêva dagirtî ne, gilîgero, ³⁰ xeybkir, ji Xwedê aciz, bêhurmetkir, k'ubar, babax, buxdanbêj, ne gur'a dê-bavanda, ³¹ bêfem, bêamin, bêsaf, nerazî, bêrehm. ³² Belê, evana haş ji rastîya qanûna Xwedê hene, ku yên van tiştan dikin hêjayî mirinê ne, lê ne ku t'enê van tiştan dikin, lê xweyên van kiran jî begem dikin.

DÎWANA XWEDÊYE RAST

2 ¹ Awa, lo merivo, hizkî tu k'î hebî, çaxê lome dikî, tu nikarî xwe bêsûc kî. Çi lome xelqê dikî, wî lomeyî li xwe dikî, çimkî tu bona çî lomek'ar î, hema wan tiştan dikî. ² Lê em zanin, ku dîwana Xwedê wê bi rastîyê ser wanda bê, yên ku tiştên usa dikin. ³ Awa, lo merivo, tu ku lome xweyê van kiran dikî û tu xwexa jî xweyê wan kiran î, te t'irê tuê ji dîwana Xwedê birevî? ⁴ Yan jî tu ku dewlemendîya şîrinayîya Xwedê, berbihêrî û sebira wî bêhurmet dikî, gelo nizanî ku şîrinayîya Xwedê te berbi t'obekirinê dibe? ⁵ Lê tu bi serhişkî û dilkevirîya xwe *xezeba* hêrsa *Xwedê* ser xweda dicivîni, li wê Roja *xezeba* hêrsêda, çaxê dîwana Xwedêye rast bê k'ifşê. ⁶ Ewê weke kirê her kesî bine pêşîya wî. ⁷ Jîyîna heta-ha-tê wê bide wan, yên ku t'imê bi dûmka dirêj nava kirinên qencda ne, ku hurmetê, rûmetê û nemirîyê dixazin. ⁸ Lê hêrs û xezebê ser wanda be, yên ku qazınca xwe diger'in, dest ji rastîyê kirine û xwe dane xirabîyê. ⁹ Tengasî û zulmê ser wan hemûyanda bê, yên xirabîyê dikin, pêşîyê cihûr'a, paşê necihûr'a. ¹⁰ Lê hurmet, rûmet û haştî wê li wan hemûyan be, yên ku qencîyê dikin, pêşîyê cihûr'a û paşê necihûr'a. ¹¹ Çimkî li cem Xwedê firqî t'une.

¹² Ewên ku bêy Qanûna *Xwedê* ne û guneh dikin, bêy Qanûn jî wê unda bin, lê yên xweyqanûn, ku guneh dikin, wê bi Qanûnê jî dîwana wan bibe. ¹³ Çimkî li ber hizûra Xwedê ne ku ewên Qanûnê dibihên rast in, lê ewên ku Qanûnê diqedînin wê rast bêne hesabê. ¹⁴ Hêtanosên ku Qanûna wan t'une, çaxê bêy hemdê xwe xastinên Qanûnê diqedînin, hizkî ew bêy Qanûn in, hema xwexa bona xwe dibine qanûn. ¹⁵ Çimkî evana didine k'ifşê, ku xastina Qanûnê dilê wanda nivîsar e. Îsafa wan jî şehdetîya vê yekê dide, çaxê ku ewana fikirên xweda xwe neheq dikin yan *jî* bêsûc dikin. ¹⁶ Û aha wê Roja *dîwanê*, çaxê Xwedê bi destê Mesîh Îsa dîwana tiştên merivane dizîva bike, wê anegorî vê Mizgînîyê bike, ya ku ez dannasîn dikim.

CIHÛ Û QANÛN

¹⁷ Awa tu cihû têtî hesabê û te xwe spartye Qanûnê, bi Xwedêyê xwe jî difir'î. ¹⁸ Xastina wî zanî û ji Qanûnê hîn bûyî, qencîyê-xirabîyê ji hev derdixî, ¹⁹ xweda jî bawer î, ku rêberê koran î, ronaya ber yên tarîyêda yî, ²⁰ şîretk'arê bêfeman û dersdarê xortan î. Gumana te jî heye, ku bi Qanûnê hema xwey'arzê zanebûnê û rastîyê yî. ²¹ Lê awa, tu ku hevalê xwe hîn dikî, xwexa xwe hîn nakî? Dannasîn dikî nedize, lê tu didizî? ²² Dibêjî: «Zinêk'arîyê neke», lê zinêk'arîyê dikî? Ji p'ûtan zivêr î, lê qîrarên pîroz diherimîni? ²³ Bi Qanûnê difir'î, lê Qanûnê dit'eribîni, Xwedê bêhurmet dikî? ²⁴ Çawa nivîsar e: «Rûyê we *cihûyanda* nava hêtanosanda navê Xwedê tê bêhurmetkirinê».*

²⁵ Belê, qazınca sinetîyê wê hebe, heger Qanûnê biqedîni. Lê heger tu Qanûnê dit'eribîni, sinetîya te dibe bêsinetî. ²⁶ Usa jî, heger yê nesinetkirî rastîya t'emîyên Qanûnê biqedîne, nesinetîya wî gelo wê sinetî neyê hesabê? ²⁷ Û yê bi qîrarê nehatye sinetkirinê, ku Qanûnê diqedîne, wê dîwana te bike, ku xweyê nivîsar û sinetîyê yî, lê Qanûnê dit'eribîni. ²⁸ Çimkî cihû ne ew e, ku dervava ye û sinetî ne ew e, ku dervava ser qalib e. ²⁹ Lê ew e cihû, yê dilê xweda cihû ye û sinetîya rast dilê sinetbûyî ye, ku bi Ruh e, ne bi Qanûna nivîsar. Pesinê yê aha, ne ku ji merivan e, lê ji Xwedê.

3 ¹ Îdî cihû bi çî zêde ye? yan çî qazınca sinetîyê heye? ² Gelek, bi her alîyanva. Berê pêşda bi wê yekê, ku gotinên Xwedê li wan hatine spartinê. ³ Awa heger ji wan hinek amin neman, xa ji dest bêaminîya wan Xwedê wê bêamin dernayê? ⁴ T'u car! Bira Xwedê rast derê, lê hemû meriv derew, çawa nivîsar e: «ku tu gotinên xweda rast derêyî û dîwana xweda serdest bî».[†]

⁵ Lê heger neheqîya me rastîya Xwedê dide k'ifşê, em çî bêjin? Ku usa ye Xwedê neheq e? Ku *xezeba* hêrsa xwe ser meda dirêje. (Bi *cûr'ê* merivayî dibêjim). ⁶ T'u car! Heger ne usa be, Xwedê wê çawa dîwana dinyayê bike?

⁷ Lê heger bi derewîya min rastîya Xwedê, bona rûmeta wî, hê tê ber ç'evan, îdî çima dîwana min mîna gunehk'arekî bê kirinê? ⁸ Û gelo heq e, ku em aha bêjin: «Xirabîyê bikin, ku bibe qencî», çawa hinek buxdanan li me gilî dikin, yanê em usa dibêjin? Merivên aha rast wê ser bela xwe vebî.

MERIVÊ RAST T'UNE

⁹ Awa îdî em çî bêjin? Em cihû ser *necihûyanr'a* ne? T'u car! Çimkî me li jor îdî da k'ifşê, çawa cihû, usa jî necihû, hemû jî bin hikumê gunehda ne. ¹⁰ Çawa nivîsar e: «Yekî rast t'une, t'u kes t'une, ¹¹ t'une t'u kes, ku fem

* 2:24 Îşaya 52:5.

† 3:4 Zebûr 51:4.

bike, t'u kes t'une Xwedê biger'e. ¹² Hemû meriv xalifî ne, hevr'a t'evayî bêkêr bûne, yekî qencîyê bike t'une, t'u kes t'une. ¹³ Gora vekirî ye gewrîya wan, mixenet e zimanê wan, je'ra me'ran bin zarên wan. ¹⁴ t'ijî nifir û te'layî li devê wan, ¹⁵ xûnrêtinêr'a dilezîne nigên wan. ¹⁶ Qeda-bela nava rîya wan. ¹⁷ Rîya haştîyê nas nekirin e, ¹⁸ tîrsa Xwedê ber ç'evên wan qet ne maye».[‡]

¹⁹ Belê, em zanin ku Qanûn çi dibêje, wanr'a dibêje, yên ku bin hikumê Qanûnêda ne, ku her dev bêne girêdanê û li ber *dîwana* Xwedê t'emamîya dinyayê cabdar be. ²⁰ Belê, bi kirên Qanûnê t'u beden wê li ber hizûra Xwedê rast neyê hesabê, çimkî bi Qanûnê guneh tê naskirinê.

MERIV LI BER XWEDÊ ÇAWA RAST TÊ HESABÊ

²¹ Niha rastîya Xwedê bêy Qanûn k'ifş bûye, ku bona wê *rastîyê* Qanûn û p'êxember jî şehdetîyê didin. ²² Rastîya Xwedê bi bawerîya ser Îsa Mesîh tê standinê û Xwedê yên *bawer dikin* li ber xwe rast hesab dike. Firqî t'une, ²³ çimkî hemûyan guneh kir û rûmeta Xwedêda neman. ²⁴ Lê *meriv* bi k'erema wî, bi rizgarkirina Mesîh Îsa rasthesabbûnê p'êşkêş distînin. ²⁵ Xwedê Mesîh hê pêşda k'ifş kiribû, ku ew bi xûna xwe li ber gunehên wan k'êve, yên ku wê wî bawer bikin. Xwedê eva yeka kir, ku rastîya xwe bide k'ifşê, çimkî wî bi sebira xwe ew gunehên ku pêşda hatibûne kirinê ne da ber hesaban, ²⁶ awa gotî, Xwedê bi Îsa eva yeka kir, ku rastîya xwe vî zemanîda bide k'ifşê, ku xwexa rast e û wî rast hesab dike, k'ê ku bawerîya xwe Îsa tîne.

²⁷ Awa îdî çi ma, ku em pê bifir'in? Hemû p'ûç bû çû. Çima p'ûç bû? çimkî em Qanûnê diqedînin? Na! Lê çimkî em bawer dikin. ²⁸ Çimkî meva femdarî ye, ku meriv bi bawerîyê rast tê hesabê, bêy kirên Qanûnê.

²⁹ Yan, Xwedê t'enê Xwedêyê cihûyan e? Ew ne yê hêtanosan e? Belê, ew Xwedêyê hêtanosan e jî, ³⁰ çimkî Xwedê yek e û yên sinetbûyî bi bawerîyê rast hesab dike û *usa jî* yên nesinetbûyî hema bi wê bawerîyê *rast hesab dike*. ³¹ Ku usa ye em bi bawerîyê Qanûnê hêç dikin? T'u car, lê em Qanûnê qedîm dikin.

ÎBRAHÎM BI BAWERÎYÊ RAST HATE HESABÊ

4 ¹ Îdî em çi bêjin bona Îbrahîmê bavpêşê me, alîyê bedenêda? Wî çi dît? ² Heger Îbrahîm bi kirinên xwe rast hesab bibûya, hingê dikaribû bi kirinên xwe bifir'îya, lê ne ku ber hizûra Xwedê. ³ Lê k'a nivîsar çi dibêje? «Îbrahîm bawerîya xwe Xwedê anî û ew yek wîr'a rastî hate hesabê».[§] ⁴ Awa heger yek k'arekî dike, maşê wî jêr'a çawa p'êşkêş nayê dayînê, lê çawa deyn. ⁵ Lê heger yek k'ar nake, lê bawerîya xwe wî tîne, k'ê nep'akan bêsûc dike, bi vê bawerîyê ew rast hesab dibe. ⁶ Dawid jî aha xwezîya xwe li wî merivî tîne, yê ku bêy kirinan Xwedê wî rast hesab dike. ⁷ *Ew dibêje*: «Xwezî li wan, neheqîyên k'ê hatine baxşandinê û gunehên wan hatine nixamtinê. ⁸ Xwezî li wî merivî, ku Xudan wîr'a guneh hesab nake».^{**}

⁹ Gelo eva xwezîya li sinetbûyîyan tê dayînê yan nesinetbûyîyan? Me pêşda got, ku bawerîya Îbrahîm jêr'a rastî hate hesabê. ¹⁰ Gelo çiçax hate hesabê? Pey sinetbûnêr'a yan berî sinetbûnê? Ne ku pey sinetbûnêr'a, lê berî sinetbûnê. ¹¹ Û paşê ewî sinetî çawa nîşana rasthesabbûnê stand, bi wê bawerîya xweye berî sinetîyê. Û aha Îbrahîm bû bavê hemû bawermendên nesinetbûyî, ku ew jî rast bêne hesabê ¹² û usa jî bû bavê sinetbûyîyan. Ne t'enê sinetbûyîyan, lê bavê wan jî, yên ku p'êga wê bawerîyêda diçin, ya ku dilê Îbrahîmê bavê meda hê berî sinetîyê hebû.

SOZÊ XWEDÊ BI BAWERÎYÊ HATE DAYÎNÊ

¹³ Ew sozê ku dinyayê war bin, Îbrahîm û zuretê wîr'a ne ku bi *kirinên* Qanûnê hate dayînê, lê bi bawerkirinê, bi çi ew rast hate hesabê. ¹⁴ Heger t'enê ewên ji kirên Qanûnê bibûna warxur, hingê bawerî wê p'ûç bûya û soz jî wê hêç derk'eta. ¹⁵ Çimkî Qanûn hêrsê radike. Wê dera ku qanûn t'une, qanûnt'eribandin jî t'une.

¹⁶ Û aha soz bi bawerîyê tê standinê, ku soz bona hemû zuretên Îbrahîm p'êşkêşeke erêkirî be, ne t'enê bona ewên xweyan, lê bona wan jî, yên ku mîna Îbrahîm bawer dikin. Çimkî Îbrahîm bavê me hemûyan e, ¹⁷ çawa ku nivîsar e: «Min tu kirî bavê gelek miletan».^{††} *Belê*, ew bavê me ye, li ber hizûra wî Xwedêyê ku ewî bawerîya xwe lê anî, ku ew mirîyan zêndî dike û gazî tiştên ku t'unene dike, çawa ku hene. ¹⁸ Wê dera ku guman lê t'unebû, Îbrahîm bi guman bawer kir, ku xwexa wê bibe bavê gelek miletan, çawa hatibû gotinê: «Zuretê te wê aha zêde be».^{‡‡} ¹⁹ Ew bawerîyêda sist nebû, wî li ser halê qalibê xwe ne nihêrî, ku îdî mîna yekî mirî bû, (çimkî ew weke sed salî bû) û ne jî li ser malzar'a Seraha mirî nihêrî. ²⁰ Lê bawerîya xwe sozê Xwedê anî, dudilî nebû, bi bawerîyê qewat stand, şikirîya xwe Xwedê anî ²¹ û wê yekêda bawer bû, ku yê soz daye wê bine sêrî jî. ²² Lema wîr'a rastî hate hesabê. ²³ Lê eva gotina ne t'enê bona Îbrahîm hate nivîsarê, ku Xwedê ew rast hesab kir, ²⁴ lê bona me jî rastî wê bê hesabê, ku em wî bawer dikin, k'ê Xudanê me Îsa ji mirinê zêndî kir. ²⁵ Îsa bona neheqîyên me hate kuştinê û ji mirinê zêndî bû, ku em rast bêne hesabê.

* 3:10-14 Zebûr 5:9; 10:7; 14:1-3; 53:1-3; 140:3;

† 3:15-17 Îşaya 59:7,8.

‡ 3:18 Zebûr 36:1.

§ 4:3 Destpêbûn 15:6.

** 4:7-8 Zebûr 32:1,2.

†† 4:17 Destpêbûn 17:5.

‡‡ 4:18 Destpêbûn 15:5.

5¹ Awa em bi bawerîyê rast hatine hesabê, lema haştîya me li Xwedêr'a heye, bi saya Xudanê me Îsa Mesîh. ² Bi wî me mecal dît bi bawerîyê t'evî wê k'eremê bin, k'îjanêda em sekinî ne. Û bi wê gumanê difir'in, ku emê t'evî rûmeta Xwedê bin. ³ Û ne t'enê haqas, lê em tengasiyên xweda jî difir'in, çimkî em zanin ku tengasî sebirê *pêşda* tîne, ⁴ sebir jî cêribandinê, cêribandin jî gumanê. ⁵ Û guman jî me şermî nahêle, çimkî hizkirina Xwedê ser meda bi wî Ruhê Pîroz barî ye, yê ku mer'a hatye dayîne. ⁶ Çimkî çaxê eme hê bêç'are bûn, Mesîh bona me nep'akan waxtda mir. ⁷ Degme bona merivekî rast yek bimire, lê bona merivekî qenc belkî yek biwêre bimire, ⁸ lê Xwedê hizkirina xwe hindava meda hingê da k'îfşê, çaxê eme hê gunehk'ar bûn, Mesîh bona me mir. ⁹ Niha em ku bi xûna wî li ber Xwedê rast hesab bûne, hê çiqas zêde emê bi wî ji *xezeba* hêrsa *Xwedê* rizgar bin. ¹⁰ Heger em t'evî Xwedê bi mirina Kur'ê wî li hev hatin, çaxê eme hê dijmin bûn, lê hê çiqas zêde bi wê li hevhatinê emê bi jîyîna wî rizgar bin. ¹¹ Û ne t'enê haqas, lê bi Xwedê jî em difir'in, saya Xudanê xwe Îsa Mesîh, bi k'îjanê em Xwedêr'a li hev hatine.

ADEM Û MESÎH

¹² Awa çawa bi merivekî guneh k'ete dinyayê û jî guneh jî mirin hat, usa jî mirin belayî ser hemû merivan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir. ¹³ Berî Qanûnê dinyayêda guneh hebû, lê wê dera ku Qanûn t'une, li wir guneh nayê hesabê. ¹⁴ Lê mirinê jî Adem girtî heta Mûsa hikum kir, heta ser wan jî, yên ku mîna Adem guneh nekiribû.

Adem t'erzekî wî bû, yê ku peyr'a wê bihata. ¹⁵ Lê p'êşkêşa Xwedê ne mîna neheqîya Adem e. Çimkî heger bi neheqîya merivekî gelek mirin, hê çiqas zêde bi k'erema merivekî~ ya Îsa Mesîh, k'erem û dayîna Xwedê ser gelekanda zêde bû. ¹⁶ P'êşkêş ne mîna maşê gunehê yekî ye, çimkî dîwanê *bi neheqîkê* ceza anî *ser merivan*, lê p'êşkêşê jî gelek neheqîyan *meriv gîhandine* rasthesabbûnê. ¹⁷ Çimkî heger bi neheqîya merivekî û rûyê wîda mirinê hikum kir, çiqas zêde ewên ku k'erema Xwedêye mezin û rasthesabbûnê p'êşkêş distînin wê jîyîna bi saya yekî~ bi Îsa Mesîh p'adşatîyê bikin.

¹⁸ Awa bi vî cûreyî~ bi neheqîkê dîwana t'emamîya merivayê bû, usa jî bi kirineke rast hemû meriv wê rast bêne hesabê û jîyîne bistînin. ¹⁹ Çawa bi neguhdarîya yekî gelek bûne gunehk'ar, usa jî bi guhdarîya yekî gelek wê rast bêne hesabê. ²⁰ Lê Qanûn k'ete nav, ku neheqî zêde be, lê li k'u guneh zêde bû, li wir k'erem jî hê zêde bû, ²¹ ku çawa guneh bi mirinê hikum kir, usa jî bi rasthesabkirinê k'erema Xwedê hikum bike~ me bibe berbi jîyîna heta-ha-tê, bi saya Xudanê me Îsa Mesîh.

MIRINA BI MESÎH, ZÊNDÎBÛNA BI MESÎH

6¹ Lê em niha çi bêjin? Nava gunehanda bimînin, ku k'erema Xwedê ser meda zêde be? ² T'u car! Em ku hindava gunehanda mirin, çawa dikarin hê nava wanda bijîn? ³ Hûn nizanin, em ku bi *navê* Mesîh Îsa hatine nixamtinê, mirina wîda hatine nixamtinê? ⁴ Bi nixamtinê em îdî t'evî mirina wî bûne û wir'a t'evayî *gor'êda* hatine nixamtinê, ku çawa Mesîh bi rûmeta Bavê jî mirinê zêndî bû, usa jî emê bikaribin jîyîna nûda bijîn.

⁵ Çimkî heger em mirina wîva hatine girêdanê û bûne mîna wî, usa jî emê mîna zêndîbûna wî zêndî bin. ⁶ Em evê yekê zanin, ku merivê* meyî kevn t'evî wî xaç bû, ku *qewata* qalibê gunehk'ar p'ûç be, ku ji vir hada em nebîne xulamên guneh. ⁷ Çimkî ewê ku mirye, ew jî guneh aza bûye. ⁸ Awa heger em t'evî Mesîh mirine, em bawer dikin, ku emê t'evî wî bijîn jî. ⁹ Çimkî em zanin, Mesîh ku jî mirinê zêndî bûye, îdî namire, mirin ser wî îdî hikum nake. ¹⁰ Bi wê mirinê ew bona guneh carekê mir, lê niha ku dijî, bona Xwedê dijî. ¹¹ Usa jî hûn xwe bona guneh mirî hesab kin, lê bona Xwedê zêndî, bi saya Mesîh Îsa.

¹² Awa bira îdî guneh hikumî li ser qalibê weyî elê mirinê neke, ku hûn gur'a xastinên wî bikin. ¹³ Û endemên qalibê xwe nedine guneh, ku bibîne hacetên neheqîyê, lê xwe bidine destê Xwedê, çawa yekî jî mirinê zêndîbûyî endemên we bira bona Xwedê bibîne hacetên heqîyê. ¹⁴ Û guneh wê serk'arîyê li we neke, çimkî hûn ne bin Qanûnêda ne, lê bin k'eremêda ne.

XULAMÊN RASTÎYÊ

¹⁵ Îdî çi? Em gunehan bikin, çimkî ne bin qanûnêda ne, lê bin k'eremêda ne? T'u car! ¹⁶ Gelo hûn haqas tişt nizanin, ku hûn xwe xulamîyêr'a bidine destê k'ê û gur'a k'ê bikin, dibîne xulamên wî? Heger hûn xulamên guneh bin, diçine berbi mirinê, lê heger hûn xulamên Xwedê bin, gur'a wîda bin, diçine berbi rasthesabbûnê. ¹⁷ Lê şikir Xwedêr'a, ku waxtekê hûn xulamên guneh bûn, lê bi hub û rez hûn li gora t'ertzê wê hînkirinê çûn, ya ku we xwe spartê. ¹⁸ Hûn jî guneh aza bûn û bûne xulamên rastîyê. ¹⁹ (Ez mîna cûr'ê merivayî dibêjim, ji dest bêt'aqetîya *binyata* weye bedenî.) Waxtekê çawa we endemên xwe dane neheqîyê, ku bibîne xulamên heramîyê û neheqîyê, usa jî niha endemên xwe bidine helalîyê, ku bibîne xulamên rastîyê.

²⁰ Çaxê hûn xulamên guneh bûn, ji rastîyê aza bûn. ²¹ Hingê we ji kirinên xwe çi ber çinîn, bona k'îjanan hûn niha şerm dikin? Ew *kirin* axirîyê mêriv dibîne berbi mirinê. ²² Lê niha hûn jî guneh ku aza bûn û bûne xulamên Xwedê, berê helalîyê diçinin û axirîya wan jî jîyîna heta-ha-tê ye. ²³ Çimkî ji ber maşê gunehva, *yê gunehk'ar* mirinê distîne, lê ji p'êşkêşa Xwedê jîyîna heta-ha-tê, bi saya Xudanê me Mesîh Îsa.

* 6:6 Awa gotî, binyata kevn.

7¹ Birano, derheqa çida ku ezê niha wer'a bêjim, hûn wê baş fem dikin, çimkî ez wanr'a xeber didim, çawa yên haş ji Qanûnê hene. Qanûn haqas waxt ser mêriv hikum dike, heta ku meriv zêndî ye. ² Mesele, jina mêrkirî bi qanûnê mêrê xweyî zêndîva girêdayî ye, lê heger mêrê wê dimire, hingê ew ji wê qanûna ku mêrva girêdayî bû aza dibe. ³ Awa heger mêrê wê hê zêndî be û ew bibe jina mêrekî din, wê zinêk'ar bê hesabê, lê heger mêrê wê bimire, ew ji wê qanûnê aza dibe û zinêk'ar nabe, heger bibe jina mêrekî din. ⁴ Usa jî hûn, birayên min, bi bedena Mesîh hindava Qanûnêda mirin, ku bibine p'ara yekî din, yê ku ji mirinê zêndî bûye, ku hûn Xwedêr'a ber bînin. ⁵ Çimkî çaxê me hê bi *binyata* bedenî dijît, temên gunehan, ku ji dest Qanûnê *qewat* hildidan, nava qalibên meda ya xwe dikirin, ku em bimirin û eva yeka berê gunehkirinê ye. ⁶ Lê niha em hindava Qanûnêda mirin û ji wê rizgar bûn, bi k'îjanê em girtî bûn, ku em bi jîyîna nûye ruhanî *Xwedêr'a* xizmetîyê bikin, lê ne bi rîya Qanûna nivîsar.

QANÛN Û GUNEH

⁷ Awa em çi bêjin? Gelo Qanûn guneh e? T'u car! Lê minê guneh nas nekira, heger Qanûn nîbûya. Mesele, minê nizanibûya ku dilhaviyî jî guneh e, heger Qanûnê negotibûya: «Dilhaviyîyê neke». ⁸ Lê guneh t'emî kire manî, nava mînda her cûr'e dilhaviyî pêşda anî. Çimkî bêy Qanûn guneh mirî ye. ⁹ Ez xwexa waxtekê bêy Qanûn zêndî bûm, lê gava t'emî gihîşte min, guneh zêndî bû, ¹⁰ lê ez mirim. Ê ew t'emîya ku bona jîyînê bû, hema ew jî bû bayîsê mirina min. ¹¹ Çimkî guneh ji t'emî kire manî, ez xapandim û bi wê kuştim.

¹² Awa Qanûn pîroz e û t'emîya wê jî pîroz e, rast e û qenc e. ¹³ Ku usa ye, *Qanûna* qenc bona min bû mirin? T'u car! Lê guneh li nava mînda mirin pêşda anî, ya ku bi wê qencîyê bû, ku hunurê guneh k'ifş be û neheqîya guneh bi t'emîyê hê mak be.

ŞER'Ê NEK'IFŞE NAVA MÊRIVDA

¹⁴ Belê, em zanin ku Qanûn ruhanî ye, lê ez bedenî me, bindestîya gunehr'a firotî. ¹⁵ Çimkî ez çi dikim tê dernaxim. Ne ku wê yekê dikim, çi dixazim, lê wê yekê dikim, çi ber ç'evê min reş e. ¹⁶ Lê heger çi ez naxazim wê dikim, Qanûnê begem dikim, ku ew qenc e. ¹⁷ Lê awa wê *kirinê* ne ku ez dikim, lê gunehê ku nava mînda dimîne ew dike. ¹⁸ Ez zanim, ku nava mînda~ li bedena mînda, t'u tiştê qenc namîne, çimkî qencîyêr'a razîbûn ji minva girêdayî ye, lê ew yek minr'a li hev nayê. ¹⁹ Belê, wê qencîya ku dixazim bikim nakim, lê xirabîya ku naxazim wê dikim. ²⁰ Heger ez wî tiştê ku naxazim dikim, îdî ne ku ez dikim, lê ew gunehê ku nava mînda dimîne, ew dike.

²¹ Awa ez qanûnekê *nava xweda* dibînim: Gava dixazim qencîyê bikim, bêy hemdê min xirabî li cem min pêşda tê. ²² Ez bi t'emamîya dilê xwe Qanûna Xwedê begem dikim, ²³ lê qanûneke din nava xweda dibînim, ku miqabilî wê qanûna ku hişê min ew begem kirye dike şer' û min dike hêsîrê qanûna guneh, ya ku nava mînda ye. ²⁴ Ez çi merivekî hêsîr-belengaz im! K'ê wê min ji destê vî qalibê elê mirinê rizgar bike? ²⁵ (Şikir Xwedêr'a, bi saya Xudanê me Îsa Mesîh!)

Aha ez xwexa bi hiş-aqilê xwe qanûna Xwedêr'a xizmetîyê dikim, lê bi qalibê xwe qanûna gunehr'a.

JÎYÎNA BI BEDENÎ Û BI RUHÊ XWEDÊ

8¹ Niha yên ku t'evî Mesîh Îsa bûne yek, îdî dîwana wan nabe, çimkî ne ku bi *binyata* bedenî dijîn, lê bi *ya* Ruh. ² Çimkî qanûna Ruhê jîyînê bi saya Mesîh Îsa ez ji qanûna guneh û mirinê rizgar kirim. ³ Belê, çi ku qanûnê ji dest bêt'aqetîya *binyata* beden nikaribû bikira, Xwedê ew yek kir. Wî Kur'ê xwe nîgara *binyata* bedenê elê gunehkirinêda bona guneh şand. Ê aha ewî wî bedenîda dîwana guneh kir, ⁴ ku rastîya t'emîyên Qanûnê nava meda bê meyaserkirinê, emên ku bi *binyata* bedenî najîn, lê bi *ya* Ruh. ⁵ Çimkî yên ku bi xastina *binyata* bedenî dijîn, ew ser tiştên bedenî difikirin, lê yên ku bi xastina *binyata* Ruh dijîn, ew ser tiştên Ruh difikirin. ⁶ Axirîya fikira bedenî mirinê dide, lê axirîya fikira Ruh jîyîn û haştî ye. ⁷ Çimkî fikira bedenî hindava Xwedêda dijminatî ye, ew ber Qanûna Xwedê xwe naşkêne û ne jî dikare. ⁸ Ewên bi *binyata* bedenî dijîn, nikarin li Xwedê xaş bîn. ⁹ Lê hûn ne bi *binyata* bedenî ne, lê bi *ya* Ruh, heger rast Ruhê Xwedê nava weda dimîne. Lê heger Ruhê Mesîh ne nava yekîda ye, ew ne p'ara wî ye. ¹⁰ Ê heger Mesîh dilê weda ye, qalib mirî ye, çimkî we guneh kir, lê ruhê we zêndî ye, çimkî hûn rast hatine hesabê. ¹¹ Ê heger Ruhê ewî ku Îsa ji mirinê zêndî kir, nava weda dimîne, wê bi wî Ruhê xweyî nava weda, yê ku Mesîh ji mirinê zêndî kir, jîyînê bide qalibê weyî elê mirinê jî.

¹² Awa, birano, em borcdar in, lê ne ku bedenêr'a, ku bi xastina wê bijîn. ¹³ Çimkî heger hûn bi xastina *binyata* bedenî bijîn hûnê bimirin, lê heger bi Ruh kirên bedenî bikujin, hûnê bijîn.

¹⁴ Ewên ku bi Ruhê Xwedê tene rêberîkirinê, ew in lawên Xwedê. ¹⁵ Çimkî we ew ruh nestandye, ku we bike xulam, ku hûn dîsa nava tirsêda bin, lê we ew Ruh standye, yê ku we dike warxurên Xwedê, bi k'îjanî em gazî wî dikin: «Abba!»~ «Bavo!» ¹⁶ Hema ew Ruh xwexa şehdetîyê dide ruhê me, ku em lawên Xwedê ne. ¹⁷ Ê heger lawên wî ne, usa ye warxur in, warxurên Xwedê û t'evî Mesîh xweyp'arên war. Belê, heger em t'evî te'lî-tengîyên Mesîh bûne, emê t'evî rûmeta wî bin jî.

¹⁸ Ez aha tê derdixim, ku te'li-tengîyên meyî vî zamanî, li ber rûmeta wê meva k'ifş be, ne tiştêk e. ¹⁹ Hemû efîrîn jî bêsebir ç'evnihêrî hîvîya k'ifşbûna lawên Xwedê ne. ²⁰ Belê, efîrîn ber bayê *jîyîna* p'ûç k'etin, ne ku bi hemdê xwe, lê *Xwedê* ew dane vê yekê, bi wê gumanê, ²¹ ku efîrîn xwexa jî ji wê xulamtiya p'ûç aza bin û t'evî azayî û rûmeta lawên Xwedê bin. ²² Çimkî em zanin ku hemû efîrîn heta niha bi hevr'a dikine zare-zar û mîna eşa k'ulfetê dik'işînin. ²³ Û ne t'enê efîrîn, lê em xwexa jî nava xweda zare-zar in, emên ku me Ruhê Pîroz standye, çawa berê deremeta Xwedêye pêşin û hîvîyê ne, heta ku Xwedê wartiya me eseyî ke, awa gotî em bigihîjine azabûna qalibê xwe. ²⁴ Belê, vê gumanê em rizgar bûn. Lê ew gumana ku tê dîtîne, ne guman e, çimkî yek çawa dikare gumana wî tiştî be, çi li ber ç'evan e? ²⁵ Lê heger gumana me bona wî tiştî ye, ku nayê dîtîne, em gerekê bi sebir hîvîyê bimînin.

²⁶ Usa jî Ruhê Pîroz tê hewara bêt'aqetîya me, çimkî em nizanin çawa gerekê dua bikin, lê Ruhê Pîroz xwexa bi gotinên k'edere ku nayêne ser zar-zimanan, bona me qencbêjîyê dike. ²⁷ Û yê dilan vedinihêre zane fikira Ruhê Pîroz çi ye, çimkî ew weke daxaza Xwedê bona merivên Xwedê qencbêjîyê dike.

²⁸ Em zanin ku her tişt wanr'a dibe qencî, yên ku Xwedê hiz dikin û li gora qîrara wî gazîkirî ne. ²⁹ Çimkî Xwedê k'îjan pêşda nas kirin, ew jî pêşda k'ifş kirin, ku bibine mîna Kur'ê wî, ku Îsa nava gelek biranda *yê* nixurî be. ³⁰ Û ewên ku pêşda k'ifş kirin, gazî wan jî kir û gazî k'îjanan kir, ew jî rast hesab kirin û k'îjan rast hesab kirin, ew jî xweyrûmet kirin.

XWEDÊ YAR E K'Î NEYAR E?

³¹ Niha em bona van tiştan çi bêjin? Heger Xwedê alîyê me ye, k'î dikare miqabilî me be? ³² Ewî ku heyfa xwe Kur'ê xwe neanî, lê bona me hemûyan ew da der, îdî wê çawa her tiştî t'evî wî p'êşkêşî me neke? ³³ Xwedê ye, ku hîlbijartîyên xwe rast hesab dike, k'î dikare wan gunehk'ar ke? ³⁴ K'î dîwanê dike? Mesîh e, yê ku *bona me* mir, lê ji mirinê zêndî bû jî û alîyê Xwedêyî rastê ye, ku bona me qencbêjîyê dike. ³⁵ Îdî çi wê me hizkirina Mesîhda şikê xe? ³⁶ Derd-kul, te'li-tengî, zêrandin, xelayî, bêsit'arî, qeda-bela yan şûr? Çawa nivîsar e: «Bona te em her roj ber mirinê ne, mîna peza serjêkirinê têne hesabê».[†]

³⁷ Lê em nava van hemû tiştanda hê zêde serdik'evin, bi saya ewî ku em hiz kirin. ³⁸ Çimkî ez bêşik bawer im, ku ne mirin, ne jîyîn, ne milyak'et, ne şexsek, ne tiştên hizûr, ne tiştên wê bân, ne t'u qewat, ³⁹ ne yên jorin, ne yên jêrin û ne jî efîrinekî mayîn dikare me hizkirina Mesîhda şikê xe, ya ku bi Xudan Mesîh Îsa li ser me hate k'ifşê.

XWEDÊ, ÎSRAËL, HÊRS Û REHMA XWEDÊ

⁹ ¹ Ez rastîyê bi Mesîh bêtêlif dibêjim û bi *rehma* Ruhê Pîroz îsafa min jî şehdetîyê dide min, ² ku ez gelekî ber xwe dik'evim û dilê minda jî kuleke k'ûr e. ³ Çimkî min xwexa dixwast nifir li min bibûya~ ji *rehma* Mesîh biqetyama, bona mîletê minî ji xûn-goştê min, ⁴ ku îsraêlî ne. Li wan dik'eve bibine warxurên *Xwedê* û rûmeta *wî bistînin*, çimkî peyman, Qanûna dayî, hebandin û sozên dayî wanr'a hat. ⁵ Kal-bav jî ji wan in û Mesîh jî, ji alîyê xûn-goştêda ji nava wan hat, ku ser hemûyanra Xwedêyê heta-ha-têyî hêjayî şikirîyê ye. Amîn.

⁶ Lê nabe, ku gotina Xwedê badîhewa be, çimkî ne ku ew hemû îsraêlî ne, yên ku ji Îsraêl dinê k'etine ⁷ û ne jî hemûyên ku ji bedena Îbrahîm bûne lawên wî ne, lê hatye gotinê: «Bi Îshaq wê ter'a zuret bê hesabê». ⁸ Awa gotî lawên Xwedê ne ew in, yên ku ji bedenê ne, lê lawên sozdayî wê nisil bêne hesabê. ⁹ Çimkî sozê gotî ev bû: «Sala tê, vî çaxî ezê vegerim û Serahêra kur'ek wê bibe». ¹⁰ Lê ne t'enê ev, Rêvêka jî bi du kur'an ji mêrekî duhalî derk'et~ ji bavê me Îshaq. ¹¹ Û çaxê kur'ik hê nebibûn, hê wan qencî yan xirabî nekiribûn, lê ku qîrara Xwedêye hê pêşda kirî qedîm bimîne, ¹² dîya wanr'a hate gotinê: «Yê mezin wê yê biç'ûkra xulamtiyê bike». ¹³ Eva yeka ne ku ji ber kirinanva wê bibûya, lê li gora gazîya Xwedê. ¹⁴ Çawa nivîsar e: «Min Aqûb hiz kir, lê ji Esaw çûm».[‡]

¹⁵ Em îdî çi bêjin? Gelo neheqîya Xwedê heye? T'u car! ¹⁶ Çimkî Mûsara dibêje: «Ez k'ê ku gerekê bême rehmê, ezê bême rehmê û ser k'ê gerekê dilşewit bim, ezê dilşewit bim». ¹⁷ Eva yeka îdî ne ji xwastin yan xîreta mêriv e, lê ji rehma Xwedê ye. ¹⁸ Çimkî nivîsar firewinra dibêje: «Min tu bona wê yekê hîlbijartî, ku qewata xwe bi te bidime k'ifşê û navê min t'emamîya dinyayêda bê gotinê». ¹⁹ Awa Xwedê k'îjanan dixaze tê rehmê û k'îjanan dixaze wan serhişk dike.

²⁰ Hingê tuê minr'a bêjî: «Lê îdî çima Xwedê me neheq dike? K'î dikare li ber qîrara wî rabe»? ²¹ Lê tu k'î yî, merivo, ku li ber gotina Xwedê radibî? Gelo yê xuliqî dikare Xuliqdarra bêje: «Te çima ez aha çêkirime»? ²² Çima hikumê cêr'ker ser axê t'une, ku ji wê her'îya stirayî him derdanên bona rûmetê çêke, him jî yên bona bêr'ûmetê? ²³ Lê vê yekêda k'ê çi dikare bêje? çaxê berî ku Xwedê hêrsa xwe û qewata xwe wanva bide k'ifşê, wî bi sebra dirêj li wan derdanan sebir dike, yên ku hêjayî wê hêrsê ne û undabûnêra hazir sekinî ne. ²⁴ Wî sebir kir, ku zengînya rûmeta xwe wan derdananra bide k'ifşê, yên ku ev rehm dîtine, ya ku wî hê pêşda hazir kiribû, ku

* 8:35,39 Bi yûnanî dewsa xebera «şikê xe» «dûr xe» nivîsar e. Li gora yûnanî «hizkirin» ya Mesîh e.

† 8:36 Zebûr 44:22.

‡ 9:7,9,11,12 Destpêbûn 21:12; 18:10, 14; 25:23.

§ 9:13 Malaxî 1:2,3.

** 9:15 Derk'etin 33:19.

†† 9:17 Derk'etin 9:16.

ewana t'evî rûmeta wî bibûna. ²⁴ Û ew derdanên gazîkirî em in~ ne t'enê ji cihûyan, lê ji hêtanosan jî, ²⁵ çawa kitêba Hoseyada ew dibêje: «Cimeta ku ne ya min e, ezê bêjimê: <Cimeta min> û ye ne delalra ezê bêjimê: <Delalî>». ²⁶ Û «wê dera ku wanr'a hate gotinê: <Hûn ne cimeta min in>, hema li wir jî ewê lawên Xwedêyê zêndî bêne gotinê».*

²⁷ Îşaya jî bona Îsraêl dike qûr'în dibêje: «Heger hesabê lawên Îsraêl weke qûma *devê* be'rê be, t'enê p'arek wê jê rizgar be. ²⁸ Çimkî Xudan wê kin û kurt zûtirê dîwana dinyayê bike».[†]

²⁹ Û çawa Îşaya berî wê yekê got: «Heger Xudanê Ordîyan mer'a zuret nehişta, emê bik'etana roja Sodomê û bibûna mîna Gomorayê».[‡]

³⁰ Em îdî çi bêjin? Hêtanosên ku pey rastîyê nediçûn, gihîştine rasthesabbûnê~ wê rasthesabbûna *ku* ji bawerîyê ye, ³¹ lê Îsraêlî ku pey Qanûnê diçûn, ku bi wê rast bêne hesabê, negihîşte wê rasthesabbûnê. ³² Çima? çimkî ne ku bi bawerîyê, lê bi kirên xweye ji Qanûnê *dicedandin*. Û ewana ser kevirê lik'umandinêda k'etin hol bûn, ³³ çawa nivîsar e: «Va ye ez kevirê lik'umandinê Sîyonêda datînim, zinarekî jê holbûnê û her k'ê ku wî bawer bike, wê şermî nemîne».[§]

K'Î GAZÎ NAVÊ XUDAN KE WÊ RIZGAR BE

10 ¹ Gelî birano! Dua û xwastina dilê min ji Xwedê bona rizgarbûna Îsraêlê ye. ² Ez şehdeyê wana me, ku ew hindava Xwedêda xweyxîret in, lê ne bi zanebûn. ³ Wana rastîya Xwedê fem nekir, wan xwast rastîya xwe qedîm kin, lema pey rastîya Xwedê neçûn. ⁴ Çimkî Qanûn bi Mesîh ser hevda hat, ku her bawermend bi wî rast bê hesabê.

⁵ Bona wê rastîya ji Qanûnê Mûsa aha dinivîse: «Merivê ku Qanûnê biqedîne, ewê bi wê jî bijî».^{**} ⁶ Lê bona rastîya ji bawerîyê aha dibêje: «Dilê xweda nebêje: K'ê wê rabe ezmên?»^{††} (awa gotî Mesîh jorda bîne), ⁷ yan: «K'ê wê her'e gelîyê bêbin?» (awa gotî Mesîh ji nava mirîyan derxe). ⁸ Lê nivîsar çi dibêje? «Xebera *Xwedê* cem te ye~ ser zarê te û dilê teda ye», (ew xebera bawerîyê, ya ku em dannasîn dikin). ⁹ Heger tu bi zarê xwe îqrar kî, ku Îsa Xudan e û dilê xweda bawer bikî, ku Xwedê ew ji nava mirîyan zêndî kirye, tuê rizgar bî. ¹⁰ Çimkî bi dil meriv bawer dike, rast tê hesabê û bi zar îqrar dike, rizgar dibe. ¹¹ Çawa nivîsar dibêje: «Her k'ê ku wî bawer bike, wê şermî nemîne».^{‡‡} ¹² Belê, firqî t'une nava cihû û necihûyanda, çimkî Xudanê hemûyan yek e û yên ku gazî wî dikin, hindava wan hemûyanda jî zengîn e. ¹³ Çimkî nivîsar dibêje: «K'î gazî navê Xudan ke, wê rizgar be».^{§§}

¹⁴ Lê çawa wê gazî wî kin, heger bawerîya xwe wî neanîne? yan çawa wê wî bawer bikin, heger bona wî nebihîstine? yan çawa wê bibihên, heger xeber dannasîn nebe? ¹⁵ Yan çawa wê xeberê dannasîn kin, heger neyêne şandinê? çawa nivîsar e: «Çiqasî hewas in gavên wan, yên ku mizgînîya qencîyê didin!»^{***} ¹⁶ Lê hemûyan gur'a Mizgînîyê nekir, çimkî Îşaya dibêje: «Xudan, k'ê bawerîya xwe gotina me anî?»^{†††} ¹⁷ Awa bawerî ji bihîstinê tê, bihîstin jî ji gotinên li ser Mesîh.

¹⁸ Lê ez dipirsim: Gelo wan ne bihîst? Belê, nivîsar e: «Dengê wan t'emamîya erdê hilda û xebera wan belayî her çar qulbên dinyayê bû».^{††††} ¹⁹ Dîsa dipirsim: Gelo Îsraêl vê yekê nehesyay? Pêşda Mûsa dibêje: «Ezê bi miletê bêkêr helanê bidime we û bi miletekî bêfem hêrsa we rakim».^{§§§} ²⁰ Îşaya jî bêtirs dibêje: «Ez ji alîyê wanda hatime hatime dîtinê, yên ku ez nediger'yam û wan ez nas kirim, yên ku bona min nedipirsîn». ²¹ Lê bona Îsraêlê jî dibêje: «T'emamîya rojê min destê xwe dirêjî miletekî serhişk û berzeq kir».^{****}

REHMA XWEDÊ HINDAVA ÎSRAÊLÊDA

11 ¹ Awa ez dipirsim: Gelo Xwedê cimeta xwe wêda avît? T'u car! Ez xwexa jî îsraêlî me, ji nisilê Îbrahîm, ji qebîla Binyamîn. ² Xwedê cimeta xwe wêda neavît, k'îjan ku hê pêşda hilbijartibû. Yan hûn nizanin nivîsar serhatîya Êlyasda çi dibêje, ku çawa, wî şikyatê Îsraêlê li ber Xwedê dikir digot? ³ «Xudan, p'êxemberên te kuştin, qurbangêhên te xirab kirin, t'enê ez mame û pey min jî diger'in». ⁴ Lê caba Xwedê çi bû? «Min xwer'a heft hezar meriv xwey kirine, yên ku li ber Bael çok venedane».^{††††} ⁵ Usa jî niha, vî zemanîda hinekên hilbijartî bi k'erema Xwedê mane. ⁶ Û heger bi k'eremê ye, îdî ne ji kiran e, heger usa bûya, k'erem îdî nedibû k'erem.

⁷ Îdî çi? Îsraêl negihîşte wê, çi diger'ya, lê yên hilbijartî gihîştinê û yên mayîn kor bûn, ⁸ çawa nivîsar e: «Xwedê

* 9:25,26 Hoseya 2:23; 1:10.

† 9:27,28 Îşaya 10:22,23.

‡ 9:29 Îşaya 1:9.

§ 9:33 Îşaya 8:14; 28:16.

** 10:5 Qanûna K'ahîntîyê 18:5.

†† 10:6,7,8 Qanûna Ducarî 30:12,13,14.

‡‡ 10:11 Îşaya 28:16.

§§ 10:13 Yowêl 2:32.

*** 10:15 Îşaya 52:7.

††† 10:16 Îşaya 53:1.

†††† 10:18 Zebûr 19:4.

§§§ 10:19 Qanûna Ducarî 32:21.

**** 10:20,21 Îşaya 65:1,2.

††††† 11:3,4,3. P'adşatî 19:10, 14,18.

ew tevizandin, ku bi ç'evan nebînin û bi guhan nebihên, heta roja îroyîn». * ⁹ Û Dawid dibêje: «De bira sifra wan wanr'a bibine t'or' û t'ele, çawa maşê jirêk'etina wan. ¹⁰ Bira ronahîya ç'evên wan tarî be, ku nebînin û pişta wan t'imê qûz be». †

¹¹ Awa ez dipirsim: Gelo ew ji rê k'etin, ku unda bin? T'u car! Lê neheqîya wan bû manîya rizgarbûna hêtanosan, ku ew bik'evine xîretê. ¹² Heger neheqîya wan qazinc da dinyayê û k'etina wan qazinc da hêtanosan, lê hê çiqas wê qazinceke *mezin* be, çaxê t'emamîya wan rizgar be!

RIZGARBÛNA HÊTANOSAN

¹³ Niha ez we *bawermendên ji nava* hêtanosanra dibêjim: Belê, ez şandîyê hêtanosan im û xizmetîya xwe bilind dikim, ¹⁴ belkî bikaribim yên ji xûn û goştê xwe bikime xîretê û ji wan hinekan jî rizgar kim. ¹⁵ Çimkî heger wêda avîtina wan bû manîya li hevhatina dinyayê t'evî Xwedê, îdî ku ew bêne hildanê wê bibe çi? Wê bibe zêndîbûna mirîyan. ¹⁶ Heger girika hevîrêye pêşin helal e, t'emamîya şkevê pêva helal e. Û heger raw pîroz in, çiqil jî pêr'a pîroz in. ¹⁷ Heger ji wan çiqilan hinek şkestin, lê tu, ku ji dara zeytûna beyanî *bûyî*, dewsa wan hatî servakirinê, t'evî qinyata rawên zeytûna *qenc* bûyî, ¹⁸ tu dilê xwe li wan çiqilên şkestî şa neke. Lê heger dilê xwe şa kî, bîr bîne, ne ku te raw jor girtine, lê raw tu jor girtî. ¹⁹ Îdî tuê bêjî: «Çiqil hatine şkestinê, ku ez bême servakirinê». ²⁰ Rast e, ewana ji dest nebawerîyê şkestin û tu bi bawerîyê rawva şidyayî. K'ubar nebe, lê bitirse. ²¹ Çimkî heger heyfa Xwedê çiqilên binyatî nehat, belkî heyfa wî wê te jî neyê. ²² Awa şîrinayî û hêrsa Xwedê binihêre, ew hêrs e hindava ji rêk'etiyanda û şîrin e hindava teda, heger nava şîrinayîyêda bimînî. Lê heger na, tuê jî bêyî bir'inê. ²³ Lê heger cihû nava nebawerîyêda nemînin, wê bêne servakirinê, çimkî Xwedê dîsa dikare wan serva ke. ²⁴ Çimkî heger tu, binyata xweda çiqilê zeytûna beyanî bûyî û hatî bir'inê, ser wê zeytûna qence ne ji binyata xwe hatî servakirinê, lê hê çiqas rihet ewên ku çiqilên binyatî ne, wê ser zeytûna xwe bêne servakirinê.

XWEDÊ HINDAVA HEMÛYANDA REHM E

²⁵ Ez naxazim birano, ku hûn haş ji vê sur'ê t'unebin, ku hûn xwe dewsa zaneyan daneynin. P'areke milletê Îsraêlê wê serhişk bimîne heta hesabê wan hêtanosên ku wê rizgar bin t'emam be. ²⁶ Pey vê yekêra wê t'emamîya Îsraêlê rizgar be, çawa nivîsar e: «Rizgarkir wê ji Sîyonê bê û bêxwedêtiyê ji Aqûb dûr xe. ²⁷ Û ev e peyman mine t'evî wan, çaxê ez gunehên wan hildim». ‡

²⁸ Mizgînîyê ku dinihêrî, ewana dijmin in, bona xatirê we, lê ku hilbijartinê dinihêrî, ewana hizkirî ne, bona xatirê kal-bavên xwe. ²⁹ Çimkî Xwedê k'ê hilbijêre û p'êşkêşan bidê, wê yekêda ne p'oşman e. ³⁰ Çawa waxtekê we jî guhdarîya Xwedê nedikir, lê niha bi neguhdarîya wan we rehm dît, ³¹ usa jî ewana niha bûne neguhdar, ku bi rehmdîtina we ew jî rehmê bibînin. ³² Çimkî Xwedê her kes nava neguhdarîyêda xwey kir, ku hemûyan jî bê rehmê.

ÇIQASÎ K'ÛR IN REHM, SERWAXTÎ Û ZANEBÛNA XWEDÊ

³³ Êêê, zengînî, serwaxtî û zanebûna Xwedê çiqasî k'ûr in! Qirarên wî çiqasî ji hiş-aqilan jortir in, *t'u kes* serederîyê ji rîyên wî dernaxe! ³⁴ Çawa nivîsar e: «K'ê nêt-fikira Xudan hesîya? yan k'ê bû şîretk'arê wî? ³⁵ Yan k'ê pêşda *tîştêk* daye wî, ku dewsa wê jê bistîne?» § ³⁶ Çimkî her tişt ji wî, bi wî û bona wî ne. Şikir wîr'a heta-ha-ha-tê. Amîn.

QURBANÊN ZÊNDÎYE DURUFKIRÎ

12 ¹ Awa ez hîvî ji we dikim, birano, boy *xatirê* rehma Xwedê, qalibê xwe p'êşkêşî Xwedê kin, çawa qurbaneke zêndîye durufkirî, ji wî hildayî, ya ku hebandina weye ruhanî ye. ² Û nek'evine kirasê vê dinyayê, lê nêt-fikirên xweda werine nûkirinê, ku hûn bizanibin çi ye qirara Xwedê, ku qencî, xaşî û k'amilî ye.

³ Ez bi wê k'erema ku Xwedê da min, ji we her kesîra dibêjim, ku ji bera xwe zêdetir nefikirin, lê bira ji we her kes fikira xweda hişyar, weke wê bawerîya ku Xwedê p'arevekir bifikire. ⁴ Çawa qalibê meda gelek endem hene û k'arê wan her yekî ne yek e, ⁵ usa jî em gelek in, lê bi Mesîh bedenek in û ji me her kes endemên hev in. ⁶ Awa anegorî wê k'erema mer'a hatye dayînê, em p'êşkêşên xweye cûr'e-cûr'e pêk bînin. Heger p'êşkêşa p'êxembertîyê ye, weke bawerîya xwe me be, ⁷ heger xizmetk'arî ye, nava xizmetk'arîyêda bin, heger hînkirin e, pey hînkirinê bin, ⁸ yê dil dide ber mêriv, bira li pey wê yekê be, yê p'arevedike, bira bi merdanî bike, ewê serk'ar e, bira xîret be, yê qencîyê dike, bira bi dilê razî bike.

⁹ Hizkirina we bêqelpî be, ji xirabîyê zivêr bin, xwe li qencîyê bigirin. ¹⁰ Birahizîyêda ser hevdu şewat bin, hurmetkirinêda ji hevdu derbaztir bin, ¹¹ xîretêda xwer'anedîtî nebin, bi hub û rez xizmetîyê Xudanra bikin, ¹² bi gumanê şa bin, tengasîyanda sebir kin, her t'im dua bikin, ¹³ destê xwe dirêjî pîrozên destteng bikin, pey mêvanhizîyê bin. ¹⁴ Yên we dizêrînin hûn dua-dirozge li wan bikin, belê dirozge bikin û nifiran li wan nekin. ¹⁵ T'evî yên şa dibin şa bin û t'evî yên digirîn bigirîn. ¹⁶ Fikira we her kesî hindava hevda yek be, k'ubar-babax nebin, lê t'evî ewên xwe nimiz digirin nimiz bin, xwe dewsa zaneyan daneynin. ¹⁷ T'u kesîr'a ji ber xirabîyêva

* 11:8 Qanûna Ducarî 29:4; Îşaya 29:10.

† 11:9,10 Zebûr 69:22,23.

‡ 11:27 Îşaya 59:20,21; 27:9.

§ 11:34,35 Îşaya 40:13; Yêremîya 23:18; Îbo 41:11.

xirabîyê nekin. Çi li ber ç'evên hemû merivan qenc e, wê yekê bikin.¹⁸ Çiqas ji we tê, t'evî her merivan haştîyêda bin.¹⁹ Heyfê hilnedin, delalîyên min, lê cî bidine hêrsa Xwedê, çimkî nivîsar e: «Heyfhildan ya min e, ezê *li gora kirê her kesî* bidimê, Xudan dibêje». ²⁰ Lê: «Heger dijminê te birçî ye, nan bidê û heger t'î ye, avê bidê, çimkî tu bi vê kirinê pirîskên agir t'opî ser serê wî dikî». ²¹ Tu ber xirabîyê nede der, lê bi qencîya te *bira* xirabî ber bide der.

BORCÊ BER SEROK Û HIKUMETÊN VÊ DINYAYÊ

13 ¹ Her merivek bira gura wan hikumetanda be, yên ku ser wîr'a ne, çimkî t'u hikumetekî bêy destûra Xwedê t'une û ewên ku hene jî, ji Xwedêda ne. ² Awa k'î ber hikumetê radibe, ew ber qîrara Xwedê radibe û ewên ku radibin, dîwana Xwedê ser xweda tînin. ³ Çimkî serok wan natirsînin, yên ku qencîyê dikin, lê yên xirabîyê dikin *ditirsînin*. Tu dixazî ji hikumetê netirsî? Xwe li qencîyê bigire û tuê bibî şîrinê wê. ⁴ Çimkî ew xizmetk'arê Xwedê ye, bona qencîyên te. Lê heger xwe li xirabîyê bigirî, jê bitirse, çimkî wî badîhewa şûr girênedaye. Ew xizmetk'arê Xwedê ye, ku hêrsa *Xwedê* ser wanda birêje, k'îjanên ku xirabîyê dikin. ⁵ Lema em gerekê gura hikumetanda bin û ne t'enê ku em li ber hêrsê nek'evin, lê ku îsafa me jî dilê me rihet bihêle.

⁶ Ji ber vê yekê jî hûn xerc didin, çimkî ew xulamên Xwedê ne û xizmetk'arên wê yekê ne. ⁷ Awa p'ara k'ê çî dik'eve wê bidine wan, k'êr'a xerc, xerc bidinê, k'êr'a selef, selefana bidinê, ji k'ê gerekê bitirsîn, jê bitirsîn û k'êr'a ku hurmet dik'eve, hurmeta wî bigirin.

HIZKIRINA HINDAVA HEVDA

⁸ T'u tiştîda deyndarê t'u kesî nemînin, pêştirî hev hizkirinê, çimkî k'î hevalê xwe hiz dike, ew Qanûna *Xwedê* diqedîne. ⁹ Û ev t'emîyên ku tèn gotinê: «Zinêk'arîyê neke, nekuje, nedize, dilhavîjîyê neke» û her çî t'emî jî ku hene, dik'evine nava vê gotinê: «Hevalê xwe weke xwe hiz bike». ¹⁰ Hizkirin xirabîya hevalê xwe nake. Awa hizkirin Qanûnê hemû diqedîne.

¹¹ Awa hûn aha bijîn, çimkî zanin ev çî zeman e. Niha îdî waxt e, ku em ji xewê hişyar bin, çimkî niha rizgarbûn hê nêzîkî me ye, ne ku hingê çaxê me bawer kir. ¹² Ji şev p'ara mezin çûye, sibeh nêzîk bûye, awa em kirên tarîstanîyê ji xwe dûr xin û ç'ekên ronayê li xwe kin. ¹³ Usa bijîn, çawa ronaya rojêda, bêy ner'êyê, maşoqê îçkê, bênamûsîyê, heramîyê, şer'ûdîyê û hevşûdîyê. ¹⁴ Lê *nîgara* Xudan Îsa Mesîh li xwe kin û bona dilhavîjîyên *binyata xweye* bedenî xem hilnedin.

NE LOME BIKIN Û NE JÎ HEVDU P'ÎŞK KIN

14 ¹ Yên bawerîyêda sist qebûl kin, lê li ser dudilîya wî jêr'a nek'evine de'wê. ² Yek bawer dike, ku her tiştî dikare bixwe, lê yê sist t'enê p'incar'ê dixwe. ³ Ewê ku dixwe, bira yê naxwe bêhurmet neke û ewê ku naxwe jî bira lome yê dixwe neke, çimkî Xwedê ew qebûl kirye. ⁴ Tu k'î yî, ku lome xulamê yekî din dikî? Heger sekinî be yan k'etî be, ew k'arê Xweyê wî ye. Lê ewê bisekine, çimkî Xwedê dikare wî bide sekinandinê.

⁵ Yek rojekê ser rojên dinra digire, yek jî hemû rojan weke hev digire. Bira her kes fikira xweda bawer be. ⁶ K'ê rojekê xwer'a *dibijêre* û wêda xem hildide, ew bona Xudan xem hildide, usa jî ewê dixwe bona Xudan dixwe, çimkî şikirîyê dide Xwedê. Û yê naxwe jî bona Xudan naxwe û şikirîyê dide Xwedê. ⁷ Ji me t'u kes boy xwe najî û t'u kes boy xwe namire. ⁸ Heger em dijîn, bona Xudan dijîn û heger dimirin, bona Xudan dimirin. Awa heger em bijîn yan bimirin p'ara Xudan in. ⁹ Ji ber vê yekê jî Mesîh mir û zêndî bû, ku him hikumî li ser mirîyan bike, him jî li ser zêndîyan. ¹⁰ Îdî tu çima lome birê xwe dikî? yan çima birê xwe bêhurmet dikî? Ji me her kes jî wê li ber dîwana Mesîh bisekine. ¹¹ Çimkî nivîsar e: «Ez zêndîtîya xwe kim, Xudan dibêje, ku her çok wê li ber min bitewe û her zar-ziman îqrar ke, ku ez Xwedê me». ¹² Awa ji me her kes wê bona xwe li ber Xwedê cabdar be.

¹³ De îdî em lome hevdu nekin, lê vê yekê bikine dilê xwe, ku em nig nedine ber t'u birayî, ku ew p'îşk nebe. ¹⁴ Ez vê zanim û bi Xudan Îsa bawer im, ku t'u tiştêkî ji xwe heram t'une, lê wîr'a heram e, yê heram hesab dike. ¹⁵ Heger bi xwarinê dilê birê xwe ji xwe dihêlî, îdî rabûn-rûniştina te ne bi hizkirinê ye. Bi xwarina xwe wî unda neke, bona k'îjanî Mesîh mir. ¹⁶ Bira ew tiştê ku tu bona xwe qenc dibînî, nebe manîya xeyb kirinê. ¹⁷ Çimkî P'adşatîya Xwedê ne xwarin û vexwarinêda ye, lê li rastîyê, haştîyê û şabûnêda ye, *tiştên* ku dayîna Ruhê Pîroz in. ¹⁸ K'ê bi van xizmetîyê Mesîhr'a dike, ew li Xwedê xaş tê û dibe şîrinê merivan.

¹⁹ Awa em ser wê nêtê bin, ku hev'r'a bi haştî bin û bawerîya hev şên kin. ²⁰ Rûyê xwarinêda k'arê Xwedê xirab nekin. Her tişt paqij e, lê t'enê bona wî merivî xirab e, k'ê ku bi xwarina xwe dibe bayîsê k'etina xelqê. ²¹ Qenc e ne goşt bixwî, ne şerabê vexwî û ne jî wî tiştî bikî, bi çî birê teyê bik'eve. ²² Tu çawa bawer dikî, bira ew nava te û Xwedêda bimîne. Xwezî li wî, k'î bi van tiştên ku hildide *çawa rastî*, dîwanê ser xweda nayne. ²³ Lê heger yek dixwe û dudilîyê dike, *ku ne bi dilê Xwedê ye*, dîwanê ser xweda tîne, çimkî *wêda* ne bawer e. Û çî ku ne bi bawerîyê ye, guneh e.

* 12:19,20 Qanûna Ducarî 32:35; Gotinên Silêman 25:21, 22.

† 13:9 Derk'etin 20:13-15, 17; Qanûna K'ahîntîyê 19:18.

‡ 14:11 Îşaya 45:23.

15¹ Emên li *bawerîyêda* qewat, gerekê li kêmasîyên yên sist sebir bikin, lê ne bona wê yekê, ku em li xwe xaş bîn, ² lê bira ji me her kes qencîkirinêda hevalê xwe xaş bê, ku bawerîya wî bişidîne. ³ Çimkî Mesîh jî ne ku li xwe xaş hat, lê çawa nivîsar e: «Ew bêhurmetîyên ku li te dikin, hatine ser min». ⁴ Lê çî pêşda kitêbanda hate nivîsarê, bona hînbûna me hate nivîsarê, ku em bi sebirê û berdilîya wan gotinên nivîsaran xweyguman bin. ⁵ Bira Xwedêyê sebirê û berdilîyê bide we, ku hûn hindava hevda ser nêtekê bin, weke *daxaza* Mesîh Îsa, ⁶ ku em hevr'a bi zarekî şikirîyê bidine Xwedê û Bavê Xudanê xwe Îsa Mesîh.

⁷ Ji ber vê yekê bona şikirîya Xwedê hevdu qebûl kin, çawa Mesîh em qebûl kirin. ⁸ Çimkî ez *wer'a* dibêjim, ku Mesîh bû xizmetk'arê cihûyan, ku bi qedîmkirina wî sozê ku kal-bavanr'a hatye dayîne aminîya Xwedê bide k'ifşê. ⁹ Hêtanos jî wê bona rehma wî şikirîyê bidine Xwedê. Çawa nivîsar e: «Ji ber vê yekê ezê nava hêtanosanda pesinê te bidim û boy navê te bistirê». [†] ¹⁰ Û dîsa dibêje: «Ay miletno, bi t'evî cimeta wî şa bin!» [‡] ¹¹ Û dîsa dibêje: «Şikirîyê bidine Xudan, her miletno û pesinê wî bidin, her cimetno». [§] ¹² Îşaya jî dibêje: «Tamareke Yêşa wê derê û bibe mîrê miletan û milet wê gumana xwe bidine ser wî». ^{**} ¹³ Bira Xwedêyê gumanê dilê we bi şabûn û haştîyêva t'ame-t'ijî ke, bona wê bawerîya we, ku gumana we bi qewata Ruhê Pîroz zêde be.

XIZMETK'ARÎYA PAWLOS BONA HÊTANOSAN

¹⁴ Ez xwexa hindava weda bawer im, birayên min, ku we gelek qencî kirine û zanebûnêva jî dagirtî ne û dikarin hevdu şîret kin. ¹⁵ Lê alîkîva min turuş kir, birayên min, *wer'a* nivîsî û hinek tişt anîne bîra we, bi wê k'erema ku ji Xwedêda minr'a hatye dayîne, ¹⁶ ku *bi wê k'eremê* li nava hêtanosanda ez bibime berdestîyê Mesîh Îsa, ku bi xizmetk'arîyê Mizgînîya Xwedê bidim, ku hedîbûna hêtanosan bi *destê* Ruhê Pîroz pîrozbûyî bê hildanê. ¹⁷ Awa ez dikarim *bona xizmetk'arîya* li ber Xwedê bi saya Mesîh Îsa bifir'im. ¹⁸ Çimkî ez turuş nakim bona tişteki usa xeber dim, çî ku Mesîh bi destê min nekiribe, ku hêtanos gura wîda bin, tiştên bi xeberan bin yan bi kirinan bin, ¹⁹ bi nîşanan û k'iryametên qewat, bi qewata Ruhê Xwedê. Û aha ez ji Orşelîmêda girtî heta Îlîrkûmê ger'yam û ew der bi Mizgînîya Mesîhva t'ije kir. ²⁰ Min divedand, ku li wan deran Mizgînîyê dannasîn kim, li k'u bona navê Mesîh nehatibû bihîstinê, ku nebe ez ser rikinê hinekên din çê kim. ²¹ Lê belê, çawa nivîsar e: «K'îjananra bona wî nehatye gotinê, wê bibînin û ewên ku bona wî ne bihîstye, wê bizanibin». ^{††} ²² Lema gelek caran rê nedik'ete min ser weda bihatama. ²³ Lê niha îdî van alîyan cîyê usa t'une, ku p'êgeh lê nek'etibe û ev çend sal e ez dixazim bême cem we, ²⁴ çaxê ku her'ime Spanyayê. Awa gumana min heye, ku ezê ser rîya xwe serîkî li we xim û ji wir hûn min ver'êkin, ku her'ime Spanyayê, gava bîna min hinekî bi we derê. ²⁵ Lê niha ez diçime Orşelîmê, ku pîrozanra bi k'omekdayîne xizmetîyê bikim. ²⁶ Çimkî birayên Makedonyayê û Axayayê bi hevr'a qayl bûn, ku alîk'arîkê bidine pîrozên Orşelîmêdaye k'esib. ²⁷ Ew qayl bûn û deydarê wan in jî. Çimkî hêtanosan alîyê ruhanîda k'omek ji cihûyan standin, gerekê ew jî bi hebûka vê dinyayê k'omekê bidine wan. ²⁸ Awa pey vê kirinêr'a, çaxê alîk'arîya t'opkirî bigihînimê cî, ezê bême cem we û ji wir derbazî Spanyayê bim. ²⁹ Ez zanim, çaxê bême cem we, ezê bi dewlemendîya dua-dirozgên Mesîh bêm.

³⁰ Ez hîvî ji we dikim birano, bi saya Xudanê me Îsa Mesîh û bi wê hizkirina ji Ruh, ku hûn bi duayên xwe li ber Xwedê t'evî şer'k'arîya min bin. ³¹ Dua bikin, ku ez ji destê nebawerên Cihûstanêda rizgar bim û xizmetîya mine bona k'omekdayîne Orşelîmêda li pîrozan xaş bê. ³² Û aha ezê bi *daxaza* Xwedê, bi dilekî şa bême cem we û hinekî t'evî we hêsa bim. ³³ Bira Xwedêyê haştîyê we hemûyanra be. Amîn.

SILAVÊN AXIRÎYÊ, DUA-DIROZGE Û ŞIKIRDARÎ

16¹ Ez t'emîya xûşka Foybê didime we, ya ku civîna Kenxêrayêda berdestîyê dike. ² Hûn wê bi navê Xudan qebûl kin, çawa li pîrozan dik'eve û çaxê dibe hewcê tişteki, destê xwe dirêjî wê kin, çimkî ewê jî xweyîti gelean kirye û usa jî min.

³ Silavê bidine Priskîlayê û Ekîlayê~ hevalk'arên mine k'arê Mesîh Îsada. ⁴ Wana bona min dest ji jîyîna xwe k'îşand û ne ku t'enê ez ji wan razî me, lê hemû civînên ji *nav* hêtanosan jî. ⁵ Silavê bidine civîna mala wanda jî. Apênetyê delalê min jî silav bikin, ku Asyayêda bawermendê Mesîhî pêşin e. ⁶ Silavê bidine Meryemê, ku bona we gelek xûdan rêtye. ⁷ Silavê bidine Endronko û Yûnyasê pismam û hevalên mine hebsêda. Ew nava şandîyanda naskirî ne û berî min bawerîya xwe Mesîh anîne.

⁸ Silavê bidine Emplîyato, delalê minî bi Xudan. ⁹ Silavê bidine Ûrbano hevalk'arê meyî k'arê Mesîhda û Staxoyê delalê min. ¹⁰ Silavê bidine Apêlîs, ku bona Mesîh yekî cêribandî ye. Silavê bidine mala Arîstopolo. ¹¹ Silavê bidine Hêrodfiyonê pismamê min. Silavê bidine bawermendên Xudane ji mala Nerkîso. ¹² Silavê bidine Tirîfênayê û Tirîfosayê, yên ku bona navê Xudan dixebitin. Silavê bidine Persîsêya delal, ku bona Xudan gelek xûdan rêtye. ¹³ Silavê bidine Rûfoyê hîlbijartîyê Xudan û dîya wî û usa jî yeke mîna dîya min. ¹⁴ Silavê bidine Asînkrito, Flêgon, Hermês, Patrobas, Hermas û birayên mayîne t'evî wan. ¹⁵ Silavê bidine Filologo û Yûliya,

* 15:3 Zebûr 69:9.

† 15:9 Zebûr 18:49.

‡ 15:10 Qanûna Ducarî 32:43.

§ 15:11 Zebûr 117:1.

** 15:12 Îşaya 11:10.

†† 15:21 Îşaya 52:15.

Nêroyîs û xûşka wî, usa jî Olîmpas û hemû pîrozên t'evî wan.

¹⁶ Silavê bi ramûsana şîrê helal bidine hev. Hemû civînên Mesîh silav li we dikin. ¹⁷ Niha ez hîvî ji we dikim, birano, ku hûn hevza xwe ji wan bikin, yên ji wê hînkirinê der, ya ku hûn hîn bûne, cudetîyê pêşda tînin û xelqê p'îşk dikin. Ji wan dûr bin. ¹⁸ Çimkî yên usa xulamîyê Xudanê me Mesîhr'a nakin, lê zikê xwe diç'êrînin. Bi zarê xaş û fêl-fenîyê, yên fikira xweda zar' dixapînin. ¹⁹ Bona guhdarîya we hemû jî zanin û ez bona we şa me, lê dixazim ku hûn hindava qencîyêda serwaxt bin û hindava xirabîyêda dilsafi. ²⁰ Û Xwedêyê haştîyê zûtîrekê wê serê Şeytan binê nigên weda bip'elêxe. K'erema Xudanê me Îsa Mesîh wer'a be.

²¹ Tîmotêyoyê hevalk'arê min silavan li we dike, usa jî Lûkyo, Yason û Sospatroyê pismamên min.

²² Ez Tertîyo jî bi navê Xudan li we silav dikim, yê ku ev name nivîsi.

²³ Gayos silavan li we dike, mêvanê min û t'emamîya civînê. Êrastoyê ser xezna bajêr silavan li we dike û usa jî birayê Kiwarto. ²⁴ K'erema Xudanê me Îsa Mesîh we hemûyanr'a be. Amîn.

²⁵ Niha şikir wîr'a, yê ku dikare we bawerîyêda qedîm ke, weke wê Mizgînîya ku ez bona Îsa Mesîh dannasîn dikim, weke aşkerebûna wê sur'a ku hê dewrên berêye bihurîda veşartî mabû, ²⁶ lê niha bi nivîsarên p'êxemberan aşkere bû û bi fermana Xwedêyê heta-ha-tê hate naskirinê, ku her mîlet bawer bikin û gur'a wîda bin. ²⁷ Şikir Xwedêyê bêhimberî serwaxtr'a, bi destê Îsa Mesîh, heta-ha-tê. Amîn.

NAMA PAWLOSE PÊŞIN KORINTÛYANR'A

PÊŞGOTIN

Usa k'ifş dibe ku eva nama nêzîkî sala 54-an, li dema rêwîtiya Pawlose 3-an, Efesêda Korintûyanr'a hatye nivîsarê.

Bajarê Korintê bajarekî Yûnanistanêyî k'ifş bû. Ew li qeza Axayayêda p'ayt'extê Romayê bû. Civîna Mesîh bi destê Pawlos li wir bingeha xwe girt, gava li dema rêwîtiya xweye dudan ew li wir 18 mehan ma (K'arên Şandîyan 18:11, 18). Korint bajarekî nav û deng bû, ne t'enê li aliyê k'ir'in-firotanêda, lê usa jî aliyê rabûn-rûniştinê û zanebûnêda. Hebandinên başqe-başqe li wir rikinê xwe girtibûn, çimkî her millet li wir hebûn. Li wir bêşermî gihîştibû dereceke gelek bilind. Û vê yekê gelekî hikumî li ser civîna nû dikir û k'arê xulamên Xwedê giran dikir.

Pawlosê Şandî bi vê namê li ser wan pirsan disekine, yên ku li jîyîna civîna nûda bibûne giranî, usa jî ew li ser t'evgirêdana wan, rabûn-rûniştin û bawerîya wan disekine.

Xema Pawlos bona dutîretîya nava civînê û k'arê wanî xirab bû. Usa jî ew pirsên hal-zewacê, îsafê, qeyde-qanûnên civînê, p'êşkêşên Ruhê Pîroz û fikira zêndîbûna mirîyan safî dike û dide k'ifşê, ku Mizgînî bona van pirsan çawa hîn dike.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin û şikirdayîn (1:1-9)

Cudetîya nava civînê (1:10-4:21)

Pirsa li ser hal-zewacê (5:1-7:40)

Pirsa îsafê û rê-rizmên miletan (8:1-11:1)

Jîyîn, hebandin û t'erbetîya civînê (11:2-14:40)

Li ser zêndîbûna Mesîh û bawermendan (15:1-58)

K'omekt'opkirin (16:1-4)

T'ivdirên Pawlos û silavên axirîyê (16:5-24)

SILAVKIRIN Û ŞIKIRDAYÎN

1 ¹⁻³ Ji Pawlosê bi daxaza Xwedê bona şandîtiya Mesîh Îsa gazîkirî, bi t'evî Sostênîsê bira, civîna Xwedêye Korintêr'a *dixazin*, ku k'erem û haştîya Xwedêyê Bavê me û Xudan Îsa Mesîh bibe, wanr'a, ku bi Mesîh Îsa pîroz bûne û pîrozbûnêr'a hatine gazîkirinê, li wan hemûyanr'a t'evayî, yên ku her deran gazî navê Xudanê me Îsa Mesîh dikin~ Xudanê wan û me.

⁴ Ez her dem bona we şikirîyê didime Xwedêyê xwe, bona wê k'erema wî, ya ku bi saya Mesîh Îsa wer'a hatye dayînê. ⁵ Belê, hûn bi saya wî bi her tiştan dewlemend bûn~ xeberdanêda û her zanebûnêda. ⁶ Hînkirina li ser Mesîh nava weda hate qedîmkirinê, ⁷ ku hûn kêmasîya t'u p'êşkêşî nak'îşînin û usa hîvîya k'ifşbûna Xudanê me Îsa Mesîh bin. ⁸ Û Xwedê wê heta xilazîyê we qewîn-qedîm ke, ku hûn Roja hatina Xudanê me Îsa Mesîhda bêt lek'e bin. ⁹ Amin e ew Xwedêyê ku gazî we kir, ku hûn Kur'e wî Îsa Mesîhê Xudanê meva t'evgirêdayî bin.

CUDETÎYA CIVÎNA KORINTÊDA

¹⁰ De ez îdfî hîvî ji we dikim, birano, bi navê Xudanê me Îsa Mesîh, bira gotina we hemûyan yek be û cudetî nava weda t'unekin, lê hûn hemû jî bi hevr'a li ser nêt-fikir û meremekî qewîn-qedîm bin. ¹¹ Çimkî deng-be'sê we ji mala Xiloyê gihîşte min, birano, ku nava weda de'w-doş hene. ¹² Ez vê dixazim bêjim, ku nava weda yek dibêje: «Ez Pawlosî me», yê din dibêje: «Ez jî Apoloyî me», yek jî: «lê ez Petrûsî me», û yekî din jî dibêje: «Ez jî Mesîhî me». ¹³ Çima Mesîh p'ar-p'arfî ye? çima Pawlos bona we xaç bûye? yan bi navê Pawlos hûn bi avê hatine nixamtinê? ¹⁴ Ez jî Xwedê razî me, ku min ji we t'u kes nixamt, pêştirî Kirîspo û Gayos. ¹⁵ Niha t'u kes nikare bêje, ku hûn bi navê min hatine nixamtinê. ¹⁶ (Bi rastî min mala Steyfan jî nixamt. Lê îdfî nayê bira min, ku min yekî din nixamtibe.) ¹⁷ Çimkî Mesîh ez neşandim, ku binixênim, lê Mizgînîyê dannasîn kim û vê yekê ez bi zora zimanê jîr nakim, ku nebe qewata xaçê Mesîh bê undakirinê.

MESÎH ZORAYÎ Û SERWAXTÎYA XWEDÊ YE

¹⁸ Rast e, hînkirina bona xaç yên undabûyîra bêaqilî ye, lê bona me~ yên rizgarbûyî, zoraya Xwedê ye. ¹⁹ Çawa nivîsar e: «Ezê serwaxtiya serwaxtan unda kim û bîlantîya bîlanan hêç kim». ²⁰ K'anê ne serwaxt? K'anê ne zane? K'anê ne aqilmendên vê dinyayê? Ê ne Xwedê serwaxtiya vê dinyayê kire bêaqilî? ²¹ Çimkî serwaxtiya Xwedê nehişt ku دنیا bi serwaxtiya xwe wî nas bike, lê li Xwedê xaş hat, ku bi wê hînkirina «bêaqilî» yên bawer dikin rizgar bike. ²² Cihû k'iryametana dixazin, yûnan jî serwaxtiyê diger'in. ²³ Lê em Mesîhê xaçbûyî dannasîn dikin, cihûyanra p'îşkbûn, yûnananra jî bêaqilî, ²⁴ lê bona yên gazîkirî, heger cihû bin yan yûnan bin, ew xeber Mesîh e~ zorayî û serwaxtiya Xwedê. ²⁵ Çimkî ew kirên Xwedêye ku ber ç'evên merivan bêaqilî k'ifş dibin, ew ser her serwaxtiya merivayêra ye û kirê Xwedêye ku ber ç'evên merivan sist k'ifş dibe, ew ser her zoraya merivayêra ye.

²⁶ Hela binihêrin, birano, hûn k'î bûne, ku ji *alîyê* Xwedêda hatine gazîkirinê: Li dinyayêda ji we gelek ne serwaxt bûne, ne yên zor bûne û ne jî esilzade bûne. ²⁷ Lê Xwedê bêaqilên dinyayê hîlbijartin, ku serwaxtan bide şermê û sistên dinyayê hîlbijartin, ku yên zor bide şermê ²⁸ û Xwedê yên bêqîmete bêrûmet û yên ne t'u tişt

* 1:19 Îşaya 29:14.

hilibijartin, ku heyînên berbiç'ev ji navê ret ke, ²⁹ku t'u beden li ber hizûra Xwedê bi xwe nefir'e. ³⁰Û eva yeka ji Xwedê ye, ku hûn t'evî Mesîh Îsa bûne yek, yê ku ji Xwedêda mer'a bû serwaxtî, rastî, pîrozî û rizgarî. ³¹Ku çawa nivîsar e: «Yê difir'e, bira bi Xudan bifir'e».*

BAWERÎ Û SERWAXTÎYA XWEDÊ

2¹Ez jî çaxê hatime cem we, birano, nehatim ku bi xeber yan serwaxtîya zengîn sura Xwedê we pê bihesînim. ²Çimkî min nêta xweda danenî, ku nava weda tiştêkî din bizanibim, pêştirî Îsa Mesîh û ew jî yê xaçbûyî. ³Ez xwexa halekî sistda, bi tirs û lertz nava weda bûm. ⁴Gotin û hînkirina min, ne ku ji serwaxtîya merivayê bi xeberên razî kirinê bû, lê bi îzbatîya zoraya Ruhê Pîroz, ⁵ku bawerîya we ne ku bi serwaxtîya merivayê be, lê bi zoraya Xwedê be.

⁶Lê derheqa serwaxtîyêda ku em yên ruhanîye gihîştîra xeber didin, ne serwaxtîya vê dinyayê ye û ne jî ya mîrên vê dinyayê, hikumê k'îjanan hêç dibe. ⁷Lê em derheqa serwaxtîya Xwedêye sur'e veşartîda xeber didin, ya ku Xwedê hê berî efirandina dinyayê, bona rûmeta me qîrar kir. ⁸Ji mîrên vê dinyayê t'u kesî ev serwaxtî fem nekir, çimkî heger fem bikirana, wê Xudanê rûmetê xaç nekirana. ⁹Lê çawa nivîsar e: «Ew tiştên ku ç'evan nedîtine û guhan nebihîstine, dilê mêrivra derbaz nebûne, Xwedê bona wan hazîr kirine, yên ku wî hiz dikin».[†]

¹⁰Lê Xwedê eva yeka bi Ruhê xwe li ber me vekir. Çimkî Ruh her tiştî vedinihêre, heta nêt-meremên Xwedêye k'ûr jî. ¹¹K'î haş ji dilê mêriv heye, pêştirî wî ruhê nava wîda? Usa jî t'u kes haş ji sur'a Xwedê t'une, pêştirî Ruhê Xwedê. ¹²Me ne ku ruhê vê dinyayê standye, lê Ruhê ji Xwedêda, ku wan tiştên ji Xwedêda mer'a dayî em fem bikin. ¹³Em bona van tiştan bi gotinên ji serwaxtîya merivayê hînbûyî nabêjin, lê bi gotinên hînkirina ji Ruhê Xwedê. Tiştên ruhanî wanr'a şirovedikin, yên ku ruhanî ne. ¹⁴Lê merivê ne bi Ruh wan tiştên Ruhê Xwedê hîlnade, bi ya wî ev yekana bêaqilî ne û nikare jî fem bike, çimkî ew tişt bi ruhanî tene lênihêrandinê. ¹⁵Lê yê bi Ruhê Xwedê her tiştî vedinihêre û xwexa ji t'u kesî nayê lênihêrandinê. ¹⁶Çawa nivîsar e: «K'ê nêt-fikira Xudan hesîya, ku şîreteke bide wî?»[‡] Lê nêt-fikira Mesîh nava meda ye.

XIZMETK'ARÊN XWEDÊ

3¹Lê min, birano, nikaribû t'evî we çawa merivên ruhanîr'a xeber da, lê çawa yên bedenîr'a, çawa t'evî zar'okên bawerîya Mesîhda. ²Min şîr da we, lê ne ku xwarin, çimkî we hê nikaribû bixwara û niha jî nikarin, ³çimkî hûn hela hê bedenî ne. Heger hê nava weda hevsûdî û hevr'îkî hene, gelo ev tişt ne bedenî ne? Û hûn mîna merivên vê dinyayê najîn? ⁴Mesele, çaxê yek dibêje: «Ez Pawlosî me», yê din: «Ez jî Apoloyî», hûn ne bedenî ne?

⁵De, Pawlos k'î ye? Apolo k'î ye? Ew xizmetk'arên Xwedê ne, bi k'îjanan we bawer kir. Çiqas Xudan da ji wan her kesî, *wan haqas kir*. ⁶Min daçikand, Apolo avda, lê Xwedê hêşîn kir. ⁷Awa ne yê daçikand tiştêk e, ne jî yê avda, lê yê hêşîn kir~ Xwedê. ⁸Yê daçikand û yê avda yek in û her kes wê maşê xwe weke k'arê xwe bistîne. ⁹Çimkî em bi hevr'a k'arkerên Xwedê ne, lê hûn zevîya Xwedê û xana Xwedê ne.

¹⁰Min jî weke wê k'erema ku Xwedê da min, mîna rik'înk'êşekî serwaxt rikin avît, lê yekî din ser çê dike. Lê t'enê bira her kes haş ji xwe hebe, çawa çê dike. ¹¹Çimkî rikinekî din t'u kes nikare dayne, pêştirî yê danî, ku Îsa Mesîh xwexa ye. ¹²Li ser vî rikinî yek *dikare* bi zêr', zîv, kevîrên qîmet, dar, gîhê yan kayê çê ke, ¹³lê bi çi tiştî jî çê ke, k'arê her kesî wê aşkere be, çimkî ew Roj wê bide k'îfşê, ewê bi êgir aşkere be û kirê her kesî çi halîda hebe, agirê bicêribîne. ¹⁴Heger k'arê yekî bimîne, ewê maş bistîne, ¹⁵lê heger k'arê yekî bişewte, ewê zîyanê bik'îşîne, lê xwexa wê rizgar be, çawa *yekî* nava êgirr'a derbazbûyî.

¹⁶Gelo hûn nizanin, ku hûn p'aristxana Xwedê ne û Ruhê Xwedê nava weda dimîne? ¹⁷Heger yek p'aristxana Xwedê xirabe ke, Xwedê jî wê wî xirabe ke, çimkî p'aristxana Xwedê pîroz e, ku hûn in.

¹⁸Bira t'u kes xwe nexapîne. Heger yekî ji we li gora qeydên vê dinyayê xwe serwaxt dibîne, bira bibe bêaqil, ku bibe serwaxt. ¹⁹Çimkî serwaxtîya vê dinyayê li ber Xwedê bêaqilî ye. Çawa nivîsar e: «Ew serwaxtan nava fêl-fenê wanda digire»²⁰ û dîsa: «Xudan zane, ku şêwrên serwaxtan p'ûç in».[§] ²¹De bira îdî t'u kes bi merivan nefir'e! Her tişt jî p'ara we ye~ ²²Pawlos, Apolo, Petrûs, dinya, jîyîn, mirin, tiştên ku niha hene yan yên wê bèn, her tişt p'ara we ye, ²³hûn p'ara Mesîh in, Mesîh jî p'ara Xwedê ye!

NIMIZBÛNA ŞANDÎYÊN MESÎH

4¹Awa gerekê meriv usa me hesab bikin, çawa berdestîyên Mesîh û wek'îlên sur'ên Xwedê. ²Ji wek'îl jî tê xastinê, ku ew amin be. ³Lê bona min eva ne xem e, ku hûn yan merivên din lome min bikin, ez xwexa jî lome li xwe nakim. ⁴Îsafa min rihet e, lê ne ku ez bi vê yekê xwe sofî dikim, lê hakimê min Xudan e. ⁵Awa ji waxt zûtîr lome nekin, hê berî hatina Xudan, ewê tiştên tarîyêda veşartî derxe ronayê û şêwrên dilan bide aşkerekirinê. Û hingê her kes wê ji Xwedê bê qîmetkirinê.

* 1:31 Yêremîya 9:24.

† 2:9 Îşaya 64:4.

‡ 2:16 Îşaya 40:13.

§ 3:19,20 İbo 5:13; Zebûr 94:11.

⁶ Ev yekana, birano, min bona we anîne ser xwe û Apolo, ku hûn vê yekê ji me hîn bin, *ku* ji nivîsarê der *t'u tiştî* nekin. Hingê ji we t' u kesê bi yekî din nefir'e. ⁷ K'î te ji xelqê firq dike? yan çî te heye, ku te nestandye? Lê çima pesinê xwe mîna yekî nestandî didî?

⁸ Îdî hûn t'êr bûne, îdî hur' bûne! Bêy me hûn îdî p'adşatîyê dikin! Ax, xwezî we niha p'adşatî bikira, meyê jî t'evî we p'adşatî bikira! ⁹ Çimkî ez usa dibînim, ku Xwedê em şandî avîtine paşîya hemûyan, çawa yên mirinêr'a dayî, çimkî li dinyayêda ewî em derxistine dîtindarê, him li ber milyak'etan, him jî li ber merivan. ¹⁰ Em bêaqil in bona Mesîh, lê hûn serwaxt, bi Mesîh! Em sist in, lê hûn qewat! Hûn xweyrûmet in, lê em bêrûmet! ¹¹ Heta niha jî em birçî dimînin, t'î dimînin, bêsit'ar dibin, têne lêdanê û dero-der dibin. ¹² Em bi destên xwe dixebitin û bi xûdana xwe dijîn. Çaxê me bêhurmet dikin, em dua-dirozge li wan dikin, çaxê me dizêrinin, em sebir dikin, ¹³ çaxê navê mer'a dilîzin, em ber wan dadixin. Em bûne gemara vê dinyayê û heta niha jî her tiştîda bûne erd û xwelî!

¹⁴ Vê yekê ez wer'a dinivîsim, ne ku we bidime şermê, lê ku we mîna lawên xweyê delal şîret kim. ¹⁵ Heger li *k'arê Mizgînîya* Mesîhda, bi hezaran t'erbetdarên we jî hebin, lê gelek bav wê t'nebin, çimkî min bi *Mizgînîya* Mesîh Îsa hûn dinê xistin. ¹⁶ Lema hîvî ji we dikim, hûn mîna min bin. ¹⁷ Bona vê yekê min Tîmotêyo ser weda şand, lawê xweyî delal û hindava Xudanda amin. Ewê wan rê-dirbên mine li Mesîh Îsada girtî bîne bîra we, ku ez li her deran, hemû civînan çawa hîn dikim.

¹⁸ Ji we hinek babax bûne, wan t'irê ezê neyême cem we. ¹⁹ Lê heger Xudan hiz bike, ezê zûtirekê şûnda ser weda bêm û ezê ne ku li gotinên babaxan binihêrim, lê hunurên wan. ²⁰ Çimkî P'adşatîya Xwedê ne xeberdanêda ye, lê hunurda ye. ²¹ Hûn çawa dixazin? Ez bi kewaz ser weda bêm yan bi hizkirinê û ruhê milûkîyê?

XIRABÎYA CIVÎNÊDA

5 ¹ Deng û be's heye, ku nava weda bênamûsî jî heye û ew jî bênamûsîke usa, ku nava hêtanosanda jî t' une, ku yek dêmar'îya xwer'a serî dayne. ² Hûn k'ubar-babax bûne! Ê ne gerekê we şîr bikira û ewî xweyê vî kirî ji nava xwe derxista? ³ Rast e ez bi qalib ne nava weda me, lê bi ruhê xwe hizûr im û çawa yekî hizûr, min îdî bona yê vî tiştî dike qirara xwe da, ⁴ ku çaxê hûn bi navê Xudanê me Îsa cîkî dicivin, ruhê min jî t'evî we, bi qewata Xudanê me Îsa, ⁵ wî merivî bidine destê Şeytan, ku bedena wî unda be û ruhê wî Roja Xudanda rizgar be.

⁶ Ne baş e, ku hûn firnaq dibin! Gelo hûn nizanin, ku hinek hevîrtirşk t'emamîya şkevê hiltîne? ⁷ Vî hevîrtirşkê kevn ji xwe dûr xin, ku hûn bibine hevîrê nûyî bêy hevîrtirşk, çawa hûn usa jî hene. Çimkî berxê meyî Cejina Derbazbûnê, awa gotî- Mesîh, bona me hate serjêkirinê. ⁸ De em vê cejinê derbaz kin, ne ku bi hevîrtirşkê kevnî femekorîyê, lê bi nanê bêy hevîrtirşk, bi nanê helalîyê û rastîyê.

⁹ Min wer'a namêda nivîsîbû, ku t'evî qavan nebin. ¹⁰ Gotina min ne bona qav, timak'ar, t'alank'ar yan p'ûtp'arêzên vê dinyayêda bû. Heger usa bûya, gerekê hûn lap ji dinyayê derk'etana. ¹¹ Lê min wer'a nivîsî, ku hûn t'evî wî *xûşk û* birayî nebin, yê ku qav e, tima ye, p'ûtp'arêz e, xeybkir e, pey îçkê diçe yan jî t'alank'ar e. T'evî yê usa qet nan jî nexwin! ¹² Ne k'arê min e, ku ez dîwana yên ji civînê der bikim. ¹³ Xwedê wê dîwana wan bike. Lê hûn dîwana yên civînêda bikin*, çawa nivîsar e: «Yê xirab ji nava xwe derxin».†

PIRSA DE'W-DOZÊN NAVA BAWERMENDAN

6 ¹ Gelo eva halê kirinê ye? Ku çaxê nava yekî ji we û birê wîda de'w-doz pêşda tê, ew wê yekê turuş dike û li ber nep'akan dide safîkirinê, lê ne ku li ber pîrozan. ² Çima hûn nizanin, ku *merivên Xwedêye* pîroz wê dîwana dinyayê bikin? Û heger bi destê we wê dîwana dinyayê bê kirinê, gelo hûn nikarin van pîrsên sivîk jî safî bikin? ³ Çima hûn nizanin, ku emê dîwana milyak'etan jî bikin? Îdî k' u dimîne dîwana pîrsên vê dinyayê nekin? ⁴ Awa heger nava weda pîrsên vê dinyayê safîkirinê hebin, hûn çawa dikarin hakimîyê bidine destê yên usa, ku ji alîyê civînêda ne t' u tişt in? ⁵ Ez vê yekê dibêjim, ku hûn şerm bikin! Gelo nava weda yekî serwaxt t' une, ku bikaribe nava biratîyêda serederîyê derxe? ⁶ Lê bira birêr'a dik'evê de'wê, ew jî li ber nebaweran!

⁷ Bi rastî we vê yekêda lap daye der, ku hûn hev'r'a dik'evine dergehê dîwanê. Gelo hê ne qenc e, ku hûn bêne neheqkirinê? Gelo hê ne qenc e, ku hûn bêne şêlandinê? ⁸ Lê hûn neheqîyê dikin û dişêlînin, ew jî *hindava* biranda! ⁹ Çima hûn nizanin, ku yên neheq wê P'adşatîya Xwedê war nebin? Nexapin! Ne bênamûs, ne p'ûtp'arêz, ne zinêk'ar, ne qone, ne mêrzan, ¹⁰ ne diz, ne timak'ar, ne yên pey îçkê, ne xeybkir, ne jî t'alank'ar P'adşatîya Xwedê wê war nebe. ¹¹ Û ji we hinek usa bûn. Lê hûn ji gunehan hatine şuştinê, hatine pîrozkirinê, rast hatine hesabê, bi navê Xudan Îsa Mesîh û bi Ruhê Xwedêyê me.

BIRA QALIBÊN WE BONA XWEDÊ BIN

¹² Îzina min li her tiştî heye, lê her tişt ne kêrhatî ye. Îzina min li her tiştî heye, lê ez gerekê bin hikumê t' u tiştîda nebin. ¹³ *Dibêjin*: «Xwarin bona zik e, zik jî bona xwarinê», lê Xwedê her duyan jî wê unda ke. Qalib ne bona qavîyê ye, lê bona *xizmetîya* Xudan e, Xudan jî bona qalib *xem dike*. ¹⁴ Û Xwedêyê ku Xudan ji mirinê zêndî kir, wê me jî ji mirinê zêndî ke, bi qewata xwe. ¹⁵ Çima hûn nizanin, ku qalibên we endemên Mesîh in? Awa ez endemên Mesîh jê hildim û bikim endemên ya qav? T' u car! ¹⁶ Yan hûn nizanin, ku yê nêzikî ya qav dibe, wêr'a

* 5:13 «Lê hûn dîwana yên civînêda bikin» -ev hevok ji rêza 12-a cîguhastî li rêza 13-a bûye, ku fikira gotinê zelal be.

† 5:13 Qanûna Ducarî 17:7; 19:19.

dibe bedenek? çawa nivîsar dibêje: «Her du wê bibine bedenek».* ¹⁷ Lê yê nêzîkî Xudan dibe, wîr'a dibe ruhek. ¹⁸ Ji qavîyê birevin! Hemû gunehên mayîne ku meriv dike, ji qalib der e, lê ewê ku qavîyê dike, miqabilî qalibê xwe guneh dike. ¹⁹ Çima hûn nizanin, ku qalibên we p'aristxana Ruhê Pîroz in, ku nava weda ye, yê ku we ji Xwedê stand? Hûn ne xweyê serê xwe ne. ²⁰ Hûn bi qîmet hatine k'ir'înê. Ji ber vê yekê bikin ku hûn bi qalibê xwe şikirîyê bidine Xwedê.

PIRSÊN HAL-ZEWACÊ

7 ¹ Lê niha jî li ser wan pirsên ku we minr'a nivîsîn: «Qenc e ku mêr nêzîkî jinê nebe»? ² Lê ku pêşîya qavîyê bê girtinê, bira her mêr jina wî hebe û her jin jî mêrê wê. ³ Mêr bira deynê jinê bidê, jin jî deynê mêr. ⁴ Jin ne xweya qalibê xwe ye, lê mêr, usa jî mêr ne xweyê qalibê xwe ye, lê jin. ⁵ Ji hevdu na-na nekin, pêştirî wê dema ku hûn bi hev'r'a bona demekê t'ifaq qirar dikin ku nava duakirinêda[†] bin, lê dîsa werine cem hev, ku Şeytan we necêribîne, ji dest bêt'awîya we. ⁶ Ez vê yekê dihêlime ser rezedilîya we, lê ne ku ferman didim. ⁷ Rast e, min dixast ku hemû meriv mîna min bûna, lê her yekî'r'a dayîneke ji Xwedê heye, yek aha ye, yê din jî usa ye.

⁸ Lê yên bêy jin û jinebîyanr'a ez dibêjim: Qenc e ku ew mîna min bimînin. ⁹ Lê heger xwe zeft nakin, bira bizewicin yan mêr kin, çimkî qenc e ku ew bizewicin û mêr kin, ne ku xweda bişewtin.

¹⁰ Lê yên zewicî û mêrkirî'r'a, ne ku ez fermanê didim, lê Xudan: Bira jin ji mêr neqete, ¹¹ lê heger biqete jî, bira mêr neke yan jî mêrê xwer'a li hev bê. Û bira mêr jî jina xwe ber'nede.

¹² Lê yên mayînr'a ez dibêjim, ne ku Xudan: Heger jina birakî nebawer be û ew jin bixaze t'evî wî bimîne, bira wê ber'nede. ¹³ Û heger jineke mêrê wê nebawer be û bixaze t'evî wê bimîne, bira ji wî neqete. ¹⁴ Çimkî mêrê nebawer bi jina bawermend helal dibe û jina nebawer jî bi mêrê bawermend. Heger usa nebûya, lawên weyê heram bûna, lê niha helal in. ¹⁵ Lê heger nebawer biqete, bira biqete. Xûşk yan bira vê derecêda aza ye. Belê, Xwedê gazî we haştîyê kir. ¹⁶ Tu çi zanî jinikê, belkî tuê mêrê xwe bidî jîyînê? yan jî tu çi zanî mêro, belkî tuê jina xwe bidî jîyînê?

¹⁷ Wekî din ez dibêjim: Xudan çawa p'ara her kesî da û çawa Xwedê gazî her kesî kir, bira weke wê yekê jî bijî. Ev e t'emîya ku ez didime hemû civînan. ¹⁸ Heger yekî ku sinetbûyî hate gazîkirinê, bira sinetîya xwe bêhurmet neke. Heger yekî ku nesinetbûyî hate gazîkirinê, bira sinet nebe. ¹⁹ Ne sinetbûn tiştê e û ne jî nesinetbûn, lê serî pêkanîna t'emîyên Xwedê ye. ²⁰ K'ê çi halîda hate gazîkirinê, bira wê yekêda jî bimîne. ²¹ Xulam bûyî, çaxê hatî gazîkirinê? Xem neke. Lê heger dikarî aza bî, wê mecalê ji destê xwe neke. ²² Çimkî ew xulamê ku hate gazîkirinê, ku bibe p'ara Xudan, ew ji xizmetîya Xudan aza ye, usa jî ewê ku aza ye, çaxê hate gazîkirinê, ew xulamê Mesîh e. ²³ Hûn bi qîmet hatine k'ir'înê, nebine xulamên merivan. ²⁴ Birano, k'ê çi halîda hate gazîkirinê, bira wê yekêda jî li ber Xwedê bimîne.

PIRSÊN BONA ZERÎYAN Û CAHILAN

²⁵ Lê niha ji bik'iran çi dik'eve: min derheqa wanda ferman ji Xudan nestandye, lê t'enê ez fikira xwe dibêjim, çawa yekî k'erema Xudan standî, yê ku hindava wîda amin e. ²⁶ Ez bona tengasîya niha aha rê têra dibînim, ku meriv çi derecêda ye, bira usa jî bimîne. ²⁷ Jinêva girêdayî yî? Neke ku jê biqetî. Ji jinêda qetyayî? Pey zewacê nek'eve. ²⁸ Lê heger bizewicî, guneh nakî û heger qîz mêr ke, guneh nake. Lê yên usa wê rastî tengasîyan bèn, ez dixazim we ji wê yekê dûr xim.

²⁹ Ez vê yekê dibêjim, birano: Waxt kin e. Ji vir hada ewê ku jina wî heye bira usa be, çawa ku bêy jin, ³⁰ ewê digirî, çawa ku nagirî, ewê şa dibe, çawa ku şa nabe, ewê dik'ir'e, çawa ne xweyê wan tiştan be ³¹ û ewê k'arê dinyayêva mijûl dibe, çawa yê pêva mijûl nabe, çimkî ev dinya k'ifş derbaz dibe. ³² Lê ez dixazim ku hûn ji xeman aza bin. Yê nezewicî k'arên Xudanva giro ye, ku çawa li Xudan xaş bê. ³³ Lê yê zewicî xemên dinyayêva giro ye, ku çawa li jina xwe xaş bê, ³⁴ ew k'etye nava du keviran. Jina bêy mêr yan qîz k'arên Xudanva giro ye. Meremê wê ew e, ku ew ruh û qalibê xweda pîroz be, lê ya mêrkirî xemên dinyayêva giro ye, ku çawa bike li mêrê xwe xaş bê. ³⁵ Ez van tiştan bona qazınca we dibêjim, ne ku bar didime ser milên we, lê dixazim ku hûn bi t'erbet û bi hub û rez k'arên Xudanva giro bin. ³⁶ Lê heger yek şerm dike, ku bik'ir e û waxtê zewaca wî derbaz bûye, temê wî jî wê yekê heye, ku gerekê bizewice, bira usa bike, çawa dixaze, guneh nake, bira bizewice. ³⁷ Lê ewê ku fikira xweda ser qirara xwe ye, li ser wî giranî t'une~ ser temê xwe dikare, dilê xweda qirar kirye ku bik'ir bimîne, ew tiştêkî qenc dike. ³⁸ Awa yê dizewice, qenc dike, lê yê ku bik'ir dimîne, ew hê qenc dike.

³⁹ Jina ku heta mêrê wê zêndî ye, ew mêrê xweva girêdayî ye, lê heger mêrê wê bimire, ew aza ye, k'êr'a ku bixaze dikare mêr ke, lê t'enê bira bi qirara Xudan be. ⁴⁰ Lê ewê hê xwezî be, ku usa bimîne. Û bi fikira min, Ruhê Xwedê nava minda heye.

PIRSA QURBANÊN P'ÛTANRA DAYÎ

8 ¹ Niha jî li ser qurbanên p'ûtan: Femdarî ye, ku zanebûna me her kesî jî heye. Zanebûn mêriv babax dike, lê hizkirin şên dike. ² Heger yek difikire, ku ew tiştêkî zane, bi rastî ew wî tiştî hê usa nizane, çawa lazim e bizanibe. ³ Lê heger yek Xwedê hiz dike, wî ji aliyê wîda zanebûn standye.

* 6:16 Destpêbûn 2:24.

† 7:5 Hinek destnivîsarên paşwaxtîyêda aha ye: «û rojîyêda bin.»

⁴ Awa derheqa wan qurbanên p'ûtanda *bêjim*, ku meriv dixwin: Em zanin ku p'ût bi xwe p'ûç in û Xwedêkî din t'une, pêştîrî yekî. ⁵ Heger li erdê û ezmên xwedê navkirî bin jî, çawa gelek xwedê û xudanên *navkirî* hene jî, ⁶ lê bona me t'enê Xwedêk heye~ Bav, Efirandarê her tiştî û em jî hene bona wî û t'enê Xudanek heye~ Îsa Mesîh, bi k'îjanî her tişt xuliqî ne û em jî hene bona wî.

⁷ Lê ev zanebûn cem her kesî t'une. heta niha hê dilê hinekan li pey p'ûtp'arêzîyê ye, ku çaxê wî goştî dixwin, hesab dikin çawa qurbanên p'ûtan û xwe diherimînin, çimkî îsafa xweye sistda fikaran dikin. ⁸ Lê xwarin me li ber Xwedê nade sekinandinê. Heger em bixwin, tişteki zêde nakin û heger nexwin, tişteki jî kê nakin. ⁹ Lê miqatî xwe bin, nebe ku azayîya we bibe kevir, li ber nigên yên sist. ¹⁰ Mesele, merivekî ku îsafa xweye sistda fikaran dike, heger te bibîne, ku tu~ yekî xweyzanebûn p'aristxana p'ûtda li sifrê rûniştî yî, ê ne ew kirê te wê dil bide wî, ku ew jî ji qurbanên p'ûtanr'a dayî bixwe? ¹¹ Û ji dest wê zanebûna te, birê teyî sist, ku bona wî Mesîh mir, wê unda be. ¹² Û aha, tu ku neheqîyê li birayên xwe dikî û îsafa wane sist birîndar dikî, li ber Mesîh neheqîyê dikî. ¹³ Awa heger xwarin dibe kevirê ber p'îyê birê min, gerekê ez îdî qet goşt nexwim, ku birê xwe p'îşk nekim.

DESTÛR Û MECALÊN ŞANDÛYAN

9 ¹ Ê ne ez aza me? Ê ne ez şandî me? Ê ne min Xudanê me Îsa bi ç'evên xwe dît? Ê ne hûn bi emekê min bûne p'ara Xudan? ² Heger ez ne şandîyê hinekên mayîn bim, lê hema bêşik şandîyê we me! Çimkî mora şandîtîya min hûn in, ku bûne p'ara Xudan.

³ Caba min bona yên ku dixazin ji min gilî derxin ev e: ⁴ Gelo îzina me t'une, ku em ji ber k'arê xweva bixwin û vexwin? ⁵ Gelo îzina me t'une, ku em k'ulfeteke xûşk *berdestî* xwer'a bigerînin, çawa şandîyên din, birayên Xudan û Petrûs dikin. ⁶ Yan t'enê ez û Barnabas gerekê bixebitin û xwe xwey kin? ⁷ K'îjan esker e, ku ji k'îsê xwe eskertîyê dike? K'î bax datîne û ji berê wê naxwe, yanê jî yê ber pêz ji şîrê pêz venaxwe? ⁸ Ez van tiştan bi *fikira* merivayî nabêjim. Ê ne Qanûn jî wê yekê dibêje? ⁹ Belê Qanûna Mûsada nivîsar e: «Devê gayê bêderêda dixebite girênedê». * Gelo xema Xwedê t'enê bona ga ye? ¹⁰ Yan ew bona me dibêje? Belê, eva yeka bona me hate nivîsarê, ku yê erdê radike, gerekê bi guman rake û yê genim dihêre, gerekê wê gumanê be, ku wê k'eda xwe bixwe jî. ¹¹ Heger me nava wêda tiştên ruhanî çandin, gelo tişteki mezin e, ku ji we hebûka bona qalib hildin? ¹² Heger îzina hinekên din heye qazincê ji we bibînin, ê ne ya me hê zêde heye? Lê me ev îzin pêk neanî. Belê, me li her tiştî sebir kir, ku t'u tişt nebine pêşbir'ê Mizgînîya Mesîh. ¹³ Yan hûn nizanin, ku ewên p'aristxanêda dixebitin ji p'aristxanê jî dixwin? Û ewên ku xizmetk'arîya qurbangehê dikin, ji qurbangehê jî p'ara xwe distînin. ¹⁴ Usa jî Xudan destûr da, ku yên Mizgînîyê dannasîn dikin, ji Mizgînîyê bijîn.

¹⁵ Lê min ji van îzanan t'u yek pêk neanî, ne jî niha bona wê yekê dinivîsim, ku van *îzanan* pêk bînim. Hê baş e ez bimirim, ne ku yek rûspîtîya min hêç ke. ¹⁶ Belê, heger Mizgînîyê dannasîn kim, nikarim pesinê xwe bidim, çimkî ev deynê stûyê min e. Wey li min heger Mizgînîyê dannasîn nekim! ¹⁷ Û heger eva yeka ji xastina dilê xwe min bikira, hingê maşê minê hebûya, lê eva yeka ne ji xastina dilê min e, çimkî eva xizmetîk e, ku *ji Xwedêda* li min hatye spartinê. ¹⁸ Awa îdî maşê min çi ye? *Ev e*, ku ez Mizgînîyê li dannasîna xweda bêy maş bidim û îzina xweye mizgînîdayîne bi cûrekî ne baş pêk neynim.

¹⁹ Rast e ez ji her kesî aza me, lê dîsa ez xwe dikime xulamê hemûyan, ku hê gelek qazinc kim. ²⁰ Bona cihûyan, dibime mîna cihûyan, ku cihûyan qazinc kim. Bona yên bin Qanûnêda, dibime mîna yên bin Qanûnê, ku yên bin Qanûnê qazinc kim, (lê ne ku ez bin Qanûnêda me). ²¹ Bona yên bêy Qanûn, dibime mîna yên bêy Qanûn, ku yên bêy Qanûn jî qazinc kim, (lê ne ku ez bêy Qanûn im, lê ez bin qanûna Mesîhda me). ²² Bona yên sist dibime mîna wan, ku yên sist qazinc kim. Bona hemûyan ez dik'evime halê her kesî, ku her derecanda bikaribim hinekan rizgar kim. ²³ Van hemû tiştan ez îdî bona Mizgînîyê dikim, ku bibime hevalp'arê *dua-dirozgên* ji wê.

²⁴ Gelo hûn nizanin, ku ewên lecmeydanêda, hemû jî direvin, lê t'enê yek lecxelatê distîne? Hûn usa birevin, ku bistînin. ²⁵ Ewên dik'evine lecê, xwe hînî gelek tiştan dikin, ku wî t'acguliya ku diç'ilmise bistînin, lê kirina me bona *t'acguliya* heta-ha-tê ye. ²⁶ Ji boy wê yekê ez mîna yekî bêy merem narevim, ne jî bi k'ulman diçime bê. ²⁷ Lê ez zorê qalibê xwe dikim û wê zeft dikim, ku nebe ez xelqêr'a dannasîn kim, lê kêmasîya min hebe.

XWEDÊ NECÊRÎBÎNIN

10 ¹ Naxazim, birano, ku hûn nizanibin ku kal-bavên me hemû jî bin sîya e'wrda bûn û hemû jî Be'ra Sorr'a derbaz bûn. ² Hemû jî bi *serk'arîya* Mûsa e'wr û be'rêda hatine nixamtinê. ³ Hemûyan jî hema ew xwarina ruhanî xwar ⁴ û hemûyan jî hema ew vexwarina ruhanî vexwar, çimkî ji wî qeyayê ruhanî vedixwarin, yê ku wanr'a diçû û ew qeya Mesîh bû. ⁵ Lê Xwedê gelekên ji wan begem nekirin, lema cinyazên wan ber'îyêda her deran k'etî man.

⁶ Îdî ew tişt bona me bûne mesele, ku em havîjîya xwe tiştên xirab neynin, çawa wan dilhavijî kir. ⁷ Ne jî bibin p'ûtp'arêz, çawa ji wana hinek bûn, bona k'îjanan nivîsar e: «Cimet rûnişt xwar, vexwar û rabûn hevr'a lîstin». ⁸ Em qavîyê nekin, çawa ji wana hinekan kir û rojekêda bîst sê hezar meriv k'etin. ⁹ Mesîh jî necêribînin, çawa ji wan hinekan cêriband û ji me'ran hatine gesticinê mirin. ¹⁰ Û bîna xwe teng nekin, çawa ji wan hinekan bîntengî

* 9:9 Qanûna Ducarî 25:4.

† 10:7 Derk'etin 32:6.

kirin û bi destê milyak'etê mirinê hatine qir'ê. ¹¹ Ev her tişt çawa mesele dihatine serê wan, lê bona me, ku em axirîya van dewrananda dijîn, çawa şîret hatine nivîsarê. ¹² Awa k'î difikire ku ew qedîm sekinî ye, bira haş ji xwe hebe, ku nek'êve. ¹³ Û ji *gewata* mêriv der t'u cêribandin nehatine serê we, lê Xwedê amin e, ku wê nahêle hûn ji *gewata* xwe der bêne cêribandinê. Cêribandinêda ewê delîlekê jî bike, ku hûn bikaribin teyax kin.

¹⁴ Awa delalîyên min, ji p'ûtp'aristîyê birevin. ¹⁵ Ez çawa t'evî yê serwaxt xeber didim. Hûn xwexa bidine ber hesaban, ez çi dibêjim. ¹⁶ Çaxê em bi wê k'asa *Şîva Xudane* dua-dirozgê şikirîyê didin, ê ne ew t'evgirêdana xûna Mesîh e? Ew nanê ku em ker dikin, ê ne ew t'evgirêdana qalibê Mesîh e? ¹⁷ Nanê me yek e, lema em hemû hevr'a qalibek in, çimkî lezeta me hemûyan jî ji wî nanî ye.

¹⁸ Binihêrin, Îsraêla bi bedenî, yê ku qurbanan dixwin, t'evî wê p'ara qurbangê nabin? ¹⁹ Ez çi bêjim? Gelo p'ût ji xwe tiştê e yan qurbanên p'ûtanr'a têne dayîne berga tiştê digirin? ²⁰ T'u car! Lê gotina min ev e, ku ew tiştên hêtanos qurban dikin, cinanr'a dikin, ne ku Xwedêr'a. Ez naxazim ku t'evgirêdana we cinanr'a hebe. ²¹ Hûn nikarin him ji k'asa Xudan vexwin, him jî ji k'asa cinan. Hûn nikarin him ji sifra Xudan bixwin, him jî ji sifra cinan. ²² Gelo, em usa bikin ku xîreta Xudan hilnede? çima em ji wî zortir in?

²³ Dibêjin: «Her tiştîda aza me», lê her tişt ne qazinc e. «Her tiştîda aza me», lê her tişt şên nake. ²⁴ Nebe ku yek qazınca xwe biger'e, lê ya hevalê xwe na.

²⁵ Çi ku qesabxanêda tê firotanê bixwin, venenihêrin, bona fikara îsafê *dibêjim*. ²⁶ Çawa nivîsar e: «Dinya bi xezna xweye p'ir'va ya Xudan e». ²⁷ Heger ji nebaweran yek we t'eglîf ke û hûn bixazin her'in, çi bidine ber we bêy fikara îsafê bixwin, *venenihêrin*. ²⁸ Lê ku yek wer'a bêje: «Eva qurban e», îdî nexwin, bona fikara îsafa ewî ku hûn pê hesandin. ²⁹ Gotina min ne bona fikara îsafa we ye, lê ya hevalê we. Lê gelo çima gerekê bona fikara îsafa yekî din azayîya min bê lomekirinê? ³⁰ Heger ez şikirîyê didime Xwedê û dixwim, çima bona wê yekê xeyba min dikin, ku ez şikirîya xwe Xwedê tînim?

³¹ Awa heger hûn bixwin, vexwin yan çi k'arê ku bikin jî, her tiştî bona şikirîya *navê* Xwedê bikin. ³² Ne nig bidine ber cihûyan, ne ber necihûyan, ne jî ber civîna Xwedê, ³³ çawa ez jî ji her alîyanva li hemûyan xaş tîm û qazınca xwe nager'im, lê ya gelek, ku ew rizgar bin.

SERÊ JINÊ MÊR E, SERÊ MÊR MESÎH Û SERÊ MESÎH JÎ XWEDÊ

11 ¹ Awa hûn mîna min bin, çawa ez jî mîna Mesîh im. ² Ez p'ayê we didim, ku hûn her derecanda min bîr tînin û ew t'emîyên ku min gîhandine we hûn pêk tînin. ³ Lê ez dixazim hûn bizanibin ku serê her mêrî Mesîh e, serê jinê mêr e û serê Mesîh jî Xwedê. ⁴ Her mêrê ku serê xwe wergirtî dua yan p'êxembertîyê dike, ew serê xwe bêhurmet dike. ⁵ Û her jina ku serê xwe newergirtî dua yan p'êxembertîyê dike, ew serê xwe bêhurmet dike. Ew dibe mîna yeke p'or'kur'. ⁶ Awa heger jin serê xwe wernegire, bira p'or'ê xwe jî bibir'e. Lê heger jinêr'a şerm e, ku p'or'ê xwe bibir'e yan kur'ke, usa ye bira serê xwe wergire. ⁷ Ne cayîz e, ku mêr serê xwe wergire, çimkî ew nîgar û rûmeta Xwedê ye, lê jin rûmeta mêr e. ⁸ (Çimkî ne ku mêr ji jinê ye, lê jin ji mêr e ⁹ û ne ku mêr bona jinê hate xuliqandinê, lê jin bona mêr.) ¹⁰ Ji ber vê yekê gerekê *nîşana* destûrê serê jinê be, ji boy milyak'etan. ¹¹ Lê qirara Xudanda ne jin bêy mêr dibe, ne jî mêr bêy jinê. ¹² Çimkî çawa jin ji mêr e, usa jî mêr ji jinê dibe, lê hemû jî ji Xwedê ne. ¹³ Hûn xwexa bidine ber hesab, gelo jinêr'a cayîz e, ku serê xwe newergirtî ber Xwedê dua bike? ¹⁴ Ê ne t'ebîyet jî we hûn dike, ku rewşa mêr bi p'or'ê dirêj dik'êve? ¹⁵ Lê rewşa jinê p'or'ê dirêj e, çimkî ew p'or'jêr'a çawa wergir hatye dayîne. ¹⁶ Lê heger yek vê yekêr'a bixaze bik'êve de'wê, xeysetê meyî din t'une û ne jî ya civînên Xwedê.

ŞÎVA XUDAN

(Metta 26:26-29; Marqos 14:22-25; Lûqa 22:14-20)

¹⁷ Lê vê pirsêda ez p'ayê we nadim, çimkî çaxê hûn dicivin, ew ne ku dibe qazınca we, lê zîyana we. ¹⁸ Berî her tiştî, ez dibihêm, ku çaxê hûn li civînêda dicivin, nava weda dutîretî heye û kê-m-zêde ez bawer im jî. ¹⁹ Belê, wê nava weda dutîretî çê be, ku yê nava wedaye bijare k'ifş bin. ²⁰ Awa hûn ku li cîkî dicivin, ev xwarina ku hûn dixwin, ew nabe *Şîva Xudan*, ²¹ çimkî gava ji we her kes dixwe, lezo-bezo ser *Şîvê* dik'êve. Yek birçî dimîne û yê din k'êfxaş dibe. ²² Çima malên we t'unene, ku hûn wanda bixwin û vexwin? yan belkî hûn civîna Xwedê bêhurmet dikin û desttengan didine şermê? Ez wer'a çi bêjim? Bona vê kirina we p'ayê we bidim? Wê yekê nikarim!

²³ Min eva yeka ji Xudan stand û da we, ku Xudan Îsa wê şeva ku hate nemamkirinê, nan hilda ²⁴ şikirî da, ker kir û got: «Eva bedena min e, ku bona we tê dayîne: vê yekê bona bîranîna min bikin». ²⁵ Usa jî pey *Şîvêr'a* k'as hilda û got: «Eva k'asa peymanî nû ye, pê xûna min girêdayî. Vê yekê bona bîranîna min bikin, çi cara ku hûn jê vexwin». ²⁶ Her car, çaxê hûn vî nanî bixwin û jî wê k'asê vexwin, li ser mirina Xudan xeber din, heta ku ew bê.

²⁷ Awa k'î nanê Xudan bi nelayîqî bixwe yan k'asa wî vexwe, wê bibe deyndarê beden û xûna wî. ²⁸ Lema bira meriv pêşîyê xwe binihêre û paşê ji wî nanî bixwe û jî wê k'asê vexwe. ²⁹ Çimkî k'î bixwe û vexwe û femîna bedena Xudan nizanibe, ew dîwana xwe dixwe û vedixwe. ³⁰ Lema jî nava weda gelek nexaş û xweyzede hene û hinek jî mirine. ³¹ Lê heger me dîwana xwe bikira, dîwana meyê nehata kirinê, ³² lê dîwana me çaxê bibe, em ji

* 10:26 Zebûr 24:1.

Xudan têne şîretkirinê, ku dîwana me t'evî dinyayê nebe.

³³ Awa birayên min, çaxê bona Şîva Xudan hûn bicivin, hîvîya hevdu bisekinin. ³⁴ Lê heger yek birçî ye, bira mala xweda bixwe, ku nebe, çaxê hûn bicivin, dîwanê ser xweda bînin. Bona pirsên mayîn jî çaxê bêm ezê hingê safî kim.

P'ÊŞKÊŞÊN RUHÊ PÎROZ NAVA ENDEMÊN BEDENEKÊDA

12 ¹ Niha ez naxazim, birano, ku hûn derheqa p'êşkêşên ruhanîda nezan bin. ² Hûn zanin, ku çaxê hûn hêtanos bûn, pey p'ûtên ker'e-lal usa diçûn, çawa dihatine birinê. ³ Lema ez wer'a dibêjim: t'u kes t'une ku bi Ruhê Xwedê xeber de û bêje: «Nifir li Îsa ye». Û t'u kes jî nikare bêje: «Îsa Xudan e», heger ne bi *hikumê* Ruhê Pîroz be.

⁴ Awa cûr'e-cûr'e p'êşkêşên ruhanî hene, lê hema dayîna wî Ruhî ne, ⁵ cûr'e-cûr'e xizmetî hene, lê Xudan hema wan dide, ⁶ usa jî nava *meda* karebûnên cûr'e-cûr'e hene, lê hema ji wî Xwedêyî ne, ku van dayînan da karebûnê datîne nava her kesî. ⁷ Lê nîşangeha Ruhe her kesî'a bona qazınca hemûyan e. ⁸ Yekî'r'a ji Ruh xebra serwaxîyê tê dayînê, yê dinr'a xebra zanebûnê, hema ji wî Ruhî, ⁹ yekî dinr'a bawerî, hema ji wî Ruhî, yekî dinr'a jî p'êşkêşên hekîmtîyê, hema ji wî Ruhî, ¹⁰ yekî dinr'a *daye*, ku k'iryametana bike, yekî dinr'a jî p'êxembertî, yekî dinr'a femîna ku ruhan ji hev derxe, yekî dinr'a zimanên başqe-başqe, yekî'r'a jî şirovekirina wan zimanan. ¹¹ Ev hemû jî hema ew Ruh xwexa hikum dike û başqe-başqe her kesî'a p'arevedîke, çawa ew dixaze.

¹² Çawa beden yek e û gelek endemên wê hene, lê dîsa ew hemû hev'r'a bedenek in, usa jî Mesîh e. ¹³ Rast usa em hemû bi Ruhekî hatine nixamtinê, ku bibine bedenek, him cihû him jî *bawermendên jî* hêtanosan, him xulam him aza û ewî em hemû jî ji wî Ruhî dane vexwarinê.

¹⁴ Belê, beden ne t'enê ji endemekê ye, lê ji gelek. ¹⁵ Heger nig bêje: «Ez ne ji bedenê me, çimkî ne dest im», gelo eva manî ye, ku ew ne ji bedenê be? ¹⁶ Û heger guh bêje: «Ez ne ji bedenê me, çimkî ne ç'ev im», gelo eva manî ye, ku ew ne ji bedenê be? ¹⁷ Heger t'emamîya bedenê ç'ev bûya, lê *endema* bihîstinê wê li k'u bûya? Heger hemû beden guh bûya, lê *endema* bînhildanê wê li k'u bûya? ¹⁸ Lê rast Xwedê ew endem yeko-yeko bedenekêda cî kirin, çawa wî xwast. ¹⁹ Heger hemû endemek bûna, bedenê li k'u bûya? ²⁰ Lê bi rastî, niha endem gelek in, lê beden yek e. ²¹ Ç'ev nikare bêje dest: «Tu ne lazimî min î!» Û ne jî serî niganra dikare bêje: «Hûn ne lazimî min in!» ²² Lê serda ew endemên bedenêye ku sist k'ifş dibin, ew hê ferz in ²³ û ew endemên bedenêye ku bêhurmet têne hesabê em hurmeta wan hê zanin û yên e'ybe nava wêda, em hê bi t'erbet dinixêmin, ²⁴ lê endemên meye bête'yb ne hewcê wê yekê ne. Lê Xwedê beden hevva kir, ku endema bêhurmet hê zêde hurmetê bistîne, ²⁵ ku dutîretî nek'eve nava bedenê, lê hemû endem li ser hevdu şewat bin. ²⁶ Lema, çaxê endemek dêşe, hemû endem hev'r'a dêşin, lê çaxê pesinê endemekê tê dayînê, hemû endem wêra k'êfxaş dibin.

²⁷ Awa hûn bedena Mesîh in û ji we her kes endemeke bedena wî ye. ²⁸ Û Xwedê pêşîyê civînêda hinek kirine şandî, ya dudana p'êxember, ya sisyan dersdar, paşê yên k'iryametê dikan, paşê xweyp'êşkêşên hekîmtîyê, k'omekdarîyê, serk'arîkirinê û zimanên xerîb. ²⁹ Çima hemû şandî ne? çima hemû p'êxember in? çima hemû dersdar in? çima hemû k'iryametana dikan? ³⁰ Çima hemû xweyp'êşkêşên hekîmtîyê ne? çima hemû bi zimanan xeber didin? çima hemû zimanan şirovedikin? ³¹ De hûn heyra p'êşkêşên hê mezinda bin û ezê rêke here baş jî nîşanî we bikim.

HIZKIRIN

13 ¹ Heger ez bi zimanên merivan yan milyak'etan xeber dim, lê hizkirina min t'unebe, *hingê* ezê bibime mîna *derdana* sifire ku dike şingîn yan zengilê ku dike zingîn. ² Heger p'êşkêşa p'êxembertîyê minr'a hebe û hemû sur'an û zanebûnê fem bikim û heger bawerîya min jî haqas be, ku heta ç'îya jî ji cî biguhêzim, lê hizkirina min t'unebe, ez ne t'u tişt im. ³ Û heger hebûka xwe hemû belayî *k'esîban* kim û bedena xwe jî bidime şewitandinê, lê hizkirina min t'unebe, ezê t'u tiştî qazinc nekim.

⁴ Hizkirin sebîrdîrêj e, şîrin e, hizkirin hevsûdîyê nake, hizkirin k'ubar nabe, babax nabe, ⁵ ne bêp'ergal e, ya xwe nagere, zû hêrs nak'eve, k'înê najo, ⁶ dilê xwe li neheqîyê şa nake, lê rastîyêra şa dibe. ⁷ *Hindava* her kesîda berbîhêr e, her dem bawer dike, her dem xweyguman e, li ber her kesî dadixe.

⁸ Hizkirin qet xîlaz nabe. Heger p'êxembertî hebin, wê hêç bin, heger zimanên *xerîb* hebin, wê *îdî* xeber nedin, heger zanebûn hebe, wê derbaz be her'e. ⁹ Belê, em ji gelekî hindikî zanin û ji gelekî hindikî p'êxembertîyê dikan. ¹⁰ Lê çaxê k'amiltî bê, hingê nek'amiltî wê derbaz be her'e.

¹¹ Çaxê ez zar'ok bûm, min mîna zar'okê xeber dida, mîna zar'okê difikirîm, mîna zar'okê dida ber hesêb. Çaxê mezin bûm, ew tiştên zar'otîyê min ji xwe dûr xistin. ¹² Niha em çawa neynikêda tişteki nezelal dibînin, lê hingê emê rû bi rû bibînin. Niha ez ji gelekî hindikî zanim, lê hingê ezê t'am bizanibim, çawa hatime naskirinê. ¹³ Awa niha ev sê tişt dimînin: Bawerî, guman û hizkirin. Lê hizkirin ser wanr'a ye.

HEYRA P'ÊŞKÊŞÊN RUHANÎDA BIN

14 ¹ Xwe hizkirinê bigirin û heyra p'êşkêşên ruhanîda bin, hê zêde p'êxembertîkirinê. ² Ewê ku bi zimanê *xerîb* xeber dide, ew ne ku mêrivr'a xeber dide, lê Xwedêr'a, çimkî t'u kes fem nake. Ew bi *dayîna* Ruh sur'an dibêje. ³ Lê yê p'êxembertîyê dike, ew merivanr'a xeber dide û bawerîya wan şên dike~ bînê dide ber wan û ber dilê

wanda tê. ⁴ Yê bi zimanê *xerîb* xeber dide, t'enê bawerîya xwe şên dike, lê yê p'êxembertîyê dike, t'evayîya civînê şên dike. ⁵ Ez dixazim ku hûn hemû jî bi zimanan xeber din, lê hê dixazim ku hûn p'êxembertîyê bikin, çimkî *k'arê* yê p'êxembertîyê dike, ji *k'arê* yê bi zimanan xeber dide çêtir e, pêştirî wî waxtê ku *ziman* tê şirovekirinê, ku civîn bê şênkirinê.

⁶ Awa birano, heger ez bême cem we û bi zimanan xeber dim, ezê t'u qazincê nedime we, heger ez aşkeretîyê yan zanebûnê yan p'êxembertîyê yan hînkirinê wer'a neynim? ⁷ Hacetên nebînbere ku deng derdixin, mesele: bilûr be yan çeng be, heger dengê wan ne zelal be, wê çawa zanibin çi miqam tê lêxistinê? ⁸ Yan jî, heger bor'î dengêkî nenas derxe, k'ê wê bona şer' hazirîya xwe bibîne? ⁹ Usa hûn jî, heger bi ziman xebereke femdarî nebêjin, wê çawa bizanibin hûn çi dibêjin? Gotina we wê bibe mîna *çawa ku hewêr'a bêjî*. ¹⁰ Awa dinyayêda gelek cûr'e ziman hene, lê ji wana t'u yek jî ne bêy femîn e. ¹¹ Lê, heger ez zimanekî fem nakim, ez bona yê wî zimanî xeber dide *xerîb* im û yê xeber dide jî bona min *xerîb* e. ¹² Usa hûn jî, ku heyra *p'êşkêşên* ruhanîda ne, hê bikin ku wan p'êşkêşan bistînin, bi k'îjanan civîn şên dibe.

¹³ Ji ber vê yekê, ewê ku bi zimanê *xerîb* xeber dide, bira dua bike ku şiroveke jî. ¹⁴ Çimkî çaxê ez bi zimanê *xerîb* dua dikim, ew ruhê min dua dike, lê hişê minda t'u tişt rûnanê. ¹⁵ Ez çi bikim? Ezê him bi ruhê xwe dua bikim, him jî bi hişê xwe, him bi ruhê xwe bistirêm, him jî bi hişê xwe. ¹⁶ Heger tu bi ruhê xwe şikirîyê bidî, ewê ku mîna nezanan sekinî ye, wê çawa razîdarîya ter'a qayl be û bêje: «Amîn»? Ew qet fem nake jî, tu çi dibêjî. ¹⁷ Belê, tu baş razîbûnê didî, lê bawerîya yê din nayê şênkirinê.

¹⁸ Ez ji Xwedêyê xwe razî me, ku ji we hemûyan zefir bi zimanan xeber didim. ¹⁹ Lê civînêda hê dixazim pênc xeberên femdarî bêjim, ku hinekên din jî hîn bikim, ne ku bi hezaran xeberên *xerîb*.

²⁰ Birano, hişê xweda zar'ok nebin! Hindava xirabîyêda mîna zar'okan bin, lê hişê xweda gihîştî bin. ²¹ Qanûnêda nivîsar e: «Ezê bi zimanên *xerîb* û bi zarên *xerîban* vê cimêr'a xeber dim, lê dîsa ewê guhdarîya min nekin, Xudan dibêje». ²² Awa p'êşkêşa zimanên *xerîb* nîşanek e, lê ne ku bona bawermendan, lê bona nebaweran û p'êxembertî jî ne ku bona nebaweran e, lê bona bawermendan. ²³ Heger t'emamîya civînê pêva bicive û hemû jî zimanên *xerîb* xeber din, hingê hinekên nezan yan nebawer, ku bik'evine hindur, wê nebêjin: «Evana dîn bûne»? ²⁴ Lê heger hemû jî p'êxembertîyê bikin, hingê ku yekî nebawer yan nezan bik'eve hindur, wê ji hemû gotinên wan bê hilatinê û bê gunehk'arkirinê, ²⁵ sur'ên dilê wîda jî wê bêne derxistinê û ewê deverû li ber *hizûra* Xwedê bik'eve, wî bihebîne û bi dengê bilind bêje: «Rastî jî Xwedê nava weda ye»!

²⁶ Awa îdî, gelî birano? çaxê hûn dicivine cîkî, ji we her kesîr'a çi jî hebe~ stiran be, hînkirin be, aşkeretî be, ziman be, şirovekirina zimên be, bira hemû jî bona şênbûna civînê bin. ²⁷ Heger yek bi zimanê *xerîb* xeber dide, bira dudu bin yan here zef sisê, lê bira yek pey yekîr'a xeber de û yek jî şiroveke. ²⁸ Lê heger t'u kes t'une ku şiroveke, bira ew civînêda deng neke, t'enê ber xweda Xwedêr'a xeber de. ²⁹ Ê jî p'êxemberan jî bira dudu yan here zef sisê xeber din û yên din bira wê binihêrin. ³⁰ Lê heger li ber yekî jî nava yên rûniştî jî tişteke vebe, îdî bira yê pêşin dengê xwe bibir'e. ³¹ Çimkî hûn hemû jî, sirê-dorê dikarin p'êxembertîyê bikin, ku hemû jî hîn bin û bêne berdilîkirinê. ³² Ê ruhên p'êxemberan bin serk'arîya p'êxemberanda ne, ³³ çimkî Xwedê ne Xwedêyê bêp'ergalîyê ye, lê yê haşîyê û usa jî Xwedêyê pîrozan e, li her civînanada.

³⁴ Jinên we bira civînêda xeber nedin, çimkî bona wan fermana xeberdanê t'une, lê bira guhdar bin, çawa Qanûn jî dibêje. ³⁵ Lê heger ew tişteki dixazin bizanibin, bira malêda ji mêrên xwe bipirsîn, çimkî ne cayîz e, ku jin civînêda xeber de. ³⁶ Çima xebera Xwedê ji we derk'et? yan t'enê gihîşte we? ³⁷ Heger yek difikire, ku xwexa p'êxember e yan ruhanî ye, bira zanibe, ku çi min wer'a nivîsîn, ew t'emîya Xudan e. ³⁸ Lê heger yek nezan e *û naxaze hîn be*, bira usa jî bimîne.

³⁹ Awa birano, heyra p'êxembertîkirinêda bin û dengê yên bi zimanên *xerîb* xeber didin nebir'in. ⁴⁰ Lê bira her tişt bi t'erbetî û qeyde-qanûnî be.

ZÊNDÎBÛNA MESÎH Û YA BAWERMENDAN

15 ¹ Ez wê Mizgînîyê dixazim bîname bira we, birano, ya ku min wer'a dannasîn kir, we ew hilda û li ser wê jî hûn qedîm in. ² Bi wê jî hûn rizgar dibin, heger wê xebera ku min wer'a dannasîn kir, qewîn bigirin, lê heger na, bawerîya weyê p'ûç derê.

³ Ê berî her tiştî min ev yeka usa da we, çawa min stand, ku Mesîh bona gunehên me mir, li gora nivîsaran ⁴ û k'ete gor'ê, roja sisyan ew ji mirinê zêndî bû, li gora nivîsaran, ⁵ Petrûsva k'ifş bû, peyr'a her donzdeh şandîyanva. ⁶ Paşê carekêva ji pênîsidî zêdetir biranva k'ifş bû, ji wana gelek heta niha zêndî ne, lê hinek jî hênijî ne. ⁷ Paşê Aqûbva k'ifş bû, peyr'a hemû şandîyanva.

⁸ Pey hemûyanr'a minva k'ifş bû, çawa yekî beravîtîva. ⁹ Çimkî ez ji şandîyan yê herî paş im, ku ne layîq im şandî jî bême gotinê, çimkî min civîna Xwedê zêrand. ¹⁰ Lê ez çi jî heme, bi k'erema Xwedê me û k'erema wî, ku li ser min heye, p'ûç dernek'et. Lê serda, ez ji wan hemû şandîyan zêdetir xebitûm û ew ne ku ez bûm, lê k'erema Xwedê, ku li ser min heye. ¹¹ Awa heger ez bim yan ew bin, em hemû jî aha dannasîn dikin û aha jî we bawer kir.

¹² Awa heger em dannasîn dikin, ku Mesîh ji mirinê zêndî bûye, çawa ji we hinek dibêjin, «Zêndîbûna mirîyan

t'une»? ¹³ Heger zêndîbûna mirîyan t'une, ku usa ye Mesîh jî zêndî nebûye. ¹⁴ Û heger Mesîh zêndî nebûye, usa ye dannasîna me p'ûç e û bawerîya we jî p'ûç. ¹⁵ Û em jî dibine şehdeyên Xwedêye derew, çimkî me bona Xwedê şehdetî da, ku ewî Mesîh zêndî kir, lê heger mirî wê zêndî nebin, ku usa ye wî ew jî zêndî nekiryê. ¹⁶ Çimkî heger mirî wê zêndî nebin, usa ye Mesîh jî zêndî nebûye. ¹⁷ Û heger Mesîh zêndî nebûye, hingê bawerîya we p'ûç e, hûn hela hê nava gunehên xweda ne ¹⁸ û ewên bawerîya Mesîhda jî mirine, unda bûne. ¹⁹ Heger em t'enê bona vê jîyînê gumana xwe bidine ser Mesîh, em ji her merivan rebentir in.

²⁰ Lê rast Mesîh ji mirinê zêndî bûye, çawa berê deremeta pêşine ji nav mirîyan. ²¹ Mirin rûyê merivekîda bû, bi merivekî jî wê zêndîbûna mirîyan bibe. ²² Çawa hemûyên ji Adem dimirin, usa jî hemûyên ji Mesîh wê zêndî bin. ²³ Lê her kes dora xweda: Pêşîyê Mesîh, çawa berê deremeta pêşin, paşê yên p'ara Mesîh, li dema hatina wîda. ²⁴ Axirî jî wê hingê bê, çaxê her serwêrtîyê, hikumetîyê û qewatê ret ke û p'adşatîyê bide destê Bav Xwedê. ²⁵ Çimkî ew gerekê p'adşatîyê bike, heta ku Xwedê hemû dijminan bike binê p'iyên wî. ²⁶ Dijminê xilazîyê, ku wê ret ke, mirin bi xwe ye, ²⁷ çimkî nivîsar dibêje: «Xwedê her tişt binê p'iyên wîda êlimî wî kir». Lê çaxê tê gotinê «her tişt» êlimî wî kir, femdarî ye, pêştîrî wî Xwedêyê ku her tişt êlimî wî kir. ²⁸ Û çaxê her tişt êlimî wî bin, hingê Kur' xwexa jî wê êlimî wî Xwedêyî be, yê ku her tişt êlimî wî kir, ku her tiştîda ew bibe Xwedêyê her tiştî.

²⁹ Heger zêndîbûn t'une, ewên ku bona mirîyan têne nixamtinê wê çi bikin? Heger mirî wê qet zêndî nebin, îdî çima bona mirîyan têne nixamtinê? ³⁰ Çima em jî her t'im xwe davêjine nava qezîyan? ³¹ Ew fir'naqîya min şehde ye, birano, ya ku ez bi saya Xudanê me Mesîh Îsa bi we firnaq dibim, ku ez her roj dest ji jîyîna xwe dik'îşînim. ³² Heger ez mîna wan merivan difikirîm, îdî çima min Efesêda şer'ê xwe t'evî rewiran kir? çi bû qazınca min? Heger zêndîbûna mirîyan wê t'unebe, de werin *bi ya hinekan* «em bixwin-vexwin, çimkî sibê emê bimirin». ³³ Nexapin! Hevaltîya xirab rabûn-rûniştina xweyp'ergal xirab dike. ³⁴ Nava rastîyêda hişyar bin, îdî guneh nekin, çimkî hê ji we hinek Xwedê nas nakin, ez vê yekê dibêjim, ku hûn şerm bikin.

QALIBÊN MEYE PEY ZÊNDÎBÛNA MIRÎYANR'A

³⁵ Lê yekê bêje: «Çawa mirî dikarin zêndî bin û qalibê wanê çawa be»? ³⁶ Lo hişo! Ew t'oximê ku tu diçînî, jîyînê nastîne, awa gotî şîn nabe heta «nemire». ³⁷ Û ew çi tu diçînî, ne ku wî qalibî diçînî, k'îjan wê şîn be, lê hebeke sade, mesele: genim be *yan* jî t'oximekî mayîn be. ³⁸ Û Xwedê qalib dide wî t'oximî, çawa ku dixaze û her t'oximek qalibê xwe distîne. ³⁹ Hemû qalib ne yek in, goştê mêriv başqe ye, goştê heywên başqe, yê teyredan başqe ye, yê mesîyan jî başqe. ⁴⁰ Qalibên ezmanî jî hene, qalibên dinyayî jî hene, lê rewşa yên ezmanî başqe ye û yên dinyayî başqe. ⁴¹ Rewşa te'vê başqe ye, rewşa hîvê başqe û rewşa steyrkan jî başqe ye û her steyrkek bi rewşa xwe ji hevdu têne cudekirinê. ⁴² Aha jî zêndîbûna mirîyan e: Qalibê dêris tê çandinê, *lê* yê nedêris wê zêndî be. ⁴³ Ew bêrewş tê çandinê, *lê* bi rewş wê zêndî be, ew bi bêt'aqetîyê tê çandinê, *lê* bi qewat wê zêndî be. ⁴⁴ Qalibê bîber tê çandinê û qalibê ruhanî wê zêndî be. Çawa ku qalibê bîber heye, usa jî qalibê ruhanî heye. ⁴⁵ Aha jî nivîsar e, merivê pêşin «Adem, bû bînberekî zêndî», lê Ademê paşin bû ruhberekî zêndî. ⁴⁶ Lê pêşîyê ne ku yê ruhanî bû, lê yê bîber û paşê yê ruhanî. ⁴⁷ Merivê pêşin ji xwelîya erdê bû, merivê dudan ji ezmên~ ji Xudan. ⁴⁸ Çawa yê ji xwelîyê bû, usa jî yên ji xwelîyê ne û çawa yê ji ezmên e, usa jî yên ji ezmên in. ⁴⁹ Û me çawa nîgara yê ji xwelîyê li xwe kirye, emê usa jî nîgara yê ji ezmên li xwe kin.

⁵⁰ Gotina min ev e, birano, ku xûn û goşt li P'adşatîya Xwedê nikarin war bin, ne jî *qalibê* dêrisbûnê wê *jîyîna* nedêrisbûnê war be. ⁵¹ Hela bibihên, ezê wer'a sur'ekê bêjim: Ji me her kes wê nemirin, lê em her kesê jî bêne guhastinê, ⁵² nişkêva, demeke *kinda*, çawa ç'evê xwe bikopînin, li dema *lêdana* bor'îya axirîyê. Çimkî gava bor'î bê lêdanê, mirî wê halekî nedêrisbûyîda zêndî bin û emê jî, awa gotî~ *yên ku nemirine*, wê bêne guhastinê. ⁵³ Çimkî gerekê evî dêris nedêrisîyê li xwe wergire û evî elê mirinê nemirîtyê. ⁵⁴ Lê çaxê evî dêris nedêrisîyê li xwe wergire û evî elê mirinê nemirîtyê li xwe wergire, hingê ew gotin wê bê sêrî, ku nivîsar e: «Mirin ji serdestîyê hate daqurtandinê». ⁵⁵ «Mirin! k'anê ye qîla je'ra te? Mirin! k'anê ye serdestîya te»? ⁵⁶ Qîla mirinê guneh e û qewata guneh ji Qanûnê ye. ⁵⁷ Lê şikir Xwedêr'a, ku bi destê Xudanê me Îsa Mesîh me serdest dike.

⁵⁸ Awa birayên mine delal, qewîn-qedîm bimînin, ji cîyê xwe neşihitin, her dem k'arê Xudanda pêşda her'in, bizanibin, ku xebata we li ber Xudan ne p'ûç e.

ALÎK'ARÎYA BONA ORŞELÎMÊ

16 ¹ Lê niha derheqa *alîk'anî* t'opkirina pîrozanzanr'a, min çawa t'emî da civînên Galatyayê, hûn jî usa bikin: ² Her yekşem, ji destê we her kesîva çiqas tê, bira tiştêkî paş xe, ku nebe çaxê ez bê, hingê bê t'opkirinê. ³ Û çaxê ez bê, hûn k'îjanî ku bixazin, ezê bi destê wan, bi nivîsar p'êşkêşên we bişînimê Orşelîmê. ⁴ Û heger minr'a jî bik'eve, ku ez her'im, îdî ewê t'evî min her'in.

T'IVDÎRÊN PAWLOS Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

⁵ Pey çûyîna qeza Makedonyayêr'a, ezê serîkî li we xim, çimkî ezê Makedonyayêra derbaz bim. ⁶ Dibe ku li cem we bimînim yan jî t'enê zivistana xwe li wir derbaz kim û hingê hûn dikarin min wî alîda verêkin, k'uda ku ezê her'im. ⁷ Çimkî ez niha naxazim we li ser rîya xwe bibînim her'im, lê dixazim ku demekê cem we bimînim, heger

* 15:54,55 Îşaya 25:8; Hoseya 13:14.

Xudan hiz bike. ⁸ Lê niha ezê heta Roja Pêncîye k'ifş, li Efesê bimînîm, ⁹ çimkî derîkî oxirêyî mezin li ber min vebûye û peyk'etîyên min gelek in.

¹⁰ Heger Tîmotêyo bê cem we, usa bikin ku ew ji we venek'işe, çimkî ew jî bona Xudan mîna min dixebite. ¹¹ Usa bira t'u kes wî bêhurmet neke. Wî bi dilê rihet verêkin, ku bê cem min, çimkî ez hîvîya wî û birayên t'evî wî me. ¹² Lê derheqa Apoloyê birada, min gelekî hîvî ji wî kir, ku biranra ew jî ser weda bihata, lê nêta wî hatinê niha qet t'unebû, lê wê bê, çaxê mecala wî hebe.

¹³ Hişyar bimînîn, bawerîyêda qewîn-qedîm bin, jîr bin, qewat bigirin, ¹⁴ bira her kirinên we bi hizkirinê bin.

¹⁵ Niha hûn zanin ku Stêfanas mala xweva bawermendên qeza Axayayêye pêşin e û wan xwe dane xizmetîya bona pîrozan. Îdî hîvî ji we dikim, birano, ¹⁶ ku hûn gura yên usada bin, usa jî gura wan hemûyanda, yên ku t'evî k'arê vê xebatê dibin.

¹⁷ Ez bona hatina Stêfanas, Fortûnato û Axayîko şa me, wana bi hizûra xweva dewsa we girt, ¹⁸ bi wê yekê wana dilê min û we jî rihet kirin. Hurmeta yên usa bigirin.

¹⁹ Civînên qeza Asyayêda li we silav dikin. Ekîla û Priskîla t'evî civîna mala xweda bi Xudan gelekî li we silav dikin. ²⁰ Hemû birayên li vir we silav dikin. Bi ramûsana şîrê helal li hevdu silav kin.

²¹ Ev silav, destnivîsara min Pawlos e. ²² Heger yek Xudan hiz nake, bira nifir li wî be. «Maranata». * ²³ K'ere ma Xudan Îsa wer'a. ²⁴ Hizkirina minê *jî t'imê* li ser we hemûyên p'ara Mesîh Îsa be.

* 16:22 «Maranata» bi zimanê aramî tê femkirinê: «Xudan were.»

NAMA PAWLOSE DUDAN KORINTÛYANR'A

PÊŞGOTIN

«Nama Pawlose dudan KorintÛyanr'a» nêzikî sala 56-an hatye nivîsarê. Ji namê k'ifş e, ku ji endemên civînê hinek li gora rastîya Xwedê nedîçûn û himberî Pawlos rabûn, wî jî berk' li wan hilatibû, lê sebir û hizkirina xwe hindava wanda xwey dikir û guman bû jî, ku axiriyê her tiştê baş be.

P'ara namêye pêşînda Pawlos p'evgirêdana xwe û civîna Korintê zelal dike û şirovedike, ku nama pêşînda çima usa sert li wan hilatibû. Paşê ew şikirîya xwe ji Xwedê tîne, ku hilatina wî bû manî, ku ewana ser kirina xwe p'oşman bûn, vegeryan û wîr'a razî bûn.

Usa jî Pawlos wan hîn dike, ku ew aliyê p'êşkêş dayînedê hazir bin û alîk'arîya bawermendên Cihûstanêye destteng bikin.

Serên axiriyêda jî Pawlos derheqê xizmetîya şandîtiya xwe û rabûn-rûniştina xweda dibêje. Ew bona yên miqabilî xwe dinivîse û xwe li t'evî wan dide ber hev. Lê belê, meremê Pawlos ne ew bû, ku ew navê xwe biger'ya yan xwe bilind bigirta. Lê wî piştgirî dayîna Xwedê-xizmetîya xweye şandîtiyê dikir, ku bawermend bikaribin Mizgîniya Xwedêye rast nas bikin, wê qewîn bigirin û ji k'arker û hînkirinên ne ji Xwedêda jî dûr k'evin.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin û şikirdayîn (1:1-11)

Hizkirina Pawlos hindava civîna Korintêda (1:12-7:16)

K'omekdarîya bona bawermendên Cihûstanê (8:1-9:15)

Hikumê şandîtiya Pawlos ji Xwedêda ye (10:1-12:21)

T'emî û silavên axiriyê (13:1-13)

SILAVKIRIN

1 ¹⁻² Ji Pawlosê şandîyê Mesîh Îsa, bi daxaza Xwedê û ji Tîmotêyoyê birayê me, civîna Xwedêye Korintêr'a k'erem û haştîya Bavê me Xwedê û Xudan Îsa Mesîh bibe û wan hemû pîrozanz'r'a, yên ku t'evayîya qeza Axayayêda ne.

TENGASÎ Û BERDILÎ

³ Xwedêyê dua-dirozgeva xîne, Bavê Xudanê me Îsa Mesîh, Bavê dilşewat û Xwedêyê her berdilîyê. ⁴ Ew nava her tengasîyanda ber dilê meda tê, ku em jî bikaribin ber dilê wanda bèn, yên ku nava her cûr'e tengasîyanda ne, bi wê berdilîya ku em xwexa ji Xwedêda distînin. ⁵ Belê, çiqas gelek em t'evî wan te'li-tengîyên Mesîh dibin, haqas gelek jî em bi destê Mesîh têne berdilîkirinê. ⁶ Heger em tengasîyanda ne, ew bona berdilî û rizgarbûna we ye, heger em têne berdilîkirinê, ew bona wê berdilî û rizgarbûna we ye, ku hûn bikaribin wan te'li-tengîyanda sebir bikin, yên ku em xwexa jî dibînin. ⁷ Û gumana me *bona* we qedîm e, çimkî em zanin, ku çawa hûn t'evî me diçerçirin, usa jî hûn t'evî me bêne berdilîkirinê.

⁸ Em naxazin ku hûn haş ji wan te'li-tengîyan t'unebin, birano, yên ku me li qeza Asyayêda k'işandin. Ji qewata me der bargiranî haqasî k'etine ser me, heta ku me dest ji jîyîna xwe jî k'işand. ⁹ Belê, me xwer'a qirara mirinê hilda, lê ev yek usa bû, ku em gumana xwe nedine ser xwe, lê ser Xwedê, yê ku mirîyan ji gor'an zêndî dike. ¹⁰ Ewî em ji wê mirina mezine *bêxilazî* rizgar kirin, rizgar dike û gumana me heye ku wê dîsa rizgar bike, ¹¹ bi alîk'arîya wan duayên ku hûn bona me dikin. Û aha bi saya duayên gelek k'erem wê mer'a bê dayîne û gelek wê bona me şikirîyê bidine Xwedê.

RÛSPÎTÎ Û XEMA PAWLOS HINDAVA KORINTÛYANDA

¹² Rûspîtiya me şehdetîya îsafa me ye, ku me ji Xwedêda bi dilê paqij û bêy durûtî jîyîna xwe li vê dinyayêda derbaz kir û hê zêde hindava weda, ne ku bi serwaxtiya merivayî, lê bi k'erema Xwedê. ¹³ Em tiştêkî din wer'a nanivîsin, lê pêştirî wan tiştên ku hûn dikarin bixûnin û fem bikin û ez guman im, ku hûnê t'am fem bikin, ¹⁴ çawa kê-m-zêde, we em fem kirine û hûnê bigihîjine wê femînê, ku em rûspîtiya we ne, çawa hûn jî ya me, li wê Roja hatina Xudan Îsada.

¹⁵ Min bi vê gumanê şewra xwe kir, ku pêşda bihatama cem we, ku we du bare k'erem bîstana, ¹⁶ awa gotî serîk bida we, *paşê* ji cem we biçûma Makedonyayê û ji Makedonyayê jî dîsa ser weda vegeryama, ku we jî ez berbi Cihûstanê verêkirama. ¹⁷ Çaxê ez aha difikirîm, gelo min kêmaqilî kir? yan çi ku şewrîm, ez bi merivayî şewrîm, ku «Belê» û «Na»-ya min bibe «na»? ¹⁸ Lê Xwedê şehde ye, ku sozê me wer'a nebûye «Belê» û paşê «Na». ¹⁹ Çimkî Kur'ê Xwedê Îsa Mesîh, ku bi me- bi min, Silas û Tîmotêyo wer'a hate dannasînkirinê, ne «Belê» û «Na» bû, lê li Xwedêda bûye «Belê». ²⁰ Çimkî her sozên Xwedê bi Îsa Mesîh «Belê» ne, lema jî em bi wî «Amîn» dibêjin, bona rûmeta Xwedê. ²¹ Û yê ku em û hûn t'evayî bi Mesîh qewîn-qedîm kirin û k'ifş kirin, hema ew Xwedê ye, ²² ku em mor kirin jî û Ruhê Pîroz dilê meda çawa bihêya³ warstandinê danî.

²³ Lê ser minr'a Xwedê şehde ye, min hûn hêvişandin, ku nehatime Korintê. ²⁴ Em hikumî ser bawerîya we nakin, lê t'evî we bona şabûna we dixebitin, çimkî hûn bawerîyêda şidyayî ne.

BAXŞANDIN

2 ¹ Awa min bona xwe qirara kir, ku dîsa neyê şabûna we neşkênim. ² Çimkî heger ez şabûna we bişkênim, îdî

³1:22 Bihê ser warra ye, çimkî ew Ruhê Xwedê ye û ew Bihê îzbatîya hatina Îsaye dudan e, ku bê û bawermendan bike xweywar.

k'ê wê dilê min şa ke, pêştîrî ewên ku şabûna wan min şkênand. ³ Min ew yek nama xweda nivîsîbû, ku nebe çaxê ez bê, yên ku gerekê min şa kin, *nişkêva* ew dilê min bişkênin. Çimkî ez we hemûyanda bawer im, ku şabûna min şabûna we hemûyan e. ⁴ Min bi gelek hêsiran, bi gelek k'eder û k'esera dilê xwe wer'a nivîsî, ne ku bona wê yekê, ku şabûna we bişkênim, lê ku hûn wê hizkirina mine mezin hindava xweda fem bikin.

⁵ Awa heger yekî şabûna *min* şkênand, ewî ne ku t'enê şabûna min şkênand, lê ya hinekên din jî, lê ku serda zêde nekîm jî, ewî şabûna we hemûyan şkênand. ⁶ Ew cezayê ku ji we gelek gihîşte wî, îdî besî wî merivî ye. ⁷ Lê niha hûn gerekê bibaxşînine wî û ber dilda bèn, ku k'erbî berxwek'etinê xwe unda neke. ⁸ Awa hîvî ji we dikim, hindava wîda hizkirina xwe qedîm kin. ⁹ Min hema bona wê yekê jî nivîsiye, ku we bicêribînim û bizanîbim k'a hûn her tiştîda guhdar in. ¹⁰ Heger hûn tiştêkî dibaxşînine yekî, ez jî wer'a me. ¹¹ Heger tiştêkî baxşandinê hebe, bona we li ber hizûra Mesîh dibaxşînim, ¹¹ ku *rûyê nebaşandinêda* Şeytan me zirarê nexe, çimkî em haş ji hunurên wî hene.

HIZKIRINA PAWLOS HINDAVA TÎTODA Û SERDESTÎYA XWEDÊNASAN

¹² Çaxê ez bona mizgînîdayîna Mesîh gihîştîme Troyayê, min dît ku Xudan derîk li ber min vekirye. ¹³ Lê dilê min ne rihet bû, çimkî min birê xwe Tîto li wir nedît. Hingê min xatirê xwe ji wan xast û çûme qeza Makedonyayê.

¹⁴ Lê şikir Xwedêr'a, ku t'imê me p'êga k'oma Mesîhda pêşda dibe, yê ku *dijmin* bindest dike û bîna naskirina xwe bi me her deran bela dike. ¹⁵ Çimkî em bîna Mesîhe xaş in, li ber Xwedê, him li nava rizgarbûyîyan, him li nava undabûyîyan. ¹⁶ Bona hinekan em bîna mirinê ne, ku wan berbi mirinê dibe û bona hinekan jî bîna jîyînê, ku wan berbi jîyînê dibe. ¹⁷ Ê k'î dikare vî barî hilgire? ¹⁷ Em ne mîna hinekan e, yên ku xebera Xwedê qazınca xweva girêdidin, lê em çawa merivne ji Xwedêda şandî, li ber hizûra Xwedê bi t'evgirêdana Mesîh bi dilê bêqelpî xeber didin.

PEYMANA NÛ Û QANÛN

3 ¹ Gelo em dîsa vedigerin, xwexa pesinê xwe bidin? yan *gelo* mîna hinekan mer'a lazim e, ku em wer'a şehdenamên xwe bişînin yan ji we bistînin? ² Ê ne hûn in şehdenamên me, dilê meda nivîsar, ku ji aliyê her merivîda hatine naskirinê û xandinê? ³ K'ifş e jî, ku bi xizmetîya me hûn nama Mesîh in, ne ku bi hubirê nivîsar, lê bi Ruhê Xwedêyê zêndî, ne ku li ser selên kevîrî, lê li ser t'extên dilê xûn û goşt.

⁴ Gumana me vê yekêda Xwedê ye, bi saya Mesîh. ⁵ Ne ku em *usa* hesab dikin, ku em layîqî vî k'arî ne, lê karebûna me ji Xwedêda ye. ⁶ Ewî ew karebûn da me, ku em bibine xizmetk'arên Peymana nû, ne ku xizmetk'arên herfan, lê yên Ruh, çimkî herf dikuje, lê Ruh dide jîyînê.

⁷ Awa heger xizmetîya Qanûna mirindariyê, ku li ser kevîran hatibû k'olanê, haqas xweyrûmet bû, heta ku lawên Îsraêl nikaribûn rûyê Mûsa binihêryana, ji dest wê şewqa rûyê wîyî ku dîsa wê derbaz bûya, ⁸ lê xizmetîya Ruh wê hê çiqas xweyrûmet be? ⁹ Çimkî heger ew xizmetîya ku axiriyê dîwan ser merivanda danî, haqas xweyrûmet bû, hê çiqas zêde ew xizmetî wê xweyrûmet be, ya ku meriv bi wê bêsûc dibin. ¹⁰ Usa, ya ku xweyrûmet bû, li ber wê rûmeta seranser bêrûmet derk'et. ¹¹ Heger xizmetîya ku wê derbaz bûya biçûya xweyrûmet bû, îdî xizmetîya ku wê bimîne, hê çiqas xweyrûmet e?

¹² Awa em xweyê vê gumanê ne, lema xeberdana xweda bêtirs in. ¹³ Em ne mîna Mûsa ne, ku xêlî avîtibû ser rûyê xwe,* ku lawên Îsraêl heta xilaziyê ew rûmet nedîtana, ya ku wê derbaz bûya. ¹⁴ Ê ew hişê xweda femekorî bûn û heta îro jî çaxê peymana kevn dixûnin, hema ew xêlî li ser femê wan dimîne. Çimkî ew t'enê bi Mesîh tê hildanê. ¹⁵ Heta îro jî, çaxê *kitêbên* Mûsa dixûnin, xêlî ser femê wan dimîne, ¹⁶ lê çaxê vedigerine berbi Xudan, hingê ew xêlî tê hildanê. ¹⁷ Ê Xudan xwexa Ruh e û Ruhê Xudan li k'u be, wir azayî heye. ¹⁸ Awa em hemû jî bi rûkî bêt xêlî şewqa rûmeta Xudan dibînin, çawa neynikêda û tene guhastinê~ nava rûmeta wîda hê pêşda diçin dibine hema mîna nîgara wî û ev yek bi destê Ruhê Xudan e.

XEZNA RUHANÎ DERSANÊN AXÎNDA

4 ¹ Em ji vê xizmetiyê aciz nabin, *ku jê venak'işin*, ya ku me bi rehma Xwedê stand. ² Lê em ji tiştên şerme dizîva vedik'işin û fêlbaziyê nakin, ne jî xebera Xwedêda qelpiyê dikin, lê serda rastiyê tînine li ber ç'evan û aha li ber hizûra Xwedê em xwe îsafa merivanva dîhar dikin. ³ Lê heger ev Mizgîniya ku em didin, veşartî ye jî, ew li ber *merivên* undabûyî veşartî ye. ⁴ Çimkî <xwedêyê> vê dinyayê yên nebawer femekorî kirin, ku ronaya Mizgîniya rûmeta Mesîh li ser wan nedîr nede, ewî ku nîgara Xwedê ye. ⁵ Ê em ne ku xwe dannasîn dikin, lê Îsa Mesîh, çawa Xudan, xwe jî, çawa xulamên we, boy navê Îsa. ⁶ Xwedê ku got: «Ji tarîyê ronahî nedîr bide»,† wî xwexa dilê meda nedîr da, ku bi wê ronayê~ bi kesa Îsa Mesîh em rûmeta Xwedê nas bikin.

⁷ Lê ev xezna me nava derdanên axînda ye, ku k'ifş be, ew qewata seranser ji Xwedê ye, ne ku ji me. ⁸ Ji her alîda em xwey derd-kul in, lê ji tengasiyan xwe unda nakin, dereca hewargaziyêda ne, lê ne bêguman in, ⁹ zêryayî ne, lê nehatine bîrkinê, lêdayî-k'etî ne, lê ne undabûyî ne. ¹⁰ Her dem em mirina Îsa bedenên xweda dibin, ku

* 3:13 Derk'etin 34:34.

† 4:6 Destpêbûn 1:3.

jîyîna Îsa jî bedenên meda k'ifş be. ¹¹ Çimkî eme ku zêndî ne, bona Îsa mirinêr'a têne dayîne, ku jîyîna Îsa jî qalibê meyî elê mirinêda k'ifş be. ¹² Awa mirin nava meda ya xwe dike, lê jîyîn nava weda. ¹³ Lê li nava me û weda hema ew ruhê bawerîyê ye, lema em xeber didin, çawa nivîsar e: «Min bawer kir, lema xeber da». ¹⁴ Em zanin ku ewê Xudan Îsa ji mirinê zêndî kir, wê t'evî Îsa me jî ji mirinê zêndî ke û me bi wer'a t'evayî li ber xwe bide sekinandinê. ¹⁵ Belê, ev hemû bona we ye, ku k'erem li ser gelekanda hê bibare û usa şikirdarîya rûmeta Xwedê jî hê zêde be.

¹⁶ Bona vê yekê em gumana xwe nabir'in. Belê, merivê meyî derva dêris dibe diçe, lê dilda roj bi roj em têne veguhastinê. ¹⁷ Çimkî te'lî-tengîyên meye dem-deme sivik me digihînine rûmeta heta-ha-têyî seranser. ¹⁸ Awa em tiştên ku k'ifş dibin nanihêrin, lê yên nek'ifş, çimkî tiştên k'ifş bona demekê ne, lê yên nek'ifş heta-ha-tê ne.

5 ¹ Ê em zanin, ku qalibê meyî axînî mîna konekî firarî çaxê xirab be, ji Xwedêda maleke meye heta-ha-tê li ezmên heye, ne bi destan çêkirî. ² Ê em vî konîda dinelin, heyra wê yekêda ne, ku mala xweye ezmanî li xwe wergirin, ³ ku çaxê em wê li xwe wergirin, tazî k'ifş nebin. ⁴ Belê, heta hê em vî konîda dimînin, bin barê giranda dinelin, em naxazin evî ji xwe bêxin, lê *yê ezmanî* serda wergirin, ku qalibê meyî elê mirinê wê jîyînêda bihele. ⁵ Xwedê xwexa em vê yekêr'a hazir kirine û Ruh çawa bihêya *war* da me.

⁶ Awa her dem em vê yekêda bawer in û zanin ku heta em vî qalibêda ne, ji Xudan dîr in, ⁷ çimkî em bi bawerîyê dijîn, lê ne bi dîndarê. ⁸ Ê em *Îsada* haqas bawer in, ku hê dixazin ji vî qalibê derk'evin û li cem Xudan bihêwirin. ⁹ Ji boy vê yekê em dîcedînin, ku em bimînin yan derên, t'enê li wî xaş bîn. ¹⁰ Çimkî ji me her kes jî gerekê li ber dîwana Mesîh bisekine, ku her kes li gora wan kirinên qalibê xweda kirî bistîne, çi ku kiribe~ qencî yan xirabî.

XIZMETÎYA ŞANDÎTÎYÊ

¹¹ Em, ku haş ji tîrsa Xudan hene, merivan tînine rayê. Ê em li ber Xwedê naskirî ne, guman heye, ku îsafa weda jî naskirî ne. ¹² Em ne ku dîsa li ber we pesinê xwe didin, lê mecalê didine we, ku hûn bi me firnaq bin, ku bikaribin caba wan bidin, yên ku bi dîtina ç'evan firnaq dibin, lê ne ku bi ya dilanda. ¹³ Heger me hişê xwe unda kirye, ew bona Xwedê ye, lê heger em ser hişê xwe ne, ew bona we ye. ¹⁴ Hizkirina Mesîhe hindava meda p'êyî ser me dike û em aha fem dikin, heger yek bona hemûyan mirye, usa hemû jî pêr'a mirine. ¹⁵ Mesîh bona hemûyan mir, ku yên zêndî, îdî ne ku bona xwe zêndî bin, lê bona wî, yê bona wan mir û ji mirinê zêndî bû.

¹⁶ Awa ji vir hada em îdî t'u kesî bi bedenî nas nakin. Rast e *waxtekê* me Mesîh bi bedenî nas kir, lê niha îdî em usa nas nakin. ¹⁷ Awa heger kesek nava Mesîhda ye, ew efirînekî nû ye, tiştên kevn derbaz bûn çûn û va ye her tişt nû çê bûn. ¹⁸ Ev her tişt ji Xwedêda ne, ku bi Mesîh em t'evî xwe li hev anîn û xizmetîya li hevanîne da me. ¹⁹ Belê, Xwedê bû, ku dinya bi Mesîh t'evî xwe li hev anî, neheqîyên wan wanr'a hesab nekirin û xebera li hevanîne sparte me. ²⁰ Awa em ji alîyê Mesîhda qasidîyê dikin, çawa ku Xwedê bi me hîvî ji we dike: Em alîyê Mesîhda reca ji we dikin, Xwedêr'a li hev werin! ²¹ Belê, ewî ku guneh nekiribû, Xwedê bona me ew kire guneh, ku bi destê wî em ji Xwedêda bibine yên rast.

6 ¹ Em jî çawa hevalk'arên Xwedê, hîvî ji we dikin, ku hûn k'erema Xwedêye standî nehêlin ku bêqazinc be. ² Çimkî Xwedê dibêje: «Li dema rehm-k'eremêda min dengê te bihîst û roja rizgarbûnêda hatime hewara te».† Va niha ye dema rehm-k'eremê! Va niha ye roja rizgarbûnê!

³ Em usa dikin ku t'u tiştêda nebîne bayîsê k'etina kesekî, ku xizmetîya me neyê lomekirinê. ⁴ Lê her tiştêda em xwe p'êşkêş dikin û bi sebira dirêj didine îzbatkirinê, ku em xizmetk'arên Xwedê ne: Li te'lî-tengîyanda, k'esîbîyêda, derd-kulanda, ⁵ lêdananda, hebsanda û her alîyanva hicûmbûyî, k'esirî, bêxew, birçî, ⁶ bi dilê paqij, bi zanebûnê, bi sebirdirêjîyê, bi şîrinayîyê, bi Ruhê Pîroz û bi hizkirina bêy fêl-fen, ⁷ bi gotina rastîyê û qewata Xwedê, bi sîlihên rastîyê, ji her du alîyanva, ⁸ li hurmetê û bêhurmetîyêda, li pesindayîne û şermdayîne. Me çawa derewîn hesab dikin, lê em ser rastîyê ne, ⁹ me çawa yên nenas hesab dikin, lê em *hemûyanva* naskirî ne, çawa yên mirî, lê va ye eme zêndî ne, çawa ceza standî, lê eme nekuştî ne, ¹⁰ em mîna yên zelûlîyêda ne, lê her t'im şa ne, çawa yên feqîr, lê em gelekandewlemend dikin, usa k'ifş dibe yanê tişteki me t'une, lê her tiştên me hene.

¹¹ Me xebera *jîyîne* wer'a got, me devê xwe negirt, ay Korintîno, dilê me jî hindava weda fire ye. ¹² Hûn ji alîyê meda nayêne êşandinê, lê îsafa we, we dêşîne. ¹³ Ez çawa lawên xwer'a xeber didim, ku hûn dewsa wê yekê li me vegefrînin û dilê xwe mer'a fire kin.

DÛRÎ P'ÛTP'ARISTÎYÊ BIN

¹⁴ T'evî nebaweran nek'evine bin barekê‡, çimkî çi k'arê heqîyê neheqîyêra heye? Yan çi t'evgirêdana ronayê tarîyêr'a? ¹⁵ Ê çi t'ifaqîya Mesîh Bêlyarra heye? yan çi p'ara bawermendan nebaweranra heye? ¹⁶ Yan jî çi hevkirina p'aristxana Xwedê ya p'ûtanra heye? çimkî em p'aristxana Xwedêye zêndî ne! Çawa Xwedê got:

* 4:13 Zebûr 116:10.

† 6:2 Îşaya 49:8.

‡ 6:14 Bi yûnanî dewsa xebera «bar» «nîr» nivîsar e.

rast derên, lema divedînin, ne t'enê li ber hizûra Xudan, lê li ber merivan jî.

²² Em t'evî wan her du biran, birakî xweyî din jî dişînin, yê ku me gelek tiştanda ew cêribandye û t'imê jî ew xîretk'êş dîtye û niha jî hindava weda hê xîretk'êş e, çimkî ew gelekî weda amin e. ²³ Lê heger pirs bê ser Tîto, ew hevalê min e û li xebata nava weda jî hevalk'arê min e. Lê heger bê ser wan her du birayên me, ewana ji alîyê civînêda şandî ne û bona rûmeta Mesîh dixebitin. ²⁴ Awa hizkirina xwe û ew pesinê ku me bona we daye, wan'ra li ber hemû civînan bidine îzbatkirinê.

K'Ê ÇAWA BIÇÎNE WÊ USA JÎ BIDIRÛ

9 ¹ Li ser p'êşkêşdayîna bona pîrozan tişteki zêde ye, wer'a binivîsim. ² Çimkî wê rezedilîya we zanim û nava mekedonîyanda bi we fînaq dibim dibêjim, ku bawermendên qeza Axayayê hê sala parva hazirîya xwe p'êşkêşdayîner'a dîtine û vê rezedilîya we, gelekên ji wan anîne xîretê. ³ Û awa ez wan birayên xwe dişînim, ku fir'naqîya mine hindava weda wê yekêda hêç derneyê, lê hûn usa hazir bin, çawa min gotye, ⁴ ku nebe çaxê mekedonî t'evî min bên û bibînin hûn hê ne hazir in û em (nabêjim hûn) şermî bin, wê aminîya hindava weda. ⁵ Lema min rê têra dît, hîvî ji biran kir, ku berî min bêne cem we û t'ivdareka wê p'êşkêşa gumreh bibînin, ya ku we soz dabû, ku ew bi rezedilîyê hazir be, lê ne bi destê zorê.

⁶ Vê yekê bîr nekin: Yê ji timayê kêma diçîne, wê kêma jî bidirû, lê yê gumreh diçîne, wê gumreh jî bidirû. ⁷ Dilê her kesî'ra çiqas derbaz dibe, bira haqasî bide, ne ku bide û dilê wî pey be yan bi borcdarîyê be, çimkî dayîna bi dilê şa li Xwedê xaş tê. ⁸ Xwedê dikare her alîyanva wer'a her k'eremî bike, ku her alîyanva, her t'im her tiştên weye kêrhatî hebin û zêde bin jî bona her kirinên qenc. ⁹ Çawa nivîsar e: «Wî gumreh da feqîran, qencîya wî heta-ha-tê dimîne».* ¹⁰ Ewî ku t'oxim dide t'oximreş û nan jî bona xwarinê, wê t'oxim p'êşkêşî we ke û zêde ke, ku berên qencîya we jî gelek be, ¹¹ ku hûn her tiştîda dewlemend bin û her alîyanva merd bin û ew qencîyên ku hûn bi destê me dikin, bibine manî, ku şikirîyê bidine Xwedê. ¹² Û çaxê hûn vê xizmetîyê dikin, ne t'enê kêmasîya pîrozan t'ije dikin, lê ku hê zêde şikirîyê bidine Xwedê. ¹³ Ev kirina we rastîya bawerîya we îzbat dike û aha *meriv* şikirîya xwe Xwedê tînin, bona guhdarîkirina we, ku hûn Mizgînîya Mesîh îqrar dikin û bona wê merdanîya we, ku hûn alîk'arîya wan û hemûyan dikin. ¹⁴ Ewê bona we dua bikin û heyra weda bin, bona wê k'erema Xwedêye seranser, ya ku wer'a hatye dayîne. ¹⁵ Şikir Xwedê'ra bona wê dayîna wîye ku nayê ser zaran!

HIKUMÊ ŞANDÎYÎYA PAWLOS

10 ¹ Ez, Pawlos bi milûkî û şîrinayîya Mesîh hîvî ji we dikim: *mîna hinekan nefikirin*, ku ez rû bi rû nava weda xwe nimiz digirim, lê ji dîrva sert xeber didim. ² Ez reca dikim, hûn usa nekin ku çaxê bêm jî sert bim, çimkî ez eseyî zanim, ku dikarim turuş kim hindava wanda jî sert bim, yên ku li ser me usa difikirin, yançîye em bi *fikirên* bedenî dimeşin. ³ Belê, rast em *merivne* bi beden in, lê em bi bedenî eskerîyê nakin. ⁴ Ç'ekên eskerîya me, ne bedenî ne, lê ji Xwedê bi qewata wî ne, bona wêrankirina kelan. ⁵ Em wan şêwr û her tiştên bilindbûyîye k'ubare miqabilî zanebûna Xwedê hêç dikin û her fikiran dikine hêsîr û dikine bin gura Mesîh. ⁶ Em hazir in her neguhdarîyê bidine cezayê, çaxê guhdarîya we t'am be.

⁷ Hûn dîndarê dinihêrin. K'î li xwe guman e, ku ew p'ara Mesîh e? Bira vê jî bifikire, ku çawa ew p'ara Mesîh e, usa jî em in. ⁸ Çimkî heger ez hinekî zêde jî bifir'im, ew bona wî hikumî ye, ku Xudan da me, tişteki şermîyê jî têda t'une û ew bona şênkirina we ye, ne ku xirabkirinê. ⁹ Û ez usa nakim ku yanê bi nameyên xwe we ditirsînim. ¹⁰ Çawa hinek dibêjin: «Nameyên wî sert û qewat in, lê ew dîndara xweda me'rimek e û xebardana xweda jî ne maqûl e». ¹¹ Yên usa bira fem bikin, em dîrva bi xeber û nameyên xwe çawa ne, nêzikva bi kirên xwe jî usa ne. ¹² Lê rast em newêrin, xwe mêzîne xin û himberî wan kin, yên ku xwexa pesinê xwe didin, gava ewana nava hevda xwe bi hev çap dikin, ew xwe himberî hevdu dikin û wê yekê fem nakin. ¹³ Lê çî ji me dik'eve, ku p'aya bidine xwe, em ji çapa xwe zêdetir naçin, lê weke wê çapa standî, ku Xwedê kire p'ara me, ku digihîje heta cem we jî. ¹⁴ Belê, ne usa ye, ku hûn ne *goveka* çapa meda bin, yanê em xwexa xwe dirêjî heta cem we dikin, lê rastî ev e, ku bi Mizgînîya Mesîh em îdî gihîştine heta cem we. ¹⁵ Em ji çapa *goveka* xwe dernayên û bi xebata hinekên din nafir'in. Lê em wê gumanê ne, ku bawerîya we bigihîje bibe weke wê dayîna ku me standye, xebata me jî nava weda hê zêde berfire be. ¹⁶ Em dixazin ku ji we wêdatir jî *her'in*~ Mizgînîyê cîyên mayîn jî dannasîn kin, ne ku em her'in *goveka* yekî dinda bi kirê wî bifir'in. ¹⁷ Lê çawa nivîsar e: «Yê difir'e, bira bi Xudan bifir'e».† ¹⁸ Çimkî ne ku yê p'ayê xwe dide, ew li *Xudan* xaş tê, lê yê ku Xudan p'ayê wî dide.

PAWLOS Û ŞANDÎYÊN DEREW

11 ¹ Xwezî we hinekî bêaqilîya min bibihûrya. Lê bikin ku hindava minda berbîhêr bin. ² Çimkî ez bi xîreta Xwedê xîreta we dik'işînim. Çimkî min hûn yekî'ra~ Mesîhr'a nîşan kirin, ku we mîna qîzeke bik'ir li ber *hizûra* wî bidime sekinandinê. ³ Lê t'enê ditirsim, ku çawa me'r bi fêlbazîya xwe Hêwa xapand, usa jî ew hişê we biçeliqîne û hûn destê xwe ji şîrhelalî û dilsafiya xweye hindava Mesîhda bikin. ⁴ Çaxê yek tê û Îsakî din dannasîn dike, yê ku me dannasîn nekiryê yan ruhekî din hûn distînin, yê ku we ji me nestandye yan mizgînîke din *dide*, ya

* 9:9 Zebûr 112:9.

† 10:17 Yêremîya 9:24.

ku me nedaye we, *hindava vanda* jî hûn xaş berbihêr in. ⁵Lê bi ya min ez t'u tiştîva ji wan şandîyên ahaye k'ifş ne kêmtir im! ⁶Belkî zimanda ne ser xwe me, lê ne zanebûna xweda. Me ev yek her alîyanva her tiştîda nîşanî we daye. ⁷Gelo min guneh kir, ku Mizgînîya Xwedê bêy maş da we û xwe jî ber we nimiz girt, ku hûn bilind bin? ⁸Min civînên mayîn «t'alan» kirin, ji ber maşê xweva, ku wer'a xizmetîyê bikim. ⁹Û li cem we, gava ez hewcê tişteki bûme, min giranî neda ji we t'u kesî, çimkî ew bawermendên ku ji Makedonyayê hatibûn, çi kêmasîyên min hebûn, wana destê xwe dirêjî min kir. Belê, min her alîyanva usa kirye, ku giranîyê nedime we û dikim ku nedim jî. ¹⁰Û bi rastîya Mesîhe ku nava minda ye, rûspîtiya min wê der-dorên qeza Axayayêda jî heç derneyê. ¹¹Ez, ku aha dikim, gelo we hiz nakim? Wê yekê Xwedê zane! ¹²Û min çawa kir, ezê usa jî bikim, ku rê nek'ewe wan, yên ku manîyan diger'in, ku p'ayê xwe bidin, yançîye ew jî mîna me dixebitin.

¹³Lê yên usa şandîyên derew in, k'arkerên qelp, ku xwe dikine kirasê şandîyên Mesîhe rast. ¹⁴Û ev yek ne tişteki ecêbmayînê ye! Şeytan xwexa jî xwe dike kirasê milyak'etê ronahîyê. ¹⁵Hilbet, ne tişteki zehmet e, ku xizmetk'arên wî jî bik'evine kirasê xizmetk'arên rastîyê. Axirîya wan wê weke kirên wan be.

TELÎ-TENGÎYÊN PAWLOSE ŞANDÎTÎYÊ

¹⁶Dîsa dibêjim, bira t'u kes min bêaqil hesab neke. Lê heger hûn hesab dikin jî, îdî bira min mîna yekî bêaqil qebûl kin, ku ez jî hinekî p'ayê xwe bidim. ¹⁷Çi ez *niha* dibêjim, ew ne ji qirara Xudan e, lê mîna yekî bêaqilî pey pesinê navê xwe k'etî dibêjim. ¹⁸Gelek bi merivayî p'ayê xwe didin, ezê jî p'ayê xwe bidim. ¹⁹Belê, hûn merivne serwaxt in, lê bi rezedilî bêaqilan sebir dikin! ²⁰Hûn sebir dikin, çaxê yek we dike xulam yan k'eda we dixwe yan we qazınca xwer'a dide xebatê yan bi k'ubarîya xwe we nimiz dike yan rûyê we dixwe. ²¹Ez bi şermî dibêjim, ku em wê yekêda pênebûyî bûn! Heger yek dil dike bi tişteki bifir'e, ezê jî dil bikim, (ez vê yekê ji bêaqilîyê dibêjim). ²²Ewana îbranî ne? Ez jî. Îsraêlî ne? Ez jî. Ji nisil Îbrahîm in? Ez jî. ²³Xizmetk'arên Mesîh in? (Bêaqilî dibêjim), ez ji wan hê zêdetir im! Ji wan zêdetir xebitîme, ji wan zêdetir k'etime hebsan, ji wan zêdetir hatime lêdanê, gelek caran heta ber devê mirinê jî çûme. ²⁴Bi destê cihûyan pênc caran, ji çilî qamçîk kême hatime lêdanê, ²⁵sê caran ez avîtime ber şivdarê, carekê ez dame ber keviran, sê caran rastî gemîwelgerandinê hatime, şev û rojekê be'rêda mame. ²⁶Gelek caran nava rêwîtiyên xweda nava cûr'e-cûr'e qezîyên giranda bûme~ ji ç'eman, ji t'alank'aran, ji miletê xwe, ji hêtanosan, bajêrda, çolanda, ser be'rê, ji birayên derew. ²⁷Ez xemxur bûm, dixebitîm, gelek caran min xewa şevê jî nedidît, t'î-birçî, gelek caran bêy nan, cemidî û bêsit'arîyêda bûm. ²⁸Pêştirî tengasîyên mayîn, *hela* xemên her civînanê her roj jî li ser min t'op dibin. ²⁹Yan k'î k'ete halê sist, ku ez jî pê'r'a neşyam? K'î jî rê tê derxistinê, ku dilê min jî naşewite?

³⁰Heger lazim be ez p'ayê xwe bidim, ezê bi sistîyên li halê xwe p'aya bême xwe. ³¹Xwedêyê Bavê Xudan Îsa, ku heta-ha-tê hêjayî şikirîyê ye, zane ku ez derewan nakim. ³²Bajarê Şamêda welîyê berdestîyê Arêtas p'adşa, nobedar dabûne ber dergêhên bajêr, ku min bigire, ³³lê ez bi sepetê p'encereke sûrêva hatime daxistinê û ji destê wî revîm.

DÎTINOK Û AŞKERETÎYÊN PAWLOSE JI XWEDÊDA

12 ¹Ez dikarim p'ayê xwe bidim, lê bi rastî qazınca wê t'une. Lê niha ezê derbazî wan dîtinok û aşkeretîyan bim, yên ku Xudan nîşanî min dane. ²Ez bawermendekî Mesîh nas dikim, çardeh sal pêşda, (bi qalib bû, nizanîm yan bêy qalib bû, Xwedê zane,) heta ezmanê sisyan hate hilbirinê. ³Û ez merivekî zanîm, ku (bi qalib bû, nizanîm yan bêy qalib bû, nizanîm, Xwedê zane,) ⁴heta buhiştê hate hilbirinê û tiştên ku nayêne ser zaran bihîstin, ku mêriv ne hêja ye jî wan tiştan xeber de. ⁵Ezê bi yekî usa *hêja* bifir'im, ne bi xwe, lê t'enê bi halê xweyî sist. ⁶Lê heger ez bixazim jî p'ayê xwe bidim, ev ne bêaqilî ye, çimkî ez rastîyê dibêjim. Lê ez xwe zêft dikim, ku nebe yek ser min tişteki zêde bifikire, pêştirî tiştê ku ji min dibihê yan dibîne.

⁷Û ku nebe *nişkêva* ez bona gelek aşkeretîyên seranser k'ubar bim, qalibê minda lêdanek, ku ç'îg dide, min'r'a hate dayînê, ku milyak'etekî Şeytan min bêşîne, ku ez k'ubar nebim. ⁸Bona vê yekê min sê caran hîvî ji Xudan kir, ku vê yekê ji min dûr xe, ⁹lê ewî gote min: «K'erema min besî te ye, çimkî qewata min nava sistîyêda meyasêr dibe». Awa ezê bi dilê razî pê sistîyên *halê* xwe bifir'im, ku qewata Mesîh nava minda be. ¹⁰Lema jî ez bona navê Mesîh sistîyên *halê xwer'a* qayl im~ qaranr'a, kêmasîyanr'a, zêrandinan û te'lî-tengîyanr'a, çimkî gava ez sist dibim, hingê qewat dibim.

XEMÊN PAWLOS HINDAVA KORINTÎYANDA

¹¹Rastî min bêaqilî kir ku p'ayê xwe da, lê we zor li min kir! Gerekê we p'ayê min bida. Ez t'u tiştîva ji wan şandîyên k'ifş ne kêmtir im, lê ez xwexa jî ne t'u tişt im. ¹²Bi her sebirêva şandîtiya mine rast bi nîşanan, k'iryametan û k'arên qewat nava weda hate îzbatkirinê. ¹³Gelo min çi tiştîda hurmeta we ji hurmeta civînên mayîn kêmtir girtye, pêştirî wê yekê, ku min zehmet neda we? Bibaxşînine min vê neheqîyê!

¹⁴Eva sê car e ez hazirîya xwe dibînim, ku ser weda bême û zehmetê nadime we. Ç'evê min ne ser hebûka we ye, lê li we ye! Çimkî ne ku law gerekê bona dê-bavan berhev kin, lê dê-bav bona lawên xwe. ¹⁵Ezê bi hub û rez mal-halê xwe jî û hema xwe jî bona we bidime der. Hizkî ez hê zêde we hiz bikim, lê hûn min kême. ¹⁶Usa min xwexa zehmet nedaye we, lê bi ya hinekan ezî fêlbaz bûme û bi fêl-fenê xwe min hûn avîtime t'ela xwe. ¹⁷Gelo min bi destê ewên ku min ser weda şandin, hûn qazınca xwer'a dane xebatê? ¹⁸Min hîvî ji Tîto kir û t'evî wî ew bira

şand. Gelo Tîto hûn qazınca xwer'a dane xebatê? Gelo me *kirê xwe* bi ruhekî nedikir? Gelo em ne ser rêkê bûn?

¹⁹ Belkî hûn difikirin, ku em heta niha li ber we dixazin xwe rûspî kin? Na! Lê em bi Mesîh li ber hizûra Xwedê xeber didin û her tiştî, delalîyên me, bona qazınca we dibêjin. ²⁰ Ez ditirsim, ku çaxê bêm, nişkêva we usa nebînim, çawa ez dixazim û hûn jî min usa nebînin, çawa hûn dixazin. Ditirsim ku nava weda hê şer'-de'w hebin, hevşûdî, diltengî, hevr'ikî, xeyb, buxdan, k'ubar-babaxî û bêt'erbetî hebin. ²¹ Ditirsim, ku çaxê dîsa ser weda bêm, Xwedêyê min serê min li ber we daxe û bona *wan* gelean şîne bikim, yên ku pêşda guneh kiribin û ji kirên heramiyê, bênamûsiyê û necayîziyê venegeryabin.

T'EMÎ Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

13 ¹ Eva cara sisyan e, ku ezê ser weda bêm. Çawa nivîsar e: «Gerekê bi devê du yan sê şehdan her tişt bê makkirinê».* ² Min hê pêşda gotye û niha jî dibêjim, mîna cara dudan, gava nava weda hizûr bûm, niha jî dîsa ji dûrva wanr'a û usa jî hemûyanr'a dinivîsim, yên ku pêşda guneh kirine: Heger dîsa bêm, îdî ezê nedime xatirê t'u kesî, ³ çimkî hûn îzbatîya wê yekê diger'in, ku bizanibin, gelo Mesîh bi min xeber dide. Mesîh hindava weda ne sist e, lê nava weda qewat e. ⁴ Rast e ew bi sistîyê hate xaçkirinê, lê bi qewata Xwedê zêndî ye. Belê, em bona wî dik'evine *halê* sist, lê nava weda emê bi qewata Xwedê t'evî wî bijîn.

⁵ Hûn xwe bicêribînin û binihêrin, gelo hûn nava bawerîyêda ne? Xwe binihêrin, gelo hûn tê dernaxin, ku Îsa Mesîh nava weda ye, t'enê hûn *lênihêrandinêda* pênebûyî nebin? ⁶ Lê guman heye, ku hûnê fem bikin, ku em ne pênebûyî ne. ⁷ Lê em dua Xwedê dikin, ku hûn xirabîyê nekin, lê ne bona wê yekê ku em qenc k'ifş bin, lê ku hûn qencîyê bikin, hizkî em pênebûyî jî k'ifş bin. ⁸ Çimkî em nikarin tişteki *xirab* li rastîyê bikin, lê t'enê em bona qazınca rastîyê k'ar dikin. ⁹ Em şa dibin, gava em sist dibin û hûn qewat dibin. Û em jî bona we dua dikin, ku hûn t'am bigihîjin. ¹⁰ Bona van yekan ez dûrva wer'a dinivîsim, ku nebe çaxê bêm, hindava weda sert bim, bi wî hikumê ku Xudan daye min, ya ku bona şenkirinê ye, ne ku xirabkirinê.

¹¹ De îdî, birano, xaş bin! Qedîm bin, ber dilê hevda werin, ser nêtekê bin, pey haştîyê bin û Xwedêyê hizkirinê û haştîyê wê wer'a be.

¹² Silavê bi ramûsana şîrê helal bidine hev. Her pîroz silavê li we dikin.

¹³ K'erema Xudan Îsa Mesîh, hizkirina Xwedê û t'evgirêdana Ruhê Pîroz li we hemûyanr'a be.

* 13:1 Qanûna Ducarî 19:15.

NAMA PAWLOS GALATÛYANR'A

PÊŞGOTIN

Li Asya Biç'ûkda Galatya qezake Romayê bû. Pawlos li dema rêwîtiya xizmetîya xweye pêşinda li qeza Galatayêda bajarên Entakya Pisidyayêda, Lîstrayêda, Dêrbêda û Îkonyayêda rikinê civînên mesîhîyê avît.

Û çaxê Pawlos ne wir bû, dannasînkirên başqe hatine li Galatayê û civîna wan t'evîhev kirin. Wan ev pirs pêşda anîn, ku: «Yê vedigere berbi Xwedê, gerekê li gora Qanûna Mûsa bê sinetkirinê, ku bibe mesîhî û Qanûnê xwey bike, ku li ber Xwedê rast bê hesabê». Pawlos hê pêşda bona vê yekê şirovekiribû, lê galatî dîsa xalifî bûn, wan hînkirina dersdarên şaş hildabû. Lê Pawlos bi vê namê dide k'ifşê, ku xizmetîya wî ji Xwedêda ye, ku ew Mizgîniya Îsa Mesîh bigihîne miletên necihû û civînên ji nava wan bi hînkirina Mizgîniyêye rast bişidine. Rast e, Pawlos hê pêşda rastîya Mizgîniyê ew hîn kiribûn, lê dîsa bi vê namê ji nivîsarên Kitêba Pîroz~ ji nivîsarên p'êxemberên Xwedê şirovedike, ku rîya azayîyê û rizgarîyê, ew bi bawerîya li ser Îsa Mesîh e, ne ku bi Qanûn qedandinê. Û yê ku bi Qanûn qedandinê dixaze rizgar be, usa dertê, ku ew kirinên xwe ser kirina Îsa Mesîh'a digire, ew ne ku bawer dîke, ku bi kirina Îsa wê rizgar be (ku boy me mir û zêndî bû), lê ew bawer dîke yanê wê boy kirinên xwe rizgar be. Pawlos dibêje, ku yên usa ji Mesîh dîr k'etine û k'erema Xwedê ji ji wan hatye bir'inê. Lê belê, Pawlos dinivîse, ku meriv bi kirê Îsa Mesîh rizgar dibe û bi k'erema Xwedê gerekê bi jîyîna paqij bijî.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin û şikirdayîn (1:1-10)

Pawlos û şandîyên mayîn (1:11-2:21)

Qanûn, bawerî û Mizgîniya k'erema Xwedê (3:1-4:31)

Azayî, binyata bedenî û binyata Ruhê Pîroz (5:1-26)

Alî hevdu bikin, himberî hev bûyîn k'ubar dîke (6:1-18)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ez Pawlosê *ku bûme* şandî, ew ne ji alîyê merivanda bû, ne jî bi destê merivan bû, lê bi destê Îsa Mesîh û Bav Xwedê, yê ku ji mirinê ew zêndî kir. ² *Belê ez* û hemû birayên t'evî min we civînên Galatayêda dixazin, ku ³ k'erem û haştîya Xwedê Bavê me û Xudan Îsa Mesîh bibe, ⁴ ewî ku canîya xwe anegorî daxaza Bavê me Xwedê ji ber gunehên meva da, ku me ji vî zemanê nihayî xirab rizgar bike. ⁵ Şikir Xwedêra heta-ha-tê! Amîn.

T'ENÊ MIZGÎNÎKE RAST HEYE

⁶ Ez ecêb dimînim, ku hûn usa zû ji wî *Xwedêyî* vedigerin, yê ku bi k'erema Mesîh gazî we kir û hûn diçine berbi mizgîniyê din. ⁷ Lê rast mizgîniyê din t'une, lê hene hinek, ku we t'evîhev dîkin û dixazin Mizgîniya Mesîh biguhêzin. ⁸ Lê heger em yan ji ezmên milyak'etek jî bê û mizgîniyê din wer'a dannasîn ke, ya ku ne mîna wê Mizgîniyê ye, ku me wer'a dannasîn kirye, bira nîfir li wî be! ⁹ Çawa me pêşda got, niha dîsa dibêjim: Heger yek mizgîniyê ne mîna wê Mizgîniya ku we hilda wer'a dannasîn ke, bira nîfir li wî be!

¹⁰ Gelo niha ez *dixazim* merivan razî kim yan Xwedê? yan ez dixazim, ku li merivan xaş bêm? Heger min hela hê bixasta li merivan xaş bihatama, nikaribûm bibûma xulamê Mesîh.

¹¹ Ez vê yekê we pê dihesînim, birano, ku ew Mizgîniya min dannasîn kir, ne ya merivayî ye. ¹² Min ew ji merivan nestand, ne jî ji kesekî hîn bûm, lê Îsa Mesîh ez pê hesandim.

¹³ We bona bêp'ergalîya mine waxtekêye nava cihûtîyêda bihistye. Min civîna Xwedê gelekî dizêrand û ew xirab dikir. ¹⁴ Nava cihûtîyêda jî ez ji gelek hevalên xwe pêşva bûm, alîyê xîreta rê-rizmên kal-bavanda jî hê zêde bûm. ¹⁵ Lê çaxê Xwedê xast, (wî ez hilbijartim, çaxê hê ez zikê dîya xweda bûm û bi k'erema xwe ez k'ifş kirim,) ku ¹⁶ Kur'ê xwe minva bide naskirinê, ku ez nava hêtanosanda wî dannasîn kim, hingê min şewra xwe t'u kesî nexist, ¹⁷ ne jî rabûme Orşelîmê, cem ewên ku berî min bibûne şandî, lê ez zû çûme Erebiştanê û dîsa vegeryame Şamê. ¹⁸ Paşê sê salan şûnda rabûme Orşelîmê, ku Petrûs bibînim û panzdeh rojan cem wî mam. ¹⁹ Lê ji şandîyên mayîn min t'u kes nedît, pêştirî Aqûbê birê Xudan. ²⁰ Ez çî ku wer'a dinivîsim, bêxêlif li ber hizûra Xwedê dibêjim. ²¹ Paşê çûme alîyên Sûryayê û Kîlîkyayê. ²² Lê civînên Mesîhe Cihûstanêda ez rû bi rû nas nedikirim. ²³ Wana t'enê bihistibû ku: «Ewî ku waxtekê em dizêrandin, niha xwexa wê bawerîyê dannasîn dîke, ya ku waxtekê xirab dikir». ²⁴ Û bona min şikirî didane Xwedê.

PAWLOS Û ŞANDÎYÊN MAYÎN

2 ¹ Paşî çardeh salan t'evî Barnabas ez dîsa rabûme Orşelîmê, min Tîto jî xwer'a bir. ² Ez *daxaza Xwedê* hesîyam, ku rabûm çûm û min ew Mizgîniyê li wan da hesandinê, ya ku ez nava hêtanosanda dannasîn dikim, lê ev yek min serokan'a başqe digot. Min nexast badîhewa bibezim yan bezîbim. ³ Lê heta Tîtoyê t'evî min jî, ku yûnan bû, zor li wî jî nekirine, ku bê sinetkirinê. Lê ev pirs pêşda hat, ⁴ çend birayên derew şûlikîne nava me, ku cesûsiyê azayîya me bikin, ya ku me bi *k'erema* Mesîh Îsa dest anîye, ku me bin destê xweda bidana xebatê. ⁵ Lê me qet deqekê jî gur'a wan nekir, ku rastîya Mizgîniyê nava weda qewîn-qedîm bimîne.

⁶ Lê bona wan jî, ku serok k'ifş dibûn, (qet ne xema min e, ku ew berê çî bûne, Xwedê firqiyê nake nava merivan), wan serokan t'u tişteki nû negotine min. ⁷ Lê hê dîtin, ku li min hatye spartinê, ku ez Mizgîniyê bidime nesinetan, çawa ku li Petrûs jî hatye spartinê, ku Mizgîniyê bide sinetbûyîyan. ⁸ Çimkî Xwedêyê ku Petrûs danî şandîyê cihûyan, hema wî jî ez danîm şandîyê hêtanosan. ⁹ Çaxê Aqûb, Petrûs û Yûhennayê ku stûn dihatine hesabê, bona wê k'erema ku minr'a hatibû dayîne pê hesîyan, destên xweye rastê dane min û Barnabas, çawa nîşana t'ifaqê, ew qayl bûn, ku em her'ine nava hêtanosan û ew jî nava cihûyan. ¹⁰ Lê wana hîvî kir, ku em feqîran

bîr nekin, ya ku ez xwexa jî demana wê yekêda me.¹¹ Lê çaxê Petrûs hate Entakyayê, ez aşkere miqabilî wî rabûm, çimkî ew şaş bû.¹² Berî hatina çend merivên ku Aqûb şandibûn, ewî t'evî bawermendên ji hêtanosan nan dixwar. Lê çaxê ewana hatin, ew paşda vedik'işîya û xwe başçe kir, ji tîrsa ewên ku digotin, gerekê *bawermendên ji hêtanosan* bêne sinetkirinê.¹³ Û cihûyên bawermende mayîn jî t'evî wî durûtî kirin, heta Barnabas jî xalifî, k'ete nava wê durûtîya wan.¹⁴ Lê gava min dît ku ew nava rastîya Mizgînîyêda namînin, hingê min li ber hemûyan Petrûsr'a got: «Heger tu cihû yî, lê mîna yekî hêtanos dijîyî û ne ku mîna cihûyan, tu çawa zorê didî *bawermendên ji hêtanosan*, ku bibine mîna cihûyan?»

CIHÛ JÎ, HÊTANOS JÎ BI BAWERÎYÊ RIZGAR DIBIN

¹⁵ Emên ku e'silê xweda cihû ne û ne ji gunehk'arên hêtanosan, ¹⁶ zanin ku meriv bi kirinên *li gora t'emîyên* Qanûnê nikare rast bê hesabê, lê t'enê bi bawerîya ser Îsa Mesîh. Me *xwexa* jî bawerîya xwe Mesîh Îsa anî, ku bi bawerîya ser Mesîh em rast bêne hesabê, lê ne ku bi kirinên Qanûnê, çimkî t'u beden bi kirinên Qanûnê nikare rast bê hesabê.¹⁷ Awa heger em dikin, ku bi Mesîh rast bêne hesabê, hingê k'ifş dibe, ku em xwexa jî mîna hêtanosan gunehk'ar in, gelo vê yekêda Mesîh bû wek'ilê gunehan? T'u car!¹⁸ Heger tiştên ku min xirab kirine, dîsa destpê dikim çê dikim, hingê ez neheqîya xwe didime îzbatkirinê.¹⁹ Çimkî ez bi Qanûnî bona Qanûnê mirim, ku bona Xwedê bijîm. Ez t'evî Mesîh xaç bûm, ²⁰ ji vir hada ne ku ez dijîm, lê Mesîh e, ku nava minda dijî. Û niha ez ku vî qalibîda dijîm, bi bawerîya hindava Kur'ê Xwedêda dijîm, yê ku ez hiz kirim û canîya xwe bona min da der.²¹ Ez k'erema Xwedê wêda navêjim, çimkî heger rasthesabbûn bi Qanûnê bûya, usa dertê ku Mesîh badîhewa mir.

QANÛN, BAWERÎ Û SOZÊ XWEDÊ

3¹ Ay galatîyên bêhesab! K'ê hişê we bir? Ê ne bona Îsa Mesîh usa wer'a hate gotinê, çawa bêjî ber ç'evê we hate xaçkirinê?² Ez t'enê vê yekê dixazim ji we bizanibim: We Ruhê *Pîroz* bi Qanûn-qedandinê stand yan bi bihîstin û bawerkirina *Mizgînîyê*?³ Çima hûn hesabana nadine xwe? We bi Ruh destpê kir û niha bi *cûr'ê* bedenî xilaz dikin?⁴ Haqas tişt badîhewa hatine serê we? Nabe ku badîhewa bin!⁵ Gelo ew *Xwedêyê* ku Ruhê xwe p'êşkêşî we kir û nava wêda k'iryametana dike, ew bona kirinên weye ji Qanûnê ne yan bona bihîstin û bawerkirina weye *Mizgînîyê*?

⁶ Bona Îbrahîm aha nivîsar e: «Îbrahîm bawerîya xwe Xwedê anî û ew yek jêr'a rastî hate hesabê».*⁷ Awa hûn bizanibin, yên ku bawer dikin ew in lawên Îbrahîm.⁸ Hê pêşda nivîsarê dabû k'ifşê, ku Xwedê wê bi bawerî hêtanos rast hesab bikirana û hê zûva Mizgînî dabû Îbrahîm ku: «Bi te wê dua-dirozge li her miletan bibe».^{† 9} Awa ewên ku bawer dikin, dua-dirozge li wan tê kirinê, t'evî Îbrahîmê bawermend.

¹⁰ Belê, ewên ku *gumana* kirinên Qanûnêda ne, ew binê nifirda ne, çimkî nivîsar e: «Nifir li wî merivî be, her k'ê ku nava hemû nivîsarên kitêba Qanûnêda namîne û naqedîne».^{‡ 11} Îdî safî ye, ku t'u kes bi Qanûnê nikare li ber hizûra Xwedê rast bê hesabê, çimkî *nivîsar e, ku*: «Yê rast bi bawerîyê wê bijî».^{§ 12} Lê Qanûn ne bi bawerîyê ye, lê çawa nivîsar dibêje: «K'ê t'emîyên Qanûnê biqedîne! ewê bi wan bijî».^{** 13} Mesîh ji nifirê Qanûnê em k'ir'in, dewsa me ew k'ete binê wî nifirî, çimkî nivîsar e: «Nifir li wî be, yê darva tê dardakirinê».^{†† 14} Ku dua-dirozge Îbrahîmr'a dayî bi Mesîh Îsa bê ser hêtanosan, ku em jî sozên Ruhê *Pîroz* bi bawerîyê bistînin.

¹⁵ Birano! Ez tîname ser qirara dinyayê. Heger yekî warhebûkek qedîm kiribe, t'u kes nikare wê hêç ke yan jî tiştêkî din serda zêde ke.¹⁶ Awa ew soz Îbrahîm û zuretê wîr'a hatine dayînê. Nivîsarêda nayê gotinê: «Zuretên te» çawa bona gelekana, lê bona yekî: «Zuretê te»^{‡‡} û ew zuret Mesîh e.¹⁷ Awa ez vê yekê dibêjim, ew warhebûka ku ji Xwedêda hê pêşda bi soz hatibû qedîmkirinê, Qanûna ku çarsid sî salî şûnda derk'et, nikare wan sozên betal ke û *war jî* hêç ke.¹⁸ Çimkî heger wartî ji Qanûnêva girêdayî bûya, wê sozva girêdayî nebûya, lê Xwedê *war* bi soz p'êşkêşî Îbrahîm kir.

¹⁹ Îdî meremê Qanûnê çi bû? Qanûn serda zêde bû, ku neheqî bê naskirinê, heta hatina wî zuretî, k'îjanîr'a soz dabû. Qanûn ji alîyê milyak'etanda, bi destê navçetîya yekî hate dayînê.^{§§ 20} Lê bona dayîna warhebûkê navçê ne lazim e, çimkî warhebûk bi destê yekî tê dayînê û ew yek xût Xwedê ye.

WARXUR Û XULAM

²¹ Gelo Qanûn miqabilî sozên Xwedê ye? T'u car! Heger qanûnek hebûya, ku bikaribûya jîyîn bida, hingê rasthesabbûn eseyî wê bi qanûnê bûya.²² Lê nivîsar hemûyan bin hêsîrîya gunehda dide k'ifşê, ku tiştên sozdayî bawermendanra bi bawerîya ser Îsa Mesîh bêne dayînê.

²³ Û bawerî ku hê nehatibû, em bin destê Qanûnêda mîna girtîyan dihatine xweykirinê, heta wê bawerîya ku wê

* 3:6 Destpêbûn 15:6; Romayî 4:3.

† 3:8 Destpêbûn 12:3; 18:18; 22:18.

‡ 3:10 Qanûna Ducarî 27:26.

§ 3:11. Hebaqûq 2:4.

** 3:12 Qanûna K'ahîntîyê 18:5.

†† 3:13 Qanûna Ducarî 21:23.

‡‡ 3:16 Destpêbûn 13:15; 24:7.

§§ 3:19 Qanûna Ducarî 33:1-3; Îbranî 2:2; K'arên Şandîyan 7:38, 52.

k'ifş bûya. ²⁴ Û aha Qanûn bû t'erbetdarê me û em anîne berbi Mesîh, ku em bi bawerîyê rast bêne hesabê. ²⁵ Lê niha bawerî ku hatye, îdî em ne bin destê Qanûna t'erbetdarda ne.

²⁶ Bi bawerîya ser Mesîh Îsa hûn hemû jî lawên Xwedê ne. ²⁷ We Mesîh li xwe wergirtye, hûn hemûyên ku bi Mesîh hatine nixamtinê. ²⁸ *Îdî* firqî ne nava cihû û necihûda heye, ne nava xulam û azada, ne jî nava mêr û k'ulfetda, çimkî hûn hemû jî yek in, bi Mesîh Îsa. ²⁹ Û heger hûn p'ara Mesîh in, usa ye hûn zuretê Îbrahîm in û warxurên wî sozî ne.

4 ¹ Awa ez *vê yekê* dibêjim, warxur heta ku zar' e, ew ji xulêm nayê firqîkirinê, nenihêrî wê yekê, ku ew xweyê her tiştî ye. ² Lê bin destê xemk'êş û wek'îlanda ye, heta wî waxtê ku bavê k'ifş kirye. ³ Usa jî çaxê em ruhanîda hê «zar'» bûn, me xulamtî sixirên vê dinyayêra dikirin. ⁴ Lê çaxê waxt ser hevda hat, Xwedê Kur'ê xwe şand, yê ku ji k'ulfetê bû û k'ete bin Qanûnê, ⁵ ku yên bin Qanûnêda aza bike û em bibine warxurên Xwedê.

⁶ Û çimkî hûn lawên wî ne, Xwedê Ruhê Kur'ê xwe şande nava dilê we, ku gazî Xwedê dike: «Abba!»~ yanî «Bavo!» ⁷ Awa îdî tu ne xulam î, lê law û heger law î, usa jî bi Mesîh warxurê Xwedê yî.

XEMA PAWLOS BONA GALATYAN

⁸ Waxtekê, çaxê we Xwedê nas nedikir, we xulamtî yên usara dikirin, ku rast ne xwedê bûn. ⁹ Lê niha we ku Xwedê nas kirye, hela Xwedê jî hûn nas kirine, îdî çawa dîsa hûn vedigerine ser wan sixirên vê dinyayêye bêqewate ne t'u tişt û dixazin dîsa wan'a xulamtîyê bikin? ¹⁰ Hûn guh didine rojên *cejnan*, mehan, deman û salan. ¹¹ Ez bona we ditirsim, ku ew k'arê min bona we kirye deya her'e.

¹² Ez hîvî ji we dikim, birano, bibine mîna min, çimkî ez jî mîna we bûme. We t'u zirar nedaye min. ¹³ Hûn zanin, ku cara pêşin, ku min Mizgînî da we, ez qalibê xweda bêsihet bûm. ¹⁴ Û wî halîda jî we dîsa ez bêhurmet nekirim û pišta xwe neda min, lê weke milyak'etekî Xwedê we ez qebûl kirim û weke Mesîh Îsa. ¹⁵ Ew şabûna we bona çi bû? Ez xwexa şehdeyê we me, heger ji dest weva bihata, weyê ç'evê xwe jî derxista bida min. ¹⁶ Îdî ez bûme dijminê we, ku min wer'a rast xeber daye?

¹⁷ Ewên dine ku k'etine demana we, ew ne ku qencîya we dixazin, lê dixazin we ji min biqetînin, ku hûn bik'evine demana wan. ¹⁸ Qenc e ku meriv demana qencîyêda be û ne t'enê hingê, çaxê ez nava weda bim, lê her t'im. ¹⁹ Lawên min, niha ez dîsa bona we mîna êşa k'ulfetê dik'işnim, heta ku nava weda *nîgara* Mesîh çê be. ²⁰ Xwezî niha ez li cem we bûma û min cûr'ê xeberdana xwe biguhasta, çimkî bona we ez k'etime nava mitalan!

MESELA HACER Û SERAH

²¹ Hela bêjine min, hûn ku dixazin bin Qanûnêda bin, we nebihîstye Qanûn çi dibêje? ²² Nivîsar e ku: «Du kur'ên Îbrahîm hebûn, yek ji carîyê bû, yê din ji jina aza». ²³ Yê ji carîyê bû, ew bi *fikira* bedenî ji dîya xwe bibû, lê ewê ji jina aza bû, ew li gora sozê Xwedê bû. ²⁴ Ev yek bi sîmvolî tê femkirinê, ev her du jin du peyman in: Yek ji ç'iyayê Sînayê bona xulamtîyê tîne, ew Hacer bû. ²⁵ Hacer li Erebanêda ç'iyayê Sînayê tê hesabê û dibe mîna Orşelîma niha, ku lawên xweva xulamtîyê dike. ²⁶ Lê ya aza, ew Orşelîma jorin e û ew e dîya me hemûyan. ²⁷ Çimkî nivîsar e: «Şa be, bêzureta ku te zar' nedanîn. Ji şabûna bistirê, bike qîr'în, ku te êşa zar'anîne nek'işand. Çimkî zar'okên te mêrberdayîyê wê ji zar'okên ya xweymêr zêdetir bin».*

²⁸ Awa, birano, mîna Îshaq hûn lawên wî sozî ne. ²⁹ Lê çawa hingê usa jî niha yê ji *fikira* bedenî bibû, yê ji alîyê Ruhda dizêrand. ³⁰ Lê nivîsar çi dibêje? «Wê carîyê kur'ê wêva t'evayî berîdê derxe, çimkî kur'ê carîyê t'evî kur'ê jina aza gerekê war nestîne».† ³¹ Awa, birano, em ne lawên carîyê ne, lê lawên ya aza ne.

AZAYÎYÊDA BIMÎNIN

5 ¹ Wê azayîyêda qewîn-qedîm bimînin, ya ku Mesîh bona me anî û dîsa nek'evine bin barê wê xulamtîyê.

² Bibihên, ez Pawlos dibêjime we: Heger hûn bêne sinetkirinê, Mesîh t'u qazincê nade we. ³ Ez her merivîr'a dîsa aşkere dibêjim, k'ê razî ye, ku bê sinetkirinê, ew borcdar e, ku t'emamîya Qanûnê biqedîne. ⁴ Û heger hûn bi Qanûn-qedandinê dixazin rast bêne hesabê, hingê hûn ji Mesîh qetyayî ne û ji k'erema *wî* k'etî ne. ⁵ Lê çi ji me dik'eve, em bi saya Ruhê *Pîroz* û bi bawerîyê gumana wê rasthesabbûnêda ne. ⁶ Çimkî li hizûra Mesîh Îsada ne sinetî tişteke e, ne jî nesinetî, lê serî bawerî ye, ku bi hizkirinê ya xwe dike.

⁷ Ê ne hûn baş pêşda diçûn! K'ê hûn dane sekinandinê, ku elimî rastîyê nebin? ⁸ Eva helana ne ji wî ye, yê ku gazî we kirye. ⁹ «Hinek hevîrtirşk hevîr pêva hiltîne». ¹⁰ *Lê* bona we ez Xudanda guman im, ku hûnê tişteki din nefikirin, lê yê fikirên we t'evîhev dike wê ser bela xwe vebe, k'î jî ku hebe.

¹¹ Lê ez, birano, heger hela hê sinetîyê dannasîn dikim, îdî çima tême zêrandinê? Ku usa ye gerekê t'u kes ji xaçê Mesîh p'işk nebûya. ¹² K'a bibûya, ku yên fikirên we t'evîhev dikin, xwexa ji xwe k'okêda bibir'iyana!

¹³ Hûn! azayîyêr'a hatine gazîkirinê, birano, lê t'enê ew azayîya we bira mecalê nede dilhavijîya *binyata* bedenî, lê bi hizkirinê hev'r'a xulamtîyê bikin. ¹⁴ Çimkî t'emamîya Qanûnê bi vê gotinê ser hevda tê: «Hevalê xwe weke kesa xwe hiz bike».‡ ¹⁵ Lê heger hûn hevdu bigezin û hevdu bixwin, miqatî xwe bin, ku hûn hevdu ret nekin.

* 4:27 Îşaya 54:1.

† 4:30 Destpêbûn 21:10.

‡ 5:14 Qanûna K'ahîntîyê 19:18.

¹⁶ Awa ez dibêjim, li *gora binyata* Ruh bimeşin û hûnê gura dilhaviyîyên *binyata* bedenî nekin. ¹⁷ Çimkî dilhaviyîya *binyata* bedenî miqabilî Ruh e, *binyata* Ruh jî miqabilî *binyata* bedenî ye. Ev her du li hev nakin, lema hûn nikarin xastinên dilê xwe bikin. ¹⁸ Lê heger hûn bi Ruh têne rêberîkirinê, hûn nak'evine bin *nifirê* Qanûnê.

¹⁹ Awa kirên *binyata* bedenî k'ifş in: Bênamûsî, heramî, necayîzî, ²⁰ p'ûtp'arêzî, sêrbazî, dijminatî, şer'-de'w, hevsûdî, hêrsk'etin, hevr'ikî, dutîretî, cudetî, ²¹ ç'evê xirab, merivkujî, maşoqê îçkê, neqenc û çî ku mîna van in. Ez niha wer'a dibêjim, çawa min pêşda jî gotibû, ku yên van tiştan dikin, P'adşatîya Xwedê war nabin.

²² Lê berên Ruh ev in: Hizkirin, şabûn, haştî, sebirkirin, şîrinayî, qencî, aminî, ²³ milûkî, xwegirtin. Hindava van tiştanda *hikumê* Qanûnê t'une. ²⁴ Û ewên ku p'ara Mesîh Îsa ne, *binyata* xweye bedenî temên xirabva û haviyîyanva t'evayî ser xaç kuştine. ²⁵ De ku em bi saya Ruh dijîn, em gerekê bi rêberîya Ruh bimeşin. ²⁶ Em k'ubar nebin û *wê yekêda* agirê hevdu gur' nekin û hevsûdîyê li hevdu nekin.

ALÎ HEVDU BIKIN, HIMBERÎ HEV BÛYÎN K'UBAR DIKE

⁶ ¹ Birano, heger yek neheqîkêda bê girtinê, hûn ku *merivne* ruhanî ne, wî bi ruhê milûkîyê bînine ser rîya rastîyê. Lê haş ji xwe jî hebin, ku hûn nek'evine cêribandinê. ² Barên hevdu hildin û aha hûnê qanûna Mesîh biqedînin. ³ Heger yek xwe dewsa tiştêkî datîne û bi xwe ne tiştêk e, ew xwexa xwe dixapîne. ⁴ Bira her kes kirinên xwe bide ser mêzînê û paşê ji xwe razî be, ne ku xwe himberî hevalê xwe bike. ⁵ Çimkî her kes wê caba kirên xwe bide.

⁶ Ewê hînî xebera Xwedê dibe, gerekê her tiştên qencda dersdarê xwe bike nava p'arê. ⁷ Nexapin, Xwedê nabe pêk'enî. Çimkî meriv çî diçîne, wê jî didirû. ⁸ K'î ku bona *binyata* bedenî diçîne, ewê ji wê bedena *elê gunehkirinê* mirinê bidirû, lê k'î ku bona *binyata* Ruh biçîne, wê ji Ruh jîyîna heta-ha-tê bidirû. ⁹ Ji qencîkirinê aciz nebin, çimkî emê waxtda bidirûn, heger niha em sist nebin. ¹⁰ Awa heta ku waxt destên meda ye, hemûyan'a qencîyê bikin, hê zêde neferên malên bawermendan'a.

¹¹ Binihêrin, ez bi çî herfên gir niha wer'a dinivîsim. ¹² Ewên ku dixazin ji dervava xwe bidine k'ifşê, ew p'êyî ser we dikin, ku hûn bêne sinetkirinê. Lê evana vê yekê dikin, ku nişkêva bona xaçê Mesîh ew neyêne zêrandinê.

¹³ Ewên xweysinet xwexa jî Qanûnê xwey nakin, lê dixazin hûn bêne sinetkirinê, ku ew bi sinetîya qalibê we bifir'in. ¹⁴ Lê ez, t'obe, be ku bi tiştêkî din bifir'im, lê pêştirî bi xaçê Xudanê me Îsa Mesîh, bi k'îjanî dinya bona min xaçbûyî ye, ez jî bona dinyayê. ¹⁵ Ne sinetî tiştêk e, ne jî nesinetî, lê serî ew e, ku bibine efirînekî nû.

¹⁶ Bira haştî û rehm li ser wan hemûyan be, yên ku anegorî vê yekê dijîn û usa jî ser Îsraêla Xwedê be.

¹⁷ Ji vir hada bira t'u kes zehmetê nede min, çimkî nîşangehên birînên Îsa min hildane li ser bedena xwe. ¹⁸ Bira k'erema Xudanê me Îsa Mesîh ruhê wer'a be, birano. Amîn.

NAMA PAWLOS EFESÛYANR'A

PÊŞGOTIN

Bajarê Efesê li qeza Asyayêda p'ayt'extê Împêratorîya Romayê bû. Ew bajarekî herî k'ifş bû. Alîyê mezinayîya xweda, li Împêratorîya Romayêda ew bajarê çaran bû û gelekî bedew û xaş bû.

Civîn Efesêda rast e bi xizmetîya Pawlos çê nebibû, lê qasî sê salan ew li wir maye û ew hîn kirine. Û ev nama xwe Pawlos ji hebsê bawermendên wirra nivîsiye (3:1; 4:1; 6:20). Usa jî namên wîye filîpiyanr'a, kolosîyanr'a û Filîmonr'a ji hebsê hatine nivîsarê. Ev name nav dibin «Nameyên ji hebsê».

Bi vê namê Pawlos qîrar û meremê Xwedêyî heta-ha-tê tîne li ber ç'evan, ku çawa bi meyaserbûna t'ivdîra Xwedê wê hemû tişt bin serwêrtîya Mesîhda bin, him her tiştên li erdê, him jî yên li ezmên. Û hemû millet jî ber Xwedê gerekê yektîya Îsa Mesîhda bibine yek. Pawlos gazî cimeta Xwedê vê yekê dike, ku nava vê qîrarêda bimesîn.

P'ara namêye pêşinda Pawlos nêt-fikira yektîya t'evî Xwedê pêşda tîne, ku çawa Bav Xwedê cimeta xwe hilbijart, gîhande gunehafûbûnê û bi saya Kur'ê xwe Îsa Mesîh ew rizgar kirin. Usa jî li ser sozê Xwedêyî mezin disekine, ku Xwedê çawa Ruhê xweye Pîroz bi hesabê bihêya warstandinê dide bawermendan.

Lê p'ara namêye dudanda Pawlos wanr'a şirovedike, ku ewana jîyîneke usa bijîn, çawa yektîya Mesîhda ew jîyîn heye, ku xwedênas civînêda, malda, hevaltîyêda hurmet bin, bi milûkîyê, hizkirinê û xemk'êşîyê hevr'a xizmetîyê bikin, ku bi vî awayî rastîya Xwedê usa k'ifş be, çawa heye.

Pawlos vê namêda p'evgirêdana Mesîh û cimeta Xwedê bi sê şikilan tîne li ber ç'evan: Civîn çawa bedenek, ku serê wê Mesîh e, ya dudana civîn mîna xanekê ye, ku kevirê enîşka wê Mesîh e û ya sisyan civîn mîna k'ulfetekê ye, malxê wê Mesîh e. Bi van yekan Pawlos li ser rehma Xwedêye yektîya Îsa Mesîhda disekine, ku her tişt hizkirin. xwep'êşkêşkirin, baxşandin û k'erema Mesîhva girêdayî ye.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin, Mesîh û civîna wî (1:1-3:21)

Mesîh, bedena wî û jîyîna nû (4:1-6:9)

Ç'ekên xwedênasîyê û dua-dirozge (6:10-24)

SILAVKIRIN Û DUA-DIROZGÊN RUHANÎYE BI MESÎH

1 ¹⁻² Ji Pawlosê şandîyê Îsa Mesîhe bi daxaza Xwedê: bira k'erem û haştîya Xwedêyê Bavê me û Xudan Îsa Mesîh li ser we pîrozên Îsa Mesîhe amin be, we bawermendên wîye ku li Efesêda dimînin.

³ Xwedêyê dua-dirozgeva xinê, Bavê Xudanê me Îsa Mesîh, yê ku bi hemû dua-dirozgên ruhanîye li ezmanan bi Mesîh dirozge li me kirin. ⁴ Û hê berî efirandina dinyayê Xwedê bi wî em hilbijartin, ku em li ber hizûra wî bi hizkirinê pîroz û bêqusûr bijîn. ⁵ Ewî em bi destê Îsa Mesîh hê pêşda k'ifş kiribûn, çawa li dilê wî xaş hat, ku me bike warxurên xwe, ⁶ ku pesinê wî bona wê k'erema wîye xweyrûmet bê dayînê, bi çi jî ewî pê Hizkirîyê xwe mer'a qencî kir. ⁷ Bi wî, yanê bi xûna wî me rizgarî standye~ me afûbûna gunehan standye, li gora k'erema wîye zengîn, ⁸ ya ku wî gelek ser meda barand, bi her serwaxtîyê û femînê. ⁹ Wî sur'a daxaza xwe meva vekir, çawa li wî xaş hat, çi ku hê pêşda Mesîhva girêdayî wî qîrar kiribû, ¹⁰ ku hema waxt ser hevda bê, t'ivdîra wî meyaser be, ku her tişt bik'evine bin serwêrtîya Mesîh, him her tiştên li erdê, him jî yên li ezmanan. ¹¹ Bi wî em bûne warxurên Xwedê û ev yek Xwedê qîrara xweda hê pêşda k'ifş kiribû, ku her tişt li gora daxaz û qîrara wî be, ¹² ku em pesinê rûmeta wî bin, emên ku hê pêşda Mesîhda guman in. ¹³ We jî, gava xebera rastîyê~ Mizgînîya rizgarbûna xwe bihîst, we bawerîya xwe Mesîh anî û bi Ruhê Pîrozî sozdayî hatine morkirinê. ¹⁴ Yê ku bihêya wê yekê ye, ku em warxurên Xwedê ne, heta ku ew cimeta xwe t'am aza ke, bona pesinê rûmeta xwe.

DUAYÊ PAWLOS

¹⁵ Awa min jî ji hingêda, ku bona bawerîya weye ser Xudan Îsa û wê hizkirina weye hindava hemû pîrozanda bihîstye, ¹⁶ bona we dest ji şikirdariyê nek'işandye. Ez t'imê nava duayên xweda we bîr tînim, ¹⁷ ku Xwedêyê Xudanê me Îsa Mesîh~ Bavê xweyrûmet, Ruhê serwaxtîyê û hesînê bide we, ku hûn wî t'am nas bikin. ¹⁸ Û ç'evên ruhê we vebin, ku hûn bizanibin, ew gumana wê gazîya bona we *bi xwe* çi ye û ew zengînya rûmeta wîye bona pîrozana çi ye. ¹⁹ Û ew mezinayîya zoraya wîye seranser çi ye, nava me bawermendanda, ya ku bi qewata zor tê bik'aranînê, ²⁰ *hema ew zoraya* ku Xwedê li ser Mesîh da k'ifşê, çaxê ew ji nava mirîyan zêndî kir û li ezmanan alîyê xweyî rastê da rûniştandinê, ²¹ ew danî li ser her serwêrtîyan, hikumetîyan, qewatan, xudantîyan û li ser her navên ku têne hildanê, ne t'enê li vê dinyayê, lê dinê axretê jî. ²² Û Xwedê her tişt kirine bin p'iyên wî û ew k'ifş kir çawa serê civînê. ²³ Civîn jî bedena Mesîh e, t'emambûna wî, belê, *Mesîh* xwexa t'evayîya her tiştî li her deran t'emam dike.

BI K'EREMÊ HÛN RIZGARBÛYÎ NE

2 ¹ Hûn rûyê neheqî û gunehên xweda mirî bûn, ² ku pey rê-rizmên vê dinyayê diçûn û ew yek li gora serk'arîya Mîrê vê hewê bû, ew ruhê ku niha nava wan merivanda ya xwe dike, yên ku ne gura Xwedêda ne. ³ Em hemû jî waxtekê pey wan tiştan diçûn~ me bi dilhaviyîyên *binyata* bedenî dijît û dil û fikirên mer'a çi derbaz dibûn me ew yek dikirin û binyata xweda em hêjayî *xezeba* hêrsa Xwedê bûn, çawa ewên din. ⁴ Lê Xwedêyê ku xweyrehma mezin e, bi hizkirina xweye mezin, bi k'îjanê em hiz kirin, ⁵ çaxê eme ku rûyê neheqîyên xweda hê mirî bûn, ewî em t'evî Mesîh zêndî kirin. Bi k'eremê hûn rizgarbûyî ne! ⁶ Bi Îsa ewî em ji mirinê zêndî kirin û t'evî wî em li ezmanan dane rûniştandinê, bi saya Mesîh Îsa. ⁷ Wî eva yeka kir, ku li nava wan zamanên wê bênda zengînya k'erema xweye seranser, ku bona me ye, bi şîrinayî bide k'ifşê, ya ku bi destê Mesîh Îsa ye. ⁸ Çimkî hûn bi

k'eremê rizgarbûyî ne, bi destê bawerîyê û eva yeka ne ji we ye, lê dayîna Xwedê ye. ⁹ Ev ne ji kirinan e, ku t'u kes p'ayê xwe nede. ¹⁰ Belê, em efirînên *destê wî* ne, bi Mesîh Îsa bona kirinên qenc xuliqî, ku Xwedê hê pêşda hazir kirin, ku em nava wan *kirinanda* bimeşin.

HEMÛ BAWERMEND BI SAYA MESÎH YEK IN

¹¹ Awa bîr bînin, ku hûn jî waxtekê bi bedenî hêtanos bûn, ku ji alîyê cihûyanda bêsinet dihatine hesabê, ewên ku xwe sinetkirî hesab dikirin, bi sinetîya qalibe bi destan kirî. ¹² Hingê hûn bêy Mesîh û xerîb bûn û hindava bajarvantîya Îsraêlda û ji peymanên sozdayî jî dûr bûn û vê dinyayêda bêy guman û bêy Xwedê bûn. ¹³ Lê hûnên ku waxtekê dûrî van tiştan bûn, bi xûna Mesîh niha Mesîh Îsara bûne nêzik. ¹⁴ Çimkî ew e haştîya me, ku her du-*cihû û necihû* hevr'a kirine yek. Ewî dîwarê navbir'iyê, awa gotî dijminatî bi bedena xwe xirab kir ¹⁵ û qanûna t'emîyane bi ferman dayî jî hêç kir, ku bi xwe, ji her duyan~ ji *cihû û necihûyan* merivekî nû bixuliqîne û bi vî cûreyî bike haştî. ¹⁶ Ê Mesîh bedenekêda her du t'evî Xwedê bi xaçê xwe li hev anîn, çimkî bi wê kirinê dijminatî lap ji navê derxist. ¹⁷ Hat û Mizgînîya haştîyê da we *necihûyên* dûrî Xwedê û cihûyên nêzikî wî. ¹⁸ Çimkî bi saya wî, me her duyanra jî *destûr* heye, ku bi Ruhekî nêzikî Bavê bin.

¹⁹ Awa hûn îdî ne xerîb û firarî ne, lê bajarvantîya we t'evî pîrozane e û hûn neferên mala Xwedê ne, ²⁰ li ser wî rik'inî hatine çêkirinê, ya ku şandîyan û p'êxemberan danî, kevirê enîşka k'îjanî Mesîh Îsa xwexa ye. ²¹ Bi wî t'emamîya xanî pêva bi cî-yêr çawa p'aristxaneke pîroz bilind dibe, bi saya Xudan, ²² bi k'îjanî hûn jî bi hevr'a tene çêkirinê, çawa xana Xwedê, bi Ruhê Pîroz.

PAWLOS ŞANDÎYÊ NAVA HÊTANOSAN

3 ¹ Awa ez Pawlos, ku bona navê Mesîh Îsa hebsêda me, boy xatirê we hêtanosan e. ² Gerekê we bihistibe, ku ev wek'iltî ji k'erema Xwedê minr'a bona we hatye dayînê. ³ Eva sura bi aşkeretîkê li ber min hate vekirinê. Ê li jor *vê namêda bona wê* min kurt wer'a nivîsî ⁴ û gava hûn bixûnin, hûnê bikaribin zanibin ku ez haş ji sura Mesîh heme. ⁵ Eva sura dewrên bihurîda li ber lawên merivan venebûye, çawa niha bi Ruhê Pîroz li ber şandî û p'êxemberên wîye pîroz vebûye, ⁶ ku hêtanos bi Mesîh Îsa, bi Mizgînîya *wî t'evî Îsraêlê*, çawa endemên bedenekê bibine xweyp'arên war û wan sozên ku wî dan.

⁷ Ez bûme xizmetk'arê vê Mizgînîyê, li gora hikumê zoraya Xwedê, anegorî dayîna ji k'erema wî. ⁸ Belê, ezî ku ji nava pîrozanda yê herî biç'ûk im, lê ev k'erem minr'a hatye dayînê, ku nava hêtanosanda zengînya Mesîhe seranser dannasîn kim ⁹ û li ber hemûyan vekim, ku çawa t'ivdîra sura Xwedê tê bik'aranînê, ya ku hê dewrên berêda cem Xwedêyê ku her tişt efirandye, veşartî mabû. ¹⁰ *Xwedê xwest*, ku serwaxtîya xweye cûr'e-cûr'e niha bi destê civînê li serwêrtî û hikumetên ezmananva aşkere ke, ¹¹ anegorî qirara xweye ji dewrên berêda, ya ku wî bi destê Mesîh Îsa Xudanê me kir. ¹² Bi Mesîh û bi wê bawerîya meye ser wî em dikarin bêtirs û rûvekirî nêzikî Xwedê bin. ¹³ Awa ez ji we hîvî dikim, ku hûn, bona wan te'lî-tengîyên mine boy we ber xwe nek'evin, yên ku bona rûmeta we ne.

HIZKIRINA ÎSA MESÎH

¹⁴ Bona vê yekê ez li ber Bav çok vedidim, ¹⁵ ji k'îjanî her qebîleke li erd û ezmanan navê xwe distîne, ¹⁶ *dua dikim*, ku ew bide we, ku hûn weke zengînya rûmeta wî bi zoraya Ruh k'ûrayîya dilê xweda bişidin, ¹⁷ ku Mesîh bi bawerîyê dilê wêda bijî û hûn hizkirinêda raw bidin û qedîm bin, ¹⁸ ku t'evî hemû pîrozane hûn bikaribin fem bikin, ku çi ye berayî, dirêjayî, bilindayî û k'ûrayî, ¹⁹ awa gotî hizkirina Mesîh nas bikin, ya ku seranser ser her zanebûnêra ye, ku hûn t'evayîya Xwedêva t'ije bin.

²⁰ Belê, ew dikare bi wê qewata ku nava meda k'arê xwe dike, her tiştî ji xastin û fikirîna me zêdetir bike, ²¹ şikir wîr'a nava civînêda, bi saya Mesîh Îsa, hemû zemanîda, heta-ha-tê! Amîn.

EM HEMÛ ENDEMÊN BEDENEKÊ NE

4 ¹ Awa ez, ku bona navê Xudan girtîyê hebsê me, hîvî ji we dikim, ku hûn layîqî wê gazîyê bijîn, k'îjanêra hatine gazîkirinê. ² Hûn bi t'emamîya milûkîyê û xwe nimiz girtinê, bi sebirê û hizkirinê li ber hev daxin. ³ Bicedînin, ku hevgirêdana Ruhê Pîroz bi p'evgirêka haştîyê xwey bikin. ⁴ Wek bedenekî û *ji* Ruhekî, çawa ku hûn gumanekêra hatine gazîkirinê. ⁵ Xudan yek e, bawerî yek, nixamtin yek, ⁶ Xwedê yek~ Bavê hemûyan, ku ser hemûyanra ye, t'evî hemûyan e û nava we hemûyanda ye.

⁷ Belê, ji me her kesîra jî k'erem hatye dayînê, çawa Mesîh p'arevekir. ⁸ Bona vê yekê tê gotinê: «Çaxê hilk'işya çû jorê, hêsîr ji hêsîrîyê aza kirin û p'êşkêş dane merivan». ⁹ Ev «hilk'işya» çi tê hesabê? Ew ev yek e, ku ew pêşda dak'ete vê dinya jêrin. ¹⁰ Ewê ku dak'et, hema ew xwexa *Mesîh* bû, ku ji hemû ezmanan jortir çû, ku her tiştî hizûra xweva t'ije ke. ¹¹ Ê *hema* wî p'êşkêş dane merivan, ku hinek bibine şandî, hinek p'êxember, hinek mizgîndar, hinek jî serk'ar û dersdar, ¹² bona k'amiltîya pîrozane, bona hazirbûna wane k'arên xizmetîyêr'a, bona şênbûna bedena Mesîh, ¹³ heta ku em hemû jî bigihîjine wê yekê, ku bawerîyê û Kur'ê Xwedê naskirinêda bibine yek, bibine merivên gihîştî, awa gotî bigihîjine dîndara Mesîhe t'am.

* 4:8 Zebûr 68:18.

¹⁴ Ji vir hada em nebîne mîna zar'okan, ku ji pêlan virda-wêda tèn û diçin û bi derewên merivan ber bayê her hînkirinekê dik'evin, yên ku bi fêlbazîyê dixapînin û dixalîfînin. ¹⁵ Lê hûn bi hizkirinê rastîyêda her'in, her alîyanda bigihîjine sêrî, awa gotî Mesîh, ¹⁶ ku bi wî t'emamîya bedenê hevva ye û hemû jî bi sêvikan hevva girêdayî ne. Û Mesîh nava her endemeke *bedenêda* k'arê xwe dike û bi hizkirinê wan hêşîn dike, bona şênbûna bedena xwe.

JÎYÎNA NÛ

¹⁷ Awa ez vê yekê bêtirs dibêjim û bi navê Xudan t'emî didime we, ku hûn îdî t'u car usa neçin, çawa hêtanos bi fikirên xweye p'ûç diçin. ¹⁸ Ewana haş ji xwe t'unene û ji jîyîna Xwedê dûr k'etine, ji dest nezaniya dilê xwe û serhişkîya xwe. ¹⁹ Bûne bêşerm û xwe dane jîyîna neqenc, heta ku her cûr'e kirinên heram jî dikin û jê t'êr nabin.

²⁰ Lê we Mesîh usa nas nekîr! ²¹ We bona wî bihîstye û çawa kesên p'ara Îsa, hûn hîn bûne, ku rastî nava wîda ye. ²² De hûn xeysetê xweyî berê~ wî merivê kevn, ku bi havijîyên fêl-fenanva dêrisbûyî ye ji xwe dûr xî ²³ û ruh û fikirên xweda werine veguhastîne, ²⁴ merivê nû li ser xwe wergirin, yê ku bi rastîyê û bi pîrozîya bêlek'e *nîgara* Xwedêda xuliqî ye.

²⁵ Awa derewîyê ji p'êsîra xwe dawşînin, ji we her kes hevalê xwer'a rast xeber de, çimkî em bi hevr'a endemên Bedena Mesîh in. ²⁶ Heger hûn hêrs k'evin jî, guneh nekin, pey hêrsa wer'a bira ro neçe ava ²⁷ û cî nedine Şeytan. ²⁸ K'ê dizîyê dike, bira îdî nedize, lê bi xûdana xweye helal bijî~ bi destên xwe bixebite, ku destê xwe dirêjî k'etîyan ke jî. ²⁹ Ji zarê we bira qet xebereke xirab derneyê, pêştirî xeberên ku kêrî guhdaran tèn û qazincê didine wan. ³⁰ Û Ruhê Xwedêyî Pîroz te'l' nekin, bi k'îjanî hûn bona Roja Azayîyê hatine morkirinê. ³¹ De bira her te'layî, hêrs, diltengî, qar'eqar' û k'ifîrî bi her cûr'e xirabîyên wanva t'evayî ji we dûr bin. ³² Û hevr'a şîrin bin, dilê we ser hev bişewte û bibaxşînine hev, çawa Xwedê bi Mesîh baxşande we.

T'EMÎ Û ŞÎRET

5 ¹ *Xeysetê xweda* mîna Xwedê bin, çawa lawên delal ² û bi hizkirinê bimeşin, çawa Mesîh jî em hiz kirin û kesa xwe bona me da û Xwedêr'a bû hedî û qurbana bînxaş.

³ Lê navê qavîyê û her heramiyê yan timayê nava weda qet gerekê neyê gotinê, çî ku li pîrozan nak'eve. ⁴ Usa jî gotinên bêmerîfetî yan bêfemî yan h'enekên ner'ê, ku li we nak'evin bira ji zarê we derneyên, lê dewse şikirdarî derê. ⁵ Hûn haş ji vê yekê hene, ku t'u qav yan heram yan timak'ar (ku p'ûtp'arêz e) P'adşatiya Mesîh û Xwedê war nabe. ⁶ Nebe ku yek bi xeberên p'ûç we bixapîne, çimkî bona van tiştan hêrsa Xwedê ser wan lawên neguhdarîyê radişe. ⁷ Awa hûn t'evî yên usa nebin! ⁸ Waxtekê hûn jî *mîna wan* tarî bûn, lê niha hûn ku p'ara Xudan in, ronahî ne. Awa mîna lawên ronayê bijî, ⁹ çimkî berê ronayê ev in: Qencî, heqî û rastî. ¹⁰ Bizanibin çî li Xudan xaş tê. ¹¹ T'evî wan kirên bêbere tarîyê nebin, lê wan aşkere kin, ¹² çimkî bona wan tiştên ku ewana dizîva dikin jî şerm e ku bê xeberdanê. ¹³ Lê tişteki ku li ber ronayê hatye derxistinê, ew tê aşkerekirinê, ¹⁴ çimkî her tişte ku tê aşkerekirinê, ew li ber ronahîyê ye. Bona vê yekê hatye gotinê: «Xewixîyo, hişyar be! Ji nava mirîyan derê û Mesîhê te ronahî ke».

¹⁵ Awa miqat bin, ku hûn nigê xwe fesal bavêjin, mîna bêfeman nebin, lê mîna serwaxtan bin. ¹⁶ Waxtê xwe qazinc kin, çimkî zamanî xirab e. ¹⁷ Lema bêfem nebin, lê bizanibin çî ye daxaza Xudan. ¹⁸ Û bi şerabê serxaş nebin, ku jîyîna mêriv p'ûç dike, lê bi Ruhê Pîrozva t'ije bin. ¹⁹ Zebûran, dirozgan û stiranên ruhanî hevr'a bêjin, dilê xweda Xudanr'a bistirên û zebûran bêjin. ²⁰ Her dem bona her tiştî razîbûnê bidine Bav Xwedê, bi navê Xudanê me Îsa Mesîh.

BORCÊ JIN Û MÊRAN

²¹ Bi tîrsa Mesîhe dilê xweda gura hevdu bikin. ²² Bira jin usa gura mêrê xweda bin, çawa ku *gura* Xudanda bin, ²³ çimkî mêr serê jinê ye, çawa Mesîh jî serê civînê ye û ew e Rizgarkirê bedena xwe. ²⁴ Û çawa civîn gura Mesîhda ye, bira usa jî jin her tiştîda gura mêrê xweda bin.

²⁵ Mêrno, jinên xwe *usa* hiz bikin, çawa Mesîh civîn hiz kir û kesa xwe ji ber wêva da, ²⁶ ku wê bi ava hewz bişo~ bi xeberê pîroz ke, ²⁷ ku civînê li ber xwe qeşeng bide sekinandinê, ku t'u qusûr yan lek'e yan tişteki mîna van ser t'unebe, lê paqij û bêqusûr be. ²⁸ Usa jî mêr, hûn gerekê jinên xwe çawa bedena xwe hiz bikin. Yê ku jîna xwe hiz dike, ew kesa xwe hiz dike. ²⁹ Çimkî kesa t'u merivî ber ç'evê wî ne reş e, lê wê t'êr dike û bona wê xem dike, çawa Mesîh jî *bona* civînê, ³⁰ çimkî em endemên bedena wî ne. ³¹ Çawa nivîsar e: «Mêr wê dê û bavê xwe bihêle û xwe li jinê bigire û her du wê bibine bedenek»[†] ³² Eva sura k'ûr e, lê gotina min li ser Mesîh û civînê ye. ³³ Belê, ji we her kes jî bira jîna xwe weke kesa xwe hiz bike û jin jî bira li ber mêrê xwe hesaban bide xwe.

T'EMÎYÊN BONA LAWAN Û DÊ-BAVAN

6 ¹ Lawno, gur'a dê û bavê xweda bin, belê ev layîq e, çawa *t'emîya* Xudan *dibêje*: ² «Dê û bavê xwer'a hurmetê bike» û ev e t'emîya pêşin, ya ku pêr'a soz hatye dayîne, ³ «ku bona te qenc be û ser erdê jîyîna te dirêj be». ⁴ Û hûn, bavno, lawên xwe hêrs nexin, lê wan bi hînkirin û şîreta Xudan mezin kin.

* 4:30 Bi yûnanî: dewsa xebera «te'l» «melûl» nivîsar e.

† 5:31 Destpêbûn 2:24.

‡ 6:3 Derk'etin 20:12; Qanûna Ducarî 5:16;

⁵ Xulamno, bi saw û tirs û bi dilê rast gur'a xweyîyên xweye vê dinyayêda bin, çawa gur'a Mesîhda, ⁶ xulamtîya xwe ne ku bona dîtina ber ç'evan bikin, ku li merivan xaş bèn, lê çawa xulamên Mesîh bi hub û rez qirara Xwedê bînine sêrî. ⁷ Bi rezedilî xulamtîyê bikin, çawa Xudanr'a, ne ku merivanr'a. ⁸ Hûn zanin ku her kes, heger xulam be yan aza be, çi qencîyê ku bike, ewê weke wê jî ji Xudan bistîne.

⁹ Hûn jî xweyîno, hindava wanda usa bin. Dest ji gefxwarinê bikin. Hûn zanin, ku Xweyê wan jî, yê we jî li ezmanan e û cem wî t'u firqî t'üne.

Ç'EKÊN XWEDÊNASÎYÊ Û DUA-DIROZGE

¹⁰ De îdî, birano, zoraya Xudan hildin, zoraya karebûna wî. ¹¹ Silihê Xwedê li xwe kin, ku hûn bikaribin miqabilî hunurên Şeytan bisekinin. ¹² Çimkî şer'ê me ne miqabilî xûn û goşt e, lê miqabilî serwêrtî û hikumetîyan e, miqabilî mîrên vê dinya tarî û *ordîyên* ruhên xirab e, yên ku li ezmênda ne. ¹³ Ji ber vê yekê silihê Xwedê hildin, ku hûn bikaribin li roja xirabda miqabil bisekinin û paşî kirina her tiştîr'a, cîyê xweda qewîn-qedîm bimînin.

¹⁴ Awa cîda qewîn bisekinin, rastîyê piştî xweva bişidînin, mîna êlek-zirihê jî heqîyê li xweva kin ¹⁵ û nigên xwe şidyayî *gotîna* Mizgînîya haştîyêra hazir kin. ¹⁶ Li ser her tiştîra bawerîyê jî çawa mert'al bigirine xwe, ku bi wê hûnê bikaribin hemû tîrên agirîye ku yê Xirab davêje vêsînin. ¹⁷ Û çawa k'umzirih *mizgînîya* rizgarbûnê bikine serê xwe û xebera Xwedê jî çawa şûrê Ruhê Pîroz bigirin. ¹⁸ Bi hemû dua û reca her dem dua bikin, bi Ruhê Pîroz. Vê yekêda hişyar bimînin û bona hemû pîrozan t'imê dua bikin. ¹⁹ Bona min jî dua bikin, ku minr'a bê dayîne~ gotineke min hebe, ku bêtirs sur'a Mizgînîyê aşkere kim, ²⁰ bona k'îjanê ez nava van qeydanda qasidîyê dikim. Dua bikin, ku ez bona Mizgînîyê bêtirs xeber dim, çawa lazim e.

²¹ Lê ku hûn haş ji hal û k'arên min hebin, her tiştî Tixîkoyê birayê delal û xizmetk'arê Xudanî amin wê wer'a bêje. ²² Ez bona wê yekê ewî ser weda dişînim, ku hûn haş ji me hebin û ew bi vê yekê ber dilê weda bê.

²³ Bira haştî û hizkirin bawerîyêva t'evayî ji Bav Xwedê û Xudan Îsa Mesîh dilê weda be. ²⁴ Bira k'erem li wan hemûyan be, yên ku Xudanê me Îsa Mesîh bi hizkirina bêlek'e hiz dikin.

NAMA PAWLOS FÎLÎPÎYANR'A

PÊŞGOTIN

Eva nama Pawlosê şandî ji hebsê civîna bajarê Filîpîyanra nivîsiye. Ev civîn ya pêşin bû, ku bi xizmetîya Pawlos li ser axa Awropayê, nava Împêr'atorîya Romayêda çê bû, ew li qeza Makedonyayêda bû. Hingê, li vê civînêda dersdarên şaş pêşda hatibûn û miqabilî hinkirina Mizgînîyê rast hîn dikirin, lema Pawlos gelekî ber xwe k'et û eva nama nivîsî. Lê li vê namêda em dibînin, ku Pawlos Mesîhda guman e û şa ye, ku bawermendên wir wê nava rastîyêda bisekinin. Usa jî Pawlos razîbûna xwe dide wan û şikirîyê jî dide Xwedê, ku bawermendên li Filîpyayê alîk'arîya wî kiribûn, li tengasîya wîda k'inc û xurek wîr'a şandibûn.

Pawlos bi vê namê wan hîn dike, ku bawermend xîret û egît bin û ji dest tengasîyan sist nebin. Ew hîvî ji wan dike, ku ew hevr'a t'ifaq bin û ber hevdu daxin, ne ku k'ubar û babax bin.

Usa jî ew bona jîyîna xwedenasîyê tiştên ferz wan hîn dike~ bona k'erema Xwedê, bawerîyê, Qanûnê û çend tiştên din, ku xwedênas bigihîjîne meremê Xwedêyî sereke, awa gotî jîyîna mesîhiyêda pêşda her'in bibîne mîna Mesîh Îsa.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin û duayê Pawlos (1:1-11)

Xizmetîya Pawlos û k'erema Xwedê (1:12-26)

Jîyîna bi Mesîh (1:27-2:18)

Şewra ku li Tîmotêyo û Êpafrodîtova girêdayî ye (2:19-30)

H'evza xwe ji dijminan bikin (3:1-4:9)

Razîbûna Pawlos û silavên axirîyê (4:10-23)

SILAVKIRIN Û DUAYÊ PAWLOS

1 ¹ Ji Pawlos û Tîmotêyoyê xulamên Mesîh Îsa li *we* hemû pîrozên bi *destê* Mesîh Îsar'a, bi t'evayîya berpirsyar û berdestîyên civînêr'a, yên ku li alîyên Filîpyayê dimînin: ² Bira k'erem û haştîya Xwedêyê Bavê me û Xudan Îsa Mesîh wer'a be.

³ Ez her t'im şikirîyê didime Xwedê, gava we bîr tînim, ⁴ her dem nava hemû duayên xweda, bona we hemûyan bi *dilê* şa dua dikim, ⁵ çimkî hûn roja pêşinda heta îro t'evî k'arê Mizgînîdayîne bûne.

⁶ Û ez vê yekêda bawer im, ku ewê dilê weda dest bi k'arê xweyî qenc kirye, wê heta Roja *hatina* Mesîh Îsa jî bigihîne sêrî. ⁷ Û heq e jî ez bona we hemûyan aha bifikirim, belê hûn dilê mînda ne, çimkî hûn hemû jî t'evî wê k'erema ku ji Xwedêda minr'a hatye dayîne bûne û hema niha jî, ku bendkirî me û bona Mizgînîyê sekinî me û wê didime qedîmkirinê. ⁸ Xwedê şehdeyê min e, ku ez bi huba Mesîh Îsa çiqasî heyra we hemûyanda me.

⁹ Û ez vê duayê dikim, ku hizkirina we hê bigihîje û bi zanebûn û serwaxtîyêva hê zêde be, ¹⁰ ku çi here qenc e, hûn wê hilbijêrin. Hingê hûnê Roja hatina Mesîhda bêqelpî û bêlek'e bin ¹¹ û bi saya Îsa Mesîh bi berên heqîyêva t'ijîbûyî bin, bona rûmet û pesinê Xwedê.

JÎYÎN MESÎH E

¹² Ez dixazim hûn bizanibin, birano, ku çi hate serê min, wê yekê hê alîk'arîya pêşdaçûyîna Mizgînîyê kir. ¹³ Awa t'evayîya k'oma k'oçikserêva, usa jî hemûyên mayîna aşkere ye, ku ez bona navê Mesîh bendkirî me. ¹⁴ Û dilên p'iranîya birayên bi Xudan jî bi van benên mine *hebsê* şîdyan, ku hê bêtirs xebera Xwedê bêjin.

¹⁵ Hinek ji hevsûdîyê û mixenetîyê Mesîh dannasîn dikin, lê hinek jî bi meremê qenc ¹⁶ ji hizkirinê dannasîn dikin, çimkî ew zanin, ku ez ser vê xizmetîyê hatime danîne, ku piştgirîyê Mizgînîyê bikim. ¹⁷ Lê yên mayîna bona hevr'ikîyê Mesîh dannasîn dikin, lê ne bi dilê rast. Ew difikirin, ku ser benên mine hebsîda tengasîyê zêde kin.

¹⁸ Ne xem e! Çawa jî hebe, heger ew bi qelpîyê yan bi rastîyê Mesîh dannasîn dikin, bi vê yekê ez şa me û ezê şa bim jî, ¹⁹ çimkî zanim, ku axirîyê ev yekê bibe qazınca azabûna min, bi duayên we û alîk'arîya Ruhê Îsa Mesîh. ²⁰ Ez guman im û ç'evnihêrya vê yekê me, ku ezê t'u tiştîda şermî nemînim, lê hê bêtirs bim û çawa her dem, usa jî niha bi qalibê min pesinê Mesîh bê dayîne, hizkî bi mirina min be yan bi jîyîna min be. ²¹ Çimkî bona min jîyîn Mesîh e û mirin jî qazinc. ²² Heger jîyîna vî qalibîda hê qazincê dide k'arê min, ez nizanîm k'îjanî hilbijêrim. ²³ K'etîme nava du keviran: Ez hizret im jî vî qalibî derk'evim û her'ime cem Mesîh, bona min eva hê baş e, ²⁴ lê mayîna mine vî qalibîda hê bona qazınca we ye. ²⁵ Ez vê yekêda hê bawer im, ku ezê bimînim û t'evî we hemûyan bim, ku hûn hê pêşda her'in û bawerîyêda şa bin. ²⁶ Awa çaxê ez dîsa bême cem we, hûnê bi min, bi *rehma* Mesîh Îsa hê fir'naq bin.

²⁷ Lê t'enê çawa layîqî Mizgînîya Mesîh e, hûn xwe usa xwey bikin, ku heger ser weda bêm, we bibînim yan dûrva bibihêm, bizanibim ku hûn hevr'a t'ifaq in û bi ruh û dilekî bona şer'k'arîya bawerîya Mizgînîyê qewînk'edîm in. ²⁸ T'u alîyanva ji peyk'etîyên xwe netirsîn. Ev yek îzbatîya undabûna wan û rizgarbûna we ye û ev jî ji Xwedê ye. ²⁹ Ev k'erem Xwedê bona xatirê Mesîh daye we, ku hûn ne t'enê wî bawer bikin, lê ku bona wî biçerçirin jî. ³⁰ Niha hûn jî nava wî şer'îda ne, k'îjan we li ser min dît û bona min niha dibihên.

HER ZAR-ZIMAN WÊ ÎQRAR KE KU ÎSA MESÎH XUDAN E

2 ¹ Awa heger bi Mesîh berdilîya we heye, heger hizkirina wî dilê we hêsa dike, heger t'evgirêdana Ruhê Pîroz weva heye, heger dilşewatî û rehma dilê we heye, ² şabûna min hûn t'emam kin: bi hizkirina hindava hevda li ser nêt-fikirekê û femînekê bin. ³ T'u tiştî bi hevr'ikîyê nekin û pey pesinê navê xwe nek'evin, lê ji we her kes bira bi

milûkîyê hevalê xwe ji xwe zêdetir hesab ke. ⁴T'enê li qazınca xwe neger'in, lê bira her kes qazınca hevalê xwe jî biger'e. ⁵Mesîh Îsa ser çî nêt-fikirê bû, ji we her kes jî usa bifikire: ⁶Yê ku reng-nîgara Xwedêda bû, pey wê yekê nek'et, ku weke Xwedê bima, ⁷lê xwexa xwe ber tiştêkî hesab nekir, k'ete reng-nîgara xulamêkî û bû mîna merivan, k'ete reng-nîgara mêriv. ⁸Xwe nimiz kir, heta mirinêra jî qayl bû, ew jî mirina li ser xaç. ⁹Lema Xwedê ew hê bilind kir û navekî usa da wî, ku seranser ser hemû navanra ye, ¹⁰ku her çok li ber navê Îsa bitewe, heger li ezmên be, heger li ser dinyayê be, heger li gelîyê bêbinda be ¹¹û her zar-ziman îqrar ke, ku Îsa Mesîh Xudan e, bona rûmeta Bav Xwedê.

HER TIŞTÎ BÊY BÎNTENGÎ Û BÊY ŞER'-DE'W BIKIN

¹²Delalîyên min, awa çawa ez nava weda bûm hûn t'imê guhdar bûn, niha hê zêde guhdar bin, çaxê ne nava weda me. Bona rizgarbûna xwe bi saw û tirs bixebitin, ku wê yekê bigihînine axirîyê, ¹³çimkî Xwedê xwexa vê yekê dîke dilê we, ku hûn *tiştên qenc* dixazin û dikin, çawa li wî xaş tê.

¹⁴Her tiştî bêy bîntengî û bêy şer'-de'w bikin, ¹⁵ku hûn nava vî nisilê neheq û xalîfîda lawên Xwedêye bêsûc bin, bêlek'e û bêqûsûr, ku nava vanda mîna ronahîdarên ezmanan şewq bidin, ¹⁶çawa yên xebera jîyînê qayîm girtî. Û ezê hingê~ Roja hatina Mesîhda rûspî bim, ku badîhewa nebezîme û badîhewa nexebitîme. ¹⁷Belê, heger cî bê, ku bona xizmetîya bawerîya we xûna min jî bê rêtinê û çawa şehîd Xwedêra bême dayîne, ezê şa bim û t'evî şabûna we bim. ¹⁸Usa jî hûn, şa bin û t'evî şabûna min bin.

TÎMOTÊYO Û ÊPAFRODÎTO

¹⁹Ez Îsa Xudanda guman im, ku ezê zûtirekê Tîmotêyo ser weda bişînim û gava halê we pê bihesim dilê minê rihet be. ²⁰Ez yekî mîna wî dilê xwer'a nabînim, ku bona halê we mîna pêşewitîkî xem bixwe. ²¹Çimkî yên mayîn her kes dû qazınca xwe k'etine, ne ku ya Îsa Mesîh. ²²Lê hûn zanin, ku ew cêribandî ye û Mizgînîyêra t'evî min *usa* xizmetî kir, çawa kur' bavêr'a. ²³Awa nêta min heye, ku ez zû wî ser weda bişînim, gava îdî hal-hewalê min bê safîkirinê. ²⁴Û ez Xudanda bawer im, ku zûtirekê ezê xwexa jî ser weda bêm. ²⁵Lê min usa rê têra dît, ku birayê me Êpafrodîto jî bişînime cem we, yê ku t'evî min xebitî û şer'ê xwe kir, k'îjan we şandibû, ku alî min bike. ²⁶Ewî jî gelekî bîra we kirye, ber xwe dik'eve, ku we bona nexaşîya wî bihistye. ²⁷Rastî jî ew nexaş k'et, çû ber devê mirinê. Lê Xwedê li wî hate rehmê, lê ne t'enê wî, usa jî min, ku ser k'ederêda mînda k'eder zêde nebe. ²⁸Lema ez wî bi hub û rez dişînim, ku hûn wî bibînin, dîsa şa bin û ez ber xwe nek'evim. ²⁹Awa bi dilê şa ewî boy navê Xudan qebûl kin. Hurmetekî giran bidine yên mîna wî, ³⁰çimkî ew bona k'arê Mesîh heta ber devê mirinê jî çû û dest ji jîyîna xwe jî k'işand, ku dewsa we minr'a xizmetîyê bike.

MIQATÎ XWE BIN

3 ¹De îdî, birayên min, bi Xudan şa bin! Ez aciz nabim, ku wan tiştan dîsa wer'a dinivîsim, lê ew bona bêqezîya we ye. ²H'evza xwe ji yên nebaş* bikin, h'evza xwe ji k'arkerên xirab bikin, h'evza xwe ji wan bikin, yên ku ji qalib dibir'in~ sinet dikin. ³Çimkî sinetîya rast ya me ye, ku em bi ruh Xwedêra xizmetîyê dikin û bi Mesîh Îsa difir'in. Gumana me ne ser *nav-nîşanên* qalib e, ⁴lê heger pirs bê ser wan nav-nîşanên qalib, ez guman im, ku wê yekêda serfînyaz im. Heger yek difikire, ku qalibê xweda serfînyaz e, ez hê zêde. ⁵Roja heyştan sinet bûme, ji malbeta Îsraêl û ji qebûla Binyamîn im, îbranî me ji îbranîyan, alîyê Qanûnêda fêrisî, ⁶min k'erbî xîretê civîna Xwedê dizêrand, hindava rastîya Qanûnêda jî bêlek'e bûm. ⁷Lê çî ku qazınca min bû, min bona Mesîh zîyan hesab kirye. ⁸Û serda jî ez her tiştî zîyan hesab dikim û himberî vê yekê nakim, ku Xudanê xwe Mesîh Îsa nas bikim, çî ku qazınca seranser e! Bona xatirê wî ez ji her tiştî qetyam û çawa gemar hesab dikim, ku Mesîh qazinc kim ⁹û t'evî wî bibime yek. Îdî ev rastîya min, ne ku ji Qanûn-qedandina min tê, lê ji Xwedê bi bawerîya ser Mesîh tê. ¹⁰Ez dixazim wî û qewata zêndîbûna wîye ji mirinê nas bikim û t'evî te'lî-tengîyên wî bim û bik'evime halê mirina wî, ¹¹ku bikarîbim bigihîjime zêndîbûna mirîyan.

BERBI K'AMILTÎYÊ HER'IN

¹²Ez nabêjim ku îdî meremê min hatye sêrî yan îdî k'amil bûme, lê ez pey k'etime, ku xwe wê *k'amiltîyê* bigirim, bona k'îjanê Mesîh Îsa ez girtime. ¹³Birano, ez xwe hesab nakim, ku min ew yek qazinc kirye, lê serî ew e, ku ez tiştên pişt xweva hiştî bîr bikim, xwe bavêjime yên pêşîya xwe, ¹⁴dicedînim bigihîjime meremê xwe~ wê lexelata gazîya Xwedêye jorin, ya ku bi saya Mesîh Îsa ye.

¹⁵Awa ji me her kes, k'î îdî k'amil e gerekê aha bifikire. Lê heger tiştêkî din jî dilê weda hebe, wê yekê jî Xwedê wê ber we veke. ¹⁶Lê t'enê em gihîştine çî derecê, anegorî wê yekê bifikirin û bimeşin.

¹⁷Ç'ev bidine min birano û wan binihêrin, yên ku usa xwe xwey dikin, çawa ku me bi rabûn-rûniştina xwe nexşek wer'a hiştye. ¹⁸Çimkî gelek bi meşa xwe dijminên xaçê Mesîh in, bona k'îjanan min gelek caran wer'a gotye, niha jî bi girî dibêjim. ¹⁹Axirîya wan undabûn e, xwedêyê wan zikê wan e û kirên wane şermî jî rûmeta wan e. Ew t'enê li ser tiştên vê dinyayê difikirin. ²⁰Lê welatê me li ezmanan e, ji k'u em ç'evnihêrya Rizgarkir Xudan Îsa Mesîh in. ²¹Ewê qalibê meye şkestî biguhêze û bike mîna qalibê xweyî xweyr'ûmet, bi wê qewata ku dikare her tiştî bike bin hikumê xwe.

* 3:2 Bi yûnanî dewsa «yên nebaş», «se» nivîsar e.

4 ¹ Niha birayên mine şîrin û heyran, hûn in şabûn û t'acgulîya serê min, delalîyên min, aha bi Xudan qewîn-qedîm bimînin.

² Ez hîvî ji Eyodîya dikim û hîvî ji Sintîxa dikim, bira bi *daxaza* Xudan li hev bîn. ³ Belê, ez hîvî ji te jî dikim hevalbarê minî amin, tu jî alî wan *k'ulfetan* bike. Evana t'evî min xebata Mizgînîdayînêda xûdan rêtine, usa jî t'evî Klêmês û hevalk'arên mine mayîn, navên k'îjanan kitêba jîyînêda nivîsar in.

⁴ T'imê bi Xudan şa bin, dîsa dibêjim, t'imê şa bin! ⁵ Bira berbîhêriya we her merivanva aşkere be. Xudan nêzîk e. ⁶ Bona t'u tiştî xem nekin, lê xwastina we bira bi dua û reca razîbûnêva t'evayî Xwedêva aşkere be. ⁷ Û haştîya Xwedê, ku ji her hiş-aqilî jortir e, wê dil û fikirên we bi Mesîh Îsa xwey bike.

⁸ De îdî, birano, ser van tiştan bifikirin, çi ku bi rastîyê ye, maqûlîyê ye, heqîyê ye, paqijayîyê ye, hizkirinê ye, hurmetê ye, bi xeysetê qenc e û layîqî qencgotinê ye. ⁹ Hûn çi ji min hîn bûn, we çi ji min stand, bihîst û dît wê yekê bikin û Xwedêyê haştîyê wê wer'a be.

RAZÎBÛNA PAWLOS Û SILAVÊN AXIRÏYÊ

¹⁰ Ez bi k'erema Xudan gelekî şa me, ku pey haqas waxtra we ez bîr anîm û bona min xem k'işand. Belê, we xem dik'işand jî, lê mecal nedik'ete we. ¹¹ Ne ku ji hewcetîyê ez vê yekê dibêjim, na, ez hîn bûme, ku li hemû halîda razî bim. ¹² Ez hînî t'onebûnê bûme, hînî hebûnê bûme, ez her alîda û her halîda baş hîn bûme, ku heger t'êr bim yan birçî bim, hebûnêda bim yan t'onebûnêda bim, *bikaribim razî bim*. ¹³ Ez her tiştî dikarim, bi saya ewî ku qewatê dide min.

¹⁴ Lê we qenc kir, ku tengasîya minda destê xwe dirêjî min kir. ¹⁵ Belê hûn jî zanin, gelî filîpîyan, ku ji destpêbûna dannasîna Mizgînîyêda, çaxê ez ji Makedonyayê derk'etim, t'u civînê bona xizmetk'arîya min destê xwe dirêjî min nekir, pêştirî we. ¹⁶ Çimkî carekê-dudan jî we ew tiştên minr'a kêrhatî şandine Têsalonîkê. ¹⁷ Ez ne ku tişteki dixazim bistînim, lê dixazim li ser hesabê weda qazinc zêde be. ¹⁸ Min her tişt standye û nava hebûnêda me. Ew tiştên ku we bi destê Êpafrodîto minr'a şandine besî min in. Ew dayîna we bîneke xaş e, hedîya qebûl û li Xwedê xaş. ¹⁹ Û Xwedêyê min hemû kêmasîyên we bi rûmet li gora zengînya xwe bi destê Mesîh Îsa t'ije ke. ²⁰ Belê, şikir Xwedêyê Bavê mer'a, heta-ha-tê! Amîn.

²¹ Bi Mesîh Îsa silavê bidine hemû pîrozan. Ew birayên ku t'evî min in li we silav dîkin. ²² Hemû pîroz li we silav dîkin, hê zêde ewên ku ji mala Qeyser in. ²³ K'erema Xudan Îsa Mesîh ruhê wer'a be.

NAMA PAWLOS KOLOSÏYANR'A

PÊŞGOTIN

Kolosya li Asya Biç'ûkda bajarekî li alfyê rohilata Efesê bû. Civîn Kolosyayêda ne ku bi xizmetîya Pawlos çê bibû, lê bi xizmetîya piştgirê wî Êpafraşê kolosîda. Lê dîsa Pawlos borc hildabû ser xwe, ku bona civîna Kolosyayê xemxur be û ji Efesê hevalk'arên xwe dişandine wir, ji k'îjanan yek jî Êpafraş bû. Û wî eva nama jî civîna bajarê Kolosyayêra nivîsi, çimkî ew pê hesiya, ku Kolosyayêda dersdarên şaş hene, ku cimetê hîn dikin, ku milyak'etan, xudantîyan û hikumetên jorin bihebînin û pey rê-rizmên kal-bavan her'in, bêne sinetkirinê, cûr'e-cûr'e xurekan nexwin.

Pawlos bi vê namê rîya rast nîşanî bawermendan dike û derheqa jîyîna nûda dinivîse, ku p'evgirêdana bawermendan hindava hevda gerekê çawa be. Ew dide k'ifşê, ku ew hemû hebandin û bawerîyên mayîn merivan ji wê rizgarîya ku Îsa Mesîh dide dîr dixin.

Ew şirovedike, ku Xwedê bi destê Îsa Mesîh her tişt efrandin û bi wî jî merivayê vedigerîne berbi xwe û Îsa danîye çawa serê civînê. Û Îsa ser hemû tiştîra ye, hizkî hikumetên ezmanan bin yan yê dinyayê bin, efrînên li vê dinê bin yan yê li ezmên bin, mêr-milyak'et bin yan mîr û beg bin.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin, dua û şikirdayîn, Mesîh û kirinên wî (1:1-2:19)

Jîyîna nû û jîyîna kevn (2:20-4:9)

Silavên axirîyê (4:10-18)

SILAVKIRIN, DUA Û ŞIKIRDAYÏN

1 ¹ Ji Pawlosê bi daxaza Xwedê şandîyê Mesîh Îsa û ji Tîmotêyoyê bira, ² wan birayên pîroze Mesîhra amin, yên ku Kolosyayêda dimînin: Bira k'erem û haştîya Xwedêyê Bavê me* bibe.

³ Her t'im çaxê em bona we dua dikin, şikirîya xwe ji Xwedêyê Bavê Xudanê xwe Îsa Mesîh tînin, ⁴ çimkî me bona wê bawerîya weye ser Mesîh Îsa û wê hizkirina weye hindava hemû pîrozanda bihîstye. ⁵ Û ev yek ji gumana we tê, ku bona we li ezmananda tê xweykirinê, boy k'îjanê we bihîstye, ya ku bi xebera Mizgînîyêye rast pêşda gihîşte we ⁶ û usa jî t'emamîya dinyayê, ku hêşîn dibe û ber dide, belê, nava weda jî, ji wê rojêda girtî, çaxê we bihîst û k'erema Xwedê bi hemû rastîya wêva nas kir. ⁷ Hûn vê yekê ji hevalxulamê meyî hizkirî, ji Êpafraş hîn bûne, ku hindava meda berdestîkî Mesîhî amin e.

⁸ Wî bona hizkirina weye ji Ruh mer'a got. ⁹ Lema jî ji wê rojêda, çaxê me bona we bihîst, me dest ji dua û hîvîkirinê nekiryê, ku hûn zanebûna daxaza Xwedêda k'amil bin û bi hemû serwaxtîyê û femîna ruhanîva t'ije bin, ¹⁰ ku bikaribin xwe usa xwey kin, çawa layîqî Xudan e, ku her alfyanva li wî xaş bîn, her qencîkirinêda xweyber bin û zanebûna Xwedêda bigihîjin, ¹¹ ku anegorî zoraya wîye xweyr'ûmet bi t'emamîya qewata wîva hê zor bin, ku hûn bikaribin bi sebira dirêj û bi teyaxkirinê şa bin. ¹² Û razîbûna xwe bidine Bav Xwedê, ku hûn hêjayî vê yekê kirine, ku P'adşatîya ronayêda t'evî pîrozana bibine xweyp'ar. ¹³ Ewî em ji hikumetîya tarîstanîyê rizgar kirin û cîguhastî nava P'adşatîya Kur'ê xweyî delal kirin, ¹⁴ bi xûna k'îjanî em aza bûn~ me baxşandina gunehan stand.

¹⁵ Îsa nîgara Xwedêyê nek'ifş e, Nixurîyê ser hemû efrînan. ¹⁶ Çimkî bi destê wî her tiştên li erd û ezmanan efrî ne~ tiştên ku k'ifş dibin û k'ifş nabin, heger t'extp'adşa bin yan xudantî bin, heger serwêrtî bin yan hikumetî bin, her tişt bi destê wî û bona wî efrî ne. ¹⁷ Ew berî her tiştî hebû û her tişt bi saya serê wî cîyê xweda qewîn-qedîm dimînin. ¹⁸ Ew e serê Bedenê~ serê civînê, ew e destpêbûna wê û nixurîyê ji nava mirîyan, ku her tiştîda ew bibe yê pêş. ¹⁹ Çimkî li *Bavê* xaş hat, ku hemû xeyset û karebûnên wî nava Îsada bin, ²⁰ ku bi wî~ bi xûna wîye li ser xaç rijyayî nava xwe û hemûyanda haştîyê çêke, heger yê li ser erdê bin yan yê li ezmên bin.

²¹ Hûn jî, ku ji dest fikir û kirinên xweye xirab waxtekê xerîb û dijminên Xwedê bûn, ²² niha Xwedê bi mirîna Mesîhe bedenî hûn xwer'a li hev anîn, ku we li ber hizûra xwe pîroz, bêlek'e û bêşûc bide sekinandinê: ²³ heger hûn bawerîyêda qewîn-qedîm bimînin û ji gumana Mizgînîyê nek'evin, ya ku we bihîst û hemû efrînên bin p'er'ê ezmênra hate dannasînkirinê. Û ez Pawlos bûme xizmetk'arê wê *Mizgînîyê*.

TENGASÏYÊN PAWLOSE BONA CIVÎNÊ

²⁴ Ez niha şa me, ku bona we çerçîrîm û wan tengasîyên Mesîhe mayî bi canîya xwe bona Bedena wî~ bona civînê t'emam dikim. ²⁵ Ez civîna wîr'a bûme berdestî û ev yek ji alfyê Xwedêda çawa deyn k'ete stûyê min, ku gotina Xwedê bêkêmasî wer'a dannasîn kim, ²⁶ ew sura ku ji dewr û qur'nanda veşartî bû, lê niha pîrozana va aşkere bû. ²⁷ Xwedê xwast li ber wan zengîna sura xweye xweyr'ûmet veke, ya ku bona her miletan e. Û ew sur' ev e~ Mesîh nava weda, gumana rewş-rûmetê. ²⁸ Em *hema* wî dannasîn dikin, her kesî şîret dikin û bi hemû serwaxtîyê hîn dikin, ku her kesî bi Mesîh li ber Xwedê k'amil bidine sekinandinê. ²⁹ Bona wê yekê jî ez dixebitim û anegorî wê hikumdarîya wî şer'ê xwe dikim, ya ku nava minda bi qewata zor ya xwe dike.

2 ¹ Ez dixazim ku hûn bizanibin, bona we û yê Lawdikyayê ez çiqasî k'ûr k'etime xîretê û bona wan hemûyan jî, yê ku rû bi rû ez nedîtime, ² ku dilê we bişide û hûn hizkirinêda bibine yek û bigihîjine t'emamîya zengîna fendarîyê. Hingê hûnê sura Xwedê nas bikin, ku Mesîh e. ³ K'ilîta hemû xezna zanebûn û serwaxtîya veşartî ew

* 1:2 Destnivîsarên hinekanda ev jî heye: «Û Xudanê me Îsa Mesîh.»

xwexa ye. ⁴ Ez vê yekê dibêjim, ku t'u kes we bi zarê şîrin nexalifîne. ⁵ Rast e bi bedenî ez dûrî we me, lê bi ruhê xwe t'evî we me û şa me, ku p'ergalîya weye t'ifaq û bawerîya weye ser Mesîh qedîm dibînim.

NAVA HÎNKIRINA MESÎHDA BIMÎNIN

⁶ Awa we Xudan Mesîh Îsa çawa hilda, usa jî bi wî bijîn, ⁷ raw avîtî, ser wî çêkirî û bawerîyêda qewîn-qedîm, çawa hûn hatine hînkirinê. Û her dem bi razîdarîyê şikirîyê bidine wî.

⁸ Miqatî xwe bin, nebe ku yek bi serwaxtîya derewe p'ûç we *hişda* bike hêsîr. Ew ji rê-rizmên merivan û sixirên vê dinyayê tèn, ne ji Mesîh. ⁹ Çimkî hemû xeyset û karebûnên* xwedêtiyê bi bedenî nava Mesîhda ne ¹⁰ û hûn jî bi wî dagirtî ne, ku ew e serê hemû serwêrtîyan û hikumetîyan.

¹¹ Bi wî hûn bi sineta ne bi destan hatine sinetkirinê~ hûn bi k'arê Mesîh ji *binyata* bedena xweye elê gunehkirinê hatine bir'înê. ¹² Û bi nixamtina *avê* hûn wîr'a t'evayî *gor'êda* hatine nixamtinê û bi wê nixamtinê jî wîr'a t'evayî ji mirinê zêndî bûn, çimkî we bawerîya xwe qewata wî Xwedêyî anî, yê ku Mesîh ji mirinê zêndî kir. ¹³ Û hûn ku bi ruhanî *waxtekê* nava neheqîyanda û *binyata* bedena xweye nesinetkirîda mirî bûn, *Xwedê* hûn t'evî Mesîh zêndî kirin. Ewî hemû neheqîyên me baxşandine me ¹⁴ û ew beret'a deynên meye ku bi qeyde-qanûnî miqabilî me hatibû nivîsarê ji navê hilda û xaçê dar xist. ¹⁵ Û usa Mesîh *silihên* serwêrtî û hikumetên tarîstanîyê ji wan êxist û bi serdestîya xwe ew li ber *peyçûyên* xwe kirine sosret.

¹⁶ Awa guh nedine t'u kesî, yên ku bona pîrsa xwarin-vexwarinê yan cejînan yan serê mehan yan jî rojên şemîyan lome li we dîkin. ¹⁷ Ev hemû sîya wan tiştan e, yên ku wê bèn, lê rastî Mesîh e. ¹⁸ T'u kes bira bi xwenimizkirina *ner'ast* û milyak'et-hebandinêva bi tiştên nedîtiye ji fikirên p'ûç destê we ji lecxelatê neke. Yên usa k'ubar in ¹⁹ û xwe ji Sêrî~ ji Mesîh qetandine. Bi k'îjanî t'emamîya bedenê bi p'evgirêk û sêvikanva hevva girêdayî tê xweykirinê û bi destê Xwedê digihîje, li gora daxaza wî.

²⁰ Awa heger hûn t'evî Mesîh mirine û ji sixirên vê dinyayê aza bûne, îdî hûn çima mîna berê pey rê-rizmên vê dinyayê diçin? Hûn çima guh didine t'emîyên aha? *Soz-mesele*: ²¹ «Nêzik nebe, te'm neke, lê nek'eve». ²² Ev hemû rê-rizmên p'ûç in, çî ku li gora t'emî û hînkirinên merivan e. ²³ Yên ku çawa serwaxtî k'ifş dibin, gava ew bi hebandin û xizmetîyên ber xwe derxistî xwe nimiz dîkin û bedena xwe nuqsan dîkin, lê ev hemû bergî tiştêkî nagirin, *lê t'enê* bedena xwe razî dîkin.

JÎYÎNA NÛ Û KEVN

3 ¹ Awa hûn ku t'evî Mesîh ji mirinê zêndî bûne, usa ye li tiştên jorin biger'in, wê dera k'u Mesîh li alîyê Xwedêyî rastê rûniştî ye. ² Ser tiştên jorin bifikirin, ne ku ser yên vê dinyayê. ³ Çimkî hûn mirine û jîyîna we t'evî Mesîh nava Xwedêda veşartî ye. ⁴ Çaxê Mesîh~ jîyîna we, k'ifş be, hûnê jî hingê t'evî wî bi rûmet k'ifş bin.

⁵ Awa endemên xweye vê dinyayê~ *temên xirab* bikujin: Bênamûsîyê, heramîyê, dilhavijîya *ner'ê*, xwastina xirab û timayê, ku p'ûtp'aristî ye. ⁶ Ev in manî, ku *xezeba* hêrsa Xwedê wê bê ser wan merivên ne gura wîda. ⁷ Waxtekê we jî ew tişt dîkin, çaxê nava wan kirên xirabda dijî. ⁸ Lê niha hûn van her tiştan ji xwe dûr xin: Hêrsê, diltengîyê, xirabîyê, k'ifirîyê û xeberên necayîz ji zarên xwe. ⁹ Hevdura derew nebêjin, çimkî we merivê kevn kirên wîva ji ser xwe êxistye ¹⁰ û ewî nû li xwe kirye, ku roj bi roj anegorî nîgara Efîrandarê xwe tê nûkirinê, ku hûn Xwedê t'am nas bikin. ¹¹ Îdî firqî ne nava cihû û necihûyanda† heye, ne nava sinetkirî û nesinetkirîyanda, ne nava barbar û skûtiyanda heye,‡ ne jî xulam û azada, lê hemû bi Mesîh in~ Mesîh e dilê hemû *bawermendîda*.

¹² Awa çawa pîrozên Xwedêye hilbijartî û hizkirî, dilşewatîyê, qencîyê, berbihêrîyê milûkiyê û sebirê li xwe wergirin. ¹³ Li hev sebir kin û li hev bibaxşînin, heger gazinê yekî hindava kesekîda hebe jî, çawa Xwedê bi Mesîh baxşande we, hûn usa jî bibaxşînine hevdu. ¹⁴ Û li ser van hemûyanda hizkirinê li xwe kin, ya ku p'evgirêka k'amiltîyê ye. ¹⁵ Bira haştîya Mesîh p'adşatîyê nêt-fikirên we bike, bona k'îjanê hûn hatine gazîkirinê, ku bibine mîna bedenekê û razîbûnê bidin. ¹⁶ Bira xebera Mesîh bi zengîni nava weda bimîne. Bi hemû serwaxtîyê hev hûn bikin û şîret kin, zebûran û her cûr'e stiranên ruhanî bi şikirdarî dilê xweda bona Xwedê bistirên. ¹⁷ Û çî jî hûn bi xeberan yan bi kirinan bikin, her tiştî bi navê Xudan Îsa bikin~ bi destê wî razîbûnê bidine Bav Xwedê.

T'EMÎYÊN BONA NEFERÊN MALÊ

¹⁸ K'ulfetno, gura mêrê xweda bin, çawa li *carîyên* Xudan dik'eve. ¹⁹ Mêrno, jinên xwe hiz bikin, dilê wan neêşînin. ²⁰ Lawno, her tiştîda gura dê û bavê xweda bin, çimkî ew yek li Xudan xaş tê. ²¹ Bavno, hêrsa lawên xwe ranekin, ku ew ber xwe nek'evin.

²² Xulamno, her tiştîda gura xweyîyên xweye vê dinyayê bikin, ne ku bi rûva, ku ber ç'evên merivan bêne dîtîne, ku wan xaş bèn, lê bi dilê rast û tîrsa Xudan xulamtiyê bikin. ²³ Û çî jî bikin, bi hub û rez bikin, çawa bona Xudan, ne ku bona merivan. ²⁴ Zanibin, ku ji Xudan hûnê maş bistînin. Çimkî Xudan Mesîhra hûn xizmetîyê dîkin. ²⁵ Lê yê neheq wê weke neheqîya xwe bistîne, çimkî li cem Xwedê t'u firqî t'une.

* 2:9 Bi yûnanî: aha ye «hemû t'am-t'ijeya xwedêtiyê.»

† 3:11 Bi yûnanî aha ye: «Yûnan», yanî necihû.»

‡ 3:11 Skûti li ber ç'evên yûnanan cimeteke here paşdamayî bû.

⁴ ¹ Xweyîno, xulamên xwer'a heqîyê û rastîyê bikin. Hûn zanîbin, ku *ser* wer'a jî li ezmên Xudan heye.

² Her gav xwe bidine duakirinê û wê yekêda hişyar t'imê razîbûnê bidine Xwedê. ³ Bona me jî dua bikin, ku Xwedê bona xeberdanê derî li ber me veke, ku em sura Mesîh *hemûyan* bidine hesandinê, (bona k'îjanê jî ez bendkirî me), ⁴ ku ez wê *sur'ê* weke wê k'erema minr'a dayî bidime hesandinê.

⁵ Hindava nebaweranda serwaxt bin û waxtê xwe qazinc kin. ⁶ Bira xeberdana we merîfetî û xwêkirî be û zanîbin, ku çawa cayîz e, caba her kesî bidin.

⁷ Derheqa minda, her tiştî Tixîkoyê birayê delal wê bêje we. Ew berdestîkî amin û heval-xulamekî bi Xudan e. ⁸ Ez bona wê yekê wî ser weda dişînim, ku hûn haş ji me hebin û ew bi vê yekê ber dilê weda bê. ⁹ Ez wî t'evî Onîsimoyê birayê meyî aminî delal dişînim, ku ji we ye. Ewana wer'a wê bona her tiştên ku li vir dibin bêjin.

SILAVÊN AXIRÎYÊ

¹⁰ Erîstarxoyê hevalê minî hebsêda silavan li we dike, usa jî Marqosê pismamê Barnabas. (Bona wî we t'emî standye. Çaxê bê cem we, wî qebûl kin.) ¹¹ Û Îsayê ku jêr'a Yûsto jî dibêjin silavan li we dike. T'enê evana ji alîyê bawermendên cihûyanda bona P'adşatîya Xwedê t'evî k'arê min in û ber dilê minda hatine. ¹² Silavên Êpafraşê xulamê Mesîh Îsa jî li we hene, ku ew yekî ji we ye. Ew her dem bi dil û can bona we dua dike, ku hûn k'amil û t'am li nava hemû daxaza Xwedêda sekinî bin. ¹³ Ez şehde me, ku ew gelekî bona we, usa jî bona yên Lawdîkyayê û Hîrapolîsêda xîret dike. ¹⁴ Lûqayê hekîm û delal silavan li we dike, usa jî Dîmas. ¹⁵ Silavê bidine birayên Lawdîkyayê, Nîmfasa xûşk û civîna mala wêda. ¹⁶ Çaxê ev nama nava weda bê xandinê, usa jî bikin ku civîna Lawdîkyayêda bê xandinê û nama lawdikîyanr'a şandî jî hûn bixûnin. ¹⁷ Bêjine Arxîpo: «Bona wê xizmetîya ku te ji Xudan standye, miqatî bî, ku bînî sêrî».

¹⁸ Ev silav, min, Pawlos bi destê xwe nivîsî. Benên minî *hebsê* bîr nekin! K'erema Xwedê wer'a be.

NAMA PAWLOSE PÊŞIN TÊSALONÎKÎYANR'A

PÊŞGOTIN

Bajarê Têsalonîkê hingê li qeza Makedonyayêda p'ayt'extê Romayê bû. Li dema rêwîtiya Pawlose dudanda Xwedê bi mizgînîdayîna wî li wir jî civîn çêkir. Lê pêr'a-pêr'a cihû jî ç'evnebariyê rabûne miqabilî wî, ku k'arê dannasînkirina wî pêşda neçe. (K'arên Şandîyan 17:1,5-9). Lema Pawlos jî Têsalonîkê çû Beroyayê, paşê derbazî Korintê bû. Û bona hal-hewalê civîna Têsalonîkê û rabûn-rûniştina wan jî Tîmotêyoyê hevalk'arê xwe pê dihese.

Pawlos bi vê namê dil dide ber wan û wan dişidîne, çimkî ewana jî miletê xwe gelekî dihatine zêrandinê, ku ji rê-rizmê kal-bavaye p'ûç, ji p'ût'aristiyê derk'etibûn û vegeryabûn berbi Xwedêyê rast. Usa jî Pawlos caba gelek pîrsên wan dide. Bona hatina Îsaye dudana jî dinivîse, ku bawermend neyêne xapandinê, çimkî bona hatina Îsa gelekana jî ber xwe roj û dem digotin. Û çawa her namên xweda, usa jî vê namêda Pawlos li ser rabûn-rûniştina bawermendan disekine û şîret dike, ku ew li gora daxaza Xwedê bi pîrozî û paqijayî bijîn. Eva nama niha jî caba gelek pîrsên îroyîn dide.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1:1)

Xebera Xwedê çî rez dide bawermendan (1:2-3:13)

Jîyîna ku li Xwedê xaş tê (4:1-12)

Hînkirina li ser hatina Îsa Mesîh (4:13-5:11)

T'emî û silavên axiriyê (5:12-28)

SILAVKIRIN

1 Ji Pawlos, Sîlas û Tîmotêyo civîna Bav Xwedê û Xudan Îsa Mesîhr'a, ya ku li Têsalonîkêda ye: K'erem û haştîya Bav Xwedê û Xudan Îsa Mesîh bibe.

JÎYÎN Û BAWERÎYA TÊSALONÎKÎYAN

2 Em li nav duayên xweda her dem we bîr tînin û bona we hemûyan razîbûnê didine Xwedê. **3** Kirinên bawerîya we, k'arê hizkirina we û sebira gumana weye li ser Xudanê me Îsa Mesîh em li ber Xwedê Bavê xwe t'imê bîr tînin. **4** Em zanin, birano, ku hûn Xwedêda hizkirî û hilbijartî ne, **5** çimkî Mizgînîya me ne t'enê bi xeberê wer'a hate dannasînkirinê, lê usa jî bi zorayê, bi Ruhê Pîroz û îzbatîyê. Û hûn zanin, ku nava weda em wer'a çawa bûne. **6** Û hûn jî bûne mîna me û Xudan~ we nava gelek tengasiyanda bi şabûna ji Ruhê Pîroz xeber hilda. **7** Û aha hûn bona hemû bawermendên Makedonyayê û Axayayê bûne nexşek. **8** Çimkî xebera derheqa Xudanda ji we derk'et û bela bû, ne t'enê nava Makedonyayê û Axayayêda, lê bona wê bawerîya weye ser Xwedê her deran tê gotinê, usa ku îdî ne hewce ye em tiştekî serda zêde kin. **9** Çimkî ewana bona me dibêjin, ku we çawa em qebûl kirine û çawa hûn jî p'ûtan berbi Xwedê vegeryane, ku xizmetiyê Xwedêyê zêndî û rastra bikin **10** û ji ezmên hîvîya hatina Kur'ê wî bin, yê ku wî ji nava mirîyan zêndî kir~ Îsayê ku ji *xezeba* hêrsa tê me rizgar dike.

K'ARÊ PAWLOS LI TÊSALONÎKÊDA

2 **1** Hûn xwexa jî zanin, birano, ku hatina meye cem we ne badîhewa bû. **2** Em pêşiyê Filîpyayêda çerçirî bûn û hatibûne bêhurmetkirinê, çawa hûn zanin, paşê me bi Xwedêyê xwe dîsa turuş kir, ku wer'a *jî* nava wê miqabilîya giranda Mizgînîya Xwedê bêjin. **3** Çimkî xebera meye zarê şîrinda ne tiştekî xêlif heye, ne heramî heye, ne jî vir' û derew. **4** Lê çawa em ji Xwedêda hatine hilbijartinê û Mizgînî çawa li me hate spartinê, em usa xeber didin. Em usa nakin ku li merivan xaş bîn, lê li Xwedê, yê ku dilê me vedinihêre. **5** Me gotinên xweda durûtî nekirin, çawa hûn zanin, ne jî em dizîva pey timak'aryîyê çûn. Xwedê şehde ye! **6** Ne jî em pesinê navê xwe ger'yan, ne nava weda, ne jî nava yên mayînda. **7** Belê, me dikaribû çawa şandîyên Mesîh li ser we bibûna bargiranî. Lê em nava weda bînfîre bûne, çawa kevanîk, ku lawên xwer'a diricife. **8** Usa jî dilê me ser we dişewtî, heta ku me dixast ne t'enê Mizgînîya Xwedê bida we, lê jîyîna xwe jî, çimkî hûn bibûne delalîyên me. **9** Ew xebat û xîreta me tê bîra we, birano? Em şev û roj dixebitîn, ku li ser we t'u kesî nebîne bargiranî, çaxê me Mizgînîya Xwedê wer'a dannasîn kir.

10 Hûn xwexa şehde ne, usa jî Xwedê, ku çawa em we bawermendanr'a bi helalîyê, bi rastîyê û bêqusûr meşyan. **11** Hûn baş zanin, ku em hindava we her kesîda usa bûne, çawa bav hindava lawên xweda. **12** Me hûn şîret dikirin û dil dida ber we û hîvî ji we dikir, ku hûn usa bimeşin, çawa li Xwedê xaş tê, yê ku hûn gazî P'adşatî û rûmeta xwe kirin.

13 Û bona vê yekê jî em her t'im razîbûnê didine Xwedê, ku çaxê we ji me xebera Xwedê bihîst, we ew hilda, lê ne çawa xebera merivayê, lê çawa xebera Xwedê, rast usa jî heye, ku nava we bawermendanda ya xwe dike. **14** Çimkî hûn jî, birano, k'etine halê wan civînen Xwedêye p'ara Mesîh Îsa, yên ku li Cihûstanê ne û we jî hema ew *te'li-tengî* ji destê miletê xwe dît, çawa wana jî ji destê wan cihûyan, **15** yên ku him Xudan Îsa, him jî p'êxember kuştin û em jî zêrandin. Ewana ber ç'evê Xwedê k'etin û bûne neyarên hemû merivan! **16** Vana pêşî li me dibir'in, ku em hêtanosanr'a bona rizgarbûna wan xeber nedîn. Û bi vî cûreyî *wan cihûyan* her gav li ser gunehanda *guneh* dadigirtin û hêrsa here giran li ser xwe rakirine.

17 Lê em, birano, rast e demeke kin rû bi rû ji hev xerîb man, lê ne bi dil û hê zêde em k'etine demana dîtina rûyê we. **18** Me xast em bihatana cem we, min, Pawlos xwexa jî çend caran xast bêm, lê Şeytan rê neda me. **19** Lê li ber

Xudanê me Îsa k'î ye gumana me yan şabûna me yan jî t'acgulîya ku em pê difir'in, wî zamanê hatina wîda, ê ne hûn in? ²⁰ Belê, hûn in rûspîtî û şabûna me.

3 ¹ De îdî, me nikaribû sebir bikira. Me şewra xwe kir, ku em t'enê li Atînayê bimînî ² û Tîmotêyoyê birayê xwe, yê ku t'evî me Mizgînîya Mesîhda bona Xwedê dixebite, ser weda bişînin, ku bawerîya we qewîn ke û dil bide ber we, ³ ku van tengasîyanda ji we t'u kes nelik'ume. Çimkî hûn xwexa zanin, ku ev tişt bona me ne. ⁴ Belê, çaxê em cem we bûn, me hê hingêda wer'a digot, ku emê rastî tengasîyan bèn û usa jî bû, çawa hûn zanin. ⁵ Lema min îdî sebir nekir, Tîmotêyo şand, ku haş ji bawerîya we hebim, ku nebe Cêribandok hûn cêribandibin û ew zehmeta me *dît* deya her'e.

⁶ Lê niha Tîmotêyo ku ji cem we ser meda vegerya û mizgînîya bawerî û hizkirina we da me, ku we bi hub û rez em bîra xweda xwey kirine û heyra meda ne, çawa em jî ya weda, ⁷ ji boy wê yekê, birano, nava hemû te'lî-tengîyên meda, dilê me bi wê bawerîya we rihet bû, ⁸ çimkî gava hûn rîya Xudanda qewîn-qedîm dimînî, bîna me jî vedibe. ⁹ Em bona we û wê şabûna t'am, gelo çi razîbûnê dikarin bidine Xwedê, ku em li ber Xwedêyê xwe wer'a şa dibin? ¹⁰ Em şev û roj bi dil û can reca dikin, ku rûyê we bibînî û kêmasîya bawerîya we t'ije kin. ¹¹ Bira Xwedê~ Bavê me xwexa û Xudanê me Îsa rîya me rast ke, ku em bêne cem we. ¹² Bira Xudan hizkirina we hindava hevda û hemûyên mayînda şîne û zêde ke, çawa ya me hindava weda heye. ¹³ Bira dilê we bişîdîne, ku hûn pîrozîyêda bêqusûr bin, li ber hizûra Xwedê~ Bavê me, li dema hatina Xudanê me Îsa Mesîhda, gava hemû pîrozên xweva t'evayî bê.

JÎYÎNA KU XWEDÊ XAŞ TÊ

4 ¹ Niha birano, em bi navê Xudan Îsa hîvî û reca ji we dikin, ku çawa hûn ji me hûn bûn usa her'in û li Xwedê xaş bèn, ku hûn wê yekêda hê pêşda her'in. ² Çimkî hûn zanin, ku bi *qirara* Xudan Îsa me çi t'emî dane we. ³ Daxaza Xwedê ew e, ku hûn bêy lek'e bin~ ji qavîyê dûr bimînî. ⁴ Bira ji we her kes jî zanibe qalibê xwe bi helalîyê û bi namûsî xwey bike, ⁵ lê ne ku bi xwastina temê xirab, mîna hêtanosan, yên ku Xwedê nas nakin. ⁶ Nebe ku vê yekêda kesek bêesil derê û namûsa biranra bilîze. Bona van hemû tiştan Xudan wê heyfê ji wan hemûyan hilde, çawa ev yek me hê pêşda gote we û bi merîfetî t'emî da we. ⁷ Çimkî Xwedê gazî me li heramîyê nekiryê, lê helalîyê. ⁸ Awa k'î vê t'emîyê ber tişteki hesab nake, ew ne ku mêriv, lê Xwedê ber tişteki hesab nake, yê ku Ruhê xweyî Pîroz jî dide me.

⁹ Lê bona hizkirina hindava biranda, ne lazim e, ku em wer'a tişteki binivîsin, çimkî hûn xwexa ji Xwedê hîn bûne, ku hevdu hiz bikin. ¹⁰ Û hûn îdî wê hizkirinê hindava her birayên t'emamîya Makedonyayêda didine k'ifşê. Lê em hîvî ji we dikin, birano, ku hûn wê yekêda hê pêşda her'in. ¹¹ Bikin ku hûn rihet û bi hemdê xwe bijîn û ji we her kes k'arê xweva mijûl be û bi destê xwe bixebite, çawa me t'emî da we, ¹² ku p'ergalîya we yên derra bi merîfetî be û hûn hewcê t'u tiştî nebin.

HATINA XUDAN Û ZÊNDÎBÛNA MIRÎYAN

¹³ Birano, em dixazin ku hûn derheqa mirîyanda zanibin, ku ber xwe nek'evin, mîna ewên bêguman. ¹⁴ Awa heger em bawer dikin, ku Îsa mir û ji mirinê zêndî bû, usa jî Xwedê wê mirîyên ji bawerîya Îsa bi wîr'a vegeşîne. ¹⁵ Em vê yekê bi gotina Xudan dibêjine we: em ku heta hatina Xudan bijîn~ zêndî bimînî, t'u car pêşîya mirîyan nak'evin. ¹⁶ Xudan xwexa bi hesandina fermanî, bi dengê serokmilyak'et û lêxistina bor'îya Xwedê wê ji ezmên dak'ewe û ew mirîyên ku Mesîh bawer kiribûn, wê pêşîyê ji mirinê zêndî bin, ¹⁷ paşê, emên ku zêndî mane, emê wanr'a t'evayî e'wanra bêne hilbirinê û hewêda rastî Xudan bèn û aha heta-ha-tê t'evî Xudan bin. ¹⁸ Awa bi van xeberan ber dilê hevda werin.

XEZEB WÊ NIŞKÊVA BÊ

5 ¹ Lê bona waxt û sihetan, birano, ne hewce ye em tişteki wer'a binivîsin, ² çimkî hûn xwexa baş zanin, ku Roja Xudan wê mîna dizê şevê bê. ³ Çaxê bêjin: «Dinêda seqirî û aminî ye», hingê *xezeba* undabûnê wê nişkêva ser wanda bê, mîna êşa k'ulfeta duhalî û wê nikaribin jê rizgar bin. ⁴ Lê hûn, birano, ne tarîyêda ne ku ew Roj mîna dizekî ser weda bigire. ⁵ Hûn hemû jî lawên ronayê ne û lawên rojê. Em ne yên şevê ne, ne jî yên tarîyê. ⁶ Awa em mîna yên mayîn xewêda nemînî, lê hişyar û haş ji xwe hebin. ⁷ Çimkî ewên ku radizên, şevê radizên û ewên serxaş dibin, şevê serxaş dibin. ⁸ Lê em ku yên rojê ne, gerekê haş ji xwe hebin, êlekziriha bawerîyê û hizkirinê li xwe girêdin, k'umzirriha gumana rizgarîyê jî bidine serê xwe. ⁹ Xwedê ne ku bona *xezeba* hêrsê em k'ifş kirine, lê bona standina rizgarîyê, bi destê Xudanê me Îsa Mesîh. ¹⁰ Ew bona me mir, ku heger em zêndî bin yan mirî bin, t'evî wî bijîn. ¹¹ Lema ber dilê hevda werin û alîk'arîya hevdu bikin, çawa hûn dikin jî.

T'EMÎ Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

¹² Em hîvî ji we dikin birano, ku hûn hurmeta wan bigirin, yên ku boy navê Xudan nava weda dixebitin, serk'arîyê û şîretan li we dikin. ¹³ Hurmeta wana bona k'arê wan bi hizkirinê hê bilind bigirin. Hevr'a t'ifaq bin. ¹⁴ Em hîvî ji we dikin, birano, yên bêp'ergale bêxîret şîret kin, dil bidine ber tîrsonekan, kêrî k'etîyan werin, hindava hemûyanda sebira we hebe. ¹⁵ Miqatî xwe bin, nebe ku yek ji ber xirabîyêva xirabîyê bike, lê her dem ser nêta qencîyê bin, him bona hev, him jî bona hemûyan.

1 Têsalonêkîyanr'a 5

¹⁶ Her t'im şa bin, ¹⁷ her dem dua bikin, ¹⁸ her tiştîda razîbûnê bidin, çimkî ev e daxaza Xwedê bi *navê* Mesîh Îsa bona we. ¹⁹ *Dayîna* Ruh netemirînin. ²⁰ P'êxembertîyan bêrûmet nekin. ²¹ Her tiştî lê binihêrin, tiştên qenc qewîn bigirin. ²² Ji her cûr'e xirabîyan dûr k'evin.

²³ Xwedêyê haştîyê, xwexa we lap pîroz bike~ t'emamîya ruh, bînayî û qalibê we û heta hatina Xudanê me Îsa Mesîh bêqusûr xwey ke. ²⁴ Ewî gazî we dike yekî amin *e û boy çî gazî kirye* wê meyaser ke jî.

²⁵ Birano, bona me jî dua bikin. ²⁶ Bi ramûsana şîrê helal silavê bidine hemû biran. ²⁷ Ez we bi Xudan didime sondê, ku hûn vê namê hemû birayên pîrozr'a bixûnin. ²⁸ K'erema Xudanê me Îsa Mesîh wer'a be.

NAMA PAWLOSE DUDAN TÊSALONÎKÎYANR'A

PÊŞGOTIN

Nava vê civînêda t'imê pirsâ hatina Îsaye dudan pêşda dihat û gelek şirovekirinên şaş jî didan û heta ew şirovekirin yan p'êxembertî ser navê xulamên Xwedê digotin û ew t'evîhev dikirin. Pawlos vê nama xweye dudanda jî li ser wê pirsê disekine û zelal jî nivîsarên Kitêba Pîroz, mesele jî p'êxembertîya Daniyêl û yên din hîn dike, ku hatina Mesîh wê çawa be. Û dîsa, çawa her nameyên xweda, usa jî vê namêda Pawlos li ser rabûn-rûniştina bawermendan disekine û şîret dike, ku ew li gora daxaza Xwedê bi pîrozî û paqijayî bijîn, ji tengasîyan jî netirsîn.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1:1-2)
Razîbûn û hînkirina bona hatina Îsa (1:3-2:17)
Şîretên bona bawermendan (3:1-5)
T'emî û silavên axirîyê (3:6-18)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ji Pawlos, Sîlas û Tîmotêyo civîna Bav Xwedê û Xudan Îsa Mesîhr'a, ya ku li Têsalonîkêda ye: ² K'erem û haştîya Bav Xwedê û Xudan Îsa Mesîh bibe.

DÎWANA XWEDÊ RAST E

³ Ev deynê me ye, birano, ku her t'im bona we razîbûnê bidine Xwedê û ev yek rast e jî, çimkî bawerîya we baş digihîje û hizkirina we hindava hevda zêde dibe. ⁴ Lema em xwexa jî nava civînên Xwedêda bi we fir'naq dibin, bona sebir û bawerîya we, çimkî hûn wan hemû zêrandin û tengasîyanda, yên ku tene serê we, sebir dikin. ⁵ Ev yek îzbat dike, ku dîwana Xwedê rast e. Û aha hûnê hêjayî P'adşatîya Xwedê bin, bona k'îjanê jî hûn wan te'lî-tengîyan dibînin. ⁶ Belê, Xwedê rast e, ku wan bide tengasîyê, yên we didine tengasîyê ⁷ û yên ji we tengasîyêda ne jî, t'evî me bide hêsakirinê. Ev yekê bibe, çaxê Xudan Îsa t'evî milyak'etên xweye zor ji ezmên bi k'ûra agirva k'ifş be, ⁸ ku heyfê ji wan hilde, yên ku Xwedê nas nakin û gura Mizgînîya Xudanê me Îsa Mesîh nakin. ⁹ Ewana wê bela xwe bi wêranbûna heta-ha-tê bibînin~ wê ji hizûra Xudan û rûmeta qewata wî bêne avîtinê, ¹⁰ çaxê wê Rojê ew bê, ku nava pîrozên xweda bê rûmetkirinê û hingê hemû bawermend wê bi wî heyr-hujmek'ar bin. Hûnê jî nava wanda bin, çimkî we bawerîya xwe şehdetîya me anî. ¹¹ Ji ber vê yekê em her t'im bona we dua dikin, ku Xwedêyê me, we hêjayî wê gazîyê ke û hemû nêt-meremên weye qenc û kirinên weye ji bawerîyê bi qewatê meyaser ke. ¹² Û aha wê pesinê navê Xudanê me Îsa nava weda bê dayînê û hûnê jî nava wîda bêne pesinê bistînin, li gora k'erema Xwedêyê me û Xudan Îsa Mesîh.

K'IFŞBÛNA MERIVÊ NEHEQÎYÊ Û HATINA XUDAN ÎSA MESÎH

2 ¹ Em hîvî ji we dikin, birano, ku bona hatina Xudanê me Îsa Mesîh û t'opbûna meye cem wî, ² hûn fikirên xweda zû şaş nebin û xwe unda nekin, ne bi p'êxembertîyê, ne bi zargotinê, ne jî bi nameyan, yançîye me nivîsîbe yanê: «Va ye Roja Xudan îdî hatye». ³ Bira t'u kes we bi t'u tiştî nexapîne, çimkî ew Roj nayê, heta ku raberîbûn pêşda neyê û ew Merivê Neheqîyêyî p'ara undabûnê k'ifş nebe. ⁴ Ewê miqabilî her tiştan bisekine~ çî ku xwedê tene hesabê yan hebandinê û xwe ser her tiştîra bigire, heta ku p'aristxana Xwedêda jî wê rûnê û bide k'ifşê, yanê ew Xwedê ye.

⁵ Gelo nayê bîra we, çaxê ez hê cem we bûm, min ev tişt digotine we? ⁶ Û hûn zanin çî nahêle ku ew niha k'ifş be, ku ew waxtê qirarkirîda k'ifş be. ⁷ Çimkî Sura Neheqîyê îdî destpê kirye, lê ewê ku niha nahêle, wê nahêle heta ku xwexa ji navê bê hildanê. ⁸ Û paşê Ewî Neheq wê k'ifş be, ku Xudan Îsa wê bi hulma devê xwe, li dema hatina xwe, ku k'ifş be wê wî unda ke. ⁹ Hatina Yê Neheq wê bi qewata Şeytan be, heta hunurê wî jî wê hebe ku nîşan û k'iryametên derew bike ¹⁰ û yên ku diçine undabûnê wê bi her cûr'e neheqîyan bixapîne. Ewana unda dibin, çimkî wan rastî hiz nekir û hilneda ku rizgar bin. ¹¹ Lema jî Xwedê xalifandineke zor ser wanda diçîne, ku bawerîya xwe derewîyê bînin, ¹² ku dîwana wan her kesî bibe, yên ku bawerîya xwe rastîyê neanîn, lê k'êfa wan neheqîyêra hat.

¹³ Lê em gerekê bona we her dem ji Xwedê razî bin, birayên ji Xudanda hizkirî, çimkî Xwedê hûn hilbijartin, ku bi Ruh hûn bêne pîrozkirinê, bawerîya xwe rastîyê bînin û bibine berên rizgarîyêye pêşin. ¹⁴ Ewî gazî we wê yekê kir, ku bi Mizgînîdayîna me hûn rûmeta Xudanê me Îsa Mesîh bistînin. ¹⁵ Awa birano, qewîn-qedîm bimînin û wan rê-rizman qewîn bigirin, yên ku hûn heger ji gotinên me bin yan ji nameyên me bin hîn bûne.

¹⁶ Xudanê me Îsa Mesîh xwexa û Bavê me Xwedê, yê ku em hiz kirin û bi k'eremê berdilîke heta-ha-tê û gumana qenc da me, ¹⁷ bira ber dilê weda bê û we nava hemû kirin û gotinên qencda bişidîne.

T'EMÎ Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

3 ¹ De îdî, birano, bona me dua bikin, ku xebera Xudan zû pêşda her'e û bê rûmetkirinê, çawa nava weda bû. ² Dua bikin, ku em ji merivên neheq û xirab rizgar bin, çimkî ne her kes in, ku Mizgînîyêra amin in. ³ Lê Xudan xwexa amin e, wê we bişidîne û ji Yê Xirab xwey ke. ⁴ Em bi Xudan weda bawer in, ku me çî t'emî dane we, hûn diqedînin û hûnê biqedînin jî. ⁵ Bira Xudan mêla we bide ser hizkirina Xwedê û sebira Mesîh.

⁶ Em t'emî li we dîkin, birano, bi navê Xudanê xwe Îsa Mesîh, ku hûn xwe ji her birayê bêp'ergale bêxîret dûr bigirin, yê ku wan rê-rizmê ku me dane we naqedînin. ⁷ Hûn xwexa zanin, ku gerekê hûn ç'ev bidine me, çimkî em nava weda bêp'ergale bêxîret nebûne, ⁸ ne jî me nanê kesekî bêy maş xwarye, lê bi xûdana enîya xwe şev û roj em dixebitîn, ku ser we t'u kesî nebîne bargiranî. ⁹ Ne ku destûra me t'unebû, lê me nexşê xwe nîşanî we kir, ku hûn ç'ev bidine me. ¹⁰ Çimkî çaxê em hê cem we bûn jî, me ev yek digote we: «K'î naxaze bixebite, bira nexwe jî». ¹¹ Lê em dibihên, ku nava weda hinekên bêp'ergale xwer'anedîtî hene, k'arê xwe hiştine, t'evî k'arê kesên din dibin. ¹² Em bi navê Xudan Îsa Mesîh t'emî û hîvî ji yê usa dîkin, ku bi merîfetî bixebitin û nanê xwe bixwin. ¹³ Lê hûn, birano, ji qencîkirinê newestin. ¹⁴ Heger yek guhdarîya gotinên meye vê namêda neke, *vî cezayî wîr'a* k'ifş kin~ wîr'a hevaltîyê nekin, ku şerm bike. ¹⁵ Lê nebe ku mîna dijminekî wî binihêrin, lê mîna bira şîret kin. ¹⁶ Bira Xudanê haştîyê xwexa, her dem, her alîva haştîyê bide we. Xudan we hemûyanr'a be. ¹⁷ Eva silava destê min Pawlos e, çawa nîşana hemû nameyên min, aha dinivîsim. ¹⁸ K'erema Xudanê me Îsa Mesîh we hemûyanr'a be.

NAMA PAWLOSE PÊŞIN TÎMOTÊYOR'A

PÊŞGOTIN

Tîmotêyo cahilekî bawermend bû, ji Asya Biç'ûk, bavê wî yûnan bû, lê dîya wî cihû. Li bajarê Lîstrayêda Pawlos li dema rêwîtiya xweye dudan rastî wî hat. Ji hingêda Tîmotêyo, nava rêwîtiya wîda bû hevalk'arekî wîyî pêş. Lema navê wî gelek caran li kitêba «K'arên Şandiyanda» û gelek namên Pawlosda tê biranînê. Gelek caran Pawlos k'arên civînên nû spartye wî, çawa yekî amin nava cûr'e-cûr'e pirsên giranda.

Vê namêda Pawlos bona hînkirinên şaş dibêje, ku Tîmotêyo miqat be, ku ew şaş nek'evine civînê. Ew hînkirinên şaş, bona k'îjanan Pawlos dibêje, îro bi navê «Ginostîk» tê naskirinê (bi yûnanî «Gnosis» tê femkirinê «zanebûn») û nava sedsaliyên pêşinda, hê zêde sedsaliya dudan û sisyanada ew hînkin gelekî bela bibû.

Usa jî Pawlos vê namêda li ser rabûn-rûniştin û xizmetiyên civînêda û bona xeysetê serwêran, berpirsyaran û berdestiyan dinivîse. Û şîretê dide Tîmotêyo, ku ew civînêda giran be, bi rabûn-rûniştina xwe bibe xulamekî Mesîhî xweyê nexşê qenc û cabdariya civînêye cûr'e-cûr'e jî hilde ser xwe.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1:1-2)
Civîn û xizmetk'arên wê (1:3-3:16)
Dersdarên derew û xizmetk'arê qenc(4:1-5:25)
T'emî û silavên axiriyê (6:1-21)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ji Pawlosê şandiyê Mesîhî Îsa, bi daxaza Xwedêyê Rizgarkirê me û Mesîhî Îsayê gumana me. ² Bira rehm, k'erem û haştiya Bavê me Xwedê û Xudanê me Mesîhî Îsa li Tîmotêyoyê lawê minî jî baweriyêyî heqî-helalr'a bibe.

XIZMETK'ARÎYA KU LI PAWLOS HATE SPARTINÊ

³ Çaxê ez diçûme Makedonyayê, min hîvî ji te kir, li Efesê bimînî, ku t'emîyê bidî çend kesan, ku ew hînkirina şaş nedin ⁴ û guh nedine çilovîskan û hesabên silsiletan, ku xilazîya wan t'une, ku hê şer'-de'wan t'evradike, ne ku qirara Xwedê pêk tîne, ya ku bi baweriyê meyaser dibe. ⁵ Serê t'emîyê hizkirin e, ji dilê rast, îsafa rihet û bawerîya bêy durûtî. ⁶ Ji k'îjanan hinek dager'yan û pey gotinên p'ûç k'etin. ⁷ Dixazin bibine dersdarên Qanûnê, lê ew xwexa jî nizanin çî dibêjin, ne jî wan tiştên ku didine zora xwe fem dikin.

⁸ Em zanin, ku Qanûn qenc e, heger yek wê rast biqedîne. ⁹ Femdarî ye, ku qanûn ne bona merivên rast e, lê bona neheq û serhişkan e, bona nep'ak û gunehk'aran e, bona mirdar û heraman e, bona wan e, yên ku hurmeta dê-bavê xwe dik'evin, bona merivkujan e, ¹⁰ bênamûsan, qonan, merivdizan, derewîn û şehdederewan e û bona wan her kesan e, yên ku tiştên miqabilî hînkirina silamet dikin, ¹¹ *miqabilî* wê hînkirina ku li Mizgînîya xweyrûmet digire, ya ku ji Xwedêyê xwezîyî ye, k'îjan li min hatye spartinê.

¹² Ez jî Mesîhî Îsa razî me, ji Xudanê me, ku qewat da min û ez amin hesab kirim û danîme ser vê xizmetk'ariyê. ¹³ Ez jî berê li wî dik'ifirîm, min ew dizêrand û dijminatî li wî dikir, lê rehm li min bû, çimkî min nebaweriyêda bi nezanîya xwe ew *tişt* kirin. ¹⁴ K'erema Xudanê me ser minda gelek barî, bi t'evî bawerî û hizkirina Mesîhî Îsa. ¹⁵ Vê gotinêda xêlif t'une û lap hêja ye, ku bê hildanê, ku: «Mesîhî Îsa hate dinyayê, ku gunehk'aran rizgar bike», serê k'îjanan ez im. ¹⁶ Lê rehm bona wê yekê li min bû, ku Mesîhî Îsa li ser min t'emamiya sebira xwe bide k'ifşê, çawa bona yekî serê gunehk'aran, ku bona wan bibe nexşek, yên ku wê bawerîya xwe wî bînin, ku jîyîna heta-hatê bistînin. ¹⁷ Awa wî P'adşayê heta-hatêyî nemirî û nek'ifşr'a~ Xwedêyê bêhimberr'a bira heta-hatê hurmet û rûmet be! Amîn.

¹⁸ Lawê min Tîmotêyo, evê t'emîyê didime te, ku tu şer'ê xweyî qenc li gora wan p'êxembertîyan bikî, yên ku pêşda bona te bûn, ¹⁹ dest jî baweriyê neke û îsafa xwe rihet xwey ke. Hinekan ev yek jî xwe dûr xistin û gemîya bawerîya xwe welgerandin. ²⁰ Ji wan bûn, Hûmenayo û Skender, ku min ew dane destê Şeytan, ku ew hîn bin Xwedê nek'ifirin.

DERHEQA DUA Û CIVÎNÊDA

2 ¹ Awa hîvî dikim, ku berî her tiştî bona hemû merivan dua bikin, reca û lava bikin, razîbûnê bidin, ² usa jî bona p'adşan û hemû serokan, ku em jîyîneke seqirî û rihet derbaz kin û t'am li nava xizmetîya Xwedêda bin, bi maqûliyê. ³ Li ber Xwedê Rizgarkirê me ev e qenc û bi dilê wî, ⁴ ku dixaze hemû meriv rizgar bin û rastîyê nas bikin. ⁵ Çimkî heye Xwedêk û nava Xwedê û merivanda jî navçêtîk~ meriv Mesîhî Îsa, ⁶ ku kesa xwe çawa maşê rizgarkirina hemûyan da. Eva yeka rast waxtda bû îzbatîya *daxaza Xwedê*. ⁷ Û bona vê yekê ez dannasînkir û şandî hatime k'ifşkirinê, (ez rast dibêjim, derew nakim,) hêtanosanr'a bi rastîyê bûme dersdarê baweriyê.

⁸ Awa ez dixazim, ku her deran mêr destên xwe bi helalî bilind kin û bêy hêrs û bêy dudilî dua bikin.

⁹ Usa jî bira k'ulfet bi k'incên maqûl-layîq bin, xemila wane *rast* jî şerm û namûs bin, ne ku gulî-gujang yan zêr' yan dur' yan jî k'incên qîmetgiran, ¹⁰ lê bi kirên qenc, çawa li wan k'ulfetan dik'eve, yên ku Xwedêr'a xizmetiyê dikin. ¹¹ Bira k'ulfet bêdeng û bêy xeberdan hîn be, bi t'emamiya guhdariyê. ¹² Ez îzinê nadime k'ulfet, ku hîn bike, ne jî hikumî li ser mêr bike, lê bira dengê xwe bibir'e. ¹³ Çimkî pêşiyê Adem xuliqî, paşê Hêwa ¹⁴ û Adem

nexapîya, lê jin xapîya û neheqî kir. ¹⁵ Lê halê zar'anînêda jî *jin* wê rizgar be, * heger bi namûsî nava bawerîyê, hizkirinê û paqijayîyêda bimîne.

BONA XIZMETK'ARÊN CIVÎNÊ

3 ¹ Vê gotinêda xêlif t'une: Heger nêt-fikira yekî li serk'arîyê heye, ew k'arekî qenc dixaze. ² Serk'ar gerekê bêqusûr be, mêrê jinekê be, haş ji xwe hebe, aqilda giran, maqûl, mêvanhiz, hînkirinêda serxwe be, ³ ne pey îçkê, ne sirtûk, lê berbihêr, ne şer'ûd, ne p'erehiz. ⁴ Bira malxêtiya baş li mala xwe bike, lawên xwe gur'a xweda her alîyanva maqûliyêda mezin ke. ⁵ (Çimkî heger yek nizane malxêtiyê li mala xwe bike, wê çawa bikaribe xemk'êşîyê li civîna Xwedê bike?) ⁶ Bira ne jî bawermendê nû be, ku nebe k'ubar be û dîwana wî jî mîna ya Şeytan bê kirinê. ⁷ Û li cem yên ji civînê der jî gerekê bona wî baş bê gotinê, ku nebe bê bêhurmetkirinê û bik'eve t'ela Şeytan.

⁸ Usa jî bira berdestî maqûl bin, xebendanêda durûtîyê nekin, îçkehiz nebin, pey k'eda heram nek'evin. ⁹ Sur'a bawerîyê bi îsafa rihet xwey kin. ¹⁰ Û evana jî bira pêşda bêne cêribandinê û heger tiştêk li ser wan t'unebe, paşî hingê bira berdestîyê bikin.

¹¹ Usa jî bira k'ulfetên *berdestî* giran, ne xeybkir, lê haş ji xwe hebin û her tiştîda amin bin.

¹² Berdestî gerekê mêrê jinekê be, baş malxêtiyê li lawên xwe û mala xwe bike. ¹³ Ewên ku baş berdestîyê dikan, ew xwer'a dereceke bilind qazinc dikan û li bawerîya Mesîh Îsada jî *dikarin* gelekî bêy tirs *nêzîkî wî bin*.

SUR'A XWEDÊNASIYÊ

¹⁴ Ez ku van tiştan ter'a dinivîsim, guman heye ezê zûtirekê ser teda bêm. ¹⁵ Lê heger derengî k'evim jî, tuê zanibî çawa gerekê mala Xwedêda~ civîna Xwedêyê zêndîda bimeşî, ku ew e stûn û îdara[†] rastîyê. ¹⁶ Bêy xebendan, sura xwedênasiya me gelekî k'ûr e~ Xwedê bi bedenî k'ifş bû, bi *binyata* Ruh rastîya wî hate îzbatkirinê, milyak'etanva hate dîtinê, nava hêtanosanda hate dannasînkirinê, dinyayêda hate bawer-kirinê û rûmetêra hate hilbirinê.

DERSDARÊN DEREW Û XIZMETK'ARÊ QENC

4 ¹ *Ruhê Pîroz* aşkere dibêje, ku axirzemananda hinek wê ji bawerîyê dûr k'evin û guh bidine ruhên derewîn û hînkirinên cinan, ² çî ku bi durûtîya derewînan e, îsafa k'îjanan *mîna ç'ermê* daxbûyî ye, *ku avê hilnade*. ³ Ew meriv hal-zewacê didine hildanê û *merivan* ji wan xwarinan didine dûrxistinê, k'îjan Xwedê bona bawermend û rastînaskirîyan efirandine, ku bi razîbûnê bixwin. ⁴ Her tiştê ku Xwedê çê kirye qenc e û tiştêkî heram têda t'une, heger ew bi razîbûnê tê hildanê, ⁵ çimkî bi xebera Xwedê û duakirinê tê paqijkirinê.

⁶ Heger tu van şîretan biratîyê hîn bikî, tuê bibî xizmetk'arê Mesîh Îsayî qenc, çawa tu xwexa jî bi wan gotinên bawerîyê û hînbûna qence ku pey çûyî, qinyatê digirî. ⁷ Xwe ji çilovîskên pîrejînaye heram dûr bigire. Xwe hînkirina xizmetk'arîya Xwedêda qal ke. ⁸ Qalkirina qalib kêrî tiştê hindik tê, lê ya xizmetk'arîya Xwedêda kêrî her tiştî tê, sozê wê him bona vê dinyayê heye, him jî bona dinê axretê. ⁹ Vê gotinêda xêlif t'une û lap hêja ye, ku bê hildanê. ¹⁰ Bona vê yekê em dixebitin û bêhurmet dibûn, çimkî me gumana xwe danîye ser Xwedêyê zêndî, ku Rizgarkirê hemû merivan e, hê zêde yê bawermendan.

¹¹ Van tiştan t'emî ke û hîn ke. ¹² Nebe ku yek cahiltîya te bêhurmet ke, lê tu bawermendanra bibe nexşek, xebendanêda, rabûn-rûniştinêda, hizkirinêda, bawerîyê û helalîyêda. ¹³ heta hatina min pey wê yekê be, ku cimetêra nivîsarên pîroz bixûnî, şîret kî, hîn kî. ¹⁴ Hindava wê p'êşkêşa xweye ruhanîda bêxem nebe, ya ku bi p'êxembertîyê ter'a hatye dayînê, gava berpirsyanan destê xwe danîne ser te. ¹⁵ Guh bide ser wan tiştan û nava wanda bimîne, ku pêşdaçûyîna te ber hemûyan aşkere be. ¹⁶ Haş ji xwe û ji hînkirina xwe hebe. Her dem nava wanda bimîne, çimkî bi vî cûreyî tuê xwe jî rizgar kî û wan jî, ewên ku guhdarîya te dikan.

RABÛN-RÛNIŞTINA T'EVÎ MEZIN Û BIÇ'ÛKAN U K'ARÊ JINEBÎYAN

5 ¹ Dilê kalemêran neêşîne, lê çawa bavê xwe ber dilê wanda were. Cahilan çawa birayên xwe hesab ke, ² pîrejînan çawa dîya xwe, k'ulfetên cahil çawa xûşkên te'mê dê-bavê, her alîva bi fikira dilê paqij.

³ Hurmetê bona wan jinebîyan bike, yên ku jinebîyên pey rastîyê ne. ⁴ Lê heger law yan nevíyên jinebîkê hebin, bira ewana pêşîyê hîn bin, ku mala xweda li ser dê û bavê xwe dilşewat bin û deynê wan vegeînin, çimkî li ber Xwedê ev yek qenc e, li wî xaş tê. ⁵ Jinebîya pey rastîyê ew e, ya ku t'enê maye û gumana xwe danîye ser Xwedê, şev û rojên xwe bi dua û reca derbaz dike. ⁶ Lê ya pey k'êfa dilê xwe ye, hizkî ew zêndî ye, lê *bi ruh* mirî ye. ⁷ Van tiştan t'emî bike, ku bêlek'e bin. ⁸ Lê heger merivek bona xwexatîya xwe û hema bona mala xwe xem nake, yê usa bawerî înk'ar kirye û ji nebaweran jî xirabtir e.

[†] 2:15 Ji sedsalîya 1-êda-3-an hînkirineke şaş bela bibû, ku digotin <p'êşê kevantîyê û zaranîne guneh e, jinên usa rizgar nabin,> lê Pawlos dide k'ifşê, ku halê zaranîne ne guneh e û pêşîya rizgarîyê nabir'e>.

[†] 3:15 Fikira wê ev e, ku li ser civînê û nava wêda rastî îdare bûye.

⁹ Nava *xizmetk'arîya* jinebîyanda bira ew bê hildanê*, ya ku ji şêst salî ne kêmtir e, carekê mêrkirî bûye, ¹⁰ bi kirinên qencva jî k'ifş e~ zar'ok mezin kiribin, mêvan qebûl kiribin, nigên pîrozana şuştîbin, dest avîtibe k'etîyan û bona her k'arê qenc jî hazir e.

¹¹ Lê jinebîyên cahil hilnede, çimkî ew li ber Mesîh *ne amin in*, gava temê xwe xirab dikin, dixazin mêr kin ¹² û aha dîwanê ser xweda tînin, çimkî qirara pêşda *girêdayîr'a* amin namînin, paşda vedik'işin û dibine xweranedîtî, ¹³ mal-mal diger'in û ne t'enê xweranedîtî ne, lê usa jî gilîgero, t'evî k'arê kesên din dibin û tiştên necayîz xeber didin. ¹⁴ Awa ez dixazim, ku jinebîyên cahil mêr kin, zar'okan bînin û malkir bin, ku ziman nekine devê xêrnexazan. ¹⁵ Çimkî îdî ji jinebîyên cahil hinek xalifîn, pey Şeytan çûn. ¹⁶ Heger mala bawermendekîda jinebî hebin, bira ew alîk'arîya wan bike û civînê neke bin barê giran, ku civîn bikaribe alîk'arîya jinebîyên pey rastîyê bike.

BONA BERPIRSYARAN

¹⁷ Ew berpirsyarên ku baş serk'arîyê dikin, bira dubare hêjayî hurmetê bin û hê zêde ewên ku li ser xeberdanê û hînkirinê dixebitin. ¹⁸ Çimkî nivîsar dibêje: «Devê gayê ku bêderêda dixebite girênede» û «K'arker hêjayî maşê xwe ye».† ¹⁹ Hindava berpirsyarda gilî-gotinan hilnede, heger du yan sê şehde t'unebin. ²⁰ Lê berpirsyarên ku nava gunehanda ne li ber hemûyan li wan hilê, ku yên mayîn jî bitirsin.

²¹ Ez li ber hizûra Xwedê, Mesîh Îsa û milyak'etên bijare çawa deyn dikime stûyê te, ku tu van şîretan bêy mêlt'agêrî xwey kî, t'u tiştî bi firqîyê nekî.

²² Destê xwe zû daneyne ser yekî, bona *xizmetk'arîya* Xudan û t'evî gunehên wan nebe. Xwe paqij xwey ke.

²³ Ji vir hada t'enê avê venexwe, lê hinek jî şerab t'ev ke, bona hinava *xwe* û bona wê yekê, ku tu zû-zû nexaş dik'evî.²⁴ Hene hinek, ku gunehên wan k'ifş in û wan rast dibine ber dîwanê, lê gunehên hinekan jî paşê wê k'ifş bin. ²⁵ Usa jî kirinên qenc k'ifş in û ew kirinên ku ne k'ifş in jî, wê veşartî nemînin.

T'EMÎ Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

6 ¹ Yên ku bin barê xulamtîyêda ne, bira axayên xwe hêjayî hurmeta bilind hesab kin, ku navê Xwedê û hînkirina me neyê bêhurmetkirinê. ² Axayên k'êye bawermend hene, bira wan bêhurmet nekin, çimkî ew birayên hev in. Yê xulam bira hê baş xulamtîyê bikin, çimkî ewên ku ji xizmetîya wan qazincê distînin, ew bawermend û delal in. Van tiştan hîn bike û şîret ke. ³ Heger yek tiştêkî din hîn bike û gotinên Xudanê me Îsa Mesîhe silometr'a û wê hînkirina xizmetk'arîya Xwedê'a ne razî ye, ⁴ ew yekî k'ubar e û tiştêkî nizane. Ew nexaşiya şer' û de'wanva girtî ye, ji çî jî hevsûdî, neyarî, k'ifîrî, şikên xirab ⁵ û şer'ûdî pêşda tîn. Ev her tişt ji nav merivên nêfîkirda herimî û ji rastîyê k'ûvîbûyî pêşda tîn, ku bi ya wan, ew dikarin ser navê xizmetk'arîya boy Xwedê hebûka vê dinê xwer'a qazinc kin. ⁶ Lê xizmetk'arîya boy Xwedê bi razîdarîyêva qazinceke mezin e. ⁷ Me t'u tişt neaniye dinyayê û emê nikaribin tiştêkî jî bibin. ⁸ Lê k'inc û xurekê me hebin, bi wan em razî bin. ⁹ Lê ewên ku dixazin dewlemend bin, têne cêribandinê, dik'evine t'elê û nava gelek temên bêaqil û zîyandar, k'îjan mêriv niqoyî undabûnê û wêranbûnê dikin. ¹⁰ Çimkî p'erehizî bingeha her cûr'e xirabîyê ye. Hinekan xwe dane wê yekê, ji bawerîyê xalifîn û bûne xweyê kul û derdan.

¹¹ Lê tu, merivê Xwedê, ji van tiştan bireve û pey rastîyê, xizmetîya boy Xwedê, bawerîyê, hizkirinê, sebir-sik'anê û milûkîyê her'e. ¹² Şer'ê bawerîyêye qenc bike, jîyîna heta-ha-tê qazinc ke, ku wê yekê'a hatî gazîkirinê û li ber gelek şehdan te ew îqrara qenc da. ¹³ Ez li ber hizûra Xwedêyê ku jîyînê dide hemû efîrînan û li ber Mesîh Îsayê ku li ber Pîlatoyê Pontîyo bi îqrara qenc şehdetî da, t'emîyê didim te, ¹⁴ ku tu vê t'emîyê bêlek'e û bêqusûr xwey kî, heta k'ifşbûna Xudanê me Îsa Mesîh, ¹⁵ ku waxtê xweda wê ji alîyê Yê xwezî û zorî bêhimberda k'ifş be, P'adşayê p'adşayan û Xudanê xudanan. ¹⁶ Ku nemirin t'enê ji *hikumê* wî ye û ew nava ronayêda ye, ku t'u kes nikare nêzik bê. T'u merivî ew nedîtye û ne jî dikare bibîne. Hurmet û zoraya heta-ha-tê wîr'a be! Amîn.

¹⁷ T'emîyê bide dewlemendên vê dinyayê, bira babax nebin û gumana xwe nedine ser hebûka p'ûçe derew, lê ser Xwedêyê zêndî, ku her tiştî bi merdanî dide me, ku em lezetê jê bibînin. ¹⁸ Bira ew qencîyan bikin, bi kirinên qenc dewlemend bin, merd bin û p'arevekirinê'a jî hazir bin, ¹⁹ ku bi vî cûreyî xwer'a xeznekê t'op kin, ku bi wê bona jîyîna rast rikinekî qenc axretêda xwer'a qazinc kin.

²⁰ Ay Tîmotêyo! Çi tiştên ku li te hatine spartîne, wan xwey bike. Ji gotinên p'ûçe heram û ji şer'-de'wan xwe dûr bigire, ku navê «zanebûn»-ê derew li wan tiştan kirine. ²¹ Hinekan xwe van yekan girt û ji bawerîyê xalifîn. K'erema Xwedê wer'a be.

* 5:9-15 Hingê jinebîyan bona xizmetkirinê deftera civînêda navên xwe didane nivîsarê, lê Pawlos digot, ku yên cahil neyêne nivîsarê, çimkî qirar ev bû, ku gerekê wan t'emamîya jîyîna xwe Mesîhra xizmetî bikira, lê çaxê dixastin mêr bikirana, soz-qirarê xwe dit'eribandin û çawa yên bêamin wê bik'etana ber dîwanê, lê Pawlos ew yek nedixast.

† 5:18 Qanûna Ducarî 25:4; Lûqa 10:7.

NAMA PAWLOSE DUDAN TÎMOTÊYOR'A

PÊŞGOTIN

Ev nama dudan Tîmotêyor'a Pawlos ji kelê nivîsiye, gava Romêda bendkirî bû. Vê namêda hê zêde t'emî û şîret in, ku dide hevalk'arê xweyî cahil. Li vir fikira sere ew e, ku mizgîndar gerekê nava zêrandin û tengasîyêda sebir bikin û teyax bin, lema jî ew ber dilê wîda tê, ku ew bêtirs be û şer'ê xweyî qenc baş pêk bîne, çawa eskerê Mesîhî amin. Pawlos dil dide Tîmotêyo, ku serxwe be û bêtirs şehdetîya bona Îsa Mesîh bide, hînkirina rastîya Mizgîniyê xwey bike û borcê xwe, çawa yekî dersdar û mizgîndar bine sêrî.

Pawlos Tîmotêyor'a dinivîse, ku ew haş ji xwe hebe, nek'êve nava de'w-dozen p'ûçe vala, ku kêr nayên, lê t'enê guhdaran p'işk dikan.

Usa jî Pawlos nêt-meremê şandîtiya xwe, bawerîya xwe, sebir, hizkirin, zêrandin û tengasîyên xwe tîne bîra Tîmotêyo, çawa nexşê jîyîna bawermendê ku vegeryaye berbi Xwedê, ku li ser vê dinya xirabiyêda xwedênas bikaribin bi jîyîna xwe îzbat bikin, ku ew qirara Xwedê ser her tiştîr'a digirin û usa pesinê navê Xwedê didin.

Eva nama dikare ber dilê hemû bawermendanda bê, hê zêde wan, yên ku barê xizmetîya Xudan hildane ser xwe.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1:1-2)

Razîbûn û dilşidandin (1:3-2:13)

T'emî û şîret (2:14-4:5)

Nexşê jîyîna Pawlos (4:6-22)

SILAVKIRIN, RAZÎBÛN Û DILŞIDANDIN

1 ¹ Ji Pawlosê bi daxaza Xwedê şandiyê Mesîh Îsa, li gora wî sozê jîyînê, ya ku bi Mesîh Îsa ye, ² bira rehm, k'erem û haştiya Bav Xwedê û Xudanê me Mesîh Îsa li Tîmotêyoyê lawê minî delal be.

³ Ez ji Xwedê razî me, ku mîna pêşiyên xwe ez bi îsafa rihet wîr'a xizmetiyê dikim, her dem şev û roj nava duayên xweda te bîr tînim. ⁴ Û çaxê hêsirên te bîr tînim, dik'evime demana dîtina te, ku şabûn bik'êve dilê min. ⁵ Ez wê bawerîya teye bi dilê rast bîr tînim, ya ku pêşda cem pîrika te Loyîsê û dîya te Eynikê hebû û bawer im, ku ew bawerî nava teda jî heye. ⁶ Lema ez tînime bîra te, ku tu k'arê p'êşkêşa Xwedê hê gur' kî, ya ku bi destdanîna min ter'a hate dayînê. ⁷ Çimkî Xwedê ruhekî tirsê neda me, lê Yê zorayê, hizkirinê û serhişxwebûnê.

⁸ Awa şerm neke, ku bona Xudanê me şehdetiyê bidî, ne jî bona min şerm bike, ku ez bona navê wî bendkirî me. Lê t'evî me bona Mizgîniyê biçerçire, anegorî zoraya Xwedê. ⁹ Xwedê em rizgar kirin, pîrozîyêr'a gazî kirin, ne ku bona kirinên me, lê bi qirar û k'erema xwe. Ev k'erem bi Mesîh Îsa hê ji dewrên berêda mer'a hate dayînê. ¹⁰ Lê niha bi k'ifşûna Rizgarkirê me Mesîh Îsa aşkere bû, ku mirin hêç kir û jîyîna nemiriyê bi Mizgîniyê safî kir. ¹¹ Û ez vê Mizgîniyêr'a dannasînkir, şandî û dersdar hatime k'ifşkirinê, ¹² lema aha diçerçirim. Lê şerm nakim, çimkî zanim min bawerîya xwe k'ê anîye û bawer im jî, ku wî çî spartye min, wê heta wê Rojê jî xwey bike. ¹³ Tu xwe li wî nexşê hînkirina silamet bigire, nava wê bawerî û hizkirinêda be, ya ku te ji min bihîst, k'îjan ji Mesîh Îsa gihîşte me. ¹⁴ Wan tiştên qence ku spartine te, bi wî Ruhê Pîrozî nava meda xwey bike.

¹⁵ Tu zanî, ku ewên qeza Asyayêda bûn, pişta xwe minda kirin, t'evî wan Fûgelo û Hêrmoxênîs jî. ¹⁶ Bira Xudan rehma xwe li mala Onîsîforo bike, çimkî ewî gelek caran dilê min rihet kir û benên ez *pê girêdayî me* şerm nedikir, ¹⁷ lê çaxê hate Romayê, ew gelekî li min ger'ya, heta ku ez dîtîm, ¹⁸ (bira Xudan bidê, ku ew wê Rojê rehmê ji Xudan bibîne) û Efesêda jî ewî minr'a çiqas xizmetk'arî kir, tu baş zanî.

MIZGÎNÎYA KU PAWLOS DANNASÎN KIR XWEY BIKIN

2 ¹ Awa lawê min, bi wê k'erema meye ji Mesîh Îsa qewat be. ² Û ew tiştên ku te li ber gelek şehdan ji min bihîst, bispêre wan merivên amin, yên ku wê bikaribin hinekên din hîn bikin. ³ Awa t'evî te'lî-tengîya me be, mîna eskerê Mesîh Îsayî qenc. ⁴ T'u esker k'arê jîyîna vê dinyayêva mijûl nabe, ku li serokesker xaş bê. ⁵ T'u lecker jî wê t'acguliyê nestîne, heger bi qeyde-qanûnî nek'êve lecê. ⁶ Û cotk'arê ku zehmetê dibîne, gerekê pêşda ew ji berê erdê te'm ke. ⁷ Bizanibe ez çî dibêjim, çimkî Xudan wê her tiştîda hiş-aqil bide te.

⁸ Wî Îsa Mesîhê ji bereka Dawid bîr bîne, yê ku ji nava mirîyan hatye zêndîkirinê, li gora wê Mizgîniya ku ez dannasîn dikim. ⁹ Bona vê Mizgîniyê ez diçerçirim, heta mîna zulmk'arekî jî bendkirî me, lê xebera Xwedê ne bendkirî ye. ¹⁰ Lema ez her tiştî sebir dikim, bona xatirê hîlbijartîyan, ku ew jî wê rizgarbûna bi saya Mesîh Îsa bistînin, bi rûmeta heta-ha-têva t'evayî. ¹¹ Û vê gotinêda xêlif t'une: ku «Heger em t'evî wî mirin, emê t'evî wî jî bijîm. ¹² Heger em sebir bikin, emê t'evî wî p'adşatiyê jî bikin. Heger wî înk'ar kin, ewê jî me înk'ar ke. ¹³ Heger em amin nemînin, ewê *k'arê xweda* amin bimîne, çimkî ew nikare xwe înk'ar ke».

HER KESÊ KU NAVÊ XUDAN SER WAN E BIRA JI NEHEQIYÊ DÛR BE

¹⁴ Van tiştan bîne bîra wan, li ber hizûra Xudan şehdetiyê bide wan, ku ewana li ser xeberan hevr'a nek'evine de'wê. Ev kêrî t'u kesî nayê, lê t'enê *bawerîya* guhdaran wêran dike. ¹⁵ Bike ku tu li Xwedê xaş bêyî, bibî k'arkerekî usa, ku şerm nekî, lê xebera rastiyê rast şirovekî. ¹⁶ Lê ji xeberdanên herame p'ûç xwe dûr bigire, çimkî ewên ku xwe dane vê yekê, wê nep'akîyêda hê pêşda her'in ¹⁷ û xeberên wan mîna xiş-xişê p'enc dide. Hûmenayo û Filîto jî ji wan in, ¹⁸ yên ku ji rastiyê xalifî ne û dibêjin, ku zêndîbûna mirîyan îdî bûye û bawerîya hinekan weldiger'înin. ¹⁹ Lê rikinê *ku Xwedê danîye* qedîm dimîne û ev mor ser e: «Xudan yên p'ara xwe nas dike» û «Her kesên ku navê Xudan ser xwe xistine, bira xwe ji neheqiyê dûr bigirin».

²⁰ Maleke mezinda ne t'enê derdanên zêr' û zîv hene, lê yên ji dar û her'îyê jî hene, hinek bona hurmetê ne, hinek jî bona tiştên bêhurmetîyê. ²¹ Awa heger yek xwe ji wan tiştên necayîz paqij ke, ewê bibe derdaneke hurmetê, pîrozîyê û xweyê xwer'a kêrhatî, bona her xizmetîyên qenc hazir kirî.

²² Ji dilhavijîyên cahiltîyê bireve, xwe li rastîyê, bawerîyê, hizkirinê û haştîyê bigire, t'evî wan be, yên ku bi dilê rast gazî navê Xudan dikin. ²³ Tu xwe ji de'w-dozên bêfikire bêfem dûr bigire, çimkî tu zanî ku ji wan tiştan şer' pêşda tên. ²⁴ Lê ne cayîz e, ku xulamê Xudan şer' bike, lê ku hindava hemûyanda berbihêr be, bikaribe hîn bike û bînfîre be, ²⁵ bi şîrinayî yên miqabil şîret ke, ku belkî Xwedê rê bide ber wan, ku ji gunehkirinê vegezin û rastîyê nas bikin. ²⁶ Hingê ewê ser hişê xweda bîn û ji t'ela Şeytan rizgar bin, k'îjanî ew girtine, ku daxaza wî biqedînin.

ROJÊN AXIRÎYÊ Û KITÊBA PÎROZ

3 ¹ Lê vê yekê zanibe, ku rojên axirîyêda zamanên xirab wê bîn. ² Merivê bibine xwehiz, p'erehiz, k'ubar, babax, k'ifir, ne gura dê-bavanda, bêşêkir, heram, ³ dilsar, bêrehm, buxdanbêj, temsist, zulmk'ar, neyarên qencîyê, ⁴ nemam, berzeq, xwer'azî, hêsahiz, ne ku xwedêhiz. ⁵ Rengê xizmetk'arê Xwedê wê wan k'eve, lê zoraya wî wê înk'ar kin. Tu xwe ji yên aha dûr bigire.

⁶ Nava vanda yên usa hene, ku dişûlikine malan, k'ulfetên aqilsivike bin barên gunehanda girtî dikine hêsîr, yên ku bi cûr'e-cûr'e temên xirabva têne birinê. ⁷ Evana her t'im hîn dibin, lê t'u car nikarin rastîyê nas bikin. ⁸ Çawa Yanîs û Yambrîs miqabilî Mûsa bûn, usa jî ev meriv miqabilî rastîyê disekinîn, merivne fikirên xweda welger'yayî ne, bawerîyêda jî bêkêr in. ⁹ Lê wê gelekî pêşda neçin, çimkî bêfemîya wan wê li ber hemûyan aşkere be, çawa ya wan her duyan bû.

¹⁰ Lê te nasîya xwe daye hînkirin, rabûn-rûniştin û nêt-meremên min, bawerî, sebir, hizkirin û bînfîreyîya min û ¹¹ *zanî ku ez hatime zêrandinê û çerçîrîm*. Tu zanî, ku li Entakyayê, Îkonyayê, Lîstrayê çi hatine serê min, ez çawa hatime zêrandinê û min sebir kir! Lê Xudan ez ji wan her tiştan rizgar kirim. ¹² Belê, her k'ê ku dixaze bi Mesîh Îsa nava xizmetk'arîya Xwedêda bijî wê bê zêrandinê ¹³ û merivên xweyfêlên xirab û derewîn wê xirabîyêda pêşda her'in, bixalifînin û bixalifin. ¹⁴ Lê tu, nava wan tiştanda qewîn-qedîm bimîne, çi hîn bûyî û têda bawer bûyî. Tu zanî ji k'ê hîn bûyî, ¹⁵ usa jî tu ji biç'ûktîya xweda nivîsarên pîroz zanî, yên ku dikarin serwaxtîyê bidine te, ku tu bi bawerîya ser Mesîh Îsa rizgar bî. ¹⁶ T'emamîya nivîsara Kitêba Pîroz ji bînaya Xwedê ye û bona hînkirinê, hilatinê, rastkirinê û şîretkirina jîyîna heqîyê kêrhatî ye, ¹⁷ ku merivê Xwedê bêkêmasî be û bona her k'arên qenc hazir sekinî be.

4 ¹ Awa li ber hizûra Xwedê û wî Mesîh Îsayê ku wê bi p'adşatîya xweva bê û hingê dîwana mirî û zêndîyan bike, şehdetîyê didime te, ² Xeberê dannasîn ke, t'imê ser wî k'arê xwe be, hizkî waxt be yan bêwaxt be, li şaşîyan hilê, pêşîya neheqîyê bigire, dil bide merivan, bi t'emamîya sebirê hîn ke. ³ Çimkî zeman wê bê, ku merivê guh nedine hînkirina silamet, lê wê xastinên dilê xwer'a wan dersdaran ser xwe t'op kin, yên ku wê tiştên li guhê wan xaş tên hîn bikin. ⁴ Wê guhê xwe ji rastîyê dager'inin û pey çilovîskan k'evin. ⁵ Lê tu! her tiştîda hişyar bimîne, tengasîyanda sebir ke, k'arê mizgîndar bike, xizmetîya xwe bîne sêrî. ⁶ Çimkî ez xwexa şehîdbûnêr'a îdî ser roj-rojan im û waxtê çûyîna min pêr'a gihîştîye. ⁷ Lecêda ez qenc revîm, min rîya xwe anî sêrî, bawerî xwey kir. ⁸ Û niha minr'a dimîne t'acgulîya rastîyê *bistînim*, ya ku Xudan~ Hakimê rast wê bide min, wê roja *axretêda* û ne t'enê min, lê wan hemûyan jî, yên ku bi hub û rez heyra k'ifşbûna wîda ne.

⁹ Bike ku zû bêyî cem min. ¹⁰ Dîmas dînya hiz kir, ez hiştîm û çû Têsalonîkê. Kireskîs çû Galatyayê, Tîto jî Dalmetyayê. ¹¹ T'enê Lûqa cem min maye. Marqos t'evî xwe hilde bîne, çimkî vê xizmetîyêda ew kêrî min tê. ¹² Tixîko, min şande Efesê. ¹³ Çaxê tu bêyî, wî qap'ûtê ku min Troyayêda cem Karpos hişt t'evî xwe bîne, usa jî kitêbên gulomatîk bîne, hê zêde yên ç'erm.

¹⁴ Skenderê hedad gelek xirabî hindava mînda kir. Xudan wê weke kirên wî bîne pêşîya wî. ¹⁵ Tu jî h'evza xwe ji wî bike, çimkî ew gelekî miqabilî gotina me sekinî.

¹⁶ Cara pêşin, çaxê ez li ber dîwanê sekinîm, t'u kes pişta min nesekinî, hemûyan ez hiştîm çûn. Bira ev yek wanr'a guneh neyê hesabê! ¹⁷ Lê Xudan minr'a ragirt û qewat da min, ku bi min Mizgînîdayîn meyasêr be û hemû hêtanos Mizgînîyê bibihên. Ez ji devê şêr rizgar bûm. ¹⁸ Xudan wê min ji her kirên xirab rizgar ke û bi aminî bigihîne P'adşatîya xwey ezmanan. Şikir wîr'a heta-ha-tê. Amîn.

¹⁹ Silavê bide Priskîlayê û Ekîla, usa jî mala Onîsîforo. ²⁰ Êrasto Korintêda ma, min Trofîmo jî Maltayêda nexaş hişt. ²¹ Bicedîne ku tu berî zivistanê bêyî. Eybûlo, Pûdês, Lînos, Klawdîya û hemû bira te silav dikin. ²² Xudan t'evî ruhê te be. K'erema Xwedê wer'a be.

NAMA PAWLOS TÎTOR'A

PÊŞGOTIN

Tîto hevalk'arekî Pawlosî gelek kêrhatî bû, ew miletîya xweda yûnan bû û jîyîna xweda ne mezin bû, cahil bû. Pawlos ew Kirêtayêda hiştibû, ku serk'arîyê şixulê civînê bike. Û vê namêda hevalk'arê xweyî şîrhelalra bona k'arê xizmetîya wî şîretên usa dinivîse, ku her dem kêrî hemû xulamên Xwedê tê.

Cimeta Kirêtayê gelekî xwe xirabîyê girtibû, rabûn-rûniştina wan ne baş bû, lema Tîto gerekê hê serxwe û hişyar k'arê xwe bikira, ku civîna Xwedêye wir paqij bima.

Namêda hê zêde ev pirsên han têne li ber ç'evan:

- Pawlos Tîtora dinivîse, ku serk'arên civînê gerekê çawa bin.

- T'emîyên bona Tîto, ku ew hînkirina rast bide hemûyan.

- T'emîyên bona rabûn-rûniştina bawermendan.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1:1-4)

Serk'arên civînê û k'arê wan (1:5-16)

Borcê her bawermendî (2:1-15)

Jîyîna bawermendan û silavên axirîyê (3:1-15)

SILAVKIRIN Û K'ARÊ TÎTO KIRÊTAYÊDA

1 ¹ Ji Pawlosê xulamê Xwedê û şandîyê Îsa Mesîh~ hatime gazîkirinê, ku *bi xizmetîya min* hîlbijartîyên Xwedê nava xizmetîya Xwedêda, bawerîyêda û zanebûna rastîyêda pêşda her'in, ² bi gumana wê jîyîna heta-ha-tê, ya ku hê dewrên berêda Xwedêye ku derew nake soz da ³ û waxtda bi dannasîniyê gotina xwe da aşkerekirinê, ya ku bi fermana Xwedêye Rizgarkirê me li min hate spartinê.

⁴ Tîtoyê lawê minî heq-helalr'a, ku bi bawerîya meye t'omerî bona min bû: K'erem û haştî ji Bav Xwedê û Rizgarkirê me Mesîh Îsa.

⁵ Min tu bona wê yekê li Kirêtayêda hiştî, ku çî kêmasî hebin tu t'ije kî û her bajarîda berpirsyanan k'ifş kî, çawa min ev t'emî da te: ⁶ Gerekê berpirsyan bêy lek'e be, mêrê jinekê be, lawên wî amin bin, ku bona ner'êyîyê yan jî neguhdarîyê nek'etine nava gote-gotan. ⁷ Belê, serk'ar çawa wek'îlxercê Xwedê, gerekê bêlek'e be, ne serhişk, ne hêrs, ne pey îçkê k'etî, ne şer'ûd, ne pey k'eda heram k'etî, ⁸ lê mêvanhiz, xêrxaz, aqîlda giran, ser rastîyê, pîroz, xwezefî. ⁹ Û wê gotina amin qewîn û qedîm bigire, çawa hîn bûye, ku bikaribe bi hînkirina silamet dil bide yên mayîn û li yên miqabil bona şaşîyên wan hilê. ¹⁰ Çimkî yên xweserîxwe gelek in, yên xeberp'ûç û derewîn, hê zêde yên ku ji nav sinetîyê ne. ¹¹ Gerekê dengê yên usa bidine bir'inê, çimkî ew malên *merivan* lap xirab dikan, tiştên necayîz hîn dikan û vê yekê bona qazınca xweye heram dikan. ¹² Ji kirêtîyan hema p'êxemberekî wan jî gotye: «Kirêtî t'imê derewîn in, rewirên xirab û p'irxurên bêxîret in». ¹³ Ev şehdetîke rast e, lema sert li wan hilê, ku bawerîyêda silamet bin ¹⁴ û guh nedine çilovîskên cihûyan û t'emîyên wan merivên ji rastîyê dageryayî. ¹⁵ Her tişt bona dilpaqîşan helal e, lê bona heram û nebaweran t'u tişt ne helal e, heta hiş û îsafa wan jî herimî ne. ¹⁶ Ew dibêjin, ku Xwedê nas dikan, lê bi kirên xwe wî înk'ar dikan, heram û xweserîxwe ne û her kirineke qencra bêkêr in.

HÎNKIRINA SILAMET

2 ¹ Lê tu wê hîn bike, çî ji hînkirina silamet e. ² Kalemêr bira haş ji xwe hebin, giran û maqûl bin, bawerîyê, hizkirinê û sebirêda serxwe bin.

³ Pîrejin jî bira usa p'ergal bin, çawa li merivên Xwedê dik'eve, ne buxdanbêj bin, *ne jî* mêla xwe bidine ser îçkê. Lê bira xweyşîretên qenc bin, ⁴ ku jinên cahil hîn kin, ku ew mêrê xwe û lawên xwe hiz bikin, ⁵ aqîlda giran bin, nav-namûs bin, malkir, heyf û gura mêrê xweda bin, ku xebera Xwedê neyê bêhurmetkirinê.

⁶ Usa jî cahilan şîret ke, ku aqîlda giran bin. ⁷ Her tiştîda tu bibe nexşê kirên qenc, nava hînkirinêda bêy durûtî û maqûl be, ⁸ bi xeberên silamete bêkêmasî, ku yê miqabil şermî bimîne û tişteki wîyî gotinê hindava meda nîbe.

⁹ Xulaman şîret ke, ku gura axayên xweda bin û her tiştîda li wan xaş bèn, gilîyan li wan venegerînin, ¹⁰ *ji wan* nedizin, lê t'am aminîya qenc nîşanî wan kin, ku hînkirina bona Rizgarkirê me Xwedê, her alîyanva bixemilînin. ¹¹ Çimkî k'erema Xwedê bona rizgarbûna her merivan k'ifş bû û ¹² me hîn dike, ku em nep'akîyê û dilhaviyîyên dinyayê înk'ar kin û li ser vê dinyayê hişê me serê me, bi rastîyê û xwedênasîyê em bijîn ¹³ û hîvîya wê gumana xwezî bin~ k'ifşbûna rûmeta Xwedêye mezin~ Rizgarkirê me Îsa Mesîh. ¹⁴ Ewî kesa xwe bona me da der, ku me ji hemû neheqîyan aza û paqij ke û bike cimeta xweye helal û xîretk'êşên kirên qenc.

¹⁵ Van tiştan hîn bike, bi t'emamîya destûra ku te standye ber dilê wanda were û li wan hilê. Bira t'u kes te bêhurmet neke.

JÎYÎNA BAWERMENDAN Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

3 ¹ Bîne bîra cimetê, ku gura serok û hikumetan bikin, guhdar bin û bona hemû kirinên qenc hazir sekinî bin. ² T'u kesî bêhurmet nekin, şer'ûd nebin, lê milûk bin û hindava hemû merivanda şîrinayîya xwe

* 1:10,14 Pawlos xebera «sinetîyê», bona cihûyên hingê dibêje.

bidine k'ifşê. ³Çimkî waxtekê em jî bêfem bûn, xwesorîxwe, xalifî û xulamên cûr'e-cûr'e temên xirab bûn û em k'êfa dilê xwer'a bûn, me nava xirabîyê û hevsûdîyêda dijît, em ne hizkirî bûn û me hevdu hiz nedikir. ⁴Lê çaxê şîrinayî û hizkirina Xwedê Rizgarkirê me k'ifş bû, ⁵wî em rizgar kirin. Ne ku bona wan kirinên meye rast, ku me kir, lê li gora rehma xwe em rizgar kirin, em şûştin û nû dinê xistin û em veguhastin, bi *destê* Ruhê Pîroz. ⁶Ku Xwedê bi merdanî ew *Ruh* ser meda barand, bi *destê* Îsa Mesîhê Rizgarkirê me, ⁷ku bi k'erema wî em rast bêne hesabê û bi wê gumanê em jîyîna heta-ha-tê war bin. ⁸Ev gotin bêxêlif e û ez dixazim ku tu van tiştan qedîm kî, ku yê Xwedê bawer dikin, bik'evine xîretê û tiştên qenc bikin. Evana merivanra qenc û qazinc in.

⁹Lê tu xwe ji de'w-dozen bêfikir, hesabê silsiletan, hevr'ikîyê û şer'-de'wên li ser Qanûnê dîr bigire, çimkî ew *tişt* bêkêr û p'ûç in. ¹⁰Ewê ku bêt'ifaqîyê dike, carekê-dudan wî şîret ke û jê dîr k'eve. ¹¹Bizanibe, ku yê usa xalifî û gunehk'ar e, ew xwexa dîwanê ser xweda tîne.

¹²Çaxê Artemas yan Tixîko bişînime cem te, bike ku tu bêyî Nîkopolîsê cem min, çimkî min qirar kir, ku vê zivistanê li wir derbaz kim. ¹³Zênasê qanûnzan û Apolo zû ver'êke, usa bike ku ew rêva kêmasîya t'u tiştî nek'îşînin. ¹⁴Yên ji nava me jî bira hîn bin, pey kirinên qenc her'in, ku kêrî yê hewce bèn û bêber nebin.

¹⁵Hemûyên t'evî min li te silav dikin. Silavê bide wan, yê ku t'evî me li ser bawerîkê ne û me hiz dikin. K'erema Xwedê we hemûyanra be.

NAMA PAWLOS FILÎMONR'A

PÊŞGOTIN

Ev nama Pawlosê şandî hevalekî xweyî navê wî Filîmonra nivîsîye. Filîmon bawermendekî naskirî bû. Ji xulamên wî yekî navê wî Onîsîmo, ji cem wî revî bû û bona kirê xwe gerekê bihata kuştinê. Lê çaxê Pawlos kelêda bû, hingê Onîsîmo rastî wî tê. Ew bi şehdetiya Pawlos li Xwedê vedigere û dibe bawermendê Îsa. Hingê Pawlos bi vê namê hîvî ji Filîmon dike, ku ew bibaxşîne Onîsîmo û wî hilde, ne çawa xulam, lê ji xulam zêdetir, çawa birakî bawermend.

Vê nama kinda bawerî û hizkirina xwedênasane hindava Îsa Mesîhda tê k'îfs, ku t'emîyên wî xwey dikirin û dibaxşînine hevdu.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1-3)

Pawlos ji Filîmon razî ye (4-7)

Hîvîkirina bona Onîsîmoyê û silavên axirîyê (8-25)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ji Pawlosê bona Îsa Mesîh bendkirî û ji Tîmotêyoyê bira, li Filîmonê hevalk'ar û delalê mer'a, ² Afîya xûşkr'a û Arxîpoyê hevaeskerê mer'a û usa jî wê civînêr'a, ya ku mala teda dicive: ³ K'erem û haştî ji Bavê me Xwedê û Xudan Îsa Mesîh.

BAWERÎ Û HIZKIRINA FILÎMON

⁴ Ez her dem ji Xwedêyê xwe razî me, birayê Filîmon, gava nava duayên xweda te bîr tînim, ⁵ çimkî bona wê hizkirina teye hindava hemû pîrozanda û bawerîya teye hindava Xudan Îsada dibihêm. ⁶ Ez dua dikim, ku t'evgirêdana teye mer'a, li bawerîyêda me bigihîne wê zanebûna k'ûr, çî ku bona wan her tiştên qencda ye, yên ku bi Mesîh p'ara me k'etine. ⁷ Bona wê hizkirina dilê teda, birao, ez gelekî şa bûm û dilê min rihet bû, ku dilê pîrozan bi te rihetî dîte.

HÎVÎKIRINA BONA ONÎSÎMOYÊ Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

⁸ Bona vê pirsê, bi Mesîh çawa bira, min dikaribû turuş bikira, ferman bida te, çî ku cayîz bû, ⁹ lê ji dest hizkirinê hîvî dikim. Ez Pawlosê kalemêr û niha jî bona Îsa girtîyê *hebsê*, ¹⁰ bona lawê xwe Onîsîmo hîvî ji te dikim, yê ku bengirêyên minda çawa kur' bona min bû. ¹¹ Ew waxtekê kêrî te nedihat, lê niha him kêrî te, him jî kêrî min tê.

¹² Ez wî li ser teda vedigerînim, ew cegera min e. ¹³ Min dixast ew cem xwe bihişt, ku dewsa te ber destê min bûya, heta ku ezî bona Mizgînîyê bendkirî me. ¹⁴ Lê bêy îzina te min nexast tiştêkî bikim, ku qencîya te ne bi destê zorê be, lê bi rezedilîya te be. ¹⁵ Belkî bona vê yekê ew waxtekê ji te dûr k'et, ku her t'im bibe p'ara te, ¹⁶ lê ne ku çawa xulam, ji xulamêkî jî zêdetir, çawa birakî delal! Heger ew bona min haqas delal e, bona te ewê hê zêde be, him alîyê bedenêda, him jî alîyê Xudanda.

¹⁷ Awa heger tu min çawa hevalê xwe hesab dikî, wî usa qebûl ke, çawa min. ¹⁸ Heger ewî neheqîk jî hindava teda kiribe yan tiştêkî deyndarê te be, wan li ser min hesab ke. ¹⁹ Ez Pawlos bi destê xwe dinivîsim, Ezê li te vegeirînim (ku nebêjime te, tu jî jîyîna xweva deyndarê min î.) ²⁰ Belê, birayê min, bona xatirê Xudan, bira eva qencîya ji te bigihîje min, bide xatirê Mesîh, dilê min rihet ke. ²¹ Ez guhdarîya teda guman bûm, lema min ev *name* ter'a nivîsî, çimkî zanim tuê ji gotina min zêdetir jî bikî.

²² Pêştirî vê yekê, minr'a cîkî mayînê jî hazir ke, çimkî ez guman im, ku Xwedê wê caba duayên we bide~ min paşda bide we.

²³ Êpafrasê bona navê Mesîh Îsa hevalê minî girtîyê hebsê te silav dike, ²⁴ usa jî Marqos, Erîstarxo, Dîmas û Lûqa, hevalk'arên min. ²⁵ K'erema Xudan Îsa Mesîh wer'a be.

NAMA ÎBRANÎYANR'A

PÊŞGOTIN

Navê nivîsk'arê vê namê îro ne k'ifş e, lê gelek zane dibêjin, ku ew bi cûr'ê nivîsara Pawlos e (13:20-25) û ji p'êşkêşa wî ye, çimkî Xwedê ew k'erem Pawlos'a dabû, ku Mizgînî bi hemû alîyanva bi destê wî bê naskirinê û şirovekirinê. (Romîyanr'a 2:16; 15:15,16; 16:25; Galatîyanr'a 1:11,12,15)

Nivîsk'arê vê namê dil dide ber xwedênasan, ku ew nava bawerîya Mizgînîyêda bimînin û hê zelal dike, ku Îsa Mesîh rast heyîntîya Xwedê ye û wek'îltîya Peymana Xwedêye Nû dike, ya ku îdî nayê guhastinê, ev Peyman ya heta-ha-tê ye.

Usa ew li ser van pîrsên rastîyê jî disekine:

Îsa Kur'ê Xwedêyî heta-ha-tê ye, ku guhdarîya xweye hindava Bavêda bi cizaretên xwe da k'ifşê. Û ew ser hemû p'êxemberanr'a û ser hemû milyak'etanr'a ye.

Îsa ji Xwedêda serokk'ahînê rast û heta-ha-tê ye û ser her k'ahînanr'a ye. K'ahînên li gora qanûna Peymana Kevn sûret û şikilê wî bûn (bi sîmvolî bûn). Wî bi carekê bona her t'im bedena xwe kire qurban û îdî qurbanên li gora qanûnê berga tiştêkî negirtin, ew qurbanên ku berî Îsa Mesîh dihatine kirinê, ew şikilê qurbanbûna wî bûn. Meriv t'enê bi destê Îsa dikare ji guneh, tîrsê û mirinê rizgar be.

Usa jî vê namêda tê k'ifşê, ku xebera Xwedêye sond pêr'a ser her xeberanr'a ye.

SERECEMA NAMÊ

Aşkerebûna Xwedêye t'am Mesîh e (1:1-3)

Mesîh Îsa ser milyak'etanr'a ye (1:4-2:18)

Mesîh Îsa ser Mûsa û Yêşûr'a ye (3:1-4:13)

K'ahîntîya Mesîh Îsa ser her k'ahîntîyêr'a ye (4:14-7:28)

Peymana Mesîh ser her peymananr'a ye (8:1-9:28)

Mesîh Îsa qurbana ser qurbananr'a ye (10:1-39)

Bawerî, jîyîna xwedênasîyê û silavên axirîyê (11:1-13:25)

XWEDÊ BI KUR'Ê XWE XEBER DA Û KUR' JI MILYAK'ETAN MESTIR E

1 ¹ Xwedê gelek caran û bi gelek cûreyan pêşda kal-bavên mer'a bi p'êxemberan xeber daye, ² lê van rojên axirîyêda bi Kur' mer'a xeber da, k'îjanîr'a wî *destûr* da ku bibe warxurê her tiştî, bi k'îjanî erd-ezman jî efirandye. ³ Ew ronahîya rûmeta Xwedê ye, hema nîgara heyîntîya wî, ku bi xebera xweye zor her tiştî qewînd-qedîm xwey dike. Û çaxê wî bona şuştina gunehên merivan *îdî* hazirî dît, li jor alîyê Mezinayîye rastê rûnişt.

⁴ Kur' haqasî ser milyak'etanr'a seranser derk'et, çiqasî ew navê ku wî stand seranser ser navên wanr'a ye. ⁵ Çimkî Xwedê t'u milyak'etîr'a aha negotye: «Tu kur'ê min î û îro bona min bûyî» û dîsa *dibêje*: «Ezê bibim bavê wî, ewê jî bibe Kur'ê min».* ⁶ Û çaxê Xwedê nixurîyê xwe dişîne dinyayê, dîsa dibêje: «Bira hemû milyak'etên Xwedê wî bihebînin». ⁷ Lê bona milyak'etan aha dibêje: «Ew milyak'etên xwe dike ba û berdestîyên xwe *jî* alava êgir».† ⁸ Lê bona Kur' dibêje: «T'extê te, ya Xwedê, t'extê heta-ha-tê ye, kewazê p'adşatîya te kewazê rastîyê ye. ⁹ Te heqî hiz kir, neheqî jî ber xwe avît, lema Xwedê~ Xwedêyê te ji hevalên te zêdetir tu bi rûnê şabûnê gulrûn kirî».‡ ¹⁰ Û aha jî dibêje: «Ya Xudan, te pêşîyê rikinê dinyayê avît û ezman k'arê destên te ne. ¹¹ Ewê wêran bin her'in, lê tuê bimînî, hemû wê mîna cilan bip'izinin. ¹² Tuê wan mîna qap'ût li hev bip'êçî, mîna k'incan ewê bêne guhastinê, lê tu dîsa ew î û salên te wê kê mîna nebin».§ ¹³ Gelo k'îjan milyak'etîr'a Xwedê gotye: «Li alîyê minî rastê rûnê, heta ku ez dijminên te bikime binê p'îyên te?»** ¹⁴ Îdî milyak'et k'î ne? Ew hemû jî ruhên berdestî ne, ku bona xizmetk'arîya wan *merivan* têne şandinê, yên ku wê rizgarbûnê war bin.

GUH BIDINE XEBERA RIZGARÎYÊ

2 ¹ Bona vê yekê gerekê em hê zêde guh bidine wan tiştên me bihîstine, ku em ji wana nexalifin. ² Çimkî heger ew xebera bi destên milyak'etan hate gotinê qedîm ma û hemû neheqîyê û neêlimîyê maşê xwe rast standin, ³ lê emê çawa xwe aza kin, heger guh nedine wê rizgarbûna mezin, ya ku pêşda Xudan dannasîn kir û yên ku dengê wî bihîstin, meva eseyî kirin? ⁴ Serda jî Xwedê bi nîşanan, k'îryametan, cûr'e-cûr'e kirên qewat û p'êşkêşên Ruhê Pîroze belakirî şehdetî da, çawa ku daxaza wî bû.

K'Ê ME BERBI RIZGARBÛNÊ DIBE?

⁵ Xwedê ne ku milyak'et kirine serokên wê dinya ku wê bê, li ser k'îjanê em xeber didin. ⁶ Lê cîkî şehdetîyê dide û dibêje: «Ya Xwedê, meriv çi ye, ku wî bîr tînî yan kur'ê mêriv, ku bona wî xem dikî? ⁷ Te hinek waxt ew ji milyak'etan nimiztir kir, *lê* bi rûmet û hurmet t'acgulî *serê* wî kir û ⁸ her tişt kirine binê nigên wî».††

Awa yê her tişt kirine binê nigên wî, t'u tişt nehişt, ku nekiribe binê nigan. Lê niha em hê her tiştî binê niganda nabînin. ⁹ Lê niha em Îsa bi rûmet û hurmet t'acgulîyê sêrî dibînin, ewî ku hinek waxt ji milyak'etan hatibû nimizkirinê, ku biçerçîrya û bimira, bi k'erema Xwedê bona hemûyan te'ma mirinê jî bidîta. ¹⁰ Belê, hêja bû ku Xwedê, yê ku her tişt bona xwe efirandye û bi destê xwe xwey dike, Rêberê rizgarbûna merivan bi çerçîrandinê

* 1:5 Zebûr 2:7; 2 P' adşatî 7:14.

† 1:6,7 Zebûr 97:7; Zebûr 104:4.

‡ 1:9 Zebûr 45:6,7.

§ 1:12 Zebûr 102:25-27.

** 1:13 Zebûr 110:1.

†† 2:8 Zebûr 8:4-6.

k'amil bikira, ku gelek law t'evî rûmeta Îsa bikirana. ¹¹ Ewê ku pîroz dike û ewên ku pîroz dibin, ev hemû jî ji Xwedêkî ne. Lema ew vê yekêda şermîyê nabîne, ku wan birayên xwe hesab bike, ¹² ku dibêje: «Bona navê te ezê birayên xwer'a bêjim, civînêda ezê pesinê te bidim». ¹³ Aha jî dibêje: «Ezê gumana xwe bidime ser Xwedê». Û aha jî: «Va me ez û ew lawên ku Xwedê dane min».*

¹⁴ Çawa ku t'evgirêdana lawan xûn û goştra bû, Îsa xwexa jî t'evî wan bû xweyp'arê *binyata* wan, ku aha bi mirina xwe, wî unda ke, yê ku hikumê wî li ser mirinê hebû, awa gotî Şeytan ¹⁵ û yên ku t'emamîya jîyîna xweda hêsîrên tîrsa mirinê bûne wan rizgar bike. ¹⁶ Femdarî ye, ku ew alîk'arîya milyak'etan nake, lê alîk'arîya zuretê Îbrahîm. ¹⁷ Lema jî bi her alîyanva gerekê Îsa bibûya mîna wan biran, ku bibûya serokk'ahînekî rehm û amin li *xizmetk'arîya* ber Xwedêda, ku gunehên cimê bida k'ewandinê.† ¹⁸ Û çawa ew çerçirî û hate cêribandinê, usa jî dikare alîk'arîya wan bike, yên ku dik'evine nava cêribandinê.

ÎSA SER MÛSARA YE

3 ¹ Awa birayên pîroz, hûn ku hevalp'arên wê gazîya ezmên in, Mesîh Îsa binihêrin, wî şandî û serokk'ahînekî ku em îqrar dikin. ² Yê ku hindava Xwedêda amin e, yê ku ew k'ifş kir, mîna Mûsa, ku hemû *k'arê* mala wîda *amin bû*. ³ Îsa haqasî ji Mûsa zêdetir hêjayî rûmetê bû, çiqasî yê malê çê dike hurmeta wî ji hurmeta malê zêdetir e. ⁴ (Femdarî ye, her malek bi destê yekî tê çêkirinê, lê yê her tişt efirandye, Xwedê ye.) ⁵ Rast e, Mûsa hemû *k'arê* mala wîda xulamekî amin bû, ku şehdetîya wan gotinên Xwedê bida. ⁶ Lê Mesîh çawa kur' hindava mala Xwedêda amin bû. Û ew mala wî em in, lê t'enê em wê egîfîyê û gumana ku em bi wê difir'in qewîn bigirin.

BONA CIMETA XWEDÊ RIHETÎK XWEYKIRÎ YE

⁷ Îdî çawa Ruhê Pîroz dibêje: «Îro ku hûn dengê wî bibihên, ⁸ mîna kal-bavên xwe serhişkîyê nekin, çawa li dema raberîbûnê, çaxê ber'iyêda hatine cêribandinê, ⁹ wê dera ku kal-bavên we ez cêribandim, hizkî t'emamîya çil salî kirinên min dîtî jî û haş ji min hebûn. ¹⁰ Lema hîlê min ji wî nisilî çû û min got: <Dilda ew t'imê xalifî ne û rîya min nas nekirine>. ¹¹ Awa min jî ji hêrsa sond xwar got: <T'u car ewê nek'evine rihetîya min>!»‡

¹² Miqatî xwe bin, birano, nebe ku nava we yekîda dilekî xirab û nebawer hebe, ku pişta xwe Xwedêyê zêndîda ke. ¹³ Lê her roj qewatê bidine hevdu, heta ku nivîsarêda bona me «îro» heye, ku ji we t'u kes bi gunehan nexape, nebe serhişk. ¹⁴ Çimkî em t'evî Mesîh bûne xweyp'ar, lê t'enê em wê *bawerîya* pêşda qedîmbûyî heta xilazîyê qewîn bigirin. ¹⁵ Awa çawa jor hate gotinê: «Îro heger hûn dengê wî bibihên, serhişk nebin, çawa li dema raberîbûnêda».

¹⁶ Belê, hinekan bihîstin û rabûne ber *Xwedê*? Gelo ewana ne ew hemû bûn, ku bi destê Mûsa ji Misirê derk'etibûn? ¹⁷ Çil salî hîlê Xwedê ji k'ê çû? Ê ne ji wan çû, yên ku guneh kirin û cinyazên wan ber'iyêda man? ¹⁸ Û Xwedê bona k'ê sond xwar ku nek'evine rihetîya wî, ê ne bona neêliman? ¹⁹ Belê, evana ji dest nebawerîya xwe nikaribûn bik'etanê.

4 ¹ Awa çimkî ew sozê bona k'etina nava rihetîya wî hê dimîne, lema gerekê em miqatî xwe bin, ku t'u kesî ji we ji wê rihetîyê nemîne. ² Çimkî mer'a jî ew Mizgînî hate dayînê, çawa wanr'a. Lê Mizgînîya ku wan bihîst qazinc neda wan, çimkî bi bawerîyê hilnedan. ³ Lê em, ku bawer dikin, emê bik'evine wê rihetîyê. Çawa li jor hate gotinê: «Awa min ji hêrsa sond xwar got: <T'u car ewê nek'evine rihetîya min>!» Lê ewê ku eva yeka got, k'arên wî ji dema efirandina dinyayêda xilaz bibûn. ⁴ Cîkî bona roja heftan aha hatye gotinê: «Û Xwedê roja heftan ji hemû k'arên xwe rihet bû». ⁵ Û ji vir *şûnda* dîsa dibêje: «T'u car ewê nek'evine rihetîya min». ⁶ Awa hinek wê bik'evine wê rihetîyê, lê ewên ku pêşda mizgînî bihîstibûn ji dest nebawerîyê nek'etinê. ⁷ Bona vê yekê, pey gelek waxtanr'a Xwedê rojêke din k'ifş dike û dibêje «îro», çawa bi zarê Dawid li jorê hate gotinê: «Îro heger hûn dengê wî bibihên, serhişkîyê nekin».

⁸ Heger Yêşû ew gîhandibûna rihetîyê, wê îdî Xwedê pey wê yekêr'a bona rojêke din xeber neda. ⁹ Awa bona cimeta Xwedê mîna roja şemîyê hê rojêke rihetîyê heye. ¹⁰ Belê, k'ê dik'eve rihetîya Xwedê, ew îdî ji k'arên xwe rihet dibe, çawa Xwedê jî ji k'arên xwe. ¹¹ Awa em bicedînî, ku bik'evine wê rihetîyê, ku t'u kes mîna nebawerîya merivên jorgotî neke û nek'eve roja wan.

¹² Xebera Xwedê zêndî ye û zor e û ji her şûrê dudevî bir'atir e, ku derbazî heta navbera ruh û can, hestû û mejû dibe û nêt û fikirên dilan jî vedinihêre. ¹³ Û t'u efirîn ji wî ne veşartî ye, lê her tişt li ber ç'evê wî vekirî û aşkere ye, li ber k'îjanî emê hesabê xwe bidin.

ÎSA SEROKK'AHÎNÊ SER HEMÛYANR'A YE

¹⁴ Awa serokk'ahînekî meyî mezin û ezmananra derbazbûyî heye~ Îsayê Kur'ê Xwedê, de *nîha* bikin, ku em wê bawerîya ku îqrar dikin qewîn bigirin. ¹⁵ Serokk'ahînekî meyî usa t'une, ku tengasîyên meda nikaribe bik'eve halê me û alî me bike, lê ew ji her alîyanva cêribandî ye, mîna me, lê t'enê bêguneh. ¹⁶ De îdî em bêtîrs nêzikî t'extê Xwedêyî k'eremê bin, ku rehmê bistînin û k'eremê bibînin, ku çaxê em hewce bin, ew alîk'arîya me bike.

* 2:12,13 Zebûr 22:22; Îşaya 8:17,18.

† 2:17 Bi gotineke din: «Afûkirinê»

‡ 3:11 Zebûr 95:7-11. Derk'etîn 17:1-7; Hejmartin 20:1-13.

§ 4:4 Destpêbûn 2:2.

5¹ Her serokk'ahînek ji nav merivan tê hilbijartinê û k'ifşkirinê, ku bona wan li ber Xwedê bisekine, ku hedî û qurbanan ber gunehên wanva bide. ² Ew çawa meriv dikare bi dilê şewat alîk'arîya wan merivan bike, yên ku nezan û xalîfî ne. ³ Çimkî ew xwexa jî kêmasîyanda ye, lema çawa bona cimetê, usa jî bona xwe gerekê qurbanan guneh afûbûnêra bide. ⁴ T'u kes xweserîxwe vê hurmetê nastîne, lê t'enê ewê ku ji Xwedêda tê gazîkirinê, çawa Harûn bû. ⁵ Usa jî Mesîh, ne ku ewî xwe bilind kir ku bibe serokk'ahîn, lê Xwedê ew bilind kir û gote wî: «Tu kur'ê min î û îro bona min bûyî». ⁶ Çawa cîkî din jî dibêje: «Tu heta-ha-tê k'ahîn î, bi cûrê Melkî-Sadiq».*

⁷ Îsa li nav rojên *jîyîna* xweye bedenîda gelekî bi k'eser û hêsiran ji wî lava û reca dikirin, yê ku dikaribû ew ji mirinê rizgar bikira û bona milûkî û êlimiya xwe hate bihîstinê. ⁸ Rast e, ew Kur'ê Xwedê bû, lê dîsa bi wan te'lî-tengîyên xwe hînî guhdarîyê bû. ⁹ Ê çaxê wê yekêda hate k'amilkirinê, bona hemûyên ku guhdarîya wî dikin, ew bû rîya rizgarbûna heta-ha-tê ¹⁰ û Xwedê ev nav li wî kir «Serokk'ahînek bi cûrê Melkî-Sadiq».

BAWERÎYÊDA HÊ PÊŞDA HER'IN

¹¹ Derheqa vê yekêda gelek tiştên meyî gotinê hene, lê şirovekirina van zehmet e, çimkî bihîstinêda guhên we giran bûne. ¹² Bi rastî, heta niha gerekê hûn dersdar bûna, lê hê hewce ye ku hûn ji gotinên Xwedê dersên pêşine sade hîn bin. Hûn hela hê hewcê şîr in, ne ku xwarina giran. ¹³ Yê şîrxur e, ew nikare hînkirina rastîyê bimehîne, çimkî dergûş e. ¹⁴ Lê xwarina giran bona merivên gihîştî ye, yên ku bi hînbûnê hesînên xweda cêribandî ne~ qencî û xirabîyê ji hev derdixin.

HÎN BIN Û SOZÊ XWEDÊYE NAS BIKIN

6¹ Awa em li ser Mesîh hînbûnên pêşin bihêline alîkî û bêne ser hînbûna gihîştî. Em dîsa rîkinê van *hînkirinan* nevêjin~ bona vegera ji kirinên berbi mirinê, Xwedê-bawerkirinê, ² hînbûna li ser nixamtinan, destdanînek, zêndîbûna mirîyan û dîwana heta-ha-tê. ³ Lê emê bi destûra Xwedê li hînbûna gihîştîda pêşda her'in! ⁴ Çimkî îdî bêmecal e, ku yên carekê hatine ronahîkirinê, p'êşkêşa ezmên te'm kirine û Ruhê Pîrozva t'evgirêdayî bûne, ⁵ usa jî te'ma xebera Xwedêye qenc û qewatên dinê axretê hildane, ⁶ heger ew ji wê bawerîyê bik'evin, îdî nabe ku dîsa ew bikaribin vegezin, çimkî ewana careke din Kur'ê Xwedê nava xweda xaç dikin û dikine sosret.

⁷ Ew erdê ku gelek caran serda dibare, ava xwe distîne û qazınca deremetan dide wan, bona k'îjanan tê bêcerkirinê, dua-dirozge Xwedê tê ser wê. ⁸ Lê erdê ku gongil û stirîyan digihîne, ew bêkêr e û hêjayî nîfirê ye, axirîya wî jî şewtandin e. ⁹ Lê çî ji me dik'eve, delalîyên me, em weda bawer in, ku hûn ser rêke hê qenc in, ku we dibe berbi rizgarbûnê. ¹⁰ Xwedê ne neheq e, ku kirên we û ew hizkirina ku we bona navê wî da k'ifşê bîr bike, ya ku we pîrozanzî xizmetî kir û dikin jî. ¹¹ Lê em dixazin, ku ji we her kes wê xîretê heta axirîyê bide k'ifşê, ku gumana we qewîn-qedîm bimîne. ¹² Em naxazin, ku hûn xweranedîtî bin, lê ç'ev bidine ewên ku bi bawerîyê û sebirê sozên Xwedê war dibûn.

¹³ Çaxê Xwedê soz da Îbrahîm, çimkî kesekî ji wî mestir t'unebû, ku bi wî sond bixwara, xwexa bi kesa xwe sond xwar, ¹⁴ got: «Belê, ezê ha dua-dirozgan li te bikim û zuretê te pîr' zêde kim». ¹⁵ Û aha Îbrahîm bi sebira dirêj gihîşte sozê Xwedê. ¹⁶ Belê, meriv bi ji yê xwe mestir sond dixwin û hemû şer'-de'wê nava wanda sond safî dike. ¹⁷ Bi sondxwarinê Xwedê xast wanr'a, yên ku warxurên sozê wî ne, hê bida k'ifşê, ku qîrara wî nayê guhastinê. ¹⁸ Û bi du tiştan~ bi soz û sondê Xwedêye ku nayê guhastinê, berdilîke meye eseyî heye, ku t'u car nabe, ku Xwedê wanda derew derê û em jî wanda sit'ar bûne, lema em dikarin xwe bavêjine wê gumana pêşîya xwe. ¹⁹ Û ev guman bona jîyîna me lengereke qedîm û amin e, ku p'erda *pîrozxana* ezmênr'a derbazî hindur dibe, awa gotî diçe Cîyê Herî Pîroz, ²⁰ wê dera ku Îsa bona me çawa pêşîk'êş k'etyê. Ew bûye serokk'ahînek heta-ha-têyî bi cûrê Melkî-Sadiq.

MELKÎ-SADIQ

7¹ Melkî-Sadiq[‡] p'adşayê Şelîmê bû, k'ahînek Xwedêyê Herî Jor. Çaxê Îbrahîm ji qir'kirina p'adşayan vedigerya, Melkî-Sadiq pêşîya wîda çû û dua-dirozge li wî kir. ² Îbrahîm jî ji hemû t'alanê xwe dehek da wî. (Pêşîyê navê Melkî-Sadiq şirovedibe: «P'adşê Rastîyê» û alîkî dinva jî ew «P'adşê Şelîmê»[§] bû, awa gotî navê wî wî tê femkirinê «P'adşayê haştîyê».) ³ Ew bêy bav, bêy dê û bêy malbet bû, ne roja bûyîna wî k'ifş bû, ne jî xilazîya jîyîna wî. Ew mîna Kur'ê Xwedê bû û t'imê k'ahîn dimîne.

⁴ Awa binihêrin, ku ew yekî çawayî mezin bû, ku Îbrahîmê bavpêş jî ji t'alan dehek da wî. ⁵ Û zuretên Lêwî, ku dibine k'ahîn, bona wan Qanûnêda t'emî heye, ku ji cimetê dehekê bistînin~ ji birayên xwe, hizkî ew ji bedena Îbrahîm in jî. ⁶ Lê Melkî-Sadiq ne ji malbeta Lêwî bû, ewî jî Îbrahîm jî dehek stand û dua-dirozge li wî kir, yê ku ku ji Xwedê soz standibû. ⁷ Eva yeka femdarî ye, ku yê biç'ûk ji yê mezin dua-dirozgan distîne. ⁸ Vê k'ahîntîya *Lêwîda*, merivên elê mirinê dehekê distînin, lê vir (k'ahîntîya *Melkî-Sadiqda*), yê dehekê distîne bona wî nivîsar

* 5:5,6 Zebûr 2:7; 110:4.

† 6:14 Destpêbûn 22:16,17.

‡ 7:1 Destpêbûn 14:17-20.

§ 7:2 «Şelîm» bi îbranî «haştî.» Şelîm xwexa navê bajarê Orşelîmêyî kevn e.

** 7:5 Hejmartin 18:21.

dibêje, ew zêndî ye. ⁹ Û em dikarin vê yekê jî bêjin: Lêwîyê ku zuretê wî dehekê hildide, wî xwexa jî bi destê Îbrahîm dehek da Melkî-Sadiq. ¹⁰ Çimkî ew hê navdilê bavê xweda bû, çaxê Melkî-Sadiq pêşîya wîda çû.

ÎSA SEROKK' AHÎNÊ HETA-HA-TÊ

¹¹ Awa heger k'amilbûn bi destê k'ahîntîya lêwîyan bûya, (çimkî cimeta *Îsraêlê* ser wî bingehî qanûna *k'ahîntîyê* standibû), îdî çi lazim bû, ku k'ahînekî din rabûya, bi cûrê Melkî-Sadiq û ne ku bi cûrê Harûn? ¹² Belê, çaxê k'ahîntî tê guhastinê, gerekê qanûna *k'ahîntîyê* jî bê guhastinê. ¹³ Û bona k'îjanî ev yek tê gotinê, ew ji qebîleke din bû, ji k'îjanê t'u kesî qurbangehêra xizmetk'arî nekiryê. ¹⁴ Û çawa k'ifş e, Xudanê me ji qebîla Cihûda bû û Mûsa derheqa k'ahîntîya wê qebîlêda t'u tişt negotye. ¹⁵ Û hê zêde ev yek k'ifş e, ku k'ahînekî dinî bi cûrê Melkî-Sadiq radibe, ¹⁶ yê ne ku li gora t'emîyê ji bedenê bû k'ahîn, lê bi qewata jîyîna bêxilazî. ¹⁷ Çimkî şehdetîya vê yekê *nivîsar* dide ku: «Tu heta-ha-tê k'ahîn î, bi cûrê Melkî-Sadiq». ¹⁸ Awa t'emîya pêşda gotî ji dest sistî û bêkêrîya xwe hêç bû, ¹⁹ çimkî qanûnê t'u tişt k'amil nekîr, lê dewsa wê gumanê hê qenc k'ete navê, bi k'îjanê em nêzîkî Xwedê dibin.

²⁰ Serda jî Îsa bêy sond nebû k'ahîn! Ewên din bêy sond bûne k'ahîn, ²¹ lê ev bi sond, bi destê wî *Xwedêyî*, yê ku gote wî: «Xudan sond xwar û wê ji gotina xwe p'oşman nebe: Tu heta-ha-tê k'ahîn î». ²² Awa Îsa wek'iltîyê peymanê hê qenc dîke.

²³ Ji *lêwîyan* gelek k'ahîn hebûne, çimkî mirinê nehiştîye ku ew t'imê bimana. ²⁴ Lê k'ahîntîya Îsa xilaz nabe, çimkî ew heta-ha-tê dimîne. ²⁵ Bona vê yekê ew dikare her dem wan rizgar ke, yên ku bi destê wî nêzîkî Xwedê dibin, çimkî ew t'imê zêndî ye, ku bona wan qencbêjîyê bike.

²⁶ Awa bona me hema rast serokk'ahînekî aha lazim bû, pîroz, bêşûc, bêqusûr, ji gunehk'aran cudebûyî û ji ezmanan jortir çûyî. ²⁷ Û Îsar'a ne lazim e, ku ew her roj mîna serokk'ahînen mayîn pêşîyê bona gunehên xwe û paşê bona gunehên cimê qurbanan bide. Lê ewî eva yeka carekê bona her demî kir, gava xwe kire qurban. ²⁸ Qanûn merivên bêtaqetîyêva girtî dîke serokk'ahîn, lê sondê Xwedê, ku pey Qanûnê'a hat, Kur' dîke serokk'ahîn, yê ku heta-ha-tê hate k'amilkirinê.

ÎSA SEROKK' AHÎNÊ MEYÎ MEZIN E

8 ¹ Fikira wan tiştên me pêşda gotin ev e~ Serokk'ahînekî meyî usa heye, ku li ezmanan ser t'extê Mezinayê, alîyê rastê rûniştîye. ² Ew çawa serokk'ahîn pîrozxanêda xizmetîyê dîke, awa gotî konê rastda, yê ku Xudan vegirt, ne ku merivan.

³ Her serokk'ahînek bona dayîna qurban û hedîyan k'ifşkirî ye, awa gerekê tiştêkî Îsa jî hebûya, ku bida. ⁴ Heger ew li ser dinyayê bûya, wê qet nebûya k'ahîn jî, çimkî k'ahîn hene, ku anegorî Qanûnê hedîyan didin. ⁵ Evana mîna sî û t'ertzê wan tiştên ezmanî xizmetîya xwe dikin, çawa Mûsar'a hate fermankirinê. Çaxê wî Konê Şehdetîyê wê vegirta, wîr'a aha hate gotinê: «Binihêre! Her tiştî bi wî şikilî bikî, çawa ku min li ser ç'îyê nîşanî te kir». ⁶ Lê niha Îsa gihîşte xizmetk'arîke hê bilind û seranser, mîna wê wek'iltîya ku ew dîke, *wek'iltîya* ku bi sozên here qenc peymanê here qenc qedîm bûye.

⁷ Heger peymana pêşin bêkêmasî bûya, îdî ya dudan wê hewce nebûya. ⁸ Lê Xwedê cimê neheq dîke û dibêje: «Va roj wê bîn, Xudan dibêje, ezê mala Îsraêl û mala Cihûdar'a peymanê nû girêdim, ⁹ lê ne mîna wê peymana ku min t'evî kal-bavên wan girêda, wê roja ku min ji destê wan girt, ku ji Misirê derxim. Ewana nava peymana minda neman, min jî dest ji wan k'işand, Xudan dibêje. ¹⁰ Lê ev e ew peymana ku ezê t'evî mala Îsraêl qedîm kim, pey wan rojan'a, Xudan dibêje: Ezê qanûnên xwe bikime hişê wan û dilê wanda jî wan binivîsim û ezê bibime Xwedêyê wan, ewê jî bibine cimeta min. ¹¹ Hingê t'u kesê hevalê xwe yan birayê xwe hîn neke nebêjê: <Xudan nas bike>, çimkî ji biç'ûkên wan girtî heta mezinan her kesê jî min nas bikin. ¹² Ezê neheqîyên wan bibaxşînim û gunehên wan jî îdî bîr neynim». ¹³ Xwedê ku bona peymanê «nû» got, ya pêşin kevn kir û çi ku kevn û pîr dibe, ber undabûnê ye.

HEBANDINA LI EZMÊN Ê SER DINYAYÊ

9 ¹ Rast, bona hebandina peymana pêşin qîrar jî hebûn, pîrozxan jî *hebû*, li ser dinyayê. ² Kon bi du gozan vegirtî bû: Ya pêşîyê'a digotin «pîrozxan», têda hebûn şemdan, sifre û nanê Xwedê'a dayî. ³ Lê ya hindure pişt p'erdê'a digotin «Cîyê Herî Pîroz». ⁴ Têda bûn t'extbixûra zêr'în, Sindoqa Peymanê, ya ku der û hindurva zêr'kirî bû. Wê sindoqêda hebûn cêr'ê zêr'în, bi manava t'îjî, kewazê Harûne ku gul da û selên peymanêye kevirî. ⁵ Ser sindoqê, xêrûbên rûmeta Xudan hebûn û ser cîyê ku guneh dîhatine baxşandinê, dikirine sî. Niha ne waxt e em bona wan hûr-gilî bêjin. ⁶ Ev tişt aha cîkirî bûn û k'ahîn jî her dem dik'etine goza pêşîyê û xizmetk'arîya xwe dikirin. ⁷ Lê ya hindur salê carekê t'enê serokk'ahîn dik'etê, lê ne bêy xûn, ku ji ber gunehên xwe û cimêta dida, k'îjan ku ji nezaniya xwe dikirin. ⁸ Bi vê yekê Ruhê Pîroz dide k'ifşê, ku rîya Cîyê Herî Pîroz ne vekirî ye, heta ku goza pêşîyê heye. ⁹ Eva yeka şikilek e, bona zemanê niha û dide k'ifşê, ku hedî û qurban tene dayîne nikarin îsafa wan paqij bikin, yên ku vê xizmetîyê tînin, ¹⁰ lê t'enê xwarin-vexwarin û cûr'e-cûr'e nîşangehên

* 8:5 Derk'etin 25:40.

† 8:12 Yêremîya 31:31-34.

‡ 9:7 Qanûna K'ahîntîyê 16.

şuştin-veşuştinêva girêdayî ne. Ev qeyde-qanûnên rûva ne û heta wî waxtê danîna qanûna nû dimînin.

¹¹ Lê çaxê Mesîh, çawa serokk' ahîne tiştên qence ku wê bên hat, goza hê mezin, k'amil û ne bi destan çêkirîr'a derbaz bû, awa gotî ne ji efirînên vê dinyayê ye. ¹² Ew ne ku bi xûna canegan û nêriyan, lê bi xûna xwe carekê bona her dem k'ete Cîyê Herî Pîroz û azabûna heta-ha-tê dest anî. ¹³ Heger bi reşandina xûna canegan, nêriyan û k'oziya noginan, ku yên li gora qirarê herimî rûva qalibê wan paqij dikirin, ¹⁴ îdî çiqas zêde xûna Mesîh, ku bi destê Ruhê heta-ha-tê xwe çawa qurbana bêqusûr da Xwedê, wê îsafa me ji kirinên ku em dibirine berbi mirinê paqij bike, ku em Xwedêyê zêndîr'a xizmetiyê bikin?

¹⁵ Mesîh bona vê yekê wek'iltîya peymanî nû dike, ku yên gazîkirî wî warê heta-ha-tê bistînin, ya ku Xwedê soz daye, çimkî mirina wî bona azayîya ji neheqiyên wan bû, neheqiyên ku li dema peymanî pêşînda kiribûn.

¹⁶ Awa li k'u warhebûk peymankirî ye, li wir eseyî gerekê warhebûkdar mirî be. ¹⁷ Çimkî warhebûk pey mirina warhebûkdarr'a qedîm dibe. Belê, ew hê ne bi qanûnî ye, heta ku warhebûkdar zêndî ye. ¹⁸ Lema peymanî pêşî jî bêy xûn nehate qedîmkirinê. ¹⁹ Çaxê Mûsa hemû t'emiyên Qanûnê gotine cimetê, hingê xûna canegan û nêriyan hilda t'evî avê kir, risê sorê gevez çiqilê zoxêva kir û bi wê xûn reşande ser kitêba Qanûnê û cimetê û ²⁰ got: «Ev e xûna wê peymanî ku Xwedê t'emî da we».* ²¹ Usa jî wî ew xûn reşande ser kon û hemû derdanên bona hebandinê. ²² Belê, angorî Qanûnê p'iranîya her tiştî bi xûnê paqij dibû û bêy xûnr'êtinê baxşandin nedibû.

MESÎH BI XWEQURBANKIRINÊ GUNEHAN HILDIDE

²³ Awa heger şikilên tiştên ezmanan wê bi van kirinan paqij bûna, yên ezmanan jî hema gerekê bi qurbanên ji van çêtir paqij bûna. ²⁴ Çimkî Mesîh ne ku k'ete pîrozxana bi destan çêkirî, ya ku şikilê ya rast e, lê hema k'ete ezmên, ku bona me niha li ber Xwedê bisekine. ²⁵ Ne jî ew dik'ete goza *dudan*, ku gelek caran xwe bikira qurban, çawa ku serokk' ahîn her sal ne bi xûna xwe dik'evê. ²⁶ Heger aha bûya, ew gerekê gelek caran pey efirandina dinyayêra biçerçirya. Lê niha axirîya dewrananda ewî xwe da k'ifşê û carekê bona her t'im bi xwequrbankirinê guneh hildan. ²⁷ Û çawa bona merivan qirarkirî ye: carekê bimirin û paşê li ber dîwanê bisekinin, ²⁸ usa jî Mesîh carekê bona gunehhildana gelek qurban hate dayînê. Û ewê cara *dudan* ne ku bona gunehhildanê k'ifş be, lê bona rizgarbûna wan, yên ku hîvîya wî ne.

XWEQURBANKIRINA MESÎH SER QURBANÊN QANÛNÊRA YE

10 ¹ Qanûn sîya wan tiştên qenc e, yên ku tên, lê ne hema heyîntîya wan yekan e. Lema *Qanûn* bi wan qurbanên yek-cûrê, ku her sal pey hev bînavbir'î tene dayînê nikare wan k'amil bike, yên ku bi qurbanîyê nêzikî Xwedê dibin. ² Heger ew paqij bibûna, wê dest ji qurbanîyê bik'işandana, çimkî bi carekêva yên qurbanê didin wê bihatana paqijkirinê û ji wê şûnda bona gunehan îsafa wan wê li wan nehilata. ³ Lê ew qurban her sal gunehên wan tînine bîra wan. ⁴ Çimkî xûna canegan û nêriyan t'u car nikare gunehan ret ke. ⁵ Lema jî, çaxê Mesîh wê bihata vê dinyayê, got: «Te qurban û hedî nexwastin, lê bona min qalibek hazir kir. ⁶ Qurbanên şewatê û qurbanên bona gunehan li te xaş nehatin. ⁷ Hingê min got: <Ez va me, ya Xwedê, hatim daxaza te bînime sêrî, çawa bona min kitêbêda nivîsar e>».* ⁸ Pêşda dibêje: «Qurban û hedî, qurbanên şewatê û qurbanên bona gunehan te nexwastin û ew li te xaş nehatin» (tiştên ku angorî qanûnê dihatine dayînê). ⁹ Paşê dibêje: «Ez va me ya Xwedê, hatim ku daxaza te bînime sêrî». *Mesîh* ya pêşî wêda davêje, ku ya *dudan* qedîm ke. ¹⁰ Û aha Îsa Mesîh daxaza Xwedê anî sêrî, carekê bona her dem qalibê xwe kire qurban û bi vê yekê em paqij kirin.

¹¹ Her k'ahînek, her roj nava xizmetk'arîya xweda ye û gelek caran hema wan qurbanan dide, k'îjanên ku t'u car nikarin gunehan ret kin. ¹² Lê evî k'ahîni bona gunehhildanê *t'enê* qurbanek da û peyr'a heta-ha-tê alîyê Xwedêye rastê rûnişt ¹³ û ji wir hada hîvîyê ye, heta ku dijminên wî bin p'iyên wîda bîne danîne. ¹⁴ Bi qurbanekê ewî yên ku paqij dibin heta-ha-tê k'amil kirin. ¹⁵ Ruhê Pîroz jî *bona vê yekê* şehdetiyê dide me. Pêşiyê dibêje: ¹⁶ «Ev e ew peymanî ku ezê pey wan rojanra t'evî wan qedîm kim, Xudan dibêje. Ezê qanûnên xwe dilê wanda daynim û wan hişê wanda binivîsim». ¹⁷ Paşê dibêje: «Guneh û neheqiyên wan ezê îdî bîr neynim».* ¹⁸ Wê dera ku baxşandin tê dayînê, îdî bona gunehan hedî kêr nayê.

EM BÊTIRS NÊZİKÎ XWEDÊ BIN

¹⁹ Awa birano, bi saya xûna Îsa em dikarin bêtirs bik'evine Cîyê Herî Pîroz, ²⁰ wê rîya nûye zêndîr'a, ya ku ewî bona me nava wê p'erdêra vekir, *ew p'erde* bedena wî ye. ²¹ Awa ku k'ahînekî meyî mezin heye ser mala Xwedê, ²² em dikarin bi dilê rast nêzikî Xwedê bin, baweriyêva t'ijî, dilê xwe ji îsafa xirab paqijkirî û qalibê xwe jî bi ava zelal şuştî. ²³ De em wê gumana ku îqrar dikin qewîn bigirin û ji cî nehejin, çimkî ewê ku soz daye amin e. ²⁴ Û bira em bona hevdu xem bikin, ku hizkirinê û qencîkirinêda hev gur' kin. ²⁵ Û dest ji li hevcivînê em nek'işînin, çawa hinekanra bûye xeyset, lê em dil bidine ber hev û hê zêde *van tiştan* bikin, çiqasî em dibînin ku ew Roja *Axretê* nêzik dibe. ²⁶ Çimkî heger me rastî nas kirye û ew hildaye û peyr'a bi hemdê xwe nava gunehanda bimînin, îdî ji vir hada bona baxşandina gunehan t'u qurban derbaz nabe, ²⁷ lê t'enê dimîne hîvîya dîwana tîrsa

* 9:20 Derk'etin 24:8.

† 10:7 Zebûr 40:6-8.

‡ 10:16,17 Yêremîya 31:33,34.

mezin û k'ûra agir, ku wê yên miqabilî Xwedê hûfî xwe ke. ²⁸ Heger yekî ku Qanûna Mûsa bit'eribanda, gava du yan sê şehde hebûna, wî nedihatine rehmê, ew dihate kuştinê. ²⁹ Lê t'exmîna we, ewê hê çiqasî hêjayî cezayê giran be, yê ku Kur'ê Xwedê daye bin p'îyên xwe û xûna peymanê haram hesab kirye, bi k'îjanê ew paqij bû û Ruhê k'eremdarîyê bêhurmet kirye? ³⁰ Belê, em wî nas dikin, yê got: «Heyfhildan ya min e, *weke kirê her kesî* ezê bînime pêşîyê». Û dîsa: «Xudan wê dîwana cimeta xwe bike».† ³¹ Tiştêkî saw û tirs e, bik'evine destê Xwedêyê zêndî.

³² Wan rojên pêşin bîr bînin, çaxê hûn hatine ronahîkirinê û gelekî hatine çerçirandinê. ³³ Caran bi qaran û zêrandinan hûn dihatine bêhurmetkirinê, caran jî t'evî halê wan dibûn, yên ku ew tişt dik'işandin. ³⁴ Hûn dik'etine halê girtîyên *hebsê* jî û gava hebûka we jî t'alan çû, hûn bi wê şa bûn, çimkî we xwexa zanibû, ku hebûka weye hê qenc û her t'im heye. ³⁵ Awa wê gumanê ji xwe dîr nexin, ku maşekî giran ji wê tê. ³⁶ Wer'a sebir lazim e, ku hûn daxaza Xwedê bînine sêrî û bigihîjine sozê wî. ³⁷ Çawa nivîsar e: «Dû zemanekî kinra, ewê ku wê bê, derengî nak'eve, wê bê». ³⁸ Û «yê rast bi bawerîya xwe wê bijî» û heger ew paşda vek'işe, ez wî begem nakim».‡ ³⁹ Lê em em ne ji wan in, ku paşda vek'işin û unda bin, lê em ew in, ku bawer dikin, ku ruhên me rizgar bin.

BAWERÎ Û BAWERMEND

11 ¹ Bawerî mak dike, ku ew tişt hene, bona çî guman heye û îzbatîya wan tiştan e, çî ku nayêne k'ifşê. ² Pêşîyên me bi bawerîyê li Xwedê xaş hatin.

³ Bi bawerîyê em zanin, ku dînya bi xebera Xwedê efirî ye û ji tiştên nek'ifş ev tiştên ku tene dîtîne çê bûne.

⁴ Bi bawerîyê Habîl hedîke hê baş da Xwedê, ne ku Qayîn. Bi wê *bawerîyê* jî şehdetî bû, ku ew rast e, çimkî li ser hedîyên wî nîşangeha Xwedê bû. Û rast e ew mir, lê bi *kirên xwe* hê xeber dide.

⁵ Bi bawerîyê Henox cîguhêzî bû, ku mirinê nebîne. Ew *t'u deran* nehate dîtîne, çimkî Xwedê ew cîguhêzî *ezmên* kiribû, çimkî berî cîguhêzîya wî *nivîsarêda* şehdetî bû, ku ew Xwedê xaş hatibû. ⁶ Û bêy bawerî qet nabe ku meriv li Xwedê xaş bê, çimkî k'ê nêzîkî Xwedê dibe, gerekê bawer bike, ku Xwedê heye û wê maş bide wan, yên ku li wî diger'in. ⁷ Bi bawerîyê Nuh bona tiştên ku hê nedihatine k'ifşê ji *Xwedê* ferman stand û bi saw rabû gemî çê kir, ku mala xwe rizgar ke. Wî dîwana dinyayê bi wê *bawerîyê* kir û bû warxurê wê rastîya ku bi bawerîyê tê *standîne*.

⁸ Bi bawerîyê, Îbrahîm çaxê hate gazîkirinê, gura *Xwedê* kir, ku her'e wê dera ku wê çawa war bîstana. Ew rabû çû, lê ne jî zanibû ku k'uda diçe. ⁹ Bi bawerîyê ew wî erdê sozdayîda firarî ma, çawa xerîbîyêda. Û t'evî Îshaq û Aqûb konanda ma, ku ew jî warxurên wî sozî bûn. ¹⁰ Çimkî Îbrahîm hîvîya wî bajarê bi rik'inê qayîm-qedîm bû, ya ku Xwedê şikilê wê k'işandye û efirandye.

¹¹ Bi bawerîyê Serahê xwexa jî, *ya bêber*, havênê zar'anîne stand û wê mezinayîya xweda zar'ok anî. Çimkî bawer kir, ku yê soz daye amin e. ¹² Û ji wî *Îbrahîmî*, yê ku îdî ber devê mirinê bû, weke steyrkên ezmên û qûma devê be'rê bêhesab meriv dinê k'etin.

¹³ Ev hemû jî bawerîyêda mirin, lê sozên Xwedê nestandin. Ewana t'enê ew soz dîrva dîtin, şa bûn û xwe mukur' hatin, ku ew merivne xerîb û firarî ne li ser vê dinyayê. ¹⁴ Ewên ku tiştên aha dibêjin, didine k'ifşê ku ew welatekî *xwer'a* diger'in. ¹⁵ Û heger ew der bîr banîna, ji k'u ew derk'etibûn, mecalâ wan hebû vegeryana wir. ¹⁶ Lê ewana demana cîkî hê qencda bûn~ yê ezmanî. Ji ber vê yekê Xwedê tiştêkî şermîyê nabîne, ku Xwedêyê wan bê gotîne, çimkî ewî bona wan bajarek hazir kirye.

¹⁷ Bi bawerîyê Îbrahîm, ku ji *alîyê* Xwedêda hate cêribandinê, Îshaq da. Wî soz standibûn, lê dîsa kur'ê xweyî tayê-t'enê dikire qurban, ¹⁸ bona k'îjanê Xwedê gotibûyê: «Bi Îshaq wê ter'a zuret bê hesabê». ¹⁹ Çimkî Îbrahîm dilê xweda digot, ku Xwedê dikare Îshaq ji mirinê jî zêndî ke û ewî kur'ê xwe paşda stand, çawa nexşê zêndîbûna ji mirinê.

²⁰ Bi bawerîyê Îshaq bona wan tiştên ku wê bibûna, dua-dirozge li Aqûb û Esaw kir.

²¹ Bi bawerîyê Aqûb ber mirinê dua-dirozge li her kur'ekî Ûsiv kir, xwe da ser kewazê xwe û *Xwedê* heband.

²² Bi bawerîyê Ûsiv ber mirinê bona derk'etina lawên Îsraêl bîr anî û bona hestûyên xwe t'emî da.

²³ Bi bawerîyê Mûsa çaxê ji dîya xwe bû, bi destên dê û bavê xwe sê mehan hate veşartinê. Wana dît ku kur'ik bedew e, ji fermana p'adşê netirsyan.

²⁴ Bi bawerîyê Mûsa çaxê mezin bû, nexwast kur'ê qîza firewin bê hesabê. ²⁵ Ew fikirî, ku hê qenc e t'evî cimeta Xwedê zelûlîyê bik'işîne, ne ku demeke kin nava gunehanda k'êf bike. ²⁶ Ewî qara Mesîh hebûkeke hê mezin hesab kir, ne ku xeznên Misirê, çimkî ç'evê wî lê bû, ku maş bistîne. ²⁷ Bi bawerîyê Mûsa Misir hişt û ji hêrsa p'adşê netirsya, çimkî Mûsa Yê nek'ifş didit û qewîn-qedîm ma. ²⁸ Bi bawerîyê pêşda Mûsa Cejina Derbazbûnê qedîm kir û xûn li *rexderîyan* da reşandinê, ku Milyak'etê Mirinê nixurîyên wan nek'eta.

²⁹ Bi bawerîyê be'ra Sorra derbaz bûn, çawa ku zihayêva. Gava misirîyan jî cêriband, ku derbaz bin, xeniqîn.

³⁰ Bi bawerîyê sîr'ên bajarê Erîhayê k'etin, gava heft rojan dora wan zivir'în.

³¹ Bi bawerîyê Rexaba qav, ku cesûs bi haştî qebûl kirin, t'evî nebaweran unda nebû.

* 10:28 Qanûna Ducarî 17:6.

† 10:30 Qanûna Ducarî 32:35,36; Zebûr 135:14.

‡ 10:38 Hebaqûq 2:3,4.

³² Ez îdî çî bêjim? Waxt t'êrê nake, ku bona Gîdeyon, Baraq, Şimşon, Yêfta, Dawid, Samoyêl û p'êxemberan bêjim, ³³ yên ku bi bawerîyê p'adşatî bindest kirin, heqî kirin, soz standin, devê şêran dane girtinê, ³⁴ k'ûra agir temirandin, ji devê şûr rizgar bûn, ji bêt'aqetîyê qewat girtin, nava şer'da bûne mêrxas, berî ordîyên xerîb dan. ³⁵ K'ulfetan mirîyên xwe zêndîbûyî standin. Hinekan jî azayî wêda danîn, çerçîrîn û mirin, ku ji mirinê zêndî bin û bigihîjine jîyîneke hê qenc. ³⁶ Hinekên mayîn jî k'etine ber qamçîyan, nava qaran, usa jî bendkirî û hebsanda hatine zêrandinê. ³⁷ Ew dane ber keviran, dane ber devê bir'ekan, k'etine nava qezîyan, bi şûran hatine kuştinê, ew bi p'ostên pêz û bizinan ger'yan, xelayî, tengasî dîtin û çerçîrîn. ³⁸ Dinya ne layîqî wan bû! Ew li ber'î û ç'îyan diger'yan, şkeft û gêdûkên erdêda diman.

³⁹ Evana hemû bawerîyêda *kesên* navenîşan bûn, lê sozê Xwedê nestandin, ⁴⁰ çimkî Xwedê bona me tiştêkî hê qenc hazir kirye, ku ewana bêy me negihîjine k'amiltîyê.

ÎSA MESÎHÊ PÊŞİK'ÊŞÊ BAWERÎYÊ BINIHÊRIN

12¹ Awa ku dora me haqas k'oma şêhdane giran heye, de em jî rabin hemû giranîyê û wî gunehê ku rihet li me diwale ji xwe dûr xin û bi teyax lecmeydana pêşîya xweda birevin. ² Em Îsa binihêrin, wî Pêşik'êş û K'amilkirê bawerîya me, yê ku bona wê şabûna pêşîya xwe xaçbûnêra qayl bû, şerm ber tiştêkî hesab nekir, li ser t'extê Xwedê, alîyê wîye rastê rûnişt. ³ Awa li ser wî bifikirin, çawa ewî gunehk'arên miqabilî xwe sebir kir, ku hûn newestin û qudûmê xweda sist nebin. ⁴ We hê heta xûnrêtinê miqabilî gunehan nekiryê şer'. ⁵ Gelo we ew berdilî bîr kirye, ya ku Xwedê wer'a çawa lawên xwer'a xeber da? «Lawê min, şîreta Xudan bêhurmet neke û ne jî ber xwe k'eve, gava ew li te hiltê. ⁶ Çimkî Xudan k'ê hiz dike, wî şîret dike û k'ê çawa law qebûl dike t'eplan jî lê dide».*

⁷ Hûn li şîretê sebir bikin, çimkî Xwedê wer'a çawa lawên xwer'a dimeşe. Ew k'îjan law e, ku bav wî şîret nake? ⁸ Lê heger hûn neyêne şîretkirinê, çawa hemû law tene şîretkirinê, usa ye hûn ne helal in~ ne lawên wî ne. ⁹ Heger em ji bavên xweye bi xûn-qinête vedik'işin, yên ku me şîret dikin, hê çiqas zêde gerekê em gura Bavê ruhê xweda bin, ku bijîn? ¹⁰ Bavên meye bi xûn-qinête demeke kin li gora xwastina dilê xwe me şîret dikin, lê Xwedê bona qazınca me, ku em jî mîna wî pîroz bin. ¹¹ Rast e, her şîret li dema gotî dilê merivan xaş nayê, wî dêşîne, lê paşê yên bi wê hînbûyî, berê haştîyê bona jîyîna rast distînin.

RABIN Û JÎYÎNA QENC DERBAZ KIN

¹² De qolanê milên xweye sistbûyî û qudûmê çokên xweye bêt'aqet qewîn kin ¹³ û nigên xwe rîya rastda bavêjin, ku yê dikule hol nebe, lê qenc be.

¹⁴ T'evî her kesî haştîyê û pîrozîyêda bin, bêy k'îjanê t'u kesê Xudan nebîne. ¹⁵ Miqatî xwe bin, nebe ku ji we yek ji k'erema Xwedê paşda bimîne û tamareke te'l derê, tengasîyê bide û gelekani biherimîne. ¹⁶ Nebe ku yek qav yan dinêhiz be, mîna Esaw, ku bona zike xwarin nixurtîya xwe firot. ¹⁷ Awa hûn zanin jî, gava wî paşê xwast dua-dirozgê nixurtîyê li wî jî bibe, *xwastîna wî* nehate sêrî. Îdî ç'are nedibû, ku ew tiştê ji destê xwe berdabû, lê bihata vegeandinê, nenihêrî wê yekê, ku bi hêsiran hîvî dikir.†

¹⁸ Hûn *mîna Îsraêliyan* nêzikî wî ç'îyayê *Sînayê* ji axê nebûne, ku agir pêk'etibû, bi tarîstanîyê, mij-dûmanê û bobelîskêva girtî bû, ¹⁹ ku li wir bor'î lê dik'et û dengê xeberdanê dihat. Gava yên ev deng dibihîstin, lava dikirin, ku îdî xebereke din wan'a neyê gotinê, ²⁰ çimkî li wê fermanê t'ab nedikirin, ku digot: «Heger rewirek jî nêzikî ç'îyê be, gerekê bidine ber keviran».‡ ²¹ Dîndara vê yekê usa saw bû, heta ku Mûsa jî got: «Ez sawê dik'işnim û dilerizim».§

²² Lê hûn nêzikî ç'îyayê Sîyonê bûne, wî bajarê Xwedêyê zêndî~ Orşelîma ezmên û ordîya rengîne ji milyak'etên bêy hesab ²³ û wê k'om û civîna dîharkirîye nixurtîyan, navên k'îjanan li ezmanan nivîsar e. Hûn nêzikî Xwedê bûne, ku hakimê hemûyan e û nêzikî ruhên yên rast bûne, ewên ku gihîştine k'amiltîyê ²⁴ û nêzikî Îsayê ku wek'iltîyê peymanan nû dike û *nêzikî* xûna wîye reşandî bûne, ku ji xûna Habîl qenctir xeber dide.

²⁵ Îdî miqatî xwe bin, ku nebe hûn ewî wer'a xeber dide *gotîna wî* hilnedin. Heger li ser erdê, ewên ku *Mûsayê ku* t'emîyên Xwedê didan wêda danîn, rizgar nebûn, îdî emê çawa bikaribin rizgar bin, heger em pişta xwe bidine ewî ku ji ezmanan mer'a xeber dide? ²⁶ Dengê wî hingê erd hejand, lê niha soz daye û dibêje: «Ezê careke din jî bihejînim, lê ne t'enê erdê, lê ezmên jî».¶ ²⁷ Xebera «careke din» dide k'ifşê, ku tiştên efîrî wê bihejin û bêne guhastinê, ku yên nahejin qewîn-qedîm bimînin.

²⁸ Awa çimkî me p'adşatîke ku ji cî naheje standye em vê k'eremê qewîn bigirin û bi tirs û bi jîyîna baş Xwedêra xizmetîyê bikin, çawa li wî xaş tê, ²⁹ çimkî Xwedêyê me mîna wî agirî ye, ku dimaşîne *ret dike*.

* 12:6 Gotinên Silêman 3:11,12.

† 12:16,17. Destpêbûn 25:29-34; 27:30-40.

‡ 12:20 Derk'etin 19:12,13; 20:18-21.

§ 12:21 Qanûna Ducarî 9:19.

¶ 12:26 Hagay 2:6.

13 ¹ Birahizî bira t'imê nava weda qewîn-qedîm be. ² Mêvanhizîyê bîr nekin, çimkî hinekan bi wê yekê milyak'et qebûl kirin, lê pê nehesyana.* ³ Girtîyên *hebsê* bîr bînin, usa hesab kin ku hûn jî wanr'a bendkirî ne, usa jî yên ku diçerçirin bîr bînin, çimkî hûn jî mîna wan xûn û goşt in.

⁴ Zewac û mêrkirin bira *nava weda* k'arekî hurmet be û cî-nivîn *jî* helal, lê dîwana qav û zinêk'aran Xwedê wê bike. ⁵ Xeysetê xweda p'erehiz nebin, destên weda çiqas heye, *bi haqasî* razî bin, çimkî Xwedê got: «Ezê qet ji te dûr nek'evim û qet te ber'nedim». ⁶ Lema jî em bêxem dikarin bêjin: «Xudan piştovanê min e, ez natirsim. Merivê çi li min bike?»†

⁷ Rêberên xwe bîr bînin, yên ku wer'a xebera Xwedê gotine. Axirîya jîyîna wan binihêrin û ç'ev bidine bawerîya wan. ⁸ **Îsa Mesîh duhu, îro û heta-ha-tê hema ew e.** ⁹ Ber bayê cûr'e-cûr'e hînkirinên xerîb nek'evin. Qenc e ku dil bi k'erema *Xwedê* bişide, ne ku bi qeyde-qanûnên xwarin-nexwarinê û k'ê ku pey tiştên aha k'etin, t'u qazinc nestandin. ¹⁰ Qurbangeheke me heye, ku îzina t'u kesî ji wan nîne ji wê bixwin, yên ku p'aristxanêda xizmetîyê dikin. ¹¹ Çawa ew heywanên ku xûna wan bi destê serokk'ahîn bona baxşandina gunehan dihate pîrozxanê û cendekên wan ji misken der dihatine şewitandinê,‡ ¹² usa jî Îsa, ku cimet bi xûna xwe paqij bikira, ji dergehê bajêr der çerçirî. ¹³ Awa werin, em ji misken derên her'ine cem wî û bêhurmetîyên *ku li wî dikin* hildine ser xwe, ¹⁴ çimkî li vir mer'a bajarekî ku wê bimîne t'une, lê em hizreta wî bajarî ne, yê ku wê bê. ¹⁵ De werin em her dem bi navê wî hedîyên pesindayîne bidine Xwedê, awa gotî berê zar-zimanê xweye ku navê wî îqrar dikin. ¹⁶ Usa jî qencî û alîhevkinê bîr nekin, çimkî qurbanên usa li Xwedê xaş tîn.

¹⁷ Guhdarîya rêberên xwe bikin û gura wanda bin. Çimkî hûn bin bendûra wanda ne û bona ruhê we cabdar in. Hûn usa bin ku ewana wî k'arê xwe bi *dilê* şa bikin, ne ku bi ne'îlnî, çimkî ew yekê qazincê nade we.

¹⁸ Bona me dua bikin. Em eseyî zanin, ku îsafa me paqij e û dixazin ku her tiştîda rast bimeşin. ¹⁹ Ez hê zêde hîvî dikim, ku hûn xût bona hatina min dua bikin, ku ez zûtirekê vegerime cem we.

DUA-DIROZGE Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

²⁰ Awa Xwedêyê haştîyê, ku Xudanê me Îsa ji mirinê zêndî kir, yê ku bi xûna peymana heta-ha-tê Serokşivanê pêz e, ²¹ bira bi her tiştên qencda we qedîm ke, ku hûn daxaza wî bikin û ew nava meda bi destê Îsa Mesîh tiştên ku li wî xaş tîn bike. Şikirî li navê wî be, heta-ha-tê! Amîn.

²² Ez hîvî ji we dikim, birano, hûn bi sebirê guh bidine van gotinên mine dildayîne, çimkî min kurt wer'a nivîsî.

²³ Zanibin, ku Tîmotêyoyê birê me ji hebsê hatye berdanê. Heger ew zû bê, ezê wîr'a bêm we bibînim.

²⁴ Silavê bidine hemû rêberên xwe û pîrozan. Ewên ji Îtalyayê, li we silav dikin. ²⁵ K'erema Xwedê we hemûyanra be.

* 13:2 Destpêbûn 18:1-8; 19:1-3.

† 13:5,6 Qanûna Ducarî 31:6. Zebûr 118:6.

‡ 13:11 Qanûna K'ahîntîyê 16:27.

NAMA AQÛB

PÊŞGOTIN

T'u kes nizane nivîsk'arê vê namê k'îjan Aqûb e, çimkî li nava donzdeh şandiyên Îsada du Aqûb hebûn, (Lûqa 6:14-16). Lê li gora hinekan ew Aqûbê birayê Xudan Îsa Mesîh e, (Metta 13:55) ku serk'arekî civîna Orşelîmêda bû. (K'arên Şandîyan 15:13; Galatî 1:19).

Eva nama bona hemû endemên civîna Xwedêye, ku t'emamiya dinyayêda belabûyî ne. Ew bi xeberên qewat û meselên bedew rê dide ber wan bawermendan, ku bikaribin bi serwaxtî nava jîyîna rastda bijîn. Ew li ser cûr'e-cûr'e pirsan disekine, mesele: li ser cêribandinê, zêrandinê, jîyîna pîroz, firqîkirinê, kirinên baweriyê, şaş xeberdanê, serwaxtîyê, şer'-de'wan, k'ubarîyê û milûkîyê, xeybê, lomekirinê, sebirê û dua.

Vê namêda ew usa jî xeysetên Xwedê dide naskirinê, ku xwedênas bizanibin, ku çawa gerekê li ber wî bimeşin û wî'r'a xizmetîyê bikin. Dil dide ber wan, ku nava tengasîyanda sebir bikin û hert'im nava duakirinêda bin û alîk'arîya hevdu bikin.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin û cêribandin (1:1-18)
Bihîstin û kirin (1:19-27)
Bona firqîkirinê (2:1-13)
Bawerî û kirin (2:14-26)
Bawermend û ziman (3:1-18)
Bawermend û dinya (4:1-5:6)
Şîretên başqe-başqe (5:7-20)

SILAVKIRIN Û CÊRIBANDIN

1 ¹ Ji Aqûbê xulamê Xwedê û Xudan Îsa Mesîh, li we her donzdeh qebîlên dinyayêda belabûyî'r'a silametîyê *dixazim*.

² Birayên min, şabûneke mezin hesab bikin, çaxê hûn rastî cûr'e-cûr'e cêribandinan tên. ³ Bizanibin, ku cêribandina bawerîya we sebirê pêşda tîne. ⁴ Û sebir jî bira heta xilazîyê be, ku hûn k'amil û gihîştî bin, t'u kêmasîya we t'unebe. ⁵ Heger serwaxtîya yekî ji we kême e, bira ji Xwedê bixaze. Ew bi merdanî dide her kesî, wan bêhurmet nake. K'ê dixaze wî'r'a tê dayînê. ⁶ Lê t'enê bira bi bawerîyê bixaze û dudilî nebe, çimkî yê dudilî mîna pêlên be'rê ye, ku ji bayê radibin û datînin. ⁷ Merivê usa bira nefikire, ku tişteki wê ji Xudan bistîne. ⁸ Merivê dudilî çî rîya ku bigire jî têda ne qedîm e.

⁹ Birayê feqîr bira ser bilindbûna xwe firnaq be, ¹⁰ lê yê dewlemend ser nimizbûna xwe, çimkî ewê mîna gula gihê hişk be her'e. ¹¹ Çawa te'v dertê û bi germayîya xwe gihê hişk dike, gul jê diware û bedewetîya dîndara wê jî unda dibe, usa jî wê yê dewlemend kirê xweda biçilmise her'e.

¹² Xwezî li wî merivî, ku cêribandinêda teyax dike, çimkî çaxê bi cêribandinê bêlek'e derê, ewê t'acgulîya jîyîne bistîne, ya ku Xwedê wan'r'a soz daye, yên ku wî hiz dîkin. ¹³ Bira t'u kesê ku k'etye nava cêribandinê nebêje: «Xwedê min dicêribîne», çimkî Xwedê xirabîyanda nayê cêribandinê û *bi wî cûreyî* t'u kesî jî nacêribîne. ¹⁴ Lê her kes ji dilhaviyîyên xwe dixape û dik'eve nava cêribandinê. ¹⁵ Û gava dilhaviyî kelê xwe distîne, guneh jê dibe û guneh jî ku tê kirinê, mirin jê dibe.

¹⁶ Nexapin birayên mine delal! ¹⁷ Her dayîneke qenc û her p'êşkêşeke k'amil ji jor, ji Bavê ronaya tê xwarê, ku ne xwexa tê guhastinê, ne jî sî li ber heye, ku dager'e. ¹⁸ Ewî bi daxaza xwe bi xebera rastîyê em ji xwe dinê xistin, ku em bibine nixurîyên efrînên wîye *nû*.

BIBIHÊN Û BIQEDÎNIN

¹⁹ Awa, birayên mine delal, bira her meriv bihîstinêda lez be, lê xeberdan û hêrsk'etinêda derengî be, ²⁰ çimkî hêrsa mêriv rastîya Xwedê nayne sêrî. ²¹ Lema hemû mirdarîyê û her xirabîyê ji xwe dûr xin, bi milûkîyê wê xebera nava weda çandî hildin, ya ku dikare ruhên we rizgar ke.

²² Xeberê biqedînin, ne t'enê bibihên û usa xwe bixapînin. ²³ Heger yek t'enê xeberê dibihê, lê naqedîne, ew mîna wî merivî ye, yê ku sifetê xwe çawa heye neynikêda dibîne: ²⁴ Xwe dinihêre, derbaz dibe diçe û zû bîr dike ew yekî çawa bû. ²⁵ Lê ewê ç'evê xwe ji qanûna k'amile azayîdar nabir'e û nava wêda dimîne, ew dibihê bîr nake, lê diqedîne, ew wan kirinên xweda xwezîyî ye.

²⁶ Heger yek xwe xwedênas hesab dike, lê zimanê xwe zeft nake, xwexa xwe dixapîne, xwedênasîya wî p'ûç e. ²⁷ Li ber hizûra Bav Xwedêyê me xwedênasîya rast û bêqusûr ev e: Te'lî-tengîyanda dest bavêjine sêwîyan û jînebiyan û kesa xwe jî ji vê dinyayê bêlek'e xwey ke.

NAVA MERIVANDA FIRQÎYÊ DANAYNIN

2 ¹ Birayên min! Hûn ku bawermendên Xudanê me Îsa Mesîhê xweyrûmet in, nava merivanda firqîyê daneynin. ² Mesele, çaxê yekî bi gustîlka zêr' û k'incên rewş bê civîna we, usa jî yekî k'esîb bi k'incên kevinva bê ³ û hûn xwey'incên rewş binihêrin û bêjinê: «K'ereke ke vê jorê rûnê», lê yê k'esîbr'a *bêjin*: «Ser p'îyan bisekine» yan jî «vê jêrê rûnê», ⁴ gelo hûn nava xweda firqîyê danaynin û nabine hakimên fikirên xirab?

⁵ Bibihên birayên mine delal! Ê ne Xwedê k'esîbên vê dinyayê hilbijartin, ku bi bawerîyê dewlemend in û warxurên wê P'adşatîyê ne, ya ku Xwedê soz daye ewên ku wî hiz dîkin? ⁶ Lê hûn k'esîban bêhurmet dîkin! Gelo ne dewlemend in, ku we dişêlînin û we k'aşî ber dîwanê dîkin?

⁷Gelo ne ew in, ku wî navê qenc dik'ifirin, yê ku li ser we ye?

⁸Heger hûn qanûna P'adşatîyê biqedînin, *mîna* nivîsara ku dibêje: «Hevalê xwe weke xwe hiz bike»,^{*} qenc dikin. ⁹Lê heger hûn firqîyê datînin, guneh dikin û hindava Qanûnêda dibine mîna gunehk'aran. ¹⁰Ewê ku t'emamîya Qanûnê xwey dike, lê t'emîkêda neheqîyê dike, ew dibe deyndarê t'emamîya Qanûnê. ¹¹Çimkî ewê ku got: «Zinêk'arîyê neke» usa jî got: «Nekuje». Awa heger zinêk'arîyê nekî, lê bikujî, dîsa Qanûnê dit'eribînî. ¹²Xeberdan û kirinên xweda usa bin, çawa yên dîwana wan wê bi qanûna azayîdar bibe. ¹³Çimkî bêy rehm wê dîwana bêrehman bibe, lê ber dîwanê rehm serfînyaz dike.[†]

BAWERÎ Û KIRIN

¹⁴Çi qazinc, birayên min, heger yek bêje, ku bawerîya wî heye, lê kirinên wî t'unebin? Gelo eva bawerîya dikare wî rizgar ke? ¹⁵Mesele, heger birak yan xûşkek hewcê *k'inc* yan nanê rojê be, ¹⁶ji we yek wanr'a bêje: «Bi *dilê* rihet her'in, germ bin û t'er bin», lê tiştên ew wanda hewce ne nede wan, çi qazinc? ¹⁷Usa jî bawerî, heger kirinên wê t'unebin, bi t'enê mirî ye.

¹⁸Yek dikare bêje: «Bawerîya te heye, kirinên min hene. K'a bawerîya xwe bêy kirinan nîşanî min ke, ezê jî bawerîya xwe bi kirinên xwe nîşanî te bikim. ¹⁹Tu bawer dikî, Xwedê yek e. Qenc dikî! Cin jî bawer dikin û saw digirin. ²⁰Lê vê yekê dixazî bizanibî? Merivê p'ûç, bawerî bêy kirinan mirî ye? ²¹Ê ne Îbrahîmê bavê me bi kirinan rast hate hesabê, gava kur'ê xwe Îshaq qurbankirinêra danî ser qurbangehê? ²²Tu dinihêrî, ku bawerîyê t'evî kirinên wî ya xwe kir û bi wan kirinan bawerîyê rîya xwe meyaser kir? ²³Û nivîsar hate sêrî, ku dibêje: «Îbrahîm bawerîya xwe Xwedê anî û ew yek wîr'a rastî hate hesabê»[‡] û hevalê Xwedê hate gotinê. ²⁴Hûn dinihêrin, ku meriv bi kirinan rast tê hesabê, lê ne t'enê bi bawerîyê?

²⁵Gelo usa jî Rexaba qav bi kirinan rast nehate hesabê, gava cesûs hildane mala xwe û ew rêke dinva ver'êkirin? ²⁶Awa çawa qalib bêy ruh mirî ye, usa jî bawerî bêy kirinan mirî ye.

ZIMAN

3¹Birayên min, gelekî dersdartîyê nekin, çimkî hûn zanin, ku dîwana me dersdaran wê hê giran be. ²Belê, em hemû jî gelek şaşîyan dikin. Heger yek xebardana şaşîyê nake, ew yekî k'amil e, ku dikare t'emamîya qalibê xwe bîne zeftê. ³Em gemê davêjine devê hespê, ku ew bik'eve bin bendûra me û em serk'arîyê t'emamîya canîya wê bikin. ⁴Yan gemî, çiqasî jî mezin in û ji ber bayê qayîm têne ajotinê, lê bi çerxeke gelekî biç'ûk wî alîda têne serk'arîkirinê, dilê gemîvan k'îjan alîda ku bixaze. ⁵Usa jî ziman endemekî biç'ûk e, lê tiştên ji xwe mestir dibêje. Binihêrin, pirîske agir, çi daristaneke mezin dikare bişewitîne! ⁶Ziman jî agirek e, dinyake neheqîyê, nava endemên meda. Ew qalibê meda li cîkî usada ye, ku t'evayîya wê dêris dike, agir dewra jîyîna mêriv dixê û ew xwexa ji alava agirê dojê pêgirtî ye. ⁷Her cûr'e rewir, teyrede, şûlik û heywanên be'rê têne zeftê û zeftî mêriv dibin, ⁸lê t'u meriv ser zimên nikare. Ew zulmk'arekî ji zeftê der e, je'ra mirinêva dagirtî ye. ⁹Em bi zimên şikirîyê didine Xudan û Bav, bi wî jî nifir merivan dikin, yên ku nîgara Xwedêda hatine xuliqandinê. ¹⁰Hema ji wî zarî him dua û him jî nifir dertên. Birayên min, ne baş e ku eva aha be. ¹¹Gelo ji ç'evkanîkê him ava xaş û him ya te'l dide der? ¹²Gelo dibe, birayên min, ku dara hêjîrê berê zeytûnê bide yan jî k'ola tirîyê hêjîrê? Ne jî ji ç'evkanîya şor' ava xaş dide der?

SERWAXTÎYA DINYAYÊ Û YA EZMÊN

¹³Nava weda k'î ye serwaxt û aqil? Bira ew kirinên xwe bi p'ergalîya qenc û bi milûkîya serwaxtîyê bide k'ifşê. ¹⁴Lê heger dilê weda hevsûdîya xirab û ç'evnebarî hene, k'ubar nebin û rastîyê derew dernexin. ¹⁵Ev «serwaxtî» ne dayîna jorin e, lê ya dinyayê ye, ya merivayîye *p'ûç* e û ya ji cinan e. ¹⁶Çimkî li k'u hevsûdî û ç'evnebarî hene, li wir bêt'erbetî û her kirinên xirab jî hene. ¹⁷Lê serwaxtîya jorin, berê pêşda paqij e, usa jî haştîyê çê dike, milûk û berbîhêr e, bi rehmê û berên qencîyêva t'ije ye, bêy mêlt'agêrî û bêy durûtî ye. ¹⁸Û berê rastîyê ji alîyê wîda tê çinîne, yê ku bi haştîyê diçîne.

HEVALÊ DINYAYÊ~DIJMINÊ XWEDÊ

4¹Ji k'u ne ew şer' û de'wên nava weda? Ê ne ji temên we ne, ku dilê weda şer'ê xwe dikin? ²Ç'evê we li tiştan e, lê dest we nak'eve, dikujin û ç'evnebarîyê dikin, lê nikarin bigihîjine *meremê xwe*, hûn hevr'a dik'evine hucetê û şer' dikin, lê dest naxin, çimkî hîvî nakin. ³Û çaxê hîvî *ji Xwedê* dikin, nastînin, çimkî ser nêta xirabîyê hîvî dikin, ku bi k'êfên dilê xwer'a xerc kin. ⁴Bêsilno! Çima hûn nizanin, k'ê vê dinyayê hiz dike, ew dijminatîyê Xwedêr'a dike? Awa k'î dixaze bibe yarê dinyayê, ew xwe dike dijminê Xwedê. ⁵Yan t'exmîna we badîhewa nivîsar dibêje: Xwedê demana wî ruhê nav meda ye? ⁶Lê hê ew k'eremê dide me. Lema nivîsar dibêje: «Xwedê miqabilî k'ubar-babaxan e, lê k'eremê dide wan, yên xwe nimiz digirin».[§] ⁷Awa gur'a Xwedêda bin. Miqabilî Şeytan bisekinin û ewê ji we bireve. ⁸Nêzikî Xwedê bin, Xwedê jî wê nêzikî we be. Destên xwe bişon,

* 2:8 Qanûna K'ahîntîyê 19:18.

† 2:13 Bi yûnanî aha ye: «Rehm ser dîwanê dik'eve.»

‡ 2:23 Destpêbûn 15:6.

§ 4:6 Gotinên Silêman 3:34.

gunehk'arno, dilê xwe paqij kin, dudilîno. ⁹ Binelin, şînê bikin û bigirîn, bira k'enê we bibe şîn, şabûna we jî k'eder. ¹⁰ Li ber Xudan xwe nimiz bigirin û ewê we bilind ke.

XEYBA HEVDU NEKIN Û K'UBARÎ DÛRÎ P'ÊSÎRA WE BE

¹¹ Xeyba hevdu nekin, birano. K'î xeyba birê xwe dike yan lome birê xwe dike, ew xeyba Qanûnê dike û lome Qanûnê dike. Lê heger tu lome Qanûnê dikî, îdî tu ne ew î, ku Qanûnê biqedînî, lê hakimê wê yî. ¹² T'enê Qanûndarek û H'akimek heye, ku dikare rizgar ke û unda bike. Lê tu k'î yî, ku lome merivan dikî?

¹³ Niha guhdar bin, hûnên ku dibêjin: «Îro yan sibê emê her'ine filan bajarî û li wir salekê bimînin, bik'ir'in-bifiroşin û qazinc kin». ¹⁴ Hûn roja xweye sibê nizanin. Jîyîna we çi ye? Hûn mîna hulm-gulmê ne, hew dinihêrî heye û zû unda dibe. ¹⁵ Dewsa ku hûn aha bêjin: «Heger Xudan bixaze, emê bijîn û filan yan bêvan tiştî bikin». ¹⁶ Lê hûn bi k'ubar-babaxîya xwe difir'in. Her p'ayadayîneke aha xirabî ye. ¹⁷ Awa yê ku zane qencîyê bike û nake, ew jêr'a guneh e.

BONA DEWLEMENDAN

5 ¹ Niha bibihên, hûn dewlemendno! Bigirîn û şînê bikin bona wê sêfilîya ku wê ser weda bê. ² Hebûka we rizî ye, k'incên we jî bûne xurê bizûzê. ³ Zêr' û zîvê we zeng girtin e û zenga wan wê miqabilî we şehdetîyê bide û mîna alava êgir goştê we hûfî xwe ke. We bona *şehdetîyê* rojên axirîyêr'a xezne t'op kir! ⁴ We ew maşê k'arkerên ku erdê we didirûtin nedanê. Va ye ew dikine zarîn û şikîyatê wan k'arkeran gihîştîye ber guhê Xudanê Ordîyan. ⁵ We li ser dinyayê bi xaşî û rihefî derbaz kir û li gora dilê xwe xwarye-vexwarye, mîna yên bona roja serjêkirinêr'a k'ozîkirî. ⁶ We dîwana wan merivên rast kir û ew kuştin, yên ku ranebûne miqabilî we.

SEBIR Û DUA

⁷ Awa birano, heta hatina Xudan sebir bikin. Binihêrin, cotk'ar hîvîya berê erdêyî bi qîmet e, lema sebir dike, heta ku barana pêşin û paşin lêke. ⁸ Hûn jî sebir bikin, gumana xwe unda nekin, çimkî hatina Xudan nêzîk e. ⁹ Bîna xwe jî hevdu teng nekin, birano, ku dîwana we nebe. Va ye hakim pişt dêrî sekinî ye.

¹⁰ Birano, alîyê te'lî-tengîyan û sebirêda ç'ev bidine wan p'êxemberan, yên ku bi navê Xudan xeber dane. ¹¹ Belê, em xwezîya xwe li yên sebir dikin tînin. We bona sebir Îbo bihîstîye û we dît, ku Xudan axirîke çawa qenc da wî. Xudan gelekî dîlşewat û rehm e!

¹² Berî her tiştî, birayên min, sond nexwin, ne bi ezmên, ne bi erdê, ne jî sondeke din. Bira «Belê»-ya we belê be, «Na»-ya we na be, ku hûn dîwanê ser xweda neynin.

¹³ Heger yekî ji we nava te'lî-tengîyêda ye, bira dua bike. Heger yek şa ye, bira Xwedêr'a bistirê. ¹⁴ Heger yekî ji we nexaş e, bira gazî berpirsyarên civînê ke, ku serda dua bikin, bi navê Xudan bi rûn wî gulrûn kin. ¹⁵ Û duayê bi bawerîyê kirî wê yê nexaş qenc ke û Xudan wê wî rake ser p'îyan. Û heger gunehê jî kiribe, wê li wî bê baxşandinê. ¹⁶ Lema ber hev gunehên xwe bidine rûyê xwe û bona hev dua bikin, ku hûn qenc bin. Duayê yê rast gelekî qewat e û hikum dike. ¹⁷ Êlyas hema merivekî mîna me xweyhavîjî bû, wî bi dil û can dua kir, ku baran nebare û sê sal û şeş mehan baran nebarî. ¹⁸ Û paşê dîsa dua kir, ji ezmên baran barî û erdê berê xwe da.

¹⁹ Birayên min! Heger yekî ji we ji rîya rastîyê bik'eve û yekî din wî vegeerîne, ²⁰ ewî ku yê gunehk'ar ji rîya wîye xalîfî vedigerîne bira bizanibe, ku ew ruhekî ji mirinê rizgar dike û gunehên *wîyî* gelek-giran ret dike.

NAMA PETRÛSE PÊŞIN

PÊŞGOTIN

Bi vê nama xweye pêşin Petrûsê şandî berbir'î cimeta Xwedê dibe, awa gotî wan bawermendên ku belayî bakura Asya Biç'ûk bibûn, ku pênc qeza dik'etine nava wê. Ev civîn, hinek bi k'arê Pawlos, hinek jî bi k'arê hevalk'arên wî çê bibûn.

Li gora şehdetîya civîna sedsalîya dudan Petrûs eva nama, berî kuştina xwe sala 65, Romayêda nivîsîye, ku bi navekî sur' wî bajarîra digotin «Babilon» (5:13), çaxê mesîhî bi destê Nêronê Qeyserê Împêr'atorîya Romayê dihatine zêrandinê.

Meremê vê namê ew e, ku ber dilê wan bawermendanda bê, yên ku nava tengasî û zêrandinêda bûn. Vê namêda Petrûs dide k'ifşê ku çawa Îsa cizaret dît, mir û jî mirinê zêndî bû. Û sozê hatina wîye dudan jî bawermendanra gumaneke qedîm e.

Usa jî Petrûs hîvî jî bawermendan dike, ku ew her t'im hişyar û hazir bin, nava jîyîna pîrozîyêda li gora daxaza Xwedê bijîn û bibine p'aristxanên Xwedêye zêndî, li ser rik'inê rast çêkirî~ li ser Îsa Mesîh.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1:1-2)

Bîranîna kirên Xwedêye bona rizgarbûnê (1:3-12)

Şîretên bawermendanra (1:13-2:10)

Borcên bawermendan li te'lfî-tengîyanda (2:11-4:19)

T'emî û silavên axirîyê (5:1-14)

SILAVKIRIN Û ŞIKIRDARÎ

1 ¹⁻² Ji Petrûsê şandîyê Îsa Mesîh, we xerîbanr'a, yên ku li ser erdên Pontosê, Galatyayê, Kepedokiyayê, Asyayê û Bîtênayê belabûyî ne: bira k'erem û haştî li ser we hê zêde be. Bav Xwedê hûn li gora pêşdazanîna xwe hîlbijartin, ku bi Ruhê Pîroz hûn pîroz bin, bi xûna Îsa Mesîhe rêtî bêne paqijkirinê û guhdarîya wî bikin.

³ Xwedêyê dua-dirozgeva xinê, Bavê Xudanê me Îsa Mesîh, ji rehma xweye mezin, careke nû em dinê xistin, bi zêndîbûna Îsa Mesîhe ji mirîyan, ku em xweyê gumana rast bin, ⁴ bona wî warê nep'ûçe ku narize û naç'ilmise. Eva li ezmanan bona we xweykirî ye. ⁵ Û hûn bi bawerîya ser zoraya Xwedê tene xweykirinê, bona wê rizgarbûna hazirkirî, ya ku wê axirzemêda k'ifş be. ⁶ Bi k'îjanê hûn şa dibin. Rast e niha hûn hinekî medekirî ne, ji dest cûr'e-cûr'e cêribandinên mer'a lazim, ⁷ ku xalîsîya bawerîya we hê bi qîmet k'ifş be ne, ku ew zêr'ê bi agir cêribandî, yê ku unda dibe diçe û aha bawerîya we wê hêjayî pesinê, rûmetê û hurmetê be, waxtê k'ifşbûna Îsa Mesîhda. ⁸ We ew nedîtye, lê wî hiz dikin, niha jî nabînin, lê wî bawer dikin û bi wê şabûna mezine xweyrûmet şa ne, ku bi zaran nayê gotinê. ⁹ Çimkî hûn rizgarbûna ruhê xwe distînin, çawa berê bawerîya xwe.

¹⁰ P'êxember vê rizgarbûnê diger'yan û lê nihêrîn û bona wê k'erema ku wê wer'a bibûya p'êxembertî kirin. ¹¹ Ruhê Mesîhî nava wanda hê pêşda li ber wan vedikir, ku Mesîhê biçerçire û peyr'a bik'eve rûmeta xwe. Û wan dixast ku bizanîbin, k'a bona çiçax *tê gotinê* û zemanekî çawada ev tişt wê bibin. ¹² Ev *tişt* li ber wan vebû û wan ne ku bona xwe, lê bona me xizmetî kirin, li wan tiştanda, çi ku niha wer'a bi destê ewên ku Mizgînî wer'a dannasîn kirin hatine gotinê, bi *hikumê* Ruhê Pîrozî ku ji ezmên hate şandinê. Milyak'et xwexa jî demana wan *tiştanda* ne, ku hema bi ç'evan bibînin. ¹³ Lema hûn fikirên xweda piştgirêdayî haş jî xwe hebin û gumana xwe t'am bidîne ser wê k'erema ku wê wer'a bê dayîne, li dema k'ifşbûna Îsa Mesîhda. ¹⁴ Mîna lawên guhdar bin, lê ne ku mîna rabûn-rûniştina wî waxtê dilxastinên xweye nezanîya xwe. ¹⁵ Mîna wî Pîrozê ku gazî we kir, hûn jî pîroz bin, nava hemû rabûn-rûniştina xweda. ¹⁶ Çawa nivîsar e: «Pîroz bin, çimkî ez pîroz im».*

¹⁷ Heger hûn wîr'a «Bavo» dibêjin, yê ku bêy firqî dîwana her kesî weke kirên wî dike, ku usa ye vî waxtê xerîbya xweye firarî bi tîrsa Xwedê derbaz kin. ¹⁸ Çimkî hûn zanin, ku ji rê-rizmên neraste ku we ji kal-bavan stand, hûn bi zêr'yan zîvên ku p'ûç dibin nehatine azakirinê, ¹⁹ lê bi xûna Mesîhe qîmetgiran, çawa *xûna* berxekî bêqusûr û bêlek'e. ²⁰ Ew hê berî destpêbûna dinyayê k'ifşkirî bû, lê van axirîyan bona we k'ifş bû. ²¹ Bi wî we bawerîya xwe wî Xwedêyî anî, yê ku ew jî nava mirîyan zêndî kir û rûmet da wî, ku bawerî û gumana we ser Xwedê bimîne. ²² Awa we guhdarîya rastîyê kir û usa xwe paqij kir, ku hizkirina we hindava biranda bêy durûtî be û niha hûn hevdu bi dilê rast hê qewîn hiz bikin. ²³ Hûn dîsa ne ku ji t'oximê dêris dinê k'etine, lê ji yê nedêris~ ji xebera Xwedêye zêndîye heta-ha-tê. ²⁴ Çimkî her beden mîna gîhê ne, hemû rewşa mêriv *jî* mîna gula gîhê. Gîha hişk dibe, gulên wê jê diwarin, ²⁵ lê xebera Xudan heta-ha-tê dimîne». Eva ew xeber e, ya ku bi Mizgînîyê wer'a hate dannasînkirinê.

KEVIRÊ ZÊNDÎ Û MILETÊ PÎROZ

2 ¹ De her cûr'e xirabîyê, derewîyê, durûtîyê, hevsûdîyê û xeybê ji p'êşîra xwe dawşînin. ² Mîna zar'okên ber bistan heyra şîrê neqelpe ruhanîda bin, ku hûn bi wî *şîr* bona rizgarbûnê mezin bin. ³ We te'ma şîrinayîya Xudan dîtye. ⁴ Hûn xwe li wî bigirin, wî kevirê zêndî, ku ji merivan wêda avîfî ye, lê ji Xwedêda hîlbijartî û xweyhurmet e. ⁵ Hûn jî mîna kevirên zêndî, p'aristxaneke ruhanî werine çêkirinê û çawa k'ahînen pîroz qurbanên ruhanîye li Xwedê xaş bi Îsa Mesîh bidin. ⁶ Çimkî kitêbêda nivîsar e: «Va ez Sîyonêda kevirê enîşkêye bijare û xweyhurmet daftînim û k'î bawerîya xwe wî bîne wê t'u car şermî nemîne».† ⁷ Awa ew kevir bona we bawermendan xweyrûmet e, lê bona nebaweran: «Ew kevirê ku hosteyan wêda avîf, bû serê e'nîşkê», ⁸ «qeyayê ku meriv jê hol

* 1:16 Qanûna K'ahîntîyê 11:44-45; 19:2; 20:7.

† 2:6 Îşaya 28:16.

dibin û kevirê ku pê dilik'umin». * û hema wê yekêra jî k'ifşkirî ne, çimkî guhdarîya xeberê nakin.

⁹ Lê hûn esilekî bijare ne, k'ahînên p'adşatîyê, milletê buhurtî, cimeta heqe-helal, ku qencîyên wî bikine dengî, yê ku hûn ji tarîstanîyê gazî ronaya xweye hujmek'ar kirine. ¹⁰ Hûn waxtekê ne t'u cimet bûn, lê niha bûne cimeta Xwedê, hûne bêy rehma wî bûn, lê niha we rehm dîye.

ÇAWA XWEDÊNAS BIJÎN

¹¹ Delalîyên min! Hîvî ji we dikim, çawa merivên firarî û xerîb, hevza xwe ji dilhaviyîyên bedenê bikin, ku miqabilî ruh şer' dikin. ¹² Hûn nava hêtanosanda xwe usa p'ergal xwey kin, ku heger çawa xirab we rezîl kin jî, kirên weye qenc bibînin û şikirîyê bidine Xwedê, wê Roja ku ewê serîkî bide dinyayê.

¹³ Gura her serwêriyên merivayêye k'ifşkirî bikin, bona xatirê Xudan, gura p'adşêda bin, çawa serokê herî bilind, ¹⁴ usa jî gura welîyanda bin, çawa yên alîyê p'adşêda şandî, ku cezayê bidine neheqan û pesin jî bidine qencan. ¹⁵ Çimkî ev e qirara Xwedê, ku hûn bi qencîkirinê dengê merivên bêaqile nezan bidine bir'inê. ¹⁶ Hûn mîna *merivên* aza bijîn. Bira azayîya we nebe xêlîya xirabîkirinê, lê çawa xulamên Xwedê bijîn. ¹⁷ Hurmeta hemûyan bigirin, birahiz bin, ji Xwedê bitirsin, hurmeta p'adşê bizanibin.

P'ÊGA ÇERÇIRÎNA MESÎHDA HER'IN

¹⁸ Xulamno, bi tirs gura axayên xweda bin, ne ku t'enê gura yên qenc û berbihêrda, lê gura zulmk'aranda jî. ¹⁹ Çimkî ev jî k'erema Xwedê ye, ku meriv bi îsafa rihet cîkî heqî-bêxêda zelûliyê dik'işîne û sebir dike. ²⁰ Çi qazinc, heger hûn bona gunehkirinê bêne lêdanê û sebir kin? Lê heger hûn bona qencîkirinê biçerçirin û sebir kin, ew li ber *hizûra* Xwedê k'eremek e. ²¹ Hûn hema vê yekêra jî hatine gazîkirinê, çimkî Mesîh xwexa jî bona we çerçirî û wer'a nexşek hişt, ku hûn p'êga wîda her'in. ²² Ewî guneh nekir û ser zarê wî qelpî t'unebû.† ²³ Gava dihate bêhurmetkirinê, ji berva wî t'u kes bêhurmet nedikir û gava diçerçirî, gef li kesekî nedixwar, lê xwe spartibû hakimê ser rastîyê. ²⁴ Ewî bedena xweda gunehên me rakirine ser xaçê darê, ku em ji gunehan aza bin û bona rastîyê bijîn: Bi *k'ewa* birînen wî hûn qenc bûn. ²⁵ Çimkî hûn mîna pezên xalifî bûn, lê niha vegeryane cem Şivan û Xemk'êşê ruhê xwe.

T'EMÎYA BONA JIN Û MÊRAN

3¹ Usa jî k'ulfetno, gura mêrê xweda bin, ku ji wan hinek jî, heger guhdarîya xeberê nakin, bi p'ergalîya jinên xwe, bêy *şirovekirina* xeberê bêne ser bawerîyê, ² çaxê p'ergalîya weye tirsî nav-namûsê bibînin. ³ Bira xemila we dervava bi gulîvegirtinê û rêzkirina zê'an yan jî bi k'incan nebe, ⁴ lê merivê dildaye bedewetîya nep'uç be, ku ruhê milûk û berbihêr e, ku li ber Xwedê qîmetê wê giran e. ⁵ Çimkî waxtekê bi vî cûreyî k'ulfetnê pîroz, ku gumana xwe danîbûne ser Xwedê, xwe dixemilandin, xemila wan ew bû, ku gura mêrê xwe bikirana, ⁶ mîna Serahê, ku gura Îbrahîmda bû û digote wî: «Xweyê min». Îdî hûn jî qîzên wê dèyê ne, heger hûn xwe li qencîyê digirin û ji t'u tiştî natirsin.

⁷ Usa jî merno, bi femdarîyê jîyîna xwe t'evî jinên xwe derbaz kin, çawa qîsmê sist hurmeta wan bigirin, usa jî çawa hevalwarê wê jîyîna ku hûnê p'êşkêş bistînin, ku t'u tişt nebîne bayîsê duayên we.

BONA RASTÎYÊ BIÇERÇIRIN

⁸ De îdî, hûn hemû jî ser nêtekê bin, ser hevdu şewat bin, hevdu hiz bikin, rehm û omdayî bin. ⁹ *Nîşkêva* nebe ku hûn dewsa xirabîyê xirabî bikin yan dewsa bêhurmetkirinê bêhurmet kin, lê dewse dua-dirozgan li wan bikin, çimkî hûn vê yekêra hatine gazîkirinê, ku dua-dirozgê sozdayî bistînin. ¹⁰ Çimkî: «li k'ê jîyîn xaş tê û dixaze rojên xaş bibîne, bira zimanê xwe nede xirabîyê û zarê xwe jî buxdanbêjîyê. ¹¹ Bira ji xirabîyê vegere, qencîyê bike, bira haştîyê biger'e, li pey wê her'e. ¹² Çimkî ç'evê Xudan li ser yên rast e û guhê wî ser duayê wan, lê rûyê Xudan miqabilî xweyfelên xirab e».‡

¹³ K'ê wê hindava weda xirabîyê bike, heger we xwe li qencîkirinêda girtye? ¹⁴ Lê heger hûn bona rastîyê biçerçirin jî, hûne xwezî ne! Îdî ji merivan netirsin û xwe unda nekin. ¹⁵ Lê dilê xweda Mesîh bilind bigirin, çawa Xudanê pîroz. Her gav hazir bin, caba wan hemûyan bidin, yên ku bona wê gumana nava weda dipirsin. Lê wê yekê bi tirs û milûkîyê bikin, ¹⁶ xweyê îsafa rihet bin, ku ewên we rezîl dikin şermî bimînin, yên ku p'ergalîya weye qence bi Mesîh bêhurmet dikin. ¹⁷ Hê qenc e, heger qirara Xwedê ye, em bona qencîyê biçerçirin, lê ne ku bona xirabîyê. ¹⁸ Çimkî Mesîh carekê *bona her dem* bona gunehhildanê çerçirî, yê heq bona neheqan, ku me nêzikî Xwedê bike. Ew bi bedenî hate kuştinê, lê bi *destê* Ruh jîyînera hate veğerandinê. ¹⁹ Ew bi ruh çû nava wan ruhên hebsêda dannasîn kir, ²⁰ yên ku waxtekê ne guhdar bûn, çaxê Xwedê bi sebira dirêj li wan sebir dikir~ wî zemanê Nuhda, çaxê gemî dihate çekirinê. Wêda hindik, awa gotî heyşt kes bi avê *ji zemanê xirab* rizgar bûn. ²¹ Ew av şikilê nixamtinê bû, ya ku niha ne ku bona şuştina qirêja qalibê we ye, lê ew *nixamtin* li ber Xwedê, şehdetîke îsafa rihet e, bona rizgarîya me, bi zêndîbûna Îsa Mesîhe ji nav mirîyan, ²² yê ku çûye ezmên, li alîyê Xwedêyî rastê ye û milyak'et, hikumetî û zorayên ruhanî bin *hikumê* wîda elimî wî ne.

* 2:7,8 Zebûr 118:22, Îşaya 8:14.

† 2:22 Îşaya 53:9.

‡ 3:10-12 Zebûr 34:12-16.

4¹ Awa Mesîh ku bona me bi bedenî çerçirî, hûn jî bi wê nêt-fikirê silihkirî bin. Çimkî yê bi bedenî çerçirî dest ji gunehan k'îşandye, ² ku îdî li rojên xweye vî qalibîda em ne ku li gora dilhaviyîyên xweye merivayî bijîn, lê li gora qirara Xwedê. ³ Îdî bese, ku we waxtê jîyîna xweye bihurîda li gora xastina hêtanosan derbaz kirye, *hingê* hûn pey heramîyê, temxastinên xirab, îçkevexwarinê, nerêyê, serxaşbûnê û p'ûtp'aristîya mirdar k'etibûn. ⁴ Ewana ecêbmayî jî dibin, ku hûn t'evî bêp'ergalîya wane bênamûsî nabin û navê xirab li pey we dixin. ⁵ Lê ewana wê li ber wî cabdar bin, yê ku hazir e dîwana mirî û zêndîyan bike. ⁶ Ji boy vê yekê mirîyanra jî Mizgînî hate dayînê, ku bi bedenî dîwana wan bê kirinê, mîna mêriv, ku bi ruhanî bijîn, mîna Xwedê.

P'ÊŞKÊŞÊN XWEDÊYE BONA CIVÎNÊ

⁷ Axirîya her tiştî nêzîk bûye. Awa serwaxt û hişyar bin, ku bikaribin pey duakirinê bin. ⁸ Berî her tiştî bi hub û rez hevdu hiz bikin, çimkî hizkirin gelek gunehan dibaxşîne. ⁹ Hindava hevda mêvanhiz bin, bîna xwe teng nekin. ¹⁰ Ji we k'ê çî p'êşkêş standye, bi wê jî hev'r'a xizmetîyê bikin, çawa wek'îlên qenc, li nava wan k'eremên Xwedêda. ¹¹ Heger yek xeber dide, bira li gora gotinên Xwedê xeber de, heger yek xizmetîyê dike, bira bi wê zoraya ji Xwedêda standî bike, ku her tiştîda navê Xwedê bê bilindkirinê, bi destê Îsa Mesîh, şikir û zorayî wîr'a heta-ha-tê. Amîn.

TELÎ-TENGÎYÊN BONA NAVÊ ÎSA MESÎH

¹² Delalîyên min! Bona cêribandina ku tê serê we, nefikirin ku ev alava tengasîyê çî belake nişkêva ye, ku li we qesidîye, ¹³ lê şa bin, ku hûn t'evî te'lî-tengîyên Mesîh dibin, ku dema k'îfşbûna rûmeta wî jî hûn bireqisîn û şa bin. ¹⁴ Heger boy navê Mesîh hûn bêne bêhurmetkirinê, hûne xwezîyî ne, aha *tê k'îfşê* ku Ruhê Xwedêyî rûmetê li ser we venyaye. ¹⁵ Bira ji we t'u kes neçerçire çawa merivkuj, diz, zulmk'ar yan jî *yekî ku* t'evî k'arê xelqê dibe. ¹⁶ Lê heger çawa mesîhî biçerçire, bira şerm neke, lê şikirîyê bide Xwedê bona wî navê ku hildaye ser xwe. ¹⁷ Îdî waxt pê'r'a gihîştîye, ku dîwan ji mala Xwedêda destpêbe û heger pêşda ji meda destpê dibe, lê axirîya wan wê çawa be, yên ku gura wê Mizgînîya ji Xwedê nakin? ¹⁸ Nivîsar e: «Heger yê rast wê bi zorekê rizgar be, îdî halê nep'ak û gunehk'aran wê çawa be?» ¹⁹ Awa yên ku li gora qirara Xwedê diçerçirin, bira xwe li qencîyê bigirin, ruhê xwe bispêrine Efirandarê xweyî amin.

T'EMÎ Û SILAVÊN AXIRÎYÊ

5¹ Ez hîvî ji berpirsyarên nava weda dikim, ez xwexa jî çawa berpirsyar û şehdeyê te'lî-tengîyên Mesîh û hevalp'arê wê rûmetê meye ku wê k'îfş be: ² Şivantîyê wî kerîyê pezê Xwedêyî li ber xwe bikin, ne ku bêy dilê xwe, lê bi hub û rez usa xwey kin, çawa Xwedê dixaze, ne ku bona qazınca xwe, lê bi rezedilî, ³ ne ku hikumî li ser wan bikin, yên p'ara we k'etine, lê nexşê qenc nîşanî kerî bikin. ⁴ Û çaxê Serokşivan k'îfş be hûnê wî t'acgulîya rûmetêye ku naç'ilmise bistînin.

⁵ Usa jî cahilno, gur'a mezinanda bin. Û hûn hemû jî, bi xizmetîya li ber hev xwe nimiz kin, çimkî: «Xwedê miqabilî k'ubar-babaxan e, lê k'eremê dide wan, yen xwe nimiz digirin».† ⁶ Bin destê Xwedêyî zorda xwe nimiz kin, ku ew waxtda we bilind ke ⁷ û hemû xemên xwe bavêjine ser wî, çimkî ew bona we xem dike. ⁸ Haş ji xwe hebin, hişyar bimînin! Şeytanê neyarê we mîna şêrê birçî digêr'e k'a k'ê hûfî xwe ke. ⁹ Lê hûn bawerîyêda qewîn-qedîm miqabilî wî rabin, çimkî hûn zanin ku birayên we jî t'emamîya dinyayêda hema usa diçerçirin. ¹⁰ Lê Xwedêyê her k'ereman, ku bi Mesîh hûn gazî rûmeta xweye heta-ha-tê kirine, wê pey hinek te'lî-tengîyanra xwexa we k'amil ke, bişidîne, qewat ke û xweybingeh ke. ¹¹ Rûmet û zorayî li wî be heta-ha-tê. Amîn.

¹² Mîn bi destê Silas, ku wî birakî amin hesab dikim, kurt wer'a nivîsî û bi vê dil didime we û şehdetîyê didim, ku ev e k'erema Xwedêye rast. Vêda hûn qewîn-qedîm bisekinin. ¹³ Civîna Babilonêda silavan li we dike, ya ku t'evî we hatye hîlbijartinê, usa jî lawê min Marqos. ¹⁴ Bi ramûsana hizkirina dilê rast hevdu silav bikin. Bira haştî li we hemûyên p'ara Mesîh be. Amîn.

* 4:18 Gotinên Silêman 11:31.

† 5:5 Gotinên Silêman 3:34.

NAMA PETRÛSE DUDAN

PÊŞGOTIN

Bi vê nama xweye dudan Petrûsê şandî berbir'î hemû bawermendan dibe. Ew bi vê namê dixaze pêşîya hînkirinên şaş bide girtinê û li bawermendan bike, ku ji wê hînkirinê nexalifin, ya ku bi destê wan merivan hatye hînkirinê, k'îjanan bi ç'evê xwe Îsa Mesîh dîtîbûn û bi guhê xwe hînkirina wî bihîstîbûn. Petrûs sert miqabilî wan e, yên ku digotin «Îsa Mesîhê venagere» û usa jî hînkirinên dine nerast didan û rabûn-rûniştina xweda jî ne baş bûn. Petrûs sozê Îsa tîne bîra xwedênasan, ku Îsa wê vegere û t'u car nabe ku ew soz derew derê, lema xwedênas gerekê bi rabûn-rûniştina paqij hîvîya wê rojê bin, ku heger bimirin yan bêne hilbirinê, ew p'ara Îsa Mesîh bin.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1:1-2)
Gazî û hîlbijartina ji Xwedêda (1:3-21)
Dersdarên şaş û derew (2:1-22)
Hatina Mesîhe dudan (3:1-18)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ji Şimhûn Petrûsê xulam û şandîyê Îsa Mesîh, wer'a, yên ku t'evî me hema ew bawerîya xweyqîmet bi rastîya Xwedê û Rizgarkirê me Îsa Mesîh standin: ² Bira k'erem û haştî li ser weda zêde be, bi zanebûna *hindava* Xwedê û Xudanê me Îsada.

GAZÎ Û HILBIJARTINA JI XWEDÊDA

³ Belê, qewata xwedêtiya wî her çî ku jîyîna xizmetîya Xwedêra lazim in p'êşkêşî me kir, bi wê naskirina meye *hindava* wîda, ku wî bona rûmetê û xeysetê qenc gazî me kir. ⁴ Aha ewî sozên herî mezinî qîmetgiran dane me, ku bi wan em binyata xwedêtiyêva t'evgirêdayî bin û ji wê boş-betalîya ku ji dilhaviyîyên dinyayê pêşda tèn birevin.

⁵ Û bona vê yekê hûn her alîda pey k'evin, ku ser bawerîya xweda xeysetê qenc zêde kin, ser xeysetê qencda zanebûnê, ⁶ ser zanebûnêda xwegirtinê, ser xwegirtinêda sebirê, ser sebirêda xizmetîya Xwedêra, ⁷ ser xizmetîya Xwedêra birahizîyê û ser birahizîyêda jî hizkirinê. ⁸ Çimkî heger nava weda ev şuret hene û zêde dibin, *hingê* hûnê bêkêr û bêber derneyên, bi wê naskirina weye *hindava* Xudanê me Îsa Mesîhda. ⁹ Lê li cem k'ê ev şuret t'unene, ew *fikirda* kor e, dûr nabîne û bîr kirye, ku ji gunehên xweye berê paqij bûye.

¹⁰ Bona vê yekê, birano, hê bikin ku hûn wê gazî û bijarebûna xwe qedîm kin. Heger vê yekê bikin, hûn qet nak'evin. ¹¹ Û aha bona we wê destûreke mezin bê dayînê, ku hûn bik'evine P'adşatîya heta-ha-tê, ya Xudan û Rizgarkirê me Îsa Mesîh.

¹² Lema ez her dem dixazim van tiştan bînime bîra we, rast e hûn zanin jî û ser wê rastîya ku gihîştîye we jî qewîn-qedîm in, ¹³ lê ez vê yekê çawa borcê xwe dibînim, ku heta vî qalibîda me bînime bîra we. ¹⁴ Çimkî zanim, ku zûtîrekê vî qalibî ezê ji xwe bêxim, çawa ku Xudanê me Îsa Mesîh ez pê hesandim. ¹⁵ Awa ezê bikim, ku pey ji dinyayê derk'etina minr'a jî hûn her dem bikaribin van tiştan bînine bîra xwe.

YÊN KU RÛMETA ÎSA MESÎH DÎTIN

¹⁶ Em ne ku pey çilovîskên hostetîye berxwedexistî k'etîbûn, çaxê me bona zorayî û hatina Xudanê me Îsa Mesîh wer'a got, lê me bi ç'evên xwe mezinayîya rewş-rûmeta wî dît. ¹⁷ Ewî ji Bav Xwedê rûmet û hurmet stand, gava ji wê Rûmeta Qeşeng deng hat û got: «Ew e Kur'ê minî delal, ji k'îjanî razî me». ¹⁸ Ev dengê ku ji ezmên hat, me xwexa bihîst, gava em wîr'a t'evayî ser ç'îyayê buhurtî bûn.

¹⁹ Awa bona me gotinên p'êxembertîyêye hê qedîm hene. Wê baş be, ku hûn wan *xeberan* binihêrin, çimkî ew mîna ç'îrakê ne, ku tarîyêda ronayê dide, heta ku sibeh zelal be û steyrka berbi ro dilê weda nedîr bide. ²⁰ Lê pêşîyê vê yekê zanibin, ku t'u kes xweserîxwe nikare p'êxembertîyên nivîsarê şiroveke. ²¹ Çimkî t'u p'êxembertî bi hemdê merivan nehatye dayînê, lê merivên Xwedê bi rêberîya Ruhê Pîroz xeber dane.

DESDARÊN DEREW

2 ¹ P'êxemberên derew jî nava cimêda hebûne, çawa li nava weda jî dersdarên derew wê hebin, ku dizîva wê hînkirinên şaşê undakirinê bikine nava we û wî Xudanê ku ew k'ir'in jî wê înk'ar kin û zûtîrekê wê bela bînine serê xwe. ² Gelek wê ber bayê bênamûsîya wan k'evin û rûyê wanda wê rîya rastîyê bê k'ifîrîkirinê. ³ Ji dest ç'evqulîyê bona qazınca xwe wê bi zarê xaş we bixapînin. Lê dîwana wanê derengî nek'eve, bela wan ber p'îyên wan e.

⁴ Çimkî heyfa Xwedê qet li wan milyak'etên ku guneh kirin jî nehat, lê ew bendkirî avîtine zindana tarîstanîyê û Roja Dîwanêr'a dane xweykirinê. ⁵ Û heyfa wî dinya pêşin jî nehat, t'enê heşt kes rizgar kirin~ Nuhê dannasînkirê rastîyê mala wîva t'evayî, çaxê lêyî anî ser dinya nep'akan. ⁶ Xwedê dîwana bajarên Sodom û Gomorayê jî kir, ew kirin ax û xwelî, wêran kir û bona nep'akên pey wanr'a dersek hişt. ⁷ Lûtê rast rizgar kir, yê ku ji bêp'ergalîya nep'akane bênamûsî aciz bibû. ⁸ Çimkî yê rast, ku nava wanda dima, kirinên nep'akîya wan didîtin, dibihîstin û her roj ruhê wîyî rast xweda dişewtî. ⁹ Xudan ku aha ew rizgar kirin, dikare xwedênasan jî ji cêribandinan rizgar bike û neheqan Roja Dîwanêr'a xwey bike, ku cezayê xwe bistînin, ¹⁰ hê zêde ewên ku pey heramiya xastina qalib k'etine û serwêrtîyê bêhurmet dikin. Ewe berzeq û xwerazî ne, natirsin jî *ku* k'ifîriyan yên

xweyrûmete jorin dikin, ¹¹ lê milyak'et çiqasî bi qewat û zoraya xwe ji van zêdetir in, lê dîsa li ber hizûra Xudan bi k'ifirîyan dîwana wan nakin. ¹² Ev meriv mîna heywanên bêzare-bêziman in, ku bona nêç'îr û kuştinê dinê k'etine, k'ifirîyan wan tiştan dikin, bona çî qet nizanin jî ew çî ne, evana jî mîna wan heywanan wê unda bin her'in. ¹³ Wê maşê neheqîya xwe bistînin. K'êfa dilê xwer'a ro nava rojêda xirabîyê dikin û wê yekê xwer'a şabûnê hesab dikin. Evana lek'e û heram in, ku wê rêda rast naçin, k'êf-k'êfa wan e, gava t'evî we dixwin û vedixwin. ¹⁴ Ç'evên wan li zinêk'arîyê ye, ji gunehkirinê t'êr nabin, bawermendên neşîdyayî dixapînin, dilê wan t'enê hînî ç'evqulîyê bûye. Nifir ser wan e! ¹⁵ Destê xwe ji rîya rast kirin, xalifîn, rîya Bilamê Beûrda çûn, yê ku maşê neheqîyê hiz kir. ¹⁶ Lê bona neheqîya xwe hate hilatinê gava k'era bêzare-bêziman bi zimanê merivayê xeber da û pêşîya p'êxember bir'î, ku bêaqilîyê neke.

¹⁷ Merivên aha kanîyên ç'ikîyayî ne û e'wrên ji ber bayê ajotî ne. Şevereşa tarîstanîyê bona wan xweykirî ye. ¹⁸ Yên aha gotinên p'ûçe ji xwe mestir xeber didin, bi temên merivayêye xirab wan merivan dixapînin, yên ku waxtekê ji wan revîbûn, yên ku rîya xalifîda diçin. ¹⁹ Evana wanr'a azayîyê soz didin, lê xwexa xulamên tiştên p'ûçî-dêris in, çimkî meriv çî tiştîda dide der, dibe xulamê wê yekê. ²⁰ Heger ewên ku bi zanebûna hindava Xudan û Rizgarkirê me Îsa Mesîh carekê dest ji heramiyên dinyayê kirin, paşê dîsa bik'evine nava wan heramiyan û bidine der, axirîya wan wê ji ya pêşin xirabtir be. ²¹ Wanr'a hê qenc bû, ku qet ev rîya rastîyê nas nekirana, ne ku pey naskirinêr'a ji wê t'emîya pîroz, ku wanr'a hate dayîne dager'yana. ²² Ev xeber rast li ser wan tê gotinê: «Se vedigere ser vereşandina xwe»* û «Berazê şuştî dîsa xwe herîyêda vedide».

SOZÊ HATINA XUDAN

3¹ Delalîyên min, eva îdî nama dudan e ez wer'a dinivîsim, ku bi van çend tiştan bînime bîra we, fikira weye safî hişyar kim, ku hûn rast bifikirin. ² Usa jî hûn xeberên p'êxemberên pîroze gotî û wê t'emîya Xudan û Rizgarkir bîr bînin, ku bi destê şandîyan hatine gotinê. ³ Berî her tiştî vê yekê zanibin, ku rojên axirîyêda merivên usa wê rabin, ku qerfê xwe xwedênasan bikin, wê bi xastina dilê xwe bimeşin ⁴ û bêjin: «K'a ew sozê hatina wî? Kal-bavên me mirin çûn, lê her tişt hê ji waxtê efirandina dinyayêda usa mane». ⁵ Yên ku aha difikirin, vê yekê bîr naynin, ku bi xebera Xwedê hê pêşda ezman hebûn û erd jî ji nava avê û bi avê pêşda hat. ⁶ Û dinya berê jî binê avêda wêran bû û unda bû. ⁷ Lê erd û ezmanê niha jî hema bi wê xeberê tene xweykirinê, ku bi agir unda bin. Ew Roja Axretêr'a tene xweykirinê, li k'îjanêda merivên nep'ak wê unda bin her'in.

⁸ Lê bira ev yek weva tarî nemîne delalîyên min, cem Xudan rojek mîna hezar salî ye û hezar sal jî mîna rojekê ye. ⁹ Xudan sozê xwe derengî naxe, çawa hinek difikirin. Ew bi sebira dirêj li we sebir dike, naxaze t'u kes unda be, lê dixaze ku her kes ji gunehkirinê vegerin.

¹⁰ Lê Roja hatina Xudan wê *nişkêva be*, mîna *hatina* dizekî. Hingê ezman wê bi qûjîniya mezin betavebin û tiştên bin p'er'ê ezmananda jî wê bişewtin wêran bin, dinya û her tiştên wêda jî wê unda bin her'in. ¹¹ Heger ev her tişt wê bi vî cûreyî wêran bin her'in, lê hûn gerekê merivne çawa bin? Gerekê hûn jîyîna helal û xwedênasîyêda bimeşin ¹² û hîvîya Roja Xwedê bin û hatina wî lez xin. Wê rojê ezman wê bi agir-alavê bişewtin unda bin, agirê *her* tiştên bin p'er'ê ezmanan bihelîne. ¹³ Lê em li gora sozê wî hîvîya erd û ezmanê nû ne, k'îjananda rastî wê qedîmkirî be.

¹⁴ Awa delalîyên min, hûn ku hîvîya van tiştan e, bikin ku Xwedê we bêlek'e û bêqusûr t'evî xwe haştîyêda bibîne. ¹⁵ Sebira Xudanê me rizgarbûn hesab kin, çawa Pawlosê birê meyî delal jî bi wê serwaxtîya ku ji Xwedêda jêr'a hatye dayîne, wer'a nivîsî. ¹⁶ Hemû nameyên xweda jî ew bona van tiştan xeber dide. Wanda çend tişt hene, ku zehmet tene femkirinê, ku yên nezane neşîdyayî şaş şirovedikin, usa jî nivîsarên pîroze mayîn û xwexa dibine bayîsê serê xwe. ¹⁷ Awa delalîyên min, hê berêda hûn ku vê yekê zanin, miqatî xwe bin, ku nebe bi xalifandina merivên nep'ak hûn ji rê derk'evin û ji cîyê xweyî qedîm bik'evin. ¹⁸ Lê bi k'erem û zanebûna Xudan û Rizgarkirê me Îsa Mesîh bigihîjin. Şikir wîr'a, niha û heta-ha-tê! Amîn.

* 2:22 Gotinên Silêman 26:11.

NAMA YÜHENNA YE PÊŞIN

PÊŞGOTIN

Nivîsk'arê vê namê navê xwe nedaye k'ifşê, lê li gora şehdeyên sedsalfiyên pêşin û cûr'ê nivîsarê (ji stîlê) k'ifş dibe, ku nivîsk'arê vê namê Yühennayê şandiyê Îsa Mesîh e~ kur'ê Zebedî, yê ku «Mizgînî» jî nivîsî.

Eva nama mîna dezgehekê ye, ku halê mêriv tîne li ber ç'evan~ dide k'ifşê, ku merivan ji kirê wan nas bikin, ne ku ji xeberên p'ûç. Yühenna hê zêde li ser vê pîrsê disekine~ ku bi bawerîya ser navê Îsa Mesîh mêriv çî dikare bistîne û çawa dikare p'êxember û dersdarên derew nas bike û ji wan dûr k'êve.

SERECEMA NAMÊ

Gotin (1:1-4)

Ronahî û tarî (1:5-2:29)

Lawên Xwedê û lawên Şeytan (3:1-24)

Rastî û nerastî (4:1-6)

Borcê hizkirinê (4:7-21)

Bawerîya serdestî (5:1-21)

GOTIN

1 Em li ser Gotina jîyînê *wer'a* dibêjin, ku serê-sêrîda ew hebû, bona k'îjanî me bihîst, bi ç'evên xwe dît, li wî nihêrî û bi destê xwe ew p'eland. **2** Jîyîn k'ifş bû, me ew dît, em şehdetiyê didin û bona wê jîyîna heta-ha-tê *wer'a* dibêjin, ku cem Bavê bû û meva k'ifş bû. **3** Çî ku me dît û bihîst em wê *wer'a* dibêjin, ku t'evgirêdana we meva hebe û t'evgirêdana me jî Bavêva û Kur'ê wî Îsa Mesîhva heye. **4** Em van tiştan *wer'a* dinivîsin, ku şabûna me t'emam be.

XWEDÊ RONAHÎ YE: EM NAVA RONAYÊDA HER'IN

5 Ev e ew gotina ku me ji wî bihîst û we jî pê dihesînin, ku Xwedê ronahî ye û t'u tarî nava wîda t'une. **6** Heger em bêjin: «Em Xwedêva t'evgirêdayî ne», lê tarîyêda biger'in, em derew dîkin, rastîyê nabêjin. **7** Lê heger em ronayêda biger'in, çawa ew ronayêda ye, emê hevva t'evgirêdayî bin û xûna Îsa Mesîhê Kur'ê wî wê me ji hemû gunehan paqij ke. **8** Heger em bêjin: «Qet gunehê me t'une», em xwexa xwe dixapînin û nava meda rastî t'une. **9** Lê heger em gunehên xwe bidine rûyê xwe, ew *sozê xweda* amin e û ser rastîyê ye, ku gunehên me bibaxşîne û me ji her neheqîyan paqij bike. **10** Heger em bêjin: «Me t'u guneh nekiryê», em wî derewîn derdixin û xebera wî ne nava meda ye.

ÎSA MESÎH QENCBÊJÊ ME YE

2 **1** Lawên min, ez vê yekê *wer'a* dinivîsim, ku hûn gunehan nekin, lê heger yek guneh bike, li cem Bavê qencbêjê me Îsa Mesîhê heq heye. **2** Ew e *qurbana* baxşandina gunehên me û ne t'enê gunehên me, lê gunehên t'emamîya dinyayê jî.

3 Heger em t'emîyên wî biqedînin, bi wê yekê em zanin, ku em wî nas dîkin. **4** Yê dibêje: «Ez wî nas dikim», lê t'emîyên wî naqedîne, ew derewîn e û nava wîda rastî t'une. **5** Lê yê xebera wî diqedîne, hizkirina Xwedê rast nava wîda t'emam e û bi vê yekê em zanin em nava wîda ne: **6** Yê dibêje: «Ez nava wîda me», ew gerekê usa bijî, çawa Îsa jît.

T'EMÎYA KEVN Û NÛ

7 Delalfiyên min, ez ne ku t'emîke nû *wer'a* dinivîsim, lê wê t'emîya kevn, ku berê pêşda hûn wê zanin. T'emîya kevn ew xeber e, ya ku we pêşda bihîstye. **8** Lê usa jî ez t'emîke nû *wer'a* dinivîsim, rastîya k'îjanê çawa nava wîda, usa jî nava wêda *k'ifş e*. Çimkî tarî derbaz dibe û ronaya rast îdî tê k'ifşê.

9 Yê dibêje: «Ez nava ronayêda me», lê birê wî ber ç'evan reş e, ew hela hê nava tarîyêda ye. **10** Yê ku birê xwe hiz dike, ew nava ronayêda dimîne û nabe bayîsê jirêk'etînê. **11** Lê yê ku birê wî ber ç'evan reş e, ew nava tarîyêda ye, li tarîyêda digêr'e û nizane k'uda diçe, çimkî tarîyê ç'evên wî kor kiryê.

12 *Wer'a* dinivîsim, lawno, çimkî bi saya navê wî gunehên we afû bûne. **13** *Wer'a* dinivîsim, bavno, çimkî hûn wî nas dîkin, yê ku serê-sêrîda heye. *Wer'a* dinivîsim, cahilno, çimkî Yê Xirab li ber we da der. **14** *Wer'a* dinivîsim xortno, çimkî hûn Bavê nas dîkin. *Wer'a* dinivîsim, bavno, çimkî hûn wî nas dîkin, yê ku serê-sêrîda heye. *Wer'a* dinivîsim, cahilno, çimkî hûn qewat in û xebera Xwedê nava wêda dimîne û Yê Xirab li ber we da der.

DINYAYÊ HIZ NEKIN

15 Dinyayê hiz nekin û ne jî çî ku dinyayêda ne. Heger yek dinyayê hiz dike, dilê wîda hizkirina Bavê t'une. **16** Çimkî her çî ku dinyayêda ne, dilhaviyîyên bedenê ne, haviyîyên ç'evan û k'ubar-babaxîya vê jîyînê ne, ew ne ji Bavê ne, lê ji vê dinyayê ne. **17** Dinyayê jî derbaz be, haviyîya wê jî, lê yê ku daxaza Xwedê diqedîne, ewê heta-ha-tê bimîne.

HEVZA XWE JI EKSÎMESÎHAN BIKIN

18 Lawno, *eva* zamanê axirîyê ye. Û çawa we bihîstye, ku eksîmesîh wê bê, îdî gelek eksîmesîh hatine. Ji wê

yekê jî em zanin, ku waxtê axirîyê ye. ¹⁹ Ji nava me *hinek* derk'etin, lê ew ne ji me bûn, çimkî heger ew ji me bûna, wê t'evî me bimana. Lê *eva usa bû*, ku k'ifş be, ku *civînêda* ne hemû kes ji me bûn.

²⁰ Lê hûn ji ewî Pîroz hatine gulrûnkirinê û her tiştî zanin. ²¹ Ez wer'a nanivîsim, yanê hûn rastîyê nizanin, lê hûn zanin, usa jî zanin, ku hemû derew ne ji rastîyê ye. ²² K'î ye derewîn? Heger ne ew, yê înk'ar dike ku: «Îsa ne Mesîh e». *Hema* ew e eksîmesîh, yê ku Bav û Kur' înk'ar dike. ²³ Ewê ku Kur' înk'ar dike, t'evgirêdana wî Bavêra t'une. Lê yê ku Kur' îqrar dike, t'evgirêdana wî Bavêra heye.

²⁴ Awa çî ku we pêşda bihîstye, bira nava weda bimîne. Heger ew tiştê ku we pêşda bihîstye nava weda bimîne, hûnê jî nava Kur' û Bavêda bimînin. ²⁵ Û ev e ew sozê ku wî da me~ jîyîna heta-ha-tê.

²⁶ Ez vê yekê bona wê yekê wer'a dinivîsim, ku t'u kes we nexalifîne. ²⁷ Lê hûn ji Mesîh *bi Ruh* hatine gulrûnkirinê, ku nava weda dimîne. Îdî ne hewce ye, ku yek we hîn bike, çimkî hema ew Ruh bona her tiştî we hîn dike û hînkirina wî rast e, ne derew e. Çawa ewî hûn hînkirin, usa nava wîda bimînin.

²⁸ Belê lawno, nava Mesîhda bimînin, ku çaxê ew k'ifş be, em ji hatina wî venek'işin û li dema hatina wî em rûreş nebin. ²⁹ Heger hûn zanin, ku ew rast e, usa jî bizanibin, her k'ê ku rastîyê dike, ew ji wî bûye.

K'EREMA JI HIZKIRINA XWEDÊ

3 ¹ *Hela* binihêrin, Bavê çawa em hiz kirin û bona me k'ereke çawa kir, ku em lawên Xwedê bêne gotinê û usa jî heye, lema dinya me nas nake, çimkî ew nas nekir. ² Delalîyên min, niha em lawên Xwedê ne û hela hê em nizanin *paşê* emê bibine çî, lê em vê yekê zanin, ku çaxê Îsa k'ifş be, emê bibine mîna wî, çimkî emê wî usa bibînin, çawa ew heye. ³ Her k'ê ku bona vê yekê wîda guman e, ew xwe usa paqij dike, çawa Mesîh paqij e.

⁴ Her k'ê ku guneh dike, ew Qanûna *Xwedê* dit'eribîne û guneh hema qanûnt'eribandin e. ⁵ Û hûn zanin, ku bona wê yekê Mesîh k'ifş bû, ku gunehan hilde û nava wîda guneh t'une. ⁶ Her k'ê ku nava wîda dimîne, ew nava gunehanda namîne, lê her k'ê ku nava gunehanda dimîne, ewî ne ew dîtye, ne jî ew nas kirye.

⁷ Lawno, bira t'u kes we nexapîne. K'ê rastîyê dike, ew yekî rast e, çawa Îsa rast e. ⁸ K'ê nava gunehanda dimîne, ew ji Şeytan e, çimkî Şeytan ji berê pêşda guneh dike. Bona vê yekê Kur'ê Xwedê k'ifş bû, ku kirinên Şeytan xirab ke. ⁹ Her k'ê ku ji Xwedê bûye, *lawê wî ye*, ew nava gunehanda namîne, çimkî binyata Xwedê nava wîda dimîne û ew nikare nava gunehanda bimîne, çimkî ji Xwedê bûye. ¹⁰ Lawên Xwedê û lawên Şeytan bi vê yekê ji hev tene firqîkirinê~ Yê ku rastîyê nake, ew ne ji Xwedê ye, usa jî ew *ne ji Xwedê ye* k'ê birê xwe hiz nake.

HEVDU HIZ BIKIN

¹¹ Ev e ew gotin, ya ku berê pêşda we bihîstye~ Em gerekê hevdu hiz bikin. ¹² Ne ku mîna Qayîn, ku ji Yê Xirab bû û birê xwe kuşt. Bona çî ew kuşt? çimkî kirinên wî xirab bûn, lê yê birê wî qenc.

¹³ Ecêb nemînin, gelî birano, heger hûn ber ç'evê dinyayê reş bin. ¹⁴ Em zanin, ku ji mirinê em derbazî nava jîyînê bûne, çimkî em birayên xwe hiz dikin. Yê birayê xwe hiz nake, ew nava mirinêda dimîne. ¹⁵ Her k'ê ku birê wî ber ç'evan reş e, ew merivkuj e û hûn zanin, ku nava t'u merivkujîda jîyîna heta-ha-tê t'une. ¹⁶ Em bi vê yekê hizkirinê hesîyan~ Îsa bona me jîyîna xwe da. Em jî gerekê bona birayên xwe jîyîna xwe bidin. ¹⁷ Lê heger yek hebûka wîye vê dinyayê hebe û birê xwe hewcê tişteki dibîne, dilê wî ser naşewite, hizkirina Xwedê çawa dikare dilê wîda bimîne? ¹⁸ Lawno, em ne ku bi xeber yan zarê xwe hiz bikin, lê bi k'arê xwe û rastîyê. ¹⁹ Belê, bi vê yekê emê bizanibin, ku em ji rastîyê ne û emê bikaribin bi dilekî rihet li ber hizûra Xwedê bisekinin. ²⁰ Û heger dilê me, me neheq ke, Xwedê ji dilê me mestir e û haş ji her tiştî heye. ²¹ Delalîyên min, heger dilê me, me neheq neke, em dikarin turuş bikin li ber hizûra Xwedê bisekinin. ²² Û em çî bixazin, emê jê bistînin, çimkî em t'emîyên wî diqedînin û tiştên ku li wî xaş tîn wan dikin. ²³ Ev e t'emîya wî, ku em bawerîya xwe navê Kur'ê wî Îsa Mesîh bînin û em hevdu hiz bikin, çawa wî t'emî da me. ²⁴ Yê t'emîyên wî diqedîne, ew nava Xwedêda dimîne, Xwedê jî nava wîda. Û em bi vê yekê zanin, ku Xwedê nava meda dimîne, bi wî Ruhê ku wî daye me.

RUHÊ RASTÎYÊ Û RUHÊ XAPANDINÊ

4 ¹ Delalîyên min, bawerîya xwe her ruhî neynin, lê wan ruhan bicêribînin, ku gelo ji Xwedê ne? çimkî li dinyayê gelek p'exemberên derew derk'etine. ² Hûn bi vê yekê dikarin Ruhê Xwedê nas bikin: Her ruhê ku Îsa Mesîh bi bedenî hatî îqrar dike, ew ji Xwedê ye. ³ Lê her ruhê ku Îsa bi bedenî hatî îqrar nake, ew ne ji Xwedê ye. Ew ji eksîmesîh e, bona k'îjanî we bihîstibû, ku wê bê û îdî li dinyayêda ye.

⁴ Hûn ji Xwedê ne, lawno û hindava wanda serdest derk'etin, çimkî ew Ruhê nava weda ji wî ruhê ku nava dinyayêda ye mestir e. ⁵ Ew ji dinyayê ne, lema li ser dinyayê xeber didin û dinya guhdarîya wan dike. ⁶ Em ji Xwedê ne. Yê Xwedê nas dike, ew guhdarîya me dike. Yê ne ji Xwedê ye, ew guhdarîya me nake. Bi vê yekê em Ruhê rastîyê û ruhê xapandinê ji hev derdixin.

XWEDÊ HIZKIRIN E

⁷ Delalîyên min, em hevdu hiz bikin, çimkî hizkirin ji Xwedê ye, her k'ê ku hiz dike ew ji Xwedê bûye~ *lawê wî ye* û wî nas dike. ⁸ Yê ku hiz nake ew Xwedê nas nake, çimkî Xwedê hizkirin e. ⁹ Bi vê yekê hizkirina Xwedê hindava meda k'ifş bû, çaxê wî Kur'ê xweyî tayê-t'enê şande dinyayê, ku bi wî em bijîn. ¹⁰ Hizkirin vê yekêda ye,

ne ku me Xwedê hiz kir, lê ewî em hiz kirin û Kur'ê xwe şand, ku bi wî gunehên me li me bêne baxşandinê. ¹¹ Delalîyên min, heger Xwedê aha em hiz kirin, gerekê usa jî em hevdu hiz bikin. ¹² T'u kesî Xwedê t'u caran ne dîtye. Heger em hevdu hiz dikin, Xwedê nava meda dimîne û hizkirina wî dilê meda t'emam e.

¹³ Bi vê yekê em zanin, ku em nava wîda dimînin û ew jî nava meda, ku wî Ruhê xwe daye me. ¹⁴ Me dît û em şehdetîyê didin, ku Bavê Kur'ê xwe şand, ku bibe Rizgarkirê dinyayê. ¹⁵ Heger yek îqrar dike, ku Îsa Kur'ê Xwedê ye, Xwedê nava wîda dimîne û ew jî nava Xwedêda. ¹⁶ Awa em pê hesîyan û me bawer kir, ku Xwedê me hiz dike.

Xwedê hizkirin e û k'ê nava hizkirinêda dimîne, ew nava Xwedêda dimîne û Xwedê jî nava wîda. ¹⁷ Û bi vî cûreyî hizkirin dilê meda t'emam e, ku Roja Dîwankirinêda em bêy tirs bin, çimkî Mesîh vê dinyayêda çawa bû, usa jî em in. ¹⁸ Hizkirinêda tirs t'une, lê hizkirina t'am tirsê dîr dixê, çimkî *li k'u* tirs heye, li wir ceza heye û k'ê ditirse, ew hizkirinêda hê ne t'am e.

¹⁹ Em hiz dikin, çimkî pêşda ewî em hizkirin. ²⁰ Heger yek bêje: «Ez Xwedê hiz dikim», lê birê wî ber ç'evan reş e, ew derew dike. Heger ew birê xweyî ku dibîne hiz nake, çawa wê bikaribe Xwedê hiz bike, k'îjanî nabîne? ²¹ Ewî ev t'emî daye me~ Ewê ku Xwedê hiz dike, ew gerekê birê xwe jî hiz bike.

QEWATA BAWERÎYA NAVÊ ÎSA MESÎH

5 ¹ Her k'ê bawer dike, ku Îsa Mesîh e, ew ji Xwedê bûye~ *lawê wî ye* û her k'ê ku Bavê hiz dike, ew lawên wî jî hiz dike. ² Bi vê yekê em zanin, ku em lawên Xwedê hiz dikin, çaxê em Xwedê hiz dikin û t'emîyên wî diqedînin. ³ Çimkî ev e hizkirina meye hindava Xwedêda, ku em t'emîyên wî diqedînin. Û t'emîyên wî ne giran in, ⁴ çimkî her k'ê ku ji Xwedê bûye, ew dinyayê bindest dike. Û bawerîya me ye, ku dinyayê bindest dike. ⁵ Gelo k'ê dinyayê bindest dike, ew, yê ku bawer dike, ku Îsa Kur'ê Xwedê ye.

ŞEHDETÎYA BONA ÎSA MESÎH Û JÎYÎNA HETA-HA-TÊ

⁶ Ev e, yê ku bi xûn û avê hat~ Îsa Mesîh, ne t'enê bi avê, lê bi xûn û avê. Û Ruh e, ku şehdetîyê dide, çimkî Ruh rastî ye. ⁷ Û ev her sê ne, ku şehdetîyê didin~ ⁸ Ruh, av û xûn. Û şehdetîya van yek e. ⁹ Heger em şehdetîya merivan hildidin, şehdetîya Xwedê hê zêde ye, çimkî ev e şehdetîya Xwedê, ku bona Kur'ê xwe şehdetî da. ¹⁰ Yê bawerîya xwe Kur'ê Xwedê tîne, nava wîda ev şehdetî heye. Yê bawerîya xwe Xwedê nayne, ew wî derewîn derdixê, çimkî bawerîya xwe wê şehdetîyê nayne, ya ku Xwedê bona Kur'ê xwe şehdetî da. ¹¹ Û şehdetî ev e, ku Xwedê jîyîna heta-ha-tê da me û ev jîyîn nava Kur'ê wîda ye. ¹² K'ê Kur' hildaye dilê xwe, jîyîna wî heye, lê k'ê Kur'ê Xwedê hilnedaye, jîyîna wî t'une.

¹³ Van tiştan ez we bawermendên navê Kur'ê Xwedêra dinivîsim, ku hûn bizanibin, jîyîna weye heta-ha-tê heye. ¹⁴ Em bêtirs li ber Xwedê disekinîn, çimkî zanin, çi tiştê em li gora daxaza wî jê bixazin, ew me dibihê. ¹⁵ Û heger em zanin, ku çi jê dixazin ew dibihê, usa jî em zanin, ku çi em jê dixazin, emê bistînin.

¹⁶ Heger yek bibîne, ku birayê wî gunehkî berbi mirinê nekiryê, bira bona wî dua bike û Xwedê wê jîyînê bide wî, yê ku gunehê berbi mirinê nekiryê. Guneh heye, ku yê mirinê ye. Ez nabêjim, ku bona yekî aha dua bikin. ¹⁷ Her neheqî guneh e, lê guneh heye, ku ne yê mirinê ye.

¹⁸ Em zanin, ku her k'î ji Xwedê bûye ew nava gunehanda namîne, lê *Nixurîyê* Xwedê wî xwey dike û Yê Xirab nêzikî wî nabe. ¹⁹ Em zanin, ku em ji Xwedê ne û t'emamîya dinyayê bin hikumê Yê Xirabda ye. ²⁰ Lê em usa jî zanin, ku Kur'ê Xwedê hat û fem da me, ku em Yê Rast nas bikin. Belê, em nava Ewî Rastda ne~ nava Kur'ê wî Îsa Mesîhda. Ev e Xwedêyê rast û jîyîna heta-ha-tê.

²¹ Lawno, xwe ji p'ûtp'aristîyê dîr bigirin.

NAMA YÛHENNAYE DUDAN

PÊŞGOTIN

Yûhenna çawa berpirsyarê civînê vê nama xwe «Xanimeke bijartî û zar'okên wêr'a» dinivîse. Hinek aha fem dikin, ku ew civînê û endemên wêra dinivîse. Fikira namêye sereke ew e, ku bawermend nava rastîyêda bimînin, hevdu hiz bikin û ji dersdarên şaş dîr bin, yên ku Îsa Mesîh bi bedenî hatî qebûl nakin.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1-3)

Serê t'emîyê hizkirin e (4-6)

H'evza xwe ji dersdarên şaşê derew bikin (7-13)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ji berpirsyarê civînê Xanima bijarera û lawên wêr'a, k'îjanan ez bi rastîyê hiz dikim û ne ku t'enê ez, lê ew hemû jî, yên ku rastîyê nas dikin, ² wê rastîya ku nava meda dimîne û heta-ha-tê wê t'evî me be. ³ Bira rehm, k'erem û haştî ji Bav Xwedê û Îsa Mesîhê Kur'ê Bavê, bi rastîyê û hizkirin mer'a be.

RASTÎ Û HIZKIRIN

⁴ Ez gelekî şa bûm, gava min ji lawên te hinek dîtin, ku ew nava rastîyêda dijîn~ li gora wê t'emîya ku me ji Bavê standye. ⁵ Niha, Xanimê, ez hîvî ji te dikim~ t'emîke nû ter'a nanivîsim, lê t'emîya ku berê pêşda li cem me hebû, ku ji me her kes hevdu hiz bikin. ⁶ Hizkirin ev e, ku em li gora t'emîyên wî bijîn. T'emî *jî* ew e, ya ku we hê berê pêşda bihîstye, ku hûn hizkirinêda bijîn, ⁷ çimkî gelekên ku merivan ji rê derdixin hatine dinyayê, ew Îsa Mesîh bi bedenî hatî îqrar nakin. Yên aha merivan ji rê derdixin û eksîmesîh in. ⁸ Hûn miqatî xwe bin, ku k'eda xwe unda nekin, lê maşê xwe t'emam bistînin. ⁹ Her k'ê ku nava hînkirina Mesîhda namîne, lê hindava wêda neheqîyê dike, ewî bêy Xwedê ye. Yê nava hînkirina Mesîhda dimîne, bona wî Bav jî heye, Kur' jî heye. ¹⁰ Heger yek bê cem we û vê hînkirinê neyne, hûn wî hilnedine malên xwe û silavê nedinê. ¹¹ Çimkî k'î silavê bidê, t'evî kirên wîye xirab dibe.

¹² Gelek tiştên minî wer'a binivîsim hene, lê min nexwast ser p'irtûkê bi hubirê binivîsim, çimkî gumana min heye ez xwexa bême cem we û rû bi rû wer'a xeber dim, ku şabûna me t'am be.

¹³ Lawên xûşka teye hîlbijartî silavan li te dikin.

NAMA YÛHENNAYE SISYAN

PÊŞGOTIN

Ev nama Yûhennaye sisyan xwedênasekî navê wî Gayosra hatye şandinê. Yûhenna pesinê Gayos dide, ku ewî çawa bi mêvanhizîya xwe alîk'arîya biratîyê kirye. Yûhenna hîn dike, ku em hurmeta wan gelekî bigirin, yên ku Mesîhra xizmetîyê dikin, ku em jî t'evî k'arê rastîyê bin.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1-8)

Xirabîya Dîyotrefîs (9-10)

Dîmîtrîyoyê amin (11-15)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ji berpirsyarê civînê Gayosê delalr'a, k'îjanî ez bi rastîyê hiz dikim. ² Delalîyo, ez dua dikim, ku hemû alîyanva rîya te t'imê rast be û tu sihet-qewat bî, çawa ku niha ruhê te silametîyêda ye. ³ Ez gelekî şa bûm, gava çend bira hatin û şehdetî dan, ku tu nava rastîyêda amin î, çawa ku pêşda hê rastîyêda diçûyî jî. ⁴ Şabûna mine ji vê mestir t'une, çaxê ez dibihêm, ku lawên min nava rastîyêda diçin.

⁵ Delalîyo, tu nava kirinên xwedaye hindava biranda û nenasanda amin î. ⁶ Wana şehdetîya hizkirina te ber civîna vir da. Heger tu wan usa ver'êkî çawa li Xwedê xaş tê, tiştêkî qenc dikî. ⁷ Çimkî ewana bona navê Mesîh k'etine rê û t'u tişt ji nebaweran nestandine. ⁸ Awa em gerekê yên usa qebûl kin, ku t'evî k'arê rastîyê bin.

DÎYOTREFÎS Û DÎMÎTRÎYO

⁹ Min civînêra nivîsî, lê Dîyotrefîs, ku hiz dike ser hemûyanra be, guhdarîya me nake. ¹⁰ Bona vê yekê çaxê ez bêm, ezê kirinên wî *wer'a* bêjim, ku çawa davêje me~ xeyba me dike. Bi vê yekê jî t'êr nabe, ne ku t'enê biratîyê qebûl nake, lê yên dixazin qebûl kin jî, ber wan radibe û ji civînê jî wan derdixe!

¹¹ Delalîyo, ç'ev nede xirabîyê, lê qencîyê. Ewê ku qencîyê dike, ji Xwedê ye, lê ewê ku xirabîyê dike, ewî Xwedê nedîtye. ¹² Lê bona Dîmîtrîyo hemû jî şehdetîya *qenc* didin, heta ku rastî jî. Em jî şehdetîyê didin û tu zanî, ku şehdetîya me rast e.

¹³ Gelek tiştên minî ter'a binivîsim hebûn, lê min nexwast ser p'irtûkê bi hubirê binivîsim. ¹⁴ Çimkî gumana min heye, ku zûtirekê te bibînim û emê rû bi rû hevr'a xeber din. ¹⁵ Haştî li te be. Heval-hogir silavan li te dikin. Yek-yek silavan hemû heval-hogiran bike.

NAMA CIHÛDA

PÊŞGOTIN

Bi nama xweye kin Cihûda berbir'î hemû bawermendên Îsa Mesîh dibe. Hinek şehdeyên sedsalîyên pêşin usa hesab dikin, ku nivîsk'arê vê namê Cihûdayê birayê Îsa Mesîh e, li hinek jî difikirin, ku ev Cihûda ew e, yê ku nava hesabê donzdeh şagirtên Îsada bû, ku wîr'a Cihûdayê Aqûb yan jî T'adayo digotin.

Femîna vê namê nêzikî nama Petrûse dudan e. Meremê vê namê ew e, ku pêşîya wan merivan bide girtinê, yên ku merivan dixalifînin û tiştên ner'ast hîn dikin û bi hînkirinên şaşê zîyandar k'arê ji bawerîyê didane alîkî. Cihûda gelekî sert dijene wan, lê xandevanan xwedênasan şîret dike, ku ewana guhdarîya Xwedêda bimeşin.

SERECEMA NAMÊ

Silavkirin (1-2)

Dersdarên derew û k'etina wan (3-16)

Şîret û şikirdarî (17-25)

SILAVKIRIN

1 ¹ Ji Cihûdayê xulamê Îsa Mesîh~ birayê Aqûb, wer'a, yên ku gazîkirî ne û ji Bav Xwedêda hizkirî ne û xweykirîyên Îsa Mesîh in: ² Bira rehm, haştî û hizkirin hê li ser we zêde be.

DERSDARÊN DEREW

³ Delalîyên min! T'imê min dixwast bona vê rizgarbûna meye t'omerî wer'a binivîsim. Û niha min rê têra dît ku bona vê yekê wer'a binivîsim û dil bidime we, ku hûn bona wê bawerîya ku carekê bona her t'im pîrozana hatye dayînê, şer'ê xwe bikin. ⁴ Çimkî hinek meriv dizîva k'etine nava we, ku hê pêşda bona wan *nivîsar* bû, ku wê bik'evine ber dîwanê. Ewên nep'ak li ser navê k'erema Xwedê xwe dane bênamûsîyê û Xudanê me Îsa Mesîh, Mîrê yekbit'en înk'ar kirine.

⁵ Lê ez dixazim bîname bîra we û hûn van her tiştan zanin jî, ku Xudan *pêşda* cimeta xwe ji erdê Misirê rizgar kir, paşê qira ewên ku bawer nekirin anî. ⁶ Û ew milyak'etên ku destûra *standîda* neman, lê ji cîyê xwe şihitîn, ewana bona girêdana heta-ha-tê tarîstanîyêda tene xweykirinê~ bona wê dîwana Roja giran. ⁷ Vê jî bîr nekin, ku mîna van *milyak'etan* Sodom, Gomora û bajarên der-dorên wan jî *neheqî kirin*~ qavî kirin, ç'ev berdane bedena başqe û dîwana agirîye heta-ha-tê ser xweda anîn. Evana bona me îdî bûne ders. ⁸ Usa jî ew meriv pey xewnan dik'evin, qalibê xwe diherimînin, dijenine serwêrtîyan û heyînên xwey'ûmete jorin dik'ifirin. ⁹ Lê Mixayîlê serokmilyak'et ev yek nekir. Çaxê bona cinyazê Mûsa rabû Şeytanra k'ete h'ucetê, turuş nekir bi k'ifirî dîwana wî bikira, lê got: «Bira Xudan li te hilê!» ¹⁰ Lê ev meriv serederîyê li wan tiştên ku dik'ifirin nakin, lê mîna heywanên bêzare-bêziman t'enê bi binyatî fem dikin û li halê xweyî xirabda jî unda dibin.

¹¹ Wey li wan, ku rîya Qayînda çûn, mîna Bilam xalifîn, dû qazınca xwe k'etine û mîna raberîbûna Qorax wê bela xwe bibînin. ¹² Evana mesrefên hizkirina weda lek'e ne, t'evî we bêtirs dixwin-vedixwin, t'enê zikê xwe diç'êrînin. Yên aha, e'wrên bêave ji ber bayê çûyî ne, darên payîzêye bêber in, rawanva rakirî, du car hişk bûyî û ¹³ pêlên be'rêye rabûyî ne, ku e'yba wan mîna k'efê ser dik'eve. Ew steyrkên xalifî ne, ku bona wan dûxana tarîstanîyêye heta-ha-tê xweykirî ye.

¹⁴ Henox jî, ku pey Ademra yê heftan bû, bona van merivan p'êxembertî kir û got: «Va ye Xudan t'evî pîrozên xweye bêy hesab tê, ¹⁵ ku dîwana hemûyan bike û hemû nep'akan bona hemû kirên wane nep'ak û hemû gotinên xirab neheq ke, çimkî nep'akên gunehk'ar hindava wîda xeber dan». ¹⁶ Evana merivne bîntenge p'int-p'into ne û pey xwastinên dilê xwe diçin, ji xwe mestir xeber didin û bona qazınca xwe fêlbazîyê dikin.

ŞİRET Û ŞIKIRDARÎ

¹⁷ Lê hûn delalîyên min, wan gotinên ku şandîyên Xudanê me Îsa Mesîh pêşda gotine bîr bînin, ¹⁸ ku wer'a digotin: «Rojên axirîyêda merivên qerfkir wê derên, ku wê pey dilhaviyîyên xweye nep'ak her'in». ¹⁹ Evana ew meriv in, yên ku dutîretîyê dikin û bi *cûr'ê* bînayîyê tene rêberîkirinê, ne ku bi Ruh. ²⁰ Lê hûn delalîyên min, xwe bidine ser şênkirina bawerîya xweye pîroz, bi Ruhê Pîroz dua bikin, ²¹ xwe nava wê hizkirina Xwedêye hindava xweda xwey kin, hîvîya rehma Xudanê me Îsa Mesîh bin, ku jîyîna heta-ha-tê wê bide we. ²² Hindava yên dudilîda rehm bin. ²³ Hinekan rizgar kin~ ji agir bir'evînin, dilê we bira li ser yên mayîn jî bişewite, lê miqatî xwe bin, ji jîyîna wane gunehk'are mîna k'inca lewitî zivêr bin.

²⁴⁻²⁵ Bi destê Xudanê me Îsa Mesîh, Rizgarkirê me Xwedêyê bêhimberra niha û heta-ha-tê şikirî û mezinayî, zorayî û hikum, yê ku dikare we ji k'etînê xwey bike û li ber rûmeta xwe bi şayî û bêqusûr bide sekinandinê! Amîn.

AŞKERETÛYA KU ÎSA MESÎH DA YÛHENNA

PÊŞGOTIN

Ev kitêb bi destê Yûhennayê şandîyê Îsa Mesîh hatye nivîsarê, li wî waxtê zêrandina mezinda, ku ji aliyê Împêr'atorîya Romayêda bû. Yûhenna xwexa jî hate zêrandinê û çawa mesîhî hikumeta Romayê ceza da wî û ew çawa sirgûn avîte girava Patmosê, li k'û jî ewî ev kitêb nivîsî. Ev kitêb nav dibe~ «Aşkeretî», çimkî wêda gelek dîrokên veşartî aşkere bûne, ji hingêda girtî heta axirîya dinyayê. Çi ku wê bibûna Îsa Mesîh nîşanî Yûhenna dan. Û ew aşkeretî bi dîtinokan hatine li ber ç'evê Yûhenna.

Li dîtinokanda aşkeretîyên dîrokên bi sîmvolên sur'e veşartî ne, lê bawermendên hingêra ew femdarî bûne.

Meremê Îsa Mesîh ew bû, ku bawermendan nava rastîyêda bişidîne, ber dilê wanda bê, gumanê bide wan, ku usa jî ew bikaribin sur'ên Xwedê bizanibin û nek'evine t'ela Şeytan û cêribandinêda teyax kin.

Hizkî meriv fikirên vê kitêbê cûr'e-cûr'e şirovedikin, lê dîsa fikirên sereke zelal û safî ne: Xwedê bi destê Îsa Mesîh wê xirabîyê û ner'astîyê bide hildanê û dîwana Şeytan û hemûyên ner'ast bike, lê dua-dirozge jî wê li cimeta xwe bike.

Li vê kitêbêda rewş û rûmeta Îsayê xwedetî zelal û k'ifş e. Belê, vê kitêbêda her karebûnên wiye xwedetî hatine li ber ç'evan~ Ew t'evî Bav Xwedê yekbûyî ye, li ser t'extê p'adşatîyê rûniştîye, heft ruhên Xwedê wîr'a hene, ew hizkirin e, pîroz e, herî zor e, her deran e, herî zane ye, herî serwaxt e û heta-ha-tê wê bimîne. Û ewê e'se bê, <Belê, ezê zûtirê bêm>. Amîn! Were, ya Xudan Îsa.

SERECEMA KITÊBÊ

Pêşgotin (1:1-8)

Dîtinoka pêşin û nameyên her heft civînanra (1:9-3:22)

Kitêba ku bi heft moran morkirî bû (4:1-8:1)

Heft bor'î (8:2-11:19)

Zîya û her du cinewir (12:1-13:18)

Dîtinokên din (14:1-15:8)

Heft t'asên hêrsa Xwedê (16:1-21)

Wêranbûna Babilonê, ceza cinewir, p'êxemberê derew û Şeytan (17:1-20:10)

Dîwana xilazîyê (20:11-15)

Erd, ezman û Orşelîma nû (21:1-22:5)

Hatina Îsa Mesîh (22:6-21)

PÊŞGOTIN

1 ¹ Aşkeretîya Îsa Mesîh! ya ku Xwedê da wî, ku ew wan tiştên ku gerekê zûtirekê bibin, nîşanî xulamên wî bike. Îsa jî bi destê milyak'etê xwe şand û xulamê xwe Yûhenna pê hesand. ² Ewî jî şehdetîya gotina Xwedê û usa jî şehdetîya hesandina Îsa Mesîh da, her çi ku wî dîtibû. ³ Xwezî li wî, yê vê nivîsarê bixûne û *xwezî* li wan, ewên ku xeberên vê p'êxembertîyê bibihên û çi ku vêda hatine nivîsarê dilê xweda xwey kin, çimkî waxt nêzîk e.

NAME HER HEFT CIVÎNÊN QEZA ASYAYÊR'A

⁴ Ji Yûhenna, her heft civînanr'a, yên ku qeza Asyayêda ne: K'erem û haştîya wî li we be, ji Yê ku heye, hebû û wê bê û ji her heft ruhên ku li ber t'extê wî ne, ⁵ usa jî ji Îsa Mesîhê şehdeyê amin, nixurîyê ji nava mirîyan û mîrê p'adşên dinyayê, yê ku me hiz dîke û bi xûna xwe em ji gunehên me aza kirin ⁶ û em kirin k'ahînen p'adşatîyê, ku Bavê wî Xwedêr'a em xizmetîyê bikin. Bira rûmet û zorayî ya wî be heta-ha-tê, Amîn!

⁷ Wê e'wranva ew tê. Her ç'ev wê wî bibîne, heta ewên ku neksa wî qul kirin jî. Her miletên dinyayê wê li ser wî şîn û k'eder bin. Belê. Amîn!

⁸ «Ez Alfa û Omêga me», Xudan Xwedêyê Xweyhikumê li ser her heyînan dibêje, Yê ku heye, hebû û wê bê.

DÎTINOKA PÊŞIN

⁹ Ez Yûhennayê birayê we, bi Îsa hevalp'arê weye wê tengasîyê, p'adşatîyê û sebirê me. Ez bona xebra Xwedê û şehdetîya bona Îsa wê giravêda bûm, k'îjanêr'a Patmos dibêjin. ¹⁰ Roja Xudanda~ *yekşemê* Ruhê Pîroz hate ser min û min li pişt xweva dengêkî bilindî mîna dengê bor'îyê bihîst, ¹¹ ku digot: «Çi tiştê tu dibînî, kitêbêda binivîse û her heft civînanr'a bişîne, yên ku li bajarên Efesê, Simîrnayê, Pergamayê, Tiyatîrayê, Sardesê, Filadêlfayê û Lawdikayêda ne».

¹² Ez ser wî dengêda vegeryam, ku binihêrim, k'a k'î ye minr'a xeber dide û gava ez vegeryam, min heft şemdanên zêr'în dîtin. ¹³ Nava wan şemdananda jî min «yekî mîna Kur'ê mêriv dît», k'inceke dirêj lê bû û bersîngekî zêr'în li ber sîngê wî girêdayî bû. ¹⁴ P'or'ê serê wî mîna hirîya qerqaş û mîna berfê sipî bû, ç'evên wî jî mîna alava êgir. ¹⁵ Nîgên wî mîna sifirê xasî ji k'ûra agir derxistî bû, ku dibiriqe û dengê wî mîna dengê *xule-xula* gelek avan bû. ¹⁶ Destê wîyî rastêda heft steyrk hebûn û ji devê wî şûrekî dudevîyî tûj derdik'et. Rûyê wî mîna te'vê bû, ku bi t'emamîya qewata xweva dibiriqe. ¹⁷ Gava min ew dît, ez mîna mirîkî k'etime ber nîgên wî. Ewî destê xweyî rastê danî ser min û gote min: «Netirse, ez im Yê Pêşin û Paşin. ¹⁸ Ez yê zêndî me. Ez ew im, ku mir im, lê va ye zêndî me heta-ha-tê. Û k'ilît-miftên Mirinê û Cenimê destê mînda ne. ¹⁹ Awa çi tu dibînî binivîse, ku niha çi hene û çi wê paşê bibin. ²⁰ Sûra van steyrkên ku te destê minî rastêda dîtin, usa jî her heft şemdanên zêr'în ev e: Ew her heft steyrk, milyak'etên her heft civînan in û ew her heft şemdan, her heft civînan in.

T'EMÎ Û ŞÎRETÊN LI CIVÎNA BAJARÊ EFESÊR'A

2 ¹ Milyak'etê civîna Efesêr'a binivîse: Ewê ku heft steyrk destê wîyî rastêda ne û nava heft şemdanên zêr'înda

diger'e, aha dibêje: ² Ez haş ji kirinên te, xebata te û sebira te heme. Zanim, ku xweyê *kirên* xirab li te xaş nayên. Te ew jî cêribandin, yên ku xwe şandî hesab dikin, lê rast ne usa ne, te dît ku ew derewîn in. ³ Sebira te heye, bona navê min te *te'î-tengî* dît û newestîyayî. ⁴ Lê gazineke min hindava teda heye, te dest ji hizkirina xweye berê kirye. ⁵ Awa niha bîne bîra xwe, tu ji k'u k'etî û ji gunehkirinê vegere, kirinên xweye pêşîyê bike. Heger na, ezê bême cem te û şemdana te ji cî derxim. ⁶ Lê tişteki baş li cem te heye, ku tu miqabilî wan kirinên nîkolyôyan î, çawa ku ez jî miqabil im. ⁷ Guhên k'ê hene, bira bibihê, k'a Ruh çî dibêje civînan. Yê serdest dertê, ezê destûrê bidime wî, ku ji wê dara jîyînê bixwe, ya ku buhişt Xwedêda ye.

T'EMÎ Û ŞİRETÊN LI CIVÎNA BAJARÊ SIMÎRNAYÊR'A

⁸ Milyak'etê civîna Simîrnayêra binivîse: Yê Pêşin û Paşin, ewî ku mir û ji nava mirîyan zêndî bû aha dibêje: ⁹ Ez haş ji tengasî û feqîrîya te heme, lê tu dewlemend î! Usa jî ez haş ji bêhurmetkirina wan heme, yên ku bona xwe dibêjin: <Eme cihû ne>. Ew ne cihû ne, lê ji k'oma Şeytan in. ¹⁰ Ji wan te'î-tengîyan netirse, yên ku wê bêne serê te. Va ye Şeytan wê ji we hinekan bavêje hebsê, ku hûn bêne cêribandinê û hûnê dehe rojan te'î-tengîyê bibînin. heta mirinê amin bimînin û ezê t'acgulîya jîyînê bidime we. ¹¹ Guhên k'ê hene, bira bibihê, k'a Ruh çî dibêje civînan. Yê serdest dertê, ewê ji mirina dudan zirarê nek'eve.

T'EMÎ Û ŞİRETÊN LI CIVÎNA BAJARÊ PERGAMAYÊR'A

¹² Milyak'etê civîna Pergamayêra binivîse: Ewê ku şûrê wîyî dudevîyî tûj heye aha dibêje: ¹³ Ez haş ji te heme, ku tu li k'u derê dimînî, belê, li wê dera ku t'extê Şeytan lê ye. Tu navê min qewîn digirî û te bawerîya xweye hindava minda wan rojanda jî înk'ar nekîr, gava şehdeyê minî amin~ Antîpas nava weda hate kuştinê, wê dera ku Şeytan lê dimîne. ¹⁴ Lê gazineke min hindava teda heye, li wir hinek merivên te hene, ku pey hînkirina wî Bilamî diçin, yê ku Balaq hîn kir, ku lawên Îsraêl ji rê derxe, ku ew qurbanên p'ûtan bixwin û bênamûsîyê bikin. ¹⁵ Usa jî hinekên cem te pey hînkirina nîkolyôyan diçin ku ez miqabil im. ¹⁶ Awa vegere, heger na, ezê zûtirê bême cem te û bi şûrê devê xwe wan merivanra bik'evime nava şer'. ¹⁷ Guhên k'ê hene, bira bibihê, k'a Ruh çî dibêje civînan. Yê serdest dertê, ezê ji wî manayê veşartî bidimê û usa jî kevirêkî sipî, ku navekî nû wê li ser nivîsar be û t'u kesê wî navî nizanibe, pêştirî wî, k'ê wî kevirî bistîne.

T'EMÎ Û ŞİRETÊN LI CIVÎNA BAJARÊ TİYATIRAYÊR'A

¹⁸ Milyak'etê civîna Tiyatîrayêra binivîse: Kur'ê Xwedê aha dibêje, yê ku ç'evên wî mîna alava êgir in û nigên wî mîna wî sifirê xasî birqok e: ¹⁹ Ez haş ji kirinên te, hizkirina te, bawerî, xizmetî û sebira te heme. Ez zanim, ku kirinên teye paşwaxtîyê ji yên pêşîyê zêdetir in. ²⁰ Lê gazineke min hindava teda heye, ku tu wê k'ulfetê~ Îzabêlê sebir dikî, ku xwe p'êxember hesab dike. Ew bi hînkirina xwe xulamên min ji rê derdixe, ku bênamûsîyê bikin û qurbanên p'ûtan bixwin. ²¹ Min waxt da wê, ku ew ji gunehkirinê vegere, lê ew naxaze destê xwe ji bênamûsîya xwe bik'îşîne. ²² Va ezê wê bavêjime nava cî-nivînê û yên ku wêra bênamûsîyê jî dikin, bikime halekî giran, heger ji kirinên xwe venegerin. ²³ Ezê lawên wê xim bikujim û hemû civîn wê bizanibin, ku ez ew im, yê ku dil û nêt-fikiran vedinihêrim. Ezê li anegorî kirinên we her yekî bidime we. ²⁴ Lê wer'a, yên mayîne ku Tiyatîrayêda ne, ez dibêjim, yên ku pey vê hînkirina şaş nek'etine, hizkî ew <Sur'ên Şeytane K'ûr> nizanin, çawa ku ew *bona* we dibêjin. Lê ezê barekî zêde nedime ser milê we, ²⁵ lê t'enê çî we heye qewîn bigirin, heta ku ez bême. ²⁶ Yê serdest dertê û heta axirîyê kirinên min xwey bike, ezê hikumê li ser miletan bidime wî ²⁷ û ewê bi kewazê hesinî şivantîyê li wan bike û mîna firaqên ji axê bip'îşîrîne, ²⁸ bi wî hikumê ku min jî ji Bavê xwe hildaye. Û ezê steyrka sibêye zû bidime wî. ²⁹ Guhên k'ê hene, bira bibihê, k'a Ruh çî dibêje civînan.

T'EMÎ Û ŞİRETÊN LI CIVÎNA BAJARÊ SARDESÊR'A

3 ¹ Milyak'etê civîna Sardesêra binivîse: Ewê ku heft ruhên Xwedê û heft steyrkên wî hene, aha dibêje: Ez haş ji kirinên te heme, navê te heye yanê tu zêndî yî, lê bi rastî tu mirî yî. ² Hişyar be û usa bike, ku ewên li cem teyî ber mirinê ser xweda bîn, çimkî min kirinên te li ber Xwedêyê xwe t'am nedîtîn. ³ Niha bîr bîne, ku te çawa standye û bihîstye, *hema* usa jî bike û t'obe ke. Lê heger tu hişyar nebî, ezê mîna dizekî ser teda bigirim û tuê qet nizanibî, ku ezê k'îjan sihetêda ser teda bigirim. ⁴ Lê Sardesêda çend kesên te hene, ku wan k'incên xwe nelewitandine. Ewê bi k'incên çîle-qerqaş t'evî min biger'in, çimkî ew hêja ne. ⁵ Yê serdest dertê, ewê aha k'incên çîle-qerqaş li xwe wergire. Ezê navê wî ji kitêba jîyînê ret nekîm û navê wî li ber Bavê xwe û li ber milyak'etên wî aşkere bikim. ⁶ Guhên k'ê hene, bira bibihê, k'a Ruh çî dibêje civînan.

T'EMÎ Û ŞİRETÊN LI CIVÎNA BAJARÊ FILADÊLFAYÊR'A

⁷ Milyak'etê civîna Filadêlfayêra binivîse: Yê pîroz, yê rast aha dibêje, yê ku xweyê k'îlît-mifta Dawid e, ku vedike t'u kes nîne, ku dade û dadide t'u kes nîne, ku veke: ⁸ Ez haş ji kirinên te heme. Va ye min derikî vekirî danîye ber te, ku t'u kes nikare dade. Ez zanim, ku qewata te hindik e û tu pey xebera min çuyî û te navê min înk'ar nekîr. ⁹ Binihêre, hineke ji k'oma Şeytan hene, yên ku dibêjin: <Eme cihû ne>, lê bi rastî ne cihû ne, ew derew dikin. Va ye ezê p'êyî ser wan bikim, ku bîn û li ber nigên te ta bin û bizanibin, ku ez te hiz dikim. ¹⁰ Te ku t'emîya min xwey kir û sebir kir, ezê jî te wî waxtê cêribandinêda xwey bikim, ya ku wê bê li ser t'emamîya dinyayê, ku binelîyên li rûbarî dinyayê bicêribîne. ¹¹ Ezê zûtirekê bême, çî te heye qewîn bigire, ku t'u kes

t'aculîya te ji te hilnede. ¹² Yê serdest dertê, ezê p'aristxana Xwedêyê xweda wî bikime stûn û ewê îdî dernek'êve der. Ezê li ser wî navê Xwedêyê xwe, usa jî navê bajarê Xwedêyê xwe, navê Orşelîma nû binivîsim, ya ku ji Xwedêyê min, ji ezmên wê bê xwarê û ezê navê xweyî nû jî li ser wî binivîsim. ¹³ Guhên k'ê hene, bira bibihê, k'a Ruh çî dibêje civînan.

T'EMÎ Û ŞİRETÊN LI CIVÎNA BAJARÊ LAWDIKYAYÊR'A

¹⁴ Milyak'etê civîna Lawdikiyayêra binivîse: <Yê Amîn> aha dibêje, ew şehdeyê rast û amin, ç'evkanîya efirîn û xuliqîyên Xwedê: ¹⁵ Ez haş ji kirinên te heme, tu ne sar î û ne jî germ î. Xwezî tu yan sar bûyayî yan jî germ. ¹⁶ Lê çimkî tu golî yî, ne sar î û ne jî germ, ezê te ji devê xwe birêjim. ¹⁷ Tu dibêjî: <Ez dewlemend im û gelekî pêşda çûme, hewcê qet t'u tiştî nîme>. Lê nizanî, ku tu reben î, sêfîl, feqîr, kor û tazî yî. ¹⁸ Ez vî şîretî didime te: Zêr'ê bi agir cêribandî û *paqîj* ji min bik'ir'e, ku tu dewlemend bî û k'incên çîle-qerqaş ji min bik'ir'e, ku li xwe kî û şerma tazîbûna te bê nixamtinê, usa jî dermanê ç'evan *bik'ir'e*, ku li ç'evên xwe dî û bibînî. ¹⁹ Ez k'ê hiz dikim li wî hiltêm û şîret dikim. Bona vê yekê xîret ke û ji gunehkirinê vegere! ²⁰ Va ye ez li ber derî sekinî me û dêrî dixim. Heger yek dengê min bibihê û dêrî li ber min veke, ezê her'ime hindur û ez û ew~ emê hev'r'a şîvê bixwin. ²¹ Yê serdest dertê, ezê destûrê bidimê, ku t'evî min ser t'extê min rûnê, çawa ku ez serdest derk'etim û t'evî Bavê xwe ser t'extê wî rûniştim. ²² Guhên k'ê hene, bira bibihê, k'a Ruh çî dibêje civînan».

T'EXTÊ EZMÊNDA

4 ¹ Pey van tiştanra min nihêrî, wê ezmênda derîk vekirî ye. Û ew dengê mîna dengê bor'îyê, ku min berê bihîstibû gote min: «Rabe were vê jorê, ezê wan tiştên ku ji vir hada gerekê bibin nîşanî te bikim». ² Hema hingê Ruhê *Pîroz* hate ser min, min nihêrî, wê t'extek li ezmên hebû û yek li ser t'ext rûniştî bû. ³ Û *şewqa* dîndara ye rûniştî mîna ya kevîrê yaspîs û sardîyon bû. K'eskesorê jî dora t'ext girtibû, mîna şewqa zimrûde.

⁴ Li dora wî t'extî bîst û çar k'ursî hebûn û li ser wan k'ursîyan bîst û çar rûspî rûniştibûn. K'incên çîle-qerqaş li wan bûn û t'aculîyên zêr'în jî li serên wan bûn. ⁵ Ji t'ext birûsk û dengên gur'înîya e'wr-ezmanan derdik'etin. Heft şemdanên bi agir-alava gur'bûyî li ber t'ext hebûn, yên ku her heft ruhên Xwedê ne. ⁶ Li ber t'ext *mezîleke* mîna be'reke şûşe hebû, mîna xirûstala zelal. Lê li dora t'ext çar ruhber hebûn, ku pêşîyê û piştêva bi ç'evanva xim-ximî bûn. ⁷ Ruhberê pêşin mîna şêr bû, ruhberê dudan mîna canege bû, ruhberê sisyan rûyê wî mîna rûyê mêriv bû û ruhberê çaran jî mîna teyrê ku difir'e bû. ⁸ Ew her çar ruhber jî bi şeş baskan bûn û ew *bask* jî serva û binva bi ç'evanva xim-ximî bûn. Û şev û roj dengê xwe nedibir'în digotin: «Pîroz, pîroz, pîroz e, Xudan Xwedêyê Xweyhikumê li ser her heyînan, Yê ku hebû, heye û wê bê».

⁹ Çaxê wan her çar ruhberan, rûmet, hurmet û şikîrî didane Ewî li ser t'ext rûniştî, Yê ku heta-ha-tê zêndî ye, ¹⁰ ew her bîst çar rûspî xwe deverûya davîtine ber t'ext û Yê heta-ha-tê zêndî dihebandin, t'aculîyên xwe davîtin ber t'ext û digotin: ¹¹ «Ya Xudan, tu hêja yî, ku rûmetê, hurmetê û zorayê hildî *destê xwe*, çimkî her tişt te efirandin, bi daxaza te ew çêbûn û hene».

KITÊBA GULOMATKE MORKIRÎ

5 ¹ Hingê min destê wîyî rastêda, Yê ku li ser t'ext rûniştibû, kitêbeke gulomatkirî dît, ku her du alîyanva hatibû nivîsarê û bi heft moran hatibû morkirinê. ² Min nihêrî, wê milyak'etekî qewat bi dengê bilind digot: «K'î ye hêja, ku morên vê kitêbê jê rake û kitêbê veke»? ³ Lê t'u kes t'unebû, ne li ezmên, ne li ser erdê û ne jî binê erdêda, ku bikaribûya ev kitêb vekira û lê binihêya. ⁴ Ez jî k'ele-k'el digirîyam, ku yekî hêja nehate dîtinê, ku ew kitêb vekira lê binihêya. ⁵ Hingê ji rûspîyan yekî gote min: «Negirî! Va ye Şêrê ji qebîla Cihûda, ye ji k'oka Dawid serdest derk'et û dikare her heft morên wê kitêbê rake û wê veke».

⁶ Hingê min nihêrî, wê li goveka wî t'extîda, ku her çar ruhberan û *bîst çar* rûspîyan dorê girtibûn, Berek sekinî bû, çawa ku serjêkirî be. Heft stirûyên wî û heft ç'evên wî hebûn, ew her heft ruhên Xwedê ne, ku berbi t'emamîya dinyayê hatine şandinê. ⁷ Ew *Berx* hat û kitêb ji destê wîyî rastê, Yê ku li ser t'ext rûniştibû hilda. ⁸ Gava wî ew hilda, ew her çar ruhber û her bîst çar rûspî li ber wî Berxî deverûya xwe avîtin. Destê her yekîda çeng û t'asên zêr'îne bixûrêva t'ije hebûn. Ew bixûr duayên pîrozan e. ⁹ Wan stiraneke nû distiran digotin: «Tu hêja yî, ku wê kitêbê hildî û morên wê jê rakî. Çimkî tu hatî serjêkirinê û bi xûna xwe te bona Xwedê ji her berekê, ji her zimanî, ji her cimê û ji her miletî *meriv* k'ir'în ¹⁰ û ew bona xizmetk'arîya Xwedê kirin p'adşatîya k'ahînan û ewê li ser dinyayê p'adşatîyê bikin».

¹¹ Hingê min nihêrî û dengê gelek milyak'etan bihîst, ku wan dora t'ext, dora wan ruhberan û rûspîyan girtibû. Hesabê wan digihîşte hezaran û mîlîyonan. ¹² Wana bi dengê bilind distiran digotin: «Ew Berxê serjêkirî hêja ye, ku qewatê, dewlemendîyê, serwaxîyê, karebûnê, hurmetê, rûmetê û pesinê bîstîne».

¹³ Min bihîst, ku hemû efirînan~ yên li ezmên, li ser erdê, yên bin erdê, yên be'rêda, her çî ku nava wanda hebûn, distiran û *digotin*: «Bira heta-ha-tê pesin, hurmet, rûmet û qewat li Yê ser t'ext rûniştî û usa jî li wî Berxî be!» ¹⁴ Û wan her çar ruhberan digotin: «Amîn!» û rûspî deverûya xwe avîtin ew hebandin.

VEKIRINA HER HEFT MORAN

6 ¹ Hingê min nihêrî, wî Berxî moreke ji wan her heft moran vekir, min ji wan her çar ruhberan yekî dengêkî

mîna dengê gur'înîya e'wran bihîst, ku digot: «Were». ² Min nihêrî, wê hespekî rengê wî sipî k'ifş bû û destê sîyarê wîda tîrkevanek hebû, t'acgulîk wîr'a hate dayîne û ew çawa e'gît çû, ku serdest be.

³ Gava Berx mora dudan vekir, min ji ruhberê dudan bihîst, ku got: «Were». ⁴ Hingê hespekî dinî rengê zerda derk'et û sîyarê wîr'a *destûr* hate dayîne, ku haştîyê ji dinyayê hilde, ku meriv hevdu bikujin. Şûrekî mezin wîr'a hate dayîne.

⁵ Gava wî mora sisyan vekir, min ji ruhberê sisyan bihîst, ku got: «Were». Min nihêrî, wê hespekî reş *hat* û destê sîyarê wîda mēzînek hebû. ⁶ Hingê qey bêjî min ji nava her çar ruhberanda dengê bihîst, ku digot: «Genimê bi çapekê bi zîvekî û cehê sê çapan bi zîvekî *be*.^{*} Lê zîrarê nede bizîrê *zeytê* û şerabê».

⁷ Gava wî mora çaran vekir, min ji ruhberê çaran bihîst, ku got: «Were». ⁸ Min nihêrî, wê hespekî qîçelokî, navê sîyarê wî Mirin û Cenim pey wî diçû. ⁹ Ser p'areke ji çar p'arên dinyayê Mirin û Cenimêr'a hikum hate dayîne, ku ew bi şûr, bi xelayîyê, bi nexaşîya mirindarîyê û bi rewîrên dinyayê merivan bikujin.

⁹ Gava wî mora pêncan vekir, min bin qurbangehêda ruhên wan merivan dîtîn, yên ku bona Xebera Xwedê û şehdetîya ku dabûn hatibûne kuştîne. ¹⁰ Wana bi dengêkî bilind kirine gazî û got: «Ya Xudanê pîroz û rast! Tuê heta çiçax dîwanê nekî û heyfa xûna me ji binelîyên rûbarî dinyayê hilnedî?» ¹¹ Hingê ji wan her yekîra k'incên çîle-qerqas hatine dayîne û wanr'a hate gotîne, ku hinek waxt jî hêsa bin, heta ku hesabê heval-xulamên wan û xûşk-birayên wane ku wê mîna wan bêne kuştîne t'emam be.

¹² Gava wî mora şeşan vekir, min nihêrî, erd qayîm hejya. Te'v mîna k'urxê pirç' reş bû û hîv pêda-pêda bû mîna xûnê. ¹³ Steyrkên ezmên usa jorda waryane erdê, çawa ku dara hêjîrê ji ber bayê qayîm diheje û berên wê jê diwarin. ¹⁴ Hingê ezman mîna kitêbeke gulomatîk li hev hate p'êçanê û her ç'îya û girav ji cîyên xwe hejyan. ¹⁵ P'adşên dinyayê, giregirên wê, dewlemendên wê, serokeskerên wê, e'gîten wê û hemû merivên xulam û aza xwe şkeft û qeyayên ç'îyanda veşartin, ¹⁶ ç'îya û qeyanra digotin: «Ser meda bik'evin û me ji rûyê wî veşêrin, Yê ku li ser t'ext rûniştî ye, usa jî ji *xezeba* hêrsa Berxê. ¹⁷ Çimkî roja *xezeba* hêrsa wane giran hat û k'î dikare teyax ke?»

MORKIRINA 144000 LAWÊN ÎSRAËLÊ

7 ¹ Pey vê yekêra min nihêrî, wê çar milyak'et li her çar qulbên dinyayê sekinî ne û bayên her çar qulbên dinyayê girtine, ku *ba* li erdê, be'rê û t'u darê nexin. ² Hingê min milyak'etekî din jî dît, ku ji rohilatê dihat û mora wîye ji Xwedêyê zêndî hebû. Ewî bi dengêkî bilind li wan her çar milyak'etan kire gazî, yên ku wanr'a hatibû dayîne, ku zîrarê bidine erdê û be'rê û gote wan: ³ «Zîrarê nedine erdê, be'rê û daran, heta ku em mor li e'nîya xulamên Xwedêyê xwe nexin». ⁴ Hingê hesabê yên hatibûne morkirinê min bihîst: Ji hemû qebîlên lawên Îsraêl sed çil û çar hezar bûn.

⁵ Ji qebîla Cihûda donzdeh hezar, ji qebîla Rûbên donzdeh hezar, ji qebîla Gad donzdeh hezar, ⁶ ji qebîla Aşêr donzdeh hezar, ji qebîla Neftelî donzdeh hezar, ji qebîla Mînaşe donzdeh hezar, ⁷ ji qebîla Şimhûn donzdeh hezar, ji qebîla Lêwî donzdeh hezar, ji qebîla Îsaxar donzdeh hezar, ⁸ ji qebîla Zebûlon donzdeh hezar, ji qebîla Ûsiv donzdeh hezar, ji qebîla Binyamîn donzdeh hezar.

MORKIRINA JI HER MILETÊN DINYAYÊ

⁹ Pey vê yekêra min nihêrî, va ye k'omaeke merivane usa giran, ku t'u kesî nikaribû bijimarta, ji her miletî, ji her berekê, ji her cimete û ji her zimanî li ber t'ext û wî Berxî sekinî bûn. K'incên çîle-qerqas li wan bûn û çiqilên xurman jî li destên wanda bûn, ¹⁰ wan bi dengêkî bilind dikirine gazî digotin: «Rizgarbûn ji Xwedêyê me ye, Yê ku ser t'ext rûniştî ye û ji *destê* wî Berxî ye».

¹¹ Hingê ew hemû milyak'etên ku li dora t'ext, rûspîyan û wan her çar ruhberan girtibûn, ber t'ext deverûya xwe avîtin Xwedê hebandin ¹² û gotin: «Amîn! Pesin, rûmet, serwaxtî, şikirî, hurmet, qewat û zorayî bira heta-ha-tê Xwedêyê mer'a be. Amîn!»

¹³ Hingê ji wan rûspîyan yekî gote min: «Evên ku bi k'incên çîle-qerqas wergirtî ne, ew k'î ne û ji k'u derê hatine?» ¹⁴ Min gote wî: «Ez xulam, ez nizanim, tu zanî». Hingê ewî gote min: «Evana ew in, yên ku ji wê tengasîya mezin hatine, k'incên xwe bi xûna wî Berxî şuştine, çîl-qerqas kirine. ¹⁵ Lema ewana li ber t'extê Xwedê ne û p'aristxana wîda şev û roj wîr'a xizmetîyê dikin. Yê li ser t'ext rûniştî, wê konê xwe li ser wan veke. ¹⁶ Ewê îdî ne t'î bin, ne birçî bin û te'v û germayî jî wan naxe. ¹⁷ Çimkî ew Berxê ku goveka t'extda ye, wê şivantîyê li wan bike û wan bibe li ser kanîyên ava jîyîne. ¹⁸ Xwedê jî wê hemû hêsîrên ç'evên wan paqij ke».

MORA HEFTAN

8 ¹ Gava ewî mora heftan vekir, ezmênda weke nîv sihetê her tişt seqirî. ² Hingê min ew her heft milyak'etên ku li ber Xwedê sekinî bûn dîtîn, wanr'a heft bor'î hatine dayîne.

³ Milyak'etekî din bixûrdanga zêr'în dêstda hat, li ber t'extbixûra zêr'în sekinî. Wîr'a gelek bixûr hate dayîne, ku bi t'evî duayên pîrozan dayne ser t'extbixûra li ber Xwedê. ⁴ Dûyê wê bixûrê, ji destê wî milyak'etî, t'evî duayên pîrozan bilind bûn çûn ber hizûra Xwedê. ⁵ Paşê milyak'et ew bixûrdang hilda, bi agirê t'extbixûrêva dagirt avîte ser erdê. Bû gur'înîya dengên e'wr-ezmên, birûskê birq veda û erd hejya.

* 6:6 Hingê zîvek maşê xebata rojeke k'arkerekî bû.

⁶Hingê wan her heft milyak'etên ku heft bor'îyên wan hebûn hazirîya xwe dîtîn, ku bor'îyan xin.

⁷Yê pêşin bor'îyê xist, teyrok û agir xûnêva t'evayî ser erdêda barî. Û p'areke ji sê p'arên erdê şewitî, p'areke ji sê p'arên daran şewitî û hemû gîhayê şîn şewitîn.

⁸Milyak'etê dudan bor'îyê xist, tiştêkî mezinî mîna ç'îyakî agir pêk'etî hate avitînê nava be'rê. Û p'areke ji sê p'arên be'rê bû xûn, ⁹p'areke ji sê p'arên heywanên be'rê qir' bû û p'areke ji sê p'arên gemîyan wêran bû.

¹⁰Milyak'etê sisyan bor'îyê xist û steyrkeke mezine mîna tendûra bi agir-alavva gur'bûyî ji ezmên k'ete ser p'areke ji sê p'arên ç'eman û avên kanîyan. ¹¹Navê wê steyrkê Zirîçk bû. P'areke ji sê p'arên avan bû zirîçk û ji wê avê gelek meriv mirin, çimkî ew av te'l bû.

¹²Milyak'etê çaran bor'îyê xist, p'areke ji sê p'arên te'vê, p'areke ji sê p'arên hîvê û p'areke ji sê p'arên steyrkan derb standin, usa ku p'areke ji sê p'arên wan qarîya û p'areke ji sê p'arên rojê ronahî neda, usa jî p'areke ji sê p'arên şevê bû tarî.

¹³Hingê min nihêrî û dengê teyrekî ku ezmênda difir'î bihîst, wî bilind digot: «Wey, wey, wey li binelîyên rûbarê dinyayê, ku wê ber dengê wan bor'îyên her sê milyak'etên mayîn k'evin, yên ku wê bor'îyan xin».

BOR'ÏYA PÊNCAN

¹Milyak'etê pêncan li bor'îyê xist û min nihêrî, steyrkek ji ezmên k'ete ser rûyê erdê û k'îlîta k'ora gelîyê bêbin wê steyrkêra hate dayînê. ²Ewê k'ora gelîyê bêbin vekir, ji gelî dû dik'işya, mîna dûyê k'ûra mezin û rûyê te'vê û hewê girt. ³Ji wî dûyî kulî derk'etine ser rûyê erdê, wan'r'a qewata mîna qewata dúp'işkên erdê hate dayînê. ⁴Wan'r'a hate gotinê, ku zirarê nedine gîhayê erdê, ne jî t'u şînayîyê û darê, lê *zirarê* bidine wan merivan, li ser enîya k'îjanan mora Xwedê t'uneye. ⁵Wan'r'a *hikum* hate dayînê, ku wan nekujin, lê pênc mehan wan biçerçirînin. Êşa wan mîna êşa lêxistina dúp'işkan bû. ⁶Wan rojanda meriv wê li mirinê biger'in, lê wê nebînin, ewê heyra mirinêda bin, lê mirin wê ji wan bireve.

⁷Dîndara wan kulîyan mîna wan hespan bûn, yên ku bona şer' têne hazirkirinê. Li ser serê wan tiştên mîna t'acgulyên zêr'în hebûn û rûyê wan mîna rûyê merivan bûn. ⁸P'or'ê serê wan mîna p'or'ê k'ulfetan *dirêj* bû û diranên wan mîna diranên şêran bûn. ⁹Êlekzirihên wan hebûn, mîna yên hesinî, dengê baskên wan mîna dengê wan ereban bûn, ku çawa gelek hesp wan dik'işînin û dajone nava şer'. ¹⁰Mîna dúp'işkan dêlên wan jî hebûn û ser dêla wan jî derzî, bi k'îjanan hikumê wan hebû, ku pênc mehan mêriv biçerçirînin. ¹¹Milyak'etê k'ora gelîyê bêbin li ser wan p'adşa bû, ku navê wî bi îbranî «Abadûn» bû, bi yûnanî «Apolîyon», ku tê femkirinê: «Wêrankir». ¹²Weyê pêşin derbaz bû. Ji vir hada va du wey jî wê bèn.

BOR'ÏYA ŞEŞAN

¹³Milyak'etê şeşan li bor'îyê xist û min dengê ji her çar stîrûyên t'extbixûra zêr'îne li ber hizûra Xwedê bihîst, ¹⁴ku digote wî milyak'etê şeşan, yê ku bor'îya wî hebû: «Wan her çar milyak'etên ku li ber ç'emê Feratêyî mezin bendkirî ne veke». ¹⁵Hingê ew her çar milyak'et hatine berdanê, yên ku bona wê sihetê, rojê, mehê û salê hatibûne hazirkirinê, ku p'areke ji sê p'arên merivayê bikujin. ¹⁶Min hesabê ordîyên sîyarî bihîst, ku dusid mîlîyon bû. ¹⁷Wê dîtînokêda hesp û sîyarên wan minva aha k'îfş bûn~ rengê êlekzirihên wan rengê sorî mîna êgir, şîrkî mîna qalçîç'ekê û qîç'îkî mîna k'îrk'ûtê bûn. Serên hespên wan mîna serên şêran bûn û ji devên wan agir, dû û k'îrk'ût derdik'et. ¹⁸Bi van her sê belan~ bi agir, dû û k'îrk'ûtê, ku ji devên van derdik'et p'areke ji sê p'arên merivayê, hatine kuştinê. ¹⁹Çimkî qewata hespan dev û dêlên wanda bûn. Dêlên wan mîna meran bûn û serên wan hebûn, ku bi wan zirar didan.

²⁰Ew merivên mayîne ku bi van qeda-belan nehatine kuştinê jî ji wan p'ûtên ku bi destên xwe çê kiribûn venegeryan. Wan destê xwe ji cinhebandinê nek'işandin, *ne jî* ji wan p'ûtên ji zêr', zîv, sifir, kevir û dar, yên ku nabînin, nabihên û nager'in. ²¹Usa jî ew ji merivkuştinê, sêrbazîyê, bênamûsîyê û dizîya xwe venegeryan.

MILYAK'ET Û KITÊBA BIÇ'ÛKE GULOMATKKIRÎ

¹⁰¹Hingê min milyak'etekî dinî zor dît, ku ji ezmên dihate xwarê. E'wr li wî wergirtî bû û k'eskesor li sêrî bû, rûyê wî mîna te'vê bû, nigên wî jî mîna stûnên êgir bûn. ²Destê wîda kitêbeke biç'ûke vekirî hebû, wî nigê xweyî rastê danî ser be'rê, lê nigê ç'epê danî ser bejê ³û bi dengê bilind, mîna mir'înîya şêr kire qîr'în. Gava wî kire qar'în, her heft gur'înîyên e'wran bi dengên xwe xeber dan. ⁴Gava wan her heft gur'înîyên e'wran xeber dan, min xwast binivîsim, lê ji ezmên dengê hate min, ku digot: «Wan gotinên her heft gur'înîyên e'wran *morkirî xwey ke, nenivîse*».

⁵Hingê ew milyak'etê ku min dîtîbû, ewî ku nîgek danîbû ser be'rê û nîgek jî ser bejê, wî destê xweyî rastê berbi ezmên bilind kir ⁶û bi wî sond xwar, yê ku heta-ha-tê zêndî ye, awa gotî bi wî, yê ku ezman û hemûyên wêda, erd û hemûyên wêda û be'r û hemûyên wêda efirandîne û got: «Îdî waxt wê derengî nek'eve. ⁷Lê çaxê dengê bor'îya milyak'etê heftan derê, hingê wê ew sura t'ivdîra Xwedê bê sêrî, ya ku wî xulamên xwe p'êxember pê hesandîne».

⁸Pey vê yekê'r'a ew dengê ku min ji ezmên bihîstîbû, dîsa xeber da got: «Her'e, wê kitêba vekirî ji destê wî milyak'etî hilde, yê ku li ser be'rê û bejê sekinî ye». ⁹Ez jî çûme cem wî milyak'etî û min gote wî: «K'a wê

kitêba biç'ûk bide min». Ewî gote min: «Hanê, vê hilde, bixwe. Evê li hinavê teda te'l be, lê devê teda mîna hingiv wê şîrin be». ¹⁰ Hingê min kitêba biç'ûk ji destê milyak'et hilda û xwar. Devê minda mîna hingiv şîrin bû, lê gava min ew xwar, min nav hinavê xweda te'layî k'ifş kir. ¹¹ Hingê minr'a hate gotinê: «Gerekê tu dîsa li ser gelek cimetan, miletan, zimanan û p'adşan p'êxembertîyê bikî».

DU P'ÊXEMBER

11 ¹ Hingê qamîşeke mîna kewaz minr'a hate dayînê û hate gotinê: «Rabe, p'aristxana Xwedê û qurbangehê çap ke û yên ku têda dihebînin *jî bijmire*. ² Lê hewşa p'aristxanêye derva bihêle, wê çap neke, çimkî ew hêtanosanra hate dayînê. Ewê Bajarê Pîroz çil du mehan bin p'îyanda p'êpes kin. ³ Ê ezê t'emîyê bidime du şehdeyên xwe, ewê k'urx xwekirî hezar dusid şêst rojan p'êxembertîyê bikin». ⁴ Evana ew her du darên zeytûnê û her du şemdan in, yên ku li ber hizûra Xudanê dinyayê disekin. ⁵ Heger merivek bixaze zirarê bide wan, agirê ji devê wan derk'êve û dijminên wan hûfî xwe ke. Ê aha ewên ku dixazin zirarê bide wan wê bêne kuştinê. ⁶ Hikumê van heye, ku rojên p'êxembertîya xweda ezmên dadin, ku baran nebare. Usa jî hikumê wan li ser avan heye, ku wan bikine xûn û çiçax jî bixazin, dikarin her cûr'e qeda-bela bînine ser dinyayê.

⁷ Çaxê ewana şehdetîya xwe ser hevda bînin, hingê ew cinewirê ku ji k'ora gelîyê bêbin derdik'êve, wê wanr'a bik'êve şer', serdest be û wan bikuje. ⁸ Cinyazên wan wê li meydana wî bajarê mezinda *avîttî* bin, li wê dera ku Xudanê wan hate xaçkirinê, ku bi sîmvolî jêr'a «Sodom» û «Misir» tê gotinê. ⁹ Ê ji her cimetan, berekan, zimanan û miletan wê sê roj û niv li cinyazên wan binihêrin û nehêlin, ku cinyazên wan bikine gor'ê. ¹⁰ Bineliyên li rûbarî dinyayê wê dilê xwe li wan şa kin û wan bik'ênin, p'êşkêşan jî wê hevr'a bişînin, çimkî van her du p'êxemberan ewên ku li rûbarî erdê diman diçerçirandin.

¹¹ Pey sê roj û nivra Xwedê ruh ber wanda anî, ew rabûne ser p'îyan û tirseke mezin k'ete ser yên ku ew dîtin. ¹² Hingê wan dengekî bilind ji ezmên bihist, ku digote wan: «Werine vê jorê». Ê ewana ber ç'evên dijminên xwe e'wranva hilk'îşiyane ezmên. ¹³ Wê sihetê erd qayîm hejya, p'areke ji dehe p'arên bajêr hilşîya û heft hezar meriv mirin, yên mayîn jî ç'evtirsîyayî bûn û şikirî didane Xwedêyê ezmên. ¹⁴ Weyê dudan derbaz bû. Va yê sisyan wê zûtirê bê.

DENGÊ BOR'ÛYA HEFTAN Û HEBANDINA LI EZMÊN

¹⁵ Milyak'etê heftan li bor'ûyê xist û ezmênda dengên bilind hatine bihistinê, ku digotin: «P'adşatîya dinyayê bû ya Xudanê me û Mesîhê wî, ewê heta-ha-tê p'adşatîyê bike». ¹⁶ Ew her bîst çar rûspîyên ku li ber hizûra Xwedê ser k'ursîyan rûniştibûn, deverû xwe avîtin Xwedê hebandin ¹⁷ û gotin: «Ya Xudan Xwedêyê Xweyhikumê li ser her heyînan, Yê heyî û hebûyî, em şikirîyê didine te, ku te qewata xweye mezin hilda û dest bi hikumê xwe kir. ¹⁸ Her millet qîlqîlîn, lê dema *xezeba* hêrsa te hat pêr'a gihîşt, ku tu dîwana mirîyan bikî, maşê xulamên xwe, p'êxemberan û cimeta xwe bidî, usa jî yên ku ji te ditirsin, ji biç'ûkan heta mezinan. Waxt hat, ku qir'a wan bîni, yên ku dinyayê xirab dikin».

¹⁹ Pey vê yekêra li ezmênda p'aristxana Xwedê vebû û wêda Sindoqa Peymana wî k'ifş bû. Birûskê birq da, gur'îniya dengên e'wran hate bihistinê, erd hejya û teyrok barî.

K'ULFET Û ZÛYA

12 ¹ Hingê nişaneke mezin ezmênda k'ifş bû: K'ulfetekê te'v li xwe wergirtibû, hîv binê p'îyên wêda bû û t'acgulîke ji donzdeh steyrkan jî serê wê bû. ² Ew duhalî bû û k'etibû ber zar'ê, êşa xwe dik'îşand û dikire qîr'în.

³ Pey vê yekêra nişaneke din jî ezmênda k'ifş bû. Min nihêrî, wê zîyakî zerî mezin, ku heft serî û dehe stirûyên wî hebûn û heft t'ac jî li serên wî bûn. ⁴ Dêla wî p'areke ji sê p'arên steyrkên ezmên k'îşand û avîte ser erdê. Ew zîya li ber wê k'ulfeta ku k'etibû ber zar'ê sekinî, ku hema çawa zar'ok bibe wî hûfî xwe ke. ⁵ Wê k'ulfetê zar'okekî kur'în anî, ku wê bi kewaza hesinî şivantîyê li ser her miletan bike. Zar'oka wê hate rahiştinê, heta cem Xwedê û ber t'extê wî hate birinê. ⁶ K'ulfet jî revî ber'îyê, li wî cîyê ku ji alîyê Xwedêda jêr'a hatibû hazirkirinê, ku ew li wir hezar dusid şêst rojî bê xweykirinê. ⁷ Hingê li ezmên şer' dest pê bû. Mixayîl milyak'etên xweva zîyara k'ete nava şer', zîya jî milyak'etên xweva t'evayî wanr'a şer' kir, ⁸ lê dane der, li ezmênda wanr'a îdî cî nema, ⁹ awa ji jorda ew zîyayê mezin hate avîtinê. Eva ew merê pêşin bû, ku jêr'a Buxdanbêj û Şeytan dibêjin, yê ku dinya pêva xalifandye. Ew ji jorda milyak'etên xweva t'evayî hate avîtinê li ser rûyê erdê.

¹⁰ Hingê min dengekî bilind li ezmên bihist, ku digot: «Niha ye waxtê rizgarkirinê, qewat û p'adşatîya Xwedêyê me û hikumê Mesîhê wî. Çimkî ew xeybkirê birayên me ji jorda hate avîtinê, yê ku şev û roj li ber Xwedêyê me xeyba wan dikir. ¹¹ Yên ku bi xûna Berxê û xebera şehdetîya xwe serdest derk'etin û jîyîna xwe heta mirinê hiz nekirin. ¹² Awa şa bin, ezmanno û yên ku wanda dimînin. Lê wey li erdê û be'rê, çimkî Buxdanbêj jorda hate avîtinê, li cem we û ew ji hêrsa har bûye, çimkî zane, ku waxtekî kin wê bimîne».

¹³ Çaxê zîya dît, ku ew ji jorda hate avîtinê, li ser erdê, pey wê k'ulfetê k'et, ya ku zar'oka kur'în anîbû. ¹⁴ Du baskên teyrane mezin wê k'ulfetêra hatine dayînê, ku bifir'e her'e ber'îyê, wî cîyê xwe, li k'u ji zîya dîr wê sê sal û nîvan bihata xweykirinê. ¹⁵ Hingê zîya ji devê xwe pey wê k'ulfetêra mîna ç'em av berda, ku wê bi lîyîyê unda ke. ¹⁶ Lê erdê alîk'arîya k'ulfetê kir, devê xwe vekir û ew ç'em daqurtand, yê ku zîyê ji devê xwe berdabû. ¹⁷ Hingê ew zîya li wê k'ulfetê hêrsk'etî çû, ku wan lawên wêye mayîna şer'ê xwe bike, yên ku t'emîyên Xwedê diqedînin û şehdetîya bona Îsa xwey dikin. ¹⁸ Ê Zîya devê be'rê li ser qûmê sekinî.

13 ¹ Hingê min nihêrî, wê cinewirek ji be'rê derdik'et. Heft serên wî û dehe stirûyên wî hebûn, li ser stirûyên wî dehe t'ac û li ser her heft serên wî jî navên k'ifirîyan bûn. ² Ew cinewirê ku min dît, mîna piling bû, nigên wî mîna lepê hirçan bûn û devê wî jî mîna devê şêran bû. Vî ziyayî qewata xwe, t'extê xwe û hikumê xweyî mezin da wî cinewirî. ³ Serîkî vî cinewirî birîndar li ber mirinê bû, lê birîna wî hate qenckirinê. Û t'emamîya dinyayê ser wî cinewirî ecêb ma û ⁴ ew zîya heband, ku wî hikumê xwe da wî cinewirî. Usa jî cinewir hebandin û gotin: «Gelo k'î mîna vî cinewirî ye? Û k'î dikare vîra bik'eve nava şer'»?

⁵ Vî cinewirîra îzin hate dayînê, ku qur'e-babax devê xwe veke û k'ifirîyan bike, usa jî wîr'a *îzin* hate dayînê, ku çil du mehan bi hikumê xwe *ya dilê xwe* bike. ⁶ Ewî hindava Xwedêda devê xwe bi k'ifirîyan vekir, k'ifirî li navê wî, konê wî û yên ku ezmênda dimînin kir. ⁷ *Îzin* wîr'a hate dayînê, ku pîrozanra şer' bike û serdest be. Usa jî hikumê li ser her berekê, cimete, zimanî û miletî wîr'a hate dayînê. ⁸ Hemû binelîyên li rûbarê dinyayê wê wî bihebînin, navên k'îjanan ji dema efirandina dinyayêda kitêba jîyînêda~ ya Berxê serjêkirîda nehatine nivîsarê. ⁹ Guhê k'ê heye bira bibihê: ¹⁰ Ewên ku yê dîl k'etinê ne wê dîl bik'evin û yên ku ber şûr k'etinê ne wê ber şûr k'evin. Li vir wê sebir û bawerîya pîrozan kêr bê.

¹¹ Hingê min nihêrî, wê cinewirêkî din ji erdê derdik'et, du stirûyên wîye mîna yê berxê hebûn, lê mîna zîya xeber dida. ¹² Hemû hikumê cinewirê pêşin evî li ber wî dida xebatê û p'êyî ser erdê û binelîyên wê dikir, ku wî cinewirê pêşin bihebînin, birîna k'îjanîye berbi mirinê hatibû qenckirinê. ¹³ Ewî cinewirî nîşanên gelek ecêbe mezin dikirin, heta ji ezmên agir jî li ber ç'evên merivan dirête ser erdê. ¹⁴ Ewî bi wan nîşanên ku wîr'a hatibûne dayînê, ku li ber cinewirê pêşin bike, binelîyên li rûbarê dinyayê dixalifandin. Ewî gote wan, ku nîgara wî cinewirî çê kin, yê ku bi şûr hatibû birîndarkirinê û dîsa zêndî bû. ¹⁵ Hikum wîr'a hate dayînê, ku qewatê bide nîgara cinewir, ku nîgara cinewir xeber de û *usa jî ew* bikaribe wan bide kuştinê, k'ê cinewir nehebînin. ¹⁶ Ewî p'êyî ser hemûyan kir, ser biç'ûk û mezinan, dewlemend û feqîran, aza û xulaman ku ewana mor hildine ser destê xweyî rastê yan enîya xwe, ¹⁷ ku t'u kes nikaribe ne bik'ir'e, ne jî bifiroşe, pêştirî ewê ku mora cinewir, awa gotî navê wî yan hesabê navê wî ser e. ¹⁸ Li vir serwaxî kêr tê: Femê k'ê heye, bira hesab bike ku hejimara cinewir ew hejimara *nav-nîşanên* mêriv e, hejimara wî şesid şêst şeş e.

BERX Û YÊN RIZGARBUÛYÎ

14 ¹ Paşê min nihêrî, wê li ser ç'iyayê Sîyonê Berx sekinî bû û sed çil çar hezar meriv wîr'a bûn, ku li ser enîyên wan navê wî û navê Bavê wî nivîsar bûn. ² Min ji ezmên dengê bihîst, mîna dengê gelek avan û dengê bilinde mîna gur'înîya e'wran. Ew dengê ku hate min, mîna dengê miqamê çengvanan bû, ku li çengên xwe dixin. ³ Wana li ber t'ext û li ber wan her çar ruhberan û rûspîyan stiraneke nû distiran. T'u kesî nikaribû ew stiran hîn bûya, pêştirî wan sed çil û çar hezarên ku ji dinyayê hatibûne k'ir'înê. ⁴ Evana ew in, yên ku serê xwe jinanra danênîne, ew bik'ir in. Ew pey Berx diçin, k'uda jî ku ew diçe. Evana ji nava merivan hatine k'ir'înê, çawa berê deremeta pêşin ku Xwedê û Berxra bêne dayînê. ⁵ Derew ji zarê wan dernek'etye, ew bêqusûr in.

SÊ MILYAK'ET

⁶ Hingê min nihêrî, wê milyak'etekî din, ku ezmênda difir'î û Mizgînîya wîye heta-ha-tê hebû, ku wê Mizgînîyê bide yên rûbarî dinyayê~ her miletan, berekan, zimanan û cimetan. ⁷ Wî bi dengê bilind digot: «Ji Xwedê bitirsîn û şikirîyê bidine wî, çimkî siheta dîwankirina wî pêr'a gihîşt. Wî bihebînin, yê ku erd û ezman, be'r û avên kanîyan efirandine».

⁸ Hingê milyak'etekî din pey wîr'a hat û got: «Hilşîya, wêran bû! Ew Babîlona mezin, ya ku şeraba qavîya xweye har her milet dane vexwarinê».

⁹ Pey vê yekêra milyak'etekî din jî pey wanr'a hat û bi dengê bilind got: «Yê ku cinewir û nîgara wî bihebîne û mora wî hilde li ser enîya xwe yan ser destê xwe, ¹⁰ ewê ji wê şeraba hêrsa Xwedê vexwe, şeraba bi dereca here bilind, ku t'asa wîye hêrsêda dağirtî ye. Ewê li ber milyak'etên pîroz û li ber Berx agir û k'irk'ûtêda cizaretê bibîne. ¹¹ Dûyê cizareta wan wê heta-ha-tê bik'işe û şev û roj wê rihetîya wan t'unebe, yên ku cinewir û nîgara wî dihebînin û mora wî standine».

¹² Awa li vir wê sebira pîrozan kêr bê, yên ku t'emîyên Xwedê diqedînin û hindava Îsada amin in.

¹³ Hingê min ji ezmên dengê bihîst, ku digot: «Binivîse: Ji vir hada xwezî li wan merivan, yên ku bona bawerîya ser Xudan wê bimirin». Ruh dibêje: «Belê! Ewê ji k'arê xwe rihet bin, çimkî kirên wan wanr'a diçin».

NANDIRÛNA RÛYÊ ERDÊ

¹⁴ Min nihêrî, wê e'wrekî sipî û li ser wî e'wrî yekî mîna Kur'ê mêriv rûniştî. T'acgulîkî zêr'în li sêrî bû û de'seke tûj jî destê wîda bû. ¹⁵ Hingê milyak'etekî din ji p'aristxanê derk'et, bi dengê bilind li ewî li ser e'wr rûniştî kire gazî û got: «De'sa xwe bavêjê bidirû, çimkî ew siheta nandirûnê hat, berê erdê îdî gihîştîye». ¹⁶ Hingê yê li ser e'wr rûniştî de'sa xwe avîte rûyê erdê û erd hate dirûtinê.

¹⁷ Hingê ji p'aristxana ezmên milyak'etekî din derk'et û destê wîda jî de'sikeke tûj hebû.

¹⁸ Hema hingê ji t'extbixûrê milyak'etekî din derk'et, ku hikumê wî li ser êgir hebû, ewî bi dengê bilind li yê xweyê de'sika tûj kire gazî û got: «De'sika xweye tûj bavêje gûşîyên tirîyên erdê û biçine, çimkî tirîyên wê îdî

gihîştine». ¹⁹ Wî milyak'etî jî de'sika xwe avîte erdê, tirîyên erdê çinîn û bona hincirandinê avîte wî hewzê mezin, hewzê hêrsa Xwedê. ²⁰ Ew tirî wî hewzîda hatine hincirandinê, ya ku ji bajêr der bû û ji hewz xûn k'îşya, xûnê avîte gemên hespan û qasî hezar şesid meydanî* girt.

HEFT MILYAK'ET Û HEFT BELA

15 ¹ Hingê min nîşaneke dine mezin û ecêb li ezmên dît, awa heft milyak'et, ku bi wan wê heft belayên hêrsa Xwedêye axirîyê bên. ² Hingê min *mezîleke* mîna be'reke şûşe êgirva t'evayî dît, usa jî min ewên ku cinewir, nîgara wî û hesabê navê wî bindest kiribûn *dîtin*. Evana ser be'ra şûşe sekinî bûn, çengên ku Xwedê dabûne wan destên wanda bûn ³ û stirana Mûsayê xulamê Xwedê û stirana Berx distiran *û digotin*: «Kirinên te mezin in û yên met'elmayînê ne Xudan Xwedêye Xweyhikumê li ser her heyînan! Rîyên te rast û heq in, ay P'adşayê miletan. ⁴ Xudan, k'î wê ji te netirse û rûmetê nede navê te? çimkî t'enê tu pîroz î. Her millet wê bêne berbi te û serê xwe li ber te daynin, çimkî kirinên teye rast k'ifş bûn».

⁵ Pey van tiştanra min nihêrî, wê p'aristxana Konê Şehdetîyêye ezmênda vebû. ⁶ Ew her heft milyak'etên xweyê her heft qeda-belan ji p'aristxanê derk'etin. K'itanên paqije birqok li wan bûn û bersîngên zêr'în ber sîngên wan girêdayî bûn. ⁷ Hingê ji her çar ruhberan yekî heft t'asên zêr'îne bi hêrsa Xwedêye heta-ha-têyî zêndîva t'ijî dane wan her heft milyak'etan. ⁸ P'aristxane bi dûyê rûmeta Xwedê û qewata wîva t'ije bû û t'u kes nikaribû bik'eta p'aristxanê, heta ku her heft milyak'etan, ew her heft qeda-bela neanîna sêrî.

HEFT T'ASÊN HÊRSA XWEDÊ

16 ¹ Hingê min dengêkî bilind ji p'aristxanê bihîst, ku digote her heft milyak'etan: «Her'in, *her heft* t'asên hêrsa Xwedê birêjine ser erdê».

² Milyak'etê pêşin çû t'asa *destê* xwe rête ser erdê, p'izikên p'ise xirab ser wan merivan dane der, yên ku mora cinewir li ser wan bû û nîgara wî hebandibûn.

³ Yê dudan t'asa *destê* xwe rête ser be'rê, be'r bû mîna xûna mirîyan û hemû heywanetên be'rêda qir' bûn.

⁴ Yê sisyan t'asa *destê* xwe rête ser ç'eman û avên kanîyan, ew bûne xûn. ⁵ Hingê min dengê milyak'etê *li ser* avan bihîst, ku digot: «Tu rast î, Yê heyî, hebûyî û pîroz î, ku te dîwanên aha kirin. ⁶ Çimkî wan xûna pîrozan û p'êxemberan rêt û te xûn li wan da vexwarinê. Rast ew maşê wan e». ⁷ Hingê dengê ji t'extbixûrê hat, ku aha digot: «Belê, ya Xudan Xwedêye Xweyhikumê li ser her heyînan, dîwanên ku tu dikî, ew rast û heq in».

⁸ Milyak'etê çaran t'asa *destê* xwe rête ser te'vê û wêra *qewat* hate dayînê, ku merivayê bi êgir biqelîne. ⁹ Hingê meriv ji dest şewata germayîyê hatine qelandinê û k'ifirî navê Xwedê kirin, ku hikumê wî li ser van qeda-belan heye. Lê ew ji kirinên xweyê xirab venegeryan, ku şikirî bidana wî.

¹⁰ Milyak'etê pêncan t'asa *destê* xwe rête ser t'extê cinewir û tarîstanî hate ser p'adşatîya wî, ji êşê merivan zimanê xwe digestin ¹¹ û ji dest êş û p'izikan k'ifirî li Xwedêye ezmên kirin, lê ji kirên xweyê xirab venegeryan.

¹² Milyak'etê şeşan t'asa *destê* xwe rête ser ç'emê Feratêyî mezin, ava ç'em ç'ikîya, ku bona p'adşayên rohilatê rê bê hazirkirinê. ¹³ Hingê min nihêrî, va ne sê ruhên herame mîna beqan ji devê wî zîyayî, ji devê cinewir û ji devê p'êxemberê derew derdik'etin. ¹⁴ Evana ew ruhên cinan bûn, yên ku nîşanên ecêb dikin. Ew diçine cem hemû p'adşayên dinyayê, ku wan bicivînin, bona şer'ê wê Roja Mezine Xwedêye Xweyhikumê li ser her heyînan.

¹⁵ «Va ye ezê mîna dizekî bêm! Xwezî li wî, yê ku hişyar dimîne û k'incên xwe xweyê dike, ku tazî neger'e û e'yba wî k'ifş nebe!»

¹⁶ Hingê wan ruhan ew p'adşa civandine wî cîyê ku bi îbranî «Harmagedon» jêr'a tê gotinê.

¹⁷ Milyak'etê heftan t'asa *destê* xwe rête ser hewê û ji t'extê p'aristxanê dengêkî bilind derk'et û got: «Hate sêrî!» ¹⁸ Hingê birûskê lê da, bû gur'înîya dengê e'wran û erd usa qayîm hejya, ku ji wê roja ku meriv dinê k'etye heta niha erd aha nehejyaye. erdhej haqas qayîm bû, ¹⁹ ku bajarê mezin bû sê p'aran û bajarên miletan wêran bûn. Babîlona mezin li ber hizûra Xwedê hate bîranînê, ku wê k'asa xweyê şeraba hêrsa giranva bide wê. ²⁰ Hemû girav betavebûn û ç'îya îdfî nehatine k'ifşê. ²¹ Ji ezmên teyroka gir li ser merivanda barî, *ku hebeke wê* weke pêncî kilogiramî bû. Merivan ji dest lédana teyrokê k'ifirî li Xwedê kirin, çimkî eva qeda-bela gelekî giran bû.

MAKA QAVÎYÊ

17 ¹ Ji wan her heft milyak'etan, ku her heft t'as *destê* wanda bûn, yek hat min'a xeber da û got: «Were vê derê, ez dîwana wê qava bi nav û deng nîşanî te bikim, ya ku li ser gelek avan rûniştî ye. ² P'adşayên dinyayê vêra qavî kirin û binelîyên rûbarî dinyayê bi şeraba qavîya wê serxaş bûn».

³ Hingê Ruhê Pîroz hate ser min, wî milyak'etî ez birime li ber'îkê. Min nihêrî, wê k'ulfetek cinewirekî bi rengê sorê gevez sîyar bûye, yê ku serda-pêda ji her alîyanva bi navên k'ifirîyanva t'ijî bû û heft serên wî û dehe stirûyên wî hebûn. ⁴ Ew k'ulfet jî bi k'incê şîrk û sorê gevezva wergirtî bû, bi zêr', kevirên qîmet, lal û dur'va xemilî bû. K'aseke zêr'în *destê* wêda bû, ew k'as jî mirdarî û heramîya qavîya wêva dagirtî bû. ⁵ Li ser e'nîya wê navekî bi sîmvolî nivîsar bû: **Babîlona mezin, maka qavan û mirdarîyên dinyayê.** ⁶ Min nihêrî, wê ew k'ulfeta bi xûna pîrozan û bi xûna şehdeyên Îsava serxaş bûye.

* 14:20 «Hezar şeş-sed meydan» bi hesabê niha dike sêsid kilomêtir.

Gava min ew dît, ez gelekî ecêb mam. ⁷ Hingê wî milyak'etî gote min: «Tu çima ecêb mayî? Ezê sura wê k'ulfetê ter'a bêjim û *usa jî* sura wî cinewirê ku ew *k'ulfet* li xwe sîyar kirye, yê ku heft serên wî û dehe stirûyên wî hene. ⁸ Ew cinewirê ku te dît, waxtekê hebû, niha t' une. Ewê zûtirê ji k'ora gelîyê bêbin derk' eve û her'e berbi undabûnê. Bineliyên rûbarî dinyayê, navên k'îjanan ji dema efirandina dinyayêda kitêba jîyînêda nehatine nivîsarê, wê ecêb bimînin, gava wî cinewirî bibînin, yê ku hebû û niha t' une, lê wê hebe.

⁹ Li vir hiş-aqil kêr tê. Ew her heft serî, heft ç'îya ne, ser k'îjanan ew k'ulfet rûniştî ye, *usa jî* heft p'adşa ne. ¹⁰ Ji wan pênc k'etine, yek heye, yê din hê nehatye û çaxê bê, gerekê hinek waxt bimîne. ¹¹ Ew cinewirê ku waxtekê hebû û niha t' une, ew xwexa jî p'adşê heyştan e. Ew yekî ji wan her heftan e û wê her'e berbi undabûnê.

¹² Ew her dehe stirûyên ku te dîtine, deh p'adşa ne, ku hê p'adşatî nestandine, lê wê hikum bistînin, ku cinewirra t'evayî bona sihetekê p'adşatîyê bikin. ¹³ Meremê van her dehan yek e, ewê qewat û hikumê xwe bidine cinewir. ¹⁴ Evana wê t'evî Berx şer' bikin, lê Berx t'evî yên gazîkirî, yên hilbijartî û amin wê li wan bikaribe, çimkî ew Berx Xudanê xudanan û P'adşê p'adşayan e».

¹⁵ Hingê milyak'et gote min: «Ew avên te dîtî, ku ewa qav li ser wan rûniştîye, ew cimeta, k'oma merivan, millet û ziman in. ¹⁶ Ew her dehe stirûyên ku te dîtî, *usa jî* cinewir wê hevî'a bibine neyarê ya qav. Ewana wê destê wê ji her tiştî bikin, wê tazî kin û goştê wê bixwin û bi agir bişewitînin. ¹⁷ Çimkî Xwedê ev yek kire dilê wan, ku daxaza wî bikin û ser nêtekê bin~ ewana wê p'adşatîya xwe bidine cinewir, heta ku xeberên Xwedê bêne sêrî. ¹⁸ Ew k'ulfeta ku te dît, ew bajarê mezin e, ya ku p'adşatîyê li ser p'adşayên dinyayê dike».

WÊRANBÛNA BABÎLONÊ

18 ¹ Pey van tiştanra min nihêrî, wê milyak'etekî din ji ezmên dihate xwarê. Ew xweyhikumê mezin bû û ji dîndara wî rûyê erdê ronahî bû. ² Ewî bi dengê bilind kire gazî û got: «Hilşîya, wêran bû, Babîlona mezin! Ew bû xanî û miskenê cinan û pêsekinîya hemû ruhên heram, qelîtka hemû teyredên nep'ake mirdar. ³ Çimkî her miletan ji şeraba qavîya wêye har hildan vexwarin, p'adşayên dinyayê wêra qavî kirin, bazirganên dinyayê ji heramîya wêye bêy hesab dewlemend bûn».

⁴ Li vir min ji ezmên dengê din bihîst, ku digot: «Ji nava wê derk'evin, cimeta min, ku hûn nebîne hevalp'arên gunehên wê û ji belayên wê p'arê nestînin. ⁵ Çimkî gunehên wê *lod bûn* gihîştine heta ezmên û Xwedê ner'astîyên wê anîne bîra xwe. ⁶ Ewê çî kirye *usa jî* hûn bînine serê wê û li anegorî kirên wê, dubare lê vegeştînin, ew k'asa *te'layîyê*, ku ewê wer'a dagirt, hûn dubare lê dagirin. ⁷ Çiqas ewê xwexa rûmeta xwe bilind kirye û bi k'êfa dilê xweye heramra derbaz kirye, haqasî cizaretê û şîne serda bînin. Çimkî dilê xweda aha dibêje: «Ez xanimp'adşa me, ne jînebî me û ezê qet şîne nebînim». ⁸ *Hema* bona vê yekê jî nava rojekêda wê ev bela bêne ser wê~ nexaşîya mirindariyê, şîne û xelayî û ewê bibe xurê agir, çimkî yê dîwana wê dike ew Xudan Xwedê qewat e».

⁹ P'adşayên dinyayê, yên ku wêra qavî kirin û dilê xwe wêra şa kirine, çaxê dîyê şewata wê bibînin, wê bigirîn û ser wê şîne bikin. ¹⁰ Ji tîrsa cizareta wê, ewê li dîr bisekinin û bêjin: «Wey, wey li te bajarê mezin, bajarê zor~ Babîlon! Dîwana te sihetekêda hate serê te».

¹¹ Bazirganên dinyayê wê ser wê bigirîn, şîne bikin, çimkî îdî tu kes wê tiştên wane firotanê nek'ir'e. ¹² Tiştên zêr', zîv, kevîrên qîmet, lal û dur', k'itanê qîmet, p'arçên şîrk, hevîrmîş, p'arçên sorê gevez, her dara bînxaş û her tiştên ji qîlên filan, tiştên ji darên here qîmet, ji sifir, hesin û mermer, ¹³ *usa jî* darçîn, bihareta bînxaş, bixûr, rûnê bînxaş, bixûrê e'rebî, şerab, bizirê zeytûnê, arê xas, genim, dewar, pez, hesp, e'rebe, qalib û ruhên merivan. ¹⁴ Bazirgan wê bêjin: «Ew tiştên dilê tedaye şîrin ji te çûn û hemû tiştên rewşe birqok ji *destê* te hatine derxistinê, îdî qet ew dest te nak'evin». ¹⁵ Bazirganên van tiştan, yên ku bi Babîlonê dewlemend bibûn, wê ji tîrsa cizareta wê dîr bisekinin bigirîn, bavêjine ser~ ¹⁶ bilovînin û bêjin: «Wey, wey bajarê mezin, ku te k'itanê qîmet, p'arçê şîrk û sorê gevez li xwe wergirtibû û bi zêr', kevîrê qîmet, lal û dur'va xemilî bûyî! ¹⁷ Haqas hebûk sihetekêda p'ûç bû çû».

Hemû serok û sîyarên gemîyan, gemîvan û hemûyên ku bi xebata ser be'rê xwe xwey dikirin, dîr sekinîn ¹⁸ û gava dîyê şewata wê dîtî, kirine qîr'în û gotin: «Gelo bajareke dine mîna vê bajarê mezin hebû?» ¹⁹ Xwelî serê xwe kirin, bi şîne û girî kirine qîr'în û gotin: «Wey, wey li wê bajarê mezin, ku hemûyên be'rêdaye xweygemî bi hebûka wêye xinêbûyî dewlemend bibûn, lê *heyf*ew sihetekêda wêran bû çû»!

²⁰ Ezmano, pîrozno, şandî û p'êxemberno! Dilê xwe li ser *k'etîna* wê bajarê şa kin, Xwedê heyfa we jê hilda.

²¹ Hingê milyak'etekî qewat, kevîrekî mîna beraşekî mezin hilda, avîte be'rê û got: «Aha jî bajarê mezin~ Babîlon wê qayîm jorda bê avîtinê û îdî k'ifş nebe. ²² Wê îdî dengê çeng, sazband, bilûrvan û bor'îvan nav teda neyê bihîstinê. Îdî qet hostekî t'u p'êşeyî wê li nav teda k'ifş nebe. Wê îdî dengê aş jî nav teda neyê bihîstinê. ²³ Wê îdî ç'irûsîya ç'irê jî nav teda k'ifş nebe, wê îdî dengê bûk-zavê jî nav teda neyê bihîstinê. Bazir-ganên te giregîrên dinyayê bûn û her millet bi sêrbazîya te ji rê xalîfîn. ²⁴ Û xûna p'êxember û pîroznan k'ete stûyê wê bajarê û xûna wan hemûyên ku li ser rûyê erdê hatine rêtinê».

ŞABÛNA LI EZMÊN

19 ¹ Pey van yekar'a, min li ezmên dengê bilind bihîst, mîna dengê k'oma merivane giran ku digot: «Halêlûya! Rizgarî, rûmet û qewat yên Xwedêyê me ne! ² Dîwanên wî rast û heq in. Ewî dîwana wê qavê kir, ya ku bi qavîya xwe dînya herimand û *Xwedê* heyfa xûna xulamên xwe ji wê hilda».

³ Cara dudan gotin: «Halêlûya! heta-ha-tê wê dûyê wê bik'îşe».

⁴ Her bîst çar rûspî û her çar ruhber deverûya xwe avîtin û ew Xwedêye li ser t'ext rûniştî hebandin û gotin: «Amîn, Halêlûya!» ⁵ Hingê dengê ji t'ext hat û got: «Hemû xulamên Xwedêye ku ji wî ditirsin, biç'ûk û mezin bira pesinê Xwedêye me bidin».

⁶ Hingê min deng bihîst, çawa dengê k'oma merivane giran, mîna dengê xule-xula gelek avan û mîna dengê gur'înîya e'wran bilind digotin: «Halêlûya! Çimkî Xudanê me Xwedêye Xweyhikumê li ser her heyînan dest bi p'adşatîyê kir. ⁷ Em bik'enin, şa bin û şikirîyê bidine wî, çimkî de'wata Berx pê'r'a gihîşt û dergîstîya wî hazîrîya xwe dîtye. ⁸ Û bona xwekirinê k'itanê birqokî paqij jê'r'a hate dayîne». (Ew k'itan rastîya pîrozan e.)

⁹ Hingê wî milyak'etî gote min: «Binivîse: Xwezî li wan, ku bona şayîya de'wata Berx hatine t'eglîfkirinê!» Serda zêde kir got: «Hema ev in xeberên Xwedêye rast».

¹⁰ Hingê min xwe deverû avîte nigên wî, ku wî bihebînim, lê ewî gote min: «Vê yekê neke! Ez jî heval-xulamêkî mîna te û wan birayên te me, yên ku şehdetîyên li ser Îsa xwey dikin. Xwedê bihebîne, çimkî şehdetîya Îsa bi wî ruhê p'êxemberîyê ye».

SİYARÊ HESPÊ SIPÎ

¹¹ Hingê min nihêrî, ezman vebû, wê hespekî *rengê sipî hat* û sîyarê wî'r'a Amin û Rast digotin. Dîwankirin û şer'ê wî bi rastîyê ye. ¹² Ç'evên wî mîna alava êgir bûn û li sêrî gelek t'ac hebûn. Navek ser wî nivîsar bû, ku pêştirî wî t'u kesî nizanibû. ¹³ K'inceke xûnêda kirî lê bû û navê wî bû Gotina Xwedê. ¹⁴ Ordîyên ezmên jî li hespên sipî sîyarbûyî û k'itanên çîl-qerqaşe paqij li wan pey wî diçûn. ¹⁵ Ji devê wî şûrekî tûj derdik'et, ku bi wî miletan xe. Ewê bi kewaza hesinî şivantîyê li wan bike û wan li hewzê şeraba hêrsa giranda, ya Xwedêye Xweyhikumê li ser her heyînanda bih'incir'îne. ¹⁶ Li ser qap'ûtê wî û ser hêta wî navek nivîsar bû: P'ADŞÊ P'ADŞAN Û XUDANÊ XUDANAN.

¹⁷ Hingê min milyak'etek dît, ew li ser te'vê sekinî bû, bi dengê bilind kire gazî û gote hemû teyredên ku hewêda difir'in: «Werin bicivine şayîya Xwedêye mezin, ¹⁸ ku hûn cinyazên p'adşayan, serokan, mêrxasan û cendekên hespan, usa jî cinyazên sîyarên wan û hemû merivan bixwin, yên aza û xulaman, biç'ûk û mezinan».

¹⁹ Hingê min ew cinewir û p'adşên dinyayê ordîyên wanva li cîkî civayî dîtin, ku şer'ê xwe t'evî wî sîyarê hespê sipî û ordîya wî bikin. ²⁰ Hingê ew cinewir hêsîr hate girtinê û ew p'êxemberê derew jî t'evî wî, yê ku li ber wî nîşanên ecêb dikirin û bi wan ew xalifandin, yên ku mora cinewir hildan û nîgara wî hebandin. Û ew her du jî zêndî-zêndî hatine avîtinê nava gola agirê k'irk'ûtêyî ku dişewite. ²¹ Ewên mayîn jî bi wî şûrê ku ji devê sîyarê hespê sipî derdik'et hatine kuştinê û hemû teyrede ji cinyazên wan t'êr bûn.

P'ADŞATÎYA HEZARSALÎYÊ

20 ¹ Hingê min nihêrî, wê milyak'etek ji ezmên dihate xwarê, k'îlîta k'ora gelîyê bêbin û zincîreke mezin destê wîda bû. ² Ewî ew zîya girt~ ew merê pêşin, ku xwexa Buxdanbêj û Şeytan e û hezar salî girêda. ³ Ewî ew avîte k'ora gelîyê bêbin, ser wî k'îlît kir û mor lîxist, ku îdî miletan nexalifîne, heta hezar sal t'emam be. Pey wê yekêra ew gerekê bona demeke kin bê berdanê.

⁴ Hingê min k'ursî dîtin, li ser k'îjanan ew rûniştin, yên ku wê dîwanê bikin. Usa jî min ruhên wan *merivan* dîtin, k'îjan bona şehdetîya Îsa û bona xebera Xwedê hatibûne serjêkirinê, yên ku cinewir û nîgara wî nehebandibûn û ne jî mora wî hildabûne ser e'nî yan destê xwe. Evana dîsa zêndî bûn û bi Mesîhra t'evayî hezar salan p'adşatî kirin. ⁵ (Lê ew mirîyên mayîn zêndî nebûn, heta hezar sal t'emam bû.) Ev e zêndîbûna mirîyane pêşin. ⁶ Xwezî û pîroz e ewê ku p'ara wî li zêndîbûna mirîyane pêşinda heye. Mirina dudan li ser wan hikum nake, lê ewê bibine k'ahînen Xwedê û Mesîh û wê bi wî'r'a hezar salan p'adşatîyê bikin.

AXIRÎYA ŞEYTAN Û DÎWANA XILAZÎYÊ

⁷ Çaxê hezar sal t'emam be, Şeytan wê ji zindanê bê berdanê, ⁸ ewê derk'ewe, ku wan miletên her çar qulbên dinyayêda~ Gog û Magogê bixalifîne û wan bona şer' li cîkî bicivîne. Hesabê wan wê mîna qûma devê be'rê be. ⁹ Evana wê li ser t'emamîya erdê bela bin û dora wargehê ordîya pîrozan û bajarê hizkirî bigirin. Lê ji ezmên agirê bibare, wan hûfî xwe ke. ¹⁰ Ew Buxdanbêjê ku ew xalifandin jî, wê bê avîtinê nava gola agirê k'irk'ûtê, wî cîyê ku cinewir û p'êxemberê derew têda ne. Li wir wê şev û roj, heta-ha-tê biçerçirin.

¹¹ Hingê min t'extekî mezinî çîlî-qerqaşe dît û yek li ser rûniştibû. erd û ezman ji ber hizûra wî betavebûn û li t'u cîyî k'ifş nebûn. ¹² Wê demê min mirîyên biç'ûk û mezin dîtin, ku li ber t'extê Xwedê sekinî bûn. Kitêb vebûn û kitêbeke din jî vebû, kitêba jîyînê. Dîwana mirîyan anegorî wan kirinên wane kitêbanda nivîsar hate kirinê. ¹³ Be'rê mirîyên xwe da, Mirinê û Cenimê jî mirîyên xwe dan. Dîwana her kesî ji wan anegorî kirinên wan hate kirinê. ¹⁴ Hingê Mirin û Cenim hatine avîtinê nava gola agirî. Ev e mirina dudan. ¹⁵ Û navê k'ê vê kitêba jîyînêda nivîsar nîbû, ew hate avîtinê nava gola agirî.

ERD Û EZMANÊ NÛ

21 ¹ Hingê min erd û ezmanekî nû dît, çimkî erd û ezmanê berê derbaz bûn û îdî be'r t'unebû. ² Min nihêrî, wê ji ezmên Bajarê Pîroz~ Orşelîma nû mîna bûkeke xêlîkirî bona dergîstîyê xwe xemilî ji Xwedêda dihate xwarê.

³Min ji t'ext dengekî bilind bihîst, ku digot: «Va konê Xwedê nava merivanda ye! Ewê nava wanda bijî, ewana wê bibine cimeta wî û Xwedê xwexa jî çawa Xwedêyê wan wê t'evî wan bimîne. ⁴Ewê ji ç'evên wan hemû hêsiyan paqij ke û îdî mirinê t'unebe, ne jî şîn, ne girî, ne êş-êşûk, çimkî tiştên berê derbaz bûn çûn».

⁵Hingê yê li ser t'ext rûniştî gote min: «Va ez her tiştî nû çê dikim». «Binivîse, çimkî ev xeberne amin û rast in». ⁶Usa jî gote min: «Her tişt hate sêrî. Ez im Alfa û Omêga, Destpêbûn û Axirî. Ezê yên t'î, ji kanîya ava jîyîne bêy maş bidime vexwarinê. ⁷Ewê ku serdest dertê, wê her tiştî war be, ezê bibime Xwedêyê wî, ewê jî bibe lawê min. ⁸Lê p'ara tirsonekan, bêaminan, mirdar-heraman, merivkujan, bênamûsan, sêrbazan, p'ûtp'arêzan û her derewînan wê ew gol be, ya ku bi agirê k'irk'ûtêva dişewte. Ev e mirina dudan».

BAJARÊ ORŞELÎMA NÛ ÇAWA BÛKA BEXÊ

⁹Milyak'etekî ji wan her heft milyak'etan, ku her heft t'asên wane heft belayên xilazîyêva t'ije hebûn, hat minr'a xeber da û got: «Were vê derê, ezê bûkê nîşanî te bikim~ dergîstîya Bexê». ¹⁰Hingê Ruhê Pîroz hate ser min, wî ez birime ser ç'îyakî mezinî bilind û bajarê nû~ Orşelîma Pîroz nîşanî min da, ku ji ezmên~ ji Xwedêda dihate xwarê. ¹¹Rûmeta Xwedê nava wêda şewq dida, ew ronahî mîna kevirê qîmet bû, mîna kevirê yaspîs, mîna xirûstal bû. ¹²Sûra wê mezin û bilind bû, donzdeh dergeh lê bû û li ber dergehan donzdeh milyak'et hebûn. Li ser dergehan navên her donzdeh qebilên lawên Îsraêl nivîsar bûn. ¹³Ji alîyê rohilatêva sê dergeh, ji alîyê bakurêva sê dergeh, ji alîyê başûrêva sê dergeh û ji alîyê roavayêva sê dergeh hebûn. ¹⁴Donzdeh rikinên sur'a bajêr hebûn, li ser wan navên her donzdeh şandîyên Bexê nivîsar bûn.

¹⁵Bona çapkirinê qamîşekî zêr'în destê wî milyak'etîda hebû, yê ku minr'a xeber dida, ku bi wî qamîşî bajêr, dergehên wê û sur'a wê çap ke. ¹⁶Bajar çar goşe bû dirêjayîya wê weke berayîya wê bû. Ewî bajar bi wî qamîşî çap kir, donzdeh hezar meydan* derk'et. Dirêjayî, berayî û bilindayî weke hev bûn. ¹⁷Milyak'et sur'a bajêr bi çapa ku meriv *pê çap dikin* çap kir, bilindayîya wê bû sed çil çar gav.[†] ¹⁸Ew sûr ji kevirê yaspîs hatibû çêkirinê û bajar xwexa ji zêr'ê xasî mîna şûşe zelal bû. ¹⁹Rikinên sur'a bajêr bi her cûr'e kevirên xase-qîmet hatibûne xemilandinê. Rikinê pêşin yaspîs bû, yê dudan safir, yê sisyan xalkêdon, yê çaran zimrûd, ²⁰yê pêncan onîks, yê şeşan sardiyon, yê heftan kevirê zêr'în, yê heyştan berîl, yê nehan topaz, yê dehan xirîsopras, yê yanzdehan yaqût, yê donzdehan amêstîs.[‡] ²¹Her donzdeh dergeh ji donzdeh dur'an bûn, her derîk ji dur'ekî û meydana bajêr ji zêr'ê xasî mîna şûşe zelal bû.

²²Bajêrda min p'aristxane nedît, çimkî p'aristxana wê Xudan Xwedêyê Xweyhikumê li ser her heyînan û Bex xwexa ne. ²³Bajar ne hewcê te'vê û hîvê bû, ku ronahî bidanê, çimkî rûmeta Xwedê wê ronahî dike û Bex ç'ira wê ye. ²⁴Milet wê bi ronaya wî biger'in û p'adşayên dinyayê wê rewş-rûmeta xwe bînine nava wê. ²⁵Dergehên wê qet wê neyêne girtinê, çimkî li wir t'imê wê roj be, şev wê t'unebe. ²⁶Wê rûmet û hurmeta miletan bînine nava wê. ²⁷Qet tiştêkî haram wê nek'eve bajêr, ewana jî wê nek'evinê, yên ku mirdarîyê û derew dikin, lê t'enê ewên ku *navên wan* kitêba Bexêye jîyînedê hatine nivîsarê.

22 ¹Wî milyak'etî ç'emekî ava jîyîneyê mîna xirûstala birqok nîşanî min kir, ku ji t'extê Xwedê û Bex dida der. ²Û li goveka meydana *bajêrda* dareke jîyîne hebû, ku her du alîyên *wêva* ç'em *dik'îşya*, ku donzdeh cûr'e ber dida û berê xwe her meh dida. Lê bi belgên wê darê hêtanos qenc dibûn. ³Îdî nifir li wir wê t'unebe. T'extê Xwedê û yê Bex wê nava bajêrda be û xulamên wî wê jêr'a xizmetîyê bikin ⁴û rûyê wî wê bibînin û li ser enîya wan navê wî wê hebe. ⁵Li wir şev îdî wê t'unebe û bona wê ronaya ç'irê û te'vê ne lazim in, çimkî Xudan Xwedê wê li wan ronahî ke û heta-ha-tê wê *hevr'a* p'adşatîyê bikin.

HATINA ÎSA MESÎH

⁶Milyak'et gote min: «Evana xeberne amin û rast in. Xudan Xwedêyê ruhê p'êxemberan, milyak'etê xwe şand, ku wan tiştên wê zûtirê bibin nîşanî xulamên xwe bike».

⁷Îsa dibêje: «Va ye ezê zûtirê bêm. Xwezî li wî, yê xeberên vê kitêbêye p'êxembertîyê xwey dike!»

⁸Min Yûhenna ev tişt bihîstin û dîtin. Û gava min ew bihîstin û dîtin, min xwe deverû avîte nigên wî milyak'etê ku ev tişt nîşanî min kirin, ku wî bihebînim. ⁹Lê ewî gote min: «Vê yekê neke! Ez jî heval-xulamekî mîna te û wan birayên te me, *mîna* p'êxemberan û wan hemûyan, yên ku xeberên vê kitêbê xwey dikin. Xwedê bihebîne».

¹⁰Serda jî gote min: «Xeberên vê kitêbêye p'êxembertîyê veneşêre, çimkî waxt nêzik e. ¹¹Yê neheqîyê dike, bira neheqîyêda hê zêde be, yê nep'ak e, bira nep'akîyêda hê zêde be, yê rast e, bira rastîyêda hê her'e û yê ku pîroz e, bira hê pîroz be. ¹²Va ye, ezê zûtirê bêm û maşê min destê minda ye, ku weke kirinên her kesî bidimê. ¹³Ez im Alfa û Omêga, Yê Pêşin û Yê Paşin, Destpêbûn û Axirî».

¹⁴Xwezî li wan, yên ku t'emîyên wî diqedînin, ku destûra wan hebe, ji berê dara jîyîne bixwin û dergehên bajêr'r'a bik'evine hindur! ¹⁵Lê yên nebaş,[§] sêrbaz, zinêk'ar, merivkuj, p'ûtp'arêz û her k'ê ku derewîyê hiz dike û û dike, ewê derva bimîne.

* 21:16 «Donzdeh hezar meydan» dike du hezar dusid kilomêtir.

† 21:17 «Gavek bi hesabê îroyîn dike 46 sm.

‡ 21:20 Navên van keviran ji yûnanî hatine nivîsarê.

§ 22:15 Bi yûnanî dewsa «yên nebaş» «se» nivîsar e.

¹⁶ «Ez~ Îsa, min milyak'etê xwe şand, ku şehdetîya van tiştan nava civînanda bide. Ez ji malbet û bereka Dawid im û steyrka şewq, ku sibehê zû dertê».

¹⁷ Ruh û bûk dibêjin: «Were»! K'ê dibihê bira bêje: «Were»! Yê ku t'î ye bira bê û yê ku ava jîyînê dixaze bira bêy maş bistîne.

¹⁸ Ez şehdetîyê didime her kesê ku xeberên vê kitêbêye p'êxembertîyê dibihê: Heger yek tişteki ser vanda zêde ke, Xwedê jî wê van belayên ku vê kitêbêda nivîsar in ser wîda zêde ke. ¹⁹ Û heger yek ji xeberên vê kitêba p'êxembertîyê tişteki kêmkê ke, Xwedê jî wê ji dara jîyînê û ji Bajarê Pîroz p'ara wî kêmkê ke, bona k'îjanan vê kitêbêda nivîsar in. ²⁰ Yê şehdetîya van tiştan dide, ew dibêje: «Belê, ezê zûtirê bêm». Amîn! Were, Xudan Îsa. ²¹ K'erema Xudan Îsa li ser we her kesî be. Amîn!

